# EMERXANÊ ŞIKAK

Lêkolîn û Berhevkirin: MIHEMEDSALIH QADIRÎ

**avesta | JIYAN: 71 | 1**
Emerxanê Şikak
**Ji serhildana Simko heta Komara Kurdistanê**
**(1906-1946)**
Lêkolîn û berhevkirin:
**Mihemedsalih Qadirî**
**Mijar**: Dîroka tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê

**Edîtor:** Şehab Xalidî
**Berg:** Şener Ozmen
**Dîzayna Navê**: Luqman Reşîdî
**Çapa Yekem:** 2021, Stembol
**Jimar:** 1000 heb

**Çap:** Berdan Matbaası
Sadık Daşdöğen Davutpasa Cad.
Güven San. Sit. C Blok, No: 239
TOPKAPI / İSTANBUL
Tel: (0212) 613 12 11

© Mihemedsalih Qadirî - Avesta, 2021
Ji xeynî danasînê bêyî destûra weşanxanê bi tu awayî nayê zêdekirin

Sertifika no: 13193

**AVESTA BASIN YAYIN**
**REKLAM TANITIM MÜZiK DAĞITIM LTD. ŞTi.**
Şehit Muhtar Mahallesi Basma Tulumba Sokak No: 5
BEYOĞLU / İSTANBUL
Tel-Fax: (0212) 251 44 80 - (0212) 243 89 75

www.avestakitap.com
avestayayinlari@yahoo.com
https://twitter.com/avestayayin
https://instagram.com/avestayayin
http://www.youtube.com/avesta1995
http://www.facebook.com/wesanenavesta

**ISBN: 978-625-7253-**

EMERXANÊ ŞIKAK

# JI SERHILDANA SIMKO HETA KOMARA KURDISTANÊ (1906-1946)

Lêkolîn û Berhevkirin: MIHEMEDSALIH QADIRÎ

avesta | JIYAN

**EMIRXANÊ ŞIKAK**, di Emerxan Şerîfî naskirî bi Emerxanê Şikak, kurê Mihemed Şerîf Şerîfî, ji dayikbûyê sala 1874an e. Emerxan, yek ji karekter û kesayetiyên girîng û navdar ê Êla Kardar û Şikakan bû. Emerxan di çaxê serhildana Simko de, heta dema ku bi Simko re bûye, wek şêwirmendê destê rast û wezîrê şer ê Simko, xwedî rol û bandorek berbiçav bûye. Berî şerê yekem ê cîhanî û çend salan piştî wî şerî jî, di herêma stratejîk a bakûrê Rojhilatê Kurdistanê de, wek hevpeymanekî bihêz digel Simkoyê Şikak, di şer û pevçûnên navbera kurd û eceman, kurd û osmaniyan û kurd û rûsan de, beşdar bûye. Piştî vê ku bi plana hikûmeta Îranê di navbera Emerxan û Simko de nakokî çêbûne, Simko ew radestî hikûmeta Îranê kiriye. Piştî vê bûyerê, Emerxan wefadariya xwe bi hikûmeta Îranê ragihandiye û di bin fermana hikûmeta Îranê de, dijberiya Simko kirye. Sê salan piştî kuştina Simko ji aliyê Rizaxan Şahê Îranê ve, Emerxan jî, ji aliyê Hikûmeta Riza Şah ve tê girtin, cezayê zînada heta hetayê bo wî tê dayin û paşî mayina heşt salan di girtîgehên Îranê de, di serdema şerê duyem ê cîhanê de ji girtîgehê azad dibe û piştre cardin wek karakterekî girîng ê tevgera Rojhilatê Kurdistanê rolek mezin hebûye.

Emerxan sala 1942an, di serî de berpirsyarê şaxa Komeleya JK di Bakurê Rojhilatê Kurdistanê de bûye û çalakiyên berbiçav kirine. Piştre di avakirina PDK a Rojhilatê Kurdistanê de, bi Qazî Mihemed re alîkarî kiriye û wek endamê serkirdayetiya PDKê hatiye hilbijartin. Herwisa di avakirina Komara Kurdistanê de, rolek mezin hebûye û tevî (Mihemed Husên Xanê Seyf Qazî, Mela Mistefa Barzanî û Heme Reşîdxanê Bane) yek ji çar generalên Komara Kurdistanê bûye û cihekî xasmanî di xebat û bûyerên wê serdemê de hebûye.

**MIHEMEDSALIH QADIRÎ:** Jidayîkbûyê 10.01.1965an, xelkê gundê “Çarî” ê li ser bajarê Selmasê, ji Rojhelatê Kurdistanê ye. Piştî herifîna rejîma Şah li Îranê (1979), bi sedema rewşa aloz a siyasî û neseqamgîrbûna jiyanê, tenê heya pola sê a navendî derfeta xwendinê hebûye. Ew ji sala 1980yî şûn de rasterast digel “Rêkxistina PDK Îranê” li bajarê Selmasê tekoşîna xwe dest pê kiriye. Ji sala 1982yan şûn de wek pêşmergeyê Kurdistanê, di destpêkê de di nava “Hêza Bergirî a Simko” û piştre di nava PDKÎ de, bo heyamê 39 salan e ku bê navber, di çepera berxwedana netewî de, ji bo rizgariya gel û welat, dixebite. Qadirî di heyama pêşmergatiya xwe de çendîn erk û wezîfeyên cuda cuda di warên; rêkxistinî, perwerde, leşkerî, birêveberî û dîplomasiyê de, bi rê ve birine û di sê kongreyên PDKÎ de (12, 13, 15) bo heyama 12 salan, wek endamê rêbertiyê xizmet kiriye. Ji2003an heya nîva duyem a sala 2005an, wek endamê Desteya Avaker û serpereştê rojnameya *Agirî* ku ji aliyê PDKÎ ve bi alfabêya latînî û bi zaravayê kurmanciya jorîn dihate weşandin, xizmet kiriye û ji wê demê ve heya niha, bi dehan gotar û hevpeyvînên wî yên siyasî, dîrokî û edebî, di rojname û malperan de hatine belavkirin. Qadirî ji sala 2012an ve, piştî kongreya 15an a PDKÎ heya niha, nûnerê PDKÎ li Hewlêrê ye. Ev pirtûka dîrokî, yekem berhema nivîskar e ku wek pirtûk hatiye weşandin.

## Rêzbend


Pêşgotin / 9

**Beşa yekem**
**Berçavroniyek derheqê jiyan û Kesayetiya Emerxanê Şerîfî (Şikak)** / 14
Kêşeya Simko û Emerxan digel Meşrûtiyetxwazan / 34
Destbiserkirina Ebdulrizaq Bedirxan û rizgarkirina wî ji aliyê Simko ve / 36
Yekemîn Sazî û dibistana Kurdî di Rojhilatê Kurdistanê de / 38
Çend belgeyên girîng ên Osmanî û Fransî derheqê Kurdan di sala 1914`an de / 45
.Pîlana destbiserkirin û kuştina Şêx Ebdulselam Barzanî ji aliyê Osmaniyan ve / 68
.Dûrxistina Simko û Ebdulrizaq ji aliyê Rûsan ve bo Tiflîsê / 71
Penaberiya Şikakan / 75
Serbestberdana Simko ji aliyê Rûsan ve / 81
Pîlangêriya Îraniyan bo Kuştina Simko bi bombeyê / 85
Rizgarkirina bajarê Urmiyê / 91
Weşandina rojnameya "Kurd" ji aliyê Simko ve / 96
Şerê Şekeryazê / 97
Şerê Rizgarkirina bajarê Mihabadê / 99
Hêrişa dewleta Îranê bo ser Simko, û girtina Kela Çariyê / 112
Cudabûna Emerxan û hinek serokêlan ji Simko / 113
Hêrişa Tirkan li ser Simko di gundê Şamanis a Elbakê de / 114

**Beşa Duyem**
**Hevdîtina Simko bi Îngilîzan re li "Behrike"ya Hewlêrê**/ 117
Nameya Mistefa Kemal ji Şêx Mehmûdê Berzencî re / 120
Nameguherîn û hevdîtina di navbera Simko û Şêx Mehmûd de / 123
Sozên Ozdemir û vegera Simko bo Tirkiyê / 126
Deqa wergerandiya gotûbêja rojnameya "Akşam" a Tirkî digel Simko / 129
Nameya Simko bo Şêx Ebdulrehmanê Seran / 137
Emerxan di nebûniya (xiyaba) Simko de / 142
Vegera dubare ya Simko bo Rojhilatê Kurdistanê / 143
Hevdîtina Simko digel Rizaxan / 149
Serhildana Şêx Se`îd / 151
Serhildana nakokiyên di navbera Simko û Emerxan de / 157
Plana Simko bo vegerandina Emerxan û destbiserkirina wî / 165
Radestkirina Emerxan bi dewleta Îranê ji aliyê Simko ve / 168
Emerxan wefadariya xwe bi dewleta Îranê radigehîne / 171
Pîlangêriya Îraniyan bona kûrtirkirina nakokiyên di navbera Simko û Emerxan de / 172
Hêrişa Ehmedaxayê birayê Simko bo ser Emerxan li Selmasê / 174
Hêrişa hevpar a dewleta Îranê û Emerxan bo ser Simko / 176
Nameya Simko bo Babekir Axayê Pişderî / 180
Pîlana Terorkirina Simko bi biryara Riza Şah /186

**Beşa sêyem**
**Biroyê Heskê û Destpêkirina serhildana Araratê** / 196
Piştevaniya Xoybûnê ji serhildana Araratê / 198
Damezirandina "Komara Ararat"ê / 203

Berdewamiya serhildana Araratê li herêma Makû a Rojhilatê Kurdistanê / 215
Şandina Emerxan bo şer li dijî serhildêrên Araratê ji aliyê Îraniyan ve / 216
Kuştina Biroyê Heskê ji aliyê hêzên ser bi hikûmeta Îranê ve / 218
Dirêjiya serhildana Makûyê ji aliyê Ferzinde Beg û hevalên wî ve / 220
Tundreviya dewleta Îranê ya li dijî Kurdan / 226
Civîna li gundê Heştiyanê / 229
Girtin û zîndanîkirina Emerxan ji aliyê dewleta Îranê ve / 231

**Beşa Çarem**
**Şerê duyem ê cîhanî û hatina leşkerên Sovyet û Îngilîzê bo Îranê** / 235
Hilveşîna deshilata Riza Şah û azadbûna Emerxan ji Zîndanê / 237
Çalakiyên Rûsan di nav Kurdan de / 238
Çûna şanda Kurdan bo Bakûyê / 240
Hewlên Rûsan ji bo razîkirina Emerxan / 267
Emerxan û Komeleya Jiyanewey Kurd (J-K) / 286
Siyaseta wê demê a Sovyetê li hemberî Kurdan / 302
Hatina Barzaniyan bo Rojhilatê Kurdistanê / 305
Damezrandina Hizba Demokrat a Kurdistanê (PDK) li ser bingeha Komeleya (J-K) / 308

**Beşa Pêncem**
**Avakirina Komara Kurdistanê** / 313
Peymannameya li navbera Komara Kurdistanê û Dewleta Millî a Azerbaycanê / 17
Şerê di navbera dewleta Îranê û Komara Kurdistanê de / 328
Sefera Qazî Mihemed bo bakûrê Rojhilatê Kurdistanê / 345
Hewlên parastina nasnameya Kurdistanîbûna Urmiyê û derdora wê / 348
Têkiliyên siyasî ên Emerxan bi Sovyetî û Amerîkiyan re / 352
Nigeraniya Emerxan û Barzanî ji qedera Komara Kurdistanê / 364
Dawiya temenê Dewleta Millî a Azerbaycan û Komara Kurdistanê / 367
Xatirxwastina Mela Mistefa Barzanî û Qazî Mihemed / 372
Hewlên bêencam ên Emerxan ji bo pêşgirî ji bidarvekirina Qazî Mihemed / 422
Bidarvekirina Qazî Mihemed / 438
Beşek ji wesiyetnama Pêşewa Qazî Mihemed / 439

**Beşa Şeşem**
**Hilsengandina "Archibald Roosevelt" derheqê Komara Kurdistanê û Dewleta Millî a Azerbaycanê** / 445
Emerxan piştî Komara Kurdistanê / 447
Nerîna kesayetiyên siyasî derheqê pêgeh û kesayetiya Emerxan / 449
Şehîdbûna du kur, û du neviyên Emerxan di nav xebata PDKÎ de / 454

**Wêne** / 455

(JIYAN)

*Pêşkêş e bi hemû tekoşer û şervanên neteweya Kurd, ku bi dirêjahiya dîroka hevçerx, di pêxema rizgariya welat û serweriya neteweya Kurd de, li hember dagîrkerên Kurdistanê, bi lehengî û cangorîtî xebat kirine, û tu carî teslîmî dorandin û sertewandinê nebûne.*

## *Spas û pêzanîn:*

Bi xatircemî ve karê lêkolîn û amadekirina vê pirtûkê, bi bê hevkarî û mandîbûna komek ji heval û mamostayên birêz û qedirgiran, bo min karekî bizehmet bû. Lewma wek emegnasî, di cihê xwe de ye ku ez spasiya hemû wan hevalên rêzdar bikim ku bi awayekî giştî alîkariya min kirine. Bi taybet: Mamosta Mihemed Hemebaqî ji Akademiya Kurdî, ku bi dana çendîn çavkaniyan û Herwiha bi rênimayiyên xwe ên binirx hevkariya min kiriye. Keremê Serhedê, Mihemed Hesenê Wajî, Gûlay Karaoxlo, Soheyla Şerîfî, Şerîf Felah, Se`îd Veroj, Şerîf Hejarî, Dîlan Herdî, Elî Munezemî, Hadî Ezîzî, Mistefa Selîm Mîna Axa Pişderî, Qadir Şikak û Kavûs Ezîzî, ku bi dabînkirina belgename û çavkaniyan alîkariya min kirine. Dildar Şeko û Xalid Cemîl, di warê zimanevanî de hevkariya minkirine.

Kamil Necarî, Ekrem Ûnen, Solîn Hacador, Samal Ehmedî, Edhem Şêxo, Sîpan Rojhilat, Mihemed Xiyasedîn Husên, Mihemedemîn Şerîfî, û Keywan Dirûdî ku bo wergerandina belgenameyan ji zimanên: Îngilîzî, Rûsî, Tirkiya Osmanî û Farsî bo ser zimanê Kurdî, gelek zehmet kêşane. Elî Simko, Isma`îl Cehangîrzade, Xosro Ebullahhî, Rif`et Mamedî, Fehîm Se`îdiyan, Konê Reş, Mizgîn Mehdî Zêbarî, Riza Zubêr Zêbarî, Şivan Elî Şikak, Elî Ebdulla Osman neviyê Cemîl Axayê Gerdî, Elî Zerdeşt, Se`îd Muxlis Erdem, û Ehmed Hesenzade di warê dîroka devkî de zanyariyên binirx dane min. Ebdulla Hicab bi pêşniyarên xwe naveroka pirtûkê dewlemendtir kir. Celal Rewangerd bo destebendiya beşek ji belgenameyan hevkariya min kiriye.

Daxwaza lêbihorînê jî ji wan hevalên hêja dikim ku di navxwe a welat de ne, û ji bo parastina ewlehiya wan, nikarim navê wan bînim. Wan hevalên hêja di navxwe a welat de, bi peydakirina gelek belgename, wêne û çavkaniyên dîrokî ên binirx, hevkariya min kirine. Carê ew wekî serbazên winda ne, û hêvîdar im ku ew roj û derfet dûr nebe ku bikaribim di çapa duyem a vê pirtûkê de, navê wan hevalên hêja jî, di pirtûka xwe de bînim ziman.

Di dawiyê de, spasiya xwe ya xasmanî pêşkêşî hevjîna xwe ya rêzdar “Nayime Xuremî” dikim ku bi zehmetiyên girêdayî bi karê vê pirtûkê ve,  berdewam alîkarî û piştgirî da min.

## *Pêşgotin*

Di serî da vê rastiyê tînim ziman ku, min ne xwendina akademî a dîroknasiyê qetandiye, û ne jî ev pirtûka min ku li ser mijara dîrokê ye, hilgirê hemû wan metodên zanistî ye ku divêt bo nivîsîna wiha mijareke hestiyar a dîrokî, were berçavgirtin. Lewma ez asayî û xwezayî dibînim ku di vî warî de, pirtûka min bê kêmasî nebe.

Mebest û armanc ji amadekirina vê pirtûkê, berî her tiştî, hestkirin bi berpirsayetiyeke netewî û nîştimanî bû, ku ji bo vejandin û zelalkirina pişkek ji dîroka aloz û sergirtîmayî ya gelê Kurd, bi aliyên erênî û neyînî ên xwe ve, dikare bibe ders û ezmûn ji bo nifşên paşerojê. Jiber ku ev pirtûk, mêjûya ji 75 heta 114 salan berî niha li xwe digre, bi egera nemana karakterên di nava bûyerên wê demê de, lêkolîn û amadekirina vê pirtûkê karekî bizehmet bû. Lê min hewl daye, bi lêkolîn û mifahwergirtina ji zanyariyên di nava belgeyan û çavkaniyên cuda-cuda, ên nivîskî û devkî de, bikarim bi veguhastin û nîşandana aliyên xurt û lawaz yên wê dîrokê, ronahiyê bixim ser tarîtiya gelek qelîştek û nihêniyên veşartîmayî ên bûyerên wê serdemê, ku dagirtiye ji gelek wan karesat û tirajidiyên ku bi ser netewa Kurd de hatine.

Armanca min ew e, bi vejandin û zelalkirina aliyek ji wan bûyerên sedsala derbazbûyî, bikarim xizmeta gelê Kurd û nemaze nifşên paşerojê bikim. Herçend ku di vê pirtûkê de, navê gelek kes, êl û eşîretan bi aliyê erênî, yan jî neyînî ên girêdayî bi bûyerên wê demê ve hatiye vegotin, yan jî, hinek kes hatibin rexnekirin, lê min ew zanyarî li gor lêkolîn û çavkaniyên belgemend, wekî emanet bo xwendevanan veguhêztine. Qezavetkirina derbarê van bûyeran de, pêdivî ye li gor pîvan û rastiyên bêhtir ji 100 salên berê ku taybet in bi rewşa siyasî, civakî, rewşenbîrî, aborî û Kulturî ya wê serdemê, werin kirin. Ev pirtûk, dixwaze bi azîneke (metodeke) wisa, hem rûmet û meznatiya dîroka pir ji şanazî ya serhildana Simkoyê Şikak, Şêx Se`îd, Ararat û Komara Kurdistanê biparêze, hem jî, rola Emerxanê Şikak ku ekterekî berbiçav û xwedîbandor di tevgera Kurdistanê de bûye, destnîşan bike.

Herwisa min xwestiye ku derfeta gengeşe, helsengandin û mafê qezawetkirina derbarî vê babetê, li gor rastiyên girêdayî bi wê serdemê, ji bo lêkolînerên dîroknas û civaknasan were parastin. Lewma ev pirtûk, bi nerîneke xisarnasî û li ser bingeha berpirsatiyeke netewî û niştîmanî, hatiye amadekirin. Lê dîsa jî, nikarim bêjim ku di vî karî de kêmasî nînin. Asayî ye ku bi egera li berdestnebûna çavkanî û zanyariyên berfireh û selimandî, di naveroka hin zanyariyên wê berhemê de, şaşî û natemamî jî hebin.

Lê ya diyar e, ew e ku ev pirtûk, ne dixwaze bi vegotina aliyên erênî, alîgiriya kesekî bike, û ne jî dixwaze bi vegotin û navînana hin êl û eşîret û kesayetiyên ku di wê serdemê de carna rolên neyînî lîstine, hesta tu kesekî birîndar bike. Jiber ku hemû ew alî, li gor dema xwe û li gor asta îmkan û zanîna xwe, ji bo doza Kurdistanê xebitîne, û bi aliyên erênî û neyîniyên xwe ve bûne pişkek ji dîrok û nasnameya gelê Kurd.

Bixasmanî mijara girêdayî bi Simkoyê şikak û Emerxan, yan Emerxan û Komara Kurdistanê, wek babetek navxweyî, hinek hestyar û nezelal e. Jiber ku derbarî vê mijarê de qezawetên nerast û bê belge hatine kirin, lewma pêdivî ye ev babet, dûr ji nerîneke demargirjane, bi lêkolîn û zelalkirinek zanistî bikeve ber destê xwendevan û dîroknivîsan, daku her yek ji wan rêber û serkirdeyan, ligor wê ked û xebata ku hebûne, rêz ji wan were girtin.

Ev metod û karê han, hem dikare hitbara vê lêkolînê biparêze, û hem jî wê bibe çavkaniya zanyariyên bawerpêkirî ji bo şirovekirina wan kêşe û nakokiyên navxweyî, yên ku di wê serdemê de bûne egera lawaziya serhildana dîrokî ya Simkoyê Şikak, û herwisa têkçûna Komara Kurdistanê. Vegotin û gengeşekirina nakokiyên navxweyî, nek her ji mezinahiya Simkoyê şikak û Qazî Mihemed û xebata pir ji serweriya wan rêberên nemir kêm nake, belkî ew yek wê derfetê bide lêkolîner û xwendevanan, ku bizanin netewa Kurd jî, wek her neteweke cîhanê, di piroseya pêşkevtina xwe de, ji çi astengî, evrazî û nişîviyan re derbas bûye û gihîştiye îro.

Di encamê de nivşên paşerojê, wê bi dîtina van rastiyan, aliyên xurt û lawaz yên dîroka xwe bizanin, û bi wergirtina ders û ezmûnan

ji dîroka xwe, wê bêhtir bikarin ji armancên xwe yên dîrokî re, xizmetê bikin, û encamên erênî werbigrin. Bêguman, vegotina wê dîrokê, hem wê bibe egera wergirtina ders û ezmûnên binirx ji bûyerên derbasbûyî û hem jî nifşên paşerojê, bi dûbarenekirina van şaşiyên derbasbûyî, wê bizanin ger pîlanên neyaran û neşarezayî û nakokiyên navxweyî, bûne egera şikestên raborî yên netewa Kurd, di heman demê de, rizgarî û serkevtin jî ji dergehê zanist, û hevdu qebûlkirin û yekîtiyê ve, digihîje encamê.

Rast e ku ev pirtûk li ser Emerxanê Şikak û têkiliyên dûr û nêz ên wî digel bûyerên dema jiyana wî hatiye nivîsîn, lê min hewl daye tevî mijarên girêdayî bi Emerxan, li ser beşek ji dîroka 40 salî (1906-1946)an a girêdayî bi tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd di Rojhilat, Bakûr û Başûrê Kurdistanê de ravestim, û rewş û siyaseta welatên herêmî, û zilhêz ên cîhanî derheqê doza Kurd di wan qonaxan de şirove bikim.

Di vê pirtûkê de min hewl daye bi bidestxistin û wergerandina hin belgenameyên arşîva Rûs, Îngilîz, Amerîka, Osmanî û Îranê, ez bikarim cudahiya di navbera nerîn û dîtingeha Kurdan li ser siyaset û xebata wan tevî siyaset û pîlanên welatên dagîrkar, û herwisa siyaseta wî çaxî a Rûs û Amerîka û Îngilîzan, derheqê tevgera Kurdistanê bidim ber hev, da ku siyasetmedarên Kurdan tenê li gor dîtina xwe mêzeyî xebat û têkoşînê nekin, belku bi hişmendî û jîrî ji hevkêşeyen siyasî û berjewendiya welatên zilhêz û yên derdorê xwe fêm bikin, û li gor dîtina wan rastiyan, bikarin siyaset û plana xebata xwe bo gihîştin bi armancên netewî dabirêjin.

Ji naveroka wan belgenameyan, bo me xûya û zelal dibe ku siyaseta welatên wek: Rûs-Sovyet, Îngilîz, Amerîka, Osmanî-Tirkiye û Îranê, di qonaxên cuda-cuda de, derbarê Kurd û Kurdistanê çawa bûye. Herwisa zelal dibe ku siyaset û helwesta serkirdeyên Kurdan li qonaxên cuda-cuda derheqê her yek ji wan welatan de, û herwiha ew bûyerên ku wan di nav de jiyan kirine, li ser bingeha lêkolîn û stratijiyek domdirêj nebûye. Lewma em dibînin li gor çaxên cuda-cuda, li hember bûyerên curbicur, û herwisa her yek ji wan welatên navbirî, di siyaseta serokên kurdan da cudatî û paradoks hebûne.

Herçend ku dibe beşek ji wan paradoksan Li gor serdemên cuda, di çarçoveya siyaseta taktîkî, û ji neçariya serkirdeyên Kurd bi sedema rewşa nebaş û bêderetaniya wan, were şirovekirin. Lê di heman demê de nabe li hemberî şaşiyên wan jî, em çavên xwe bigrin, û dersê jê wernegrin.

Hêvîdar im ku xwendevan û bitaybetî dîroknasên Kurd, bikarin bi lêkolînên zêdetir li ser vê mijarê, rastiyên wê dîroka buhadar a netewa me, daha zêdetir zelal bikin. Wekî eyan e beşek ji wê dîrokê, hêj di bin xwelîşînka rojgar de maye, û beşeke din a wê jî ji aliyê dijminan ve, bi qestî û zanebûn hatiye şêlûkirin. Bêguman karkirin li ser wê mijarê, wê bibe bingeh û mînakek balkêş bo nivşên siberojê, û ewê bizanin ku neteweya wan bi dirêjahiya mêjûya xwe, ji çi riyeke dijwar û bizehmet û pir karesat re derbas bûye, û herwiha çi erkek ji wan re bi cî hêlaye, da ku bo gihîştina bi serkevtina yekcarî, ew jî bi cî bînin.

Mihemedsalih Qadirî- (Îlona 2020-Hewlêr)

## *Beşa yekem*

## *Berçavroniyek derheqê jiyan û Kesayetiya Emerxanê Şerîfî (Şikak)*

Emerxan Şerîfî naskirî bi Emerxanê Şikak, kurê Mihemed Şerîf Şerîfî, ji dayîkbûyê sala 1874`an e. Emerxan, yek ji karekter û kesayetiyên girîng û navdar yê êla Kardar û Şikakan bû. Mihemed Şerîfê bavê Emerxan ku serokê parek ji êla Kardaran bû, gelek caran bi egera nakokiyên li ser erdê û parastina deshilata xwe di nav Şikakan de, bi Mihemed Axayê bavê Simko re, nakokî û pevçûnên wan hebûne.

Mihemed Axa di sala 1905`an de, piştî vê ku Cewer Axayê kurê wî, bi awayekî necamêrane ji aliyê Nizam El-seltene karbidestê hikûmeta Qacar li Tewrêzê hatiye terorkirin, hewara xwe gehandiye Sultanê Osmaniyan, û daxwaz ji wî kiriye ku tola kuştina Cewer Axa li dewleta Îranê hilînin. Lê Osmanî bêy vê ku li dijî dewleta Îranê bi karekî rabin, di wî serdemî de bi gumana desthebûna malbata Bedirxaniyan li kuştina serokê ewlehiya (emniyeya) Osmaniyan li Stembolê û alîkariya Memed Axa bi wan re, wan Memed Axa jî girtine, û bêserûşûn kirine. Heta niha jî kes nizane Osmaniyan çawan û li kuderê Memed Axa kuştin, û li kuderê veşartin.

Di wê demê de Simko li herêma Kotol û li cem Murteza Qulîxanê serdarê Makûyê bûye. Hingê Şikakên êla "Kardar" yên ser bi Mistefa Axayê pisaxa û Emerxan, bi hêz û hejmara şervanên xwe, ji Şikakên girêdayî bi malbata Simko zêdetir bûne, û ewan Mistefa Axayê Kardar wek serokê Şikakan li Kela Çariyê danîne, û deshilata xwe bi ser Şikakên girêdayî bi Simko sepandin e. Lê Şikakên girêdayî Simko, bi vê yekê razî nebûne, û piştî derbasbûna çend heyvan, Mistefa Axa ji aliyê du kesan bi navê (Ehmed û Mehmûd) kurên Mîro ve, ku ji êla Şekirî ya girêdayî malbata Simko bûn, hatiye kuştin.

Digel kuştina Mistefa Axa, Kardaran jî li derdora Selmasê, hêrişî ser êlên Şikakên girêdayî bi Simko kirine, û Simko jî ji Kotolê ve bi

hewara wan de hatiye, û di navbera wî û Kardaran de alozî û şer û kuştin qewimiye. Bi vî awayî kuştina Mistefa Axayê Kardarî bûye sedema nakokî û netifaqiyek bingehîn di navbera her du aliyên Şikakan de, ku bi salan domandiye, û êdî baweriya xwe bi hevdu neanîne. Di wê serdemê de bi sedema piştgiriya Rûsan ji Simko, di navbera her du aliyan de, aramiyeke rûkêş (riwaletî) hebûye. Piştre hêdî-hêdî pêgeha Simko di herêmê de bihêz dibe, û ji wê demê şûnda Simko wekî serok, û Emerxan jî piştî mirina bavê xwe, wek destê rastê yê Simko, di nav Şikakan de rola wan hebûye.

Emerxan berî şerê yekem ê cîhanî û çend salan piştî wî şerî jî, di herêma stratejîk a bakûrê Rojhilatê Kurdistanê de, wek hevpeymanekî bihêz digel Simkoyê Şikak, heya çend salan, di şer û pevçûnên di navbera Kurd û Eceman, Kurd û Osmaniyan, û Kurd û Rûsan de beşdar bûye, û hem wekî şêvirmendê Simko û hem jî wekî fermandeyê yekem yê hêzên Simko, di asteke bilind de xizmeta tevgera Kurdistanê kiriye.

Emerxan di wê serdemê de ku digel Simkoyê Şikak bûye, jiber ku lêzan û jêhatî bû, di serhildana Simko de rol û bandoreke girîng hebûye. Herwisa piştî vê ku di navbera wî û Simko de nakokî çêdibin, û ji aliyê Simko ve radestî hikûmeta Îranê tê kirin, piştre di dijayetîkirina Simko de jî roleke berbiçav hebûye. Sê salan piştî terorkirina Simko ji aliyê Rizaxan Şahê Îranê ve, Emerxan jî, ji aliyê Hikuûmeta Riza Şah ve tê girtin, û bo heyamê çend salan di girtîgehên Îranê de dimîne.

Di serdema şerê duyem ê cîhanî de, Emerxan ji girtîgehê azad dibe û piştre cardin wek karakterekî girîng ê tevgera Rojhilatê Kurdistanê rol hebûye, û wek serkirdeyekî Komeleya J-K û Hizba Demokrat û yek ji çar jeneralên Komara Kurdistanê, cihekî xasmanî di xebat û bûyerên wê serdemê de hebûye.


Li gor belge û dekomentên berdest, Emerxan di jiyana xwe ya siyasî, serbazî û civakî de, siyasetmedarekî lêzan, xwedî ezmûn û bibandor bûye. Lewma em dibînin navê wî tevî navê Simko û Qazî Mimehed, di sedan belgenameyên Rûsî, Îranî, Osmanî, Amerîkî, û Brîtanî û herwisa çavkaniyên dîrokî de, berçav dikeve.

Emerxan digel vê ku bi xebata xwe ya dûr û dirêj, xizmetên mezin di nav bizava rizgarîxwaziya netewa Kurd de kirine, û pencemora xwe li mêjûya hevçerx ya Rojhilatê Kurdistanê xistiye, lê ew yek nayê vê wateyê, ku  Emerxan kêmasî û şaşî jî tunebin. Lewma di vê pirtûkê de, min hewl daye, ligor encama zanyarî û belgenameyên berdest, rol û kesatiya Emerxan bi dirêjiya xebata wî, bi aliyên erênî û neyînî ve, bo xwendevanan şirove û pênase bikim.

Li ser bingeha wan zanyariyên ku di encama lêkolîn û amadekirina vê pirtûkê de hatine berdest, em dibînin ku serpêhatiya Emerxan jî wek serpêhatiya piraniya serkirdeyên Kurd, tejî ye ji  ketin û rabûn, ji nakokiyên navxweyî û dijberîkirina hevdu, ji ketina nav telik û pîlanên dijminan, û di encam de qehremantî û fedakarîkirina ji bona bidestveanîna mafên neteweyî ên Kurd. Bêguman lêkolîn û zelalkirina van mijaran, dikare ronahiyê bixe ser beşek ji bûyerên girîng ên dîroka çil salan (1906-1946) a  tevgera Kurd, û herwisa wê bibe sedema sûdwergirtina ji wan bûyeran.

Çend belgeyên dewleta Osmanî ku taybet in bi çawaniya serederiya Rûsiyeya Qeyserî û Osmanî û Îraniyan digel Emerxanê Şikak û eşîra Kardar:

**Belgeya hejmar: 1**



Babê Ali
Wezareta Derve
Muduriyeta Karên Siyasî
Qelema Duyem

Ev belge ji wîlayeta Wanê, ji aliyê meimûrê mulkiyeta Îdarê "Mursel Ceharî" ve, di (04.03.1909) de bi nimreya 168 hatiye şandin.

Telegrafa serokê eşîra Kardar wate Emerxan, hem jiber ku di aliyê naverokê de girîng bû, hem jî jiber ku dema me teng bû, min rasterast ji zatê we re şand.

Ew cihê ku Emerexan di bin kontrola xwe de girtibû, ji bo parastinê baş bû. Piştre li gor lêkolîna ku min kir, min çend pêşniyaz şandin, û eger ew lawaz nebûna, ew cihê ku ew têde bûn, bêyî ku bi qasî misqalekê zirar bigihîştiba wan, ewan dikaribûn gelek zerarê bidin Rûsan.

Wek ku serleşkeriya hidûd jî ji meqamên dewletê re aniye ziman, eger wan kesan bi wê şiyana xwe ya destpêkî, li derveyî hukmê qanûna Osmanî, ew şîret guhdar bikirana, bêyî peydabûna tu kêşeyekê, wê bikarîbana bigihîjin ciyê xwe.

Diviya şahbenderê me yê li Rûsiyayê jî, ji hinek hiqûqê wan ê rewa xwedî derketiba, û şopandiba. Tevî ku ew hatibûn vexwendin, lê bi xapandinê hatin dardestkirin. Li gor naveroka nameya wan, ew herdû kesên bêguneh ku li Tewrêzê hatine îdamkirin, hêj nûçeya îdamkirina wan belav nebûye, bêguman wê sibê bête belavkirin.

Serbarê vê ku heya astekê îhtimala hêrişeke wan ya lawaz tê kirin, gelo îmkan heye ku çi wek pêdagirî li ser mafê wan, yan jî hekî îmkan hebe li dervey yasayên deshilta Osmaniyan, em karekî bo wan bikin, da ku di vê kavdanê de, ew li jêr emrê Osmaniyan de bimînin?

Şehbenderê Rûsiya ji bo girtiyan, di bersiva xwe de dibêje: Li ser daxwaza karbidestên siyasî ew rêkirine Tewrêzê. Em texmîn

bikin ger tawanên wan jî hebin, jiber ku ev kesane welatiyên me ne, divê bêne parastin. Lê karbidestên siyasî û îdarî yên me, bi tu awayî vê yekê li ber çav nagrin.


Li gor nûçeya gihîştî, Şahbenderê me derheqê vê mijarê de devê xwe nevekiriye, û qiseyek nekiriye. Îro Rûs heya qîblegeha me jî çûne û dixwazin ku bi awayekî eşkere û bi hemû şiyanên xwe, hemû wan kesan ji me veqetînin, ku bi demareke rastîn a dîndariyê ve, bi me ve girêdayî ne. Diviya ku karbidestên me di vê herêmê de bi awayekî veşartî alîkariya wî xelkî kiribana. Lê nizanim çima me nekarî vê fedakariyê ji xwe nîşan bidin. Em derheqê wî xelkî de, gelek gotinên neyînî ji berpirsên xwe dibihîsin, lê li gor îdeayan, ew gundiyên ku îşare bi navê wan tê kirin, mafê rewa jî hene. Lê niha derheqê vegerandina wan bo paşve, em nikarin tu tiştî bêjin. Li ber vê ku nayê zanîn ew bandora siyasî ya hikûmeta Tehranê li ser hikûmeta Azerbaycanê heyî, heya çi qasekî ye?.

Yên ku têne darvekirin, xelkê herêmên rojhilat in, û bê guneh rastî zirarên mezin bûne. Ger Şahbenderê me nikare bo qerebûkirina ewên ku hatinî îdamkirin, tiştekî bike, bila her nebe bona qerebûya zirara van gundiyan, tiştekî bike. Yên ku îşare bi navê wan tê kirin, bila li gor fermana cenabê we, û bilez ji aliyê wilayetê ve, hevkariya wan were kirin.

Emr û biryar ya we ye

Ew belge wek eslê xwe ye

**Belgeya hejmar:2**




Ofîsa Serokwezîrtiyê
Ji ofîsa Wezareta Karên Derve

13.01.1912

Riwayet ew e ku leşkerên Rûs, wê hêrişî Somayê bikin, û Emerxan bigirin. Ji bo vê meselê me telegraf ji serleşkeriya Erzincanê re şand. Di 13.01.1912`an de ji bo ku zatê we jî agehdar be, me bi numreya 2074`ê name ji we re şand, û em hêvî dikin ku çi pêdivî bike, were kirin.

Digel silav û rêzên giran…

**Belgeya hejmar:3**




Wîlayeta Wanê
11.02.1912

Eşîra Kardar ku li deverên Hekariyê dimînin, ji aliyê Rûsan ve hatine şêlandin, ji eşîrê du kes îdam kirine, û bi qasî 7 hezar jî pere ji wan standine. Serokê eşîrê Emerxan bi riya meimûrên îdarexaneyê, ew nameya ku şandiye, me jî ji we re şand.

Di vê nameyê de serokê eşîrê gotiye ku: “Em di bin îdareya Osmanî de ne, Rûs bê sebeb zirarê didin me. Ji ber vê em dixwazin ku wezareta dewletê bi rêyên siyasî, bi wan re bikevin têkiliyê, da ku ew malên me yên ku bi zorê ji me standine, ji wan were xwastin. Herwiha ji bo ew mirovên me yên ku hatinî kuştin jî, çi hewce dike, bila were kirin.”

Ev belge wek eslê xwe ye

**Belgeya hejmar 4:**


دائرهٔ صدارت تحريرات قلمی
شعبه
اوراق نومروسی
مسودی
مبیضی
۱۷۴۸
۱۷۴۹
قلمه ورودی تاريخی
تاريخ تسويد
تاريخ مبيض
لاجل التبييض قلمه ورودی
مقابله ایدنلر
OSMANLI ARŞİVİ
BEO

Ofîsa Sedaretê beşa Telegrafan


Ji ofîsa Herbiye (şer) re

18.02.1912

Ev Telegraf di derbarê du meseleyan de ye, rîwayet ew e ku wê Rûs li Somayê, Emerxan destbiser bikin, û bersiva sefareta Tehranê di derbarê vê rîwayetê de çî ye...

Simko û Rûs bi hev re çûne Somayê, û şexsê ku behsa wî hat kirin, wê tayînî dadgeha Somayê bikin. Du Telegrafên ku behsa van bûyeran dikin, me li rêkevt 04.02.1912 bi numreya 1748-28762 û 1749-28763 ji cenabê we re şandin.

## Belgeya hejmar: 5



Babê `Alî
Wezareta Xaricî
Karên Siyasî Muduriyeta Giştî
Ji Sefareta Petersbûrgê re
07.04.1912

Di derbarê bûyera ku Eşîra Kardarê ji aliyê Rûsan ve hatibû şêlandin


Ji hezretê dewletlî re

Eşîra Kardar ya li nahiyeyên Rojhilat, ji aliyê Rûsan ve hatine şêlandin. Rûsan du mirovên wan kuştine, û bi qasî 7 hezar jî pereyên wan ji wan standine. Di derbarê vê meselê de, serokê eşîrê Emerxan li cem me gilî û gazinde li wan kirine. Me jî gotinên wî bi awayê nivîskî wek telegraf ji wîlayeta Wanê bi wasiteya Wezareta Navxwe ji we re şand.

Di vê çarçovê de ji bo standina ew malên ku hatine şêlandin, û ji bo pêşgirtina ji kiryarên wiha ku carek din ev zulm neyê kirin, tiştên ku hewce bike, divê werin kirin. Helbet biryar, ya cenabê we yê qedirbilind e. Herwiha ferman jî ya we ye.

Li ser navê Nazirê Derve
Musteşar

## Belgeya hejmar:6



حضرت نظارتی
تحریرات دائرهسی
شفره قلمی

وانده حدود ایرانیه برنجی قسم قومیسیری ارکان حربیه قائممقامی راجحت بکدن موارد
١٠ مارت ٣٢٦ تاریخلو شفره تلغرافنامهنک صورتیدر

غایت مهم و مستعجلدر

صومایده کی شیکاك عشیرتی رؤساسی اولان اسماعیل وتیمور وعمر اغالرك روسلره دخالت ایتمك اوزره دیگرلریله
دلماسه کیدوب روسلرده لاتیله ایرانه دخالتلری کمال حرمتله قبول ایدلدیکی کبی عمران ابد تونامه
روس قنسلوسیله تلطیف ایدلدکلرینی رسماً وتواتراً ثابت اولدیغی
سریعاً ترتیب ویرر روس قنسلوسیله تعلیمات الدقلری
روسیه وایران حکومتلرنده عساکر عثمانیهیی ازعاج ونواحی شرقیهده ده اخراج ایچون تعلیمات روسیه پاراغی
ویرروایتده تفنکلی واوجیوز قشله موعود طرفنده ایرانه اجیله اولسنی استقبالکیده حکارینک
وبوتیشائی تأمینه ایرانه مأمورلرینی بالمرور ایرانه ستانو قوچیه تسلیم
آلمه اوزره ایکی یوز آتلی ایله برنجی حدودلو کنك
تسلیم ... بیلدیریلکده طرفنده قوماندانلی حدودلو ... ایکیمی وتعلیماتی اجراسی
محققه ایدوك اوده ... قوت اجرای حیاطه صول اولان موسه ناشئه ... 
صنور تشکل اجتماعنده ولایت ، قول اردوسیده
طلب ایدلکده اولدیغی وکیفیت داخلیه نظارت جلیلهسیله عرضه ایدلدیکی معروضدر .
بیلدیرلدیکی وحلنده تکرار استفسار ایدلدیکنده الآن جواب

OSMANLI ARŞİVİ
BEO
1/04/4 | 302767 | 3

Wezareta Leşkeriyê, Dayreya muxaberatê

15.05.1912


Qelema taybet

Telegrafa taybet ya serokê qereqola li ser sînorê Wan û Îranê, Behcet Beg,

Gelek girîng û taybet e

Serokên eşîra Şikak yên li Somayê, Îsmaîl, Teymûr û Emerxan ji bo tev li Rûsan bibin, çûne Dîlmanê. Tevlîbûna wan a digel Rûsa ji aliyê Îranê ve baş hatiye dîtin. Omer Axa kirine Emir Toman, û yên din jî rutbeya sertîp û nîşaneya Rûs dane wan. Herwiha em pê hesiyan ku Hikumeta Rûsiya û ya Îranê ji bo ku leşkerên Osmanî ji wê hêlê derbixin, te`ilîmat dane wan, û ji bo şer jî 300 tiving dane wan. Li gor agahiya ku qereqola 18-mîn ya li sînorê Îranê daye me, 200 heb leşkerên Îranê wê alaya Rûsan hildin. Jiber ku hêj qereqola me ya 21-mîn ava nebûye, beşeke sînorê Îranê, di bin kontrola me de nîne. Ji bo tejîkirina valahiyê, me daxwaza hêzên leşkerî ji navenda leşker kir.

## Belgeya hejmar:7


خارجیه نظارتی

١٦٤٩٢-٤٥٨

OSMANLI ARŞİVİ
BEO
4044 | 303767 | 7

Wezareta Xaricî/Karê siyasî
26.05.1912

Di derbarê serokê eşîra Şikak ku li Îranê hatiye pîrozkirin, serokên eşîra Şikak yên li navçeya Somayê İsma`îl, Têymûr û Omer Axa(Emerxan) ji bo ku tevlî Rûsan bibin, çûne Dîlmanê, û bi navbeynkariya Rûsan, xwe radestî Îranê kirine. Îranê bi çi awayî ew qebûl kirine û çi daye wan, emê wan agahiyên bidin we. Herwiha Îran ji bo ku leşkerên Osmanî ji rojhilat derxîne, alîkariyê dide wan kesana. Lê bi çi awayî alîkariyê dide wan, me di telegrafa ku ji we re şand anî ziman. Divê wezaret di vê meselê de çi pêdivî dike, zû bi zû bike.

Di vê qismê de ew şexsê ku behsa wî tê kirin û ew agahiyên ku me behs kirin, bi awayê telegraf ji sefîrên "Petersburg" û Tehranê re hat şandin. Piştî wê jî, di Telegrafa ku me ji Turhan Paşa (sefîrê Osmanî yê petersburgê) re şand de, me got: Heta ku biryara dadgeha Laheyê diyar bibe, di wan eraziyên ku di bin kontrola dewleta Osmanî de ne, ew piştgiriyê didin hin eşîran û li hember dewleta me, wan bi kar tînin. Ev tevgera han û beyanatên Mosyo Sazanov û Mosyo Tokofça li hev nayên.

Di navbera me û dewletên cîranê me de, têkiliyên me yên ku em bi taybetî dixwazin bi awayekî gelek baş bidome, di xeterê de ye. Ev daxwaziya me û polîtîkaya Petersburgê wê çawa were ba hev, em nizanin. Ev rewşa hanê divê bi awayekî munasib ji Wezareta Karên Derve ya Rûsiyayê re bên gotin. Wek ku di telegrafa Emîn Beg da jî hat gotin, dema ku Îran li ber perçebûnê bû, dewleta Osmanî li dema şerê bi dewleta Îtaliyayê re, li rewşa xwe ya siyasî nenihêrî û alîkariya Îranê kir, û ji bo yekperçeiya Îranê xebitî. Herhal hikûmeta Tehranê îro ew qenciya me ji bîr kiriye, lewma wê rewşê em gelek xemgînkirine.


Di navbera dewleta Osmanî û Îranê de, ji bo muhafezeya sînor divê komîsyonek bê lidarxistin, û heta biryara ku ji aliyê Dadgeha Laheyê ve bê dayîn, di vê demê de tecawuza me ya li aliyê Îranê,

ne ji bo daxwaziya erdê Îranê ye. Di heman demê de divê Îran jî, ji bo menfîeta Rûsan, gelê li ser sînor (Kurd) li dijî Osmanî teşwîqê şer neke. Divê Îran li ser peymana di navbera me de bisekine, û bi awayekî dostane bi me re tevbigere. Lê belê eger dewleta Îranê bi awayekî ne baş tevbigere, û eşîrên li ser sînor li dijî me bi kar bîne, divê Îran bi tu awayî û di tu mijarekê de, ji Osmanî alîkariyê nexwaze, û dev ji vê siyaseta durû berde.

Ji bo van meselayan, me him ji sefareta Tehranê re, hem jî ji ya Petersburgê re telegraf şandin. Li gor bersivên ji wan werin, divê di dema herî kurt de, çi pêdivî bike, were kirin.

Emr û ferman ya hezret e.

**Belgeya hejmar:8**



Babi Alî
Wezareta Xaricî
1912.06.02

Di derbarê serokê Eşira Şikak de ye

Serokê eşîra Şikak yê li Somayê tevlî Rûsan bûye. Rûsan bi çi awayî ew qebûl kiriye, û çi daye wî, wezîrê me yê Rûsiyayê Turhan Paşa, di vê derheqê de pirsî, û netîcê ji me re şand.

Turhan Paşa dibêj ku Musyu Sazanov bersiva vê îdi`ayê wiha daye: "Serokê eşîra Şikak bi tu awayî nehatiye bal me, û tu rastiya wê babetê nine, ku hikûmeta me xelat û nîşane dabe wî. Me tucarî niyetek wisa nîne ku em dewleta Osmanî li ser sînorê îranê aciz bikin, yan ji wir dûr bixin. Ji bo vê armancê jî, tucar dewleta Rûs û Îran nebûne yek. Ev xeber di esas de derew e".

Sazanov di mesela alîkariya çekan da jî got ku: "Qet îmkana wê yekê nine ku alîkariya 300 tivingan bi wan re, were kirin."

Di halekê de ku em dizanin Rûsiya bi hakimên Makû, Xoy, Selmas û Urmiye re bi hev re dixebitin û li hember me planan çêdikin. Em dizanin ku xelata "şûrê iftixarê" û rutbeya generaliyê danê hakimê Urmiyê.

Hûn bala xwe bidnê, ecêb e ku dema konsolosên me agahiyan ji Rûsan dixwazin, ew an dibêjin derew e, an jî dibêjin emê li ser vê mijarê lêkolînê bikin û dûre xeberê bidin we, karek ku piştre jî qet netîce jê dernakeve. Feqet diyar e ku bi vî awayî planên xwe vedişêrin û ji bo ku zeman bi dest bixin, me mijûl dikin. Ev du sal in ku ji hikumetê re dibêjim, armanca Rûsiyayê ev e ku me ji wan deverana dûr bixe. Ji bo vê armancê jî, xwe ji tu kiryarekê pare nahêlin. Di vê derheqê de, li vir gelek kes bi min re di heman fikrê de ne.

Li gor agahiyên ku konsolosên me yên li Batum û Qersê şandine, dibe ku ev agahî jî, rast bin, lewma li Azerbeycanê hin planên Rûsiyayê ên wisa hene, û dewleta Alman û Îngilizê jî hay jê hene, ku çi dike. Wek ku min li jor jî got, divê em di demeke herî kurt de, bi Îranê re ji bo ewlehiya sînor komîsyonekê li dar bixin, da ku Rûsiya di paşerojê de nebe xwediyê tu mafekî.

Emr û ferman ya we ye.

## *Kêşeya Simko û Emerxan digel Meşrûtiyetxwazan*

Piştî vê ku Mihemed Axayê bavê Simko ji aliyê Osmaniyan ve hate bêserûşûnkirin, Simko ji sala 1906`an ve di temenê 20 saliyê de li herêmên Kotol, Makû, Kela Xwê (Xoy), û Selmasê, bona bihêzkirina deshilata xwe dest bi liv û tevgerê dike. Di wê serdemê de bi sedema hevsoziya wî digel tevgera neteweyî li Bakûrê Kurdistanê, û herwiha nêzîkbûna wî li hêza leşkerî a Rûsan ku wê demê li herêmên Kotol û Selmas û Urmiyê, digel Osmaniyan di nav şer de bûne, Simko jî carna digel Osmaniyan tûşî şer bûye. Emerxan jî di wê serdemê de, bi alîkariya serokêlên Kardar û Şikakan, herêmên Selmas, Soma, Enzel û derdora Urmiyê, ji dest dagîrkariya Ecem û hêza biyanî parastiye.

Ji sala 1906`an heta 1911`an, cuda ji şerên di navbera Rûs û Osmaniyan de, li Îranê jî şoreşa Meşrûtiyetê di rojevê de bûye, û serkirdeyên herêmî yên Mucahidên girêdayî bi Şoreşa Meşrûtiyetê, di nav çalakiyan de bûn. Serbarî vê ku Simko gelek caran hewl daye tevî Şêx Mihemed Xiyabanî serokê Meşrûtexwazan re lihevhatinekê bike, lê Meşrûtiyetxwazan jî wek Qacaran, bi çavê dagîrkarî û dijminatiyê li Kurdan nihêrîne, û hewl dane ku Azeriyên li van herêman li dijî Kurdan, bi taybetî jî, li dijî Simko, Emerxan û Murteza Qulîxanê Îqbal El-selteneyê Serdarê Makûyê bikar bînin. Li hemberî vê tevgera Meşrûtiyetxwazan, Simko jî bi 300 şervanê xwe ve piştgiriya serdarê Makûyê kiriye û tevî hêzên wî, bajarê Tewrêzê dorpêç kirine.

Di wê serdemê de çendîn carî di navbera hêzên Simko û Emerxan digel Mucahidînên ser bi meşrûtexwan ku kesên wekî Heyder Emûoxlo, Emîr Hişmet, Aydîn Paşa û Kazimxanê Quşçî fermandehiya wan dikirin, şer û pevçûn rû daye. Di wan şeran de, dema ku Meşrûtexwazan şikest xwarine, Heyder Emûoxlo çend hesp ku bombe bi wan ve hatibûne girêdan, di qada şer de bi cih hêlane, bona ku dema şervanên Kurd siwarî wan hespan dibin, ew

bom bi wan ve biteqin.

Di roja 05.09.1908`an de, dema ku Aydîn Paşa ji bo rêxistinkirina Azeriyên Urmiyê li dijî Kurdan, tevî 70 siwarên xwe ve ji Selmasê ber bi Urmiyê ve bi rê ketiye, di rê de, bal gundê “Cebel Kendî” ku nêzî Urmiyê ye, rastî kemîna şervanên Emerxan dibe, û di encama şerekî kurt de, cuda ji rizgarbûna du kesan, yên din tevî Aydîn Paşa hemû hatine kuştin.

## *Destbiserkirina Ebdulrizaq Bedirxan û rizgarkirina wî ji aliyê Simko ve*

Ji serpêhatiya Ebdulrizaq Bedirxan ve hatiye wergirtin:

Li meha Îlona sala 1912`an, Seyîd Taha neviyê Şêx Ubeydullah, ji bona ku em bi hev re kar bikin, hate Tiflîsê seredana min, û em bi hev re vegeryane Xoyê, li cihê ku konsolxaneya Rûsan li wir bû.

Gava em gihîştin Culfaya Farsan-sînorê Îranê- kesekî Ermenî û ajanê Tirkiyê, derheqê vê yekê de ku em ber bi Xoyê ve diçin, xeber gihande konsolê Tirkan li Xoyê. Piştî ku bi şev em gihîştine Xoyê, li karwanserayê de em hêwirîn. Em taze bi cî bibûn, ji nişkêva sekreterê konsolxaneya Tirkan tevî zapitekê û bi çend leşkeran ve hatin, û bi nermî daxwaz ji me kirin ku em herin konsolxaneya Tirkiyê û li wir biêvirin. Gava me dît ku em di bin hukmê wan de ne, ji tirsa ku eger em neçin, ewê bi zorê me bibin, em mecbûr bûn bidin pey wan, û em gihîştin konsolxanê. Li konsolxanê em di bin çavdêriyeke tund de bûn. Dema leşker li nobedariyê de sekinîbûn, zabitan çavdêriya me dikirin. Li wir ji me pirsîn, em diçin kuderê. Me plana xwe eşkere nekir, û me got em diçine Wanê.

Du roja şûnda li jêr berpirsatiya zabitekî û 15 leşkeran em şandin “Kela Çariyê” cihê ku yekîneyek ji hêzên Tirkan li wir hêwirîbûn. Di rê da min firsend dît, û min xeber bo Simko şande Kotolê, û herwisa bo eşîra Kardaran -Emerxan- jî li Salmasê. Min ew haydar kirin ku Tirkan em girtine, û min ji wan hêvî kir ku bên, û me rizgar bikin.

Girtina me bibû cihê nerehetiya Kurdan. Tirk jî ji vê nerihetiya Kurdan tirsiyabûn, û ji bona ewlehiya xwe, hêza alîkar a leşkerî xwestin ku were Xanasorê -li sînorê di navbera Îran û Tirkiyê- wate cihê ku em ber bi wir ve dibirin. Di vê navberê de Simkoyê mêrxas bi çil siwarên xwe ve, 24 demjimêran berî ku em bigihîjin wir, li geliyê “Serhelan” kemîn danîbû, û hêviya me bû.

Ji Kela Çariyê heta Xanasorê, zabitek û 30 leşkerê Tirkan em vediguhastin. Li pey me jî dîsa 15 leşkerên din bona piştgiriya wan dihatin. Di geliyê Serhelanê de, ji nişkêve Simko hêzên Tirk dane

ber gulleyan, û leşkerên Tirk neçar man ku xwe radest bikin. Simko çekên wan ji destê wan wergirtin, û xwest hemûyan bikuje, lê ez li dijî vê yekê derketim.

Piştî rizgarkirina me ji aliyê Simko ve, Kardar jî gihîştin wir, lê gava çavê wan kete Simko, jiber ku di navbera wan de nakokî hebûn, em hêştin û paşve vegeriyan.

Di wê demê de me ji keyfxweşiya azadbûna xwe, êdî haj wan 15 leşkerên Tirk nebû, ku li gelî de li pey me dihatin. Me ew bi yekcarî ji bîr kiribûn. Dema ku em ber bi Kotolê rê ketin, wan di gêlî de li ser rêya me kemîn danîbûn, û gava em ji wir derbaz bûn, hêriş kirin ser me, û Kurdekî genc ku li kêleka min sekinîbû, di cih de hate kuştin. Parêzvanên me jî zabitekî pile nizim û leşkerekî Tirk kuştin, û wê şevê em gihîştine Kotolê.


## *Yekemîn Sazî û dibistana Kurdî di Rojhilatê Kurdistanê de*

Di despêka sala 1913`an de, Simkoyê Şikak bi sûdwergirtin ji nakokî û rikeberiya di navbera Rûs û Osmaniyan de, karî bi bîroke û hewlên dîplomasî ên Ebdulrizaq Bedirxan digel Rûsan, ku wê demê li herêma Kela Xwê (Xoyê) de deshilata wan hebûye, û herwiha bi alîkariya madî a Kurdên herêmê li bajarê Kela Xwê, yekemîn saziya perwerdehî-rewşenbîrî a Kurdî, bi navê "Komeleya Cîhandanî" ava bike. Armanca wê komeleyê vekirina xwendingeha Kurdî bo zarokan û çêkirina binkeya tendirustiyê bo akinciyên wê deverê, û herwisa weşandina rojnameyeke Kurdî bûye.

Wê komeleyê karê dibistan û perwerdehiyê, hetanî dawiya sala 1914`an domandiye. Piştre bi egera rewşa şerê yekem ê cîhanî û herwiha veguhastina Ebdulrizaq û Simko li destpêka sala 1915`an ji aliyê Rûsan ve boTiflîsê, êdî karûbarên wê saziya netewî rawestiyane. Herweha derheqê weşandina rojnameyê de jî, herçend ku heya niha tu hejmareke vê rojnamê yan kovarê nehatiye dîtin, lê dîroknivîsên wek Lazerov, Cemal Nebez û Dr. Kemal Mezher îşare pê kirine, û ger derketibe, dibe ku di arşîva Rûsan de were peydakirin. Di wê demê de piştî vê ku Rûs tevî Îraniyan derheqê kêşeya sînoran li hev kirine, Rûsan Simko û Ebdulrizaq Bedirxan dûr xistine û birine Tiflîsê.

Di wê dibistana Kurdî a bajarê Xoyê de, çend mamosteyên Kurd ku ji Qefqazê hatibûn, bi zimanê Kurdî û Rûsî, ders dane 29-30 zarokên Kurd, û derheqê wê xwendingeha Kurdî de, di dekomenta Wezareta Derve a Rûsan de, wiha qala wê xwendingehê hatiye kirin:

## Belgeya hejmar: 9



школы, состоявшагося на слѣдующій же день, при особо торжественной обстановкѣ. На праздникъ были приглашены Начальникъ отряда Генералъ Веселовскій, командиры отдѣльныхъ частей Хойскаго гарнизона, мѣстный Губернаторъ Эмиръ Арджедя, Каргузаръ, почетные граждане, ханы и купцы. Торжество началось молитвой, произнесенной школьнымъ муллой. Призывая благословеніе Божіе на новое, доброе для подростающаго курдскаго поколѣнія дѣло, мулла пригласилъ дѣтей и ихъ родственниковъ воздать хвалу Всевышнему за великую милость оказанную имъ и их сородичамъ, - видѣть первую курдскую школу созданную совѣтомъ и при помощи русскихъ, несущихъ обездоленной варварствомъ странѣ и ея населенію свѣтъ просвѣщенія.

„Да продлитъ Господь Богъ драгоцѣнную жизнь Великаго Русскаго ИМПЕРАТОРА и да укрѣпитъ мощь и величіе ЕГО Державы на счастье не только вѣрныхъ ЕГО подданныхъ, но и тѣхъ забитыхъ своими государями иноземцевъ, на которыхъ, по волѣ Божіей, изливается русское милосердіе" закончилъ мулла молитву, подкрѣпленную троекратнымъ „аминь" учениковъ и ихъ провожатыхъ.-

Послѣ подробнаго осмотра помѣщеній школы приглашеннымъ гостямъ было предложено угощеніе, состоявшее изъ сластей, чая и фруктъ.-

Воспользовавшись моментомъ, я познакомилъ пр

№ 698 Исх.т.я.Перс.ст. 13 Ноября 1913 г. 20

Министръ Иностранныхъ Дѣлъ Повѣренному въ Дѣлахъ въ Тегеранѣ
С.Петербургъ 13 Ноября 1913 г., № 3232.

/Телеграмма./

Телеграмма № 92 получена.

/Шифромъ./

Благоволите предписать Чиркову выразить котурскому беку Исмаилу Ага и прочимъ участникамъ курдской школы ВЫСОЧАЙШУЮ ЕГО ИМПЕРАТОРСКАГО ВЕЛИЧЕСТВА благодарность за выраженныя ими чувства.

/подп./ Сазоновъ.

Dekoment:

Dibistana “destpêkî a modern” ku bi zimanê kurdî perwerde daye, 1913 -Kela Xwê-(Xoy) Rohilatê Kurdistanê

Ev dekoment ya ku nav û îmzaya Wezîrê Derve yê wê demê yê Rûsiyeya Qeyserî “Sazanov S.D” pêve ye, ji bo “Çîrkov” serkonsolê Rûsiyeya Qeyserî li bajarê “Kela Xwê” a Rojhilatê Kurdistanê hatiye şandin, û tê de Sazanov amaje bi biryara vekirina yekem dibistana destpêkî a modern derbarê perwerdehiya bi zimanê kurdî kiriye, û bi Çîrkov ragehandiye: “Spasiya me bigihîne Simkoyê Şikak, û hemû aliyên ku bi germî di vekirina dibistana despêkî a modern de alîkar bûne.”

Di dekomentê de, li ser vê dibistana ku bi serperestiya Simkoyê Şikak, Ebdulrizaq Bedirxan û konsolê Rûsiyeya Qeyserî bi navê Çîrkov yê li bajarê Kela Xwê hatiye vekirin, bi berfirehî rawestiyaye. Ligor zaniyarêyên wê dekoméntê, Simkoyê Şikak 29 zarokên ku temenê wan di navbera 8-10 saliyê de bû, ji navenda Çariyê, Somayê, Biradost û Heyderanî anîbûn Kela Xwê, û di roja 21.10.1913`an de, amadekariya merasim û şahiya vekirina dibistanê ji bo roja 22.10.1913`an hatiye kirin. Li gor wê amadekariyê, ew zarok hemû bi kincên sivîl û kumên Rûsî di nav bajarê Kela Xwê (bajarê Xoyê) de meşiyane.

Di dekomentê de dibêje: ‘’Pêdivî bû dibistana Kurdî di 05.10.1913`an de li Kela Xwê bihata vekirin, lê ji ber hinek alavên ku diviyabû ji Tiflîsê bihatana, bi egera derengî gihîştina wan alavan, vekirina dibistanê, çend rojan kete direngî, û ji ber vê yekê dibistan di 22.10.1913`an de, bi merasimek fermî bi hin axavtinên Çîrkov û Simko hate vekirin.


Roja vekirina dibistanê 22.10.1913`an, gelek xelkê Kela Xwê (Xoyê) û berpirsên fermî yên Kela Xwê digel berpirsên Rûsî beşdar bûne. Herwisa derheqê vekirina wê dibistanê de tê gotin: Gava ew zarok bi parêzvaniya siwarên Simko di nav bajarê Kela Xwê de meşiyane, hin ji Azeriyan nerazîbûna xwe bi wî karê Simko diyar kirine, û gotine: “Ev zarok wê bo me bibin Gurên paşerojê”. Dema ku siwarên Simko ew gotina Azeriyan gihandine wî, Simko jî di

axavtina xwe ya di dema vekirina dibistanê de gotiye: “Ev zarok wê bibin şêrên paşeroja Kurdistanê”.

Bi vî awayî em dibînin ku Simkoyê Şikak piştî kontrolkirina bajarê Kela Xwê, bi alîkarî û hewlên dîplomasî ên Ebdulrizaq Bedirxan karîne xîmê yekemîn dibistan û kovara Kurdî di Rojhilatê Kurdistanê de danên. Dibe ku di pêşerojê de ew pêngava mêjûyî a girîng ji bo hêmasaziya netewî, wekî “roja perwerde û xwendina bi zimanê Kurdî” bi bingeh were girtin.

Li gor zanyariyan Simko plana vê yekê hebûye ku di pêşerojê de, çendîn dibistanên wiha bo xwendin û perwerdehiya zarokan, di heremên din yên Rojhilatê Kurdistanê de bide vekirin. Lê di sala 1914`an de bi sedema rewşa şerê yekem ê cîhanî, û piştre jî veguhastina Simko û Ebdulrizaq ji aliyê Rûsan ve bo Tiflîsê, êdî derfeta bicihanîna wî karî bo Simko nemaye, û dibistana Kela Xwê (Xoyê) jî hatiye daxistin.

## Belgeya hejmar: 10



Îdareya Giştî a Şer
Çiqa çarem
23.11.1913

Ev telgeraf di derbarê liv û bizavên Savfet Ebdulrizaq, Simko û Seyîd Taha de ne. Ev kes tiştên ku di eslê xwe de baş nînin, ji gel re wek tiştên baş didin xûyakirin û dibêjin.

Konsolosê Rûsiyayê yê bajarê Xoyê Çîrkov, hinek Ermenî û Kurd ku nêzî 30 kesan dibin, şandine da ku sînorê Bazîdê heta Şemzînê kontrol bikin û ji fikrên xelkê haydar bibin. Savfetê ku ji leşkerxane û qaymeqamiya Wanê hatiye dûrxistin, bi Ebdulrizaq, Simko û Seyîd Taha re tiştên nebaş, wekî ku tiştên baş in, ji gel re dibêjin. Di derbarê vê meselê de ji Mufetişxaneya leşkeran, eşîra Erziromê du telgeraf ji me re hatine. Me yek ji wan ji zatê we re şand.

Emr û ferman ya zatê we ye,


alîkarê ekrem yê hezretî şehriyar
Ahmet İzzet

## *Çend belgeyên girîng ên Osmanî û Fransî derheqê Kurdan di sala 1914`an de*

Çend belgeyên girîng ên Osmanî û Fransiyan ku pêwendî bi Simko, Ebdulrizaq, Seyîd Taha û Emerxan ve hene.

Bi dîqetkirin ji naveroka van belgeyan, bo me zelal dibe ku li bereya şerê di navbera Rûs û Osmaniyan de, li sînorê navbera Rojhilat û Bakûrê Kurdistanê, her du aliyên dijber ji Kurdan mifah wergirtine, û di heman demê de Kurdan jî li dijî hevdu, bo Rûsan û Osmaniyan şer kirine.

## Belgeya hejmar: 11



Babê `Alî / Wezareta Navxwe / Qelema taybet

04.01.1914

Remza taybet a wîlayeta Wanê

Ew telegrafa birêveberê herêma Şikeftî li ser sînorê Îranê ku ji me re şandiye, em jî ji we re dişînin. Piştî vê ku telegrafxane li herêma Bajêrge û Şikeftî hate danîn, êdî em her roj ji wir ve nûçeyan werdigrin.

Konsolê Urmiyê Ragin Beg û konsolê Urmiyê Tehsîn Beg di rastî de kesên xebatkar in. Em digel wan bi awayekî serkevtî bo hevdu telegrafan dişînin. Telegrafa konsolê Urmiyê piştî 12 demjimêran gihîşte destê me, û vê rewşê bala Rûsan bo aliyê xwe rakêşa, û wan jî derheqê vê rewşê de ji konsolxaneyên me li Xoy û Urmiyê, daxwaza zelalkirina agehiyan xwestine.

Herwiha li ser sînor bo kontrolkirina Simko ev rewşa pir girîng e.


Walî Tehsîn

Sûret:

Hêzên Rûs li Îranê rojane zêde dibin, rêya hesin ku Rûs li Îranê çêdikin, tê texmînkirin heya sal û nîveke din wê bigihîje Urmiyê. Kesekî ser bi Se`îd Beg ji aliyê Rûsan ve hatiye kuştin. Bedela xwîna wî, Rûsan yekîneyeke serbazan dane Se`îd Beg, û ji eşîra navbirî jî 5 hezar Tûmen standiye, û ji vî pereyî hezar Tûmen bo Ebdulrizaq şandine Tiflîsê. Herwiha Simko jî şebqe daniye serê 30 zarokên Misilman, û ew şandine bo dibistana Rûsan. Di heman demê de, ji Rûsiyê 500 kes şandine Urmiyê, û ew zanyariyane ji aliyê konsolê me li Xoyê ji me re hatine şandin. Herwiha konsol got ku li ser daxwaza Rûsan Simko li Selmasê bi zorî îfade li Se`îd Beg wergirtiye.

Ew zanyarî ji bo dewleta `alî ne

## Belgeya hejmar: 12


باب عالی
داخلیه نظارتی
شیفره قلمی

وان ولایتنه وارداولان شیفره

DH.KMS 9/26

Babê `Alî / Wezareta Navxwe
02.02.1914
Qelema Taybet

Telgerafa Waliyê Wanê:

Li gor telgerafa taybet ku Muteserifê Hekariyê şand, Seyîd Taha ji Rûsan 500 çek kiriye, û di nav hinek çeteyan de belav dike. Li Îranê hejmara çeteyên Qulîxan gihaye 30 kesan, û herwiha alîkarî daye Se`îd Beg jî. Ligor zaniyariya ku me hilda, wê di biharê de tevliheviyê çêbikin.

Yê ku Seyîd Taha, SÎmko û Ebdulrizaq teşwîq dike, bêguman Rûsiya ye. Ji ber vê yeke îhtimal heye ku 500 tiving dabin wan. Îhtimala ku Seyîd Taha heyfê jî hilde heye, û divê em vê ji bîr nekin. Bêguman ger Rûsiya ji aliyê Seyîd Taha ve nêzîkbûnekê bibîne, wê alîkariya wî bike. Ji ber vê jî bi îhtimalek mezin, hewalgiriya (îstixbarata) îdareya Hekariyê rast e. Hem ji ber vê îxbarê, û hem jî di biharê de ku Kurdên Îranê her sal dest bi talanê dikin, divê em bi micidî tedbîr û hazirêyên xwe bikin. Bi îzna Xwedê emê îsal wan ji nav bibin.

Lê ji bo wan metirsiyên ku di pêşerojê de wê werin pêşiya me, divê dewlet dîqetê bike. Serleşker Kazim Beg divê bilez serdana hemû cendermeyan bike.

Îsal ji bo ku artêşa mezin zêde mijûl e, em daxwaziya alîkariyeke mezin nakin, tenê dibe jenderme alîkariya me bikin. Ew leşkerên ku ji "qol ordî"yê hildane, ji jendermeyên ku rewşa wan xuya ye, ji mekteba Trabzonê 300 leşkerên Laz şandine, 300 jî ji gelê Aydinê şandine, bi tewahî 600 leşker divê heta 15`ê meha Adarê bigihêjin Wanê.

Di alaya leşkerî ya mezin de tenê du zabitên şerker hene, yên din hemû axayên kevn in. Divê li vir leşkerên serkevtî hebin. Min şexsen bi serê xwe yekîneyeke leşkeran ji bo te`qîbatê li dar xist, emê gelek ji van leşkeran îstifade bikin. Li gel van leşkeran, eşîrên


li ser hidûdê Îranê jî li gel me ne. Emê ji wan eşîran jî îstifade bikin, lê nabe ku em tedbîrên xwe jî, berçav negrin.

Ew leşkerên ku piştê meha Nîsanê bên, tu qazancê wan nagihîje me. Lewma alîkariya ku piştî talana eşîran bê, bê sûd e.

Ez li bendê me ku hûn mizgîniya qebûlkirina daxwaziya min bidin. Wê demê bi lutfa Xwedê, ne Seyîd Taha û ne jî yên ji wî meztir, nikarin tu tiştekî bikin. Dema ku xelkê xweşî ji akincîbûna vir dît, êdî naxwazin ev aramiya wan xirab bibe. Divê em bi dewleta Îranê re jî bikevin têkiliyan, û bêguman wê sûd hebe. Qet nabe ku Îran bizanibe em wan bûyerana ha dişopînin.

Valî Tehsîn


## Belgeya hejmar: 13



Dayireya Sedaretê, qelema lêpirsînê
Ji Wezareta Karên Hundir re
08.03.1914
Di derbarê Ebdulrizaq û Savfet de

Savfet Begê ku li ser bingeha gilîkirina qereqola dehemîn, ji qeymeqamtiyê hatibû avêtin, em pê hesiyan ku bi şêxê Barzan re û bi Seyîd Taha re têkiliyên wî hene. Li gor lêkolîna sefareta Urmiyê derket holê, ku Savfet ne li cihê xwe ye, û li deverên Barzan hatiye dîtin. Divê di demeke kurt de fermana girtina wî bê derxistin, û meimûrên dewleta Osmanî yên li wê deverê, wî desteser bikin. Konsolosê me yê Tehranê di derbarê Savfet Beg û Ebdulrizaq Beg de, hin zanyarî dan me. Bi riya konsolosê me yê Petersburgê, nameya di 19.01.1914`an de gihîşte me, li gor netîceya ku ji vê nameyê derket, divê di demeke kurt de rewş bi nivîskî were raporkirin, û dewleta `alî ya Osmanî re were şandin.

## Belgeya hejmar: 14


TELEGRAMME

تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expédition | | | | RECEPTION | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| No d'expédi | transmis à | Date | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | No d'ordre |

De ............ Pour ............

No ............ Mots ............ Date ............ H. ... M. ...

Voie ............ Indic. Eventuelles ............

DH. SFR 422/112

Telegrafname

Jêder: Qonaxa Walî/ Wan

02.04.1914


Ji Wezareta Hundur re

Mirovên wek Seyîd Taha, Simko, Se`îd Beg û Savfet yên ehlê tevliheviyê, ihtimal e ku ji Îranê derbasî vî alî bibin, û eşîrên wek Heyderan û Mehmûdiyan han bidin. Lewma tê zanîn ku ew eşîr gelek hurmetê ji Seyîd Taha re nîşan didin. Ev rewşa han, ku wê bi handana Rûsiyayê encam hebe, dibe ji bo tedbîrên li hember wê rewşa han, bi zaroyên wî re bête axaftin, û ji serokeşîrên Kurdan re jî Telegraf bête şandin

Waliyê Wanê

Tahsîn

## Belgeya hejmar:15



TELEGRAMME تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expédition | | | | RECEPTION | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| No d'expédit. | transmis à | Date | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | Nº d'ordre |

De ... Pour ...

Date ... H. ... M. ...

Indic. Eventuelles

DH.SFR 428/78

Telegrafname

Maxrec/Jêder: Wan


18.05.1914

Ligor agahiyên ku gihîştin destê me, li Selmasê di navbera Rûsan û xelkê de alozî derketiye. Têlên telgerafê ji aliyê gel ve hatine birin. Di nav wan de hinek leşkerên bi pere hatinî kirêgirtin hene, û heşt kes ji leşkerên Rûs ji aliyê Kurdan ve hatine kuştin.

Herwiha tê gotin ku li Tewrêzê jî tevlihevî heye. Jiber ku Konsolosê me yê li wir zêde tembel e, û Telegrafên ku em jê re dişînin bê bersiv dihêle, ji bo silametiya memleketê me, pêdivî ye cenabê we hewldaneke taybet nîşan bide, da ku di wan rojan de karbidesteke kêrhatî bişînin Tewrêzê.

Bi silav û hurmetên mezin.

**Belgeya hejmar: 16**



18.05.1914


Li Azerbeycanê hêdî-hêdî çalakiyên meşrûtiyetê têne bihîstin, dixwazin ku Hacî Şêxî biçe Tehranê, lê ew naçe. Ji xeynî wî li çend deverên din jî tevlîhevî hene. Hikûmeta Îranê îro li wir çend beyananameyên Rûsan di nav gel da belav dikin. Di derbarê meseleya ragehandina yasa û sîstema urfî de jî, em bi Tehran û Tewrêzê re di têkiliyê de ne, feqet hêj bersiveke zelal ji me re nehatiye.

Simko jî van rojan li aliyê Somayê dixebite, li wir hemû dikan girtî ne. Min ji bo wergirtina agahiyan, du welatiyên Osmanî şandine konsolxaneyê, lê hîna nehatine.

Em pêhesiyan ku Simko hatiye gundê Temir Axa. Rêveberiya herêmê jî bi gotina Rûsan hereket dikin. Ew jî di van çend rojên dawî de gelek bi tirs û endîşe tevdigerin.

Li hemberî vê rewşa xeternak de, bi tu awayî tevbigerim, li benda emr û îşareta we me.

## Belgeya hejmar: 17



TELEGRAMME

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expédition | | | | RECEPTION | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| No d'expédit. | transmis à | Date | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | No d'ordre |
| | | H.—— M.—— | | | H.—— M.—— | | |

De ........ Pour ........

No ........ Mots ........ Date ........ H. ........ M. ........

Voie ........ Indic. Eventuelles ........

18.05.1914

Ji Wezareta Hundir re


Me her niha Telegrafa cihgirê Konsolosê Urmiyê Necat Beg wergirt û bo meqamê bilind rê kir. Jiber ku têlên Telegrafê qetiyabûn, agahî direng digihîjin sefareta bilnid. Li Azerbeycanê tevliheviyên mezin hene. Ji ber vê me hin tedbîr girtine. Îhtimal heye ku vê carê kesên wek Ebdulrizaq û Simko bêne girtin. Herwiha hatina Simko ya cem Temir Axa jî balkêş e.

Di bersiva ku min ji Necat Beg re nivîsîbû, min jê re got ku ger em li ser sînor tedbîrên leşkerî negrin, em nikarin vê serhildanê bitemirînin. Dema ku gelên Osmanî rastî komkujiyê werin, divê em bi neçarî destêwerdana leşkerî bikin.

Ji bo vê yekê min ferman da Telegrafxaneya Hekarî û liqên li ser sînor, da ku di derheqê bûyeran de, hemû sibehî û êvaran, zanyariyan bidin me, û em jî berdewam wan zanyariyan bo we bişînin.

Walî Tahsîn

**Belgeya hejmar:18**


OSMANLI ARŞİVİ
DH. EUM. 2. Şb
2 72 2


Babê `Alî
Wezareta Navxwe
Qelema Taybet
17.11.1914
Remza ku ji wekaleta wilayeta Wanê hatiye

Ev heftiyek e ku hêzên me li Îranê li hêla Selmasê di navbera Çarî û Xanesorê de, li dijî çeteyên ku hejmara wan 2 hezar piyade û çendîn siwarên ser bi eşîran in, û xwediyê çekên gran in, şer dikin. Di encama şerê ku ji duh ve heta îro didome de, ji aliyê dijmin 2 zabit û sed nefer hatine kuştin. Ji aliyê me jî neh şehîd û bîst jî birîndar hene.

Serokê eşîrê Emerxan ku heta niha alîkariya Rûsan dikir, bi 200 leşkerên xwe ve tevlî hêzên me yên mucahîd bûn. Me xwest ku em vê agahiyê jî bi we re parve bikin.

Cihgirê Walî Cewdet

**Belgeya hejmar: 19**



Le Numéro: CINQ CENTIMES

MARDI 17 NOVEMBRE 1914

# L'Homme Enchaîné

JOURNAL QUOTIDIEN DU MATIN

Rédaction et Administration, 13 et 15, rue Taitbout, Paris

FRANÇOIS ALBERT, Secrétaire Général de la Rédaction

Rédacteur en Chef : G. CLEMENCEAU

A. BERNIER, Directeur-Administrateur

## De quelques Neutres

G. CLEMENCEAU.

## Échos

## LA VÉRITÉ

## JOURNÉE D'ACCALMIE

## L'offensive allemande faiblit ou échoue partout

## Communiqués officiels

## Sur le front oriental

## Sur le front franco-belge

## L'aventure turque

## LETTRE OUVERTE au Professeur Wilhelm Foerster (BERLIN)

# L'aventure turque

## SUCCÈS RUSSES PRÈS DE LA PERSE

*Pétrograd*, 16 *novembre*. — On télégraphie d'Ourmia que les hostilités dans les régions limitrophes de la frontière persane ont commencé le 8 novembre par un combat au col de Khanessoum. Le 10 novembre, nous avons délogé les Turcs du village de Khanessoum, leur tuant deux officiers et 92 Ascaris, sans subir nous-mêmes aucune perte. Le 12 novembre, l'ennemi a tenté un mouvement enveloppant contre les ailes de notre formation ; mais, grâce à l'arrivée de renforts, nous avons rejeté les Turcs vers une position plus en arrière. Le même jour, l'ennemi a lancé une partie de ses forces contre notre partisan kurde Simko et, se retranchant au sud de Tchiarykalyl, a engagé une fusillade qui a duré plusieurs jours, jusqu'à l'arrivée de nos troupes, qui ont rejeté l'ennemi. Dans ce combat, deux de nos partisans kurdes ont été blessés, y compris un frère de Simko.

Le 13 novembre, sur la route de Kotura, en territoire turc, nos avant-gardes ont pris contact avec des forces importantes de l'ennemi, composées principalement de cavalerie kurde, avec de l'artillerie, qui cherchaient à s'avancer vers Khoi et le col de Kotur.

Dans le sandjak de Bayazid, les Kurdes se rendent à nos troupes presque sans résistance.

Un fort détachement de notre ami le khan Avadjik a envahi le territoire turc, où il a fait sa jonction avec Abdul-Rezak, dont l'influence est grande.

Mustapha bey, de Tchaldaran, a passé la frontière et s'est emparé de Katchane.

Çavkanî: Heftînameya “Mirovê Azad” ku bi sedema sansorê navê xwe guheriye bi mirovê zincîrkirî
Bûyerên li ser xaka Osmanî, serkevtina Rûsan li nêzîk welatê Fars, Parîs, 17.11. 1914, arşîva kitêbxaneya nîştimanî a Fransayê
Sernivîserê hefîtînameyê: “Corc Kilêmanso” serokwezîrê pêşîn yê Fransayê bûye.
106`mîn roja şerê cîhanî yê yekem, telegrafa Fransiyan ku hevalbendê Rûsan in.
Pêtrograd 16.11.1914`an

Me ji Urmiyê ve telegraf şand ku şer û pevçûnên di herêmên hevsînor ên welatê Fars, ji 08.11.1914`an ve bi şerê singûsing (destewyexe) li Xanesorê dest pê kirine. Roja 10.11.1914`an, me li Xanesorê paşekêşe bi Tirkan kir, û 2 qumîtan û 92 esker kuştin, bêy vê ku tu zirarek gihîştibe me.


Roja 12.11.1914`an dijmin liv û tevgereke nihênî li dijî liqên hêzên me lidar xist, lê bi gihîştina hêza Piştevan, me karî hindey din paşekişiyê bi Tirkan bikin. Di heman rojê de dijmin beşek ji hêzên xwe li dijî partîzanê me yê Kurd (Simko) xiste hereketê, û bi cihgirtina li başûrê geliyê Çariyê (Çehrîq), kariye bo heyama çendîn rojan şer saz bike, lê dema ku hêzên me gihîştin wir, pêşiya dijmin girtin, û di wî şerî de du milîtanên me yên Kurd birîndar bûn, ku yek ji wan birayê Simko ye.

Roja 13.11.1914`an li ser rêya Kotolê li herêma Tirkan hêzên me yên pêşrev digel hêzeke dijmin şer û pevçûn hebûn, ku piraniya wan ji şerkerên Kurd pêk hatibûn, û digel topxanê dixwestin ber bi Xoy û Kotolê ve pêşreviyê bikin.

Li herêma Bazîdê Kurdên (aliyê Tirkan) bêy tu bergiriyeke wisa, xwe radestî hêzên me kirin. Liqek ji hêzên hevalê me (Xan Avacîk) hêriş kiriye ser herêmên Tirkan, û digel Ebdulrizaq yek girtine, ku wan jî bandoreke mezin hene. Mistefa Beg li Çaldiranê karî ji sînor derbaz be, û dest bi ser “Kaçane” de bigre.

Dawî

## Belgeya hejmar: 20


TELEGRAMME تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'Etat n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expédition | | | | RECEPTION | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| N° d'expédit. | transmis à | Date | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | N° d'ordre |
| 20 | | | | | H. M. | | |

De — Pour — موردی

N° — Mots — Date — H. M. — ساعت دقیقه — تاریخ

Voie — Indic. Eventuelles — اشارت مخصوصه

DH. ŞFR 442/91

(1-1)

Ciyê Jêder: Wan

1914.12.17

Sûret

Kardar û Heyderiyan bi hev re apê Simko Temir Axa ji gund xwe qewirandine. Sedem ew bû ku gundê ku yê wan bû, ji aliyê Temir Axa ve hatibû zevtkirin. Tê gotin ku Kurt Begê Konsolosê Rûs yê Urmiyê, ji bo ku Kerîm Xan biçe alîkariya Temir Axa, zext û givaşan li wî dike. Kerîmxan û hemû begzadeyan, daxwaza konsolosê Rûs qebûl nekiririn. Herwisa ji bo ku leşkerê lawaz ê Rûs  têk neçe, ji me alîkarî xwestine, min jî soz da wan, ku li gor îmkan hevkariya wan bikim.

Rûsan ji ber hêrişên ku li ser Temir Axa hatin kirin, duh leşkerên xwe yên Ekşîsu û Hîsarê vekişandin.

Waliyê Wanê

Tahsîn

## *Pîlana destbiserkirin û kuştina Şêx Ebdulselam Barzanî ji aliyê Osmaniyan ve*

Di sala 1914`an de, dema ku şoreşa Şêx Ebdulselam li dijî Osmaniyan rastî şikest û lawaziyê bû, ew digel komek hevalên xwe çûye herêma Urmiyê, û li wir jî bi sedema hebûna metirsiya Osmaniyan, bi awayê nepenî û di bin çavdêrî û parastina Simko û Seyîd Taha de jiyan kiriye. Her di wê heyamê de Şêx Ebdulselam li Urmiyê têkeliyê bi konsolxaneya Rûsan re dadinê, û daxwaza piştgirî û alîkariya wan bo serhildana Barzan li dijî Osmaniya dike. Piştre Şêx Ebdulselam bo dîtina karbidestên pilebilind ên Rûsî çûye Tiflîsê, û li wir bi hevkariya Kamil Bedirxan kariye daxwaziyên xwe bi Rûsan rabigehîne.

Lê Rûs bi sedema nîgeraniya wan ji egera helwesta Tirkiyê di şerê yekem ê cîhanî de, serbarî vê ku çi alîkariya Şêx Ebdulselam nekirine, hişdarî dane wî ku di rewşeke wiha de, di berjewendiya Rûsan de nîne ku çi pêngavekê li dijî Tirkan hilgre. Rûsan tenê rê dane ku Şêx Ebdulselam bo heyamekê kurt di bin çavdêriya wan de wekî penaber li Nexcewanê bimîne. Hevdem Osmaniyan nerazîbûna xwe li hemberî dîtina Şêx Ebdulselam ji aliy Rûsan ve nîşan dane. Piştî vegera Şêx Ebdulselam ji Nexcewanê, Osmaniyan pîlana girtin û kuştina Şêx Ebdulselam darêtine.

Şêx Ebdulselam Barzanî ku bi destbetalî ji Tiflîsê vegeriyabû, tê herêma Biradost a Urmiyê, ku wê demê ew herêm li jêr bandora Osmaniyan de bûye. Navbirî bi sedema bîrûbaweriya olî û bawerkirina bi Sofî Ebdullah ku kesayetiyekî olî û hevdem birayê Temirê Cango serokê tayifeya Fenekî bûye, li cem wî bûye mêhvan. Sofî Ebdullah ku wê demê bi hevsoziya digel fitwaya Osmaniyan li dijî Rûsan tevdigeriya, bi mebesta wergirtina hevkariya Osmaniyan, bona vê ku bikare di herêmê de dijayetiya Rûsan û Simko bike, li pîlana danegirtinê ya Şêx Ebdulselam Barzanî bi Osmaniyan rol hebûye, û di gundê Gengeçîna herêma Biradost a Urmiyê de Şêx Ebdulselam destbiser, û ji rêya sînorî a Sêroyê ve ew radestî Osmaniyan kiriye.

Waliyê Osmaniyan li Mûsilê, ku navê wî Silêman Nezîf û Kurdê Amedê bû, hukmê bidarvekirinê ji Şêx Ebdulselam û sê hevalên wî re birriye, û li 14.12.1914`an ew îdam kirine.

Piştî şehîdkirina Şêx Ebdulselam Barzanî, Simko bi merema sepandina deshilata xwe bi ser êla "Fenekî" de, bi piştgiriya hêzên Rûsan li herêma Somayê hêrişî ser Temirê Cango kiriye. Di encama şerekî giran de, Temirê Cango naçar bûye di tarîtiya şevê de xwe ji qada şer rizgar bike, û xwe bigehîne herêma Hekarî li Bakûrê Kurdistanê, û li wir jî ji aliyê Tirkan ve hatine bicihkirin. Piştî wî şerî Simko kariye deshilatdariya xwe bi ser êla Fenekiyan de jî bisespîne.

**Belgeya hejmar: 21**

*https://www.qdl.qa/en/archive/81055/vdc_100041348440.0x00001a?utm_source=testpdfdownload&utm_medium=pdf&utm_campaign=PDFdownload*

"Rapora Leşkerî ya Brîtanî li Ser Îraqê. Qada. 9 (Kurdistana Navendî)"

Rûpela Belgeyê 25, Rûpela Pirtûkê 16, Benda 4 û 5

Di Cotmehê de birêz "Bill" ku di cihê "Ragir Leachman" de li Mûsil bû, wek kargêrê siyasî seredana navçeya Akrê kir.

Çiyayên Bakurê Akrê mala Kurdên Zêbarî ye, di heman demê de, li peravê çepê Zapê mezintirîn dever a Şêx Barzanî ye. Şêxê Barzan û Faris Axa serokê Zêbariyan derheq çîroka hevkariya Faris Axa digel Tirkan bo destbiserkirina Şêx Ebdulselam, ku pêşengê Şêx Ehmed bû, û piştre jî li Mûsilê hate bidarvekirin, dijminayetiyeke du alî hene.

## *Dûrxistina Simko û Ebdulrizaq ji aliyê Rûsan ve bo Tiflîsê*

Ji sala 1913-1915`an, ji aliyekî ve bi sedema vê ku hin Kurdên Şikak û eşîretên Kurdan ku bi Fetweya Osmaniyan li dijî Rûsan şer dikin, Rûsan jî bi mahneya wê ku Şikur Axayê birayê Simko û hin serokêlên Şikakan jî beşdarî vî şerî bûne, daxwaz ji Simko kirine ku wan radestî Rûsan bike. Lê Simko ev daxwaza Rûsan cîbicî nekiriye.

Di kelekela şerê yekem ê cîhanî de ku hikûmeta Ehmed Şahê Qacar gelek lawaz bibû, tevî ragehandina bêalîtiya xwe di vî şerî de, lê hêzên Rûs û Îngilîz li bakûr û başûrê Îranê cihgir bûne, û di rastî dîplomat û karbidestên Rûsî û Îngilîzî di wê serdemê de bi ser Îranê de hukm kirine.


Piştî lihevkirina di navbera Rûs û Qacarên Îranê derheq kêşeyên sînorî ên di navbera wan de, Îranî daxwazê ji Rûsan dikin ku rê nedin Simko li wê herêma jêr kuntrola Rûsan di Îranê de bimîne. Rûs jî bona parastina berjewendiyên xwe, ji aliyê general “Çîrnozokov” ve ferman dane Simko ku nabe ji vê zêdetir di Kela Xwê û di wan herêmên bin kontrola wan di Îranê de bimîne, û divêt digel kesên xwe ên nizîk here Tiflîsê. Di dema çûna Simko ber bi Tiflîsê li nêzîk Colfayê, ji aliyê wan Ermeniyên ku bi sedema rewşa şer û jinavçûna mal û halê wan, ji Selmas û Urmiyê ve ber bi Colfayê direviyan, teqe lê hate kirin, lê tu zirarek negihîşte wan.

Hevdem ji aliyê Rûsan ve heman biryara dûrxistinê li ser Ebdulrizaq Bedirxan jî hatiye cîbicîkirin, û li 01.01.1915`an de, Ebdulrizaq digel Teymûrxanê waliyê Xoyê û çendîn kesên din ber bi herêmên jêr deshilata Rûsan têne dûrxistin.

Di germahiya şerê cîhanî ê yekem de, dema ku Osmanî jî di eniya tevî Alman li dijî Rûsan şer dikirin, Ebdulrizaq xwestiye ji wê rewşa han wek derfetekê mifahê wergire, û bi alîkariya Rûsan li Bakûrê Kurdistanê serhildanekê lidar bixe. Dema ku Ebdulrizaq bo destpêkirina wî karî çûye Bakûrê Kurdistanê, serbarê wê ku hewlek zaf jî daye, lê serkevtî nebûye. Piştre Ebdulrizaq di sala 1918`an de ji aliyê waliyê Osmaniyan li Mûsil, ku navê wî Silêman Nezîf

Kurdê Diyarbekirê û girêdayî bi Saziya Îtihad a Tirkan bûye hatiye girtin, û li Mûsilê hatiye kuştin û di goristana Xerîban a wir de bi axê hatiye spartin.

**Belgeya hejmar:22**



Remz ji Wezareta Daxilîye re

1915.02.18

Cihê jêderê: Rewanduz

Simko û Seyîd Taha ji bo ku xelkê Wan û Başkala û serokeşîrên Kurdan bikişînin aliyê xwe, kesên di cil û bergên melayan de dişînin herêmê, û nameyan di nav gel de belav dikin. Me ragehand her kesê ku bikare wan şexsan bigre û radestî me bikin, emê 50 Lîreyî bidin wan.

Li Rewanduzê Waliyê Mûsilê Haydar

## *Penaberiya Şikakan*

Di sala 1915`an de, piştî veguhastina Simko bo Tiflîsê, Ehmed Axayê birayê wî bi razîbûna Rûsan, ji bo sergêriya Şikakan li derdorê Selmasê, li Çariyê cihgir bûye. Ji aliyekî din ve Rûsan bi merema razîkirina Îraniyan, û herwisa sizadana Şikakên ku di şerê li dijî Rûsan de alîkariya Osmaniyan kiribûn, bona cezakirina wan hêrişî ser Kurdên herêmên Selmas û Urmiyê kirin. Piştî hêrişa tolhildanê a Rûsan li dijî Şikakan, êdî baweriya Şikakan bi Rûsan namîne û ji tirsa kuştin û girtina bi destê Rûsan, bi merema xwe rizgarkirina ji wê metirsiyê, neçar bûne bibin sê deste, û ji cih û warên xwe ve ber bi Tirkiye û Îraqê koçbar bibin.

Di wê serdemê de bi sedema hebûna birçîtî û xelayê, ku di dema şerê yekem ê cîhanî de hebû, desteya yekem ku Şikakên Soma, Biradost û Enzelê bi serokatiya Emerxan û Temirxanê Hinare û Isma`îl Axayê Hesê, berê xwe dane Başûrê Kurdistanê, û piştî gelek zehmetiyan, xwe digehînin bajarê Akrê ya girêdayî wîlayeta Mûsilê ku hingê di bin hukmê Osmaniyan de bû. Wê demê bi egera birçîbûn, westiyan, nexweşî û nebûna pêdiviyên jiyanê, gelek jin û zarokên Şikakan bi belengazî di rê de mirine. Desteya duyem, ku piranî Şikakên derdora Selmasê bûn, tevî Şikur Axayê birayê Simko û Hesoyê Cango çûne aliyê Tirkan û li herêma Hekarî û Şernexê akincî bûne. Desteya sêyem a Şikakan jî ku piranî xelkê belengaz bûn, bi neçarî li herêmên Urmiye û Selmasê, belav bûne, lê ew jî ji azardana leşkerên Rûsan bêpar nebûne.

Piştî derbasbûna heyamekê, Rûs nigeranî vê yekê bûne ku renge bi egera siyaseta dijminkarane ya wan li dijî Kurdan, Kurd li dijî Rûsan bikevin eniya Osmaniyan. Lewma serkonsolê Rûs li Urmiyê ku navê wî “Vasily Nikitin” bû, bi neçarî ji bo Şikakan efû ragehandiye. Bi vî awayî cuda ji Şikur Axa û Hesoyê Cango ku nehatibûn efûkirin, desteya duyem a Şikakan hatin efûkirin û vegeryane herêmên xwe ku hingê Ehmed Axayê birayê Simko bi razîbûna Rûsan li Çariyê deshilatdar bûye. Piştre Şikur Axa û Hesoyê Cango jî, bi çendîn siwarên şerker yên Şikakan re berê xwe

didin Başûrê Kurdistanê û xwe gehandine bal desteya yekem a Şikakan ku bi serokatiya Emerxan û Temirxanê Hinare û Isma`îl Axayê Hesê çûbûne wir.

**Şerê di navbera Şikak, Sûrçî û Zêbariyan de**

Dema ku desteya yekem a Şikakan li devera Akrê wek penaber bicih bûn, êla Merzikî jî ku pişkek ji Şikakan e, ji hêla serhedê ji tirsa tolhildana Rûsan hatibûn Akrê, û li devera Sûrçiyan bicih bibûn.

Di wê demê de ku têkiliyên malbatî di navbera meznê êla Merzikî bi navê Mihemed Elî û Şêx Ubeydullahê meznê Sûrçiyan de hebû, di navbera Şêx Ubeydullah û hevjîna Mihemed Elî bi navê Zimeyranê de têkiliya sozdarî çêdibe, û piştre ew jin ji aliyê Şêx Ubeydullah ve tê marekirin.

Ew bûyera civakî dibe sedema kêşe û nakokiyan di navbera herdu aliyan de. Emerxan daxwazê ji Şêx Ubeydullah dike, ku bi awayekî aştiyane vê kêşeyê çareser bikin, lê bi sedema vê ku Şêx Ubeydullah nexwastiye çi qerebûyekê bide wan, û digel Şikakan aştiyê bike, kêşe meztir bûye. Hevdem Zêbariyan jî bi hêceta vê ku di wê birçîbûn û xelayê wê demê de, Şikakan bi serperestiya Emerxan û Sima`îlê Hesê û Temirxan, malê wan talan kirine, ewan jî bi serperestiya Faris Axa hêrişî ser Şikakan kirine, û bi vî awayî di sala 1916`an de şereke nexwestî û bixwîn di navbera Şikakan ji aliyekî û Zêbarî û Sûrçiyan ji aliyekî din ve qewimiye.

Ew şer ku li geliyê Mêzê a navçeya Berwarî a Jorîn ku dikeve nêzîk sînorê di navbera Başûr û Bakûrê Kurdistananê rû daye. Di vî şerî de zirareke canî a mezin gihîştiye herdu aliyan, û bi dehan kesî hatine kuştin. Piştre Şikakan karîne dorpêça Sûrçî û Zêbariyan têk bişkînin, û cihê xwe qahîm bikin. Di wê demê de hêzên Osmaniyan jî ku di wê herêmê de hakim bûne, li ser daxwaza Sûrçî û Zêbariyan hatine devera şer û zext xistine ser Şikakan, ku çekên xwe radestî wan bikin. Di encama lihevkirinê ya di navbera Şikakan û berpirsên Osmanî de, bi merema vê ku ewlehiya canê Şikakan were parastin, Emerxan û hevalên wî razî dibin ku çekên xwe radestî hêzên Osmanî bikin.

**Belgeya hejmar:23**

Hêjayî gotinê ye ku derheqê wî şerê xembar û diltezîn de, dengbêjê navdar Îbrahîm Hesen Neqebî straneke balkêş bi navê "Şerê Geliyê Mêzê" bi vî awayî gotiye:

Gelî biraderîno ax lo lo, li me fermane, hayê hayê
Îro berahîka êla me şer e, dûmahîka êla me talan e, hayê hayê
Ocax û binetara mala babê min qeliya, ax lolo,
De îro binetara mala babê min ji êvar ve, dîsan ket yek jê nemane, hayê hayê
Emerxan bira girkê komê li geliyê Mêzê, wey lo bira gireke li geviya Bêhayê, hayê hayê
Şereke giran wa qewimî li geliyê Mêzê, wey lê birano bêje li girkê geviya Bêhayê hayê
Îro şahid û şihûdê Emerxanê Şikak gelek hene, gazî diketin gelî lawên Şikakan babê mino, dest hilînin, wayê wayê
Îro hûnê bi mejiyê xwe tifengê xwe nîşan bavên, îro sê ehd û qirarê xwedê gelek hene, li ser can û cesedê mêraniyê ketibin, ger mêr ji geliyê Mêzê de yek jê xilas be, wayê wayê
Hay demêêê termê egîd û xweşmêran dîsan hêlane ber hetavê, ax were haylê haylê, ax were deloylo loylo, li me ferman e
Emerxan bira şerek wa qewimî li geliyê Mêzê, wey lê bira geliyeke bi dar û Sipîndar e
Bi destê Emerxan û Temir Axayê Şikak xweş tê dengê sê tîran û pênc tîran e, wayê wayê
Bi destê mêrê Zêbariyan xweş tê dengê mîratê Înglîziyane, wayê wayê,
Îro şahid û şihûdê Emerxanê Şikak gelek hene, gazî diketin gelî lawên Şikakan babê mino dest hilînin, wayê wayê
Îro hûnê bi mejiyê xwe tifingê xwe nîşan bavên
Îro sê ehd û qirarê xwedê gelek hene, li ser can û cesedê mêraniyê ketibin, ger mêr ji geliyê Mêzê de yek xilas bin, wayê wayê
Hay de çawa wê li guhê me xweş bê dengê nalîn û qîrîna wan

birîndaran, wayê wayê, were haylê deloylo li me ferman e wayê wayê

Emerxan bira girkê komê li geliyê Mêzê, wey lo bira, bêje gireke bi cok û kanî ne

Mele Şirî, bi sê dengan gazî diketin gelî law û eşîra babê mino, hûnê dest hilînin, wayê wayê


Belê îro du birayê min yê dayk û babê hatine kuştin, ez jî bi sê gulleyên sê tîran birîndar bûme, Xwedê dizane îroke me bi yekcarî çi halê xwe nine lawo, wayê wayê

Were gelî xortan hûnê rabin, îroke mêran û mêrçakan bigrin, hayê hayê, ji heyfa me xweş mêran, hûnê ber xenceran bidrînin, wayê wayê

Wer deloylo loylo, li me ferman e wayê wayê

Piştî wê bûyera ku di sala 1916`an de rû daye, û Osmaniyan Emerxan û çend kes ji giregirên Şikakan girtine, û bo heyama çend mehan ew di Qişleya leşkerî ya di Akrê de zîndanî kirine.

**Belgeya hejmar: 24**



DH.ŞFR 554/10

Bo Wezareta Navxwe

14.05.1917

Mexrec: Mûsil

Ew nameya ku Simko ji min re şand, min bersiva wî da. Min jê re got ku hikûmeta Osmanî te qebûl dike. Em dixwazim bi awayê walî mifahê ji wî wergirin.

Serleşkerê Artêşa şeşem

Husên

## *Serbestberdana Simko ji aliyê Rûsan ve*

Piştî derbasbûna salekê bi ser girtina Simko ji aliyê Rûsan ve, dema ku Rûsî dibînin rêveberiya Ehmed Axa di nav xelkê herêmê de pir lawaz e, nîgeranî vê yekê bûne ku ev lawazî ji bo kontrolkirina herêmê wê bibe egera sûdwergirtina Osmaniyan. Ji ber vê çendê Rûsî di sala 1916`an de Simko serbest berdidin, û rê didin ku vegere devera Kotolê.

Di vê demê de rewşa penaberên Şikak yên li Başûrê Kurdistanê bi sedema girtina Emerxan û serokêlên Şikakan zêde têk çûbû, wan jî bi neçarî cardin tevî jin û zarokan berê xwe dabûne sînorê Îranê. Gava penaber gihîştibûn sînor, Simko daxwaz ji Rûsan kiribû ku rê bidin ew penaber vegerin wargehê xwe, û Rûsan jî ew daxwaza Simko qebûl kiribûn, û ew penaber jî cardin vegeryane herêmên xwe li derdorê Urmiyê.


Emerxan û serokêlên Şikakan jî piştî mana çend mehan di zîndana Osmaniyan a li Akrê, ji aliyê karbidestên Osmanî ve bi mebesta dadgehîkirin û cezakirinê, bi dest û piyên zincîrkirî, radestî yekîneyeke cendirmeyan têne kirin û ber bi Tirkiyê ve têne şandin. Piştî çend rojan peyaçûnê, ew digihîjin herêma Cizîrê. Li wir di dema bêhnvedanê de Emerxan haydar dibe ku nobedarên cendirmeyan bi egera westiyan û bêxewiyê, xew li wan ketiye. Lewma vê yekê wekî derfetekê dibîne, û yekser tevî hevalên xwe bi dest û piyên girêdayî çekên cendirmeyan ji wan dûr dixin, û piştî dûrxistina çekan, cendirmeyan ji xewê hişyar dikin û zincîrên dest û piyên xwe bi wan didin vekirin. Piştre derziya çekên cendirmeyan jî derdixin, û wan serbest berdidin. Herwisa bixwe jî ber bi herêma Hekariyê ve diçin, û piştî çend rojan xwe digehînin derdora Başkala, û ji wê derê xwe digehînin herêma Şipîran a Rohilatê Kurdistanê, û di bihara 1917`an de li navçeya Selmasê xwe digehînin cem Simko.

Pêdivî bi gotinê ye, piştî serbest berdana Simko ji aliyê Rûsan ve, Ehmed Axayê birayê wî, bi piştgiriya hinek ji serokêlên Şikakan, yên wekî; Haciyê Etmanî Ewdoyî, Mîrza Mihemedê Etmanî û Temirê Etmanî, li hember Simko rawestiyaye, û razî nebûye ku serokatiya

Şikakan radestî Simko bike. Herwisa wî nexwestiye Simko vegere Çariyê. Simko jî piştî rizgarbûna Emerxan û serokêlên Şikak ji dest Osmaniyan, bi piştgiriya Emerxan û ew Şikakên ku bi Ehmed Axa re nebûn, li hember Ehmed Axa derketiye. Piştî çend şer û pevçûnên di navbera wan de, li gundê Bawanê, li herêma Somayê fermandarekî lêhatî ê Simko bi navê Hesoyê Êverî ê babê Hecî Zibê bi destê Ehmed Axa tê kuştin, êdî Simko jî hêrişî ser Ehmed Axa û wan serokêlan dike, û wan li gundê Golegeniyê de dorpêç dike. Di encamê de Ehmed Axa û hevalên wî bi neçarî xwe radestî Simko dikin.

Piştî şikesta Ehmed Axa, Simko xwestiye Ehmed Axa û wan serokêlên Şikakan ku hevkariya Ehmed Axa kiribûn, her hemûyan bikuje. Lê li ser rica û lavahiyên hin giregirên Şikakan, Simko ji vê biryara cezakirina Ehmed Axa paşgez bûye, lê bo sizadana yên din, biryara birîna destekî Haciyê Etmanî Ewdoyî û çend kesên din ku piştevanê sereke yê Ehmed Axa bûne, daye. Piştî vê bûyerê êdî Ehmed Axayê birayê Simko û ew serokêlên hevkarên wî, ku ji aliyê Simko ve hatibûn sizadan, Emerxan wekî egera şikesta xwe ya li hember Simko dîtine. Lewma piştre bo têkbirina têkiliyên di navbera Simko û Emerxan hertim xebitîne, û di her delîveyekê de xirabiya Emerxan li cem Simko gotine.

## Belgeya hejmar: 25



ایالت آذربایجان

سواد

مورخه

نمره

Eyaleta Azerbaycanê
27.03.1919

Şêrê şer Behadorxan di dema danûstandina xwe digel birêz fermandar de, bas ji Şêx Mehmûdê navdar kiriye, û ragehandiye ku Kurdên di xaka Osmanî de, ku niha beşek ji herêma li jêr deshilata dewleta Îngilîzê ye, otonomî bi wan hatiye dayîn û beşek ji Kurdên Îranê jî li benda rewşeke wisa bûn. Lê dewleta Îngilîzê bi berçavgirtina pêwendiyên xwe digel hikûmeta Îranê, ew daxwaz ji Kurdan qebûl nekir, û bersiv da wan, ku karek wisa renge kêşe bo serbixweyî û serweriya hikûmeta Îranê hebe. Navbirî ragehandiye ku hejmarek ji êlên Osmanî ku hatine nav xaka Îranê, û bûne sedema zehmetiyan, dibe koç bikin û vegerin cihê xwe.

Derheqê Seyîd Taha de jî şêrê şer Behadorxan ragehandiye, jiber ku navbirî di nava êlan de axavtina wî tê wergirtin, wisa baştir e ku hikûmeta Îranê her wî hêvîdar bike, û bi xweşxizmetî agehdarî wî bin, û di dema hewce de, ji rêya wî ve, rê li ber hinek ji xeyalên Kurdan bigrin. Eva tenê min bona agehdariya we got.

Bo agehdariya zêdetir ya we, ez radigehînim ku Seyîd Taha kurê Şêx Sidîq e, û di van demên nêzîk de digel Simko têkilî daniye, û her wek ku rêzdar cenabê fermandar nivîsiye û ragehandiye, çend kesek ji hevwelatiyên Osmanî girtine, û li bajar.......


Şerîf El-milk

## *Pîlangêriya Îraniyan bo Kuştina Simko bi bombeyê*

Di meha duyem a bihara 1919`an de, dewleta Îranê bi merema kuştina Simko dest bi tevgerek qirêj dike. Cara yekem hakimê Tewrêzê Mukerem El-mulk, bi alîkariya Ermeniyên wê derê paketeke bombekirî amade dike, û li ser navê şandina diyariyekê ji aliyê jineke Azerî a xizma Simko bo Xusroyê kurê wî, bombeyê dişîne Çariyê. Dema ku Simko li ser rijdbûna Xusroyê kurê xwe, dixwaze paketê veke, ji nişkêve çirûskek ji têlên pakêtê pê dikeve. Simko yekser paketê ji xwe dûr dihavêje û bombe hinekî dûrî wan diteqe. Di encama teqîna bombeyê de, birayê Simko bi navê Elîxan û sê kesên din di cih de têne kuştin û çend kesên din jî birîndar dibin.


Piştî wê kiryara terorîstî, Simko daxwaz ji karbidestên Îranî kiriye, ku dibe derhal wan pîlandarêj û tawanbarên wê kiryara terorîstî ji bo sizadanê radestî wî bikin. Lê karbidestên Îranî ji bo ku pîlandarêjê sereke radestî Simko nekin, di cihê wî de çend tometbarê din radestî Simko dikin, û Simko jî sizaya kuştinê bi ser wan de cîbicî dike.

**Belgeya hejmar: 26**


DH. SFR. 603/30

13 vrk

(12 shf bos)


DH SFR. 624/134

2 vrk


(1 shf bos)

Remz ji Wezareta Daxilî re

09.04.1919

Ev lêzêdekirin ji bo Telegrafa (02.03.1919)an e. Li gor agahiyên ji hêla Başkala ve ji me re hatine, Seyîd Taha Efendî û Simko dixebitin da ku ji bo bajarên Kurda yên ku di nav Îranê û dewleta Osmanî de ne, otonomiyê bi dest bixin. Ji bo vê jî me`imûrên Îngilîz yên li Urmiyê ji bo axaftina derheqê vê meselê de, ew birine Mûsilê. Li gor agahiyên ku xeberguhêzan ji me re anî, Îngilîz û Ehmed Fayiq wek ku me di Telegrafa duhî de got, ew rêzgirtina ku dibû ji Seyîd Taha bigirtana, negirtine.

**Belgeya hejmar: 27**





Remz ji Wezareta Daxilî re
24.05.1919
Jêder: Wan

Vê gavê nameya ku ji Simko hatiye... Agahiya hatina nêzîkî 3 hezar leşkerên Îngilîz ji bo Tewrêzê gihîşte destê me, û herwiha tê gotin ku li ser navê hikumeta Kurdistanê, nûner şandine Gîlanê. Ji vê agahiyê tê fêmkirin ku Simko dixwaze li Îranê hikumeta Kurdistanê ava bike. Di derbarê vê mijarê de çi agahiyên ku bighîjin destê me, emê berdewam ji we re bişînin.

Walî Heyder

(li gor naveroka vê belgeyê derdikeve ku di navbera Simko û Mîrza Kûçikxanê serdarê Mazenderanê de ku hingê ew jî li dijî dewleta Îranê di nav serhildana Gîlanê ya naskirî bi "Şoreşa Cengel" de bûn, têkilî hebûne, û wan xwestiye di navbera tevgera Kurdistan û Gîlanê de, hevbendiyê çêbikin, û alîkariya hevdu bikin.)

**Belgeya hejmar: 28**


تلغرافنامه

DH.ŞFR 637/12

Divê ev agahî bi kesî re neyê parvekirin


Li gor agahiya ku posteçî ji me re anî, komek mirovên Îngilîzê hatine Urmiyê, û bi Eceman re axivîne da ku bi Simko re tu şerî nekin. Dema ku agahiyên nû hatin destê me, emê bilez bigihînin we.

09.07.1919

Ji Ernîsê (Muradiye)

Waliyê Wanê Heyder

**Belgeya hejmar:29**




Ji Wezareta Daxilîye re

Bilez

17.07.1919

Jêder: Ernis

Xeberguhêzê ku cara dawî nameya min ji Simko re bir... Çûye wîlayeta navendî û agahiya li jêr, ji me re şandiye. Simko ji nameya min gelek memnûn bûye, û ji xeberguhêzê me re îkram û rêzgirtin hebûye. Sê demjimêran şûnde Seyîd Taha û sê zabitên Îngilîz hatin û bi Simko re sê demjimêran bitaybetî xeber dane, û piştre jî rabûne çûne. Ligor agahiyên xeberguhêzê me, komek zabitên Îngilîz hatine Urmiyê û nakokiyên di navbera Eceman û Simko de çareser kirine. Dema agahî ketin destê me, emê ji we re bişînin...

Ernîs Waliyê Wanê Heyder

## *Rizgarkirina bajarê Urmiyê*


Di sala 1920`î de Simko haydar dibe ku dewleta Îranê ji bo jinavbirin û derxistina Kurdan ji Urmiyê, waliyekî nû bi navê Ziya El-dewle şandiye Urmiyê. Herweha Simko dîtiye ku, serbarî wê pîlana sala 1919`an ya karbidestên Îranê, wate şandina bombeyê bo Kuştina wî, hêj Îranî ji dijminatiya xwe bi Kurdan re berdewam in. Lewra piştî çend caran gotûbêja digel karbidestên Îranî, hewil daye ku pêşiya wê pîlana heyî bigire, lê çi encam bi dest nexistiye.

Lewra Simko di 17.07.1920-î de ji bo derxistina wî waliyê nû, û bona rizgarkirina Urmiyê, bi fermaneke xasmanî, Emerxan bo wê mebestê erkdar kiriye. Emerxan jî di serî de ji bo girtina Urmiyê, plana girtina bendera Golmexanê daniye, ku derwazeya sereke û stratejîk a Urmiyê bûye.

Digel dorpêçkirina Golmexanê ji aliyê Emerxan ve, piştî şerê giran ku du rojan domandiye, hêzên Qezaq ên Îranê bi fermandehiya Esed Aqaxan bi yekcarî têk şikestine, û Emerxan Golmexane ji destê leşkerên Îranê derxistiye. Piştre Emerxan tevî hêzên din ên Simko bajarê Urmiyê rizgar kirine, û bi girtina Urmiyê, waliyê Urmiyê ku dijminatiya Kurdan dikir, ji wir reviyaye. Piştre li ser fermana Simko, Emerxan wekî hakimê tam deshilatdar ê Urmiyê hatiye destnîşankirin.

Emerxan ku bi fermana Simko ji bo birêvebirina Urmiyê hatibû wezîfedarkirin, ji aliyekî ve bi dilê Ehmed Axa û hevalên wî nebûye, û ji aliyekî din ve Azeriyên Urmiyê jî bi merema xwe vedizîn ji pêdana bac û xeraca ji bo birêveberiya Urmiyê, dijayetiya Emerxan kirine. Di heman demê de Simko jî li hemberî gef û hêrişên dewleta Îranê, pêdiviya wî bi fermandehiya Emerxan di eniya şer de hebû. Lewma Simko biryara veguhastina Emerxan bo eniya şerê Şekeryazê daye, û li şûna wî kesekî Azerî bi navê Teymûr Axa ku xelkê Kevne Şehir (Bajêr) a Selmasê bû, wekî waliyê Urmiyê daniye.

## Belgeya hejmar: 30



15.12.1920

Wergera rapora Urmiyê bi navê serokê eyaletî yê Tewrêzê


Rêzdar serokî eyalet

Di destpêka hatina min de kêşeyên îdarî hemû demên min bi xwe ve mijûl kirine, û hêşta jî min derfeta lêkolîna li ser rewşa siyasî ya vî bajarî tunebûye, lê bi awayekî giştî dikarim bêjim ku rewşa vî bajarî ku ketiye bin deshilata Kurdan, ne bi dilê me ye. Her wek ku tê baskirin, Simayîl Axayê Simko, serdarê nusret hemû Kurd vexwandine cem xwe, da ku di heyama sê rojan de bigihîjin Çariyê. Îro mohlet bi dawî tê, û di nava bajar de gelek Kurd têne dîtin, ku hatine çekdarkirin, û dibêjin ku ji derdora bajar ve hatine, bona vê ku ji bo vê seferê amade bibin û rê bikevin. Bi sedema derketina Kurdan bazirganî bi tewahî sekiniye. Jiber ku pêştir ew mijûlî kirîn û firotinê bûn.

Çend hokarên cuda ji bo çûna Kurdan têne baskirin. Hinek kes dibêjin ku ber bi aliyê Xoyê ve diçin, û hin kes jî dibêjin ku ber bi aliyê Makû û Colfayê ve diçin. Lê sedema sereke hêşta jî diyar nîne. Feraşbaş ew nûçeya daye me, ku Kurdan serafên nav bazar destbiser kirine, û bi darê zorê daxwaza mûçeya serokê emniye û siwarên xwe dikin, ku hêşta wernegirtine.

Wajo: Ehmed.

**Belgeya hejmar:31**


(واعتصموا بحبل الله جميعاً ولا تفرقوا)

جیگای اداره و رەمی چاپخانه غیرت

مدیر محمد ترجانی

مقالا تیبك منفعت كرداتی تیدایی ورد گیری

جاری له هەفتەدا یکیك چاپ دکری

۱۲ مانك شوال ۱۳۴۰

حق روزنامه پیشکی ورد گیری

| خارجیه | داخله | |
| --- | --- | --- |
| ۶۰ قران | ۵۰ | سالیك |
| ۳۵ | ۲۷ | ششمانك |

قیمت یك نسخه ده شاهی

قیمت اعلانان هر دیری دو قران

روزنامیکه سیاسی ادبی اخباری سرمقالی ترجمه دکری بفارسی دینوسی کردیك بوهمو کردان

Rojnameya hejmar 3, sala yekem ku li 23.07.1922`an de hatiye weşandin, digel rojnameya hejmar(...) ku li 08.06.1922`an de hatiye weşandin.

Hewl û xîret mijara şer`î û kelama berê ye
KURD, sala 1922`an
Nirxa rojnameyê bi qist jî tê wergirtin
Salekê bo navxwe 50, û bo derve 60 Qiran e
Şeş mehan bo navxwe 27, û bo derve 35 Qiran e
Nirxa reklamê bo her xetekê, du Qiran e
Rojnameyeke siyasî û edebî û nûçeyî ye. Sergotara wê bi Farsî tê wergerandin û Kurdek bo hemû Kurdan dinivîse

مقالاتیك منفعت كردان تیدایی ورد كبری

جاری لەهر هفتەدا یكیك چاپ دكری

دوشنبە

۲۸ مانك ذیقعدە ۱۳۴۰

سالیك ۵۰ ، ۶۰ قران

شش مانك ۲۷ ، ۳۵

قیمت یك نسخەدە شاهی

قیمت اعلانات هر دیری دو قران

روزنامەیكە سیاسی ادبی اخباری سرمقالی ترجمە دكری بفارسی دینوسی كردیك دوهەو كردن

چارساله وقوعاتیت لوان سرحدان و اقع دبن عجم بواسطا غزتیت خوه بناوی شقاوتی اعلان دكن مروفیت دور ژی چكو ژ حقیقتا شولی بی خبرن بوی طرزی دزانن حال اوە حقیقتا شولی نەوەیە مەهیوی هیەجریدا كردان ایرو پاشوه راستیا دنقیت وها بنوسیت داخلق حقیقتی بزانت :

(دوی بابداچندخبران ازدی بیژم)

ایا ئەهو... كیە ... مەكە دوی حرباعمومیدا ایرانی بی طرفیا خوه اعلان كری بوحال اوه ملتی چرد ولئیت محارب هندی كردیت كفتی دسرحدا ایرانیدا متضرد نبویەا وەلمیدانی یەهر كسی باور نكت بلان بیت ببینت نەنوس، نەمال بو كردیت فقیر نمایە آیا او دژچەبو ؟ اگر دولتا ایرانی - كوحتانا خوه متبوعی وی ملتی كرد فقیر كفتی دوی محیطی دزانی محارب بولو راملتی تابعی وی متضرد بو . كانی اعلان حرب ر دكل كی دولتی كری یەبلان بده زانین

از آقای مدیر محترم جریدە شریفە (كرد) خواهشمندم بنام كردیت این چند سطر بندەرا دریكی از ستونهای جریدە برای اطلاع عمومی درج فرمایید

وقایع چهارسالە كردستان را ایرانیان درجرائد خود بنام شقاوت اكراد اعلان كردە وقارئین محترم جرائد نیز چون از حقیقت كار بی خبرند به اظهارات جرائد باور كردە و چنین تصور مینمایند در صورتیكه تمامی اظهارات جرائد ایران محض كذب بودە و نام شرافت

۱ قیام كردستان بنام محوسه شقاوت لكەدار میكنند لهذا فریضە كردی خود میدانم حقیقت مسئلەرا بطور واضح برای اطلاع عمومی بوسیلە جریدە شریفە عرض و بسمع قارئین محترم برسانم اولا دولت ایران در جنگ بین المللی بی طرفی خودرا اعلان كردە بود بدبختانە هیچ كدام مانند ملل محارب مثل كردستان سرحد ایران، حرنشده دوچار صدمات فوق الطاقه نكردیده علت این مسئله هانا بی اقتداری

## *Weşandina rojnameya “Kurd” ji aliyê Simko ve*

Heyamekê piştî rizgarkirina Urmiyê, Simko ji bo karê ragehandin û zelalkirina armanca serhildana xwe bo raya giştî fermana weşandina rojnameyeke Kurdî dide. Ji bo vê armanca girîng Mamosta Mela Mihemed Turcanî bo vî karî erkdar dike. Di serî de ji bo çapkirina rojnameyê, gava qasidên Simko diçin cem Mihemed Temdun xwediyê çapxaneya bi navê “Temedun” a Urmiyê, û fermana Simko gehandiye xwediyê wê. Xwediyê çapxaneyê bi mahneya nebûna font û teknîka pêdivî ji bo çapa rojnameya bi zimanê Kurdî, xwe nedaye ber karê çapkirina wê rojnameyê.

Gava Simko ji bersiva neyînî ya xwediyê çapxanê agehdar dibe, roja paştir bo razîkirina xwediyê çapxanê cardin neferên xwe dişîne çapxaneyê. Lê dema ku ew digihîjin wir, dibînin ku dergehê çapxaneyê daxistî ye, û xwediyê wê jî ne diyar e. Dema ku Simko ji vê yekê agehdar dibe, bi ken ve dibêje; “Madam wî nexwestiye vî karê me bike, û ji tirsan reviyaye, baştir e navê çapxaneyê ji “Temedun” ve were guherîn, û ew çapxane bi navê -Xîret- bête binavkirin, û dest bi karê weşandina rojnameyê bike”.

Piştî amadekariyên pêdivî, di Tîrmeha 1922`an de, karê girîng û dîrokî yê Simko bi weşandina rojnameya bi navê “Kurd” dest pê kiriye, Piştre çend hejamar bi du zimanên Kurdî û Farsî hatine weşandin. Nasnameya Rojnameyê wisa hatiye diyarkirin: “Rojnameyeke Siyasî, edebî, ixbarî ye, ku sergotarê werdigerîne ser Farsî, Kurdek ji bo hemû Kurdan dinivîse”.

## *Şerê Rizgarkirina bajarê Mihabadê*

Di 06-07.10.1921`an de, Simko haydar dibe ku dewleta Îranê di nava pîlangêriyeke serbazî de dixwaze hêzên xwe ji Mihabad û Miyanduawê bo girtina Urmiyê bi kar bîne. Simko jî bi merema pêşgirtin ji wê pîlanê, piştî çend gotûbêjên bi karbidestên Îranî re, ku çi daxwaziyeke wî bo deshilatdariya Kurdan di herêmê de qebûl nekiribûn, Simko jî bo tedbîrwergirtina li hemberî wê pîlana Îraniyan, bi pêkanîna civîneke berfireh ji piraniya serokeşîrên Kurdan li Çariyê, kariye biryara berevanî û rizgarkirina bihost bi bihost a xaka Kurdistanê di vê civînê de erê bike. Piştre bi yekîtiyeke xurt a eşîrên Kurdan ve, ketiye nav tevgereke nû de.

Simko bi merema pêşîgirtin ji pîlana Îraniyan û herwisa rizgarkirina Mihabadê ji destê Îraniyan, di serî de Seyîd Taha û hin hêzên xwe şandine derdora Mihabadê, û piştî du rojan ew bixwe jî ji Çariyê çûye Urmiyê, û li wir tevî Emerxan û hêzek mezin ya şervanên Kurd ji Urmiyê ve bo alîkariya Seyîd Taha çûye derdora Mihabadê.

Piştî hin şer û pevçûnên berbelav li derdora bajêr, ku hêzên Îranî reviyane nav bajarê Mihabadê, Simko peyam ji serokêlên Mihabadê û malbata Qazî Elî re şandiye, û daxwaz ji wan kiriye ku ji bo rizgarkirina bajarê xwe bi wî re alîkar bin, û rê nedin ew hêzên Îranî xwe di nav bajêr de veşêrin. Lê ew peyama Simko ji bilî eşîra Mameş û ya Mengur ku haziriya xwe bo alîkariya bi Simko re ragehandibûn, ji aliyê hin serokêlên din û bi taybetî malbata Qaziyan ve bersiva erênî wernegirt. Lewma Simko jî ji bo ramalîna hêzên Îranî û rizgarkirina bajarê Mihabadê, fermana hêrişê daye şervanên xwe, û piştî şerekî giran ku du rojan domandiye, zêdetir ji 700 kes ji cendirme û hêzên serbazî yên Îranê kuştine, û herwisa fermandeyê giştî yê leşkerê Îranê li padigana Mihabadê ku navê wî Melekzade bû bi dîl girtiye, û Mihabad bi yekcarî ji destê dagîkerên Îranê rizgar kiriye.

Hêjayî gotinê ye, gava ku Melekzade bi dîlî birine bal Simko û Seyîd Taha, ku wê demê li qiraxa Mihabadê di nava xîvetekê de bûn, Emerxan jî wê demê ji qada şerê nav bajêr vegeriyaye cem Simko, û Simko jî bi îşareya destê xwe, Emerxan bi Melekzade daye nasîn û

gotiye wî; “Ev mezin û serfermandeyê leşkerê min e”.

Lê dema ku çavê Emerxan bi Melekzade dikeve, gustîlkekê ji berîka xwe derdixe û nîşanî Melekzade dide, û jê dipirse; “Ev gustîlk ya te ye?”, Melekzade yekser tê digihîje ku Emerxan dizane ku ew gustîlk ya wî ye, û navê Melekzade wekî mohir bi vê gustîlkê ve ye. Jiber ku Melikzade di şer de bibû hokarê vê yekê ku hêzên Îranî zû xwe radestî Emerxan nekin, û di encam de piraniya hêzên Îranî hatibûn kuştin.

Bi vî awayî Melekzade nekariye gotinên Emerxan înkar bike, û bi îşareta serê xwe gotiye: “Belê, ew gustîlk a min e”. Emerxan jî di cih de, bi gotina çend xeberên hişk rû li Melekzade, ji nişkêve berê tivinga xwe rastî Melekzade dike û dixwaze wî bikuje, lê Simko û Seyîd Taha nahêlin Emerxan wî bikuje.

(Tê gotin heman ew çekdarên Îranî ku di şerekî pêştir tevî Simko de bi dîl hatibûn girtin, û Simko paşê ew serbest berdabûn, heman ew dîl cardin hatibûn şerê Simko, lewma êdî vê carê leşkerên Simko ew kuştibûn).

Piştî bidawîhatina şer û rizgarkirina Mihabadê, bi sedema şerê di nav bajar de, hin zirar û ziyanên madî gihabûne xelkê, û herwisa Simko jî lome û gazinde li hinek ji wan serokêlên Mihabadê kiribûn ku di vî şerî de hevkariya hêzên wî nekiribûn. Piştre Simko birêveberiya Mihabadê dispêre destê hin kesatiyên bawerpêkirî ên Mihabadê, û Melekzade jî digel xwe biriye Urmiyê. Dema ku Azeriyên Urmiyê Melekzade bi dîlî bi Simko re dibînin, bi vê serkevtina Simko û nekuştina Melekzade matmayî dimînin. Paşê Simko Melekzade digel xwe biriye Çariyê, û piştî heyamekê bi danûstandinêna bi karbidestên Îranê re, ew azad kiriye.

## *Şerê Şekeryazê*

Ev şer yek ji şerên mezin yên serdema Simko bû, ku di 17.12.1921-î de, bi fermana Serokwezîrê Îranê Qewam El-seltene, artêşa Îranê bi 5 hezar şerkeran ve û bi fermandehiya Emîr Erşed Zirxam Qeredaxî digel şêvirmendê leşkerî yê Swêdî bi navê "Lindbergh" hêrişî ser Simko kirin. Emîr Erşed Zirxam Qeredaxî birayê Mihemed Husênxan bû, ewê ku di sala 1905`an de, Cewer Axayê birayê Simko li Tewrêzê kuştibû. Leşkerên Îranê, ji çiyayên derdora bajarê Kela Xwê, Selmas û Urmiyê ve hêrişî ser Selmas û herêmên di bin deshilatdariya Simko de kirin.

Dema ku Simko dibîne hêzên dijmin bi girtina çeperên berahiyê pêşreviyê dikin, yekser fermanê dide Emerxan ku bi siwarên xwe ve, tevî şervanên Zêbariyan, hêrişî ser çeperên fermandeyê dijmin yê bi navê Emîr Erşed Qeredaxî li Çiyayê Şekeryazê bikin. Emerxan jî di çarçoveya fermana Simko de, tevî 200 şervanên Zêbariyan, ku ji aliyê Mehmûd Axa û Faris Axa ve dihatin fermandeyîkirin, hêrişî ser çeperên Emîr Erşed Qeredaxî li çiyayê Şekeryazê kirine, û piştî şerekî giran karîne çeperên dijmin bişkînin û fermandeyê leşkerê Îranê bi navê Emîr Erşed Qeredaxî jî bikujin.

Pêdivî bi gotinê ye ku di sala 1919`an de, eşîreta Zêbariyan bi sedema alîgiriya wan ya ji bo Osmaniyan, piştî şerê digel Îngilîzan û bombebarana firokeyên Îngilîzan, neçar mane gundên xwe berdin û ji Başûrê Kurdistanê ve hawara xwe bo Osmaniyan bibin, û herne Bakûrê Kurdistanê. Piştre li ser daxwaza Simko ji Gewerê ve çûne Rojhilatê Kurdistanê û li cem Simko êvirîne. Bi vî awayî em dibînin hemen ew Zêbariyên ku li dema penaber bûna Şikakan di sala 1916`an de, ku ji tirsê Rûsan hawar xwe bo aliyê Zêbariyan biribûn, û piştre di navbera Zêbariyan û Emerxan û Şikakan de şer û kuştin qewimîbû, vê carê qederê wisa kir ku hemen Zêbarî di sala 1919`an de, ji tirsê Îngilîzan, bi neçarî cih û warên xwe berdin, û bi jin û zarokên xwe ve li cem Simko û Emerxan biêvirin, û paşê mil bi milê Simko û Emerxan di yek çeperê de li dijî dijmin şer bikin, û leşkerê Îranê têk bişkênin. Di wî çaxî de berî ku Zêbarî ji Rojhilat vegerin

Başûrê Kurdistanê, ji aliyê Simko ve Zehra Xanima xûşka Mehmûd Axa û Faris Axa tê xwestin, û ji xwe mahre dike. Ew xizmatiya han bûye xîmê dostiniyeke domdirêj di navbera Şikak û Zêbariyan de.

Piştî kuştina Emîr Erşed ji aliyê Emerxan ve, êdî hêzên Îranê bê fermande dimînin, û dengvedana xebera kuştina Emîr Erşed di nava leşkerên Îranê de, dibe egera rûxana morala hêzên dijmin, û êdî nekarîne di eniyên din ên şer de, li hember hêzên Simko xwe rabigrin, û di tewahiya qadên şer de têk şikane, û ji hev belav bûne. Ew şikesta hêzên Îranê ji aliyê Simko ve, wê demê li seranserê Îranê dengvedanek mezin hebûye. Herwisa ew şerê Şekeryazê ku bi fermandehiya Emerxan bi rengekî herî serkevtî hatiye encamdan, wekî serkevtineke mezin ya dîrokî bo serhildana Simko hatiye tomarkirin.

**Belgeya hejmar: 32**

شماره ۲ | سال اول | صفحه ۴

کلنل شب عید با چند نفر سوار فرار متباقی
قوه او تمام محو تعرضات قشون مالکردیه و یک عراده
توپ و یک متر الیوز اغتنام شده در مدت
دو روز ازدو دشمن در هر دو نقطه
نابود گردیدند تلفات ما هشت نفر شهید
و سیزده مجروح ما با تمامی مفوت
غیب خود مجاهد و غیرت کردان
غیور و جسور خود را تقدیر و مظفریت
ایشان را تبریک میگوئیم شجاعت و حمیتی
را که ایشان درایت مرتبه اظهار و آن
شرف بسالتی را که آن شیران احراز کردند
بسی شایسته است که بقلم زرین در
صحائف تاریخ ایشان و شرف کردستان
ثبت کرده در ازمنه معدوده کردان بدان
افتخار نمایند خداوند توفیق عنایت فرموده
مجروحین را صحت و سلامت ببخشد
شهیدان را مظهر لطف و عاطفت خود کند
باید اولاد و اطفال این شهیدان را مانند
در تمامی کردان مدیون حسن عدل پدران
ایشان بود و از هر نوع معاونت و ملاطفت
با ایشان قصور ندارند و خود را دلشاد
و منشرح القلب سازند که اگر تا حال تنها پدران
صاحبی از ایشان کردند از روز بعد
تمام ملت کردها این نگهداری و صاحبی
ایشان حاضرند

محمد جمال النائب

جریده
مدیر مسؤل محمد ترجانی

مطبعه غیرت

۱۷۸

سیل خانمان کن نفوذ ایشان را در مملکت خود مان
سد نمائیم. هر کس در پی حفظ شرف قوم خود نباشد
در قیامت مواخذ و مسئول اولاد و اطفال خویش خواهد شد
ای اکراد ما الحال حاضر مرگ هستیم و میدانیم همه کس شربت
موت را چشیده و دنیا به بزرگان و پیغمبران نپاییده
نمانده و بحقیقتا باهم نخواهد ماند پس چه سعادت ابدی
را تحصیل کنیم با غیرت و عصبانیت بتمام حفظ ناموس
خود برانیم و مال و جان را در این راه فدا کنیم که در
دنیا و آخرت روسفید و نام نیکمان تا ابد خواهد ماند

(سمتکو)

روز ۲۸ شهر صیام عده دو هزار نفری مهاجمان
در تحت ریاست خالو قربان سالار ظفر از
میانداب بساوجبلاغ و عده ششصد نفری در
تحت ریاست کلنل نصرالله خان از صاین قلعه
ببوکان هجوم آور شده عده قشون ظفر نمون ما که
در تحت ریاست سید طه افندی در حوالی
سقز بود از حقیقت وقعه مطلع شده بسر دشمن
متهاجما عودت مینماید روز ۹ رمضان اردوی
دشمن در ساوجبلاغ محاصره صبح علی الطلیعه شروع
بجنگ گردیده در مدت چهار ساعت زد و خورد
قوه دشمن تماما محو رئیس اردو خالو قربان و ارکان
حرب شهزاده روح الله میرزا موقع جنگ با خنجرهای
شجیعان اکراد بخاک میافتند سطوت السلطنه
اسیر دو عراده توپ و هفت متر الیوز غنیمت
اردوی ما گردیده دشمن رو به میاندواب
تعقیب شکسته مجبرا از رود جغاتو گذشته
و غنائم بیحد و حساب است عده که از
اردوی فاتح ما در مقابل عده کلنل بود در
همان روز مشغول زد و خورد میشوند

Rapora şerê hêzên Simko li Miyanduawê ku li 26.05.1922`an de rû daye, û li rojnameya hejmara 2 ya "Kurd" de hatiye belavkirin.

Rapora şerê hêzên Simko li Miyanduawê

Roja 28`ê Remezanê, 2 hezar kes ji Eceman bi serokatiya Xalo Qurban (Salar Zefer) qatilê Mîrza Kûçikxanê Mazinderanî, li Miyanduawê ber bi Sablaxê hatin, û 600 kes jî bi serokatiya kolonêl Nesrullaxan li Sayin Qelayê ve hêrişî ser Bokanê kirin. Hejmarek ji hêzên hertim serkevtî ên me ku bi serokatiya Seyîd Taha Efendî li derdora Seqizê bûn, ji bûyerê hatin agehdakirin, û hêrişî ser dijmin kirin.

Di roja 29`ê Remezanê de orduya dijmin li Sablaxê hate dorpêçkirin, û şefeqê dema rojhilatinê şer dest pê kir, û di heyama çar demjimêran şer û pevçûnan de hêzên dijmin bi tewahî ji nav çûn. Serokê orduyê Xalo Qurban û serokê erkanê şer Şahzade Ruhulla Mîrza di dema şer de bi şûrê qehremanên Kurd ketin `erdê (hatin kuştin). Setwetulseltene wek dîl hate girtin, û 2 top û heft metreloz (reşaş-tîrbar) wek xenîmet hatin girtin, û dijmin ber bi Miyanduawê paşve vekişiya. Ecem ji çemê Cexetû derbaz bûn, û xenîmetên wan jî bê hed û hesab in.

Ew hêza orduya serkevtî ya me jî ku li hemberî hêzên kolonêl sekinîbûn, heman rojê li hev dixin. Kolonêl şeva cejnê digel çend siwaran direve, û piştre hêza wî bi tewahî ji nav çû, û topek û metraliyozek wek deskevtî hatin girtin, û di heyama du rojan de orduya dijmin li herdu ciyan ji nav çûn. Me jî heft şehîd û sêzdeh birîndar hebûn. Em bi hemû hêz û morala xwe cesûrî û xîret û cangorîtiya Kurdan pîroz dikin, û bi boneya serkevtina wan pîrozbahiyê li wan dikin. Ev cesûrî û camêriya ku vê carê ji xwe nîşan dan, û ew şeref û kerameta ku wan şêran bi dest xistin, hêjayî vê ye ku bi pênûsa zêrîn li pirtûkên dîroka wan û şerefa Kurdistanê de bê nivîsîn, û di hemû çaxan de Kurd şanaziyê pêve bikin.


Xwedê ji me re alîkar be, û silametiyê bibexşe birîndaran, û şehîdên me bi lutf û dilovaniya xwe paqij bike. Divêt zarokên wan

şehîdan bizanin ku hemû Kurd deyndarê camêriya bavên wan in, û ji tu hevkarî û dilovaniyekê bo wan xemsariyê nakin, û ew divêt dilxweş bin, jiber ku hekî heya niha tenê bavên wan agehdarî wan dibûn, eva ji niha şûnda hemû neteweya Kurd bo çavdêrî û agehdariya wan amade ne.

Çarî (Çehrîq) Mihemed Cemaledîn

Birêveberê nivîsînê: Mihemed Turcanî, çapxaneya Xîret

## Belgeya hejmar: 33



شماره (۲)

سال اوّل

صفحه (۱)

حق روزنامه پیشکی وترد کرید

داخله خارجه

سالانه ۵۰ بیست قران

ششماهه ۲۷ ۳۰ قران

قیمت یکنسخه ده شاهی

لیس للانسان الا ما سعی

کرد

۱۳۳۰

قیمت اعلانات هر دیری دو قران

روزنامه‌ایه سیاسی ادبی اخباری سرمقالی ترجمه دکریتی بفارسی دنوسی کردیک بو هولکردان

ای جماعت اکراد، ای ملت بی
صاحب و دادرس ای مظلومین پنجه
ستمکاران!! آیا میدانید ملت کردستان
چه قدر لگدکوب اجانب واقع شده
مورد تعرضات غیر قابل تحمیل ملل
گردیده است؟ یا نه البته آنها ئی
که نداشته‌اند باید بدانند که ملت کرد را
نه مال مانده، نه نفوس، نه عزت و نه
ناموس، ملت آثوری که ادنی
تراز ادمیانند عرض حیثیت کردها را
نابود ساختند ایرانیان که برادران دینی
هستند پیوسته به پنجه قهارانه در امحاء
عرق و نسل آنان کوشیده تیشه بر ریشه
شان میزنند و در اغتنام فرصت اند که
بالمره ایشانرا استیصال نمایند. ای
مظلومین وای بی صاحبی، کس نیست

باوضاع دلخراش ومحنت افزای ما نظر
مجتهی نمایند ،، حکومت روز در موقع
اشغال کردستان باوجود تنافر مذهبی
دیدید چه ملاطفات ومهربانیها مبذول
کردند . برادران دینی را هم ببینید که از
فجایع اعمال دریغ نمی نمایند . بنوامیس
کردان وعفت دختران تعرضات کرده
وروا رند بکنند ، اعمال سوء شان نسبت بما
از حد خارج وزبان از بیا نشان عاجز
ای اکراد بجز از اتفاق واتحاد
چاره به خلاصی ملت خود از
پنجه دشمنان نمی یابیم
وبجز از گرفتن دست برادری هم
دیگر چاره بحال بیچارگی اکراد
نیست ، دست یگانگی ووفاق صادقانه
بیکدیگر داده با تمام موجویت از تعرضات
دیگران خود را محافظه نمائیم طریقی خلاصی
همین است لا غیر

من یکنفر کردم وزندگانی خودم را برای تأمین
آسایش این ملت خود فدا کرده ومیکنم ولی نظر
باستماعاتم ایرانیان اعمال مرا باسم شقاوت
معرفی کرده ومرا باین نام لکه دار میکنند
ومن قاچاق واشقیا نیستم مدافعه از حقوق
مینمایم ایرانیان ظالم ودزدند که تمام حال
مملکت کردستان را دزدیده وحتی بعرض
کردان تعرض میکنند ودر از اله تمام .
شئونات شان میباشند هر کسیکه جانسوز
وعلاقه مند ومحبت خود نسبت امت
با صمیمیت خیلی مردانه دست اتحاد بمن بدهد
وبخلاصی ملت خود از چنگال آهنین ایرانیان خلاص
نماید که

۱۳۰۰ – ۴۵ – ۱ – ۲۰۴

Nameya Simko bo gelê Kurd ku di rojnameya hejmar 2 a “Kurd” ya sala 1922`an de, hatiye belavkirin:

Ey cema`eta Kurdan, ey neteweya bêxwedî û dadres, ey stemlêkiriyên destê stemkaran! Gelo hûn dizanin ku neteweya Kurdistanê çende ji aliyê biyaniyan ve hatiye serkutkirin, û ji aliyê gelên din ve ketiye ber hêrişa bêhed, yan na? Helbet yên ku nezanîne divêt bizanin ku neteweya me, ne mal jê re maye, û ne jî kesayetî û serbilindî û namûs.

Neteweya Asûrî ku mirovên herî sivik in, wan şerefa Kurdan ji nav birine. Îranî ku birayê me yê dînî ne, berdewam bi destê dijminkarane, hewl dane bona jinavbirina toxmê Kurdan, û li kok û binetara Kurdan didin, û ji bo vê yekê ji her derfetekê digerin ku Kurdan ji nav bibin. Ey belengazî û ey bêxwedîtî!! Gelo kes tuneye ku bi çavekî dilovanane li rewşa dilêş û pir ji xem ya me binêre?

Hikûmeta Rûs di dema dagîrkirina Kurdistanê de herçend ku cudahiya wan ya olî digel me hebû, lê we dît ku çiqas bi nermî û dilovanî serederî bi me re kirin. Birayên oldar (ên Misilman) jî hûn dibînin ku destê xwe ji tu kiryareke hovane li dijî me naparêzin. Ew destdirêjiyê dikin ser namûsa Kurdan, û şerefa keçên me dişkênin. Kiryarên kirêt ên wan li dijî me hemû sînorek derbaz kirine, û ew yek bi ziman nahê baskirin.

Ey Kurdino! Xeynî yekîtî û pêkvebûnê, me tu riyek bona rizgariya neteweya xwe ji destê dijmin pê şik nayê, û ji bilî girtina destê biratiya hevdu, tu çareyek bo rewşa bêçaretiya Kurdan nine.

Bi rastgoyî destê yekgirtin û pêkvebûnê bidin hevdu, û bi hemû hêz û şiyana xwe li hember destdirêjiya dijmin xwe biparêzin. Rêya rizgariyê tenê ev e, ne tu tişîteke din. Ez takek Kurd im, û min jiyana xwe bo ewlehiya neteweya xwe gorî kiriye û dikim. Lê herwek ez dibihîzim, Îranî kiryarên min wek zulm û dilreqiyê didin nasîn, û min bi vî navî tohmetbar dikin. Lê ez qaçax û dilreq nînim, ez mafê xwe diparêzim. Îranî stemkar û diz in, ku heya niha welatê Kurdistanê talan kirine, û heta destdirêjiyê dikin ser heyiya Kurdan û dixwazin hemû tiştekî ji nav bibin. Her kesek ku canbaz û hogir û evîndarê neteweya xwe ye, bila bi dilpakî û niyeteke mêrane, destê

hevxebatiyê bide min, û neteweya xwe ji destê hesinîn ê Îraniyan rizgar bike, da ku em bibin asteng li pêşberî lehiya malwêrankar ya wan di welatê xwe de.

Her kes hewl nede bo parastina şerefa gelê xwe, li roja qiyametê wê lêpirsîn jê bê kirin, û wê bibe deyndarê ewlad û zarokên xwe. Ey Kurdino! Em ku ji bo mirinê amade ne, û em dizanin ku hemû kesek wê şerbeta mirinê tam bike, û dunya ji bo mezinan û pêxemberan û dijminên wan jî nemaye, bi xatircemî ve ji me re jî namîne. Divêt ku em bexteweriya hertimî bi dest bixin û bi xîret û cesûrî ve namûsa xwe biparêzin, û mal û canê xwe di vê riyê de gorî bikin. Hingê emê di dunya û qiyametê de rûspî bin, û navê baş wê bo heta-heta bimîne.

Simko

**Belgeya hejmar: 34**

# KURDISH REPUBLIC FORMED.

## Simko, Bandit Leader, Said to Have Defeated Persian Troops.

CONSTANTINOPLE, July 9 (Associated Press).—Angora dispatches to local newspapers report that the Persion bandit Simko has proclaimed a Kurdish Republic, assuming the Presidency himself, after defeating the Shah's army. It is said that Simko commanded 85,000 men and was assisted by Mustapha Kemal Pasha, former Turkish War Minister, with the fighting lasting for several days. Simko's cavalry is reported to be marching on Tabriz.

The new republic embraces the regions of Kermanshah, Selmas, Urumiah and Erdilak, according to the dispatches, which report also an insurrection in Luristan, Western Persia.

The New York Times

Published: July 10, 1922

Copyright © The New York Times

KOMARA KURD HAT DAMEZRANDIN

10.07.1922

Tê Ragihandin Ku Rêberê Bibandor "Simko" Artêşa Îranê têk şikandiye.

CONTANTINOPLE/STAMBOL, 9`ê Tîrmehê (Weşana Hevkarî)- Li gor wan nûçeyên ku rojnameyên herêmî belav dikin, Simko rêberê Kurdên Îranê piştî têkşikandina artêşa Şahê Îranê, banga Komara Kurd dike, û bi xwe jî wek serokatiya wê komarê cih digre.

Tê ragihandin ku Simko serkirdeyê 55 hezar kesan e, û ji aliyê Mustafa Kemal Paşa ve ku pêştir Wezîrê Şer bû, û bi dirêjiya çendîn salan di nav şerê Tirkiyê de berdewam bû hatiye piştgirîkirin. Her wisa hat ragihandin ku alîgirên Simko di bajarê Tebrîzê de bo serketina Simko meşa piştgiriyê bi rê ve dibin. Ew Komara nû herêmên: Kirmanşah, Selmas, Urmiye û Erdilakê lixwe digre. Ligor wan belavokên ku raporan belav dikin, serhildanek jî di herêma Loristan a rojavayê Îranê de dest pê kiriye.

New York Times

Weşandin

**Belgeya hejmar: 35**

*THE KURDISH MINORITY PROBLEM*
*CENTRAL INTELLIGENT AGENCY*
*Published on 8th December 1948*
*Kêşeya kêmaniya Kurd*
*Rêkxirawa Îstixbarata Navendî*

Dereheqê Îranê de
R:9. beşa 3

Kurdên Îranê gelek caran hewl dane ku deshilata hikûmeta navendî ji xwe dûr bixin. Di aloziyên Rojhilata Navîn ên berî şerê yekemîn ê cîhanî de, du Kurd ji eşîra Şikak, Isma`îl Axa ku bi Simko tê nasîn û Emerxan, berî vê ku qaveta wan di sala 1922`an de ji aliyê hêzên Îranê ve were têkşikandin, bo heyama çar salan perçeyeke mezin ji bakûrê Rojavaya Îranê bi awayekî serkevtî di bin deshilata wan de bû.

Serkirdeyekî din ê serhildêr yê Kurd Cafir Sultan bû, ew jî heya sala 1925`an karîbû ku bi awayekî berfireh serxwebûna xwe bidomîne.

## *Hêrişa dewleta Îranê bo ser Simko, û girtina Kela Çariyê*

Rizaxan Şahê Îranê piştî wê derbeya ku di 22.02.1921`an li Îranê de kiriye, xwastiye deshilata xwe bi ser tewahiya herêmên Îranê de bisepîne. Lê hebûna Simko bi wê hêz û deshilata heyî, bo xwe wekî astengî û metirsiyeke mezin dîtiye. Lewma plan û nexşeyeke mezin daniye, û li bin fermandehiya serleşker Cehanbanî di 27.07.1922`an de, bi 15 hezar leşkeran û bi çendîn yekîneyên topxane û tîrbarên miselsel ve hêrişî ser Simko kirine.

Leşkerên Îranî ji bo bidawîhînana deshilatdariya Simko, û bi armanca dagîrkirina kela Çariyê ya paytexta serhildana Simko hêrişî tewahiya herêman kirine. Li hemberî wê hêrişa berfireh ya leşkerên Îranê, Simko ji bo berxwedanê daxwazê ji hemû serokêlan dike ku di amadebaşiyê de bin. Lê beşek ji wan serokêlan bi egera netebahî û lihevnekirina digel Simko dilsar bibûn, û ji dil ve xwe nedidane ber wê daxwaziya ku Simko ji bo berxwedana li hember leşkerên Îranê ji wan dikir.

Lê Emerxan hingê jî serbarî dilmayîn û sarbûna têkiliyên di navbera wî û Ehmedaxayê birayê Simko de, bi sed siwarên xwe ve li derdora Selmasê berbirûyê leşkerê dijmin bûye, û piştî du rojan şer bi egera nemana teqemenî û cebilxaneya şer tenê karîne beşek ji hêzên Simko li eniya Selmasê ji dorpêça dijmin rizgar bikin.

Bi sedema wê hêrişa giran ya leşkerên Îranê û nebûna yekrêziya di navbera serokêlên Kurd û hêzên Simko de, û herwisa piştî sê rojan şerkirin û berxwedaneke bêhempa, bi sedema kêmiya şervanan û nemana teqemeniyan, êdî şiyana berevaniya hêza Simko lawaz bûye, û leşkerên Îranê karîne ber bi Çariyê ve pêşreviyê bikin. Di rewşeke wisa de dema ku Simko li hember leşkerên zaf ên Îranê ji bilî hinek şervanên nêzî xwe Şikakên din li cem xwe nabîne, neçar maye ku ji Kela Çariyê ve ber bi herêma Şipîranê a nêzî sînorê Tirkiyê paşekişiyê bike. Dewleta Îranê jî girtina Kela Çariyê wekî serkevtina xwe bi ser Simko de hesibandiye, û li sertaserî Îranê de şahiyên mezin lidar xistine.

## *Cudabûna Emerxan û hinek serokêlan ji Simko*

Piştî girtina Kela Çariyê û çûna Simko bo sînorê Tirkiyê, bi egera wê netifaqiya ku di nav Şikakan de hebû, Qotaz Mamedî yek ji serokêlên girîng yê Şikakan bi siwarên xwe ve ji Simko cuda bûye, û ber bi herêma Elbakê ya girêdayî êla Merzikan ve çûye.

Simko ji bo vegerandina Qotaz Mamedî û nehêlana dilmayîna wî, ji Emerxan xwestiye ku Qotaz û siwarên wî vegerîne. Dema Emerxan bi merema vegerandina Qotaz û siwarên wî ber bi herêma Elbakê ve çûye, di rê de rastî Ehmed Axa û siwarên wî hatiye ku ji aliyê Îranê ve vedigeriyan. Dema ku ew ji Emerxan dipirsin, "Hûnê herin kuderê?", Emerxan jî egera çûna xwe ya ku bi fermana Simko ji bo vegerandina Qotaz e, dibêje wan. Piştî temambûna axaftina Emerxan, yek ji siwarê Ehmed Axa bi navê Avdelê Heyo, bi gotinên kirêt, sivikatiyê bi Qotaz û Emerxan dike. Lê Ehmed Axa ku ew yek dîtiye, tu tiştek negotiye wî siwarê xwe.

Dema Emerxan wan reftarên kirêt yên siwarê Ehmed Axa dibîne, êdî mayîna xwe bi Simko re bêfayde dibîne. Lewma di cih de vedigere cem Simko û serpêhatiya xwe û siwarê Ehmed Axa ji Simko re vedibêje, û ji Simko re dide xuyakirin ku êdî ew nikare pê re bimîne.

Piştî çûna Emerxan û ew rewşa xirab ya ku bi serê Simko de hatibû, gelek ji serokêl û siwarên din jî, ji ber nezelaliya paşeroja xwe, û ji ber hebûna nakokiyên navxweyî, ji Simko vediqetin. Bi vî rengî hêdî-hêdî leşkerên Simko ji hev belav dibin, û Simko digel hejmareke kêm ji xizm û kesên nêzî xwe bi tenê dimîne, û ji neçarî ber bi Bakûrê Kurdistanê û Tirkiyê ve diçin.

## *Hêrişa Tirkan li ser Simko di gundê Şamanis a Elbakê de*

Piştî çûna Simko bo aliyê Bakurê Kurdistanê, dewleta Îranê daxwazê ji dewleta Tirk dike ku Simko bigrin û radestî Îranê bikin. Dewleta Tirk jî serbarî qewl û sozên ku berê bo piştgiriyê dabûn Simko, ji bo parastina berjewendiyên xwe tevî Îranê di şeveke Oktobera 1922`an de, bi armanca destgirtina bi ser heyî û çek û teqemeniyên wî de, hêrişî ser gundê Şamanisê li aliyê bakûrê Kurdistanê dikin.

Di encama vê hêrişa leşkerên Tirk de hevjîna Simko ya bi navê Cewahir Xanim tevî çend kesên din têne kuştin, û kurê Simko yê şeş salî bi navê Xusro jî tê girtin û hemû darayî û serweta wan jî dest bi ser de tê girtin.

Hevdem digel çûna Simko bo Bakûrê Kurdistanê Şikak di navbera sînorê Tirk û Îranê de bê stargeh û perîşan dimînin. Dewleta Îranê jî bi merema vê ku Simko bi tenê bihêle, û serhildana wî bi dawî bîne, ji bo Şikakan efûyê derdixe. Li hemberî vê yekê Şikak jî bi neçarî wê efûyê qebûl dikin, û cardin vedigerin nav sînorê Îranê.

**Belgeya hejmar: 36**

*Belavkirin Hat Pejirandin 2000 / 04/17: CIA-RDP79-01009A002500030006-6*
*Belgeya rûpela 6, li PDF rûpela 10*

Serokê dawî Emerxanê Şikak ji aliyê piraniya Kurdên Îranê û herwisa ji aliyê hikûmeta Îranê ve wekî "pîrê mezin" ê girîng dihate hesibandin, û bi rûmetek civakî ya hevbeş rêz ji wî dihate girtin, lê bandora wî bi ser tewahiya eşîreta wî de nebû.

Nebûna vê piştevaniya giştî ji serokên Kurd nîşaneya wê netifaqiyê ye ku di nav Kurdan de heye, û bi awayekî berçav rêgir bûye ji hebûna rêkxistineke bibandor a Kurdî.

Kurd jiber ku li ser erdên xwe lihev nedikirin, eşîrên curbicur di nav xwe de jî ji hev vediqetiyan. Bi taybet têkiliya Kurdan ji herêmekê ve bo herêmeke din pir kêm e, û ev yek di dema zivistanê de wek astengî, çalakiyên wan lawaztir jî dike.

## *Beşa Duyem*

## *Hevdîtina Simko bi Îngilîzan re li “Behrike”ya Hewlêrê*

Piştî wê hêrişa Tirkan ya bo ser Simko û kuştina hevjîna wî li gundê Şamanisê, Simko ji Bakurê Kurdistanê ve derbasî Başûrê Kurdistanê bûye, û xwe gihandiye Dêrê a nêzî  Hewlêrê, û çûye gundê Behirkê û zêdeyî mehekê di mala Cemîl Axayê Gerdî de maye. Pêdivî ye were gotin ku hingê Îngilîz li Îraqê hakim û serwer bûn, û derbarê çarenûsa wilayeta Mûsilê û şoreşa Şêx Mahmûd di navbera Tirkan û Îngilîzan de hevrikî û arîşe hebûn. Lewma di wê demê de hem Îngilîzan xwestine Simko û Şêx Mehmûd wekî givaşekê li dijî Tirkan bi kar bînin, hem jî Simko dixwaze bi danîna têkiliyan, û wergirtina piştevaniya Îngilîzan, cardin li dijî Tirk û Îranê serhildana xwe li dar bixe.

Bo vê mebestê çend karbidestên Îngilîzan bi serperestiya “Sidi Edmunds” li rêkevt 06.11.1922`an li gundê Behirkê bi Simko û Seyîd Taha û Ehmed Axayê birayê wî re dicivin. Simko di vê hevdîtinê de daxwazên xwe ji bo berdewamiya serhilanê û wergirtina piştgiriya Îngilîzan ji bo bidewletbûna Kurdistanê bi wan radigehîne.

“C.J. Edmonds” ew hevdîtina di navbera xwe û Simko de, bi vî awayî bas kiriye: “Roja 4`ê Novemberê bi armanca gotûbêja bi simko re, ez digel “Layn” bi balafirê çûme Koyê. Roja 5`ê Novemberê ez ber bi Hewlêrê rê ketim. Roja şeşê jî digel “Layn” ku ji Koyê bi trombêlê hatibû, û digel Ehmed Efendî û “Lîtil Dîl” em bi trombêlê bona hevdîtina bi Simko re, ber bi gundê Behrikê rê ketin. Jiber ku hevdîtin li gundê Behrikê bû, ku ew gund yê eşîra Gerdî ye, û ketiye 10 maylî ya tenişt  rêya Dêrê.

Simko digel Ehmedê birayê xwe, û du-sê xizmên xwe yên mezin bi 20 kesan ve hatibû. Simko got ku ew hest bi acizbûneke taybet ji dest Îraniyan nake, jiber ku çiqas ji destê Îraniyan êş û azar dîtiye, ewqas jî li wan xistiye. Lê dixwaze ku tola xwe li Tirkan hilîne, jiber ku Tirkan soza piştevaniyê dabûne wî, lê pişta xwe danê.

Simko ji vê ku em gelek hewl didin Îraniyan aciz nekin heyrî mabû. Li ber vê ku hemû dizanin bi dirêjahiya sînor, Îraniyan digel Tirkan em ji Rewanduz û Raniyê derxistine, û hêla jî bi me re şer dikin û hevkariya hevdu dikin. Simko got ku ew bi vê hêviyê hatibû ku Îngilîz amadeyiya xwe nîşan bidin, da ku li hember wan du hikûmetan de ku dijminatiya wan a hevpar bi herdu aliyan re heye, piştevaniyê ji azadiya Kurdan bikin.

Herwiha Ehmed Teqî ji zimanê Simko ve gotûbêjan wiha vedigêre:

Îngilîz û Tirk herdu alî jî bi me re derewan dikin. Ew derheqê serbixweyî û serbestiya Kurdistanê her sozekê bidin û her gotinekê bêjin derewan dikin û me dixapînin. Îngilîz dixwazin ku hemû Kurdekî wekî xulamokê xwe bi kar bînin, û wan bo deskevt û berjewendiyên xwe wekî meymûnan bi dilê xwe bireqisînin, û me li hember neteweya me şermezar bikin, ew yek bi min nahê qebûlkirin.

Di demekê de ku ez ji cihê xwe reviyam û Tirkan hêrişî ser min kirin, li ser bingeha pêşniyar û rênîşandana Seyîd Taha ez hatim herêma Dêrê a nêzî Hewlêr-Îraqê, da ku bo hevdîtin û lihevkirina bi Îngilîzan re amade bim. Hakimê siyasî ê Îngilîzê digel Seyîd Taha bona dîtina min hatin wir, û di wê hevdîtinê de me bi dûrûdirêjî qise kir, û min gotê: “Ez Kurd im û li min qewimiye, û ez dijminê hikûmeta Farsan li Îranê me. Waye vê carê jî ez bûme dijminê Tirkan, jiber ku wan hevjîna min kuştin, û kurê min êxsîr kirin. We jî (Îngilîzan) gelek qise digel Komeleya Kurd li Stenbolê kiriye, û we hin soz jî dane wan, lê we tu sozeke xwe bi cih neaniye, lewma Kurdan digel Mistefa Kemal li hev kirin. Herwiha li Kurdistana Başûr jî we îdareya hikûmeta Şêx Mehmûd têk da, û ew jî neçar man ku digel Kemaliyan li hev bikin, û ew anîne Rewanduzê. Niha ez li cihê hemû Kurdekî li hemû Kurdistanê dibêjme we: “Ger hûn bo dana serxwebûnê bi Kurdistanê bi rastî bêne pêş û amade bin, wê demê ez jî amade me, û soz didim ku Kurdan digel we rêk bixim. Ger hûn vê yekê jî qebûl nakin, tenê daxwaza min ji we eva

ye ku hevkariya min bikin, da ku çi bi şerkirina digel Îranê, yan jî bi lihevkirina digel wan, li ser bingeha qewl û sozên we, bikarbim cardin vegerim cihê xwe.

Hakimê siyasî ê Îngilîz di bersivê de got: "Carê hez dikim bizanim ku hûn derbider bûne, we çiqas pere ji bo dabînkirina hewcehiyên xwe pêdivî ye". Simko beresiva wî da: "Me tu tişt hewce nînin, ez li vir mêhvanê birayên xwe ên Kurd ên mêrxas im, û her niha Şêx Mejmûdê hêja 500 Lîreyên altûnî ji min re şandine."

Vêca hakim got: "Gelo te pê çawa ye ku em Seyîd Taha bikin hakimê Rewanduz û Herîrê, û herwisa Ehmed Axayê birayê te jî bikin hakimê Badînan?".

Simko bi vê pêşniyara hakimê siyasî dilgiran bû û got: "Ez û Seyîd Taha em tenê koçer in, û em li Dêrê rûniştîne, diyar e ku xelkê vê herêmê di dema şoreşan de bi we re bûne, û min pêştir jî ji we re zelal kir, ku hekî hûn rast dikin, divêt berî her tiştî hûn serbixweyî û azadiya Kurdistanê berçav bigrin. Danîna teşkîlata ji bo xelkê, divêt li gor hezkirina akinciyên welat be, nek li gor hezkirina min û te. Ez bawer im ku niyeta we, ew e ku bi qebûlkirina vê daxwaziya we, hûn me bikin dijminê Kurdistana Başûr, û me li cem wan sivik bikin. Hûn çima di cihê pirsa danîna hakim bo Rewanduz û Herîrê, basa Tertîbat û teşkîlata avakirina serxwebûna Kurdistanê nakin, û wek nûner min naşînin cem Şêx Mehmûd, da ku ew jî di vê yekîtiyê de beşdar be?".


Hakimê siyasî piştî bîstekê bêdengbûn û hizirkirinê, got: "Ew daxwaziyên we, ne bi min têne cîbicîkirin û ne jî têne qebûlkirin, jiber ku di deshilata min de nîne, kerem bike em herin Hewlêrê, li wir emê nûnerê Samî ji Bexdayê bînin, da ku li ser van mijaran gotûbêjan bikin.

## *Nameya Mistefa Kemal ji Şêx Mehmûdê Berzencî re*

Di kelekela şerê yekem ê cîhanî de, dema ku sala 1916`an peymana Sayks Pîko bi awayekî veşartî ji aliyê Îngilîz, Firansa û Rûsiyayê ve ji bo parvekirina xaka împeratoriya Osmanî hate lidarxistin, ji wê demê şûnda êdî împeratoriya Osmanî, Almanya û Nemsa ber bi şikest û hilweşînê ve diçûn. Piştî bidawîhatina şerê yekem ê cîhanî "Tirkên Law" bi rêbertiya Mistefa Kemal di sala 1919`an de, bi lidarxistina kongireya Erzirom û Sêwasê hewl didan ku bona bidestxistina hevsozî û alîkariya kesayetiyên xwedîpêgeh û serokeşîrên Kurd, belkî bikarin deshilata Tirkiyeya piştî hilweşîna xelafeta Osmanî bigrin destê xwe. Ji bo vê armancê bi şandina nameyan bo her aliyekî gelek qewl û soz bi wan didan, û wisa didan xûyakirin ku hikûmeta dahatî a Kurdî wê hikûmeta hevpar a Tirk û Kurdan be. Yek ji wan nameyan jî bo heman armancê ji aliyê Mistefa Kemal ve bo Şêx Mehmûdê Berzencî hatiye şandin.

Bi hûrbûna ji naveroka vê nameya Mistefa Kemal ji me re zelal dibe ku ew siyaseta navbirî û hevbîrên wî, çi bandoreke neyînî li ser tevgera Şêx Mehmûd û pirsa Kurd bi giştî daniye. Herçend ku di peymana Sîver a sala 1920`î de bi hewla dîplomasî û lêzanîna Mistefa Paşa Yamulkî, Birîtanyayê dixwest ku Bakûrê Kurdistanê tevî wilayeta Mûsilê bo heyameke diyarîkirî û bi awayekî otonom di bin çavdêriya wan de were îdarekirin, heta dema ku qedera wan herêman ji aliyê hevalbendên wan ve were yekalîkirin, lê di sala 1923`an di peymana Lozanê de bi pîlana Tirkan, ew hevkêşe berevajî daxwaza Kurdan bi dawî hat, û serbarî binpêkirina bendên peymana Sîverê, vê carê hakimiyeta dewleta nû a Tirkiyê bi sînorên xwe ên niha ve, ji aliyê hevalbendên serkevtî di şerê yekem de bi fermî hate naskirin. Bi vî awayî derket ku Tirkan di wê serdemê de çiqas bi fêlbazî hewl dane ku bi mifahwergirtina ji hesta olî ya Kurdan, herwisa bi dana qewl û sozên bê bingeh bikarin Kurdan wek kartekê li dijî Birîtanya û aliyên dijberî xwe bi kar bînin û piştr jî li dijî her cure mafeke Kurdan bisekinin.

**Belgeya hejmar: 37**



Saygıdeğer Şeyh Mahmut Berzenci Hazretleri

Yüce Hilafet ve Osmanlı Saltanatı Makamına olan gerçek bağlılığınız ve sevgi [illegible] için beslediğiniz yakın ilginiz [illegible] bilinmekte ve kabul görülmektedir.

1. Dünya Savaşı'nın kötü sonucu düşmanlarımıza çok fırsatlar verdiğinden, ateşkes antlaşmasından beri devlet, millet ve vatanımıza [illegible] saldırı ve [illegible], dayanılamayacak ve kabul edilemeyecek bir ölçüye varmıştır. Hilafet ve saltanatın yıkılmasına, yurdumuzun [illegible] [illegible] [illegible] ve milletimizin [illegible] esir olmasına [illegible] hiçbir Müslüman düşünülemez. Düşmanlarımızın her yanda teşebbüsleri hep vatanın parçalanması ve milletimizin esir edilmesi amaçlarına yöneliktir. Gücünü milletten almayan ve tutsak durumda bulunan İstanbul Hükümeti güçsüzlükten öteye bir durum gösterememektedir.

Milletin birlik olarak gücünü ve kudretini bütün dünyaya göstermesinden başka [illegible] yol ve dayanak noktası kalmamıştır. Bu nedenle ben resmî görev ve ünvanımın, bu yolda çalışmama engel olduğunu görerek, hemen askerlik mesleğinden çekilerek yurdumuzun ve milletimizin tam olarak kurtuluşuna kadar onunla birlikte ve milletin içinde çalışmaya karar verdim. Sizin gibi fedakâr, yurtsever din adamlarımızın benimle birlikte çalışacaklarına inanıyorum. Bu defa Erzurum Kongresi'nce karar verilen bildiri ve tüzüklerden yeterince gönderiyorum. O yörede millî teşkilatın yaygınlaştırılarak güçlendirilmesi için yoğun çaba harcamanızı rica ederim. Yakında Sivas'ta toplanacak olan genel bir Kongre ile de daha yararlı ve kesin sonuçlar elde edileceğine inanıyorum. O bölgede İngilizlerin aldatıcı propagandalarının önüne geçilmesi pek çok gereklidir. Yüce Tanrı hepimizi başarıya ulaştırsın. Gözlerinizden öperim, efendim."

Eski Üçüncü Ordu Müfettişi
Mustafa Kemal

[illegible]

13.03.1919

Rêzdar Şêx Mehmûdê Berzencî!

Têkiliya we ya bihêz digel deshilata Osmanî hatiye zanîn, û hest pê hatiye kirin. Encamên xirab ên şerê yekem ê cîhanî, pêş destpêkirina agirbesê, derfeteke zêde da dijminên me, ji bo lawazkirina dewlet, netewe û welatê me. Hêrişkirin gihîştiye astek wisa ku êdî cihê qebûlkirinê nine.

Dema ku xelafeta Osmanî bi dawî hat, tu Misilmanek wisa nafikire ku welatê me bibe êxsîrê Ermeniyan û ew bi dilê xwe piyên xwe bixin nav welatê me. Dijminên me hertim di hewla perçe-perçekirin û êxsîrkirina gelê me de bûn, ger hêz û baweriyek ji millet bê wergirtin, rewşa Stenbolê ji vê yekê xirabtir nabe, ku niha tê dîtin.

Ji bilî vê yekê hewce ye ku neteweya me yek be, û hêz û şiyanên xwe nîşanî hemû cîhanê bide. Xeynî vê yekê tu riyeke derbazbûnê û cihê xweragirtinê nemaye. Ew yek rê li ber erk û wezîfeya min û navnîşanê min digre, lewma ezê bilez dest bi karê leşkerî bikim, û bawer im ku kesên fîdakar û welatparêz û îmandar ên wek we, wê bi min re kar bikin. Vê carê heya kongireya Erziromê, ezê we bi tewahî agehdar bikim.

Ez daxwaza hewl û têkoşîneke zaf li te dikim, û bona belavkirina rêkxistina millî di wê herêmê de, ez bawer im ku em digel ewên ku vê carê li kongireya Sîwasê de bi hev re kom dibin, emê encamek baş û cihê xatircemiyê bidest bînin.

Hewce ye ew propagendeyên ku Îngilîzan bi armanca xapandina we, di wê herêmê de belav kirine, bêne bêbandorkirin.

Xwedayê mezin, me hemiyan serkevtî bike, rêzdarê min çavên te maçê dikim.

Sêyem çavdêrê leşkerî yê mêjîn

Mistefa Kemal

## *Nameguherîn û hevdîtina di navbera Simko û Şêx Mehmûd de*

**Belgeya hejmar: 38**

Nameya Şêx Mehmûd bo Simko
14.12.1922
Hewlêr
Qehremanê Kurdistanê Isma`îl Axa

Renge hûn bizanin ku di rêya standina mafê gelê Kurd de, min hertim fedkarî kiriye, û rastî gelek nerehetiyan bûme. Îro bi hevkariya qehremanekî wek we, bona gihîştina bi wan hêviyan, gelek hêvîdar im. Wa dizanim ku hewcehî bi nivîsînê nake, jiber ku dizanim hûn bixwe dikarin pêşbînî bikin ku hekî em bê hêz û piştevan, xwe bavêjin nav agirê berengariyê, te guman tunebe ku ew kar, wê bibe sedema jinavbirina Kurdên belengaz. Jiber ku heya niha bi awayekî fermî û bi tewahî serbixweyî bi Kurdan nehatiye dan, heta em jî bikarin li hemberî hikûmetan bisekinin. Serbarê vê yekê jî em ji daxwazkirina mafê xwe paşve nemane. Sê meh ji vê soza hikûmeta Birîtanyaya mezin derbaz dibe ku dabû me, lê heya niha jî tu tiştek cîbicî nekiriye heta ku em jî nîşanî neteweya xwe bidin, û em hez bikin li ser heqê xwe şer bikin. Lewma naxwazim ku bêçine xwîna Kurdan were rijandin. Hekî mafê me bi me bê bexşîn, her ji dûr ve dikarim hemû fermaneke hikûmeta Birîtanyaya mezin li çarçoveya yasayê de bi cih bînim.

Hekî hûn zêdetir hêviya têgihîştin û gotûbêja dikin, kerema xwe werin Silêmaniyê ...


Mehmûd

Çi pêştir û çi jî piştî hevdîtina di navbera Simko û Şêx Mehmûd de, çend telegraf û nameguherîn di navbera Simko û Şêx Mehmûd de hatine encamdan. Simko di 08.01.1923`an de ji bo seredana Şêx Mehmûd çûye bajarê Silêmaniyê, û li wir bi merasimeke fermî û di nav kernevaleke mezin de ji aliyê Şêx Mehmûd û xelkê Silêmaniyê ve hatiye pêşwazîkirin.

Simko di heyama mana xwe ya li Silêmaniyê, hewl daye ku di hevdîtinên xwe ên bi Şêx Mehmûd re bikare wî razî bike, ku baweriya xwe bi Osmaniyan nehîne, û çarenûsa şoreşa xwe bi Osmaniyan ve girê nede. Lê Şêx Mehmûd bi sedema hewsoziya olî û bandora wan sozên xapînok ên Tirkan, ku bi rêya Ozdemir nûnerê Tirkan li Rewanduzê bi wî dabûn, bersiveke erênî nedaye Simko. Herwisa di wê dema hestiyar de Şêx Mehmûd nekariye têkiliyên xwe bi Îngilîzan re jî normal bike. Hewce ye were gotin ku di wê demê de, Refîq Hilmî û herwisa Mistefa Paşa Yamulkî jî gelek caran heman nêrînên wekî Simko derbarê siyaseta wê demê a Osmaniyan û Îngilîzan ya derheq Kurdan de gotibûne Şêx Mehmûd, lê tu encameke wê tunebûye.

Simko li heyama mana xwe li Silêmaniyê, piştî çendîn hevdîtinan digel Şêx Mehmûd çi bersivek erênî bo dûrketina wî ji Tirkan û lihevkirina bi Îngilîzan re jê wernegirtiye. Herwisa Simko çi hêviyek bi piştevaniya Îngilîzan jî nemaye ku di wê demê de, li dijî Îranê piştevaniyê ji Simko bikin. Di wî çaxî de bi sedema ji nû ve destpêkirina şerê di navbera Şêx Mehmûd û Îngilîzan, êdî Simko tê gihîştiye ku mana wî li Silêmaniyê bêfeyde ye, û pêşeroja wî jî ne zelal e, lewma di 28.03.1923`an de ji bajarê Silêmaniyê derdikeve, û vedigere derdora Rewanduzê.

**Belgeya hejmar: 39**



Deqa nameya Simko bo Şêx Mehmûd

28.01.1923

Bo hezretê hukimdarê Kurdistanê cenabê Şêx Mehmûd

Evro hemî nîşan ji şiyana Kurdistanê di ber dest û hukimdariya we de ye. Em bo tu tiştî bê`emriya te nakin, û her tiştekê ku hûn emir bikin û berjewendiya miletê Kurd tê de hebe, emê bi qisa te bikin. Ez li devera Xoşnaw û li gundê Bêtwate me, û daxwaza min ev e ku bême bajarê Silmaniyê, û hinek xeberên Kurdistana Îranê bo cenabê te bînim. Mikumkirina karûbarên Kurdistanê hewcehî bi têkilî û dostaniya bi Îngilîz re ye.

Bilez

Muxlis....

Isma`îl Şikak

## *Sozên Ozdemir û vegera Simko bo Tirkiyê*


Piştî bêhêvîbûna Simko ji Îngilîzan û bicihhêlana Silêmaniyê û hatina wî bo herêma Rewanduzê, li wir ji aliyê Ozdemir karbidestê Tirkiyê ve hinek qewl û soz bi Simko têne dayîn, û ji rêya wî ve Simko têkiliyan bi hikûmeta Tirkiyê re dadinê, û li wir çavnihêrê bersiva wan bo çûna Tirkiyê, û wergirtina piştevaniyê dimîne.

Ji aliyekî din ve hikûmeta nû ya Tirkan di bin serokatiya Mistefa Kemal de ji bo xapandina Simko, ji bo ku nehêlin Îngilîz Simko li dijî wan bi kar bînin, wekî taktîka demkî, digel rêdana bi Simko bo çûna nav Tirkiyê, û radestkirina beşek ji darayî û malê zewtkirî yê wî, û herwisa berdana Xusroyê kurê wî, gelek qewlên bêcî jî dane Simko.

Serbarî vê ku Simko di wê serdemê de heya radeyekê ketibû jêr bandora qewl û sozên Tirkan, lê wî jî xwestiye di vê rewşa aloz de, vê helwesta Tirkan wek derfetekê bona destpêkirina xebata xwe bi kar bîne. Di hevpeyvîna Simko a digel rojnameya “Akşam” a Tirkî, û herwiha di nameya Simko bo Şêx Ebdulrehmanê Seran de, dîtingeh û siyasetên wê demê yên Simko derheq Tirk û Îngilîz û herwiha çarenûsa wilayeta Mûsilê û mafê Kurdan, bi zelalî diyar in.

Lê piştî vê ku peymana Lozanê li rêkevt 24.07.1923`an de tê îmzekirin, û nakokiyên di navbera Tirkan û Îngilîzan li ser qedera Mûsilê, heta qasekê yekalî bûye, êdî Simko nekariye di Tirkiyê de bimîne, û carek din bi destê betal vegeriyaye ser sînor, û li derdora Çiyayê Dalamper li ser sînorê di navbera Îran, Tirkiye û Îraqê de akincî bûye.

## Belgeya hejmar:40



## *Nameya Simko bo Şêx Ebdulrehmanê Seran*

26.12.1923

Serokê eşîra Dol Ako, Şêx Ebdulrehman Efendî (Şêx Mela Ebdulrehmanê Seran)!

Birayê min ê rêzdar!

Bi dil û can rêz û hurmetên xwe bo we dişînim. Ji wê demê ve ku ez ji we dûr ketime, jiber ku bi awayekî zelal min xeber ji we tunebû, min gelek meraq dikir ku rewşa we bizanim. Carna ew kesên ku dihatin û diçûn, di derheqê we de xeber didane min, lê jiber ku hûn di rewşeke xirab de ne, dilê min hêsayî nedibû. Bi taybetî jî dema ku siyaseta Îngilîzan ya piştgiriya ji dijminê me yê ol û xwînê, wate Ermenî û Nasturiyan li dijî me berdewam e, û dema ez vê tînim ber çevê xwe, bêhtir xemgîn dibim.

Bi fesadî û teşwîqa Seyîd Taha, Îngilîz bi artêşekê ku ji Ermen û Siryana pêk tê, wê hêrişî ser Şêx Mehmûd Efendî bikin.

Divê em alîkariya Şêx Mehmûd bikin, ancax bi vî awayî emê bikarin serê dijminên xwe bidin tewandin. Ger hûn vê alîkariyê bikin, ez kefîl im ku wê hikumeta me ya baş di warê madî û me`inewî de, wê bi her awayî alîkariya we bike. Ger alîkarî nekin, ew hêza mel`ûn wê we jî ji nav bibin.

Wîlayeta Mûsilê ku bi awayekî eşkere di nav hidûdê me yê millî de ye, armanca me ew e ku bi her awayî, em Mûsilê cardin bistînin. Herwiha çawa ku we heta îro li hemberî van dijminê me yên dînî de serê xwe netewand, eger hûn îro jî, serê xwe li hemberî wan de netewînin, bêguman hûnê ji hikûmeta me ya adilane heqê xwe bistînin.

Îngilîz û Feysel niyeta wan ew e ku ji xortên Ermen û Nastûriyan girûpên çekdar ava bikin, û başûr û bakûrê Kurdistanê ji hev veqetînin. Eger hûn vê daxwaziyê bi cih bînin, ev siyaseta wan wê îflas bike, û ji Îslamiyetê re jî, wê xizmetekî mezin be.

Rutbe û paye û kincên Îngilizan şerefê nadin mirov. Şeref ew e ku em nebin êxsîrê dijminê xwe yê dîn û xwînê, û girîngiyê nedin malê dinyayê.

Eger hûn halê min bipirsin, çawa ku hikûmetê kurê min radestî min kir, ji ber wê lutf û merhemeta ku nîşanî min da, ezê hêj baştir bibim.

Ezê li benda encama xebat û xîreta we ya madî û mizgîniya başiya we bim.

Îmze:

Simko

## Belgeya hejmar: 41



هر كون نشر اولنور ، مليتپرور ، ترقيپرور تورك غزته‌سى

آقشام

نومرو : ۲۱۵٤ — يدنجى سنه — هر يرده فياتى ۳ غروشدر

شرقده بر كورد عشيرتنك حياتى

### مشهور كورد رئيسى سميقو وان مخابرعزه الك جانلى ماجرالرندن بعضيلرينى نقل ايديور

سميقو موصل ايچون ديوركه : «بوراسى هر كسدن زياده بنمدر، موصلك توركيه‌دن آيرلماسنه رضا كوسترەجك هيچ بر كورد موجود دكلدر»

استانبولك قورتولديغى كونده

### استانبول شهرى ، خلاص كوننك سنه دوريه‌سنى بو صباح جانلى تظاهرات ايچنده تقديس ايتدى

جنوبه مخابرمزك مكتوبلرى

### جمعيت اقوامده پوليتيسك بلاغت چيچكلرى

يونان مرخصى اوقدر كوزل سوز سويلك مرافليسيدركه بمضاده جلسه‌لرده الك عادى و مبتذل بلاغت تكرلرينه تنزل ايديور !

### استانبول شهرى نامنه غازى پاشايه تلغراف

### امير على حجازدن قاچدى

### اوطور مقدر استنفاف ابتدى

### يكى نوطه ويره‌جكمى ؟

### ضابطه‌ده‌كى جرائم اخلاقيه دوسيه‌لرى تدقيق ايديله‌جك

### مهاجرلره اراضى توزيعى

### غازى پاشانك مجلسك كشادنده عودت ايتمسى بكلنيور

آقشام قفره‌سی

حدتلی قالپاق

غریب براوغورسزلق اوی اوله‌جق ، بگین کون ، صباحدن آقشامه قدر ، بری بری تعقیب ایدن بوسوو غاوغالرك شاهدی اولدم . هیسی ده قالپاق کیمش کیمسه‌لرله قسابلر آره‌سنده اولمشدی .

# بك‌اوغلنده اسکان

## اموال متروکه بردرلو تخلیه ایتدیریله‌میور

زوالی مهاجرلر حالا آچیقده !

# سیمقو واله مخابره‌مزه

## ماجرالرینی نقل ایدییور

[ برنجی صحیفه‌دن مابعد ]

حیات حقیقیه‌ده نه‌لر اولویور ؟

# باکره برکلین اوله‌رق قوجه‌یه

## ویریلن اوچ چوجوقلی قادین

---


فوق‌العاده برماجرا ، اسرار انکلیز برروبمان وعظمتلی برفیلم

## صوك ساعت

۸ تشرین‌اول چهارشنبه آقشامندن اعتباراً الحمرا سینماسنده

ایکی قسملق ، هارولد لوئید ، قومدی

پروغرامه علاوة : بوکون اجرا ایدیلن استانبول قورتولوش بایرامی

بر آقشامدن اعتباراً کوستریله‌جکدر

## تاثو ! تاثو ! تاثو !

غیر قابل تعریف بر کلمه ... اوبر بر معماکه ۹ تشرین‌اول اوکزده‌کی چهارشنبه آقشامی « ماژیق سینماسنی » تشریف ایدنلرجه حل ایدیله‌جکدر


## شهر امانتی اعلانلری

شهر امانتندن : قره کوی کوپریسی دوبه‌لرینك تعمیرینه مقتضی بشیوز طون ساج لوحه‌نك دلیکسز و پاصلی اولماق واخراجیه ایله کمرك رسمی متعهده عائد بولونمق ودرخنیده تسلیم ایدلمك وتأدیات ساجلرك تسلیمندن صوکره یاپیلمق شرطیله بهر طونیلاتوسنی ۱۱،۸۰ انکلیز لیراسنه اعطایه طالب بولنمدیغندن بوندن دها نقصانیله عینی اوصاف وشرائطی حائز ساجی اعطاسنه طالب اولانلرك شهر حالك سکزنجی چهارشنبه کونی بعد الزوال ساعت دوده قدر تکلیفنامه‌لرینی قپالی ظرف ایله یوزده اون نسبتنده تأمینات آقچه‌لری ویا او نسبتده بانقه کفالتنامه‌سیله برابر مقام امانته تودیع ایلملری و اوصاف حقنده معلومات آلمق ایستینلرك آندن اول هیئت فنیه‌یه مراجعتلری اعلان اولونور .

اقبال کتبخانه‌سی

## تجدد خریطه‌لری

| | | |
|---|---|---|
| ۲۵ | تورکیه | صنوف عالیه‌یه مخصوص |
| ۲۵ | « | مکاتب تالیه و ابتدائیه‌یه مخصوص |
| ۲۵ | آوروپا | ( یکی تشکیلاته کوره ) |
| ۲۵ | آسیا | |
| ۲۵ | آفریقا | |
| ۲۵ | شمالی آمریقا | |
| ۲۵ | جنوبی آمریقا | |
| ۲۵ | اوقیانوسیا | |
| ۲۵ | کره مسطحه | |
| ۲۵ | عالم اسلام | |

بالاده‌کی یکی طبع ایدیلن خریطه‌لرك مرکز فروختی اقبال کتبخانه‌سیدر .

### ایش یوردی


## تورك یوردی مجموعه‌سی

یك کزیده قلملرك معاونتیله یکیدن نشر اولنه‌جغنی اوقو. مرده‌ویرمکز ( تورك یوردی ) آنقره‌ده انتشار ایتمشدر . یارندن اعتباراً « تورك یوردی » نی بتون استانبول موزعلرنده و کتبخانه‌لرده آرایکز .

## ئه‌توال سینه‌ماسنك

بو کونکی پروغرامی :

استانبولك قورتولوشی بایرامی مراسمی

مودا قبیق یاریشلری عموم تفرعاتی ایله

دومون : حال حاضر منظره‌سی

تورده‌ماندی : ۷ قسملق درام

ژیغولو : مونتروتی ، قومدی


۱۰۰۰۰ انکلیز لیراسی تضمینات

برلانظ

آناطولی ـ بغداد دمیر یوللری

## *Deqa wergerandiya gotûbêja rojnameya “Akşam” a Tirkî digel Simko*

Sala heftem–Hejmar: 2154
07.10.1924

Qedera eşîreke Kurd li “Rojhilat”

Serokê navdar ê Kurd “Simko” bo cara yekem bi awayekî rasterast bas ji hindek bûyer û serpêhatiyên xwe ji peyamnêrê me re dike.

Simko derheqê Mûsilê de dibêje: “Zêdetir ji her kesî ez agehdar im, tu Kurdek nîne ku digel cudakirina Mûsilê ji Tirkiyê be.

Ji peyamnêrê me yê taybetî:

Simko serokê navdar ê eşîrên Kurd ku heyamek e li bajarê “Wan”ê ye, wî li rojhilata Anadolê û di navxwe ya Îranê de gelek alîgir hene. Min karî hevdîtinekê digel wî serokeşîrê navdar pêk bînim. Min ew li pêşberî avahiya pêşîn a konsolxaneya Rûsiyê dît, ku ew avahî bi kirê girtibû. Simko ciwanekî 35 salî, çalak û jîr, kêrhatî û peyt, biheybet û micid e. Ew bi zimanên Tirkî, Farsî, û Rûsî diaxive. Simko şede û şaşika rîşîdar a hermûş li serê wî bû, ku berhemeke destçêkirî a xelkê herêmên sînorî ên Îranê bû.

Dema ku em digel Simko rûniştin, û me dest bi axavtinê kir, piştî basekê li ser kok û binetara wî, derheqê serhildan û şerên digel Îranê, bi vî rengî boçûn û daxwaziyên xwe anîne ziman:

Îranê digel hemû hewlên xwe nekarî artêşeke bihêz û şerker ava bike. Helbet yê ku zêde hewl bide, karê zêdetir encam dide, û wê deskevteke zêdetir hebe. Ewê di dawiyê de artêşa xwe ava bikin, lê eva tenê di forma xwe de, wê artêş be, jiber ku leşkerên Fars şiyana wan ya şerkirinê sifr e, ew tenê di zimanê xwe de vêrek û bicerg in. Her dema ku min şer digel Farsan hebûye, hertim min ew têk şikandine.

Di demên dawî de, wan erd û heyiya min wek milkê dewletê bexşîne Ermeniyan. Wan, erd û milkê taybetî ê malbata min, ku me li Urmiye, Xoy û Selmasê hebû, dane Ermeniyan, û ew li ser akincî kirin. Di rewşeke weha de, berevanîkirin ji mafê xwe, mijareke namûsî ye, lewra min jî her bi vê armancê dest da çekê.

Em li herêmeke sînorî, digel hêzên Îranê ketin nav şer de. Min top û muselsel û hindek çek hebûn, ku me ji Ermeniyên Rûsiyê wek deskevt bi dest xistibûn. Di nava hêzên Îranî de gellek piledarên Ermenî jî hebûn. Şer ji wan re gellek îza, û ji me re sanahî bû, dema ku em li serkevtinê nêzîk bibûn, ji nişkêve li hindek ciyan, me leşkerên Tirk li hemberî xwe dîtin. Di demekê de ku bi sedema lawaziya Îraniyan, nedihate hizra tu kesî, ku ewê bikarin dek û dolabeke weha bigerînin, lê xûya bû ku wan lahî ji Tirkiyê kiribûn, ku hêzên sînorî ên Tirkiyê li dijî me hevkariya wan bikin, lewra min zû fermana agirbesê da şervanên xwe. Li ber vê ku di berjewendiya malbat û eşîra me de ye, ku em bi gotina hikûmeta Tirkiyê bikin, û nabe em berê çekên xwe bidin Tirkiyê, belku hewce ye ku em li gelê Tirkiyê hez bikin, û zirarê negehînin wan.

Dema ku min biryara agirbesê da, ji wê demê şûnda êdî min dev ji her tiştê xwe li Îranê berda, û ez çûme ser xaka bavê xwe Mihemed Paşa li Tirkiyê, û li wir ew hest di dilê min de pêk hat, ku ez dikarim di nav aştî û aramiyê de bijîm. Ez tê gihîştim ku hekî Tirkiye piştgiriya Îranê bike, îmkana vê yekê nine ku ez serkevtinê bi dest bixim. Ez ji wir paşve vekişiyam, û min top û çek û cebilxaneya xwe radestî hêzên ser sînor kirin, û derbasî nava Tirkiyê bûm.

Dema ku min pêyê xwe danî ser vê xaka ku, min demên xweş ên zarokatiya xwe tê de derbaz kiribûn, hesteke xweş di nav dilê min de çêbû, ku cihê akincîbûna bavê min, ez jî li xwe girtim. Endamên eşîra min kesên gelek bixîret in, û nikarin dest ji welat û wargehê xwe berdin, lewra wan hemiyan nekarî bêne vî alî, û serbarê vê yekê jî dema ku ez derbazî vî alî bûm, xelkeke zêde digel min bûn. Min dixwest ew cihên ku em tê de ne, em avedan bikin, û bi rêya pezdarî û çandiniyê ew xelk li jêr hukimdariya Tirkiyê de, di nav aştî û azadiyê de bijîn. Lê hindek ji hevalên min, rêgirî ji vê pilana

maqûl û baş kirin, û nehêştin ku ew pilan ser bigre.

Kazim Çerkez ku ketibû pey min, bi awayekî îxanetkarane timayiya pere û zêr û tiştên binirx ên min kiribû. Wî digel piledarekî bi navê “Necmedîn” li hev kiribûn, û xwastin ku nav û navdeng û heybeta min li ber çavê deshilat û xelkê reş bikin. Bo vê armancê, wan fermandê rêzdar “Mihemed Elî Beg” li dijî min tûj kirin, û bi hikûmetê ragehandin ku ez kesekî zirarbexş im bo Tirkiyê.

Piştre Necmedîn Beg ez haydar kirim ku li gor wê fermana gihîştiye destê wî, ew daxwazê ji min dikin ku ez tevî malbata xwe herim “Wan”ê, û li wir ji rêya telegrafê ve digel berpirsekî payebilind baxivim, min yekser xwe amade kir, û digel hevjîna xwe û çend xizmetkaran, min tiştên xwe yên binirx hilgirtin, û ber bi “Wan”ê em bi rê ketin, û bi qasî nîv demjimêrî ku mabû em bigihîjin “Başkala”, em sekinîn û me xîvet hilda.

Piştî heyamekê xizmetkarên min, ez pê hesandim ku hêzên Tirkiyê xîveta me dorpêç kirine. Di wê demê de min dikarî ku yekser dest bidim çekê, û çend serbazên emegdar birîndar bikim, lê ew karê min, wê ez wekî kesekî zirarbexş nîşanî Tirkiyê dabama, û wê demê direv û boxtanên dijminên min wê hatibana cî, û rast derketiban. Lewra min biryar da ku hevjîn û kurê xwe bispêrin vijdana Tirk, û ez bi tenê reviyam. Di wê demê de gulleyek li hevjîna min ket, û hevjîna min ya bêçare her li wir şehîd bû. Herweha kurê min ê şeş salî jî bi navê Xusru hate destbiserkirin. Bila xwîna wan goriyê netewe û hikûmetê be.

Herçend ku Xusruyê kurê min li “Sarî Qamîş”ê li cem “Se`îd Paşa” jiyaneke baştir ji wê hebûye ku li cem min wek sêvî mezin be, niha jî em dibînin ku ew bi Tirkî diaxive, û dibêje ji vir bêzar bûye, herçend ku ez ji vê yekê xatircem bim jî, lê çi fayde heye, li ber vê ku ew kesên rewşa jiyana wan wek a min e, nabe bikeve dava hestên xwe.

Piştî revîna min, li ber wan hemû zextên ku li dijî min hatin bikaranîn, ez li tu cihî bicih nebûm. Hikûmetê ragehand ku ewê hemû wan kesan ceza bike ku min vehewînin, lê min jî nexwest ku tu yek ji hevalên xwe tûj bikim (han bidim) ku li dijî hikûmetê

bisekinin. Bo heyamekê ez derbider bûm, û min destengî, birçîtî, û êş û azareke zêde kêşa. Çûna min bo Îranê, yan Rûsiyê ji min re bi wateya xwekujiyê bû. Lewra di pêxema jiyan û mana xwe de, min berê xwe da wilayeta Mûsilê, ku di bin dagîrkarî û deshilata Îngilîzan de bû.

Îngilîzan bi xweşhalî ve pêşwazî ji min kirin, û karmendekî taybetî danîne ber destê min, û bi min ragehandin ku digel yekem daxwaza min, ewê 500 Kurdî digel ew qas pereyê ku ez bixwazim, wê bixin ber destê min. Di nav daxwazan de jî, tiştên weha hebûn ku hesta min birîndar dikirin, û qebûlkirina vê daxwazê wek vê bû ku tu namûsa xwe bifroşî. Ez nefretê ji Seyîd Taha û kesên wek wî dikim, ku van karan dikin. Lewra min nekarî li pêşberî çavên hemû cîhanê karekî wisa astnizim hilbjêrim.

Piştî çend rojan bîrkirinê, min biryar da, di cihê wê de ku xwe bifroşim Îngilîzan û îxanetê bi ol û neteweya xwe bikim, ya baş ev e ku xwe radestî hikûmeta xwe bikim, heta ger ew biryara min, min bibe ber darê îdamê jî. Piştî têkilîdanîna bi karbidestekî Tirk bi navê Ozdemir Beg re, ez vegeriyame hundir. Hikûmet bav e, heta ger bav digel zarokên xwe tund be jî, û neheqiyê jî derheqê wan de bike, û li wan jî bixe, nabe ew zarok li hember bavê xwe de bisekinin, û hêja nine ku stûxwarê bavê xwe nebin û rûmeta wî neparêzin. Jiber ku ew roj wê were ku ew bav, neheqî û şaşiya xwe sererast bike, heta ewê ji şaşî û kêmasiyên zarokên xwe jî xweş be, û wê qenciya wan ser xwe rake. Her wek wê helwesta ku min bixwe gelek caran li hember endamên eşîra xwe nîşan daye. Ger ew yek ji aliyê hikûmeta min ve bi heman awayî nehê dîtin, ezê dijatiyê bikim.

Ez li pêşberî hemû cîhanê radigehînin, hekî belgeyek hebe ku min û eşîra min, kêmtirîn serpêçî û dijatî li hember hikûmet û gelê Tirkiyê hebûye, û em zirarê digehînin wan, hekî kesek heye ku îdiayeke wisa bike, bila bê û biselmîne, wê demê ezê stûyê xwe bidim ber şûre celladan.

Îro ez li ser xaka bavê xwe, û li himbêza birayê xwe de me, lê ez di nav wan de jî, xwe di rewşeke nexweş û rezîliyê de dibînim.

Helbet ezê bêtawaniya xwe biselimînim. Ez spasdarê wî Xwedayî me, ku jiyan bixşiye min, û bi sedan carî canê min rizgar kiriye, jiyan li cem min wê demê nirxa xwe heye, ku ez şerafetmendane bijîm, jiyaneke cuda ji wê, li cem min tu nirxa wê nîne. Lewra selimandina vê rastiyê ku min îxanet li hikûmet û milet nekiriye, bo min mijareke girîng û namûsî ye.

Peymnêr: Piştî vê ku Simko bas ji hikûmetê kir, min derheqê kêşeya Mûsilê û Kurdan de pirs jê kir.

Simko dibêje: Ez ecêbgirtî mame, ku gelo mijarek bi navê pirsa Kurd û Tirk heye? Tiştekî wisa tê mêjiyê mirov? Li vir li gor pêgeha me, hemû mafek bi me tê dayîn, û tu cudahiyek nahê dîtin. Kesek tuneye ku dijatiya vê hikûmetê bike, ku nûnertiya Kurd û Tirk dike. Ger kesanek jî hebin, gelek kêm in, û bêpêgeh û xwefiroş in. Ne tenê xelkê têgihîştî û jîr, heta xelkê asayî û Kurdên nexwendewar jî, baş ji hewcehiya pêkvejiyana bi biratî digel neteweya Tirk tê digihîjin, û di heman demê de dizanin ku dijmantiya digel neteweya han, bi wateya mirinê ye bo man û serxwebûna wan.

Ya ku pêwendî bi kêşeya Mûsilê û rewşa wê herêmê û jiyana eşîrên wir ve heye, ez ji her kesî baştir dizanim ku çawa ye. Xelk û eşîrên wir, di bin givaş û serkuteke wêranker de jiyana xwe derbaz dikin, û bi bêtabî çavnihêrê alîkarî û piştgiriya me ne. Her hemû, bêy ku kesekî jê derxim, bi bêtabî çavnihêrê wê rojê ne ku, wê vegerin himbêza Tirkiyê, û hindî ku bixwazî, ew ji jiyana bindestiya Îngilîzan nerehet û bêzar in. Herçend ku niha li wir carna aramî û êminiyeke rêjeyî hebe jî, eva jî li ber vê ye ku, xelk carê hêvîdar in ku bi van zûkatiya ewê rizgar bibin, lê ger rojek bihêt, ku ew vê hêviyê ji dest bidin, hingê Mûsil wê bibe gola xwînê.

Ez tenê di vê pirsê de stûxwarê hikûmetê nabim, ger Mûsil ji Tirkiyê bihê veqetandin, û hikûmeta Tirkiyê jî razîbûna xwe li ser vê yekê nîşan bide. Baweriya we hebe, ez û sedan serokhozên din ên vêrek hene, ku emê Mûsilê bikin gola xwînê, û wê ew cih bibe goristana zaliman. Divêt baweriyê bi vê yekê bikî, divêt baweriyê bi vê yekê bikî.

Peyamnêr dibêje: “Dema Simko ev axavtina dikirin, kelecaneke

zêde hebû, û agir ji çavên wî dibarî, û mirov dikarî tipetipa dilê wî bibihîze. Ew kelecana wî, ew wateya digehand ku ew pilingê şerker piştî du salan bêdengiyê, hêj sax e, û wek têhniyekî li pey nêçîrekê digere ku hêrişê bike ser. Niha wî ew nêçîr peyda kiriye û amadeyî hêrişkirinê ye. Li gor wê lêkolîna taybetî a ku min derheqê Simko de encam daye, ji wê rojê şûnda ku Simko dest bi bizavê kiriye, gihîştiye astekê ku herî kêm 20 hezar kesî li dewra xwe bicivîne, û rêbertiya wan bike. Gelo tu bêjî hikûmeta Îngilîz bo vê ku bikaribe kesekî weha bi 20 hezar alîgirên wî ve, ji nav bibe, dibe bi çend hezar kesî û çend milyon Lîreyan û bi çend salan li dijî wan têkoşînê bike? Ez bersiva vê yekê bo pisporan bi cih dihêlim, û min ew pirs li Simko kir, ku gelo tu dikarî bi çend kesan ve beşdariyê di têkoşîneke weha de bikî?

Simko got: “Nikare hejmarê bêje, jiber ku renge hûn gumanê bikin ku ez zêde mezin dikim, lê tu gumaneke min di vê yekê de nine, ku hemû Kurd û herwisa ew ciwanên Tirkan jî, yên ku hilgirê silogana “peymana millî” ne, wê ji bo bidestveanîna vê armancê piştgiriya min bikin. Niha tenê di Silêmaniyê de 15 hezar kes, ku Îngilîzan malên wan bombebaran kirine, amade ne ku li dijî Îngilîzan hevkariya min bikin. Di nav sînorên wilayeta Mûsilê de jî, kerb û bêzariya xelkê gihîştiye asteke wisa, ku 150 serokhoz amade ne ku dest bidin çekê, û di yekem derfetê de dest bi serhildanê bikin. Ew jî girûpeke amade ne.

Li Cizîrê ne tenê Kurd û tirk ji bo azadî û vegerandina Mûsilê agir berbûye wan, belku bi hezaran Erebî jî hez dikin ku ji zulma Îngilîzan rizgar bibin. Ez naxwazim ku navê malbatan eşkere bikim, lê gelek name ji aliyê Erebên bajar û ên koçer ve ji min re tên, û bangî min dikin.

Peyamnêr dibêje: Hevdîtina min digel Simko di vir de bi dawî hat, ez wek kesekî ku min ji nêz ve bûyer şopandine, ezê çend notên xwe di vir de binivîsim.

Yekem: Kurd neteweyeke Misilmanê rêzdar û xwedîhêz e. Ew tu deshilatdarekî lawaz ê Îranî bi fermî nas nakin, û serokeşîrên xwe di asta Şahê Îranê de dibînin, gelo neteweyek ku wisa be, melikekî

wek Feysel yan deshilatdarên Îraqê, wê çawa bikarin ku wan bixin bin destê xwe de? Bi taybetî ew Erebên ku niha jî piraniya wan wekî koçer jiyan dikin.

Duyem: Encama wan propagendeyên bizirar ku di nav Kurdên akinciyê Tirkiyê de dihatin kirin, eşkere bûn, û karvedan berevajiyê çavnihêriya wan kesan bû, ku ew propagende bi rê ve dibirin. Niha hemû Kurd baş ji vê rastiyê hesiyane, ku hêlana Mûsilê li nav Îraqê, û di bindestiya Îngilîzan de gefê li paşeroja wan dixwe. Ew yek weha li wan dike, ku berê xwe bidin kiryareke yekalîker, wek çawa ku Simko basê dike.

Sêyem: Simko serkirdeyekî hezkiriyê Kurdan e, û karîna vê yekê heye, ku Kurdan li dewra xwe bicivîne, û xelk jî jê hez dike.

"Xelkê Îranê Simko bi Pilingê Şer bi nav dike, mohra Simko li forma "Şêr" de ye, û peyva Simko li ser wî şêrî hatiye hilkolîn".

**Belgeya hejmar: 42**

*25.10.1923*

## *Siyaseta wê demê a Sovyetê a derheqê Kurdan de*

Li gor raporta “Pastoxov” ê serokê beşa Rojhilata Navîn a Wezareta Derve a Sovyetê di 25.10.1923`an de, siyaseta neyînî a Sovyetiyan ya derheqî Kurdan, bi vî awayî zelal kirine:

1-Em kêşeya Kurd bi kêşeyeke navdewletî nizanin û ji ber vê yekê jî, otonomiya ji bo Kurdistanê bi piştgiriya her kesekê be, emê li dijî wê rawestin.

2-Bi sedema wan têkiliyên ku me bi serkirdeyên Kurd re heye, dibe ku em bêjne wan: otonomî bo Kurdistanê diruşmek e ku Îngilîzî propagendeyê bo dikin û wekî kartekê ye di destê wan de, û ji bo kêşeyên di navbera xwe û Tirkan de bi kar tînin. Emperyalîzma Îngilîz bi diruşma otonomî ji bo Kurdistan a di bin parastina xwe de, paşmayiya koletiyê di formek dijwartir de bo Kurdan bi diyarî tîne.

3-Dibe Kurd hewl bidin bi gotûbêjên rastewxwe digel dewletên Tirk û Fars û herwisa tevî hêzên pêşkevtinxwaz ên wan welatan, bikarin rewşa xwe ber bi başiyê ve biguherin. Li gor nerîna rayedarên Wezareta Derve ku heval “Şomyaniskî” araste kiriye, helwesta me li hember kêşeya Kurd, bi vî awayî ye:

1-Divêt ku otonomiya Kurdistanê, di bin piştgirî û parastina Îngilîz û Tirkan de be, lê qet nabe ku di bin piştgirî û parastina Farsan de be, jiber ku wê bibe sedema metirsiyeke siyasî û leşkerî li hember berjewendiyên Yekîtiya Sovyetê û her planek bo otonomiyeke wisa were darêtin, divêt bi rijdî were gengeşekirin.

2-Pêdivî ye em ji perçekirina Kurdistanê ya ku Başûr bo Îngilîz û Bakûr bo Tirkiyê be, haydar bin.

A - Îngilîz hewl dide Başûrê Kurdistanê bixe ser Îraqê.

B - Ger Tirkiye bixwaze otonomiyê bide Bakûrê Kurdistanê, wê bo berjewendiyên me gelek zerer hebe.

C- Ji bo vê ku Başûrê Kurdistanê bixin ser Îraqê, divêt Îngilîzî bi serokatiya dewleta Farsan re li hev bikin û bi hev re li dijî Kurdên Îranê (Kurdên Makû, Urmiye, Selmas û ...hwd) rawestin.

Em li dijî otonomiya bo Kurdistanê ne, ku bi alîkarî û piştgiriya her aliyekî be. Herwisa em li dijî çekdarkirina eşîretên Kurd in, ku ji aliyê her kesekê ve be. Gelek girîng û biqazanc e, ku em taybetmendiya şervanî a eşîretên Kurd biparêzin, û di nav wan de bangeşeyê bikin, ku ew yek ji bo nasyonalîzma Kurd, serxwebûna eşîran, pêdiviya jiyan û zindîmanê ye. Divêt bêjne wan alîgiriya Tirkiyê, yan Îngilîzan nekin, jiber ku wan armanên emperyalîstî hene. Bi wan bidin famkirin, ku Îngilîz û Tirk û Fars, dixwazin Kurdan bikne qurbaniyê armanên siyasî û leşkerî ên xwe. Divêt bêjne wan, berjewendiya wan di wir de ye, ku tevî dewletên xwe bi cuda li hev bikin, da ku mahneyê ji bo hêrişa tepeserkirinê a wan dewletan pêk nehînin.

Divêt ku bêjne wan, bila bi dewleta Fars re, li ser van xalan li hev bikin:

1-Bila eşîret, bi fermî serweriya dewleta Fars qebûl bikin.

2-Bila eşîret hazir bin, di demek diyarîkirî de, hinek bac û maliyatê bidne dewletê.

3-Bila eşîret hazir bin, li gor pêdiviya heyî, siwaran ji bo xizmeta leşkerî bidin dewletê.

Heval "Şomyatiskî" dibêje: "Eyan e, ku alîkariya me ji bo Kurdan, nabe ji çarcoweyeke teng a bangeşeyî zêdetir naveroka serbazî hebe, wekî alîkariya ji bo çapemenî û daxuyanî û ...hwd«.

Pêşniyarên Heval "Şomyatiskî" digel destûra hevalên Wezareta Derve ya me, derheqê mijara otonomiyekê bo Kurdistanê, û çareseriya kêşeya Kurd bi lihevkirina Kurdan tevî dewletên Tirk û Fars, hev digre, lê di wan xalan de, bi hev re nakok in:

1-Emê li dijî otonomiya Kurdistana Tirkiyê rawestin.

2-Em li dijî çekkirina eşîrên Kurd in. Ew babeta nû ku di pêşniyarên heval Şomyatiskî de heye, ew e ku em li dijî zeliqandina

Başûrê Kurdistanê bi dewleta Îraqê ve bin.

Beşa Rojhilata Navîn a Wezareta Derve a Sovyetê wisa difikire ku:

A-Dibe paşmayiya feodalîzm û Axa-Xulametiyê heta qonaxa sermayedariyê, di welatên Rojhilata Navîn de koka wê bê qelandin.

B-Jiber ku berjewendiya me di aramiya herêmê de ye, nabe em, ne li dijî otonomiya Kurdistana Tirkiyê, û ne jî li dijî çekkirina eşîretên Kurd bin. Jîrane ye ku piştî pêdana otonomiyê bi Kurdistana Tirkiyê, em bi tu awayekî derfeta vê yekê nedin, ku ew der tevî Bakûrê Kurdistana Fars hevdu bigrin, û bibin yek. Dûr nine ku otonomiya Kurdistana Fars têk biçe, yan bi awayekî lê bê, ku heval Şomyatiskî pêşniyar dike. Lê ya ku bi lomeyên Înilîzan ve girêdayî ye, yanî zeliqandina Başûrê Kurdistanê bi Îraqê ve, tu berjewendiyeke me tê da nine, ku em li dijî vê yekê rawestin, jiber ku çênabe ku hemû Kurdistan di bin parastina me de be, cuda ji vê ku beşek diçe ser Îraqê, baştir e ku beşên din ên Kurdistanê jî perçe-perçe bin. Ew yek di berjewendiya me de ye, û wê bibe sedema:

1-Alozî û kêşeyeke micid di navbera Tirkiye, Îraqê û Îngilîz de, û wê Tirkiyê mijûl bike.

2-Îraq (Îngilîz) wê lawaz, û hêzên wan jî, wê ji hevdu belav bibin, lê eniya di hemberî wan de wê berfirehtir bibe. Renge ew yek jî, di berjewendiya me de be. Li ser wan pirsyarên ku di wir de hatin behskirin, beşa Rojhilat a Wezareta Derve a Sovyetê daxwazê ji hevalên desteya Wezareta Derve dike, ku di wê derheqê de, fermana xwe bidin.

Pastoxov

Serokê beşa Rojhilata Navîn a Wezareta Derve a Sovyetê

25.10.1923

Bi vî awayî xûya dibe ku pirsa Kurd û daxwaziyên neteweyî ên wan, di çarçoveya stratejiya Sovyetê de cih nagre, û tenê wekî kartekê di hevkêşeyên herêmî de, ji bo parastina hevsengiya berjewendiyên xwe bi Îran, Tirk, û Birîtaniyan re hatiye bikaranîn.

### *Emerxan di nebûniya (xiyaba) Simko de*

Piştî wê rewşa ku bo Simko hatî pêş, û Simko li Rojhilatê Kurdistan nemaye, Emerxan wekî kesê duyem û xwedî tecrube, di Îranê de sergêriya Şikakan kiriye.

Wê demê ku di navbera karbidestên dewleta Îranê û hakimê Piştko li herêma Loristanê de şer derketiye, û heyama salekê domandiye, leşkerên Îranê nekarîne wî şerî bi dawî bînin. Lewma Riza Şah ku zaniye Emerxan û eşîreta Şikakan ku xwediyê tecrubeya dehan şerên mezin in, ji bo bidawîhînana şerê li Piştkoyê, daxwaz ji fermandeyê hêza 64 ya Urmiyê kiriye, ku bo sûdwergirtin ji hêza Şikakan bo şerê li dijî hakimê Piştkoyê, peywendiyê bi Emerxan û eşîreta Şikakan re danên.

Dema ku li ser daxwaza Riza Şah, fermandê leşkera Urmiyê, ew daxwaza ji Emerxan kiriye, Emerxan di nava durêyanekê de maye, û fikirî ye ku di demeke wisa de ku Simko li ser sê sînoran, di rewşeke nediyar de ye, nabe bi karekî wisa rabe ku Simko bi vî karê wî, li ber xwe bikeve.

Ji aliyekî din ve Emerxan zaniye ger wê fermana Şahê Îranê qebûl neke, vêca ew yek wê bibe egera tolhildana Şah ji wî û êşîreta bê penah ya Şikakan. Lewma ji neçarî razî bûye, ku tevlî hezar siwarê Şikakan biçin herêma Piştko ya Loristanê.

Lê dema ku çûye herêma navbirî, hakimê Piştkoyê zaniye ku Emerxan tevî siwarên Şikakan ji aliyê leşkerê Îranê ve bi zorê şandine şerê wan. Li hemberî vê yekê hakimê Piştkoyê bêyî ku şer bikin, ber bi sînorê Îraqê ve diçin û bi vî awayî  di navbera wan û Emerxan de çi şer rû nedaye. Ew jî dibe cihê dilxweşiya Emerxan, û tevî siwarên Şikakan vedigerin wargehê xwe.

## *Vegera dubare ya Simko bo Rojhilatê Kurdistanê*

Piştî bêencammayîna hewlên Simko, yên digel Îngilîzan û Tirkan, ew cardin li ser sînoran bendewar dimîne. Di rewşeke wisa nezelal de, Simko ji bo ku bikare derfeteke din bo berdewamiya xebata xwe bibîne, bi dewleta Îranê re peywendiyan datîne. Wî ji rêya fermandeyekî artêşa Rizaxan li Selmasê bi navê Serheng Kelb`elîxan, û herwiha Emîr Ebdullahxanê Tehmasibî fermadê leşkerê Bakûrê rojavayê Îranê li Kotol û Selmasê, hevdîtin û gotûbêj digel wan de kiriye.

Îraniyan bi van mercên jêrîn bersiva daxwaza Simko dane:

Divêt tu soz bidî ku êdî li dijî dewleta Îranê şer nekî.

Di dema pêdivî de, divêt tu alîkariya dewleta Îranê bikî.

Nabe tu herî Çariyê, û divêt li gundê Howesnê cihwar bibî.

Digel qebûlkirina van her sê mercan, emê te efû bikin, û tu wê bikarî vegerî Îranê, û sergêriya Şikakan bikî.

Herwiha Îraniyan bo razîkirina Simko qewl û soz danê, heya ku Emerxan mabe, yan wê di girtîgehê de be, yan jî wê li navenda Îranê were ragirtin, û dûr dibe ji herêma deshilatdariya te. Piştî lihevkirina herdu aliyan, Simko vedigere Îranê û di destpêka sala 1924`an de, li gundê Howesnê ya girêdayî herêma Soma ya Urmiyê cihwar dibe. Piştî vegera Simko bo Rojhilatê Kurdistanê, piraniya serokêlên Şikak û Herkiyan tevî Kurdên derdora Urmiyê derketine pêşwaziyê, û li gundê Howesnê serdana wî kirine.

Lê Emerxan bi egera dilmayîna ku berê di navbera wî û Simko de hebûye, serdana Simko nekiriye, û çavnihêr maye ku Simko gazî wî bike. Simko jî li hemberî nehatina Emerxan bo pêşwaziya wî, dilgiran bûye, û ev nehatina Emerxan wekî bêrêzî û bêminetiyekê li hemberî xwe zaniye. Ji aliyekî din ve, ew nexweşiya di navbera Emerxan û Simko de, derfetê dide hinek ji wan serokêlên ku li hemberî Emerxan kîndar bûn, da ku bikarin li dijî Emerxan li cem Simko biaxivin. Di encama wê rolgêrana neyînî a wan serokêlan

de, êdî Simko jî Emerxan wek neyarekî li hember xwe hesibandiye.

Piştre Simko ji bo lawazkirina deshilatdariya Emerxan di nav Şikakan de ketiye nava tevgerê de, û destûr daye siwarên xwe ku herin gundên girêdayî êla Emerxan, û gundiyan bixine bin fermana xwe de. Herçend ku Emerxan bi vê yekê dilgiran dibe, lê naxwaze li hemberî Simko raweste. Jiber ku baş dizanî ku di rewşeke wisa de hem piraniya serokêlên Şikakan û hem jî leşkerên hikûmeta Îranê, wê li dijî wî alîgiriya Simko bikin. Herwisa nexwestiye bi darê zorê jî teslîmî Simko bibe.

**Belgeya hejmar: 43**

*Deftera Tarîxê*
*Koma belge û çavkaniyên dîrokî*
*Komkirina Îrec Efşar*
*Raporên leşkerî ên şerê bi Simko re*
*Destnivîsên Xulamhusên Mehmûdî (salar intizam)*
*Rûpel 175, 176, 177,178,*

Rewşa Sima`îl Axa Simko

Piştî revîna Simko ji Îranê û bidawîhatina şerê Kurdistanê, hêzên Tirk li serhedê ew xafilandin, û di dema şevê de hêrişî ser wî kirin, û dest danîn ser tewahiya heyî û darayiya wî, û kurê wî girtin û jina wî û çendîn kes ji mirovên wî kuştin. Simko revî, û çû herêma di bin deshilata Îngilîzan (Başûrê Kurdistanê-nivîser) de, û heyamekê li cem Şêx Mehmûd ma, ku wê demê Ozdemir Paşa jî tevî hinek Tirkan di Rewandizê de, bi terzeke nerasterast tevî Îngilîzan şer dikirin.

Paşayê navbirî fikirî ku mayîna Simko li xaka di bin deshilata Înglîzan de, wê bi temamî bi zerera Tirkan bi dawî bê, lewma navbirî li ser navê dewleta Tirkan hin qewl û soz dane Simko, û gote wî ku Tirk wê bala xwe bidin te û wê kurê te serbest berdin. Bi vî awayî Ozdemir karî Simko razî bike û vegerîne herêma Başkala ya Tirkiyê.

Simko berê jî heyama ku li cem Şêx Mehmûd bû, bi rêya Şêxê navbirî, bi şandina nameyan û danîna têkiliyan bi Emîr Ebdullahxanê Tehmasibî serleşkerê hêzên Îranê li Urmiyê re, hezkirina xwe derheqê vegera bo Îranê ragehandibû. Di heman roja ku Simko li cem Şêx Mehmûd bû û ber bi Başkala rê ketibû, Emîr leşker Ebullah xan Tehmasibî ferman da min ku herim Kotolê û li wir bi Simko re hevdîtinê bikim.

Min di Kotolê de tevî Simko hevdîtin û gotûbêj pêk anî, û xûya bû ku gotinên navbirî derev in û ew tenê dixwaze hêcetan bîne daku tim Îran û Tirkan di destê xwe de rabigre, û li Îranê jî îqtidar

û deshilata xwe ya berê hebe. Herwisa piştî gotûbêjê got ku, dibe ez di berahiyê de herim Tirkiyê, jiber ku kurê min li wir dîlê Tirkan e.

Bi vî rengî gotûbêja min tevî wî çi encamek tunebû, û Simko çû û ez jî vegeriyam. Piştre Tirkan bitaybetî Silêman Sebrî Beg fermandeyê Tirkan ê serhedê bi her awayekî be, ogiriya xwe derheqê Simko de nîşan da, û kurê wî radestî wî kir, û serokatiya eşîreta Serhedê dan wî, û pere û çek û teqemenî jî didanê.

Bi vî awayî wan Simko wekî peykerekî di hember Îranê de qût kirin, da ku hertim bibe sedema serêşiyan. Simko di wê heyama ku bi Tirkan re bû, şexsê wî bi rêya peyam û mektûban ve dida xûyakirin ku ez Îranperest im û dixwazim vegerim Îranê. Ji sala par şûnda, ku cenabê Emîr leşker Tehmasibî hewl dida Simko bîne Îranê, ev babetên jêrîn bûne sedema vê yekê ku Simko neçar bibe were Îranê:

Ew pereyê ku Tirkan bo xerciyê didan wî, gelek kêm bû, û navbirî bi zehmetî jiyan dikir.

Şoreşa Tirkan li dijî kurdan, Simko ecêbmayî kir û ew bi temamî ji Tirkan bêhêvî bû, û neçar ma bi haleke perîşan were Îranê. Jiber ku wî nedikarî here cem Îngilîzan li Mûsilê, çûnke dijberiya wî tevî Aşûriyan hebû, û navbera wan baş nebû.

Simko cara yekem, berî anîna malbata xwe bo Îranê, bi Emîr leşker tehmasibî re hevdîtin û gotûbêj pêk anî û bi wan mercan razî bû were Îranê ku serokatiya eşîretê bi wî re be, û tewahiya deshilatê hebe, û herwisa ji aliyê fermandeyê giştî yê hêza Îranê (mebest Rizaxan e) efûya giştî jê re were dayîn. Piştî wan gotûbêjan Simko çû û paş çend rojan digel malbata xwe hatin nav Îranê.

Cenabê Emîr leşker Tehmasibî, serokatiya tewahiya êla Şikakan û herwisa ya tewahiya êla Emerxan û tevî şexsê Emerxan radestî Simko kir, û soz da ku ewê tewahiya milk û malê Simko jî ku dest bi ser de hatibû girtin, wê bo wî vegerînin. Herwisa ferman li tewahiya serokêlan kirin ku divêt hûn di bin emrê Simko de bin, û wî bi meqamê serokatiya xwe bi fermî binasin. Bi sedema vê ku Emerxan bo vê fermanê stûxwarî nekir, hate girtin û bi destbiserkirî bo navenda Îranê hate şandin.

Ji wê demê ve Simko serokatiya tewahiya êlan kiriye û piraniya êlan wekî berê, gelek ji Simko ditirsin, û hekî Simko azar û eziyeta kesekî jî bike, ew nevêrin şikayetê lê bikin.

Ez bi wan mercên jêrîn, Simko xizmetkarê dewleta Îranî dibînim:

Serokatiya tewahiya êlan û rêveberiya girêdayî bi wan, bi Simko were spartin, da ku ew bixwe sergêriya wan bike.

Bi awayekî ku cenabê Emîr leşker Ebullah xan Tehmasibî soza rastîn dabûn, milk û malê Simko yê ku dest bi ser de hatibû girtin, bi wî were radestkirin.

Divêt em Emerxan bixin jêr emrê Simko, yan jî divêt Emerxan heta-heta di zîndan, yan jî di navendê de were ragirtin.

Bi sedema vê ku Simko vê gavê xwediyê çi tiştekî nine, û nêzî 150-200 siwar û nanxwarê wî hene, dibe hinek pere wekî hevkarî bi wî were dayîn.

Tevî rêz û hurmetan, bi we radigehînim ger ligor wan nerînên ku li jor hatinî, tevî Simko reftar were kirin, emê hetmen bikarin ji wî mifahê wergirin û çi şik di xizmetkarî û cangorîtiya wî de nabe, lê ger cuda ji vê yekê tevî wî reftar were kirin, ewê cardin dest bi (serhildanê) bike, û wê têkiliyên xwe bi biyaniyan re çêbike. Vê gavê Simko di nav wehmê de ye, bi awayekî ku dema bo karekî tê bangkirin, ew tevî 200-300 siwarên xwe ve hereketê dike. Herwisa xeyala deshilata berê di serê wî de diqilqile, û hema kêmekê were êşandin, ewê ji nişkêve dilmayî bimîne, û wê dûr bikeve.

Ya dawiyê:

Rewşa kurdan

Kurd yanî êla Simko bixwe, ku êla Ewdoyiyan e, hinekê ji hatina Simko bo Îranê razî ne, û niha jî wekî berê li dora wî kom bûne. Lê êla Kardaran ku êla Emerxan e, bi tewahî ji hatina Simko bêhêvî bûne. Bixasmanî piştî girtina Emerxan, kurdên re`iyet jî nerazî ne, û berî hatina min bo Selmasê, Simko hinek ji kesên ser bi êla xwe li gundên Kardaran danîne, û bi awayekî zorê li wan dikin, ev yek bûye sebebê bêhêvîbûna êla navbirî, lê ji tirsan nevêrin şikayetê bikin.

Berê, dema ku Simko revîbû, gelek heywan û çarpêyên wî di cî de mabûn, û niha cem Emerxan û êla wî ne, Simko bixwe hinek ji êla Kardaran wergirtin, û hinek jî hêj li cem êla navbirî mane û Simko wan jî dixwaze.

Eger em siyaseta dewleta Îranê derheqê Simko û kurdan bidin aliyekî, emê rewşa wan wisa bibînin ku di jor de hate baskirin.

Fermandeyê hêza Selmasê- serheng Kelbelîxan

Têbînî: Bi hûrbûna ji naveroka vê belgeyê, eşkere dibe ku di sala 1924`an de hatiye nivîsandin.

## *Hevdîtina Simko digel Rizaxan*

Berî vê ku Rizaxan bibe şahê Îranê, di 01.07.1925`an de fermandeyê leşkerên Rizaxan li Urmiyê bi navê Emîr Ebdullahxanê Tehmasibî, Simko agehdar dike ku Rizaxan (serdarê supahê, û wezîrê Şer) wê bihête seredana Selmasê, û dixwaze li wir bi te re hevdîtinekê pêk bîne.

Tehmasibî ji Simko dixwaze ku bi hejmareke kêm a siwarên xwe ve, bihête cihê diyarîkirî li nêzî Selmasê. Lê Simko berevajî daxwaza Tehmasibî, ji bo pêşwaziya Rizaxan, tevî hejmarek ji serokêlên Şikakan û zêdeyî 700 siwarî, diçin ser rêya li navbera Muwancix û Selmasê, û li wir çavnihêrê hatina Rizaxan dibin.

Simko wê serdanê wek derfetekê dibîne, û bîr ji kuştina Rizaxan dike, û bo vê mebestê cuda ji çek û demançeya wî ku pê re bû, demançeya Fethulayê kurxalê xwe (Kurê Xal Mîrza) wek îhtiyat jê werdigre û datîne berîka xwe de. Di wê demê de, di nav siwarê Şikakan de bi sedema bûyereke biçûk hin alozî û tevlihevî dirust bûne, û ew yek fikra Simko bi xwe ve mijûl dike. Di heman demê de heta ku Simko dixwaze egera wê tevliheviya di nava siwarên xwe de bizane û çareser bike, ji nişkêve karwanê trumbêla Rizaxan jî digihîje cem Simko, û êdî derfeta Simko ji bo hemahengî û saxbûn li ser biryara kuştin an nekuştina Rizaxan jê re namîne.

Dema ku Rizaxan digihîje cem Simko, Simko jî bi baweriyeke bêhempa ku bi xwe hebû, bi rêzgirtineke leşkerî bixêrhatina wî dike. Dema ku Rizaxan xwe di nav ewqas siwarên Simko de dibîne, tirsiyaye û wisa dizane ku ketiye nav kemîneke mezin de. Lê ji bo ku xwe ji wê tengaviyê bi silametî rizgar bike, ji trumbêla xwe peya dibe û bêy vê ku tirsa xwe ji Simko diyar bike, bi rûyekî nerm ji Simko re dibêje:

-Min ji mêjve navê te bihîstiye, û min wisa dizanî ku tu kesekî bi temen î, lê xuya ye ku tu gencekî lêhatî yî, û bi zimanê Farsî jî baş diaxivî.

Herwisa piştî vê gotinê, Rizaxan axaftina xwe ya bi Simko re domandiye, û gotiye:

-Ez dixwazim derbarê hin pirsan de, bi te re biaxivim. Ezê îro demjimêr 4`an de herim Kohnê Şehrê, û dixwazim tu jî werî wir.

Bi vî rengî Rizaxan xatir ji Simko dixwaze û piştre bi nerehetî ve derbasî serbazgeha Selmasê dibe. Di heman demê de Rizaxan gelek tirsiyaye, û ketiye gumanê ku renge Simko hêrişî wî bike. Di rewşeke wisa de ew bi vê hêza xwe ya kêm, nikare berhingariya leşkerên Simko bike. Ji ber vê çendê yekser daxwaza hatina hêzên zêdetir ji Tewrêzê  bo Selmasê kiriye.

Li gor nivîsînên Îraniyan, dema ku Rizaxan ji Simko dûr dikeve, nefeseke kûr kêşaye û gotiye; "Em ketibûn nav davik û kemînek ecêb û metirsîdar de". Lewma li Tehmasibî nerehet bûye, û bi gotinên sivik, sexera wî biriye.

Lê Simko piştî derbasbûna Rizaxan, û jidestdana derfeta kuştina wî, bi nerehetî ve li dora xwe zivirî ye, û bi kerb û diltengiyeke mezin, bi dengekî bilind gotiye: "Ez ji Rizo (Rizaxan) re silava leşkerî bidim, û serê xwe jê re biçemînim?! Diviyabû min ew kuştiba". Herwisa gotiye; "Ji niha şûnda çi bête serê min heqê min e. Bêguman wê rojek were ku heman Rizo (Rizaxan) min bikuje".

## *Serhildana Şêx Se`îd*

Li Tirkiyê piştî vê ku şanda nû ya wî welatî bi serperestiya Îsmet Înono di peymana Lozanê (24.06.1923`an) de, bi awayekî fermî pişta xwe dane wan  qewl û sozên ku berê Mistefa Kemal bona mafê gelê Kurd dabûn, lewma Kurd jî ji rêya "Komeleya Azadî û Serxwebûna Kurd" ve ku salekê pêştir ji aliyê Xalid Begê Cibrî û Yusif Ziya û komeke rewşenbîr û kesayetiyên xwedîbandor ên Kurd ve, bi armanca serxwebûna Kurdistanê hatibû avakirin, dest bi çalakiyan dikin. Piştre ev saziya han daxwazê ji Şêx Se`îd dike ku bo serhildana sertaserî li Bakûrê Kurdistanê pêkve kar bikin. Şêx Se`îd daxwaza wan qebûl dike, û mijûlî xwe amadekirina bo vê serhildanê  dibe.

Di wê demê de aloziyek li gundê Pîran a Amedê di navbera cendirmeyên Tirk û komeke Kurdên ku ji dest hikûmeta Tirkiyê reviyabûn de diqewime. Di wê demê de Şêx Se`îd jî li wir bûye, û serbarê vê ku hewl daye pêşiya destbiserkirina wan Kurdan bigre, û wê girjiyê bi awayekî aştiyane çareser bike, lê cendirmeyên Tirk şer dest pê kirine. Ew yek bûye sedema wê ku gundiyên Pîranê jî hêrişî wan cendirmeyên Tirk bikin û hindek ji wan bikujin û çend kesan jî dîl bigrin. Piştre Tirkan jî ev bûyera han wekî hêcetekê bona destpêkirina hêrişa li ser Kurdan û girtin û kuştina wan bikar anîne..

Bi vî awayî serhildana "Komeleya Azadî û Serxwebûnê" û Şêx Se`îd zûtir ji dema diyarîkirî dest pê kiriye. Bi vî halî jî di  destpêkê de serhildêrên Kurd karîne di heyameke kurt de çendîn bajar û herêmên Bakûrê Kurdistanê ji destê Tirkan rizgar bikin, û serhildan berfirehtir bibe, û  xelkeke zêde li dewra wê bicive.

Bi sedema vê ku amadekariyeke serûber bo serhildanê nekiribûn, lewma Tirkan karîne di heyama çend mehan de, bi hêrişeke berfireh li ser herêmên curbicur serhildanê têk bişkînin, û dest bi operasiyona girtin û kuştina Kurdên serhildêr bikin.

Tirkan di kelekela serhildanê de karîbûn du serkirdeyên yekem ên "Komeleya Azadî û Serxwebûnê" bi navên Xalid Begê Cibrî û

Yusif Ziya destbiser bikin, û li 14.04.1925`an de li bajarê Bitlîsê wan îdam bikin. Herwisa desteya Seyîd Ebdulqadir û Eyûbê Sêverekî û Dr. Fuad jî, ji aliyê Tirkan ve li Amedê tên îdamkirin. Di heman demê de Zilkîf Axayê deşta Gevran û hevalên wî li bajarê Xarpûtê, ji aliyê Tirkan ve têne bidarvekirin.

Di operasiyonê de Şêx Se`îd jî digel 48 kes ji serokhoz û serkirdeyên serhildanê ji aliyê Tirkan ve têne girtin, û piştî vê ku Şêx Se`îd û hevalên wî di dadgeha leşkerî a Tirkan de, berevaniyeke mêrxasane ji mafên neteweyî ên gelê xwe dikin, û teslîmî daxwazên Tirkan nabin, hukmê bidarvekirinê bi ser wan de jî tê sepandin, û li rêkevt 28.06.1925`an li Amedê têne bidarvekirin. Tirkan termê Şêx Se`îd û hevalên wî li goreke bikom de veşartine, û piştre avahiyeke hikûmetê li ser wî cihî çêkirine, da ku tu kes nezane ku ew term li kuderê hatine veşartin.

Tirk li doma pîlana qirkirina Kurdan biryara koça bizorî a Kurdan didin, û li piraniya herêmên Bakûrê Kurdistanê dest dikin bi girtin û veguhastina Kurdan bo herêmên dûrdest ên Anadolê.

Hêjayî basê ye ku piştî têkçûna serhildana Şêx Se`îd beşek ji serkirde û têkoşerên naskirî ên serhildanê bi serkirdayetiya: Silêmanê Ehmed bavê Ferzinde Begê Hesenî digel Keremê Qulaxasî, Xalid Begê Hesenî, Şêx Elîriza kurê Şêx Se`îd, Ferzinde Begê Hesenî, û nêzîk 200 şervanên serhildana Şêx Se`îd, dibin du deste û berê xwe didin Rojhilatê Kurdistanê. Serbarê hewla pêşgirtina wan ji aliyê xelkên nêzîk li hikûmeta Tirk, û herwiha piştî şerkirina wan digel binkeyeke leşkerî a sînorparêzê Îranê, dikarin derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibin û xwe bigehînin herêma Makûyê û li "Kirrê Tendûruk" û navçeya "Kilîse Kend" cihgir bibin.

Dema ku Tirkan zaniye ew derbasî Îranê bûne, derhal ji karbidestê Îranê xwestine ku wan radestî Tirkan bikin. Karbidestê Îranê jî destpêkê Silêmanê Ehmed û çend serkirdeyên din gazî dikin gundê "Sûra Salar", û piştre tevî hevalên din, wan li hewşa avahiya kelhê de kom dikin, û daxwazê li wan dikin ku çekên xwe radest bikin. Hevdem hêzeke Îraniyan bi çekên mîtraloz li wî cihî cihgir bûne. Silêmanê Ehmed û Keremê Qulaxasî û dehan kes ji hevalên

wan ku amade nabin çekên xwe radest bikin, di kelekela gengeşeya wan de, ji nişkêve dikevin ber regbara fîşekên leşkerên Îranê, û di encam de Silêmanê Ehmed û Keremê Qulaxasî û çendîn kes ji hevalên wan di cih da şehîd dibin, û beşek din jî xwe rizgar dikin. Ferzinde Beg û çend kesên din jî bi birîndarî têne êxsîrkirin. Piştre bi sedema hewlên Simkoyê Şikak digel Îraniyan, Ferzinde beg û hevalên pê re têne azadkirin, û heyamekê li cem Simko dimînin, piştre beşek ji wan vedigerin Bakûrê Kurdistanê û di dawiya sala 1926`an de Ferzinde Beg û Ebdulbaqî û Xalis Beg tevlî serhildana Araratê dibin, ku wê demê ji aliyê Biroyê Heskê ve dest pê kiribû. Beşeke din jî heya heyamekê li cem Simko li gundê Howesnê de dimînin û piştre vedigerin Bakûrê Kurdistanê.

Derheqê bûyera kuştina Silêmanê Ehmed û Keremê Qulaxasî û hevalên wan ji aliyê leşkerên Riza Şahê Îranê li herêma Makûyê, çendîn kilam û stranên hemasî hatine strîn, ku bandor û kûrahiya wê terajidiyê, û herwiha mêrxasî û qehremantiya şervanên serhildana Şêx Se`îd bi awayê folklur tînin ziman.

**Belgeya hejmar: 44**

*Belavkirin hat pejirandin 2000 / 04/17: CIA-RDP79-01009A002500030006-6*
*Belgeya rûpela 19, rûpela PDF 23*
*IV. Tevgerên Neteweyî yên Kurd*
*A. Rêjeya Netewparêziya Kurd*

Tevgerên neteweyî yên Kurdan û serhildanên berdewam ên wan, zêdetir ji sed salan e ku dom hene. Lê di dawiya şerê cîhanî yê yekem de, tovê nasyonalîzma Kurdî ya modern hate çandin.

Digel têkçûna Tirkiyê di sala 1918`an de, peymana Sêvr di sala 1920-î de derfet bo Kurdan pêk anî. Vê peymanê hebûna birêveberiyeke gelek pêşkeftî bo Kurdan pejirand, û daxwaza bi fermînasîna mercdar a Kurdistaneke serbixwe kir, ku ji wan herêmên ku îro beşek ji başûra rojhilata Tirkiyê ne, pêk hatibû.

Lê peymana Sêvrê tu carî nehate cîbicîkirin, û di Tîrmeha 1923`an de ew bi peymana Lozanê hate guhertin, û hebûna Kurda hat piştguhxistin. Li salên piştî wê peymanê, xewna Kurdistanek serbixwe bi şer û pevçûnên di navbêra Kurd û hikûmetên Îran, Îraq, û Tirkiyê de zindî hate ragirtin. Siyaseta Tirk li ser bişavtina Kurdan di 1923`an, û dîsa di sala 1925'an de, bi berxwedana çekdarî ya Kurd re rûbirû ma.

Piraniya penaberên wan serhildanan bi awayekî perîşan reviyan Sûriyê. Li wir jî rêkxistina Xoybûnê hate damezirandin, bona ku xebata serxwebûnê bidomîne. Di wê salê de li çiyayê Araratê û li Tirkiyê hinek serhildan hatin lidarxistin. Piştre ew tevger di sala 1930-î de têk çû, û Îhsan Nûrî Paşa neçar ma ku koçberî Tehranê bibe. Di sala 1937`an de dîsa Kurdan li dijî siyaseta bişavtinê ya ji aliyê Tirkan ve serî hildan. Nêzîkî salekê pevçûn li herêma Dêrsîmê berdewam kir, wate ew cihê ku Kurdan îdia kirin ku jin û zarokên wan hatin komkujkirin, û piştre mêr ji çiyayan vegeriyan.

**Belgeya hejmar:45**

*"Research Article published on International Crimes and History Journal, 31st October 2018 (Publication Number 19, pages 177-242) written by Moumdjian, Gabaret K. "Armenian Involvement in the 1925 (Ararat) and 1937 (Dersim), Kurdish Rebellions in Republican Turkey: Mapping the Origins of Hidden Armenians".*

Babeta Lêkolînê li ser kovara Suçên Navnetewî, li rêkevta 31'ê Cotmeha 2018'an, (Hejmara weşanê 19, rûpelên 177-242) ku ji hêla "Moumdjian" û "Gabaret .K" ve hatiye nivîsîn. "Tevlîbûna Ermeniyan li serhildanên Kurdan li Komara Tirkiyê, li sala 1925`an (Ararat) û 1937 (Dêrsîm): Nexşeyên Qewmên Ermeniyên veşartî, rûpelên 183 û 184, beşa sêyem sala 1925`an:

Rûpel 183, Beşa 3emîn

1925: Serhildana Şêx Se`îdê Pîran û têkiliya wî bi Ermenîyan re:

Di warê dîroka Kurdolojiyê de lihevkirinek berfireh heye, ku di nava serhildanên Kurdan de, ya ku pirtir tê ziman, serhildana Şêx Se`îdê Pîran li 1925`an e, ku li Komara Tirkiyê biyaveke ayînî hebû. Mistefa Kemal digel hilweşîna xelafetê li sala 1924`an, û destnîşankirina formeke rojavayî a civakê, mafên bingehîn ên heşîmeta eşîrên Kurd li beşa başûrê rojhilatê Komara nû berevajî kir (rastî şikestê kir).

Rûpela 184, Beşa 5emîn

Di 8`ê Sibata 1925`an de serhildanek Kurd li wilayeteke (parêzgeheke) Rojhilatê Tirkiyê dest pê kir. Armanca Serhildana Şêx Se`îd ew bû ku ji rêya leşkerî ve serxwebûna Kurd ragehîne.

Serhildanê qasî 50 heta 60 kîlometra çargoşe, wate heya Gola Wanê bi xwe ve girt. Serhildan di Nîsana 1925`an de têk çû, û li Diyarbekirê rêberên wê jî hatin bidarvekirin.

Xala balkêş bo nivîsînê ev e ku, piraniya Ermeniyên rojavayî -wate ew Ermeniyên ku piştre wek Ermeniyên ku bibûne Kurd, yan bibûne Îslamî dihatin nasîn- beşdarî serhildanê bûn. Ji van kesên

navdar “Boghosê Çemîzgezakê” bû, ku di 26`ê Îlonê de bi mirinê hate mehkûmkirin. Karbidestên Tirk serokatiya kempeyneke medyayî kirin, û bal kişandin ser beşdarbûna milîtanên Ermenî, û Asûriyên di nav serhildana Şêx Se`îd de.

## *Serhildana nakokiyên di navbera Simko û Emerxan de*

Dema ku serokêlên Şikakan û nemaze Qotaz Mamedî, hest pê kirine ku dirêjîkêşana rewşa aloz a di navbera Simko û Emerxan de, wê bikêşe şerekî wêranker di nav Şikakan de, neçar dimînin ku herin cem Simko, û ricayê jê bikin ku razî bibe bo vexwandina Emerxan bo gundê Howesnê ya herêma Somayê, û çareserkirina nakokiyên di navbera xwe de.

Di serî de Simko dixwaze bi rêya hêza leşkerî Emerxan neçarî xweradestkirin û stûxwariyê bike, lê di heman demê de dizanî Emerxan ne ew kes e ku wisa bi hêsanî xwe raspêre. Lewma Simko ew daxwaza Qotaz û serokêlên xêrxwaz qebûl kiriye û bo vê mebestê, du qasidên xwe yên bi navên Hacî Etmanî û Emkê Nê`imetî ku ji dijberên Emerxan bûne, ji bo gehandina peyama xwe dişîne gundê Zindeştê cem Emerxan.

Lê Qotaz Mamedî û Sertîp Mamedî dizanîn ku ew du qasidên Simko bi sedema vê ku têkiliyên wan bi Emerxan re nebaş in, ew nikarin erk û wezîfeya anîna wî ya ji bo Howesnê bi cih bînin. Lewma daxwaz ji Simko kirine ku baştir e du kesên hinekî nerm û bêalî, wê peyama wî bo Emerxan bibin, lê Simko daxwaza wan qebûl nekiriye û her ew du kes şandine cem Emerxan.

Bi vî awayî qasidên Simko di demeke wisa hestiyar de çûne gundê Zindeştê cem Emerxan, û herçend Emerxan bi hatina van du kesan matmayî dimîne, lê dîsa jî çi nerehetî neaniye rûyê xwe, û bi germî pêşwaziya wan kiriye.

Dema ku Qasidan peyama Simko ya ji bo hatina Emerxan bo Howesnê gehandine wî, serbarê vê ku Emerxan bi wergirtina peyama Simko dilxweş bûye, lê di heman demê de ketiye nava dudiliyê de, ka biçe an neçe!. Piştî fikirîn û şêvirmendiya bi kesên derdora xwe re, biryarê dide ku ya baş ew e biçe Howesnê li cem Simko, û dibe ku bikare derbarê nakokiyên heyî de Simko serwext û razî bike.

Bi vî awayî Emerxan û ew qasid ji Zindeştê bi rê dikevin, û

du birayên wî jî bi navên Hacî Yûsiv li gundê Sîdan, û Husên jî ji gundê Memekanê tên, û tevî dehan siwarên xwe ber bi Howesnê ve diçin. Di heman demê de Emerxan ji bo tedbîrwergirtina li hember egerên pêşbînînekirî, fermandeyê xwe yê bi navê Letîf Çawiş tevî hêzeke Kardaran li Memekanê dihêle.

Li ber vê ku qasidên Simko bawer nedikirin ku Emerxan wê wisa bi hêsanî peyama Simko qebûl bike û bihête Howesnê, nîgeran dibin ku heger Emerxan û Simko li hev bikin, wê hingê rûyê wan yê rastî eşkere bibe. Lewma herdu qasid ji bo ku Emerxan ji hatinê dilsar bikin, bi hev re şêvirîne, ka dikarin çi bikin. Hacî Etmanî ku berê bi egera alîkariya bi Ehmed Axa re ji aliyê Simko ve, bi piştevaniya Emerxan hatibû girtin û cezakirin, rû li `Emkê Nê`imetî dibêje: “Ger ez gotinekê bêjme Emerxan, ew baweriyê bi min nake, ya baş ew e ku tu bixwe pê re biaxivî, û wî ji çûyîna bal Simko dilsar bikî”. Emkê gotina Hacî Etmanî qebûl dike, û ji Emerxan re dibêje: “Rast e ku em qasidê Simko ne, û me tenê peyama Simko gehandiye te, lê heger li ser gotina me tu herî cem Simko, û li wir belayek were serê te, hingê em ne berpirsyar in, û tenê li ser me ferman bû ku em vê peyamê bigehînin te”.

Dema ku Emerxan vê gotina Emkê dibihîze, hinekî difikire û cardin dikeve dudiliyê, ku biçe cem Simko yan neçe. Lewma Emerxan cardin bi birayê xwe Husên û hin giregirê Kardaran re dişêvire. Husênê birayê Emerxan dibêje; “Heger wisa ye, heta sozeke bawerpêkirî ji aliyê Simko ve negihîje me, çûna me ya bal Simko wê bê encam be”. Emerxan jî vê gotina birayê xwe û serokêlên Kardaran qebûl dike, û ji biryara xwe bo çûyina cem Simko paşgez dibe û ji qasidan re dibêje:

“Bêjne Simko, ew baş dizane ku Ehmed Axayê birayê wî, û hin serokêlên derdora wî, keyfa wan ji min re nayê, û her wan kesan berdewam derbarî min de gotinên nerast li cem Simko kirine. Lewma nabe Simko baweriya xwe bi gotinên wan kesan bîne”. Herwisa Emerxan di berdewamiya axaftina xwe de ji qasidan re dibêje:

“Ji Simko re bêjin, ji bo ku em di paşerojê de şermezarî hevdu nebin, bila Simko sozek bawerpêkirî ji bo me bişîne, ku ji niha

şûnda wê hurmeta me wekî berê bal wî parastî be, hingê ezê jî bi êla xwe ve cardin bikevim xizmeta wî".

Dema ku qasid wê peyama Emerxan digehînin Simko, ew gelekî hêrs dibe, û fermanê dide hêzeke şervanên xwe ku hêrişê bibin ser gundên êla Delan li herêma li jêr kontrola Emerxan. Hêzên Simko piştî girtina çend gundên ji xelkê vala ên êla Emerxan, berê xwe didin gundê Memekanê, ku fermandeyê hêzên Emerxan Letîf Çawiş li wir çeper girtibû.

Ji aliyekî din ve, Simko li gor lihevhatinekê ku berê bi hêzên Îranî re hebû, daxwazê ji karbidestên hikumeta Îranê dike, ku ew jî, ji bajarê Selmasê ve, hêrişî gundê Zindeştê bikin. Dema ku Emerxan vê rewşê dibîne, dizane ku encama şerê tevî Simko û hikûmeta Îranê, ji bilî şikesta wî tu encameke din nabe, lewma ferman daye siwarên xwe ku bêyî şer, ji dorpêça leşkerê Îranê derbikevin, û ji wan deverên ku Simko li wir e, dûr bikevin.

Digel vê biryarê Emerxan tevî hejmarek ji siwarên xwe, karîne xwe bi rêyeke veşartî ji dorpêça leşkerên hikûmetê û ên Simko rizgar bikin, û xwe bigehînin herêma Tirgewer, ku dikeve ser sînorê Îran û Tirkiyê.

## Belgeya hejmar: 46

PUBLIC RECORD OFFICE
Fo 248/1375 23487
COPYRIGHT - NOT TO BE REPRODUCED PHOTOGRAPHICALLY WITHOUT PERMISSION

Extract from Report No. 11 (Arbil Area), dated 23rd November, 1926, received from the Special Service Officer, Mosul.

----------

PERSIA.

3. SIMKO.

(a) Salar-i-Dowlah, when starting the rebellion in the Kermanshah area, communicated with Simko and other Kurdish chiefs asking their assistance. Simko at first took no action until Salar-i-Dowlah and the Pishdar had some success.

(b) Simko then wrote to the Turks and asked their assistance to fight against the Persians. The Turks sent two Turkish officers dressed in Kurdish dress who interviewed Simko. One of these officers was named Majid Eff. Yuzbashi. The two Turkish officers said that they were ready to give him help, but he would have to interview Sulaiman Sabri Bey.

(c) Sulaiman Sabri then came by aeroplane to a place near the frontier where he interviewed Simko and promised to supply him with a force of one Division and offered him ammunition.

(d) Simko also requested help from the Bolsheviks who promised to render him every possible assistance.

(e) Simko, relying on both the Turkish and the Bolshevik promises, started the rebellion by sending a party of the Herki and Barda Sori tribes of Persia to attack Ushnu. They looted the bazaar and burnt several houses.

(f) In the meantime his lashkar, consisting of few Kurdish refugees of the Hassanan and his own followers, occupied Kuhna Shehr (Maunsell sheet No.20 Sq. 23) and then moved towards Dilman. He fought

for/

PUBLIC RECORD OFFICE
Reference:-
FO 248/1375 23489
COPYRIGHT - NOT TO BE REPRODUCED PHOTOGRAPHICALLY WITHOUT PERMISSION

134

H. C. F./65 A. 22

Reference to previous correspondence :-

SECRET.

No. S.O. 2933. THE RESIDENCY,

Baghdad, the 13th December, 1926.

BRITISH LEGATION
23 DEC 1926
TEHRAN

Sir,

I have the honour to transmit to you, for information, 4 copies of

the papers noted below on the subject of Simko's attack on Ushnu.

I have the honour to be,

Sir,

Your most obedient, humble servant,

(Sd.) H. Dobbs.

H.B.M's Minister,
Teheran.

| Date. | Subject. |
|---|---|
| 23/11/26. | Extract from Report No. 11 (Arbil Area), received from the Special Service Officer, Mosul. |

T.C.

**Ji rapora hejmar 11 (Navçeya Hewlêr) hatiye wergirtin.**

23.11.1926

ji aliyê efserê xizmetguzariya taybet a Mûsilê ve hatiye şandin.

Fars (Îran)

3. Simko

A)-Dema ku Salar El-dewle serhildan li Kirmanşahê dest pê kir, têkilî bi Simko û serokên din ên Kurd re danî, û daxwaza berxwedanê kir. Destpêkê Simko tu karek nekir, heya ku Salar El-dewle û xelkê Pişderê hinek serkevtin bi dest xistin.

B)-Piştre Simko nameyek bo Tirkan nivîsand, û daxwaza alîkariyê bo şer li dijî Farsan ji wan kir. Tirkan du efserên Tirk bi kincên Kurdî şandin da ku hevdîtinê bi Simko re pêk bînin. Yek ji wan efseran Mecîd Yûzbaşî bû. Wan du efserên Tirk gotin ku, ew amade bûn alîkariya wî bikin, lê diviya ku wî Silêman Sebrî Bey bidîtiba.

C)-Piştre Silêman Sebrî bi balafirekê hate nêzî sînor, ew cihê ku hevdîtin bi Simko re pêk anî, û pêşniyara dabînkirin çek û teqemeniyan û bihêzkirina Simko da.

D)-Simko herwiha daxwaza alîkariyê ji Bilşiwîkan kir ku soza dana hemû alîkariyên gengaz û mumkin dabûne Simko.

Y)-Simko ku pişta xwe bi sozên herdu aliyên Tirk û Bilşiwîk girêdabû, dest kir bi şoreşê, û bi rêya şandina beşek ji eşîreta Herkî û Birdost ên li herêma Fars (Îranê) bona hêrişkirina li ser Şinoyê, wan bazar talan kirin û çendîn mal şewitandin.

F)-Di heman demê de hêza wî ku pêk hatibû ji awareyên Kurd li Hesenan û alîgirên wî bixwe, Kevneşehir (Bajêr) dagîr kirin û piştre ber bi Dîlemanê meşiyan. Wî şer dikir bo....

Ev belge ya Birîtanyayê ye, jiber ku mohra nûneratiya Birîtanyayê li Tehranê pêve ye, û rêkevta wê jî 23.12.1926`an ne.

**Belgeya hejmar: 47**

*https://drive.google.com/file/d/1l4jAm1NEWUEOuj60GXzMIsEyU00LAU-N/view?ts=5eae6685*

283

**SHIKAK**

| 5 | | | 6 | | 7 |
|---|---|---|---|---|---|
| Armed Men. | | | Rifles. | | Notes. |
| Horse. | Foot. | Total. | Modern. | Old but Serviceable. | |
| 1,075 | 1,025 | 3,100 | 1,100 | — | Sedentary, pastoral and agricultural. *Religion.*—Sunni. *Internal Cohesion.*—Cohesion has suffered within the last few years owing to the rivalry between Simko and Umar Khan. The Persian Government has encouraged the latter to act as a counterpoise to Simko, whose attitude is always rebellious. Simko was in 1928 a refugee in Turkey, being located at Bajirga, north-east of Diza, near the Persian frontier, with a small following of some 100 men. Umar Khan is recognised as chief by the Persian Government, but he is not strong enough to command the allegiance of the whole tribe. The smaller chiefs fear Simko, and keep on good terms with him pending his return to the tribe. *External Relations.*—Simko is related to Saiyid Taha, on whose land in 'Iraq he was living in 1926–27. Friendly to the Herki of the Mawana area. Keeps in touch with Babekr Agha of the Pizhder. The tribe is the bane of the non-tribal and Christian inhabitants of the Salmas plain and Dilman. *Political Attitude.*—Simko, a notorious brigand, prior to his flight, controlled the tribal policy towards the Persian and Turkish Governments. He was always in more or less open rebellion against the former, while keeping on reasonable terms with the latter. A violent pro-Kurd, both Turks and Persians undertook operations against him in 1926, and he was forced to flee to 'Iraq, where he remained for two years before proceeding to Turkey. The tribe is now quiet. Simko protests that he is pro-British, but his real attitude is probably confined to being pro-Simko. *Punitive Measures.*—Would necessitate the occupation of Dilman, Salmas and Urumieh. *Fighting Ability.*—The tribe has a reputation for quick raiding. The |
| 200 | — | — | — | — | |
| 350 | — | — | — | — | |
| 150 | — | — | — | — | |
| 50 | — | — | — | — | |
| 200 | — | — | — | — | |
| 50 | — | — | — | — | |
| — | — | — | — | — | |

Rapora leşkerî a Birîtanyayê
Rûpela Belgê 311, Rûpela Pirtûkê 283, Hemû Bendên Rûpelê, ŞIKAK

Rewşa Aborî: Ajeldarî û cotkarî.
Ol: Sunî

Yekîtiya navxweyî-Bi sedema rikeberiya di navbera Simko û Emerxan de, yekîtiya wan di çend salên bihorî de zirar dîtiye. Hikûmeta Farsî ji ber wê ku Simko kesekî serhildêr e, wan Emerxan han dan ku wek cênişînê Simko tevbigere. Simko di sala 1928`an de li Tirkiyê penaber bû, li Bajêrge Bakurê-Rojhilatê Dizê, li nêzî eniya Farsî, bi komeke biçûk a 100 kesên alîgirên xwe re li wir cihgîr man.

Emerxan ji hêla Hikûmeta Farsî ve, wek serokek hat pejirandin, lê ew qas bihêz nine ku bikare serkirdatiya yekîtiya hemû eşîran bike. Serokên biçûk ji Simko ditirsin, û pêwendiya xwe bi wî re baş dikin, û li benda vegera wî bo nav eşîra wî ne.

Têkiliyên Derveyî - Simko bi Seyîd Taha re têkildar e, û bi wî re li ser axa wî, wate li Îraqê ji sala 1926-1927`an jiyan kir. Digel Herkiyên herêma Mawana heval e. Têkiliyên wî ên berdewam bi Babekr Axayê Pişder re hene.

## *Plana Simko bo vegerandina Emerxan û destbiserkirina wî*

Dema ku Simko zaniye Emerxan ji dorpêça leşkerên wî û yên hikumeta Îranê rizgar bûye, hêrs bûye û zaniye ku êdî nikare bi darê zorê Emerxan destbiser bike. Herwisa nîgeranî vê jî bû ku di paşerojê de Emerxan ji bo wî bibe arîşeyek micid. Vêca ji bo girtina Emerxan taktîkeke din girtiye pêş xwe.

Simko ji bo bicihanîna vê mebestê têkiliyê bi serokêlên devera Tirgewer re dadinê, û ji bo gehandina peyama xwe, Behrî Begê kurê Temir Axa digel çend siwaran ji bo dîtina serokê êla Begzadeyan Nûrî Beg, û Hacî Axayê mezinê Herkiyan li herêma Tirgewer erkdar dike.

Simko di peyama xwe de daxwazê ji wan serokêlan dike, ku bila ew ji bo vegerandina Emerxan pê re alîkar bin, û li ser navê wî ji bo ewlehiya jiyana wî, dikarin sozê bidin wî. Dema ku Behrî Beg gihîştiye gundê Mawane, û peyama Simko gehandiye Nûrî Beg û Hacî Axa, û bona bawerpêkirina wan, li ser navê Simko ji wan re sond xwariye, û ji wan daxwaz kiriye ku ew bi vê soza Simko dayî, baweriya xwe bînin, û Emerxan bi vegerîna cem Simko razî bikin. Piştî sondxwarina Behrî Beg, ew jî têne ser vê baweriyê, ku Simko wê digel Emerxan pêk were. Lewma Behrî Beg, Nûrî Beg û Hacî Axa, bi Emerxan re dipeyivin, Emerxan jî gotina wan naşkîne, û vegera xwe bo cem Simko erê dike.

Emerxan serbarî nerazîbûna Husênê birayê xwe, ku baweriya wî bi wê soza hatî dayîn nebû, lê daxwaza Nûrî Beg û Hacî Axa qebûl dike, û tevî Nûrî Beg, Hacî Axa û Behrî Beg ku nêzî 400 siwaran bi wan re bûn, digihîjin nêzî gundê Howesnê.

Emerxan berî ku bigihîje Howesnê, bi armanca rêzgirtina ji Simko, wî ji hatina xwe agehdar dike. Simko jî berî hatina wan, serbarî wê soza ku dabû Nûrî Beg û Hacî Axa, bi merema destbiserkirina Emerxan, serokêlên Şikakan vexwendibûn, û ji wan re gotiye; “Nabe dema ku Emerxan digihîje vir, siwarên wî li cem hev bimînin. Ji wan re bibêjin ku gundê Howesnê têra ragirtina

hemû mêhvanan nake, ji ber vê çendê bila siwar li ser gundên derdorê de bihêne belavkirin, û piştî parvekirina siwaran, dest bi ser çek û teqemeniyên wan de bigrin".

Gava Emerxan tevî Nûrî Beg, Hacî Axa û Behrî Beg, digihîjin gundê Howesnê, çend mêtran dûrî cihê Simko, ji hespên xwe peya dibin, û wekî rêzgirtin ji Simko, bi peyatî ber bi aliyê wî ve diçin.

Dema Emerxan û du birayên wî yên bi navên Husên û Yûsif, digihîjin cem Simko, wekî rêzgirtin serê xwe diçemînin û li ser piyan radivestin.

Simko îzna rûniştinê dide wan, û berê xwe dide Emerxan, û jê dipirse: "Emê! ka bêje, min çi xirabî gel te kiriye, ku tu wiha ji min qaçax bûyî?

Di wê demê de ku çend serokêlên Şikakan jî li wir bûne, Emerxan di bersiva Simko de gotiyê: "Axa, ez xwe xizmetkarê te dizanim, û ji te qaçax nebûme û nabim jî. Lê ez ji tirsê qehr û sizadana te reviyame. Jiber ku ew kesên li derdora te berdewam ji min re digotin; Axa biryar daye ku bi sizayê destbirrînê, te ceza bike. Yek ji wan kesan, her ev Keleşê Şipîranî ye, ku niha li rex te rûniştiye".

Gava Emerxan wisa dibêje, Keleş di cihê xwe de tab nekiriye û yekser gotiye; "Ev Emerxane çi şol bi xelkê ketiye, û basa xelkê diket, le`inet li derewkeran bît". Piştî van gotinan bi îşareta Simko, du kes li ber çavên civata dîvanê, bi hêrs ve ji Emerxan re dibêjin; "Emê! rabe, divêt tu û Hiso û Ûso, herne zîndanê. Herwisa li ser fermana Axa, ji bilî şeşxwera (demançeya) di ber te de, divêt hûn hemû çek û teqemeniyên xwe jî radestî me bikin".

Emerxan digel her du birayên xwe serbarî vê ku li hember vê kiryara Simko matmayî dimînin, lê dîsa jî neanîne rûyê xwe, û bi bêdengî çekên xwe danîne, û berê xwe dane zîndanê. Dema diçin, dibînin ku zîndana wan paga hespan e, û çend nobetçiyên Simko jî li wir nobetê digrin. Di heman demê de li gor plana ku Simko pêştir danîbû, siwarên Emerxan, ên li gundê Howesnê û derdorê jî, ji aliyê alîgirên Simko ve têne çekkirin.

Piştî birina Emerxan û birayên wî bo zîndanê, (ku page kiribûn

zîndan) hinek serokêlên Şikakan ku kerbê wan li Emerxan vebûye, bi vê yekê dilxweş bûne, lê yek ji wan kesên ku bi vê kiryara Simko dilgiran bûye, Qotaz Mamedî bû, ku li rûbirûyê Simko nerazîbûna xwe ya derheqê vê kiryara wî aniye ziman.

Hêjayî gotinê ye ku dema Simko fermana çekkirina Emerxan û birayên wî dabû, ji zêrevanan re gotibû; "Şeşxwera (demaçeya) Emerxan jê nestînin, bila digel xwe bibe". Tê gotin merema Simko jî ew bûye, ku piştî vê riswakirinê, belkî Emerxan xwe bikuje, û bi vî awayî hem ji nîgeranî û serêşiya Emerxan rizgar bibe, û hem jî xwekuştina Emerxan nekeve stûyê wî de.

Lê dema ku Emerxan difikire çima şervanên Simko, ew şeşxwer (demançe) jê nestandine, dizane ku meremeke wisa di vî karê Simko de heye, lewma wî jî tiştek nekiriye.

Ji aliyekî din ve gava Nûrî Beg, Hacî Axa û hin serokêlên Şikakan vî karê Simko dibînin, gelekî dilgiran û matmayî dimînin, û digihîjin wê baweriyê ku wan xiyanet bi Emerxan kirine. Lewma digel vê ku dema firavînê jî bûye, lê ew bêyî ku xwe gîro bikin, li cem Simko radibin, û ji Howesnê derdikevin, û ber bi Tirgewer bi rê dikevin.

Piştre girtina Emerxan ji aliyê Simko ve, dibe cihê dilgiraniya alîgir û êlên girêdayî bi wî, û ji tirsê hêrişa leşkerên Simko, xelkê nêzî Emerxan ji gundên xwe ve, penaberî gundên Eceman yên li derdora Urmiyê dibin.

## *Radestkirina Emerxan bi dewleta Îranê ji aliyê Simko ve*

Dema ku Simko difikire, biryardayîna li ser sizadana Emerxan û birayên wî, karekî hestiyar e, serbarî vê ku ew bixwe xwedî deshilat û xwedî biryar bûye, lê pêdivî dizane ku bi çend serokêlên Şikakan yên wekî Temir Axayê xwe Simko, Mihoyê Mîro, Mihê Etmanî, Evdalê Hiyo, Ewdiyê Mîrza Mihemed û Mihemedê Tewrêzî re bişêvire, û nerîna wan jî werbigire.

Ew kesên ku Simko bi wan re şêviriye, du deste bûne. Hinek ji wan desteya Ehmed Axa bûne ku di berê de hevrikiya wan bi Emerxan re hebûy. Desteya din jî li serve bi Simko re bûn, lê di bin re jî li dijî Simko bûn, û dixwestin bi kuştina Emerxan, Simko bi yekcarî lawaz bibe û ji nav biçe. Lewma her du desteyan razîbûna xwe li ser kuştina Emerxan bi Simko ragehandine.

Lê di nav wan her du desteyan de, kesek bi navê Mehmûd Axa ku bi Mamkê dihate naskirin, û ji kesên nêzî Simko bû, li dijî vê biryarê derdikeve, û ji herdu desteyan re dibêje; “Hûn baş dizanin ku Emerxan di nav Şikakan de, kesekî xuya û xwedî pêgeh e. Evan çend rojên ku me Emerxan xistiye zîndanê, gelek êlên Şikakan û Begzadeyan, bi vê kiryarê nîgeran bûne, û li benda biryara dawî a Simko ne. Heger biryara Simko ya derbarî Emerxan de neyînî be, û em Emerxan bikujin, hingê piraniya serokêlên Şikakan wê li dijî me serhildaneke mezin pêk bînin. Lewma ya baş ew e ku em Emerxan radestî hikûmeta Îranê bikin, û diyar e bi egera wê rabihoriya Emerxan ya ku bi dewleta Îranê re heye, û ewqas ji leşkerên wan kuştine, wê bi misogerî ji aliyê hikumeta Îranê ve bê kuştin, û hingê berpirsyariya kuştina wî jî nakeve stûyê Simko”.

Ew gotinên Mamkê bandorek berbiçav li Simko dike, û Simko fermanê dide neferên xwe, ku herin Emerxan bînin cem wî. Dema ku Emerxan tînin, Simko bi nerehetî ve dibêje; “Emê! tu baş bizane, ku kuştina te misoger e. Lê dixwazim nerîna te bizanim, ka ez te bi destê xwe bikujim, yan te radestî dewleta Îranê bikim?”.

Emerxan jî jiber ku baş Simko dinase, û dizane hekî ew çi tiştekî

bêje, Simko wê berevajî gotina wî biryarê bide, lewma ji Simko re dibêje; “Ger we biryara kuştina me dabe, ya baş ew e ku hûn bixwe me bikujin. Heger hûn me bikujin, her hûnê termê me jî binax bikin. Lê hekî hûn me radestî dewleta Îranê bikin, tu dizanî ku ji ber ew rabihoriya me ya bi Îraniyan re heyî, ew têhniyê xwîna me ne, û hem wê me bikujin, û hem jî wê bi mirîtî me riswa bikin”.

Ew gotinên Emerxan nerîna Mamkê tîne bîra Simko, û ji Simko re diyar dibe ku Emerxan ji radestkirina xwe bo dewleta Îranê ditirse. Lewma Simko biryar daye ku wî radestî dewleta Îranê bike.

Simko ji bo radestkirina Emerxan bi dewleta Îranê, bi rêya telegrafê karbidestên Îranê yên li bajarê Selmasê agehdar dike, û ji wan re dibêje; “Me Emê (Emerxan) girtiye, û em dixwazin wî bo sizadayînê, radestî we bikin.” Herwisa ji wan xwestiye ku bo wergirtina Emerxan, yekîneyeke serbaz û qezaqên xwe bişînin gundê Howesnê.

Îdareya Selmasê jî bilez bi fermandehiya efserekî xwe, serbaz û qezaqan dişîne Howesnê. Lê berî ku ew bigihîjin wir, Simko ferman daye fermandarekî xwe yê bi navê Îsko Ruvî, ku ew û çend siwarên Ewdoyî, Emerxan û birayên wî ji bo radestkirina bi Îraniyan, ber bi Selmasê ve bibin, û di rê de radestî Îraniyan bikin.

Gava siwarên Simko, Emerxan û du birayên wî bi destên girêdayî û bi awayekî kirêt siwarî hespan dikin, lingên wan li bin zikê hespan ve girê didin, û ber bi aliyê Selmasê ve dibin, hin ji Şikakên ku ew dîmenê kirêt dîtine, êdî ji Simko û ji deshilatdariya wî dilsar bûne.

Dema ku Siwarên Simko, Emerxan û birayên wî Husên û Yûsif, ji herêma Somayê bi rêya Bastekavayê ber bi Çarî û Selmasê ve dibin, di rê de rastî şandeya dewleta Îranê tên, û li wir Emerxan û birayên wî radestî leşkerê Îranê dikin.

Piştî şandina Emerxan û birayên wî, Simko û civata xwe demek dirêj bêdeng mane. Piştre ji nişkêve Simko ew bêdengî şikandiye, û bi dengekî bilind û bi xembarî ve gotiye; “Weyîîî min çi şaşiyek mezin kir! Min çawa Emê (Emerexan) radestî dewleta Îranê kir! Eva duyem şaşî ye ku ez dikim. Ya yekem, gava min li Selmasê pêşwazî ji Rizo (Rizaxan) û kabîneya wî kir, û min ew nekuştin, û qedera

Îranê neguherî. Ya din jî ev e ku nediba min Emê (Emerxan) radestî Îraniyan kiriba, diviyabû min yan ew efû kiriba, yan jî min bixwe ew kuştiba".

Piştî vê gotinê, di cih de ferman daye kesekî bi navê Sako, ku serokê êla Êveriyan bû, û jê re gotiye; "Zû, tevî hin siwarên xwe, bikevin pey Emerxan, û her çi dibe bila bibe, lê wî ji destê leşker û qezaqên Îranê der bixin, û bînin cem min".

Lê gava ku Sako û siwarên wî, bilez hespên xwe çarnal teriqandine, di nîva rê de pêrgî Îsko Ruvî û siwarên Evdoyiyan bûne, ku ew piştî radestkirina Emerxan û birayên wî bi Îraniyan, ber bi Howesnê ve vedigeriyan. Dema ku Sako mebesta hatina xwe dibêje Îsko, Îsko jî rû li Sako dibêje; "Êdî çûna we bêfayde û direng e, û Emerxan û birayên xwe, di nav destê leşkerê Îranê de ne, û niha ew nêzî Selmasê bûne".

Pêdivî ye were gotin, gava ku Îsko, Emerxan û birayên wî, bi dest û pêyên girêdayî birine, ji malê dinyayê tenê titûndanka zîvîn bi Emerxan re hebû, û Îsko Ruvî ew titûndank jî ji Emerxan standibû. Dema ku Îsko Emerxan radestî Îraniyan dike, jê dipirse; "Gotinek te ya dawî bo Simko heye?", Emerxan jî dibêje; "Gava tu çûyî cem Simko, jê re bêje; li hember ewqas hevkarî û piştgiriya min ya bi Simko re, ne layiqê min bû, ku Simko wisa min bi dest û piyên girêdayî radestî dijminekî bike ku têhniyê xwîna me ye. Bila Simko xatircem be ku yên xirabiya min li cem wî gotine, ew ne dostê Simko ne jî, û wê ew roj were ku Simko, bi destê wan kesan derbê bixwe, û poşmanî vê biryara xwe ya derbarî min be".

Bi vî awayî, girtin û radestkirina Emerxan ji aliyê Simko ve bi Îraniyan, di hêla navxweyî de bûye sedema dilsarî û dûrketina zêdetir a nîvê Şikakan ji Simko, ku piştre dewleta Îranê jî ew li dijî Simko bi kar aniye. Ew mijara di asta navxweyî de yek ji hokarên herî bibandor ên lawazbûn û şikesta Simko bûye.

## *Emerxan wefadariya xwe bi dewleta Îranê radigehîne*

Dema ku şandeya serbaz û qezaqên Îranê, Emerxan û birayên wî ji siwarên Simko wergirtine û birine Selmasê, li ser daxwaza hakimê Tewrêzê, Emerxan û birayên wî şandine Tewrêzê, û piştî du mehan ku lêkolîn û îfadeya wan bi dawî tê, waliyê Tewrêzê û Emerxan hev dibînin, û di civînekê de Emerxan kariye walî tê bigehîne, ku kuştina wî çi faydeyekê nagehîne dewleta Îranê.

Hêjayî gotinê ye, di wan du mehên ku Emerxan di zîndana Tewrêzê de bû, siwarên Simko carna li derdora Selmasê havêtine ser gundên Eceman, û di van şeran de hin Ecem hatibûn kuştin. Lewma xelkê van gundan gilî û gazindên xwe gehandibûn karbidestên Hikûmeta Îranê li Selmas û Tewrêzê, û ji hikûmetê xwestine ku ew hêrişên siwarên Simko werin rawestandin.

Dewleta Îranê jî ew hêrişa siwarên Simko wekî binpêkirina wê lihevkirina di navbera xwe û Simko de hesibandiye, û êdî baweriya wê bi Simko nemaye. Lewma dewleta Îranê jî xwestiye bi vê derfetê Emerxan li dijî Simko bi kar bîne.

Wê demê ji aliyê karbidestên Îranê ve ji Emerxan hatiye xwestin, hekî bi îmkanên dewletê parastina ewlehiya Selmasê û serbazgeha leşkerî a dewletê li wan herêman bigre stûyê xwe, wê herdu birayên wî ji zîndanê azad bikin.

Herçend ku di serî de Emerxan bi daxwaza dewleta Îranê razî nebûye, û çi baweriya wî bi wan nebûye, lê ji aliyek din ve jî, çi hêviyek bi Simko jî nemabû. Di heman demê de zaniye hekî vê daxwaza dewletê qebûl neke, wê dewlet wî û birayên wî bikuje. Di rewşek wisa aloz de, ji bo ku derfetekê bo xwe peyda bike, razîbûna xwe bo daxwaza dewleta Îranê ragehandiye. Piştre ew ji zîndanê hatiye derxistin, û wekî hakimê Selmasê hatiye diyarîkirin. Ji aliyekî din ve piştî radestkirina Emerxan ji aliyê Simko ve bi dewleta Îranê, êdî di nav eşîra Şikakan de bêtifaqî û bêbawerî zêde bûye, û di nav xwe de parçe-parçe bûne.

## *Pîlangêriya Îraniyan bona kûrtirkirina nakokiyên di navbera Simko û Emerxan de*

Divêt were gotin ku ji bilî wan egerên navxweyî, yên ku bûne sedema bêtifaqî û peydabûna dijberiya di navbera Simko û Emerxan, û herwisa perçebûna di nav Şikakan de, bê guman plan û rola dewleta Îranê jî hebûye, û xwestiye bi rêya wê perçekirinê, hêza Simko lawaz bike û bizava neteweyî a Kurdan ji nav bibe.

Di derheqê vê mijarê de, ew raporta jêrîn balkêş e:

**Belgeya hejmar: 48**

Sala 1924an dema Simko bi lihevkirina digel dewleta Îranê vegeriyaye Howesnê, rojnameya bi navê “IRAN POLITICAL” di raporta xwe ya derbarê vê mijarê de wiha nivîsî ye:

Simko di rewşeke wisa de vedigere gundê Howesnê, ku piştî şikestin û çûna wî ya bo Tirkiyê, Emerxan bibû serokê Şikakan, lewma piştî vegera cardin ya Simko bo Îranê, û cihgirtina deshilata wî bi ser Şikakan de, xuya dibe ku Emerxan berhev nine ku xwe digel rastiya nû rêk bixe. Lewma serhildana nakokiyan di navbera wan du kesatiyan de çaverêkirî bû.

Ew jî di demeke wisa de bû, ku piştgiriya me`inewî a Tehmasibî (fermande û karbidestê Riza Şah yê li Urmiyê) jî bi Simko re hebû. Di rewşek wisa de, ku egera rûbirûbûna di navbera Emerxan û Simko de gelek nêz bibû, Îraniyan texmîn kiriye, ew rewş wê bandorek neyînî li ser ewlehiya sînorên bakûr-rojavayê Îranê dabinê.

Serbarê wê rewşê jî dema ku li ser fermana deshilatdariya Tehranê, Emerxan bangî Tewrêzê kirine, û jê xwestine haziriya xwe bike, û bi hêzeke Şikakên nêzî xwe amade be ji bo hêrişkirina li dijî Simko, lê Emerxan razî nebûye ku wê fermana dewleta Îranê bi cî bîne, û vegeriyaye Zindeştê.

Di heman demê de, ji ber hêrişa Simko ya bi piştgiriya hêzên dewletê li dijî Emerxan, wî ji neçarî xwe spartiye eşîreta Herkî, û her wê eşîretê jî bi mercekê ku Simko wî efû bike, Emerxan radestî Simko kirine. Simko jî wî radestî karbidestê dewletê dike, û Emerxan li Tewrêzê dihête zîndanîkirin.

Herwisa raport didomîne; “Biryar hate dayîn ku Emerxan were berdan, hetanî ku bikare bi rakêşana pişkek ji hêza Simko bo aliyê xwe, îqtidara Simko lawaz bike. Li ser wê bingehê Emerxan berdane, û îzin danê ku li gundê xwe rûnê. Karbidestên Îranê di serî de hewl dane ku nakokiya di navbera wan de bidavî bînin, lê biryar dane ku hekî di vî karî de sernekevin, hingê wê tagiriya Emerxan bikin”.

## *Hêrişa Ehmedaxayê birayê Simko bo ser Emerxan li Selmasê*

Dema hate zanîn ku Emerxan ji aliyê dewleta Îranê ve nehatiye kuştin, û dewletê ew vegerandiye Selmasê, û wekî berpirs li serbazgeha leşkerî ya Îranê cihgir kiriye, êdî Simko zaniye ku pêşbîniya wî derbarê radestkirina Emerxan bi dewleta Îranê şaş bûye. Herwisa dizane ku dewleta Îranê wê Emerxan li dijî wî bi kar bîne. Lewma Simko jî bi merema wê ku Emerxan bihêz nebe, ji bo jinavbirina Emerxan, fermanê dide Ehmed Axayê birayê xwe ku hêrişî ser Selmas û serbazgeha leşkerî bikin, û bi kuştî yan jî girtî Emerxan jê re bînin.

Dema ku leşkerê Simko hêrişî Selmasê kirine, û derdora bajar girtine, di serî de xwestine bajar û piştre jî serbazgeha leşkerî a wir bigrin. Lê dema ku gihîştine derwazeya bajêr, Emerxan û çekdarên xwe pêşiya wan girtine, û di encama şerekî yek rojî de çendîn kes ji siwarên Ehmed Axa di nav de serokêlên wekî Teyar Beg û Mihemed Selîm hatine kuştin, û gelek jî birîndar bûne.

Bi vî awayî êdî Ehmed Axa nekariye Selmasê bigre û paşve vekişiyaye, da ku cardin bi hêzeke zêdetir ve hêrişê bike ser Selmasê.

Gava ku Simko ji şikesta hêrişa Ehmed Axa bo ser Emerxan agehdar bûye, hewl daye ji Howesnê hêzek ji Şikakan ji bo alîkariya Ehmed Axa amade bike û bişîne wir.

Lê di wê demê de ji aliyê hin serokêlên Etmanî û Êverî ve, ku ji Simko nerazî bûn, ew dengo û gotegota di nav Şikakan de hatiye belavkirin, ku Ehmed Axa di şerê Selmasê de hatiye kuştin û Simko jî nexuya ye.

Dema ku Ehmed Axa ew dengo û gotegota bihîstiye, gelek nerihet û bêhêvî bûye, û neçar maye ku leşkerê xwe ji derdora Selmasê paşve bikişîne. Herwisa dema ku dengoya kuştina Ehmed Axa li deverê belav dibe, çend serokêlên Şikakan pişta xwe dane Simko, û amade nebûne li dijî Emerxan şer bikin. Simko jî êdî têdighîje ku her ew serokêlên Şikak bûne egera vê netifaqiya di navbera wî û Emerxan de.

Di rewşeke wiha de Simko dikeve fikra danîna têkiliyan û lihevkirina digel Emerxan, û bo vê mebestê kesekî bi navê Heco kurê Ezîzxan, ku neviyê Cewer Axa bû, wekî qasidê di navbera xwe û Emerxan de destnîşan dike, û jê re dibêje:

"Here bal Emê, û jê re bêje; Simko ji wan kiryarên ku derheqê te de kirine dilgiran e, û niha dizane ku bi sedema pîlangêrî û dudeviya hinek kes û aliyan, ew nakokî di navbera me de çêbûne, lewma êdî naxwaze ew dilmayîna heyî, di navbera me de bimîne".

Lê gava ku Heco ber bi Selmasê ve diçe, di rê de pêrgî Ewdiyê Mîrzayê Etmanî û siwarên wî tê, Ewdiyê Mîrza ku yek ji neraziyên dêrîn ê dijberî Simko bû, dema ku dizane Heco bo çi meremekê diçe Selmasê, û li egera lihevkirina Simko û Emerxan, êdî wê pêgeha wan jî lawaz bibe, lewma Ewdî bi teqandina çend fîşekan Heco radiwestîne, û jê re dibêje: Heco, hekî tu paşve nevegrî, ezê te bikujim. Bi vî rengî ew hewla Simko ya ji bo aştbûna bi Emerxan re hatiye astengkirin, û tu encamek tunebûye.

## *Hêrişa hevpar a dewleta Îranê û Emerxan bo ser Simko*

Piştî wê hêrişa Ehmed Axayê birayê Simko bo ser Selmasê, êdî dewleta Îranê destûr daye Emerxan ku divêt tevî leşkerê wan ji Urmiyê ve hêrişî ser Simko bikin. Dema ku leşkerê Îranê û Emerxan hêrişî ser Simko li herêma Somayê kirine, Emerxan gotiye siwarên xwe: "Rast e ku niha dewlet dixwaze Simko ji nav bibe, û herwisa piştî wê hemû heqareta ku Simko li me kirî, niha em jî bi zora dewletê hatine şerê Simko, lê pêdivî ye hûn baş bizanin ku hebûna me girêdayî bi saxmayîna Simko ye, û dibe hûn gelek hişyar bin, ku tiştek bi Simko neyê. Çunkî ger tiştek li wî bê, êdî piştî wî ji aliyê dewleta Îranê ve emê jî bêne jinavbirin".

Bo vê mebestê Emerxan bona ku leşkerên dewletê, çi şik û gumanan li wê niyeta wî nebin, destûra teqekirina hewayî li dijî hêzên Simko daye hêzên xwe, û gotiye: "Niha armanca me derxistina Simko ji wê herêmê ye, û divêt hûn wisa bikin, ku di nav şer de rê bo wî vekirî bihêlin, heta ku ew bikare derbas bibe".

Di wê hêrişa leşkerê Îranê û Emerxan de Simko digel hejmareke kêm ji şervanên xwe, piştî çend şeran ku Îsko Ruvî tê de hatiye kuştin, êdî hêza berevaniya wî lawaz dibe, û dikeve metirsiyê. Wê demê Emerxan li gor plana ku berê danîbî, ji bo derketina Simko û siwarên wî ji dorpêçê, rê jê re vekirî dihêle, û Simko digel jin û zarokên xwe, û hejmareke kêm ji Pisaxayên Ewdoyî, yên ku wefadarî Simko bûne, Howesnê cih dihêlin û rû dikin çiyayê Bereres li pişt gundê Koranê ku nêzî sînorê Tirkiyê ye.

Piştî rizgarbûna hêzên Simko ji dorpêça hêzên dewletê û Emerxan, dema ku Simko xwestiye derbasî herêma Tirgewer be, cardin hêzên dewletê tevî Begzadeyên Tirgewer, li nêzî çemê Erzîn û gundê Mawane, pêşiyê ji hêzên Simko digrin, û hêzên Simko piştî şerekî giran, û dayîna gelek kuştiyan, bi zehmetî karîne derbasî çiyayê Semawer li nêzî sînorê Tirkiyê bibin.

(Hêjayî gotinê ye, ku di wî şerê giran de, hevjîna Simko ya bi navê Zehra, ku xûşka Mehmûd Axa û Faris Axayê Zêbarê bû, ji ber

tundiya şer nekariye kurê xwe yê sava bi navê Tahirxan ji qada şer derbixe, û ji neçarî zarokê xwe di nav befrê de, li ser rê datîne û diçe. Piştre xizmên Hacî Axa û Reşîd Begê Herkî ew zarok birine mala xwe, û bi derdiserî mezin kirine).

Di wê demê de Simko tevî Xalid Begê Hesenî ku yek ji kesatiyên zana û xwedîbandor yê êla Heseniyan bû, ji serê çiyayê Semawer ve, li herêma Soma û Biradost dinêre, û dibêje; “Memleketo! tu xweş memleket bûyî, lê bi erzanî hatî firotin”. Xalid Beg jî di bersiva wê gotina Simko de, bi vegotina serpêhatiya Şahekî nexweş, ku dermanê wî xwarina goştê Qulingan bû, ji Simko re dibêje:

-Dema peyayên Şah ji bo girtina Qulingan, li ser rêya wan, kelexê deveyekê (hêştirekê) wekî dav (davik, tevlik) datînin, da ku dema quling wî kelexî dibînin, ji bo xwarinê bêne xwar û bikevin davikê, û ew jî Qulingan bigirin. Lê şêvirmendê meznê Qulingan dikeve gumanê ku li ser pişta kelexê deveyê, davik hatibin danîn, wî quling agehdar kirine ku danedin ser wî kelexî. Piştî dûrketina Qulingan ji kelexê wê deveyê, meznê Qulingan li ser gazincên hin Qulingan, ew şêvirmendê xwe yê baş, bi tohmeta ku nehêlaye Quling wî goştî bixon, ew ji şêvirmendiya xwe dûr xistiye, û şêvirmendekî din ê neşareza li ciyê wî daniye.


Piştî bihorîna heyamekê, cardin li dema vegera Qulingan ji heman rêkê, xafil ji vê ku bi heman awayê cara pêşîn, dav û tevlik ji wan re danîne, her ku çavê wan bi wî kelexî ketiye, û li ser handana wî şêvirmendê neşareza, meznê Qulingan destûra dadana ser wî kelexî daye. Lê gava meznê Qulingan berî hemûyan dadaye ser kelex, ji nişkê ve ketiye davikê û her çende qêrî û gazî kiriye jî, lê ne ew şêvirmend û ne jî tu hevalên wî, bi hewara wî de nehatine, û her bi vî rengî meznê qulingan ji nav diçe!

Piştî vegotina vê çîrokê ji aliyê Xalid Beg ve, ku mebesta wî, ew bû ku Simko bizane dema ku wî Emerxan ji şêvirmendiya xwe dûr xist, û hin kesên neşareza di cihê wî de kirin şêvirmendê xwe, xuya bû ku rojekê, wê ew qedera bihatiba serê Simko. Xuya bû ku Simko jî di wê demê de gelekî xembar bûye, û serpêhatiya xwe ya digel Emerxan aniye bîra xwe, û demek dirêj di ber xwe de, kûr û

dûr ponijiye, lê êdî dereng bûye. Piştî wê têkşikanê Simko berev sînorên Başûrê Kurdistanê vedigere, û Xalid Beg jî digel du kes ji hevalên xwe vedigere Bakûrê Kurdistan.

Xalid Begê Hesenî kesekî rewşenbîr û hevalê Xalid Begê Cibrî bûye. Ew her di destpêkê de di nava karûbarê damezrandina Komeleya Azadî de bûye. Yek ji serokên hereketa Azadî ye. Di serhildana Şêx Se`îd de li gelek eniyan şer kiriye. Xalid Begê Hesenî piştî serhildana Şêx se`îd digel êla Hesenan derbasî Îranê dibe. Di şerê li Makûyê bi leşkerê Îranê re, ku Silêmanê Ehmed û Keremê Qolaxasî û gelek hevalên wan hatin kuştin ew rizgar bûye. Lavê wî Şemsedîn di wî şerî de tê kuştin. Lawê wî Elîheyder di şerê Şêrwanşêxê de tê kuştin. Xalid Beg demekê digel Simkoyê Şikak dimîne. Piştre di sala 1926`an de, ji nû ve vedigere Bakûrê Kurdistanê, da ku serhildaneke nû organîze bike. Lê di gundê Kopê Şêrwanşêxê de rapora wî tê dan, û ji aliyê leşkerên Tirkan ve tê girtin. Leşkerên Tirk Xalid Beg digel lavê wî Nesredîn, û çend pismamên wî dibin Dîyarbekirê, û li roja 31.07.1926`an de wan îdam dikin.

**Belgeya hejmar: 49**



To:- Babekr Agha.

Somai. Dated 26.6.25.

My Respected Brother.

I have on more than one occasion expressed my appreciation of your policy which had, for the last few years, been aiming at the wellfare and interest of our race. The ruthless and barbarous treatment of the Turks to our people especially for the past several months, has confirmed the type of people you believed them to be. I am sure that hereafter you will stick more closely to your aims and exert more effort for the freedom of our nation. The Turk's relations with us have for ever been severed, not only because of their decision to exterminate our race but also because of their total denial of all religious beliefs and abolition of the Caliphate. I have therefore written and given the necessary advice to some of our misguided friends who are deceived in the Turks and are still serving the bitterest enemy of our faith and nationality. Rashid Jaudat Effendi will hand them over to you, and you are requested to forward them to the addresses accompanied by your remarks, which should draw their attention to the facts explained therein. You are to try from now on to draw them nearer to the realisation of the good underlying your policy; and you and they with one accord should help to form a great alliance which will enable us to avenge our martyred brethren and those who are exposed to martyrdom. I fully agree with your policy which is the right path to our people's freedom. Any details regarding the Turkish atrocities against the Kurds will be given you by Rashid Jaudat Effendi. With best respect and heartiest wishes for your success.

(Sgd) Simko.

## *Nameya Simko bo Babekir Axayê Pişderî*

Deqa Îngilîzî a nameyê li fayla hejmar (11) rêkevt 16.06.1925`an li arîşva Wezareta Karûbarê Navxwe a serdema paşatiyê li Bexdayê hatiye ragirtin, ku bi sedema girîngiya naveroka wê, karbidestên Îngilîz li Îraqa wê serdemê de, bi zimanê Îngilîzî wergerandine, û piştre bo kesên xwe ên serve şandine. Dr. Kemal Mezher kopiya vê nameyê ji vê arşîvê wergirtiye, û li sala 1998`an, di kovara Rengîn de weşandiye.

Deqa nameyê wiha ye:
Bo Babekir Axa
Soma 26.06.1925
Birayê min ê rêzdar

Min zêdetir ji carekê bas ji dirustî û têgihîştina xwe derbarê wê siyaseta we kiriye, ku hûn çend sal in li pêxema berjewendî û ber bi pêşveçûna neteweya me peyrew dikin. Reftara dilreq û hovane ya Tirkan digel gelê me, bitaybet di van çend mehên bihorî de, rastiya wan ji me re derket ku me bawerî bi wan hebû. Ji vê yekê xatircem im ku tu ji niha şûnda wê li ser rêbaza xwe pêdagirtir bî, û wê hewleke zêdetir bidî ji bo rizgarkirina neteweya me. Tirk hertim neyarê me bûn, ew jî ne tenê li ber vê ku biryar dane ku neteweya me qir bikin, belkî li ber vê ku wan bi tewahî dev ji Îslamê berdane, û text û tacê xelafetê ramalîne. Min nameyeke şîretkirinê bo hejmarek ji hevalên me ên ku hatinî xapandin nivîsîye, yên ku baweriya wan bi Tirka ye, û heya niha jî xizmeta dijminê bavkuştiyê dîn û neteweya me dikin. Reşîd Cewdet Efendî van nameyan ji we re tîne, hûn jî ji wan re bişînin. Ew name wê bala wan bo aliyê wan rastiyan bikşîne, ku me ji wan re şirove kirine, li ser te jî hewce ye ku ji niha şûnda xwe li wan nêzîk bikî, û daxwazê ji wan bikî ku ji naveroka vê siyasetê tê bigihîjin ku tu peyrew dikî. Bi vî awayî hûn û ew, pêkve dikarin eniyeke mezin ya wisa pêk bînin ku bibe palpiştê

me bona tolhildana şehîdên me, û yên ku xwe gorî dikin. Ez bi tewahî bi siyaseta te re me, jiber ku vê rêya dirust tê de dibînim ku dikare me bigehîne rizgariya gelê me.

Reşîd Cewdet Efendî wê bi dûr û dirêjî bas ji hovîtiya Tirkan li hember kurdan bo te bike.

Digel rêz û hurmeta min a zêde, ji kûrahiya dil ve hêviya serkevtinê ji te re dixwazim.

Îmza

Simko

*Not: Di vir de ya ku cihê baldanê ye, têkiliya berfireh a Simko digel rêber û serokêlên bibandor û xwedîpêgeh ên Kurd li her perçeyeke Kurdistanê û herwiha welatên herêmî û navdewletî ye, ku xebitiye di her derfetekê de bona gihîştin bi armancên neteweyî ên gelê Kurd piştevanî û bala wan bo xebata xwe rakêşe. Serbarê vê ku naveroka beşek ji name û gotûbêjên Simko li gor hinek name û gotûbêjên wî ên din hev nagrin, lê ew paradoksane li gor rewş û kavdanên cuda-cuda, heya qasekê xwezayî ne. jiber ku beşek ji wan vedigerin bo serdema lawazî û bêderetaniya Simko, ku divêt ji dîtingeheke taktîkî ve were nirxandin, jiber ku Simko di stratejiya xwe de, daxwaza serxwebûna Kurdistanê kiriye. Di dema hûrbûna li ser van name û têkiliyên dîplomasî ên Simko, derdikeve ku Simko cuda ji xebata siyasî û çekdarî û edebî rûbereke berfireh di pêwendiyên dîplomasiya wê serdemê de ji xwe re misoger kiriye. Ew kar jî xwediyê girîngiyeke dîrokî û taybet e, lewma di arşîva welatên wek Îran, Tirk, Rûs, Îngilîz, û herwisa di belavokên wê serdemê de, ew dekoment bi girîngî ve hatine parastin.*

**Dr. Kemal Mezher di kovara "Rengîn" de, ku sala 1998`an li Îraqê haiye belavkirin, wiha şiroveya Simko û nameya wî dike:**

"Ev name belgenameyeke dîrokî ya buhadar a pir ji ders û şîret e, helbet girîngiya dîrokî û siyasî ya naveroka vê namê di gelek tiştan de xwe nîşan dide, ku têgihîştina ji wan karekî sanahî ye, li servey hemiyan jî meznahî û dilsojiya Simko û hevçarenivîsiya neteweya Kurd bi eşkere xwe nîşan didin. Simko cihekî xuya di nav wan berheman de ber dikeve, ku bo şiroveya dîroka hevçerx a Kurd hatiye danîn. Simko berevajiyê Babekir Axa, heyameke zêde bi qewlên Tirkan hate xapandin. Lê şoreşa Şêx Se`îdê Pîran û reftara hovane a Kemaliyan li dijî rêberên Kurdên Bakûr, hemû ew Kurd hişyar kirin, ku Tirkan ew xapandibûn. Bi taybet biryara îdama Şêx Se`îd û Dr. Fuad û nêzî pêncî welatparêzên Kurd li Bakûrê Kurdistanê, hundirê hemû Kurdekî dilsoj şewitand. Wisa diyar e ku ev serpêhatiyên dilêş, bandora xwe li ser Simko hebûne ku li dijî Tirkan pêdagir be, û pêdeçûnê bi ser helwesta xwe de bike. Simko zû tevdigeriya, û zû biryar dida, û bilez ew kar dikir ku bi rast û dirust dizanî, û ji desta dihat. Di wê demê de, di nav hemiyan de dûrbîniya Babekir Axa tê bîra wî, lewma yekser nameyeke taybetî jê re dişîne, û ji rêya wî ve jî, hejmarek nameyên din bo rêberên Kurd dinivîse, û bi rêya Cewdet ku kesekî bawerpêkiriyê wî bûye, ji wan re dişîne.

Babekir Axayê Pişderî ji Simko kêmtir hatiye nasîn, lê ew jî kesekî kêm nebû. Babekir Axa mêrekî jîr, zana û dûrbîn, bilîmet û serwext bû. Di Sala 1935`an de belgenameyeke dîplomasî a Îngilîzan wiha behsê Babekir Axayê Pişderî kiriye:

"Mêrekî jîr û rêzdar e, her kesek ku ji nêzîk ve ew nas kiribe, jê hez kiriye û rêz jê girtiye". Babekir Axa wek mêrekî jîr û zana her zû ji vê yekê têgihîşt, ku Kemaliyên Tirkiyê digel neteweya Kurd dilpak nînin, lewma bi qewlên wan nehate xapandin, û li dijî Tirkxwazên Kurdistanê sekinî, yên ku gelek nekêşa ku di nav Kurdan de şermezar bûn, û xelkê bi tane û teşer (tevn) ve digote wan "Cilxwar". Babekir Axa ser vê baweriyê bû ku renge Kurd bikarin ji rêya Îngilîzan ve tiştekê bi dest bixin".

**Belgeya hejmar: 50**

*https://drive.google.com/file/d/1l4jAm1NEWUEOuj60GXzMIs EyUooLAU-N/view?ts=5eae6685*

Rûpela Belgeyê 364, Rûpela Pirtûkê 337
Benda dawî û hemû bendên rûpelên 338 û 339
Simko (navê rastî Isma`îl Axa)

Serokê Kurdên Şikak ku yek ji mezintirîn kesayetiyan di Kurdistana Navendî de ye. Ew wek bikujê Marşîmon tê naskirin. Bi hikûmeta Farsî re bi berdewamî neyartî heye. Dema ku navbirî ew sinduqa ku Îraniyan di sala (1919) de, bombe tê de danîbû, û wek diyarî jê re şandibûn, da destê birayê xwe û sinduq di destê birayê wî de teqiya û canê xwe ji dest da, li ser vê bûyerê wî hêrişî ser Urmiyê kir.

Di sala 1920-î de carê dijayetiya wî digel Farsan yekalî nebibû, ku di mehên Adar-Nîsanê de, piştî vê ku gotûbêjên di navbera Kurd û Tirkan de bê encam man, cara dawî li bakûrê gola Urmiyê, Îranî têk şikandin.

Piştre digel Seyîd Taha berdewamî dane tevgera serxwebûnê. Wê demê dihate gotin ku ew (Simko) dikare 4 hezar kesan bîne qadê. Di havîna sala 1922`an de ew ji aliyê Farsan ve hate têkşikandin, û ji aliyê Tirkan ve jî hate xapandin û îxanet bi wî hate kirin. Herwiha kurê wî hate destbiserkirin, û jina wî a hezkirî hate kuştin, û dest bi ser hemû milk û malê wî de hate girtin.

Li sala 1922`an digel 20 kes ji alîgirên xwe gihîşte cem Seyîd Taha ku li cihekî nêzîk Hewlêrê bû. Piştre çû Silêmaniyê cem Şêx Mehmûd, lê wisa xuya nake ku digel Şêx Mehmûd wan yek nerîn hebibe.

Dema ku Şêx Mehmûd di meha Adara sala 1923`an de ket, Simko ku digel Tirkan peyman girê dabû, digel Ozdemir çû Rewanduzê, û li wir wek walî û serperestê wir hate destnîşankirin, lê navbirî berî dagîrkirina Rewanduzê, ber bi Nehriyê ve çû, û piştre ji aliyê

hikûmeta Farsan ve biryara lêbihorînê jê re derket.

Heya sala 1925`an li ser dostatiya digel Tirkan berdewam bû, lê di meha Çileya Pêşîn de bi sedema kuştina berpirsekî pilenizim carek din ji aliyê Farsan ve astengî jê re hatin çêkirin.

Farsan bi sedema lawaziya hêza leşkerî, nedikarîn bi ser wî de serkevin, lewma wan Emerxanê Şikak serbest berdan ku rikeberê Simko û girtî bû, û ew li dijî Simko tûj kirin, da ku di nav eşîra xwe de lawaz be. Ji aliyekî din ve li ber vê ku destê Simko li Azerbaycanê vekirî hêlabûn, Tirk (Ecem) şepirze bibûn.

Di meha Nîsana sala 1926`an de, tê gotin ku Simko bo Şêx Ehmedê Barzan name şandiye, û di heyameke kurt de bo gotûbêja li ser tevgera serxwebûna Kurd daxwaza hevdîtinê digel Şêx Ehmed kiriye. Di rewşeke wiha de Simko di nav kûrahiya aloziyan de bû, û wî bi 1500 kesî hêrişî ser Selmasê kir, lê vê carê nekarî li hember hêzên Fars de berxwe bide, ku bo şer digel navbirî hatibûn şandin, û li deşta Urmiyê de Simko hate têkşikandin.

Hikûmeta Fars digel Tirkan biryr dabûn, ku pêkve Simko serqal bikin, û di dawiyê de ew neçar ma ku li Îraqê û li bakûrê Rewanduzê bibe penaber, û xwe avête ber rehm û dilovaniya hikûmeta Birîtanya û Îraqê, û piştre îzin dane wî ku li Sîdekan bijî.

Li wir di sala 1927`an de kêşeyek qewimî, û ew mêhvandostî û dilovaniya ku ji aliyê hevalê wî yê xanexwê ve dihat nîşandan, hate binpêkirin. Piştre li meha Pûşpera sala 1928`an de Simko digel Tirkan li hev kir, û digel alîgirên xwe sînor derbaz kirin.

Carekê 150 kes ji eşîra xwe a kevn a Şikak kom kir, û dest bi dorpêça Farsan kir, ku wisa xuya ye ku ji aliyê Tirkan ve hatibe tûjkirin. Ji meha Çirriya Pêşîn a 1928`an ve, ew digel girûpa xwe li nêzî Bajêrgeh ku li 20 maylî a bakûrê rojhilatê Dizê ye, li aliyê Gewerê dijiyan.

Hikûmeta Farsan hebûna Simko li wir wek metirsiyeke herêmî dibînin, û berdewam daxwazê ji Tirkan dikin, ku yan navbirî radest bikin, yan jî li sînorê Farsan dûr bixin. Hewce nake ku mirov kesayetiya Simko binirxîne. Eşkere ye ku ew mirovekî çalak e, û zanyarî jî vê yekê diselimînin.

Ew nefretê li hikûmeta Farsan dike, û ew rastiya jî li tevgera wî de diyar e. Di çi demekê de xwe bi yekcarî nade dest hikûmeta Tirkiyê yan Îraqê. Bê guman wî digel eşîra xwe ya kevn têkiliyeke bihêz heye, û Fars jê ditirsin. Ew niha tenê ji xwe hez dike, û tu kes yan tu tiştek jê re girîng nine.

Herwiha bi sedema vê ku wî tu tiştek nine ku ji dest bide, lewma tenê fikra serkevtinê dike. Simko wek kesayetiyeke berçav, şiyana vê heye ku dubare xwe di navend û Bakûrê Kurdistanê de rêk bixe.

## *Pîlana Terorkirina Simko bi biryara Riza Şah*

Piştî vê ku Simko bo heyama du salan di rewşeke dijwar de, li sêgoşeya Başûr û Bakûr û Rojhilatê Kurdistanê dimîne, li havîna sala 1930-î serheng Sadiqxanê Newrozî fermandê Îranî li bajarê Şinoyê bi şandina peyamekê bo Şêx Ehmedê Barzan, gotine ku Simko ji sînorê we re metirsiyê dixe ser ajeldarên aliyê Îranê û wan azar dide. Şêx Ehmedê Barzanî jî bersivê ji wan re dişîne ku ew tiştên ku we bas kiriye, min ji Simko pirs kirine, û ew jî wan gotinên we ret dike. Piştre heman karbidestê Îranî bi agehdariya Riza Şah û bi armanca vê ku Simko bixin davê, û wî ji nav bibin, ji rêya Teymûrê Şikak ve ku pêştir çekdarê Simko bûye, nameyekê ji Simko re dişînin. Îranî di vê namê de amadeyiya xwe bo gotûbêja rasterast digel Simko li bajarê Şinoyê eşkere dikin, û daxwazê dikin ku Simko bête Şinoyê, û li wir çavê wî bikeve serleşker Hesen Muqedem fermandê payebilind ê Îranî ku diviya bi nûnertiya Riza Şah ve bihatiba Şinoyê, da ku digel Simko li hev kiriban.

Piştî gihîştina nameya Îraniyan, Simko serdana Şêx Ehmedê Barzanî dike û vê mijarê bi wî radigehîne. Wisa xuya dike ku Şêx Ehmed hez kiriye ku Îranî û Simko bikarin bi rêya aştîxwazane kêşeyên di navbera xwe de çareser bikin. Herwiha Simko jî bi wan ezmûnên ku ji rabihoriya xwe û Îraniyan hebû, bi berçavgirtina vê rewşa dijwar ku tê de bûye, razî bûye ku belkû bikare bi vê gotûbêjê, derfeteke din bi dest bixe û hekî bê encam jî ma, wê demê dest bi serhildaneke nû bike. Piştî wê şêvirîna bi Şêx Ehmed re, Şêx Ehmed jî bo qahîmkariya silametiya sefera Simko, daxwaz ji eşîreta Gerdî ku akinciyê aliyê bakûrê Kurdistanê bûn kiriye, ku ew jî digel Mizûriyan û Xurşîd Axayê Herkî û Kerîmxanê Xeylanî û Xoşnawan û Biradostiyan, digel Simko herin Şinoyê.

Ji Gerdiyan: Uxuzbeg Axa, Merwan Axa û birayê wî bi navê Hemedemîn Axa, Şêr Axa û Elî Bêşûnê Gerdî, Şêx Umer Bêroxî, Baqî Şikor Bêroxî, Mihemed Axayê Kelîtî, tevî çend kesayetiyên gundê Zêt li herêma Gerdiyan, bi Simko re ber bi Şinoyê rê ketine.

Piştî gihîştina Simko û hevalên wî bo bajarê Şinoyê, li wir

çavnihêrê hatina nûnerê Riza Şah (serleşker Hesen Muqedem) dimînin. Li gor wê biryara ku hatibû danê, diviya ew serleşker ji aliyê Riza Şah ve bo wajokirina lihevkirina digel Simko bihatiba Şinoyê. Lê ya rastî ew e ku Riza Şah, ew serleşker bo kuştina Simko erkdar kiribû. Îraniyan ku ew gotûbêj wek dav û tevlikekê bo kuştina Simko rêk xistibûn, lewma ji aliyê Sadiqxanê Nerwrozî ve bi rûgeşî pêşwaziyeke germ ji Simko hatiye kirin, û xwestine bi vî awayî çend rojan Simko mijûl û sergerm bikin, da ku pîlanên xwe cîbicî bikin.

Li êvariya roja 19.07.1930`î, ligor plana diyarîkirî Simko û hinek ji hevalên xwe, digel Serheng Sadiqxan Newrozî bi niyeta pêşwazîkirin ji Serleşker Muqedem diçin ser rêya hatina wî li qeraxa bajar.

Lê serbarê dema diyarîkirî, piştî direngmayînek zêde, qasidên serleşker têne cem wan û wan agehdar dikin ku bi sedema têkçûna trombêla serleşker, ew nikare îro bê wir, û ewê sibê bihêt. Simko û hevalên wî ku heta direngiya êvarê li wir gîro bibûn, cardin ber bi Şinoyê vedigerin, û dema ku Simko û hevalên wî digihîjne nêzî dîwarên derwazê bajar, di encama xiyaneta Riza Şah de li êvariya roja 19.07.1930`î, ji çend aliyan ve dikevin ber agirê tund ê hêzên Sadiqxan Newrozî ku li gor pîlana ku pêştir darêtibûn, Simko xistin davê. Di encama gullebarana dijmin de, Simko birîndar dibe, û xwe davêje nav qultikekê. Lê dema ku dibîne Xusroyê kurê wî hinek dûrî wî ketiye ser erdê, û vedigere ku Xusro rizgar bike, di wê demê de çend gulleyên din lê dikevin. Êdî canê wî qehremanê efsaneyî yê Kurdistanê dibe goriyê nîştiman. Hevdem Xurşîd Axayê serokê eşîra Herkî, Merwan Axayê Gerdî û birayê wî, Kerîmxanê serokê eşîra Xeylanî, bi gulleyên Îraniyan şehîd dibin, û Fetah Axayê Herkî digel 13 kesên din jî bi giranî birîndar dibin.

Bi sedema giraniya şer û nebûna derfetê, termê Simko di qada şer de cih dimîne. Hêzên Simko çend caran hêrişê dikin ser wî cihî, da ku bikarin termê Simko ji destê dijmin derxin, lê bi sedema hêrişa hêzên piştevan ên Îranê, ku ji çend aliyan ve hatibûn, şervanên Simko nekarîne termê Simko derbaz bikin.

Roja paştir serleşker Muqedem ji bo çavtirsandina Kurdan termê bêcan ê Simko biriye nav bajarê Urmiyê, û nîşanî xelkê daye, û wêne lê girtine. Piştre jî termê wî li dervey derwazeyê "Hezaran" a Urmiyê li nêzî coka avê ya bi navê "DEHWAR" binax kirine. Lê heya niha jî cihê rastîn ê veşartina termê Simko nehatiye tesbîtkirin.

Şehîdkirina Simko ji bo gelê Kurd tirajidî û karesateke mezin a neteweyî bû, û welatparêzên Kurd bi giştî bi vê bûyera bijan, xembar û tazîdar bûne. Herwiha ew karesat li ser asta Îran, Tirkiye, Îraq û welatên zilhêz ên cîhanê dengvedanek mezin hebûye, û radyo û rojnameyên wî çaxî, bi berfirehî ew bûyer rûmal kirine.

Simkoyê Şikak piştî şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehrî li Rojhilatê Kurdistanê, rêberê mezintirîn û dirêjtirîn serhildana netewî bû ku bo heyama 25 salan xebata rizgarîxwazî a Kurdistanê domandiye. Di heman demê de Simko di asta hevkêşeyên girêdayî bi pirsa Kurd, bandor li ser têkiliyên di navbera Îran, Tirkiye, Îraq, Rûsye û Îngilîzan de hebûye, lewma hertim di rojnameyên wê demê de bas ji Simko û xebata netewî a wî hatiye kirin, û arîşva wan welatan jî tejî ye ji belgename û raporên têkildar bi xebata Simko, û navê wî û serhildana wî bona dewletbûna Kurdistanê, wekî sembol û nasnameya netewî a Kurdan di sedan rapor û belgenameyên welatên biyanî de hatiye tomarkirin.

# Belgeya hejmar: 51



کوشش

تکنمره پس ازیکروز شش شاهی است

شماره مسلسل ۱۳۲۸ - ۳شنبه ۲۵ صفر ۱۳۴۹

برابر ۳۱ تیر ماه ۱۳۰۹ ۲۲ ژویه ۱۹۳۰ شماره

اداره: طهران خیابان علاء الدوله

صاحب‌امتیاز و مدیر: س. شکرالله الحسینی صفوی

آدرس تلگرافی: طهران: کوشش

همه روزه باستثنای ایام تعطیل منتشرمیشود

وجه اشتراک قبلا دریافت میشود

| آبونه | داخله | خارجه |
|---|---|---|
| سالیانه | ۸۰ قران | ۱۰۰ قران |
| شش‌ماهه | ۴۰ قران | ۵۰ قران |

اعلانات صفحهٔ ۱ صفحهٔ ۲ صفحهٔ ۳ صفحهٔ ٤
سطری ۴ قران ۳ قران ۲قران ۱ قران

## قتل اسمعیل آقا سمیتقو

### قطع ریشهٔ فساد

## اوضاع هندستان

### سرجان سیمون در مجمع ملی راجع باوضاع واحوال هند و ستان لطق مبسوطی ایراد لمود که خلاصهٔ آن بقرارذیل است

## اعــــلان

بموجب ماده نوزدهم بند دوم اساسنامه بانك ملی ایران محترماً اعلام میدارد که دومین جلسهٔ مجمع عمومی بانك در ساعت شش بعد ازظهر روز پنجشنبه ۳۰مرداد ماه ۱۳۰۹ (۲۱ اوت ۱۹۳۰) منعقد خواهد گردید:

دستور جلسه بقرار ذیل خواهد بود

۱ـ تقدیم بیلان سالیانه

۲ـ مفصای هیئت ظر و هیئت رئیسه

۳ـ انتخابات هیئت نظر

٤ـ تأسیس شعبه بانك فلاحتی و متفرقه

طهران ـ مورخه ۲۸ تیر ماه ۱۳۰۹

بانك ملی ایران

نمرهٔ اعلان ۳۹۷۲

Sêşemî (22.07.1930)
Rojnameya "kûşiş" sala heştem-hejmara zincîre 1328

Em radigehînin ku hevdem digel çûna min bo Rizayiyê (Urmiyê) li gor wan raporên ku ji hikûmeta leşkerî ya Şinoyê ve gihîştiye me, zelal bûye ku Simko dîsan jî niyeteke wî ya rastgoyane û dirust tuneye, û di van sê rojên mana xwe li Şinoyê, hêdî-hêdî bi navê serdan û hevdîtinê, xelkê koçer ê biyanî li dewra xwe kom kiriye, û naxwazes ku di navenda leşkerî de amade be.

Ji aliyekî din ve dirêjîkêşana vê mijarê û danûstandina digel navbirî jî bi meslehet nebû, û bêsûd bû. Bi vî awayî şeva 27`ê mehê, sê yekîneyên leşkerî bi awayê ku li jêr hatiye nivîsîn, ji rêyên cuda ve ber bi Şinoyê hatin şandin.

Yekem: Ji Rizayiyê (Urmiyê) ve tabûrek ji leşkerê peya û girûpek ji hêza bi metraliyozan ve.

Duyem: Ji Sabilaxê (Mihabadê) ve tabûrek ji leşkerê peya.

Sêyem: Min ji Tewrêzê ve jî hêzeke siwaran digel serfermandehiya şerê gerok ê leşkerê Tewrêzê, gel xwe anîbûn, û me ferman da serbazgeha Şinoyê jî ku bi Simko ragehînin, ku dibe bilez ber bi Tewrêzê bi rê keve, û herwisa çeka wî jê bistînin, û ger Simko ji vê biryarê serpêçî kir, navbirî û hevalên wî ji nav bibin.

Wek dihate çaverêkirin, navbirî ji çûna bo navenda leşkerî serpêçî kir, û çekên xwe jî radest nekirin, lewma hêzên serbazxaneyê erk û vezîfeya xwe bi cî anîn. Ew tabûrên ku hatibûn şandin, gelek bilez çûbûne Şinoyê, û êvariya 27`ê mehê Şino dorpêç kirin, û Simko bixwe jî hate kuştin, û piraniya kesên derdorê jî hatin kuştin û birîndarkirin, yan jî revîn.

Divêt vê yekê jî bêjim ku tevgera wan tabûran ku bo vê operasiyonê hatibûn rasipartin gelek balkêş bû, û du tabûrên peya ên Rizayiyê, 12 fersex di heyama 18 demjimêran de, bi peyatîçûna berdewam, û tabûra peya ya Sablaxê jî, 10 fersex di heyama 16 demjimêran de, bi peyatîçûna berdewam, û hêza siwaran jî, bi lezgîniyek gelek baş, ew rê qedandine, û bi awayekî herî baş karîne ku erk û vezîfeya xwe bi tewahî cîbicî bikin. Herweha wê perwerdehî

û meşqa jêhatî, di jiyana hêzên çekdar, û cîbicîkirina erkên xwe de, bi tewahî biselimînin.

Rizayiye demjimêr 9, 27.04.1309, (19.07.1930), fermandê hêza bakûr a rojava, Fermandê Tugay, Hesen Muqedem

**Belgeya hejmar: 52**

*Çavkanî A-46,*
*20.07.1930*
*wergeran ji Farsî ve*
*Hêjayî baweriya tewaw e*
*Li gor zanyariyên din jî hûrbînî jê re hatiye kirin*
*Cighir yan nîştecih (Muqîm)*
*Derbarê kuştina Isma`îl Axayê Simko*

Raporta ku ji Şinoyê ve gihaye destê me, derheqê hatina Isma`îl Axa bo van derdoran, ku mijûlî komkirina Kurdan li dora xwe ye. Fermandê Alaya bakûra rojava ji Tehranê vegeriya, û yekser digel desteya fermandehiyê ber bi Urmiyê bi rê ket.

Hûrgiliyên mana Isma`îl Axa li Şinoyê wiha ye:

Isma`îl Axa daxwaz kiriye ku vegere Îranê, û dev ji çalakiyên xwe yên berê berde. Ew yek jî bi Tehranê hatiye ragehandin. Xawdî şiko (Şah) bi vî mercî rê daye ew vegere Îranê, ku li Tewrêz yan li Tehranê jiyanê derbaz bike, û rê nede ku ew li herêmên sînorî akincî bibe.

Ev nûçeya bi Isma`îl Axa ragehandin, û ew jî li 15`ê Temûzê digel hinek Kurdên xwe, gihîşte nav konên Xorşîd Axayê êla Herkî li derdora Şinoyê.

Serheng Sadiq Xan fermandeyê serbazî yê Şinoyê bo gotûbêjan derheqê çûna Isma`îl Axa bo Tewrêzê, Xorşîd Axa û Isma`îl Axa dîtin, û di vê derheqê de rapor dabû vî bajarî, û çend trombêl şandin pey Isma`îl Axa. Lê Serheng Sadiq Xan ji nû ve nûçeya vê yekê gehandibû ku Isma`îl Axa piştî vê ku here Tewrêzê, armanceke din heye, û Kurdên Îraqê jî bi navê serdan û dîtina wî têne cem wî. Di vê demê de fermandê alaya serbazî ku taze ji Tehranê hatibû, ferman da ku bilez Isma`îl Axa bişînin Tewrêzê, û hekî ew razî nebe, wî bigrin û di bin çavdêriya hêzekê de bişînin Tewrêzê.

Fermandê Tugayê jî digel serfermandehiya meydanî, ber bi Urmiyê bi rê ket, û ferman da ku tabûrek serbazî li Urmiyê û tabûrek

jî ji Sablax (Mihabad)ê bişînin Şinoyê. Ew hêz gelek zû gihîştin Şinoyê û cihgir bûn, û derwazeyên Şinoyê girtin. Di nav bajar de jî şer di navbera hêzên (hamiye) ên Şinoyê û Kurdan de qewimî. Li ser wan rêyên ku dihate çavnihêrkirin, ku Isma`îl Axa wê ji wir ve hewl bide ji Şinoyê derkeve, heşt çekdarên perwerdekirî hatin cihgîrkirin, û her yek ji wan 300 fîşek bi wan hatin dan, da ku rêya Isma`îl Axa bigrin û nehêlin ew ji bajar derkeve. Dema ku Isma`îl Axa hewl da ku ji rêya kolanên teng ve, xwe ji dorpêçê derbaz bike çekdaran ew dane ber gulleyan û ew hate kuştin.

Kurdan gelek hewl dan ku termê Simko digel xwe bibin, lê wan çekdaran bi teqekirina berdewam, derfet nedan ku destên wan bigihîje termê Simko. Beşek ji Kurdan hatin kuştin û ên din jî reviyan û hinek jî bi dîl hatin girtin. Termê Isma`îl Axa bi trombêlê gehandin Urmiyê, û li wir bi axê hate spartin.

Isma`îl Axa digel hatina bo Îranê, ji aliyê eşîreta Herkî ve hatibû hewandin, û ji aliyê Xorşîd Axa ve hatibû parastin. Renge kuştina navbirî (mebest Xorşîd Axa ye ku ew jî digel Simko hate kuştin) bibe sedema ji nû ve kombûna eşîreta wan, û destkirin bi alozî û tevlîheviya di Şinoyê de. Lewma roja 31`ê Temûzê ji Tewrêzê ve alaya qolordiyê şandin Şinoyê.

Têbîniyên muqîm (Resident): Arşîv hejmar 3, akademiya zanistiya Yekîtiya Sovyet-Dosiye-7 rêzbend 5 hejmar 10

Isma`îl Axa li 12`ê Temûzê gihîşte Şinoyê, pêşwext rê pê hatibû dayîn ku bête nav xaka Îranê, bi mercekê ku li Tewrêz yan jî li Tehranê akincî be, garantiya jiyana wî û beşek ji eşîra wî jê re hatibû kirin, nêzî 200 Kurd digel de bûn, û Isma`îl Axa li cem Xorşîd Axa peya bû û bêhnek vedan. Xurşîd Axa yek ji serdarên Kurd ên Tirkiyê ji êla Herkiyan bû, ku hemû havînekê têne zozanên Şinoyê. Fermandeyê Hamiyeya Şinoyê digel Isma`îl Axa derheq çûna xwe bo Tewrêzê, gotûbêj kir.

Rojane ji sînorên Îraqê ve Kurd bi taybetî Şêxê Barzan bi navê hevdîtin û serdanê dihatin cem Simko. Di encam de nêzî 500 Kurdên çekdar li dewra wî kom bûn, di heman demê de Isma`îl Axa xwe ji bersiva konkirêt (bo hikûmeta Îranê) vedidizî. Fars ji vê

helwesta wî nîgeran bûn, fermandeyê Tugaya serbazî bilez li 17`ê Temûzê gihîşte Urmiyê û yekser bersiv da, ku ji Urmiyê û Sablaxê her yek ji wan tabûrekê digel yekîneyên reşaşhilgir (miselsel) bişînin Şinoyê. Di heman demê de daxwaz ji fermandê Hamiyeyê Şinoyê kir, ku daxwazê ji Simko bike ku bilez ber bi Urmiyê bi rê keve, û hekî Simko bi gotina wan neke, wî çek bike.

Ew hêzên ku amaje bi wan hate kirin, li roja 17`ê Temûzê li demjimêr 11`ê şevê gihîştin wir, û heya şeva 18`ê Temûzê dewra Şinoyê girtin. Hêzên Urmiyê bi 18 demjimêran peyaçûna berdewam 84 km qedandin, û yê Sablaxê jî bi bê ravestan 70 km bi 16 demjimêran qedandin, şeva 18`ê Temûzê şer di navbera hamiyeya Şinoyê û Kurdan de rû da, û Isma`îl Axa digel Kurdên xwe, ku li qadeke teng de bûn hate kuştin. Termê wî bi trombêlê bo Urmiyê hate birin, rast di wê demê de ez bi hilkewt ji Urmiyê ve ber bi Sablax û Seqizê di rê de bûm, termê wî heta çend demjimêran di qadê de hate danîn, bona vê ku xelk bibînin, kombûnek hate sazkirin û parêzgarê Urmiyê jî axavtinek kir û kiryarên Isma`îl Axa wek çetegerî da nasandin, û pîrozbahî li artêşa Îranê kir, ku xelk ji dest kiryarên terorîstî ên Simko rizgar kirin.

Li ber vê ku dema Isma`îl Axa xwedîdeshilat bû, li salên 1920-1921`an li Urmiye û Sablaxê, gelek zirar gehandibû akinciyên van herêman, û bîranîneke xirab di van bajaran li pey xwe bi cih hiştibû. Bazerganên Kurd ku digel Farsan têkiliyeke baş hene, zêde guh nedan vê bûyerê, lê Kurdên asayî nîgeran bûn, û şêweya wênegirtina digel Simko bi mirî ew aciz û hêrs dikirin. Dema ku serbazên Fars pirça wî digirtin, û bi bêy guhdan serê wî bilind dikirin, da ku wêneyan digel de bigrin, Kurdan wisa dihesibandin ku îxanet li Simko kirine û kuştine.

Hevpêç şeş wêneyan ezê ji wan re bişînim, ku girêdayî kuştina Simko ne, û dibe ku heval Pîtrov peyama kuştina wî di heman demê de bo we şandibe. Lewma min ji Tewrêzê, di vê derheqê de agehdarî ji we re neşandin.

## *Beşa sêyem*

## *Biroyê Heskê û Destpêkirina serhildana Araratê*

Biroyê Heskê Têlî ji eşîra Celaliyan serokê êla Hesêsoriyan û nîşteciyê herêma Agiriyê bû. Di şerê cîhanî yê yekem de, Biro jî mîna hinek serokeşîretên Kurdan, bi Osmaniyan re li hemberî Ermeniyan û Rûsan şer kir. Wekî tê zanîn dewleta Osmanî ji gelek neteweyan pêk hatibû. Kurd jî di vê îqtidarê de yek ji wan neteweyan bûn. Di dema îqtidara Osmanîyan de netewa Kurd li çav neteweyên din her gav xwedî pêgehek taybet bû. Bingeha vê taybetmendiyê jî du sedemên balkêş hebûn. Ya yekem Musilmantî û Sunnîbûna piraniya Kurdan bû. Ya duyem jî Kurd di herêma Mezopotamyayê de xwedî nifûseke zaf û hem jî di şervanîtiyê de jêhatî bûn. Osmaniyan bona wan taybetmendiyan tim Kurd nêzî xwe didîtin. Osmaniyan di vê herêmê de li hemberî dijmin û neyarên xwe, Kurd wekî şûreyeke qahîm û wekî mertal bo parastina xwe bi kar dianîn.

Dewleta Osmanî di despêka şerê cîhanî yê yekem de, ji bona bidestxistina xaka welatên sermayedarî, bûne hevpeymanê dewleta Alman a Nazî. Dema ku di vî şerî de Almanî hatin têkşikandin, dewleta Osmanî jî di vî şerî de dorand û piştre lawaz bû, û neteweyên herêma Balkan daxwaza rizgariya welatên xwe kirin, û dewletên xwe ava kirin. Piştî wan bûyeran êdî dewleta Osmanî ber bi têkçûnê ve diçû, û di herêma Kurdistanê de jî roj bi roj qaveta wan lawaz dibû. Di wê demê de dewleta Osmanî bona ku vê herêmê ji dest nede, digot; “Wê Kurdistan bibe Ermenistan.” Osmaniyan bi vê siloganê Kurd dixapandin û li hemberî Ermeniyan bi kar dianîn. Hingê Biroyê Heskê û eşîretên derdora herêma Agirî jî, ji bo ku nedixwestin Kurdistan bikeve nav Ermenistanê, tevî leşkerên dewleta Osmanî li hemberî Rûs û Ermeniyan gelek şerên mezin kirin.

Li serdema hikûmeta nû a Tirkiyê de bi sedema wê rewşa dijwar ku Tirkan piştî serhildana Şêx Se`îd li Bakûrê Kurdistanê de pêk anîbûn, û bi vê sedemê dest bi veguhastina bi zorê ya Kurdan bo herêmên dûrdest ên Anadoliyê kiribûn, Biroyê Heskê Têlî yek ji serkirdeyên hoza Celalî

û akinciyê herêma Agirî bû. Biro Heskê ku çendîn salan di nav hêza Hemîdiye a Osmaniyan de xizmeta Tirkan kiribû, tê agehdarkirin ku Tirkan biryar dane navbirî bi darê zorê ji wargehê wî dûr bixin. Di 16.05.1925`an de cendirmeyên Tirkan ji bo girtin û dûrxistina Biroyê Heskê avêtibûn ser mala wî, lê di wê demê de Biroyê Heskê li malê nebûye. Piştî vê ku Biro ji bûyerê tê agehdarkirin, wî gazî kiriye ku tenê çek û hespê wî jê re bînin bes e!

Dema ku yekîneya cendirmên Tirk li Bazîdê, li gundê Mûsonê li pey Biroyê Heskê Têlî û zarokên wî ketine, li quntarên Çiyayê Araratê deng bi Tivingan ketiye, û êdî ev teqînên fîşengan bûye îşaret û despêka serhildanek din li Kurdistanê.

Serhildana Araratê a ku di bihara sala 1926`an de teqiya, û heta havîna sala 1932`an dom kir wiha dest pê kiribû.

Piştî ku Biro tevî 30 kes ji xizmên xwe berê xwe daye çiyayê Agirî, di navbera wan û hêzên artêşê de çend caran şer derket. Di encama van şeran de leşkerên Tirk paşve vekişiyan, û gelek sîleh û cebilxaneyên wan jî ketin destê serhildêran. Piştî van pevçûnan hevdîtinek di navbera zabitên Tirk û Biro de li gundê Cebê Kumetê pêk hat, lê Biro daxwaza teslîmbûnê qebûl nekir.

Bi destpêkirina berxwedana Biroyê Heskê li hemberî biryara veguhastina bi zorê ya Kurdan ji aliyê Tirkan ve, piştî demekê Ferzende Begê Hesenî kurê Silêmanê Ehmed digel Xalis Beg, Ebdulqadir, Kazim Beg, Tacdîn Beg, Eyûb Axa û gelek navdar û mêrxasên wê demê, ku ew jî bi sedema zext û gefa dûrxistinê ji aliyê dewleta Tirk ve direviyan, xwe avêtin bextê Çiyayê Araratê, û li cem Biro û birayê wî êvirîn. Di nav wan de şervanên eşîrên Keskoyî, Sakan û Şemsikan jî hebûn. Ew digel malbatên xwe hatibûne Agirî û êdî bi vî awayî Agirî bibû qibleya berxwedanê. Herwiha ew kesayetiyên navdar ên Kurd ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve hatibûn dûrxistin, ew jî ji Anadolê direviyan da ku xwe bigehînin Araratê. Di nav wan de jî Şêxên Zîlan, Şêx Evdilwehab û pismamê wî Şêx Resûl Berzencî hebûn.

Li bihara sala 1927`an ku sir û serma şikiya, mêrxasên Araratê çend caran hêrişî ser hêzên artêşa Tirk kirin, û carekê jî navçeya Bazîdê rizgar kirin.

## *Piştevaniya Xoybûnê ji serhildana Araratê*

Dema ku ji Araratê peşqela agirê serhildanê bilind bû, Îhsan Nûrî Paşa ku wê demê li derdora Xinûsê bû, ji aliyê rêkxirawa neteweyî a Xoybûnê ve wek fermandê şervanên Araratê hatiye wezîfedarkirin.

Piştî vê ku Îhsan Nûrî gihîşte çiyayê Araratê, çend hefteyan şûnde li roja 13.09.1927`an hêzên artêşa Tirk hêrişeke mezin kirin ser Araratê. Hejmara leşkerên Tirk zêdetir ji 10 hezar kesî bû. Wan ji bakûrê çiya ve yekîneyeke mezin a leşkerî di nav Agiriya Mezin û Agiriya Biçûk de bicih kirin, û dest bi hêrişê kirin. Piştî vê ku bi top û mîtralyozan dest bi teqekirinê kirin, şervanên eşîra Sakan ku li milê Îranê bûn, gihîştin hawara serhildêrên Araratê.

Wan pevçûnên dijwar çend rojan domandin. Di encam de leşkerên Tirk bi dana zirareke zaf ya canî ku di nav wan de çendîn zabit hebûn, û herwiha digel vê ku dehan kes ji wan bi dîl hatin girtin, û gelek çek û teqemenî li paş xwe bi cih hêlan, paşve vekêşiyan. Kurdan jî piştî çend rojan, dîlên di destê xwe de serbest berdan. Çemê Bazîdê di navbera serhildêrên Agirî û artêşa Tirk de bibû sînor.

Piştî ku Îhsan Nûrî û şervanên Agirî hêrişa artêşa Tirk bêbandor kirin, Îhsan Nûrî li çiyayê Araratê dest bi organîzekirina hêza şervanên Araratê li ser bingeheke leşkerî, û perwerdehiya wan kir. Komeleya Xoybûnê jî bo vê mebestê kadrên xwe şandibûn Araratê. Bi vî rengî berxwedana Araratê her diçû xurttir û berfireh dibû, û serokên Kurdan jî berdewam berê xwe didan vî çiyayî.

Ji aliyekî din ve yekîneyeke pîşekarên rêkxirawa lîbral a Ermeniyan bi navê “Daşnak” jî bi serperestiya Erdeşêr Muradiyan bo piştevaniya serhildanê hatibûne Agirî. Ev pîşekar û welatparêzên Ermenî ku ligor peymana di navbera Xoybûn û Daşnakê de hatibûn Araratê, di warê teknîka çapkirina kovara Agirî û dirûna cilûberg û yonîforman, û dabînkirina çek û teqemeniyan bo şervanên Araratê kar dikirin. Erdeşêr Mûradiyan ku bi Zîlan Beg dihate naskirin, li sala 1929`an ji aliyê leşkerên Sovyetê ve hat girtin, û piştre ew

gullebaran kirin.

Her ku diçû şervanên Araratê zêde dibûn. Desteyên Araratê heta Erzirom û Deşta Mûşê belav bibûn, û li wan deveran hêrişî ser baregehên artêşê dikirin. Derdora çiya jî di destê hêzên Araratê de bû. Piştî serkevtinên leşkerî û siyasî, bi biryara Xoybûnê di herema Azadkirî de Komara Araratê hate avakirin.

**Belgeya hejmar: 53**

Research Article published on International Crimes and History Journal, 31st October 2018 (Publication Number 19, pages 177-242) written by Moumdjian, Gabaret K. "Armenian Involvement in the 1925 (Ararat) and 1937 (Dersim), Kurdish Rebellions in Republican Turkey: Mapping the Origins of Hidden Armenians".

Mijara lêkolînê: "Beşdariya Ermeniyan di serhildanên Kurdan de, li sala 1925`an (Ararat), û sala 1937`an (Dêrsîm) di Tirkiyeya komarî de: Xerîteya resenatî ya Ermeniyên nediyar."

Nivîsîna "Momid Jiyan û Gabarit. K" ku di kovara navdewletî a tawan û dîrokê de, li rêkevt 31.10.2018`an (hejmar 19, rûpelên 177-242) hatiye weşandin.

Rûpela 185, beşa yekem

Xoybûn/afirandineke Federasiyona Şoreşa Ermenî

Federasiyona Şoreşa Ermenî naskirî bi (F.Ş.E) ji wê demê şûnda ku di sala 1921`an de ji aliyê Komara Ermenistanê ve têkoşîna wê hate sekinandin, aliyê kêm nêzî 5 salan dom kir, heya ku bikare pêkhate û pile û payeyên xwe destnîşan bike. Di kongireya cîhanî a "F.Ş.E"ê de ku sala 1923`an li Viyenê hate lidarxistin – tenê di asta rawêjkariyê de- hatin vexwandin.

Du salan piştre li sala 1925`an 10`emîn kongireya cîhanî a "F.Ş.E" hate ragehandin. Di heyama vê kongireyê de bû ku mijara beşdariya "F.Ş.E" di serhildanên Kurd de hate baskirin.

Kongireyê biryar da ku hemû wan tiştan bipejirînin ku ew rêkxistin dikare bona wê mebestê kom bike. Biryara hevkarî û beşdariya di şoreşên pêşerojê ên Kurd de, biryareke stratejî a 10-emîn kongireya cîhanî a "F.Ş. E" bû. Bi vî rengî dikarin çareseriyê ji bo wan mijaran bibînin, ku piştî şerê mezin (şerê cîhanî) çaresernekirî mabûn.

R: 186, beşa 4:

Civînê piştre biryar da ku rêkxistina Xoybûnê ava bike. Komîteya

Birêveberiya Xoybûnê pêk hatibû ji Sureya, Celadet û Kamiran Bedirxan -ku bira bûn- û herweha Memduh Selîm Beg, û Şahîn Beg.

Celadet Bedirxan li sala 1927`an heya sala 1932`an serokê komîteya birêveberiyê bû. Xoybûnê li 28.10.1927`an banga serxwebûna Kurdistanê kir, û herwiha ragehand ku ew di rewşa şer digel Tirkan de ne. Gundê Kurdava ku li quntara çiyayê Araratê ye, wek paytexta navendî a Kurdistana serbixwe hate ragehandin. Paytexta hertimî jî diviya ku Amed be.

R: 188, beşa 3

Rupen admits that instead of Ardashes Mouradian who had been arrested by the Soviets a new (continued on the next page)

Berî serhildana li herêma Araratê ku tê gotin serhildana herî bihêz a Kurd li Tirkiyê bûye, serhildaneke biçûktir a Kurd li Îranê li sala 1926`an dest pê kir. "F.Ş.E" bo danîna têkiliyeke dostane digel Îranê, hemû çalakiyên alîgiriyê bi Kurdan re ragirtin. Digel vê yekê jî kongireya 11`an a cîhanî a "F.Ş.E" biryar da ku pêbendî yekparçeyiya xaka Îranê be. Bona pêşîgirtin ji her fêmkirineke şaş di navbera xwe û hikûmeta Îranê de, nivîsîngeha "F.Ş.E" ji kadrên demsalî ên xwe, kesek bi navê "Rûpên Dêr Mînasiyan" li sala 1929`an de şande Tehranê, û wî bi zûyî daxwaza civîneke taybet digel Teymûr Taş kir, ku fermandeyê "Dî Fakto" a Îranê bû. Teymûr Taş û "Rûpên Dêr Mînasiyan" derheqê çareseriya kêşeya Kurd peymanek li dar xistin, ku Şah bixwe jî ji vê peymanê agehdar nebû. "Rûpên Dêr Mînasiyan" qebûl kir ku di cihê "Erdeşêr Muradiyan" ku ji aliyê Sovyetê ve hatibû girtin, wê kadreke nû bişînin cihê wî.

L:189 beşa 1 (F.Ş. E):

"Kalousdian" digel hinek şerkerên "F.Ş.E" bo sînorê Îran û Tirkiyê hatin şandin, da ku li Araratê xwe digel hêzên Kurdî rêk bixin.

L:190 beşa 1

Peymana hevpar a "F.Ş.E" digel Îranê li ser bingeha berfirehkirina qada şoreşa Kurd bû. Eşîrên Kurd li milê başûrê bakûrê Îranê piştevaniyeke bihêz ji hêzên Îhsan Nûrî Paşa û "Kalousdian" kirin, da ku nehêlin hêzên Tirk li aliyê başûr dewra wan bigrin. Hêzên eşîrên din ên Kurd divêt rêya Bazîdê li aliyê Wan û Ercîşê daxistibana. Ew peymana Tehranê ji aliyê serokatiya şoreşa Kurd ve hate qebûlkirin.

## *Damezirandina "Komara Ararat"ê*

Piştî vê ku Îhsan Nûrî û Biro qeveta xwe kirin yek, li Agiriyê gelek tiştên balkêş hatin qewimîn. Cara yekem Şoreşgerên Agiriyê cil û bergên leşkerî li xwe kirin, û kumên fermî yên leşkerî danîn serên xwe. Li Pêşiya kumê wan, wêneyên Agiriya mezin û biçûk bi hêmaya mertal hebû. Kumên efseran jî logoya Xoybûnê li ser hebû, û ji bona cudahiya di navbera wan de rutbe û qelem, simbilê genim, xencer û roj hatibûn bikaranîn. Şervanên Araratê bi perwerde û nîzamek leşkerî dest bi şer kirin. Herwisa ji ciwanan, rêkxistina leşkerî ava kirin.

Li ser wan erdên ku ji dijmin hatibûn valakirin, alaya Kurdistanê hildan. Di navbera salên 1926-1927`an de Biro û serokên din yên Agirî, di bin gelek zahmetiyên balkêş de, morala şoreşgerên Agiriyê bilind kirin. Di sala 1927`an de serokên serhildana Agiriyê civîna neteweyî a Kurdistanê li ser serê Agiriyê bi rê ve birin. Ev civîn wek parlamentoya (civata) Kurdistanê bû. Wê civînê erk û vezîfeya birêveberiya serbixwe û azad di herêma Agirî de dane rêkxistina xwe. Herwisa hevkarî û dostaniya bi gelê Ermenî û partiya wan a bi navê Daşnak re, wekî prensîp hate qebûlkirin û diyarkirin.

Civata Kurdistanê li Agirî, desteya birêveberiya hikûmata xwe hilbijart. Her çiqas vezîfeya hikûmetê bi piştgiriya rêkxistina Xoybûnê, çareseriya pirsgirêkên navxweyî û derveyî bû, di heman demê de erk û vezîfeya serekî a parlametoyê, ji bona rênîşandayîna şerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê bû. Di vê civînê de parlementoya Kurdistanê, Biroyê Heskê Têlî û Îhsan Nûrî bo serokatiya giştî hilbijartin û Biro Heskê Têlî bû serokê giştî yê berxwedana Agiriyê, û Îhsan Nûrî jî bû Fermandeyê Giştî yê şervanên Agiriyê. Herwisa marşa netewî a bi navê "Hilbe Agirî" danîn, û piştre rojnameyek jî bi navê "Agirî" weşandin.

Parêzgeha Agirî jî wiha hatibû tesbîtkirin: Fermandeyê Ewlekariyê Temir Axa, Qaymeqaymê Navçeya Korxanê Mele Husên Efendî, birêveberê Xopana Botî Îbrahîm Axa, birêveberê Xopana

Ortî Hesen Efendî, û birêveberê Xopana Qorî Musa Berkilî Axa bû". Di dema şer de ku leşkerên Tirk dîl dihatin girtin, bi awayekî nîzamî serbest dihatin berdan, û ligor yasaya şer reftar bi wan re dihat kirin.

**Deqa sirûda neteweyî a Komara Araratê ku ji pirtûka Îhsan Nûrî Paşa fermandê giştî yê serhildana Araratê hatiye wergirtin:**

**Agirî**

Agirî, Agirî tu agir bûy
Li nav dunya serbilind bûy
Li ser Kurdistan çira bûy..!
Hilbe Agirî, hilbe Agirî..!

Agir dirêjand ser seran
Ronahî direşand her deran
Erd dihejand car caran
Hilbe Agirî, hilbe Agirî...!

Newalên te tijî xwîn bûn
Xilxilên te tijî cendek bûn
Raste berê agir tu bûy
Îro agir lawên te bûn...!

Şerq û xerb bask wergirtiye
Ser sîngê xwe lav girtiye
Kurdan ra tu ke`ibe bûyî
Hilbe Agirî, hilbe Agirî...!

Îro dîsan hêrsa te hat
Ev agiran bûne kalat
Kom bûn êdî ser te civat
Hilbe Agirî, hilbe Agirî ...!

Roja azad ser te hilat
Ronhî ta besre reşand
Nav milletan azadî çand
Hilbe Agirî, hilbe Agirî ...!

Bertsînga te sî girtiye
Ala Kurdan lê hil bûye
Kurdan re tu ke`ibe bûy
Hilbe Agirî, hilbe Agirî

Ji sawa te Tirk digirî
Te dît çawa Romî revî
Hilbe Agirî, hilbe Agirî
Hilbe Agirî, hilbe Agirî

**Belgeya hejmar: 54**

Deqa rûpela yekem a hejmara 2 a rojnameya “Agirî” a serdema serhildana Agirî

Tarîxa derketin: Agirî

1346 (1930 )

Mudîr û sernvîs:

Cimşîd

Hejmar:2


Her hejmar: 2 Qirûş

Şeş mehî: 10 Qirûş

Salê: 20 Qirûş

25.02.1930

Yekşem Cerîde resmî û Kurdî ye



**"Romî çira (bo çi) neyarê Kurdan e"**

Tirk ehlê Tirkistanê ne, zemanê kevn da bi mihaciretî hatine Anadolê û erd standine, û rûniştine. Ehaliyê dora xwe jî tabi`ê xwe kirine, û bûne hikûmet. Bi yekbûniyê xebitîne. Ji dîn eynî îslamê jî îstifade kirine. Siyaseta Îslamî te`iqîb kirine, milelê Îslamî ra yek bûne, û xwedê jî nusret daye, û hidûdê xwe fire kirîne. Milelê din ê Misilman jî "Kurd, Ereb, Laz, Çerkez, ... û Gurcî" bona dîn çawa xilafet di rêya hikumeta Tirkan de fîda kirine, û ji ruhê xwe derbaz bûne, û bi şan û şeref, beyreqa Osmanlî bilind kirine.

...... bi qaveta leşkerî û siyasî, her du alî teşkîl kir. Şerê Îtaliya û piştî wê jî, şerê Balkan derket. Arnado nadol, cardin jî `isyan kir. ...bû, tev leşkirên Sirb û "Yûnan" aqibet ji destê Romî xilas bûn. Îsal êdî temam nebû, şerê mezin çêbû. Ji wî şerî jî Ereba îstifade kir. `Isyan kir, û ew jî ji dest Romê xilas bûn.

Romê fikir kir ku ji erdê xwe, ji pênca çar çû, û destê wî da ma yek. Ew jî nivî Kurd e, paşê nivî Tirk e.

Xak û eslê miletê Tirk di şerqê dayne. Aliyê Rojhilata deryayê Xezer ciyê Tirk û Tirkistan e. Aliyê rojavayê deryayê Xezer ciyê hidûdê Tirkiyê jî, Tirk ê Azerî ne. ....

Yan şiloxiyê derxe, yan îtihadê xwe çêke, yan hikûmetek Tirkî bide teşkîlkirin. Dibît êdî li Tirkan tê bigihîje, ew feqet mabeynê Îranê da miletê Kurd ku Îranî ye, û te`esuba Îrantiyê dikşîne, mane. Bi wê meqsed û mecburiyetê bûye dijminê Kurdan, û miletê Kurd qir dike, mehw dike, da ku rêya xwe bo Tûranê serbest veke. Nek mesela dîn û te`esub e.

Kurmanc hikûmeta Romî ra, ji miletê Tirk sadiqtir û mutî`itir jî bibe, çare nine. Romî ji bo berjewendiyên xwe ên paşerojê, wê me tehcîr bike, bikuje, û mehw bike. Miletê Kurd rûbirûyê tehlîka kuştinê jî bibe, dîsa mecbûr e merdane bixebite, yan Romê mexlûb bike, û hikumeta xwe teşkîl bike, xwe azad ke, yan li ser namûs û şerefa xwe bimre. Qe nebe .....

Bi baldan û hûrbûna ji naveroka sergotara hejmara 2 a rojnameya "Agirî" ji me re eşkere dibe, ku nivîserê mijarê çiqas zanistiyane hewl daye ku, tevî zelalkirina paşxana dîrokî û erdnîgarî a neteweyên Orasiya û Rojhilata Navîn û Balkan, bikare li ser bingeheke teorî û me`irifî rewayiya pirsa Kurd wek neteweyeke xwediyê nasnameya xak, ziman û dîrokê, bixe ber çav. Herwiha bi hevberkirina Kurdan digel wan neteweyên derdorê, ku beşek ji wan wek koçer hatine van herêman, û bi sûdwergirtin ji mijara ayînî, bo xwe dewlet ava kirine, lê Kurd hêşta jî bindest e, û nekariye dewleta xwe ya neteweyî ava bike. Lewma îşarê bi vê yekê dike ku bona dewletbûnê, divêt sê mijarên sereke wek: Hêza siyasî-leşkerî, yekîtiya navxweyî û îradeya dewletbûnê hebin.

**Doma serhildana Agirî**

Rejîma Enqerê ku amedakariya hêrişeke giştî dikir, ji bo ku bikare hinek wext bi dest bixe, çend pîlan danîn. Ligor vê yekê di sala 1928`an de, efûyeke giştî derxist. Qasid şandin pey Îhsan Nûrî, û daxwaza hevdîtinê kirin. Dewletê li hember efûyeke giştî de, teslîmbûna serhildêrên Kurd dixwest. Şertê aliyê Kurd jî ew bû, ku pêşiyê divêt Kurdên dûrxistî bo Anadolê, vegerin ser xaka xwe.

Lê Tirkan ji bo xweradestkirina şoreşgerên Araratê, û çekdamalîna wan efû derxistiye, û gotiye kengê we ew merc cîbicî kirin, hingê ewê îzin bidin Kurdên dûrxistî vegerin cî û warên xwe. Bi vî awayî niyeta Tirkan derket meydanê, û gelek malmezinên Kurd ku ji wargehên xwe hatibûn dûrxistin, berê xwe dan binxetê li Rojavayê Kurdistanê.

Di heman demê de pevçûnan jî dom dikir. Birêvebiriya Araratê desteyên biçûk-biçûk ên şervanan ku ji dehan kesî pêk dihatin, di bin fermandehiya Ferzende Beg, Elî Beşo û Xalis Axa, dişandin Erziromê, heta ku li wan deveran li aliyê piştê ve hêrişî ser xetên artêşa Tirk bikin.

Piştî ku derket qanûna efûya giştî a Tirkan, nekarî bandorê li ser birêveberên Komara Araratê û Xoybûnê danê, rejîma Enqerê ji bo hevdîtinên bi Îhsan Nûrî re heyeteke din şand Bazîdê. Di nav wan de

du karbidest û fermandeyên artêşê jî hebûn. Şanda Komara Araratê jî Biroyê Heskê, Îhsan Nûrî Paşa, Ferzende Beg û Xalis Beg bûn.

Hevdîtina meha Gulanê a sala 1928`an di navbera herdu aliyan li nêzî Bazîdê, li ser pira Şêx pêk hat. Nûnerên dewletê digotin ku ger serhildêr aram bisekinin, û Îhsan Nûrî ji heremê veqete, ewê jî hemûyan efû bikin, û hingê dikarin bi çekên xwe ve herin malên xwe. Wê demê Îhsan Nûrî Paşa jî wê bikare bi dilê xwe welatekî bo akincîbûna xwe hilbijêre, û li wir bibe balyozê Tirkan, yan jî dikare bibe fermandeyekî payebilind ê artêşa Tirkiyê.

Li hember wê daxwaza Tirkan, Îhsan Nûrî jî digot: "Divê Tirk rêza alaya Kurdan a li Araratê bigrin û ez tenê balyozê netewa Kurd im. Herwiha daxwazê jî nakim ku dewlet min efû bike. Şertê rawestandina şer jî, bi fermî naskirina serxwebûna Kurdistanê ye".

Bi vî awayî ev hevdîtin jî vala derket. Tenê li ser vê yekê li hev kirin ku, nabe dewlet leşkeran bişîne ser Araratê, û nabe serhildêr jî hêrişî ser artêşa Tirk bikin. Herwisa aliyê Tirk soz dabûn ku wê hevjîna Îhsan Nûrî, Yaşar Xanimê bişînin Helebê. Piştî çend mehên ku di nav aramiyê de derbas bû, hevdîtineke din jî li gundê "Kanîkork"ê di navbera du aliyan de pêk hat. Lê ew jî bê encam bû.

Di vê navberê de carna di nav aliyan de şerên mezin jî derdiketin. Şerê Kanîkorkê ku di sala 1929`an de qewimî, û çend hefteyan dom kir, yek ji şerên herî mezin bû. Di payîzê de leşkerên Tirk peymana agirbirê binpê kirin, û gundê Kanîkorkê ku li ser sînorê Komara Ararat û Komara Tirk bû dagîr kirin, ku ew gund hatibû şewitandin.

Li ser vê yekê hêzên Araratê hêrişî ser leşkeran kirin. Şer di deştê de qewimî. Di encam de leşkerên Tirk ji heremê vekişiya. Balafireke wan ket û gelek çek û dîl jî ketin destê Kurdan. Zivistana wê salê jî di bin bombebaran, û hêrişa li dijî şoreşgerên Araratê derbas bû.

Artêşa Tirk ji aliyekî din ve ji bo amadekariya şerê mezin li derdora Araratê rê vedikir, û baregehên leşkerî ava dikirin. Artêşa Tirk li despêka sala 1930`î li nêzî Araratê dest bi tevgereke nû kir. Hemû hêzên çalak ên artêşê li quntarên çiya civiyabûn.

Bi destpêka biharê balafirên Tirkan dest bi bombebarana rojane kiribûn. Lê pir bilind difiriyan, û zirar nedidan Araratiyan. Serleşkerê

Tirk Salih Paşa û fermandeyên wan ên bitecrûbe jî li heremê civiyabûn. Ji bo hêrişa mezin, balyozê Tirkiyê yê li Almanya, general Kemaletîn Samî jî anîbûn. Kemaletîn Samî berê li vê heremê mabû, û di artêşê de, bi Îhsan Nûrî re xebitîbû. Hejmara leşkerê Tirk bona hêrişkirina ser Komara Araratê, gihîştibû 70 hezar kesî.

Wan 50 balafir, 10 yekîneyên topên mezin, û 550 mîtralyoz jî anîbûn derdora Araratê. Li hember wan hejmara şervanên Agirî zêdey hezar kesî bûn, ku piraniya wan çekên sivik hebûn. Wan Çend mîtralyoz û top di pevçûnan de ji leşkerên Tirk bi dest xistibûn, lê ew jî bê gulle bûn.

Heya wê demê ku sînorê Îranê di destê hêzên Araratê de bû, pişta wan li aliyê Îranê qahîm bû. Li gor sînorê wê demê beşek ji çiyayê Agirî di nav xaka Îranê de bû. Ji ber vê yekê artêşa Tirk nikaribû dora çiyayê Agirî bigre. Erzaq û qismeke sîlahên serhildêran ji Îranê ve dihate serê çiya.

Pîlana artêşa Tirk hêrişa rasterast bo ser çiya bû. Wan bi hêrişeke berfireh ya bejahî û esmanî ku bi hêzeke xurt hate encamdan, karîn çiyayê Agirî yê mezin dagîr bikin. Hêzên Komara Araratê jî, ji aliyekî ve, parastina çeperan dikirin, ji aliyên din jî, desteyên gerok li heremên Diyadîn, Tendûrek, Patnos, Sîpan û Zîlanê, ji pişt re hêrişî çeperên artêşê dikirin. Herwisa gelek desteyên biçûk li Amed, Mûş, Çewlik û Erziromê digeriyan, û hêrişî baregehên leşkerî dikirin. Rêvebiriya Araratê jî bona ku pîlanên artêşê vala derxe, li sala 1930`î li herema Zîlan û Suphan jî biryara serhildanê dan. Ew herêm di destê eşîra Heyderan, Bekiran, Sîpkan, Ademan û Kalkan de bû. Serokên wan herêman jî endamê Xoybûnê bûn.

Piştî ku fermana Araratê gihîşte wan eşîran, serhildana wan berî dema diyarîkirî bo serhildanê dest pê kir. Li havîna sala 1930`î hêzên Kurd li herêma Zîlan û Suphanê, herişî baregeh û bajarên Hesen Evdal û Noşarê kirin, û leşkerê wir teslîm bûn.

Paşê bajarên Erdîş, Patnos û Bargirî ketin destê hêzên serhildêrên Kurd. Di hêrişa li ser balafirxana Erdîşê de, hêzên Kurd du balafir li erdê şewitandin, û du jî xistin. Di nava çend rojan de geliyê Zîlan û deşta Suphanê ji artêşa Tirk hatibû paqijkirin. Bi dehan leşker û zabit

dîl hatibûn girtin, û gelek çek jî ketibûn destê serhildêran de.

Lê hêzên Zîlanê berî dema diyarkirî ji aliyê fermandehiya Araratê serî hildabûn, lewma tenê mabûn. Herwisa di nav serokê eşîra Heyderan Memed Beg û Şêx Resûlê Berzencî de nakokî hebû. Herwiha beşekî eşîra Keskoyî jî alîkariya dewletê kiribû, û pêşiya serhildêran girtibûn. Artêşa Tirk jî bi hêzeke mezin dora heremê xistibû nav çembera xwe.

Wê demê Komara Araratê bi sedema vê ku serhildana Zîlanê berî dema diyarîkirî dest pê kiribû, nekarîbûn bi hawara Zîlanê de herin. Lewma dora heremê ji aliyê hezaran leşkerên Tirk ve hatibû girtin. Çend desteyên ji şervanên Kurd ku ji Araratê ve gihîştibûn heremê, tenê karîbûn bi hêrişên xwe, rê bo derbazbûna xelkê sivîl ji dest komkujiya artêşa Tirkiyê vekin. Malbatên ku ji Zîlan û Sîpanê direviyan, derbasî aliyê Îran û Araratê dibûn.

Piştî ku serhildana wir têk çû, cendirmên Tirk xwe gehandin gundan. Artêşa Tirk li geliyê Zîlan li heremê dest bi kuştina gundiyan kir. Di nav çend hefteyan de leşkerên Tirk di encama jînosayda li hember Kurdan de, 320 gund şewitandin û li gor amarên cuda-cuda ji 15 heya 20 hezar jin û zarok, û pîr û kal komkuj kirin. Hevdem Artêşa Tirk çembera dora Araratê jî dişidand.

Herwisa hewlên dîplomasî ên rejîma Tirkiyê digel welatên cîran bona jinavbirina serhildana Araratê dom dikirin. Rejîma Tirk bi taybetî bi Yekîtiya Sovyet û Îranê re têkiliyên xwe baştir dikirin, û ji bo ku ew dewlet rê li serhildêran bibirin, û li dijî wan alîkariya Enqerê bikin tedbîr distandin. Herwisa Sovyetê jî li dijî Araratê ji Tirkan re hemû alîkariyek dikir. Hevdem wan bixwe jî li ser Îranê zext dikir, ku heta Îran jî divêt li hember Kurdan tedbîran bigre.

Çend car leşkerên artêşa Sovyetê ji bo çavtirsandinê, ketibûn Îranê. Li gor Sovyetê Daşnak û Xoybûn piştgirên Îngîlîzan bûn, û wan dixwast li sînorê Sovyetê dewleteke tampon damezrînin, û serhildana Araratê jî bi vê armancê serî hildaye, û li dijî berjewendiyên Sovyetan e.

Ji aliyekî din ve dîplomatên Tirk her roj zext li sefîrên Îngîlîz û Feransî jî dikirin ku ew di Sûriyê de pêşiya xebatên Xoybûnê bigrin, û

nehêlin Xoybûn têkiliya xwe bi Araratê re bidomîne.

Artêşa Tirk di 11.06.1930-î de dest bi hêrişa giştî kir. Pêvçûnên yekem li Birnê Reş û Birnê Sor derketin. Heta 27`ê Tîrmehê pevçûnên nav aliyan bê ravestan dom kirin. Piştî destpêka şer hêzên Kurd jî dest bi hêrişa giştî kirin û heta 20.08.1930`î ji xeta Borsiyê heta Bazîdê ji artêşa Tirk standin. Di nav de Diyadîn, Îdîr, Erdîş û Bargirî, û gelek navçe û heremeke berfireh ketibû destê hêzên Kurd de. Hêrişên yekîneyên gerok jî li derdora heremên Araratê dom dikir.

Di vê demê de artêşa Rûs li quntara Agiriya Biçûk, ji çemê Erez sînor derbas kirin, û li dora çiya li pêşberî şervanên Araratê cihgir bûn. Hêzên Rûs berê top û çekên xwe dabûne aliyê şervanên Kurd, û agir li wan dibarandin. Li ser vê yekê hêzên Kurd hêrişî bajarê Başkendê kirin. Eşîra Kizilbaşoxlî ku ji Îranê hatibûn, ew jî tevlî serhildêran bûn. Bajar li sînorê Sovyetê bû. Rêyên Îdirê jî hatibûn girtin. Bajar ket destê Kurdan. 200 leşker teslîm bûn. Yên ku rizgar jî bibûn derbasî sînorê Sovyetê bûn. Rûsan leşkerê Tirk diparast.

Di sala 1930`î de dema ku şoreşa Agirî di nav pevçûnê xedar û dijwar de didomiya, eşîrên Dêrsîmê jî hêrişî ser Artêşa Tirk kirin. Di bihara sala 1930-î de, şervanên Seyîd Riza li herêma Dêrsîmê hêrişî ser baregehên leşkerên Erzirom û Erzincanê kirin. Li ser vê yekê ji sê aliyan ve yekîneyên Tirk ketin Dêrsîmê, û heta zivistanê li heremê şerên dijwar dom kir. Herwisa li sînorê Îraqê, hêzên eşîra Barzan di bin serokatiya Şêx Ehmed de ji bo alîkariya Araratê du caran li herêmên Oremar û Şemzînan avêtin ser baregehên Tirkan.

Tirkiyê di Tîrmehê de bi Îranê re peymanek pêk anî. Li gor vê peymanê sînorê Îran û Tirkiyê ji nû ve dihat diyarîkirin. Li hember hin eraziyên sînorê parêzgeha Wan a Bakûrê Kurdistanê ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve bi dewleta Îranê hatibû dan, rejîma Îranê jî li hember de, ew beşa çiyayê Agirî a biçûk ku di nav sînorê wan de dima, dabû Tirkan. Ev peyman bi dizî ve hatibû îmzekirin.

Riza Şahê Îranê dostê Mistefa Kemal Ataturk bû. Di heman demê de dewleta Îranê li ser koçberên Zîlanê jî zext dikirin, ku hewara xwe bo Rojhilatê Kurdistanê biribûn, hêzên çekdar ên Îranê hêriş dikirin ser wan koçberan, û ji wan dixwestin ku ew cardin vegerin xaka Tirkiyê.

Ji ber vê yekê çend caran di navbera wan de şer jî derketibû. Di vê navberê de Zabitên Azerî ên artêşa Îranê dijmintiya Kurdan dikirin. Herwiha dewleta Îranê eşîra Qizilbaşoxlû jî ku alîgirên serhildanê bûn, ji xaka Tirkiyê kişandibûn Îranê.

Di dawiya rojên havîna sala 1930-î de artêşa Tirk, çiyayê Araratê bi tewahî girt, û hevdem ji aliyê Îranê ve jî hêrişî ser şervanên Komara Araratê hate kirin. Li hember hêrişa vî alî de Araratî xafilgîr bibûn, û tu tedbîr nestendibûn. Eniya şer pir fireh bibû. Di rewşeke wiha de êdî şervanên Araratê nedikarîn hemû eraziyan biparêzin.

Bi taybetî piştî komkujiya geliyê Zîlan, bi hezaran sivîlên ku di nav de malbatên serhildêran jî hebûn, xwe avêtibûn Araratê. Sermayê dest pê kiribû. Xwarin û stargeha nifûsa çiya, têrê nedikir. Piştî vê hêrişa mezin a Tirkan û herwiha hevkarî a dewletên Sovyet û Îranê bi Tirkan re li dijî Araratiyan, bi vî halî jî şervanên Araratê berxwe didan, û derbeyên giran li dagîrkeran dixistin. Li aliyekî din ve jî çiqas şer dirêj dibû, zehmetiya jiyanê jî girantir dibû. Rêya Îranê hatibû girtin û xwarin nemabû.

Artêşa Tirk ku bi hêz û teknolojiya nû a leşkerî hatibû teyarkirin, di hêrişên xwe de giranî dida bombebarana sivîlan. Hêzên Araratê nekarîbûn sivîlan biparêzin. Jiber vê yekê biryara derbasbûna sivîlan ji bo Îranê dan, û hêrişî ser çeperên Tirkan kirin, ku ji aliyê Îranê ve hatibûn.

Şervanên Araratê karîn hêrişa Tirkan ya li aliyê Îranê têk bişkînin, û xelkê sivîl kom bi kom derbasî Îranê dibûn. Bi vî awayî serhildana Araratê li milê Bakûr têk çû.

Rojên pêşîn ên payîza sala 1930-î bû. Rojnameyên Tirkan di xêzên xwe de li ser çiyayê Araratê, tirbek çêkiribûn û digotin, “Xeyala Kurdistanê li vir hate veşartin.”

Li gor rojnameya “Times” a Îngilîzî ya 24.07.1930`î di van şeran de artêşa Tirk 800 kuştî, 2 hezar birîndar û 700 jî dîl li pey xwe hişt. 8 balafirên wan jî ketibûn. Herwiha 2 topên giran, 30 mîtralyoz, 600 çek, 50 çadir û barê 60 qantiran cebilxane jî ketibû destê şervanên Kurd. Rejîma Tirk ku bi hêrişên leşkerî encam nedigirt, dest avêt rêya wergirtina alîkariyan ji Îranê.

Bi vî awayî Komara Araratê ku di sala 1927`an de hatibû damezrandin, heta sala 1930-î dom kir, û di dawiyê de bi pîlana hevpar ya Tirkiye, Îran û Sovyetê têk çû.

Piştî têkçûna Komara Araratê fermandeyên wekî Biroyê Heskê, Îhsan Nûrî Paşa û Ferzende Beg jî derbasî Îranê bûn. Bi giştî 900 şervan tevî malbatên xwe gihîştin bajarê Makûyê. Gelek ji wan di nav xaka Îranê de belav bûn. Hêzên Kurd ku derbasî aliyê Îranê dibûn, demekê şûnde rejîma Îranê jî daxwaza radestkirina çekan ji wan dikir. (Ji lêkolîna nivîskar Feysel Daxlî mifah hatiye wergirtin).

**Derheqê serhildana Araratê "Chris Kutschera" nivîsiye:**

"Li roja 19.05.1931`an Kurdên Celalî, Mîlan û Heyderanlo, tevî şervanên Araratê, yên ku ji Bakûrê Kurdistanê hatibûn, li herêma Qere Eyn a Makûyê hêrişî ser baregeheke mezin a hêzên Îranî kirine. Di wê hêrişa şoreşgerên Kurd de derbeyek giran li hêza Îranî ketiye, ku ji 5 hezar leşker û çekdarên herêmî pêk hatibû. Tê gotin ku di wî şerî de hêzên Îranî nêzî 1500 kuştî û birîndar hebûne".

## *Berdewamiya serhildana Araratê li herêma Makû a Rojhilatê Kurdistanê*

Piştî têkçûna serhildana Araratê li aliyê Tirkiyê, serkirde û fermandeyên serhildanê digel sedan şervan û hezaran xelkê sivîl, di nav şerekî giran de, karîn dorpêça hêzên Îran û Tirkiyê têk bişkînin û rêya xwederbazkirina bo Rojhilatê Kurdistanê vekin. Di wê demê de Îhsan Nûrî Paşa tevî hevjîna xwe, xwe radestî Îraniyan dike, û bo Tehranê tê veguhastin û heya dema kuştina wî bi rêya bûyereke biguman a hatûçûnê li 25.03.1976`an, her li Tehranê jiyan kiriye.

Li herêma Makûyê hêzên Riza Şah daxwaz ji şoreşgeran kiriye, da ku bi çekên xwe ve, xwe radest bikin û dev ji serhildanê berdin. Biroyê Heskê û Ferzinde Beg û Ebdulqadir digel sedan şervanên Araratê û malbatên wan, ku xwe li herêma Makûyê bicih kiribûn, teslîmî daxwazên Îraniyan nabin, û bi piştevaniya eşîrên Celalî û Heyderanî li aliyê Rojhilat li ser berxwedanê berdewam dibin. Piştî heyamekê hêzên Îranê hêrişî ser şervanên Araratê dikin û ew hêriş dibe sedema destpêkirina şerekî dijwar ku sal û nîvekê berdewam bûye.

## *Şandina Emerxan bo şer li dijî serhildêrên Araratê ji aliyê Îraniyan ve*

Îbrahîm Şerîfî û Senar Mamedî di nivîsên xwe de bi hûrî behsa vê mijarê kirine, ku naveroka zaniyariyan bi vî awayî ye:

Piştî şehîdbûna Simko êdî roj bi rojê netifaqî û tevlîhevî di nav êlên Şikakan de zêde bibû, û hindek ji wan kesên ku têhniyê deshilata xwe bûne, hewleke mezin dane ku bibin serokê Şikakan. Yek ji wan kesên ku zêde dixwest bibe deshilatdar, Sertîpê kurê Mihemed Emîn bû.

Lê piraniya Şikakan ji paşeroja xwe nîgeran bûn, û ji dewleta Îranê ditirsiyan. Lewma bêhtir Emerxan hêjayî deshilatdariya Şikakan didîtin. Jiber ku Emerxan hem xwedîezmûn bû, û hem jî di wê demê de têkiliyên wî bi dewleta Îranê re baş bûn. Di encam de Emerxan wekî serokê Şikakan dihête destnîşankirin, lê nakokiyên di navbera Emerxan û Sertîp de her domandiye.

Li sala 1931`an dema ku eşîreta Şikakan hêj di nav reşpoşî û xema şehîdbûna Qehremanê mezin yê Kurdistanê Simkoyê Şikak de bûn, dewleta Îranê daxwaz ji Emerxan kiriye, ku ji bo alîkariya dewletê, divêt ew jî bi hêzên xwe ve herne eniya şerê li Agirî.

Li hember vê daxwaza Îranê serbarê vê ku Emerxan naxwaze here şerê li dijî şoreşgerên Agirî, lê ji aliyekî din ve ji ber rabihoriya Şikakan, ku di şoreşa Simko de li dijî dewletê şer kiribûn, dizane dewleta Îranê wisa bi hêsanî dev ji wan bernade.

Piştî zexta dewleta Îranê, Emerxan bi mercekê razî dibe ku wê daxwaza wan, bo çûna eniya şer li Agirî bi cî bîne, ku ew cihê hêzên Şikakan lê bin, nabe leşkerê dewleta Îranê li wir bimînin. Dewleta Îranê wê mercê Emerxan qebûl dike, û ew jî tevî hêzeke xwe ya bijarde, li derdora Agirî bi cî dibin.

Dema ku Emerxan û hêzên Şikak bi zora dewleta Îranê li Agirî bi cih dibin, piştî heyameke kurt li wir bi dizî ve ji bo hevdîtina bi Biroyê Heskê Têlî re, şandekê dişîne cem wî. Biroyê Heskê jî wê pêşniyara Emerxan qebûl dike û li ciyê diyarîkirî hev dibînin.

Di vê hevdîtinê de Emerxan ji Biroyê Heskê Têlî re dibêje; "Te

hay ji gotina dewleta Îranê heye, ku dibêje, ger Biroyê Heskê digel şervanên xwe dev ji şoreşê berdin, û çekên xwe radestî wan bikin, ewê jî ewlehiyê bidne wan, û jiyana wan jî wê biparêzin!?".

Piştî vê axaftina Emerxan, Biroyê Heskê gelekî ditengije û jê re dibêje; "Emerxan! yanî ez xwe radestî Îranê bikim, û çeka xwe bidim dijminê xwe!? Bila dewleta Îranê baş bizane, tenê gava ez hatim kuştin, wê demê ewê bikarin çeka Biroyê Heskê Têlî li ser termê wî rakin".

Dema ku Emerxan wan gotinên mêrxasane û helwesta şoreşgerî ya Biroyê Heskê dibihîze, ew jî dibêje; Birahîm Axa tu xatircem be, em jî her Kurd in, û em bi dilê xwe nehatine vir, û dilê me jî bi we re ye.

Piştre Emerxan gelek agahiyên girîng yên girêdayî bi çend û çavaniya leşkerê Îranê, û çek, teqemenî û planên wan dane Biroyê Heskê, û ew rênimayî kiriye ku çawa wan cihên stratejîk di eniya şer de biparêzin û nehêlin hêzên Îranê wan deveran bigre. Herwisa wan di navbera xwe de remz û rêkarên alîkariyê danîne, û biryar dane ku xwe ji şerê hevdu biparêzin.

Herwisa Emerxan soz daye ku rêya wan gundên li derdora Agirî bo şoreşgeran vekirî bihêle, da ku bikarin ji aliyê Îranê ve, xwarin û pêdiviyên xwe bigehînin eniya şerê li Agirî.

Li gor wê lihevtêgihîştina di navbera Emerxan û Biroyê Heskê Têlî de hatî kirin, heta ku Emerxan û siwarên xwe li herêma Araratê bûn, di heyama şeş mehan de şer û kuştin di navbera herdu hêzên Emerxan û şoreşgerên Agirî de neqewimiye.

Herwiha di vê heyamê de çend carên din jî, di navbera Emerxan û Ferzinde Begê Hesenî û şoreşgerên Araratê de hevdîtin çêbûne. Ev yek dibe sedema gumana leşkerên Îranê û li Emerxan bi şik dikevin. Lewma fermandeyê leşkerê Îranê ji Emerxan re dibêje; Emerxan êdî erk û vezîfeya te li vir bi dawî hat, divêt tu li vir nemînî. Emerxan jî bi bihîstina vê biryarê ji dil keyfxweş dibe, û bi hêzên xwe ve vedigere Zindeştê.

## *Kuştina Biroyê Heskê ji aliyê hêzên ser bi hikûmeta Îranê ve*

Karbidestên leşkerî yên Îranê piştî paşvekêşana hêzên Emerxan ji Agirî, bi merema dagirtina cihê wan bi hêzeke din a eşîrên Kurd, daxwaz ji herdu dijberên Emerxan, Sertîpê Mihemed Emînê pisaxa, û Hesenê Hinare dikin, û ew herduk jî wê daxwazê qebûl dikin û bi hêzeke kêm ya Şikakan diçin herêma Agirî.

Piştî demekê mana li herêma şer, sertîp û Hesenê Hinare derbarê hebûna têkilî û hevkariyên di navbera Emerxan û şoreşgerên Agirî de haydar dibin.

Herwisa ji bo ku bala dewletê bikşînin ser xwe, û pêgeha xwe li cem dewletê qahîmtir bikin, piraniya rêyên çûn û hatina şoreşgerên Agirî û gundên derdora Agirî dorpêç dikin.

Dema ku Biroyê Heskê Têlî ji vê kiryara kirêt ya Sertîp û Hesenê Hinare agehdar dibe, yekser wan agehdar dike, û ji wan re dibêje; hekî dilopek xwîna kurdatiyê di demarên we de hebe, nabe hûn bi alîkariya dijmineke wek dewleta Îranê şerê me bikin. Baştir e hûn jî wekî Emerxan digel me reftar û serederiyê bikin. Lê ev peyama Biroyê Heskê Têlî ji aliyê Sertîp û Hesenê Hinare ve nahête qebûlkirin.

Biroyê Heskê Têlî piştî bersiva neyînî ya Sertîp û Hesenê Hinare, êdî dizane ku rewş ne baş e, û ger nekare bi Şikakan re li hev bike, wê rêya çûn û hatina gundên li quntara Agirî bihête girtin, û herwisa wê roj bi roj dorpêça leşkerên Îranê û hêrişên Tirkan berfirehtir bibe, û baş dizane ku berfirehbûna dorpêçê, wê wan perîşan bike.

Li hemberî vê rewşê, Biroyê Heskê Têlî ji neçarî û bi armanca dîtin û lihevkirina bi Hesenê Hinare û Sertîp re digel hinek ji şervanên xwe diçe dîtina Sertîp û Hesenê Hinare. Lê di rê de li geliyê Derbend ku nêzî çiyayê Qocedaxê ye, dikeve kemîna hêzên Hesenê Hinare û di gullereşandina berahiyê de, Biroyê Heskê birîndar dibe, û piştî şerekî kurt Biroyê Heskê Têlî tevî hejmarek ji şoreşgerên Agirî têne kuştin, û piştî belavbûna xebera kuştina Biroyê Heskê Têlî bêhêvitiyeke mezin di nav şoreşgerên Ararat û

Celaliyan de belav dibe.

Derheqê Biroyê Heskê Têlî ji aliyê helbestvanê Kurd Osman Sebrî ve, parçe helbestek hatiye nivîsîn, û bi vî rengî dest pê dike;

“Rabe, de rabe Biro, de rabe
Bo çî te Ararat hîşt xirabe
Îro dîsa hat Roma bê eman
Gund şewitandin, nehêşt xwedî can”.

## *Dirêjiya serhildana Makûyê ji aliyê Ferzinde Beg û hevalên wî ve*

Di demekê de ku hêzên Îranê bi hevkariya Kurdên xwecihî, hêrişeke berfirek kirine ser şoreşgerên Agirî, û daxwaza çekdanîn û xweradestkirinê ji wan kirine, Ferzinde Beg û hevalên wî, radigehînin hekî hikûmeta Îranê garantiya parastina silametiya wan bike, û wan radestî Tirkiyê neke, û herwiha dev ji veguhastina bizorî ya jin û zarokên şoreşvanên Agirî berde, wê demê ewê jî xwe radestî hikûmeta Îranê bikin. Lê Îranî vê garantiyê nadin wan, û wan jî bi hevkariya êlên Celalî û Heyderanlî, Mîlan, Sakan, û Hesenî li aliyê Rojhilatê Kurdistanê heya nîva yekem a sala 1932`an dirêjiî bi berxwedana Makûyê li dijî Îraniyan dane, û derbeyek mezin li artêşa Îranê xistine. Di van şeran de artêşa Îranê bi hêzeke hezaran kesî û topxanê hêrişî ser şervanên Kurd kiriye, û hêzên Îranî zêdetir ji 500 kuştiyan dane, ku di nav wan de serheng Kelb`elîxanê fermandê mezin yê Riza Şah hebûye. Herwiha ji şervanên Araratê û zarokên wan jî zêdetir ji 100 kesî di berxwedana Makûyê de canê xwe gorî kirine.

Piştî van şeran êdî şervanên Araratê têk dişkên, û bi hezaran jin û zarokên Kurd ji aliyê serbaz û qezaqên Îranê ve têne destbiserkirin û bo herêmên dûrdest ên Îranê têne dûrxistin. Ew jin û zarok bi pêxasî û birçîtî ber bi herêmên nediyar têne birêkirin. Hinek ji wan dimrin, û ên dimînin li herêmên Qezwîn û Hemedanê têne akincîkirin, û hinek ji wan jî ku bêxwedî mabûn, ber bi sînorên Rûsiyê û Tirkiyê direvin. Di vê demê de Şêx Zahir ku yek ji serkirdeyên navdar ên şoreşa Agirî û Bakûrê Kurdistanê bû, ew jî li nêzî sînorê Rûsiye û Tirkiyê tê kuştin. Bi vî awayî şoreşa Araratê li encama pîlana hevpar a Îran û Tirkiyê û bi hevkariya Sovyetê bi yekcarî ji nav diçe, û şervanên wê ji hev belav dibin.

## Qedera Ferzinde Beg

Piştî têkşikana serhildana Araratê, Ferzende Beg ku Afrînerê şerê partîzanî di serhildana Araratê di Bakûrê Kurdistanê de bû, li Rojhilatê Kurdistanê jî bi hemen awayî tevî hevalên xwe, çalakiyên wisa li dijî artêşa Îranê bi rê ve birine, û derbeyên giran li wan xistine. Dema ku artêşa Riza Şah xatircem dibe ku nikarin bi rêya zorê, wisa bi hêsanî Ferzinde ji nav bibin, dest bi bêbextî û hîleyan kirine, û li ser navê Riza Şah Qur`ana mohirkirî bo Ferzinde şandine, û daxwaz jê kirine ku ger çekên xwe dabinên û xwe radest bikin, wê ji aliyê dewleta Îranê ve ewlehiya wan were parastin, û dikarin di herêma Makûyê de bi awayekî asayî bijîn.

Ferzinde Beg û hevalên wî di bihara sala 1932`an de, dema ku baweriya xwe bi wê soza Riza Şah dayî tînin, vê yekê bo xwe wekî derfetekê dibînin, û ji bo hevdîtin û xweradestkirina bi artêşa Îranê, diçin gundên "Kurdkend-Navrê û Şêx Silo" ên di herêma Çaldiran-Siyah Çeşme a Makûyê, û benda wan dimînin.

Lê hêzên Îranî berevajî wan sozên Riza Şah hêrişî ser wan gundan dikin, û li wir Ferzinde Beg û jin û zarokên wî digel Ebdulbaqî û Kazim Beg û çendîn şervanên Agirî dorpêç dikin, û daxwaza xweradestkirinê ji wan dikin. Dema ku Ferzinde dibîne wan niyeteke xêrê tuneye, neçar dibin berevaniyê ji xwe bikin. Piştî şerekî giran dema ku artêşa Îranê dibîne Ferzinde ew mêr nine ku wisa bi zorê xwe radest bike, bi topê li wê malê dixin ku Ferzinde Beg tê de bûye. Ferzinde Beg bi giranî li ranê xwe de birîndar dibe, û ji taqetê dikeve. Hevjîna wî bi navê "Besra" çeka mêrê xwe hildigre, û tevî hevalên Ferzinde li dijî hêzên Îranê şer dike. Li kelekela şer de Ebdulbaqî jî bi giranî li milê xwe de birîndar dibe, û kurê wî yê 13 salî bi navê Fedil tê kuştin. Piştre jineke malê ku hewl dide kurê Ferzinde yê 9 salî bi navê "Elfesiya" ji cihê şer rizgar bike, lê ew jî ji aliyê candirmeyên Îranî ve tê girtin, û li cih de wî zarokî jî dikujin. Piştre bi sedema nemana şiyana berxwedanê, Ferzinde Beg û hevjîna xwe digel çendîn heval û malbatên şervanên Agirî ji aliyê

artêşa Îranê ve têne êxsîrkirin, û di serî de wan dibin bajarê Xoyê û Tewrêzê, piştre wan dibin Tehranê, û liwir dixin girtîgeha Qesra Qecer de.

Hikûmeta Îranê Ferzinde Beg û Ebdulbaqî û Kazim Beg û dehan şervanên Araratê dixe bendîxaneya Qesra Qecer, û jin û zarokên Ferzinde Beg tevî çendîn malbatên din ên şervanên Agirî, di rewşeke xirab de bêxwedî li Tehranê têne ragirtin, û jiyaneke bizehmet derbaz dikin. Besra Xanim a hevjîna Ferzinde Beg li Tehranê carna bo serdana Ferzinde Beg û hevalên wî diçe girtîgeha Qesrê. Di sala 1937`an de Ferzinde Beg bi awayekî biguman di girtîgehê de koça dawiyê dike. Hefteyekê piştre jî Ebdulbaqî bi heman awayî di girtîgehê de koça dawiyê dike. Tê gotin ku ew mêrxasên Kurd bi fermana Riza Şah hatine jehrxwarkirin. Kazim Beg jî tevî çend şervanên din ên Agirî, her li girtîgeha Qesr de têne ragirtin. Lê di dema şerê duyem ê cîhanî de ku hêzên Sovyetê têne Îranê, wê demê ew jî tevî hemû girtiyan têne berdan, û digel Emerxanê Şikak vedigerin Kurdistanê.

Besra Xanima hevjîna Ferzinde Beg jî digel Asya Xanima diya Ferzinde Beg vedigerin Tirkiyê, lê bi sedema dîtina van hemû êş û azar û zehmetiyan, Besra Xanim rewşa derûniya wê têk diçe, û koça dawiyê dike.


Di vê derheqê de çendîn kilam û stranên hemasî derheq lehengiya Besra Xanimê û Ferzinde Beg hatine gotin, ku rûbereke berçav di fulklora devkî a Kurdî de li xwe girtine.

**Di stranekê de Asya Xanima xesûya Besrayê wiha stran gotiye:**

Asyayê bi sê dengan li Besrayê dikir gazî
Digot, rebenê serê vê sibehê
Dilê min porkurê dîsan tîn e, tîn e
De tu rabe tivinga Ferzinde Begê hilîne
Bikeve hafa meydanê
Tola me ji dijmin bistîne
Hela bala xwe bidin diya Elfesiyayê
Ketiye nava şerê giran
wekî şêran tolê distîne
wele tu şêr î
haza qîza şêran î
lêxe diya min bî, lêxe
bila dergûşa milê min
şêr li her derê şêr e,
çi nêr e, çi mê ye

## Belgeya hejmar: 55

Nameya Besrayê ji parlamentoya Îranê re.



۲۰/۸/۱۲

ریاست مبارک مجلس شورای ملی

کنیزه بصره عیال فرزنده مرحوم [illegible] اهل ترکیه و ده سال است برای
خاطر شوهرش تحت نظر است شوهرم دو سال پیش در زندان قصر
فوت کرد [illegible] گرفتار شوهرم که با او گرفتار در زندان بودند با بفرمان عفو عمومی
مرخص شدند و رفتند. اگر شوهرم زنده بود بی شک او هم مرخص شده بود
دیگر کنیزم را [illegible] مرخص نمیکنند [illegible] و رسیدگی شما [illegible]
[illegible]
[illegible] عاجز [illegible] استدعا دارم [illegible]
مرحمت مقرر بفرمایید این بدبخت [illegible]
مرخص و آسوده بفرمایید.

بصره

شماره ۸۰۱۹

ساله ۲۰/۸/۱۴

Deqa nameya Besra Xanima hevjîna Ferzinde Beg bo Meclisa Millî a Îranê

13.08.1320 (04.11.1941)

Sekretariyet ....

Birêz serokatiya Meclisa Şêvra Millî

Ez kenîze Besra hevjîna Ferzindê Rehmetî hevwelatiya Tirkiyê me, û heyama 10 salan e ku li ber hevjînê xwe li jêr çavdêriyê de me.

Hevjînê min du sal berê di girtîgeha Qesra Qecer de koça dawiyê kir. Hevalên hevjînê min ku digel wî giriftar û girtî bûn, li ser fermana efûya giştî serbest hatin berdan û çûn. Hekî hevjînê min jî zindî bûya, bêguman ew jî niha azad bibû. Ku wisa ye, çima min bernadin. Dibêjin ku dosiyeya we di komîsyona serdozgeriyê de ye. Besrayê çi kiriye, û çi dosiyeyek heye ku vê komîsyonê heya niha jî nekariye li ser wê biryarê bide. Ricayê dikim ku rehmê bi xerîbî û bêkesiya min bikin, û vê bêdeshilata bextreş, rojekê zûtir azad û asûde bikin. Besra

## *Tundreviya dewleta Îranê ya li dijî Kurdan*

Dema ku dewleta Îranê karîbû serhildana Simko û ya Agirî bi alîkariya Tirkan û Sovyetê ji nav bibe, êdî çi metirsiyekê li pêşberî xwe nabîne û gellek hovane li hemberî kurdan tevdigere.

Ji aliyekî din ve ji bo çavtirsandina serokêlên Kurdan, generalekî Îranî bi navê Şahbextî ku fermandeyê pilebilind ê hêza Urmiyê bû, li ber çavên xelkê dest bi sivikatî û lêdana Reşîd Begê Herkî û hindek serokêlên din ên Kurd dike. General Şahbextî ji bo ku Kurd çekên xwe radestî dewletê bikin, bi her awayî kurd aciz kirine.

Li hember van hemû givaş û reftarên narewa yên generalê Îranê, Emerxan wekî nîşandana nerazîbûnê telgerafekê bo Riza Şah dişîne. Di wê telegrafê de dibêje; Ji bo mayîna bi dewletê re heta ku me kariye Kurdên vê deverê razî bikin, em gelek westiyan, lê reftarên hişk ên generalê we, wê bibe sebebê vê ku Kurd cardin li hember hikûmeta Îranê rawestin.

Tê gotin ku Riza Şah li ser vê telegrafa Emerxan, generalê xwe agehdar dike, ku divêt daxwaza lêbihorînê ji Emerxan bike, û ji bo mayîna xwe li herêma Urmiyê dibe Kurdan razî bikî. Herçend general Şahbextî li gor destûra Şah lêbihorîna xwe ji Emerxan bi cî aniye jî, lê li hember Emerxan kîneyeke mezin di dilê xwe de hildigre.

Ji aliyekî din ve dewleta Îranê bi şêweyeke fermî daxwaza hinartina gencên Şikakan bo eskeriya Îranê dike, û dixwaze ew ji bo tomarkirina navê xwe seredana navendên pêwendîdar bikin. General Şahbextî di vê derbarê de tenê mehek molet daye xelkê herêmê, da ku kesên xwedî çek, çekên xwe radestî dewletê bikin, û yên ku vê destûrê bi cî nehînin, wê bi tundî werin sizadan.

Ew biryara dewleta Îranê tewahiya serokêlên Şikakan şepirze dike, û ew jî hawara xwe digehînin Emerxan, da çareyekê ji vê arîşeyê re bibîne.

Jiber ku baweriya Emerxan bi hinek serokêlan, û bi taybetî jî bi Sertîp, Hesen û Temirxanê Hinare nedihat, lewma daxwaza sondxwarinê ji wan kiriye û ji wan xwestiye, ger li hemberî dewleta

Îranê de, pişta wî bernedin û xiyanetê bi wî re nekin, ew jî wê wan du pêşniyarên jêrîn pêşkeşî karbidestên Îranê bike:

1-Derbarê çekên me yên heyî de, em dixwazin dewlet moleta fermî bide me.

2- Ji bo xizmeta leşkerî ya gencan, em dixwazin dewlet destûrê bide ku gencên me xizmeta leşkeriya xwe, bi rêya encûmenên herêmî û herwisa li herêma Şikakan encam bidin.

Ev pêşniyarên Emerxan ji aliyê tewahiya serokêlan ve tê qebûlkirin, û li ser destê Mela Husên melayê Memekanê destê xwe li Qur`anê dane, û sond xwarine ku heta dawî dilopa xwîna xwe, bi Emerxan re bimînin, û xiyanetê lê nekin.

Piştî wê civînê Emerxan bi merema wergirtina tedbîran, ku renge dewleta Îranê pêşniyarên wî qebûl neke, ji bo haziriya berhingariya li hemberî karvedana dewleta Îranê, mala xwe ji gundê Zindeştê vediguhêze Memekanê.

Piştre Emerxan ji karbidestên îdarî û leşkerî yên dewletê re ku li herêma Soma û Urmiyê bûn, dibêje: Heger hûn pêşniyarên me qebûl bikin, emê baweriyê bi destûra bingehîn ya dewleta Îranê bînin, lê ger hûn daxwazên me qebûl nekin, emê berxwe bidin.

Di rewşek wisa hestiyar de eşkere dibe ku piştî vegera serokêlan ji wê civîna li Memekanê, ew Sertîp û Temirxanê Hinare ku berî hemûyan sond xwaribûn, bi rêya Hecî Qadir ku xelkê Haşimavaya Mirgewerê bûye, û wekî sîxorê general Şahbextî dihate nasîn, nameyekê ji Şahbextî re dişînin, û di nameya xwe de jê re dibêjin: Me di encama westiyaneke mezin de, kariye ew serêşiya ku Simko bo dewletê dirust kiribû, ji nav bibin. Lê niha Emerxan dixwaze ciyê Simko bigre, û li hember dewleta Îranê bisekine. Em naxwazin wek Emerxan bi mahaneya neşandina gencan bo xizmeta leşkerî, yan jî bi radestnekirina çek û fîşekên xwe, li hember dewletê ravestin. Herwisa gotine em bi biryarên dewletê razî ne, û em di xizmeta dewleta Îranê de ne.

Şahbextî digel wergirtina vê nameyê û bi egera hebûna kerba wî ya li hember Emerxan, yekser naveroka nameyê bi telegrafekê ji Riza Şah re dişîne, û ji şah dixwaze ku fermana çawaniya serederîkirina

bi Emerxan re bide wî.

Piştre Şahbextî destûrê dide zabitên herêmî, ku biryara Şah ya efûkirina Şikakan di nav xelkê de belav bikin, û bi serokêlên Şikakan re bicivin, û ji wan re bêjin bila bi gotina tu kesî nekin, ku li hemberî biryarên dewletê rabiwestin, û bila wek serdema Simko dijberiya dewletê nekin.

## *Civîna li gundê Heştiyanê*

Piştî wê biryara Şahbextî li civîneke di navbera karbidest û zabitên dewleta Îranê ya digel serokêlên Şikakan de ku li gundê Heştiyanê hatibû lidarxistin, dema ku karbidestên dewletê, wê biryar û daxwaziyên Şahbextî bo wan dibêjin, piraniya serokêlan li hemberî van daxwazên dewletê de bêdeng dimînin.

Dema ku Emerxan vê yekê dibîne, êdî dizane ku ew serokêlên Şikakan bi van dengoyên dewleta Îranê ku bi rêya Sertîp û Temirxanê Hinare belav bûne, hatine xapandin û ji bilî çend kesan, yên mayî di vê dema hestiyar de, bi wê soza ku danbûne wî, girêdayî nemane û ew bi tenê hiştine.

Herwisa di wê civînê de dema ku zabitê dewleta Îranê yê bi navê Ebasxan Pûrlek, sivkatiyê bi xizmekî Emerxan dike, êdî Emerxan dizane ku rewş ji hindê derbas bûye.

Lewma her di wê gavê de Emerxan bi nîşandana helwesteke tund, ji civînê derdikeve, û yekser berê xwe dide Mamekanê. Piştre bi Qotaz Mamedî re derheqê rewşa heyî de dicivin. Di vê rûniştinê de bi Qotazê Mamedî re digihîjin vê biryarê, ku herin herêma çiyayî a Şipîranê, û li dijî daxwaza dewletê ya ji bo çekdanînê li ber xwe bidin.

Lê piştre bi hin sedemên nezelal ji wê biryara xwe vedigerin, û Emerxan cardin mala xwe vediguhêze Zindeştê, û li benda qedera xwe ya bi destê dewleta Îranê dimîne.

Piştî wê civîna li gundê Heştiyanê, karbidestên dewletê jî ew reftara tund a Emerxan û derketina wî ji civînê, wekî dijberiya biryara dewletê hesibandine, û ew raporên ku Sertîp û Temirxanê Hinare derbarê Emerxan de ji wan re şandibûn, wekî belge li ber çav digrin. Herwisa karbidestên dewletê gava di wê civînê de karîne bêdengiya serokêlên Şikakan bo xwe misoger bikin, digihîjin wê baweriyê ku Emerxan bi tenê maye, û êdî wê bikarin wî siza bidin, û sizadana wî jî wê ji serokêlên din re bibe ders û `ibret, û ewê bêhtir guhdariya fermanên dewletê bikin.

Lewma piştî wê civînê, êdî dewlet dest bi standina çekan dike, û

roj bi rojê deshilata xwe ya di nav Şikakan de zêde dike. Herwisa di standina çekan de, zexêtê li Emerxan jî dikin ku alîkariya dewletê bike.

Di rewşek wisa de êdî Emerxan baş dizane ku ji bilî Qotaz Mamedî û çend kesên din, ew nikare li berhingariya di hember dewleta Îranê de pişta xwe bi serokêlên din ên Şikakan girê bide. Ew serokêlên Şikak her wekî çawan di serdema xebata Simko de pişta Simko berdabûn, bi heman awayî herwisa pişta Emerxan jî berdane.

Dema ku Emerxan ji bilî serîçemandina ji dewletê re, rêyek din nabîne, bersiva karbidestên dewletê dide, û dibêje: Êdî ez destêwerdanê di karûbarên eşîrî de nakim, û tenê dikarim berpirsatiya radestkirina çekên êla xwe bo dewletê bigrim stûyê xwe.

Bi vî awayî Emerxan piştî gengeşeyeke zêde digel karbidestên Îranî, beşek ji çekên kevn ên kes û karên nêzî xwe kom kirine, û radestî karbidestên dewletê kirine. Dewleta Îranê piştî wergirtina çekan ji Emerxan, êdî di heyama çend mehan de her ji çemê Erez ve bigire heta sînorê Îraqê, çekên hemû serokeşîrên Kurdan jê standine.

## *Girtin û zîndanîkirina Emerxan ji aliyê dewleta Îranê ve*

Piştî çekdamalîna Kurdan ji aliyê artêşa Îranê ve, êdî Emerxan dibîne ku reftara dewletê bi wî re asayî nine. Lewma Husênê birayê wî, jê re dibêje; "Emerxan! em ditirsin ku dewlet ziyanê bigehîne te, û ya baş ew e ku tu ji Îranê derbikevî". Li ser vê gotina birayê xwe, Emerxan jî dibêje: "Rast e ku dewlet dest ji min nakêşe, lê heger ez ji meydanê derkevim, tirsa min ew e ku, bi mahneya min belayekê bînin serê we û xelkê. Ji ber vê çendê çi dibe bila bibe, ya baş ew e ku ez çavnihêrî rewşê bim".

Piştî derbazbûna çend rojan bi ser vê axaftinê re, Emerxan û birayê xwe di payîza 1934`an de, ku hingê Emerxan 61 salî bû, ji aliyê karbidestên dewletê ve bo Selmasê têne gazîkirin, û li wir jî wî dişînin Urmiyê, û her li Urmiyê wî dixin zîndanê. Piştî çend mehan ji bilateklîfî û nediyarî çarenûsa Emerxan di zîndanê de, ji aliyê dadgaha leşkerî a Şah li Urmiyê bi van tometên jêrîn, ew hatiye sizadan:

-Domdariya rêbaza kurdiniyê, û kiryarên wî yên di serdma Simko de, û ew fermandeyekî payebilind ê şer bû.

- Beşdarî di kuştina zêdeyî 800 cendirmên Riza Şah li Mihabadê

-Beşdariya li şerên li dijî dewletê, yên li Golmexane û Şekiryaz û ...hwd, û herwisa kuştina fermandeyê mezin ê Îranî bi navê Erşed Qeredaxî

-Hevkariya bi şervanên Araratê re, û xiyaneta wî bi dewletê û bi çendîn tometên din.

Dema ku dadwerê mehkemê li hemberî van tohmetan, daxwaza berevaniyê ji Emerxan dike, ew jî dibêje: "Ez çi berevaniyekê ji xwe nakim, û hûn çawan baş dizanin, wisa li ser min biryarê bidin". Piştî du rojan lêpirsîn û dadgehîkirinê, dadgehê hukmê îdamê daye Emerxan. Lê di dawiyê de bi hewldana hin dostên Emerxan, dadgehê hukmê wî yê îdamê, jê re kiriye ebed.

Bi vî awayî Emerxan çar salan di zîndana topxane ya Urmiyê de dimîne, û paşê jî wî vediguhêzin zîndana Qesra Qecer li Tehranê.

Hewce ye were gotin zîndana Qesra Qecer, hêmaya tirs, îşkence û dîktatoriya Riza Şah bû. Wê demê ew zîndan di nav xelkê de gelek meşhûr bû, û dihate zanîn ku her kesê bikeve wê zîndanê, êdî ti carî bi saxî dernakeve. Lewma ew zîndaniyên ku di wir de girtî bûn, qet tu hêviyeke wan bi azadiya xwe nebû.

Hêjayî gotinê ye ku di wê demê de nêzî 12 hezar kes di zîndana Qesr a Tehranê de girtî bûne. Di nav de Emerxan Şerîfî Şikak, Heme Reşîdxanê Bane, serokêlên Bextiyarî, û girtiyên Lor hebûn. Herwiha Ferzinde Begê Hesenî û Ebdulbaqî û Kazim Beg, û dehan girtiyên siyasî ên Kurd ku li şoreşa Agirî de beşdar bibûn, hebûn.

Cuda ji girtiyên Kurd, bi dehan zîndaniyên Hizba Komunîst ku bi 53 zîndaniyan hatibûn nasîn, wek Dr. Eranî, Kambexş, Ce`ifer Pîşewerî, Îrec Eskenderî, Bizurg Elewî û yên mayî, tevî hezaran xelkê sivîl di wê zîndanê de bûn.

Di vê mijarê de Spehbûd Ehmed Emîr Ehmedî wisa nivîsiye:

"Bi egera ku wan kurdan dixwestin parek ji axa Îranê parçe bikin, û dewleta serbixwe ya Kurdistanê ava bikin, lewma me jî ew li ser fermana Riza Şah xistibûn zîndanê, da ku li cihê fikirkirina bi serxwebûna Kurdistanê, ew fikra serxwebûna Îranê bikin."

Digel girtina Emerxan êdî zext û givaşa dewletê li ser Şikakan zêdetir dibe, û her ku diçe nebaş dibe. Cendirmeyên Şah rojane hêrişê dibin ser gundiyan, û sivikatiyê bi wan dikin. Herwisa her kesekî ku xwestiye di hember wan kiryarên narewa de nerazîbûna xwe diyar bike, ji aliyê karbidestan ve wekî domdarê rêbaza Simko dihate tohmetbarkirin. Lewma tu kesî nekariye nerazîbûna xwe bide xuyakirin, û bi vî awayî dewleta Îranê kariye deshilata xwe bi ser êlên Şikakan de bisepîne.

Bi mijarê ve girêdayî gava Şahbextî gazî Qotaz Mamedî bo Urmiyê dike, ji Qotaz re dibêje; "Emer dixwest çi bike? Wî dixwest bibe Şêx Mehmûd, yan Simkoyê duyem? Wî çima rêya xiyaneta li dijî dewletê hilbijart?"

Qotaz jî dibêje; "Cenabê Şahbextî! Emerxan ne xayîn bû, û ne jî dixwest xiyanetê bike".

Şahbextî jî li Qotaz dipirse; "Qotaz! ma tu berevaniyê ji Emer

dikî? Pêdivî nake ji min re basa wî bikî".

Qotaz dîsa dibêje; "Ne berevaniyê ji Emerxan dikim, û ne jî wekî hin kesan, dibêjim ez xulam û xizmetkarê dewletê me, û filan kes jî xayîn bû. Lê heger cenabê te îznê bide, dixwazim rastiyê bêjme te".

Dema Şahbextî vê cesaretê, û rik û rastiya Qotaz dibîne, rêya axaftinê li ber Qotaz vedike, û Qotaz dibêje:

-"Dema ku me hemû serokêlên Şikakan, derbarê radestkirina çekên xwe bi dewletê, û şandina gencan ji bo xizmeta leşkeriyê gengeşe dikir, rast di wê gavê de xeber hat, ku Istiwar Pûrlek fermandeyê leşkerên dewletê, li ber çavên cemawer sivikatî bi rihsipî û mezinekî Şikakan ku xizmê Emerxan bû kiriye. Lewma em jî bi bihîstina wê xeberê, û bi wê kiryara karbidestê dewletê nîgeran bûn, û di vê derbarê de em gihîştin vê biryarê, ku heta reftarên nebaş li hemberî me bêne kirin, em jî nikarin çekên xwe danên, û gencên xwe bişînin xizmeta leşkerî ya dewletê". Herwisa Qotaz axaftina xwe wisa domandiye: "Cenabê Şahbextî! heger ev yek curm û tawan be, em hemû şirîkê vê tawanê ne, ne tenê yek kes."

Digel bidawîhatina axaftina Qotaz, Şahbextî dibêje: "Qotaz! Bo min derket ku tu kesekî rastgo û vêrek î, lewma li te hez dikim, û ezê te efû bikim".

## Beşa Çarem

### Şerê duyem ê cîhanî û hatina leşkerên Sovyet û Îngilîzê bo Îranê

Di sala 1941`an de piştî destpêkirina şerê duyem ê cîhanî dema ku leşkerên Sovyetê ji milê bakûr û leşkerê Îngilîz jî ji milê başûr ve derbasî nav xaka Îranê dibin, bêyî ku rastî ti berevaniyeke leşkerê Îranê bibin, leşkerên Sovyetê li Tewrêzê û bakûrê Rojhilatê Kurdistanê bicih dibin.

Digel binecihbûna leşkerê Sovyetê, êdî xelk ji zilm û zordestiya hêzên ewlekariya Riza Şah û qezaqên wî rizgar dibin. Kurdên Rojhilat her ji Makûyê heta Şino û Mihabadê, bi peydabûna vê rewş û derfetê, dilxweş dibin.

Lê dîsa jî jiber ku baweriya Kurdan bi leşkerên Rûsî lawaz û cihê piştrastiyê nebû, lewma di danîna têkiliyên bi wan re, bitirs û hestiyar bûn. Jiber ku di serdema şerê yekem ê cîhanê de, leşkerên Rûsiyê dîsa hatibûne Rojhilatê Kurdistanê, û bi helwestên neyînî ên xwe li dijî Kurdan, gelek tundûtîjî û reftarên xirab derheq Kurdan kiribûn, û ew yek bibû egera nebaweriya Kurdan bi Rûsan.

**Di vê derbarê de Senar Mamedî wisa nivîsiye:**

“Piştî vê ku leşkerên Rûsî dikevin nav bajaran, hêdî-hêdî yekîneyên leşkerî yên wan ber bi gundên herêmê ve hatine. Gava gundî hatina komek leşkerê Rûsî ber bi gundê Hacîcefan li herêma Selmasê dibînin, gundî bilez çekên xwe vedişêrin, û jin û keçên gund jî digel zarokan bi armanca parastinê ji gund derdixin, û xwe di şikevtên geliyê gund de vedişêrin. Piştî veşartina jin û zarokan, mêrên gund li benda hatina leşkerên Rûsî dimînin.

Jiber ku hingê meznê gund, Qotaz Mamedî çûbû Somayê, û muxtarê Hacîcefanê bi navê Ebas ku pîremêrekî lêzan bû, ji gundiyan re dibêje: “Hekî em bo pêşwaziya wan, di nava zêcamekê

de hinek nan, av û xwê bo fermandeyê wan bibin, dibe ku em ji aliyê wan ve parastî bimînin."

Herwisa Senar Mamedî nivîsiye, Ebas axaftina xwe wisa domandiye: "Gava me ew nan, av û xwê hilgirt û em çûne pêşiya leşkerê Rûs, me dît fermandeyê wan ji hespê xwe peya bû, û tevî zabitekî Azerbaycanî hatin pêşiya me û silav kirin".

Hingê muxtarê gund jî bi wê zêcama nan, av û xwê ve ku li ser destê wî bû, diçe pêşberî fermandar û wekî rêzgirtin xwe ji wan re diçemîne. Fermandeyê Rûsî ji muxtar dipirse; "Ew çi ye, û ji bo çi ye?".

Muxtar jî dibêje; "Hekî hûn vî pariyê nan û xwê û ava me tam bikin, ew yek bi wateya girêdana peymana dostaniya we ya bi me re tê qebûlkirin".

Piştî van gotinên muxtarê gund, ew fermandeyê Rûsî pariyê nan dixwe, û bi tiliya xwe hinek xwê tam dike, û piştre avê jî vedixwe. Piştre ji gundiyan re dibêje: "Dewleta Sovyetê, dost û piştevanê hemû neteweyên bindest e, ku yek ji wan jî neteweya Kurd e, û hûn bira û dostê me ne."

Piştî van gotinên fermandeyê Rûsî, gundiyan jî ji wan re çepik lêxistine, û bixêrhatina wan bo gundê Hacîcefanê kirine.

## *Hilveşîna deshilata Riza Şah û azadbûna Emerxan ji Zîndanê*

Gava leşkerên Sovyetê li Tehran, Azerbaycan û gelek herêmên din ên bakurê Îran û Rojhilatê Kurdistanê cihgîr dibin, êdî deshilata Riza Şah hildiweşe, û leşkerê Îranê ji hev belav dibe. Di encama vê bûyerê de, tevlîheviyek mezin li piraniya herêmên Îranê, û bi taybetî jî, li bajarê Tehran a paytext dirust dibe.

Ev tevlîhevî dibe egera lawaziya deshilata li Tehranê. Lewma nêzî 12 hezar zîndaniyên li zîndana Qesr ya li Tehranê, bi serhildaneke giştî dergehên zîndanê dişkînin û bi zêrevanan re şer dikin, û di vî şerî de çend girtiyên Kurd û hin zêrevanên zîndanê têne kuştin.

Zîndanî ji wê zîndana mezin û tirsnak derdikevin, û bi wan çekên ku ji zêrevanan bi dest xistibûn, hêrişî hin îdareyên dewletê dikin. Piştre li ser daxwaza Rûsan tewahiya zîndaniyên siyasî, bi awayekî fermî têne azadkirin.

Emerxan ku bi hukmê ebedî hatibû sizadan, piştî 8 salan zîndanîbûnê, ku bi hêviya azadiya xwe nebû, li rêkevt 16.09.1941`an bi alîkariya Rûsan di temenê 75 saliya xwe de ji zîndana Qesrê derdikeve.

Emerxan piştî azadbûnê tevî hin zîndaniyên şoreşa Agirî ku di zîndanê de bi hev re bûn vedigere Selmasê, û bi pêşwaziyeke germ ji aliyê cemawer ve ji Selamasê wî digehînin gundê Zindeştê.

Hêjayî gotinê ye ku azadbûna Emerxan wekî keyfxweşiyeke mezin heta çend rojan bi serdana xelkê herêmên Selmas, Urmiye û Mihabadê domandiye.

## *Çalakiyên Rûsan di nav Kurdan de*

Rûs di ciyê vê yekê de ku piştgiriya daxwaziyên siyasî ên Kurdan bikin, plan danîne ku bi encamdayîna hin karên kulturî, bikarin bala Kurdan bo aliyê xwe rabikêşin, û bi rêya wî karî ve bandora siyasî û pêgeha xwe di nav Kurdan de bihêz bikin.

Bona wê armancê ji aliyê dewleta Sovyetê ve navendek bi navê "Mala Voks" (saziya navnetewî a ragehandina Sovyetê) ji bo damezrandina "Encumena Kulturî a Kurdistan û Sovyetê" hatiye erkdarkirin.

Di despêkê de wê saziyê dest bi vexwandina hin kesayetî û rewşenbîrên Kurd ji bo beşdarî di civînên hevbeş bi wan re kiriye, da ku derbarê bername û çawaniya karûbarên xwe nerînên wan wergirin.

Wê navendê nek her çi berhemên xwe ên edebî û kulturî bi zimanê Kurdî neweşandine, belkî gelek helbest û babetên Kurdî jî wergerandine ser zimanê Azerî û Rûsî. Xuya ye Rûsan xwestine bi rêya wî karî ve, siyasetên Hizba Komonîst di nav Kurdan de belav bikin, û nîşan bidin ku siyasta Sovyetê, ne wek ya serdema Rûsa Tizar e. Herwisa hewl dane ku bi rêya wî karî ve bikarin rewşenbîrên Kurd bo aliyê xwe rakêşin.

Di wê demê de komîserên siyasî û fermandeyên Rûsan ji bo rakêşana bala Kurdan, dest bi civîn û çalakiyên berfireh ên Kulturî û civakî dikin. Gava dibînin ku xelk bi awayekî gelekî berfireh diçin seredana Emerxan, û şahiyên mezin li Zindeştê bi rê ve dibin, ew yek bala leşkerên Sovyetê dikêşe aliyê xwe, û têgihîştine ku Emerxan di nav cemawer de kesekî xwedîpêgeh û bibandor e. Lewma wan jî bi merema bihêzkirina pêgeha xwe û balkêşana cemawer bo aliyê xwe, û ji bo pêşxistina plan û projeyên xwe yên girêdayî bi rewşa Azarbaycan û Rojhilatê Kurdistanê, dest bi liv û xebatê kirine.

Bo vê mebestê kadroyên siyasî û hewalgirî, û fermandeyên leşkerî yên Sovyetê ji bo ku ji cemawerê Kurd re bidin xuyakirin, ku siyaseta niha ya Sovyetê cuda ye ji siyaseta serdema Rûsa Qeyser, bi çalakiyên di gundên herêma Selmas, Urmiye, Zindeşt, Hacîcefan û

Howesnê de, fîlm û nimayişnameyên curbicur bi zimanê Azerî, bo temaşekirinê nîşanî Kurdan dane.

Di van kombûn û nimayişan de fermandeyên leşkerî û şêvirmendên siyasî yên Rûsî jî amade dibin. Bi merema sûdwergirtina ji serokeşîr û kesatiyên xwedî pêgeh û bibandor, gelek hewl dane ku bikarin Emerxan bo aliyê xwe rakêşin.

## *Çûna şanda Kurdan bo Bakûyê*

Di doma vê siyaseta Rûsan de, piştî destnîşankirina hin kesatiyên xwedîpêgeh ên Kurd ji aliyê karbidestên Rûsî ve li Rojhilatê Kurdistanê, li 25.11.1941`an ligor banghêşta serkomarê Azerbaycanê Baqirov şandeke Kurdan bo Bakûyê gazî dikin.


Emerxan jî di asta herî bilind a wê şandê de hatibû vexwandin. Lê wî bi hêceta ku taze ji zîndanê derketiye û hinekî nexweş e, ew vexwandin bê bersiv hiştiye, û xwe ji çûna Bakûyê parastiye. Emerxan li şûna xwe Qotaz Mamedî û Hesenê Hinare wek şanda Kurdan şandine Bakuyê.

Şanda Kurdan ji van kesan pêk hatibû:

"Qazî Mihemed, Sertîp Mihemed, Emînê Şikak, Hesen Têlo, Reşîd Begê Herkî, Nûrî Begê Begzade, Şêx Mihemed Sidîqê Şemzînî, Tahayê Herkî, Mihemed Axayê Wisûq Qasimlo, Mûsaxanê Zerza, Qerenî Axayê Mameş, Hemzeyê Nelosî, Elî Axayê Dêbokrî, Emerê kurê Elî Axa, Ebullayê Mehmûd Axa, Hacî Baba Şêx , û ...hwd".

Hêjayî gotinê ye ku piştî vegera şanda Kurdistanê, dema ku otombîla wan ji Urmiyê ber bi herêma Somayê ve tê, di rêya gundê "Çire" de trumbêla wan ji rê derdikeve û werdigere. Di encam de Sertîpê Mihemed Emîn canê xwe ji dest dide.

## Belgeya hejmar: 56



۱۱۳۶

۱

اداره ............

اخراج تلگراف رضائیه

وزارت کشور

رونوشت ............ شماره ............ مورخه ۲۰/۹/۲۶ وزارت/اداره که اصل آن بشماره ............ ثبت شد

کشور استان چهارم با سه دولت که رقابت سیاسی دارند هم مرز است و دارای چهار ملت مختلف
که همیشه باعث آشوب میباشند لهذا توجهی خاص لازم دارد فعلاً سیاست شوروی بر این است
ملت کرد و آشوری را هم پیمان آزادی کردستان را تأمین نمایند وسایل کار تهیه کاغذ چاپ
مسلسل صورت عمل بخود گرفته جلسات کمیته عالی کردستان با اطلاع افسر شوروی لیکن میکرد و
جلوگیری بواسطه حمایت شورویها مشکل اضطراب مردم روز افزون است سران اکراد
از بادکوبه مراجعت بر تجری و زبان درازی خود افزوده راهزنی را شروع کرده اند فعلاً
با تدابیر عمل السته دکه عینواید شعاع جمعی فعلاً از ارس تا رواندوز میباشد و لیه تا آخر
مرز استان رفت و آمد دارند مهاباد و سقز را برای عمل اکراد آزاد گذاشته اند اغلب
شهرستانها و دهات که کردنشین نشسته تحت الشعاع و طرف بغض و کینه اکراد و آشوری
قرار گرفته اند زحمت این مدت تعلل که منجر به آسایش نیمه است و پیش برفت بعدها
خواهد شد بنده شخصاً طرفدار ... سیل اکراد هستم چاره عاجل لازم است از کردنشینها

Derxistina telegrafa Rizayiyê (Urmiyê)
Wezareta Navxwe
26.09.1320
(17.12.1941)

Parêzgeha çarem hevsînorê sê dewletan e, ku rikeberiya siyasî pêkve hene, û çar neteweyên cuda tê de hene, ku hertim dibe sedema serhildana aloziyê. Lewma hewcehî bi baldaneke taybet e, û carê siyaseta Sovyetê li ser vê ye ku neteweyên Kurd û Aşûrî pêkve hevpeyman bin, û azadiya Kurdistanê desteber bikin.

Alavên kar hatine dabînkirin û li ser kaxeza çapî, vê meselê aliyê piraktîkî bi xwe ve girtiye. Civînên komîteya bilind a Kurdistanê bi agehdariya efserê Sovyetê têne kirin, û bi sedema piştevaniya Sovyetiyan, pêşîgirtin ji karê han dijwar e. Nîgeraniya xelkê roj bi rojê ber bi zêdebûnê ye, û serkirdeyên Kurd li Bakûyê vegeriyane û cesûrtir û zimandirêjtir ji caran dest bi rêgiriyê kirine.

Ew di hemberî her liv û tevgereke piraktîkî de bilez berxwedaniyê dikin. Niha rûberê herêma ku wê tevgerê li xwe digre, ji “Eres” ve heya “Rewandiz”ê ye, û heya dawiya sînor hatûçûnê dikin. Mihabad û Seqiz jî bo navenda tevgera Kurdan hatiye azadkirin, û ew gund û bajarên ku Kurdakincî nînin, ketine ber kerb û kîna Kurdan û Asûriyan. Hêdî-hêdî zehmeta wê heyama kurt ku ewlehî tê de hebû, û ber bi pêş ve diçû, bi heder diçe. Ez bixwe aliyê ....Kurdan im. Divêt çareyeke bilez bihê dîtin, li raporên....

**Belgeya hejmar: 57**

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

(فوری)

رونوشت گزارش شهربانی رضائیه مورخه ۷/ ۱۲/ ۲۰ شماره (۱۷)

شهربانی کل – ۶۶۴۶۶ گزارش شماره ۱۲ با کلید رمز شهربانی تجدید میشود تعقیب معروضه شماره ۶ دو روز قبل شخصا بدون اطلاع قبلی بعنوان دیدن شیخ عبد اله فرزند شیخ عبد القادر منزل نامبرده رفته مشاهده شد که عمرخان رئیس طائفه شکاک و نخشبند از سوما برادوست و قرنی آقا زرزا و موسی بیگ و رشید بیگ که از اکراد اشنویه میباشند و شیخ محمد قاضی متصدی شهرداری مهاباد و عده از اکراد – سوما برادوست در منزل شیخ عبد اله میباشند قریب ۲ دقیقه با نامبرده مذاکره شد از این ملاقات و مجموع اطلاعات حاصله چنین استنباط میشود که منظور شیخ عبد اله از آمدن بکشور شاهنشاهی برای تهیه زمینه اتحاد کرد بوده و حتی مایل است بین مسیحیان و اکراد اتحادی نیز ایجاد کنند – پاسیار ۲ جلیلوند –

رونوشت با اصل یکسان است .

شمارهٔ این سند در آرشیو سازمان اسناد ملی ایران ۲۹۳/۱۲/۶۷/۳ می‌باشد.

Wezareta navxwe/ rêveberiya giştî a bajêrvaniyê,

Bilez:

Rûnivîsa raporta bajêrvaniya Urmiyê,

Rêkevt: 26.02.1942, hejmar: 17

Bajêrvaniya giştî (mezin)-66466, raporta hejmar 12

Li dirêjiya wan mijarên di raporta hejmar 6 de, du rojan berî niha, bêy haydarkirina pêşwext, bi mahneya dîtina Şêx Ebdulla kurê Şêx Ebdulqadir, min serdana mala wî kir, û min dît Emerxan serokêlê Şikak û bexşdarê Soma-Biradost, Qerenî Axayê Zerza, Mûsa Beg û Reşîd Beg ku ji Kurdên Şinoyê ne, û Şêx Mihemed Qazî rêveberê şarevaniya Mihabadê û hejmarek ji Kurdên Soma-Birados, cem Şêx Ebdulla bûn. Ez nêzî 20 xulekan tevî navbirî rûniştim û di vê hevdîtinê de, ligor wan zanyariyên ku ketin destê min, ez wa têgihîştim ku merema Şêx Ebdulla ji hatina bo welatê paşatiyê(Îranê), pêkanîna derfetê ji bo yekîtiya Kurda ye, û herwisa dixwaze di navbera Mesîhî û Kurdan de hevpeymaniyê çêbike.

Pasyar 2 Celîlwend

## Belgeya hejmar: 58

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

( فوری )

رونوشت گزارش شهربانی رضائیه مورخه ۲۰/۱۲/۷ شماره ۱۸

شهربانی کل ـ ( ٦٦٤٦٤ ) گزارش شماره ۱۳ با کلید رمز شهربانی تجدید میشود

تعقیب معروضه شماره ۲۱ امروز شیخ عبداله فرزند شیخ عبدالقادر رعیت ـ

عمرخان بخشدار سوما برادوست وشیخ محمد قاضی متصدی شهرداری مهاباد ـ

وموسی بیک بخشدار اشنویه وقرنی آقا زرزا ورشید بیک اکراد اشنویه وشیخ صدیق

گیلانی فرزند سید طه وعده از اکراد دیگر از رضائیه بطرف مهاباد حرکت واز قراریکه

انتشار دارد برای رفع اختلاف اکراد مهاباد واتحاد دادن بین آنها رفته اند ـ

پاسیار ۲ جلیلوند ـ

رونوشت با اصل یکسان است .

شمارهٔ این سند در آرشیو سازمان اسناد ملی ایران ۲۹۳ / ۱۲/۶۷/۵ می‌باشد.

سازمان اسناد ملی ایران
IRAN NATIONAL ARCHIVES

Wezareta Navxwe/ rêveberiya giştî a bajêrvaniyê,

Bilez:

Rûnivîsa raporta bajêrvaniya Urmiyê,

Rêkevt: 26.02.1942, hejmar: 18

Bajêrvaniya giştî (mezin)-66466, raporta hejmar 13

Li dirêjiya mijarên di raporta hejmar 12 de, îro Şêx Ebdulla kurê Şêx Ebdulqadir, tevî Emerxan bexşdarê Soma-Birados û Şêx Mihemed Qazî birêveberê şaredariya Mihabadê û Mûsa Beg bexşdarê Şinoyê û Qerenî Axa û Reşîd Beg ji Kurdên Şinoyê û Sidîq Geylanî kurê Seyîd Taha û hejmarek Kurdên din, ji Urmiyê ve ber bi Mihabadê rê ketin û wekî tê gotin ji bo çareserkirina nakokiyên Kurdên Mihabadê û pêkanîna yekîtiyê di nava wan de çûne wir.

Pasyar 2 Celîlwend

**Belgeya hejmar: 59**

*(1942,bergê IV,Rûpel 320-321)*

*Telegrama 1867/00/891 li balyozxaneya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li Tirkiyê (Birêz Stînhardit 1) bo Wezareta Derve*

*Ankara, 04.05.1942*

362-Balyozê Îranê li Tirkiyê sibezûya îro ez vexwandim û ez agehdar kirim ku: Dewleta Îranê bi awayekî gelek micid nîgeranê têkderiyên Kurdan li Azerbaycanê ye, bi taybetî li herêmên derdora Urmiyê û gola Urmiyê. Herçend hejmareke zaf ji hêzên Sovyetê ku dibêjin 20 hezar kes dibin, û ji yekîneyên mîkanîze pêk tên, Azerbaycan dagîr kirine, lê nek her tu pêngav bona temirandin, yan jî kêmkirina çalakiyên 3 hezar Kurdî hilnegirtine, belkî pişta yaxîbûna Kurdan jî girtine û ew tûj kirine.

Sovyetiyan daxwaza Îranê bona vê ku Sovyet rê bide wan, ku hêzên xwe bişînin wê herêmê, da ku yaxîbûna Kurdan serkut bike ret kirine. Dewleta Îranê berdewam hêviya wê ew bû, wan têkderan serkut bike, û keyfxweş dibe ku ger karbidestên Sovyetê rê bidin wan, ewê hêza hewce bona bicihanîna vê armancê bişîne wir. Dewleta Îranê derheq wan handanên hêzên dagîrker ên Sovyetê, bedguman e. Jiber ku ew hêz kiryara hewce li dijî Kurdan encam nadin.

Balyozê Îranê got ku sedma vê ku dewleta Sovyetê rê nade hêzên Îranê ku herin herêmê, û bixwe jî tu karekî di vê derheqê de encam nade, ew e ku dewleta Tirkiyê çavtirsîn bike ku hekî Tirkiye daxwazên Sovyetê li siberojê qebûl neke, Sovyetî dikarin vê ajawe û fitneyê di nava Kurdên Tirkiyê de jî vegeşînin.

Balyozê Îranê got ku wî ji zimanê zavayê konsolê Îranê li bajarê "Kobîşêv" ve bihîstiye ku Stalîn du hefteyan berî niha li Moskoyê bangî balyozê Îranê kiriye da ku heta ser pirsên pêwendîdar bi hev re gotûbêjê bikin.

Stînhardit

Ev rapor hatiye şandin bo Tehranê û bo Kobîşîv

**Belgeya hejmar: 60**

(1942, bergê IV, rûpel 321-322)

Telegrama 1862/00/891 li Wezareta Derve bo balyozxaneya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li yekîtiya Sovyetê (Birêz Standbayı)

Waşington, 06.05.1942`an, demjimêr 11`ê paşnîvro

203-Balyozxaneya me li Tehranê rapor daye ku çalakiyên eşîrên Kurdên yaxîbûyî li herêma Rizayiyê (Urmiyê) li Azerbaycanê rewşeke gelek cidî afirandiye, ku dewleta Îranê nikare kontrol bike. Li ber vê ku Sovyet nahêle leşkerên Îranê vegerin vê herêmê, dewleta Îranê nerazîbûna xwe li Sovyetê zelal kiriye, û daxwaz jê kiriye ku ligor ruhê peymannameya Birîtanya-Rûsiye-Îranê, digel Îranê hevkariyê bike.

Şah hêvî xwestiye ku Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê piştevaniyê ji helwesta Îranê bike, hekî we pê baş be, zehmet nebe hewl bidin ku di dema hewce de nîgeraniya dewleta me derheqê wê bêserûberiya ku di van dawiyane de li Bakûra Kurdistanê hatiye pêş, digel karbidestên Sovyetê bixin ber basê.

1-Bêguman dewleta Sovyetê agehdar e, ku ajansên propagendeyên dewletên hevalbend, sermayeguzariyeke zêde li ser serhildana Kurdan kirine û dibêjin, Rûs wek beşek ji plana xwe Kurdan tûj dikin da ku vê herêma ku niha hêzên Sovyetê dagîr kirine, bixin ser axa Sovyetê. Ev propagende bi zêdeyî li Tirkiyê û Îraq û Îranê têne kirin. Renge ev yek dengvedaneke gelek xirab li ser pêgeha Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li vê herêma pir girîng de hebe.

Di dema gotûbêja digel karbidestên Sovyetê em dikarin van hokarên jêr ku sedema nîgeranbûna dewleta me ne, bas bikin:

2-Jiyana hevwelatiyên Amerîkayê, û mal û heyiya wan di metirsiyê de ye. Hevjîna nûçegihaneke Amerîkayî li derdora Tewrêzê bi destê Kurdan hatiye kuştin.

3-Carekê radyoya hevalbendan (AXIS) got ku hêzên Reşîd

Geylanî rêberê serhildana Îraqê tevlî Kurdên Îranê bûne. Di demekê de ku renge ev nûçeya rast nebe, lê nîşan dide ku serhildana Kurdan derfeteke nerasterast e, ku dijmin dikare sûdê jê werbigre, û renge ev yek komek kêşe û astengiyan bo gihîştina hewcehiyên Rûsan ji rêya Îranê ve çêbike.

Ku wisa bû, ligor wan hokarên ku hatin baskirin, dewleta Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê hêvîdar e ku dewleta Sovytê van pêngavan bavêje, jiber ku ev pêngav bona vê ku karbidestên berpirsyar bikarin bi rêya yasa û nezmê, vê bêserûberî û aloziyê bitemirînin, hewce ne.

Dewleta Îranê agehdarî vê pêwendîgirtina me nine, û nabe hûn bêjne dewleta Sovyetê ku Îranê daxwaza destêwerdana Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê kiriye. Bo agehdariya we, karbidestên xwecihî ên Sovyetê û karbidestên Îranê li Azerbaycanê çend rojan berî niha digel rêberê Kurdan hevdîtin kirine, û wisa dixuye ku daxwaza Kurdan, bo Tehranê û karbidestên pêwendîdar ên Rûsiyê hatibe veguhastin.

Zehmet nebe Wezareta Derve jî ji pêşhatan pê bihesînin.

**Belgeya hejmar: 61**

Ev belge 21 rûpel in, û serbarê vê ku tenê wêneyê du rûpelan hatiye danîn, lê naveroka hemû belgeyan bi tewahî hatiye nivîsîn.

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

بکلی محرمانه و مستقیم

رونوشت گزارش تقدیمی به تیمسار معظم وزیر جنگ مورخه ۱۳۲۱/۲/۱۹ شماره ۱۴۳

مقام مقدس تیمسار معظم وزیر جنگ

با نهایت احترام بعرض مبارک میرساند . در اینموقع که حضرت اشرف بمنظور رفع تعدی از غارت زدگان و بینوایان رضائیه و شاهپور که دستخوش تعدی اکراد واقع شده اند بمرکز استان ۴ تشریف فرما شده و دویست هزار افراد حومه رضائیه و شاهپور را که در حال ناامیدی بشهرهای معروضه پناهنده شده اند بقدوم مبارک مفتخر و امیدوار بمساعدت اولیای دولت شاهنشاهی فرموده اند علاوه بر وظایف اداری فریضه ملی خود میدانم که بدون هیچگونه ملاحظه مشاهدات و اطلاعات خود را بعرض مبارک رسانیده تا در ظل عنایت ویژه حضرت اشرف و توجهات اولیای دولت شاهنشاهی چاره برفع بدبختی و بیچارگی و بی خانمانی دویست هزار مردم غارت زده رضائیه و شاهپور بشود .

( الف) وضعیت عمومی قبل از غائله فعلی اکراد

۱ــ پس از حوادث شهریورماه ۱۳۲۰ که قسمتی از اسلحه ارتش شاهنشاهی بدست اکراد و اوباش این استان افتاد بازار خودسری در این استان رواجی پیدا کرده و بویژه در میان اکراد تحریکات بیگانگان شدت پیدا نموده و کار را بمرحله غائله امروزه رسانید .

۲ــ پیدایش کمیته ها و انجمنهای سری که پس از حوادث شهریورماه ۱۳۲۰ در این استان ظاهر شد بیشتر بواسطه سوء سیاست مامورین محلی بوده که در نتیجه ترورها و آدمکشی های متوالی در دیماه ۱۳۲۰ در شهر رضائیه واقع گردید

ل

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

رونوشت —١٦—

مورخه

شماره

١— درتمام نقاط کرد نشین از خوی تامهاباد پاسگاه امنیه جمع آوری شوند

٢— اسلحه اکراد در دست خودشان باقی باشد

٣— اسلحه عجم ها را مامورین ارتش سرخ جمع آوری

٤— یکنفر نماینده در تمام ادارات دولتی داشته باشند.

٥— بآنها آزادی سیاسی داده شود که در امور ملی خود آزاد باشند

٦— در نقاط کرد نشین آموزشگاههائی بهزینه دولت تاسیس زبان کردی تدریس نمایند

٧— دهات محال ترگور و مرگور دشت وبرادوست متعلق بخود دانسته و — تقاضای تملك آنها را نموده‌اند

٨— قریب بیست نفر از اکراد که در شهربانیها بازداشت میباشند مرخص کردند از طرف سرهنگ ارتش سرخ جواب داده شد که بجز موضوع اجازه حمل اسلحه ونگاهداری تفنگ نزد آنها برای سایر موضوعات وسیله سفارت دولت شوروی در نزد دولت ایران اقدام خواهد شد و دستور تفرقه آنها را دادند وآنها هم قول دادند که متفرق شده واگر سوال غارتی نزد اشخاصی باشد بصاحبانش مسترد دارند وپس از مذاکرات با لافدوی و مامورین شوری از دهستان سنگر برضائیه مراجعت نمودیم ثانیا در ساعت ٢ مورخه ١١ ماه جاری باتفاق سرهنگ معاون فرمانده نیروی ارتش سرخ در تبریز وعین علی اف مدعی العموم وجعفر آقا ستوان یك افسر ارتش سرخ که زبان کردی آشنا میباشد به دهستان کوی تپه محال باراند وزچای ٦ کیلومتری رضائیه رفته با روسا وبیك زادگان هرکی وروسای

✗

**Wezareta Navxwe**

**Birêveberiya Giştî ya Şarevaniyê**

**Rûnivîsa raporê pêşkêş e bi tîmsarê mezin ê wezîrê Şer (Rizaxan)**

Rêkevt: 19.02.1321 (09.05.1942) Hejmar: 143

Digel rêz û hurmetek bêdawî, erzî xizmeta cenabê we tê kirin, ji wê demê ve ku cenabê eşref bi niyeta nehêlana zilmê li ser kesên talankirî û destengên Rizayiyê (Urmiyê) û Şahpûrê (Selmasê), ku ji aliyê beşek ji Kurdan ve rastî talankirinê bûne hatine vir, hatina we bo navenda parêzgeha çarem ku 200 hezar kes ji xelkê Selmas û Urmiyê di nav bêhêvîtiyeke tewaw de, bo bajarên derdor penaber bûne, û piştevanî û hawardehatina koşka paşatiyê, ew hêvîdar û serfiraz kirine.

Em jî serbarê karûbarên îdarî, wek erk û vezîfeya neteweyî a xwe dizanin ku bêy ti cure têbîniyekê, zanyariyên xwe bidin cenabê we, da ku tevî meznahiya we, û bi hawarde hatina taybetî ya eşref, û girîngîpêdana karbidestên mezin ên dewleta Şahenşahî, hûn çareyekê bo nehêştina vê rojreşî û bêçaretî û bêstargehiya 200 hezar kes ji xelkê talankirî ên Urmiye û Selmasê bibînin.

**A: Rewşa giştî ya berî talankariya niha ya Kurd**

1) Piştî bûyerên meha Xermanana sala 1320-(1941)ê ku beşek ji çekên artêşa paşatiyê kete destê Kurdan û têkderên vê parêzgehê, êdî bazara bêserûberî û kesbikesiyê di vê parêzgehê de vegeşiyaye. Bi taybetî di nava Kurdan de, handana ji aliyê biyaniyan ve zêde bûye, û kar gihandine vê astê.

2) Serhildana komîte û rêxistinên nepenî ku piştî bûyerên Xermanana sala 1320`î di vê parêzgehê de eşkere dibin, zêdetir bi sedema kêrnehatîbûna karbidestên xwecihî bûye, ku di encama berdewamiya teror û mirovkujiyên meha Befranbara sala 1320`î de li bajarê Urmiyê qewimîne. Kurd jî hêdî-hêdî bi mifahwergirtin ji vê rewşa ku li encama aloziyên nava neteweyên cuda-cuda de hatiye pêş, beşdarî kirine, û heta di nav wan komîte û rêxistinên

ku bi navê Tûde di vê parêzgehê de pêk hatine, ji rêya Asûriyan û endamên hizbên serberedayî ve pêwendiya xwe digel biyaniyan bihêz kirine, û di wan cihên ku nêzî biyaniyan in, xwe xistine pêş hizbên din, û ligor berjewendiyên xwe tevgeriyane. Bi awayekî ku niha biyanî piştgiriya şer û kiryarên têkderane ên bêrehmane ên wan dikin, û wisa kirine ku nêzî 200 hezar kes ji re`iyetên bêçare û zehmetkêş ên Urmiyê û Şahpûrê li jêr zexta bêrehmane ya wan de bi hemû awayekî bêne çewsandin, û malên xwe bi cih bihêlin, û berê xwe bidin çolistanan.

3) Piştî sefera beşek ji serokên Kurd ên parêzgeha çar (parêzgeha Urmiyê) bo welatên biyanî û şarezabûna ji rewşa giştî ya wan welatan û vegeriyana wan, û ew xwenîşandan û manorên ku wan li ber çavên Kurdan bi rê ve dibirin, zemîneyek bo wan aloziyan pêk hatibû, û wan çavnihêriya derfeteke baş dikirin bo cîbicîkirina niyetên xwe. Mixabin li heyama derbazbûyî de, ew derfet bo wan pêk hat, û di dema xwe de wan ew amancên xwe xistin warê cîbicîkirinê de.

4) Di destpêka meha Rêbendana 1320`î de Seyîd Ebdullah kurê Şêx Ebdulqadir ji rêya sînorê Xanê ve hatiye Rizayiyê (Urmiyê), û bi vê serdana ku bo Mihabad û Şinoyê kir, hemû Kurdên Soma û Biradost, û Herkî û Begzadeyên Mirgewer û Deşt û Tirgewer, û Kurdên Şino û Mihabadê heta Bane û Seqizê yekgirtî kirin. Wî xwestiye ku bi alîkariya Qazî Mihemedê Mihabadî, her cure dijminatiyeke derbazbûyî di navbera wan de were çareserkirin, û wan bide sondê da ku bi hev re bona armanceke yekgirtî amade bibin. Renge ewan ew amadekarî jî kiribin, û li benda vê bin ku kengê rewş guncaw bû serî hildin. Lê bi sedema kêrnehatîbûna siyasî ya karbidestên xwecihî, ew rewş berevajiyê çavnihêriya Seyîd Ebdullah û Qazî Mihemed û alîgirên wan zûtir hate pêş.

**(B)-Ew sedemên ku bûne egera serhildana têkderane a niha ya Kurdan:**

1-Ew hokara çar xalî ku di beşa “A” de hatiye.

2- Piştevaniya eşkere ya biyaniyan ji Kurdan.

3- Ragehandina qedexeya hilgirtina çekan li Rizayiyê (Urmiyê) ji aliyê fermandarê Rizayiyê (Urmiyê) ve, ku bi sedema pêdagiriya serheng Haşimî û nerazîbûna Kurdan ji şêweya kar û kiryarên wezîfedarên emnî li dema wergirtina çekan di nava bajarê Rizayiyê (Urmiyê) de karvedan lê ketin, û têkderên navxweyî û derveyî, biryara qedexeya hilgirtina çekê di nava bajar de wek hewla damalîna çekan li dervey bajaran belav kiribûn, û bi vî awayî Kurd bo vê şerxwaziya niha han dane. Di demekê de ku ligor vê şarezayiya ku min li ser morala Kurdan heye, ji destpêka belavkirina vê daxuyaniyê ve, min ew kar bi baş nezanî, û min ew yek jî anî bîra cenabê fermandarê Rizayiyê (Urmiyê), û serokê herêma 2, lê girîngî nedanê.

4- Gotinên Serheng Haşimî bo serokên Kurd ên Soma û Biradost, ku xwe ji kirîna çekan biparêzin, û ew hişdariya ku di siberojeke nêz de, wê çekên wan bêne komkirin.

5) Danîna bazgehên emnî li ser rêya Şahpûr û rêya Mihabadê, bêy vê ku pêştir pêşbîniyek bo rewşa xwecihî ya wan ciyan bihête kirin, û îca bi pêdana rêkarên hewce bi bazgehan bo ragirtina hevsengiya siyaseta herêmî û berçavgirtina rewşa Kurdên çekdar ên serberedayî û piştguhxistina paşeroja wê herêma ku Kurdên çekdar bûne xulamokê biyaniyan. Jiber ku berî avakirina bazgehan, destbiserkirina serokê Kurdan berî her karekî din bûye, çêdibû ku bi rêyeke lojîkane, bi hevkariya hêzên ewlehiyê beşek ji rêyan, bidana destê Kurdan, û hekî hewce jî bûya, rêkarên din girtibana pêş, û piştre hewla avakirina bazgehan bidana.

Bi sedema vê ku Kurdên pirçek û teyar, di bin fermana biyaniyan de ne, diviya berî avakirina bazgehan, ji rêyeke guncaw kar bo rakêşana serokên Kurdên xwecihî bihatina kirin, û bi anîna beşek ji Kurdan bo nav hêzên emnî, kontrola beşek ji rêyan bi wan hatiba spartin, û di dema hewce de tevdîrên hewce berçav hatibana girtin,

û piştre pêngav bona avakirina bazgehan hatibana hilgirtin.

6) Bi sedema vê ku ew cihên destbiserdegirtî ên parêzgeha çar ku li ser sînorê Tirkiyê hilketine, renge avakirina bazgehan ji aliyê zabitên Artêşa Sor ve cihê têbînî û gumanê be. Bi sedemê vê ku Artêşa Sor bawerî bi Kurdan heye, hekî bi hêza hevpar a Kurd û Ecem, hinek ji wan cihan hatibana pirkirin, tu têgihîştineke şaş rû nedida. Ji aliyekî din ve jî Kurd razî dibûn û bi boçûna min kêşeyek bo avakirina bazgehan ji aliyê biyaniyan ve nedihate pêş.

7) Handana Eceman ji bo alîkariya danîna bazgehan li dijî Kurdan, bûye sedema gumanê di nav Kurdan de, û vê yekê ew han dane ku dest bo dijminatiyê bibin.

8) Gefxwarin li Kamil Begê Begzade û Kurdên din ên Urmiyê û Şahpûrê jî, bûye sedema alozî û pêşhatên vê dawiyê.

9) Piştî avakirina bazgeha Reşkan û Balanîşê li ser rêya Urmiye û Mihabadê, ku di rojên destpêka avakirina bazgehê de hêzên ser bi bazgehê, ketine pey pênc kes ji Kurdên ser bi Şêx Celal Derbendî li nêzîk Zerkava, û ew yek bûye sedema kuştina sê kesan û birîndarbûna Kurdekî din. Ew kiryarên han û neşopandina vê mijarê, bûye sedema hestiyarkirina bîrûraya giştî a Kurdan, û ew pirs bûye sedema propgendeya di nava Kurdan de, û hewla wan bo kombûnan û hêrişkirina li ser bazgehan, û pêkhatina rewşa niha.

**(C) Şêwaz û destpêka çêkirina aloziyê**

Li rêkevt 4`ê vê mehê de nêzî 150 kes ji Kurdên çekdar ên di bin fermana Nûrî Beg û Reşîd Beg û Es`ed û Kamil Beg ji begzadeyên herêma Mirgewer û Deşt û Tirgewer ku li (Dêhistanê) de ne, û herwiha li Têzxirab û Gecênê li 8 km a Urmiyê û li nêzî Rewze Çay (Roze Çay) ne, û gef dixwarin û li ser rêya Şahpûrê û gundên Tirknişîn bi propagendeyan beşek ji Kurdên Soma- Biradostê, û Kurdên (Rewze û Nazlû Çay) digel xwe rêk xistin, û şer û alozî saz kirin.

Li rêkevt 5`ê vê mehê nêzî 140 kes ji Kurdên gundên Deşt, Tirgewer û Mirgewer ku serokê wan Zêro Beg û Mihemed Husên

û Mecîd û Mîr Sultan kurên Kerîm Herkî bûne, li gundên herêma Mînolo û gund û cihên din ên Barandêzçay li nêzî bazgeha emnî ya Balanîş û Reşkanê li ser rêya Mihabadê cihgir bûne, û li gundên Eceman dest kirine bi komkirina çekên wan, û lêdan û azardana wan. Herwiha li gundên Şino û gundên Kurdnişîn ên derdora Nexedê û di nava êlên Mameş, xeber dane me ku Kurdên vê deverê jî bi hawara wan de hatine, û bazgehên emnî ji çekdaran ramalîne, û gundên Ecemnişîn talan kirine, û hejmarek ji Mesîhiyên Aşûrî ku serkirdeyên wan Babacan û Davûd û birayê wî wate Yeprem jî çûne cem Kurdan û di vê operasiyonê de hevkariya Kurdan kirine.

Li rêkevt 6-12`ê vê mehê Kurdên Soma Biradost ku ji aliyê Sertîp Ebas û Hesenê Hinare û Hesen Têlu û Qotaz Mamedî û Emer (Emerxan Şerîfiyê Şikak) û ...hwd ve hatine serkirdayetîkirin, di navçeya Karêz a Enzel û komek gundên din ên wekî Xaneqa û taxên Rewze de ku nêzî 500 siwar û peyayan dibin kom bûne, û bazgehên emnî ên Urmiye bo Şahpûrê, û gundên Enzel û Rewze Çayê xistine ber gefê. Herwiha hejmarek ji Kurdên Soma-Biradostê jî li nêzî Şahpûrê, gef li bazgehên nêzî vî bajarî xwarine.

Kurdên nêzî Şino û Taliş û herwiha Kurdên aliyê Sildûzê ku ji aliyê Hemzulayê kurmamê Qerenî Axayê Mameş û Qerenî Axayê Zerza û Mûsa û Şêx Celal Derbendî ve hatine serkirdayetîkirin, digel nêzî 500 kesan li Barandûzçayê kom bûne, û gef li binkeyên emniyetî xarine û dest kirin bi dizî û talan û şêlandina xelkê.

Bi her hal kombûna Kurdên çekdar li herêma Barandûz Çay, Nazlû, Rewze Çay, Bekişlû Çay û Enzelê, ku hejmara hêza wan zêdetir ji 1500 kesê siware û piyade bûn, ew hejmar heya 13`ê vê mehê bo 2 hezar heya 2500 kesî bilind bûye, û li Baranduz Çayê kom bûne. Min wek xwe nêzî 1500 kesî ji wan li nêzî Goy Tepe û Karêz û Xaneqayê bi çavên xwe dîtine.

**Hêriş li ser binkeyan û têkderiya Kurdan**

1- Ji demjimêr 9`ê roja 5 a vê mehê ve Kurdên Herkî ji aliyê Zêro Beg û kurên Kerîm Herkî ve hatine serkirdayetîkirin, û bi hevkariya

Babacan û Yeprem û hejmareke din ji Mesîhiyan hêrişî ser bazgeha Balanîşê a li 24 km a bajarê Urmiyê kirine. Di vê navberê de hejmarek ji wan Ecemên ku li gundên derdorê ve hatibûne hevkariya bazgehê, li dijî Kurdan şer kiribûn, û di vê navberê de ji Kurdan û Mesîhiyan kuştî û birîndarên wan hebûne, û ji hêzên emnî û Eceman jî yek kes birîndar bûye. Sergurd Kemal digel sê kes ji hêzên emnî li rêkevta amajepêkirî de, wê ji bo parastina serbazgehê û pêşîgirtin ji hêrişa Kurdan bo wir bêne şandin. Hêzên emnî ên serbazgeha Reşkanê jî têne komkirin û wê bo serbazgeha Balanîşê werin şandin. Bi sedema vê ku bazgeha Balanîşê bona bergirîkirinê cihekî guncaw nebûye, hêzên emnî dest bi ser gundê Pûladlû de jî digrin ku li cihekî stratejî ye û li nêzî Balanîşê ye, û li wir dest dikin bi pêşgirî û pevçûnên li hember Kurdan.

Di vê navberê de çil kes ji hêzên emnî, li rêkevt 6`ê vê mehê bo piştevaniya ji vê serbazgehê çûne wir. Şer û pevçûna heya 7`ê vê mehê dom kiriye. Di vî şerî de ku ji hemû aliyekî ve, ji navçeya Şino û navçeyên Deşt, Mirgewer, Tirgewer û navçeyên din ve hêza piştevan gihîştibû Kurdan, lewma nêzî êvariya roja 7`ê vê mehê serbazgeha Balanîşê ji aliyê Kurdan ve dest bi ser de tê girtin, û nêzî sê çar kesan têne kuştin û birîndarkirin, û hejmarek jî reviyane û yên din jî hatine çekkirin. Lê serbazgeha Pûladlû ku li ser dijayetiya Kurdan berdewam bûne, ew jî ji çar aliyan ve têne dorpêçkirin, û ji êvariya roja 7`ê vê mehê ve pêwendiya wan digel Urmiyê bi tewahî hatibûn qutkirin. Li demjimêr 24`ê roja 7`ê vê mehê, zabiteke hêza emnî digel pêncî kesî, bo şikandna dorpêça li ser serbazgeha Pûladlû, çûne wê herêmê, lê ji ber giraniya dorpêçê, tenê dikarin heya 10 km pêşreviyê bikin, û piştre vedigerin. Serbazgeha Pûladlo heya rêkevt 10`ê vê mehê li dorpêçê de dimîne, û hejmarek ji hêzên emnî ên binkeyê bi şerkirin direvin û ên din jî ku nêzî 28 kesî dibin li ber nemana fîşekan xwe radestî Kurdan dikin, û piştî çekkirina wan ji aliyê Kurdan ve, bo Urmiyê têne veguhastin. Her çawa be, berberekaniya vê hejmara kêm ji hêzên emnî li beramber Kurdan ku zêdetir ji 600 kes bûne, cihê pêzanînê ye.

2 ) Li rêkevt 7`ê vê mehê nêzî 300 kes ji Kurdên Herkî, bi

serokatiya Reşîd Beg û Nûrî Beg û Hesen Têlo, tevî hejmarek ji Kurên Ewdoyî ên Soma û Biradost û kurên Seyîd Taha ku li Kurdava a 8 km a Urmiyê hatine, û ber bi bazgehên emnî ên Kerîmava û Nazlûyê, ku ew bazgeh ji aliyê çekdarên Ecem û rûniştiyên gundên Nazlû Çay û mişexorên taybetî ên Mewlewî bexşdarê (Urmiyê) ve dihatin piştevanîkirin hereket kirin, û rêya Urmiye bo Şahpûrê daxistine, û dest kirine bi gefxwarina li rûniştiyên gundên Ecemnişîn. Herwiha li rêkevt 7`ê vê mehê du kamyonên pêkhatî ji çar zabit û çil hêzên emnî û komek fîşekan, ku ji Tewrêzê ve bo bihêzkirina hêzên emnî ên Urmiyê rê ketibûn û gihîştibûne bazgeha Nazlûyê, li wir bi sedema dorpêça Kurdan, êdî nekarîne pêşve herin û piştî agehdarbûna hêzên emnî ên Urmiyê, kamyonek bi 20 kesan ve bo alîkariya wan û vekirina rê dişînin "Girdava", û li wir jî bi sedema hêrişa Kurdan kamyonan bi cih dihêlin, û hinekê paşve tên û hinekê bergiriyê dikin, hinek jî direvne nav bajar û çawaniya bûyerê bas dikin. Dema ku zanyariyên wê bûyerê tên wergirtin, cardin hêzeke 30 kesî a leşkeran bo alîkariya hêzên xwe û şerkirina li dijî Kurdan vedigerin wir, lê jiber ku hêza Kurda zêde bûye, û cihên bilind û asê jî di destê wan de bûn, wan leşkeran jî nekarîn bo vekirina rê karekî bikin. Li ber vê ku bazgeh û hêzên emniye ên ku hatibûne şandin, şiyana wan li hember hêza zaf ya Kurdan û ew piştevaniya ku zû-zû digihîştin wan tunebû, herwisa egera destbiserkirin û çekkirina wan 120 kesan jî hebû, lewma biryar hate dan ku Mewlewî bexşdarê Urmiyê di dema şevê de, û ji korerêyên gundên Ecemnişîn ve here, û wê hêza emnî ji dorpêçê rizgae bike û wan bigehîne nava bajar. Navbirî wekî hatî baskirin diçe, û piştî gihîştina bi nêzîkatiya Eskerava li 15 km a bajarê Urmiyê, li wir ji rêya şandina komek çekdarên xwecihî ve bona rûbirûbûna Kurdan rê vedike, û di destpêkê de du kamyonên ku ji Tewrêzê ve hatibûn ji dorpêçê derdixe û vedigerîne Urmiyê, û cardin ji korerêyan ve diçe binkeya Kerîmava û Nazlûyê, û hêza dorpêçkirî rizgar dike, û wan vedigerîne Urmiyê. Di encama pevçûnên di navbera hêzên Mewlewî û Kurdan de çar çekdarên Ecem têne kuştin û du kes jî birîndar dibin û hejmarek ji Kuredan jî têne kuştin û birîndar

dibin. Tê gotin ku mezineke Herkiyan li herêma Derbend a Urmiyê di nava kuştiyan de ye. Bi her awayekî be, fedakariya Mewlewî bexşdarê Urmiyê û çekdarên Ecem bûne sedema rizgarkirina 120 kes ji hêzên emnî ku li cihên cuda-cuda ên ser rêya Şahpûrê bûn. Di vê pevçûnê de yek kamyona Ford ku pêştir li Kurdava, di destê wan de bû, û Kurdan bo veguhastina talanên xwe bo Tirgewer û Mirgewer û Deştê bi kar dianîn, dikeve destê wan de.

3) Piştî çekkirin û radestkirina binkeya Pûladlû û komkirina bazgehên Nazlû û Kerîmava, Kurdan dest kiribûn bi talankirin û birina pez û ajelên 300 gundên herêma Rewze Çay, Nazlû Çay, Baranûz Çay û Bekişlû Çay û herêma Enzel û di vê navberê de beşek ji Ecemên çekdar li hinek navçeyên wekî Enkine bi komkirina çekdarên pazdeh gundan di vê navçeyê de, karîbûn mal û darayiyên xwe di van ciyan de biparêzin û heta rêkevt 17`ê vê mehê karîbûn li hemberî Kurdan rabiwestin. Herwiha çekdarên heft gundan li herêma Enzelê li Qerebaxê kom bûn, û hemû jin û zarok û mal û darayiyên wan heft gundan bo Kazim Daşî veguhastin, û bixwe jî li Qerebaxê digel Kurdan ketibûn nava pevçûnan de. Derheqê wan gundên ku akinciyên wir Mesîhî (Ermenî û Aşûrî) bûne, jiber ku ji aliyê Kurdan ve parastî bûne, û yekîtiyek digel Kurdan hebûne, hejmarek zêde ji pez û ajelên Eceman bi navê emanet û xwedankirinê, ji wan werdigrin û radestî Kurdan dikin û renge bixwe jî mifah ji vê rewşê wergirtibin. Cuda ji vê jî, ew di warê yarmetiyê de, di warê hêz û çek û fîşek û hespan de, bo Kurdan xemsarî nekirine, û heta li şer digel emniye û talana hinek gundan de jî beşdarî hebûne. Her çawa be li rêkevta 5`ê Gulanê heya 18`ê vê mehê gundên Ecemnişîn li jêr talankirinê de bûne, û beşek ji gundan hatin şewitandin, û hinek ji xelkê wan gundan jî hatine kuştin û birîndarkirin, ên din jî aware bûne, û hejmarek zarok jî ku ji tirsê Kurdan reviyane, di dema bazdana ji rûbaran ketina nav avê û xendiqîne. Herwiha azardana jinan û mêran bi awayekî berçav rû daye, ku di rapora din de, bi awayekî cuda ji we re wê bihête şandin.

4) Tevî talankirina gundên Urmiyê û beşek ji gundên Şahpûrê li rêkevta 8`ê vê mehê pêngav ji bo hêriş û dorpêçkirin û girtina

bajarê Urmiyê hatiye hilgirtin, û wek diyar e li rêkevt 8`ê vê mehê nêzî 300 kes ji Kurdên çekdar Kûreya geçpezî û Kuştargeha bajar ku li 500 metrî a rêya Şahpûrê hilketiye xistine bin kontrola xwe de, û ji aliyê pasevanan ve teqe li wan hatiye kirin. Herwiha girên çar dewra bajar bi dest ve girtine, û rêwîng şelandine û bajar li hemû aliyekî ve di metirsiyê de ye, û desteyên 50 kesî ên hespsiwarên kurd, berdewam li baxên derdora bajar manor dane û bi şandina qasid û sîxoran bo nav bajar xelk ji bo şoreşa li dijî dewletê han dane, û bi sedema vê yekê morala xelkê û wezîfedarên emnî şikestibû, û kêşe û pirsgirêkeke zaf bo zabitên emnî û şarevaniyan hatiye çêkirin. Di vê navberê de beşek ji pez û ajelên xelkê bajar û wan gundên ku bona çerandina pez û ajelên xwe, hewara xwe bo derdora bajaran birine, hatine dizîn ku bi bergiriya wezîfedarên emnî û pasewanan, heta qasekê pêşiya vê talanê hatiye girtin, û beşeke kêm ji pez û ajelan hatine dizîn, û dorpêçkirina bajar ji aliyê Kurdan ve heya 10`ê meha Gulanê, heya pişt dîwarên bajar jî hatiye. Di heyama dorpêçê de em berdewam digel konsolê Sovyetê û Artêşa Sor di pêwendiyê de bûne, û ji aliyekî din ve hemû bilindahiyên bajar ji aliyê hêzên şarevaniyê ve hatine parastin, û hejmarek ji xelkê Ecem û yên ku ji gundan ve hawara xwe bo bajar anîbûn, bi awayekî nepenî çek bi des xistibûn, û ew çek bo parasatina bajar di cihên hewce de danîbûn.

Ji aliyekî din ve beşek ji Aşûrî û Ermeniyan ku digel Kurdan di pêwendiyê de bûn, di roja 9`ê Gulanê de xwestin ku ber bi rêveberiya emnî û şarevaniyê hêrişê bibin, û ji vê rêyê ve hêsankariyê bo Kurdan bikin. Wek diyar e li demjimêr 18`ê roja 9`ê Gulanê çend fîşekek ber bi cihê pêşîn ê binkeya leşkerî û herwiha kelanteriya 2 û girtîgeha şarevaniyê ku li navenda bajar û li taxa Yerg de ye hatin teqandin, û çend gulle jî ji aliyê wan Kurdên ku li nêzî derwazeya “Nûkçer” bûn hatin teqandin, û bi vî rengî xwestine ku emniye cihên xwe bi cih bihêlin û birevin, û ew jî dest bi ser de bigrin. Çend zabitên emnî li rûyê nezaniyê ve çend teqeyên esmanî dikin, heya ku sergurd Kemal digihîje wir, û biryara ragirtina teqê dide û emniyan ji stargehê derdixe, û bo berevaniyê dişîne derdora bajar.

Alîkarê konsolê Sovyetê ku di wê demê de li pêşiya şarevaniyê hevdîtineke wan hebû, biryara şandina emniyeyan bo dûrxistina Kurdan ji bajar radigre. Min jî îzna vî karî neda û bi vî rengî heya 10`ê vê mehê rewşa bajar û daxistina dukan û bazarê berdewam dibe.

Bi vî awayî heya dawî roja 10`ê Gulanê ku bi biryara Artêşa Sor Kurd ji derwazeyan têne dûrxistin, jiber ku hinek ji wan gundên ku ji 3 km û hinek jî ji 6 km a bajar bûn nehatibûn valakirin, û heya 17`ê vê mehê hêzên emnî û şarevaniyê bilindahiyên bajar di destên wan de dibin, û parêzgarî ji pez û malatên wan kesan dikin ku hewara xwe bo bajar anîbûn.

Hinek ji bazgehan bi awayekî têkel ji hêzên emnî û pasewanan tê damezirandin, û ji wir ve parêzgarî ji wan pez û malatan dikirin, tenê bi roj bo çerînê tînin derve, û li rêkevtên 15 û 16 û 17`ê vê mehê Kurd hêdî-hêdî ji nêzî bajar vedikêşin. Lê dukan û bazar û kolan ji roja 7 heya 17`ê vê mehê daxistîbûn, û bajar bi tewahî di rewşa gireva giştî de bûye, û bi hewla hêzên şarevaniyê karîne nanpêjxane û ew dukanên ku xwarinê difroşin bidin vekirin, û berdewam bin heya ku bersivderê daxwaziyên rûniştiyan û wan 40 hezar penaberan bin ku hewara xwe bo bajar anîne.

**(L) Ew tevdîrên ku Sovyetê û Artêşa Sor li hember Kurdan de girtine pêş**

Li rêkevt 5`ê vê mehê ku Kurdan hêrişî ser binkeya Balanîşê kirin, ji rêya fermandar ve digel konsolê Sovyetê û herwiha rasterast digel fermandeyên Artêşa Sor têkilî hatiye danîn, û bona piştevaniya ji binkeyên emnî û dûrxistina Kurdan, bi taybet di wê demê de ku binkeya "Poladpo" li rêkevt 7`ê vê mehê kete ber hêrişa Kurdan û piştre hate dorpêçkirin, her demekê ku têkilî hatibe danîn, cenabê alîkarê konsol bersiva wî ew bû ku bi bê rêdana balyozê me li Tehranê û konsolê Tewrêzê em nikarin bi tu awayî hevkariyê bikin, dema ku daxwaz ji wan hate kirin ku daxwaza rêpêdanê bikin, heya roja 10`ê mehê tu bersiveke erênî tunebû, lê derheq destbiserdegirtina bajar, fermanderên Artêşa Sor ragehandin ku Kurd hêrişên wiha nakin, û li rêkevta 9`ê mehê sê muselsel û hejmarek kêm çekdar şandin

derwazeya Şahpûrê, lê tu pêngaveke piraktîkî hilnegirtin.

Li gor wan raporên ku ji aliyê kelanterî û kesên cuda ve gihîştine destên me û faylên wê hatine arşîvkirin, Kurd di dema hêrişa bo ser binkeyên emnî, ji aliyê hêzên Artêşa Sor ve hatine handan, û heta di dema kuştina Yepirmî ê Mesîhî li şerê binkeya Balanîşê digel Ermeniyan, yek ji zabitên Artêşa Sor çûye binkeyê û derheqê kuştina Yepirmî ê Mesîhî de lêpêçîn ji zabitên emnî kiriye, û piştre fîşekdana li ber pişta yek ji wan Ecemên ku çûbû alîkariya Ermeniyan jê vekiriye, û gef lê xwariye. Ew yek bibû sedema tirs û dilkutokê û di encam de revîna hinek ji Eceman ji binkeyê. Herwiha raporên berdewam li ser hevdîtina zabitên Artêşa Sor û Kurdan hebûne. Bas ji pêdana hejmarek ji fîşekan bi Kuredan tê kirin, lê di vê derheqê de belgeyên selmîner li ber dest de nînin.

Li rêkevt 10`ê vê mehê, generalê konsolxaneya Sovyetê ku li Tewrêzê dirûnê, digel qumandarekî Artêşa Sor ku ew jî li Tewrêzê dirûnê, ji rêya firokê ve ji Tewrêzê hatine Urmiyê û digel zabitên payebilind ên Urmiyê li avahiya parêzgehê hevdîtinên wan hebûne, û berpirsê rêveberiya demûdezgehên dewletî vexwendine û derheq wan bûyerên vê dawiyê bi awayê devkî pirs kirine, û daxwaz kirine ku nûnerek ji aliyê fermandarê Urmiyê ve bê diyarîkirin, da ku digel nûnerên wan, serdana berpirsên Kurd bikin, da ku ji derdora bajar vekişin. Bona vê mebestê jî ez wek nûner hatim diyarîkirin û encama van hevdîtinan ku di van sê rojan de bi rê ve çûn, bi vî awayî erzî xizmeta we dikim:

Destpêkê di demjimêr 15`ê roja 10`ê vê mehê digel qumandarê Artêşa Sor û cihgirê fermandehiya hêzên Rûsî ku ji Tewrêzê ve hatibûn, û (Eyn Elîyov) nûnerê giştî ê Artêşa Sor li Urmiyê, Ce`ifer Axa efserê Artêşa Sor ku digel zimanê Kurdî nasyarî heye, û du kesên din ji efserên Artêşa Sor li gundê Senger li 6 km a Urmiyê digel 12 serkirdeyên Kurd kom bûn, ku navê wan li jêr de hatiye:

Nûrî Beg, Kamil Beg, Qasim Axa, Hatem Begê Herkî, Hatem Bêgzadiganê Herkî, Seyîd Ehmed kurê Seyîd Taha, Şêx Sidîq kurê

Seyîd Taha, Hesen Têlo ji Kurdên Ewdoyî, Reşîd, Se`îd Beygzade Herkî, û sê kesên din ji hevalan ku navên wan nahê naskirin, me hevdîtin kir û piştî gotûbêjeke zor, şîreta pêwîst ji aliyê qumandar û zabitên din ên Artêşa Sor ve bo Kurdan hatin kirin. Herwiha bi navê dewletê min ew nesîhet kirin. Kurdan di wir de zêde şikayet li hêzên emnî hebûn, û serkirdeyên Kurd komek pêşniyar bi mebesta vekişyana wan xistin rû:

Daxwaznameya Kurdan bo deshilatdarên Îranî û Sovyetî:

1)-Li hemû cihên Kurdnişîn ji bajarê Xoyê heya Mihabadê dibe ku binkeyên emnî bêne rakirin.

2) Kurd çekdar bimînin.

3) Ecemên çekdar ji aliyê Artêşa Sor ve bêne çekkirin.

4) Hewce ye ku Kurdan li hemû demûdezgehên hikûmetî de nûner hebin.

5) Li karûbarê neteweyî ên xwe de azadiya siyasî hebin.

6) Li cihên Kurdakincî ji aliyê hikûmetê ve xwendingeh ji wan re werin vekirin û bi zimanê xwe ê daykî bixwînin.

7) Gundên Tirgewer û Mirgewer û Deșt û Soma û Biradost bi ên xwe dizanin, û daxwaza xwedîtiya tewaw a wan dikin.

8) Nêzî bîst kes ji wan Kurdan ku di şarevaniyan de destbiser in, dibe bilez bêne azadkirin.

Derheq wan xalan de ji aliyê Artêşa Sor ve wiha bersiv hate dan ku cuda ji pirsa hilgirtina çek û veguhastinê, derheq xalên din, wê ji aliyê balyozê Sovyetê li Terhranê digel dewleta Îranê were axavtin, û pêngav werin hilgirtin. Herwiha ferman bi wan hate dan ku belav bin, û ew mal û heyiya ku ji aliyê her kesî ve hatiye talankirin, dibe bo xwediyê wan bêne vegerandin. Kurdan jî soz dan ku wisa bikin, piştî van hevdîtinan ez û nûnerê Artêşa Sor li gundê Senger em ber bi Urmiyê rê ketin, û dawî car li demjimêr 12`ê roja 11`ê mehê, ez digel cihgirê fermandehiya Artêşa Sor li Tewrêzê û (Eyn Elîyov) dawakarê giştî û Ce`ifer Axa Sitwanê yekem ê Artêşa Sor ku şarezayê zimanê Kurdî ye, em çûne gundê Goy Tepe li navçeya Berandiz Çay li 6 km a Urmiyê, û digel serkirdeyên Kurd û Begzadeyên Herkî û

serokê êlên Şino û Kurdên Mihabadê me hevdîtin hebûye, ku navê serkirdeyên Kurd bi vî awayî bû:

Zêro Beg, Mihemed Husên kurê Kerîm Herkî, Hemze Axayê kurmamê Qerenî Axayê Mameş, Musa Axa Zerza, Qadir Axa, Şêx Celal Derbendî, Babacan Aşûrî serkirde û komek ji Begzadeyên din ku navên wan nehatiye zanîn. Di vê hevdîtinê de baseke dûr û dirêj ji aliyê Kurdan ve li ser hêrişa binkeyên emnî li ser wan û kuştina sê kes ji Kurdên Şêx Celal û birina darayiya wan hate kirin. Piştre ji aliyê qumandarê Artêşa Sor û min û endamên din ên vê şandê ve ew hatin şîretkirin, û biryar hate dan ku jev belav bin, û hemû wan darayiyên zewtkirî jî bo xwediyên wan vegerînin. Di vê civînê de heman ew xalên ku desteya Nûrî Beg bas kiribûn, ji aliyê wan ve jî hatin pêşkêşkirin, û ragehandin ku darayiya wan Ecemên ku digel Kurdan şer kiribûn nahê radestkirin, û her çawa be biryar dan ku jev belav bin. Demjimêr 16:30 rêkevta baskirî em ji Goy Tepe vegeriyan, û li dema vegeriyanê nêzî 600 çekdarên Kurd li Goy Tepe hatin dîtin.

Cara sêyem jî li rêkevt 13`ê vê mehê ku rewşa bajar bi sedema talançîtiyên Kurdan têk çûbû, û çend karesat jê çêbûn, rapor bi agehdariya nûnerên Artêşa Sor gihîşt, û jora serfermandehiya Artêşa Sor jî deqa raporê bo servey xwe şandin, û bi konsolê Sovyetê û qumandarê komîsêrê binkeya Artêşa Sor a Urmiyê û Eyn Elîyov dawakarê giştî ragehandin, û bi vê boneyê ve ez bo baregeha Artêşa Sor vexwandim û bi min ragehandin ku li ber vê ku Kurdan soz dane ku serdanê bikin, û renge rapora gihîştî rast nebe, bersiv hate dan ku hekî çêbe, li cihê mebest amade bin û li nêz ve hevdu bibînin. Lewma her ji demjimêr 12`ê roja 13`ê vê mehê ve em digel wan rêzdarên ku navê wan hat, em ji derwazeya Şahpûrê ve ber bi Karêzê li navçeya Enzelê ve çûn ku dikeve 36 km a Urmiyê, û Kurd li wir mijûlî çetegerî û talankirina mal û darayiya xelkê bûn, û ew dîmen bi wan hatin nîşan dan, û herî kêm li deh ciyan de, ku Kurd mijûlî talan û hatûçûnê û manordanê bûn, konsol û zabitên Sovyetê ew bang kirin, û gotne wan ku jev belav bin û dev ji wan karan berdin, û mal û heyiya xelkê bo wan vegerînin. Herwiha

di nav rê de nêzî 300 kes ji xelk û ew jin û zarokên ku ji gundan ve hawara xwe bo bajar dianîn hatin dîtin, û di vê derheqê de zabitên Sovyetê lêkolîn kirin, û di dawiyê de em çûne Karêzê, ku cihê kombûna Kurdên Şikak û Ewdoyî bû, û li wir beşeke zaf ji serkirdeyên kurdan ku nêzî 400 heya 500 kesî dibûn amade bibûn, ku navê wan serkirdeyên ku li wir bûn, wiha ye:

Emerxan bexşdarê fermî ê navçeya Soma û Biradost, Sertîp Şikak, Hesen Têlo, Hesenê Hinare, Ebas Axa, Mihemed Axa û hejmareke xelkê din ku navê wan nehatiye zanîn. Li wir komeke pirsyar derheqê wan karên ku wan berevajiyê emniyeta giştî encam dabûn, li wan kesan hatin kirin. Kurdan di destpêkê de komeke şikayet li ser serheng Haşimî û hêzên emnî xistin rû, piştre gotin ku “em diz û talançî nînin, lê me komeke daxwazî li ser serxwebûna xwe hene, û em naxwazin cuda ji dewleta Sovyetê ji tu dewleteke din peyrewî bikin”. Di vê demê de Qazî Mihemedê Mihabadî û Seyîd Ebdullayê kurê Şêx Ebdulqadirê Geylanî ku bo pêşgirî ji têkderiya Kurdan ji Tewrêzê ve hatibûn wir, konsolê Sovyetê ew agehdar kiribûn ku ji rêya balyozê Tehranê ve pêngavên hewce di vê derheqê de tên hilgitin, û di dema vegera ji Karêzê, Qazî Mihemed gotarek bi zimanê Kurdî ji bo destxweşî û pêzanîn ji dewleta Sovyetê û eva ku Kurdan cuda ji wan tu piştevaneke din nine, pêşkêş kir. Qazî Mihemed bêy vê ku bas ji delweta Îranê bike, wî gotara xwe bi mehtkirina (pesna) Stalîn, û “her bijî dewleta Sovetê” bi dawî anî, û Kurdan jî bi çepik û hawara xwe, pêşwaziya gotara wî kirin. Em hemû digel zabitên Artêşa Sor, demjimêr 19:30`an ji rêya Karêzê ve vegeriyan, û demjimêr 22`an em gihîştin Urmiyê.

### (M) Kiryarên Qazî Mihemed û Seyîd Ebdullah

Qazî Mihemedê Mihabadî û Seyîd Ebdullah ku di destpêka vê raporê de bas ji kar û kiryarên wan hatiye kirin, herçend ku bi berçav bo aramkirina Kurdan û radestkirina darayiyên talankirî ên xelkê, çûbûne cem êlên Kurdên navçeya Soma-Biradost, û Kurdên Mirgewer, Tirgewer, Deşt û Kurdên Zerza ên Şino û Mameş, û

Kurdên din ên Mihabadê ku di van tevliheviyan de beşdar bûn, û tê gotin ku di vê derheqê de ketine nava zehmetiyan de jî, lê ew di bin de rênimayiya Kurdan dikin, û her axavtinek ku ji devê Kurdan derketibe, bi sedema kar û kiryarên wan e.

Ji malbata Îlxanîzade, kurê Elî Axa Emîr Es`ed fermandarê Mihabadê ku digel Seyîd Ebdullah ji Mihabadê hatiye, derheqê Seyîd Ebdullah pirs hatiye kirin, û navbirî gotiye ku di nava rê de Seyîd Ebdullah ji trombêlê peya bûye, û ew xelk dîtiye û bi serkirdeyên Kurd ên Soma-Biradost, û Herkiyên desteya Zêro Beg ku li Barandiz Çayê bûn, û qewl û soz dabûn ku jev belav bin gotibû, heya dema ku daxwaziyên xwe nesepînin venegerin.

2) Qazî Mihemed jî berê vê roja ku ji Tewrêzê ve ber bi Urmiyê rê dikeve, komeke rasiparde bo Kurdên Soma-Biradost û Kurdên Herkî bi vê naveroka serve şandiye, û piştre hatiye Urmiyê.

3) Qazî Mihemed li roja 19`ê Çileya Pêşîn ya îsal peyam ji Axa Buzurgiyê Îbrahîmî fermandarê wê demê yê Urmiyê û sergurd Kemalî re şandiye û gotiye, hekî ez îşev Kurdan nebînim, ewê hêrişî ser bajar bikin, lewma jî daxwaza trombêla şarevaniyê kiriye, lê bersiva wî hatiye dan ku trombêla şarevaniyê ji kar ketiye û eger jî Kurd hêrişê bikin, ewê bêne sizadan.

Herwiha ev nûçeya egera hêrişkirina ji aliyê kesên nêzî Qazî Mihemed û Seyîd Ebdullah ve, ku ji aliyê Mihemed Wisoqê rûniştiyê Urmiyê û herwiha ji aliyê hin kesên din ve hatiye belavkirin, vê yekê jî tirs û dilkutok di nava xelkê û hêzên emnî de çêkiriye, ku hekî çavdêriya hewce ji aliyê hêzên emnî û şarevaniyê ve nebûya, wê rewş aloz bibûya.

Ew gotara ku li gundê Karêzê bi amadebûna min, konsolê Sovyetê û zabitên Artêşa Sor bo 400 kes ji Kurdên Ewdoyî û Şikak derheq serxwebûna Kurdan û girêdayîbûna wan bi dewleta Sovyetê hatiye pêşkêşkirin.

Bi her hal, Qazî Mihemed û Seyîd Ebdulla, çi wekî alîgirê Sovyetê yan Îngilîz, yan bi ber çav xwe alîgirê dewleta Îranê jî bizanin, eva herduk jî hokarên sereke yên yekîtiya Kurdan in.

## *Hewlên Rûsan ji bo razîkirina Emerxan*

Rûsan berî hingê bi merema pêşxistina armancên xwe, biryar dane ku bi serokatiya Ce`ifer Pîşewerî li Tewrêzê komarekê damezrînin. Herwisa di payîza heman salê de xwestine îdareyeke otonom ji bo herêmên Rojhilatê Kurdistanê ku di kontrola Rûsan de bûn ava bikin, ku ew îdareya otonom girêdayî Tewrêzê be.

Rûs ji bo vê meremê li kesekî digeriyan, ku hêjayî vê berpirsatiyê be. Lewma di serî de Emerxan di hizra wan de bûye, û dizanîn ku ew kesatiyekî navdar, siyasî û xwedî pêgeheke cemawerî û bibandor e.

Lê neçûna Emerxan bi şanda Bakûyê re bala wan dikşîne, û ew vê kiryara Emerxan wekî hebûna arîşeyekê dizanin, û bi xwe re difikirin ku: “Qey Emerxan ji Rûsan piştrast nine!?”.

Lewma Rûs ji bo wergirtina bersiva vê pirsê, gava li civîna hevbeş a di navbera serokeşîrên Kurdan û berpirsên Azerbaycanê de li Urmiyê, ji Emerxan pirs kirine ku çima li ser daxwaza wan, ew neçûbû Bakûyê? Emerxan jî wisa dibersivîne:

“Bi van tecrube û nasîna ku min ji siyaseta Rûsan heye, nemaze di şerê yekem ê cîhanî de, ew helwest û reftara nebaş ya Rûsan ku digel Kurdan hebûnî, bûye sedem ku ez li hemberî siyaseta Rûsan gelekî hişyar bim. Wekî ez dibînim, hûn tenê dixwazin Kurdan wekî pirekê ji bo gihîştin bi armancên xwe bi kar bînin, û piştî hingê hûnê pişta me berdin. Bi van egeran min ew vexwendina we micid wernegirt”.

Bi vî rengî piştî vê ku Rûs ji nêrîna Emerxan haydar dibin, û dizanin ku Emerxan baş ji siyaseta wan fam dike, êdî bo wê mebesta ku hebûnî, ji Emerxan bê hêvî dibin û dest ji wî berdidin.

Piştre Rûs difikirin ku Seyîd Ebdullah Şemzînî bo vê mebesta xwe vexwînin. Seyîd Ebdullah Şemzînî newiyê Şêx Ubeydulahê Nehrî, û hevxebatê Simkoyê Şikak bû, û di nav xelkê Kurdistanê de jî kesayetiyekî naskirî û birûmet bû. Lê bi egera dijberiya Zêro Begê Herkî ku têkiliyên baş bi karbidestên herêmî ên Rûsan re hebû, ji Rûsan re dibêje; “Seyîd Ebdullah Şemzînî girêdayî Îngilîzan e”.

Li ser bingeha vê zanyarîpêdana Zêro Beg, Rûs dest ji Seyîd Taha jî dikêşin û paşê biryara xwe li ser Qazî Mihemed didin, û di encama çend hevdîtinan de bi Qazî Mihemed re li hev dikin.

**Belgeya hejmar: 62**

*(1942, bergê IV, rûpel 322)*

*Telegrama 1871/000/801 ji Wezîrê muxtarê Amerîkayê li Îranê (birêz Derîfûs) bo Wezareta Derve*

*Tehran, 12.05.1942`an, demjimêr 9:55`ê êvarê gihîşt*

151-“Konîholm” nîveroya 11`ê Gulanê rapor daye ku generalê hakim, Wezîrê Şer û karbidestên leşkerî ên Îranê û Sovyetê duh şev li Rizayiyê (Urmiyê) vegeriyane (Tehranê). Kurdan niha talankariyên xwe sekinandine, û 21 bazgehên têkel ên polîs (ku ji 20 leşkeran û zabitên Rûs û sê yan çar jandarmên Îranî pêk hatiye) li ser rêya di navbera Rizayiyê (Urmiyê) û Xoyê hatine danîn, da ku xelkê akinciyê herêmê biparêzin.

Sovyetî carê bi vê yekê razî bûne ku fewceke Îranê ji Tehranê bête şandin bo Rizayiyê (Urmiyê). Herwisa carê ti nîşanek ji bo pêdana îmtyazan (poanan) bi Kurdan ku gilî û gazindeyên wan di cihê xwe de nînin, di holê de nîne.

Hinek ji wan kelûpelên ku hatine talankirin, hatine şandin bo Îraqê.

**Belgeya hejmar: 63**

Ev belge sê rûpel in, tenê wêneyê duyan hatiye danîn, lê naverok bi temamî hatiye nivîsîn.

پیوست

شماره ۱۱
تاریخ ۲۱/۲/۲۱

وزارت کشور

استانداري استان چهارم

وزارت کشور

تلگراف شماره ۳ — ۲۰/۲/۱۳۲۱ البته ازلحاظ عالی گذشته وازجریان کاراجمالا استحضارحاصل فرموده اند پس ازحرکت تیمسارسرلشکروزیرجنگ که همه اهالی امید واربا ستقرارامنیت وارامش بودند یکمرتبه خبررسید سوارو پیاده اکراد ازمحلهائیکه رفته بودند مجددا برگشته ومانع عبورمروردرراه میباشند حتی ازیک سمت بدروازه شهرهم نزدیک شده یکعده ماموامنیه که برای حفاظت دربشت دیوارشهر ودروازه هاگذارده شده بود اکراد باانها شروع به تیراندازی نمودند بطوریکه صدای شلیک انها اهالی شهرراهراسان ووحشت زده نمود هنوزصدای تیرمی امد ویس کنسول باستانداری دعوت شد بعد گماندانی ویکنفرسرهنگ امد وضعیت رابیان کردم انها درخواست نمودند که ازروسای عشایربشهراحضار و ملاقات شود خود گماندان حاضرشد ورفت نوری بیك رئیس بیگزادگان و رشیدبیك رئیس هرکی رابنج ونیم بعدازظهرباستانداری اورد متعاقبا چند نفرافسرشوروی و ویس کنسول نیزرسیدند درحضور انهااین شرارت و تیراندازی مجددا اکراد سئوال شد اظهارکردند که ماده روزقبل پیشنهادی دادیم و درخواستهائی کردیم چون بماجوابی ندادند این بود که ماقوای خودمان رابطرف شهرسوق دادیم صورت پیشنهادات هشت گانه انها بضمیمه تقدیم میشود درضمن اظهارات دیگری که خیلی شبیه بهذیان بود بیان نمودند وجوابهای سخت ازبنده شنیدند وافسران شوروی رانیزوادارکردم بانها سخت گفتند فقط یک ماده ازبیشنهاد انهاکه امدن شهربطورازاد وبدون اسلحه باشد بنده بذیرفتم حضوراقول دادند که آدمهای خودراعقب کشیده ومزاحم نشوند امروزکه ۲۲ اردیبهشت است اگرچه دراطراف شهردیده نمیشوند وصدای تیراندازی هم قطع شده ولکین دردهات هنوزشرارت خودادامه میدهند امروزکه رئیس امنیه باچند نفرسربازشوروی رفته بودند محل یك سربازروسی راکه تیرتفنگ بپای او اصابت نموده بود باافسران ارتش ویك نفرازشهربانی رسیدگی نمایند که ازکدام ظرف تیرخورده ودرنتیجه معلوم شد تیرازطرف اکراد بوده ولی اقایان قبول نکرده اند.

عده اکرادرادیده بودند که درده خالی ازسکنه گندم که رعایادرچاه هابنهان کرده اند بیدا کرده گندم راحمل میکنند سربازان شوروی نیزبرای العین دیده بودند والساعه متظلمین باستانداری امده میگویند درراه گلمانخانه عده اکراد مزاحم عابرین هستند جلوعرابچی هاراگرفته اسبهای عرابه راباز کرده برده اند

وزارت کشور

استانداری استانچهارم

رونوشت پیشنهاد هشت گانه شماره تاریخ

۱ — اکراد در حمل اسلحه ازاد باشند .

۲ — یکهزارسیصد تفنگ که بدست دهاتی هابرای کشتن ماداده شده بمامورین شوروی تحویل دهند .

۳ — درشهرهای وابسته باکراد نماینده ازطرف اکراد در ادارات باشد .

٤ — دهات مرکور متعلق بسیدطه وسایراکراداست دولت بتصرف انهابدهد .

٥ — دهات صومای براد وست که در دست اکراد بود کمافی السابق بانها واگذارشود

٦ — اکراد مسلحا بشهرامد و رفت نمایند .

۷ — امنیه منحل باشد .

۸ — عده اکراد که زندانی هستند مرخص شوند .

رونوشت برابراصل است

Rêkevt: 26.02.1321 (16.05.1942)
Wezareta Navxwe
Parêzgariya parêzgeha Çarem

Helbet cenabê we ji vê babetê agehdar in, lê di pêvajoya cîbicîbûna wê de, hewce ye bi awayekî giştî hûn werin agehdarkirin. Piştî destbikarbûna tîmsarê Wezîrê Şer ku wî xelk bi awayekî giştî ji cihgirbûna asayişê hêvîdar kir, ji nişkêve xeber hat ku siwar û peyayên Kurd vegeriyane wan cihên ku berê çol kiribûn, û bûne sedema rêgiriya ji hatûçûnê, û ji aliyekî ve jî nêzî derwazeya bajar bûne. Yekîneyek ji wê hêza emnî ku bona parastinê li pişt dîwar û derwazeya bajar hatibû danîn, ji aliyê Kurdan ve teqe li wan hatiye kirin, û dengê teqekirina wan akinciyên bajar be`ecandine. Dema ku dengê teqeyê dihat, konsol bo parêzgehê hate vexwandin, û piştre (kumandan) û serhengek hatin, û min rewş bi wan ragehand. Wan daxwaz kir ku serokeşîrên bajar bêne vexwandin û hevdîtin digel wan bê kirin.

Piştre Kumandan bixwe jî li wir amade bû, û Nûrî Beg serokê Begzadeyan û herwiha Reşîd Begê serokê hoza Herkî jî li demjimêr 5:30 paşnîvro anîne nav avahiya parêzgehê. Piştre çend zabitên Sovyetê û konsol gihîştin. Bi amadebûna wan, ji nû ve ev fitnegerî û teqekirina Kurdan xistin ber bas. Kurdan gotin ku deh rojan berî niha me hinek pêşniyar û daxwazî digel we bas kiribûn, li ber vê ku we tu bersivek neda me, lewma me jî hêzên xwe ber bi nizîkatiya derwazeya bajar livandiye.

Kurdan gotin pêşniyarên me ku ji heşt xalan pêk tê, bi awayekî hevpêçkirî pêşkêşî we hatine kirin. Herwiha gelek axavtinên din jî kirin ku bê bingeh bûn, lewma min bersiva herî tund da wan. Herwiha min efserên Sovyetî jî naçar kirin ku bi tundî digel wan baxivin. Ji wan xalên ku xistin rû, min tenê yek xal qebûl kir, ew jî eva bû ku dikarin bi azadî û bê çek bêne nava bajar. Wan jî li wir soz dan ku hêzên xwe vekişînin, û kêşeyan bo nava bajar çênekin. Îro ku 22`ê Banemerê ye, herçend ku li derdora bajar nahên dîtin, û dengê teqeya wan nemaye, lê hêşta di gundan de li ser çêkirina şer

û aloziyan berdewam in.

Îro berpirsê emnî digel çend serbazên Sovyetê çûbûne herêmê. Derheq serbazeke Rûsî ku fîşekek li lingê wî ketibû, digel zabitên erteşê û kesek ji şarevaniyê, bona ku bizanin ji kuderê ve fîşek hatiye û lê ketiye, lêkolîn kirin. Di encam de derket ku ew fîşek ji aliyê Kurdan ve hatiye û lê ketiye, lê Kurdan haşa ji vê rastiyê kirin.

Hejmarek kesan di gundekî çolkirî de, Kurd dîtibûn ku mijûlî talankirina wan geniman bûne, ku ji aliyê xelkê ve di nav çalan de hatibûn veşartin. Serbazên Sovyetê jî bi çavên xwe ew yek dîtibûn. Niha xelkê stemlêkirî hatine parêzgehê, û dibêjin ku li ser rêya Golmexanê, hejmareke Kurdan rêya xelkê û ajotvanên trombêlan girtine, û piştre hesab ji erebeyan (daşqeyan) berdane û digel xwe birine.

Bi vî awayî ew li cihên curbicur mijûl in, û ez bi eşkere we agehdar dikim ku ew pêngavên ku hatine hilgirtin, yan jî ji aliyê parêzgariyê ve têne hilgirtin, bi giştî hewlên bê encam in, û hekî bo heyama du demjimêran jî aramî hebe, wê cardin nearamî vegere, lewma divêt bilez çareseriyek bihête dîtin.

Xelkê bêçare ê Rizayiyê (Urmiyê) çi tawanek kirine ku 280 gundên wan hatine talankirin, heta derî û pencere û dar û textê xîmê avahiyan jî derxistine û birine. Niha min cardin derheqê ajawe û fitneyên nû ên Kurdan nameyek bo konsolxaneyê nivîsandiye, da ku di nava parêzgehê de civîneke çend alî bi beşdariya serkirdeyên leşkerî ên Artêşa Sor û konsol pêk bînin, ku di warê danîna bazgehên emnî ku pêşwext di navbera tîmsarê Wezîrê Şer û karbidestên payebilind ên Artêşa Sor lihevkirinek li ser hatiye kirin gotûbêjan bikin, û bona dabînkirina ewlehiya vî sînorî fermanê bidin Kurdan, da ku dest ji têkderî û talançîtiyê hilgirin, û bila re`iyet vegerin ser cihê xwe, û hekî wisa nebe, û heya sê-çar rojên din çandiniya xwe (hasila xwe) av nedin, wê berhemên wan hişk bin, û di encam de wê birçîtî û qatûqirî hemû herêmê lixwe bigre, û ev yek wê zirara wê ji Artêşa Sor û xelkê belengaz ê vê şaristanê re jî hebe.

Rûnivîsa pêşniyarên heşt xalî ên Kurdan:

1-Kurd di çekhilgirtinê de azad bin.

2-Ew 1300 çekên ku (ji aliyê Îraniyan ve) bi armanca kuştina me, bi gundên (Azeriyan) hatibûn dan, radestî karbidestên Sovyetî werin kirin.

3-Di bajarên girêdayî Kurdan, nûner ji aliyê Kurdan ve di demûdezgehên îdarî de werin danîn.

4-Gundên Mirgewer ser bi Seyîd Taha û Kurdên din in, û dibe dewlet bide wan.

5-Gundên Soma-Biradost ku di destên Kurdan de bûn, herwek derbazbûyî radestî wan bêne kirin.

6-Kurd bi çekên xwe ve hatûçûna bajar bikin.

7-Hêza Emniye bê hilweşandin.

8-Kurdên girtî bêne berdan.

## Belgeya hejmar: 64

وزارت کشور
اداره کل شهربانی

صانیه

رونوشت گزارش شهربانی ر مورخه ۸/ ۳/ ۲۱ شماره ۱۸۴

X

شهربانی کل ـ تعقیب ۱۸۱ بطوریکه روزگذشته بعرض رسیده ، قریب شصت نفر
ازاکراد شکاك وعبدوی واکراد هرکی وبیگزاده محال ثلاث بشهرواردبامقامات
مربوطه ارتش سرخ وکنسول شوروی ملاقات وبرحسب دعوت کنسول شوروی در
ساعت ۱۸ امروز جناب استاندار بکماندانی ارتش سرخ رفته با حضور کنسول شوروی
وافسران عالی رتبه ارتش سرخ از روسای اکراد شکاك وهرکی وحتی عمرخان بخشداری
صومای برادوست که با اشرار همدست بود ملاقات وروسای اکراد اطمینان و ـ
تامین خواسته اند جناب استاندار هم قبول وتامین داده وضمنا بعمرخان دستور
داده اند که برای تامین راه شاهپور ورضائیه درموقع عبور نیروی اعزامی درراه
باشد بهرحال روسای اکراد با سواران وکسان خود که از دو روز قبل برضائیه آمده
ودرحدود یکصد وپنجاه نفر میباشند فعلا درشهر متوقف وقریب دویست نفر از

X

سواران آنها نیز در اطراف شهر متوقف شده اند وروسها اجازه نداده اند که همه
آنها بشهر بیایند چون اهالی از ورود مسلحانه آنها مضطرب بودند تبلیغات
لازم اقدامات احتیاطی نیز بعمل آمده انتظامات از هر حیث برقرار است وضعیات
اکراد وسیله شهربانی خوی بفرمانده نیروی اعزامی رمزا آگهی داده شد ث
پاسیار ۱ جلیلوند ۰

رونوشت با اصل یکسان است۰

Wezareta Navxwe
Birêveberiya Giştî a Şarevaniyê
Rûnivîsa rapora şarevaniya Urmiyê
08.03.1321
(29.05.1942)

Şarevaniya giştî-hevpêça (181) bi awayekî ku duh me bi we ragehand, nêzî 60 kes ji Kurdên Şikak, Ewdoyî, Herkî û Begzade li herêma "Selmas"ê hatine nav bajar, û digel berpirsên pêwendîdar ên Arteşa Sor û konsolxaneya Sovyetê hevdîtin hebûne. Ligor bangewaza Sovyetê, demjimêr 18`ê îro cenabê parêzgar (...) Artêşa Sor çûye wir, û bi amadebûna konsolê Sovyetê û zabitên payebilind ên Artêşa Sor hevdîtinek digel serkirdeyên Şikak û Herkî, û bixasmanî Emerxan serokê herêmê, ku digel têkderan hevdest bûn pêk anî. Di vê hevdîtinê de serkirdeyên Kurd daxwaza xatircembûn û parastîbûnê kirine, û cenabê parêzgar jî ew daxwaza qebûl kiriye, û ferman daye Emerxan ku bona parêzgarîkirina ji rêya Şapûr-Urmiyê li dema derbazbûna hêza şandî li wir amade bin.

Serkirdeyên Kurd digel siwarên xwe û hevalên xwe ku ji du roj berî niha ve hatine Urmiyê, û nêzî 150 kesî dibin, hêşta di nava bajar de hatine ragirtin, û nêzî 200 kes ji siwaran jî li derdora bajar hatine ragirtin. Rûsan rê nedaye ku hemû bi yekcarî bêne nav bajar, jiber ku akincî ji hatina wan bi çek ve nîgeran bûn. Di warê ragehandin û berçavgirtina tedbîrên hewce ên ewlekariyê jî, hemû pêngavek hatiye hilgirtin, û rewş bi tewahî cihgir e. Derheqê rewşa Kurdan zanyariyên biremz ji aliyê şarevaniya Xoyê ve bo fermande hatin şandin.

Pasyar 1 Celîlwend wêneyê rûnivîs digel deqa çavkaniyê hevber e

**Belgeya hejmar: 65**

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

رونوشت گزارش شهربانی رضائیه مورخه ۹/۳/۲۱ شماره ۱۹۱

X شهربانی کل ـ تعقیب ۱۸۴ روسای اکراد که برضائیه آمده بودند تا امروز صبح
تدریجا از رضائیه خارج عده قلیلی از آنها در شهربانی میباشند بغیر از ملاقاتیکه
جناب استاندار در کماندانی ارتش سرخ روز هفتم ماجاری از آنها نمود نسبت
باعمال گذشته آنها عفو و تامین داده اند و روسای اکراد بهیچوجه به ادارات
دولتی وحتی استانداری نرفته مرتبا در کماندانی ارتش سرخ و اداره سیاسی
نظامی ارتش سرخ و کنسولگری شوروی با آنها ملاقات داشته و بهیچوجه راجع
به استرداد اموال غارتی اساسا مذاکراتی نشد و اقدامی هم بعمل نیامده است
و نیز راجع به استرداد اتومبیل امنیه که نزد اکراد میباشد و اسلحه که از آنها
گرفته اند هیچگونه مذاکراتی بعمل نیامده و نیز رفتن جناب استاندار بکماندانی
X ونیامدن روسای اکراد به ادارات دولتی در افکار عمومی وجهه نامطلوبی ایجاد
کرده و اکراد هم در این دو روزه در شهر بخرید اسلحه در شهرمبادرت فروشندگان
را تحت تعقیب قرار داده و از خرید و فروش اسلحه شهربانی جلوگیری نموده ـ
پاسیار ا ـ جلیلوند .

رونوشت با اصل یکسان است.

Wezareta Navxwe
Birêveberiya giştî ya şarevaniyê
Rûnivîsa rapora şarevaniya Urmiyê,
rêkevt: 09.03.1321 (30.05.1942)

Şarevaniya giştî-Peyreva nameya 184, ew serokên Kurd ku hatibûne Urmiyê, sibezûya îro hêdî-hêdî ji bajar derketin, û hejmareke kêm ji wan di nava şarevaniyê de ne. Cuda ji vê hevdîtina ku cenabê parêzgar û serfermandehiya Artêşa Sor li roja heftê vê mehê digel wan encam dan, derheqê kiryarên derbazbûyî de emanname bi wan hate dan, û hatin bexşîn, û serokên Kurd bi tu awayî neçûne organên dewletî, û heta parêzgehan jî. Ji aliyê serfermandehiya Artêşa Sor û birêveberiya siyasî-leşkerî a Artêşa Sor û konsolê Sovyetê, bi berdewamî digel wan de hevdîtin hebûne. Lê her di bingeh de tu cure danûstandinek derheqê radestkirina malên talankirî de nehatine kirin, û tu pêngavek jî di vî warî de nehatiye hilgirtin. Herwiha derheqê radestkirina trombêlên hêzên emnî ku di destên Kurdan de ne, û ew çekên ku ji wan hatine wergirtin, tu danûstandinek nehatiye encamdan. Çûna cenabê parêzgar bo serfermandehiya Artêşa Sor û nehatina serokên Kurd bo organên dewletî, bandoreke nebaş li ser raya giştî daniye. Herwiha Kurdan jî li van du rojan di bajar de dest kirine bi kirîna çek û teqemeniyan û firoşyar jî xistine bin çavdêriyê de, û pêşiya kirîn û firotina çekên şarevaniyê jî girtine.

Pasyar 1 Celîlwend

**Belgeya hejmar: 66**

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

رونوشت گزارش شهربانی رضائیه مورخه ۲۰/ ۳/ ۲۱ شماره ۲۰۵

X شهربانی کل – ازیکماه قبل اکراد جلالی ماکوکه به غارت دهات اشتغال داشته‌اند
اخیراغارت گری خود را شدت داده واکراد جلالی هم که در دهات شاهپورساکن
ودرغائله اخیرباکراد شاهپوردرغارت دهات خوی وشاهپورشرکت داشته‌اند
بطرف ماکوحرکت کرده اندکه باکراد جلالی ملحق شوند وبطوریکه اطلاع حاصل
شده است مامورین ارتش سرخ علاوه برحمایتی که ازاکراد جلالی وسایراکراد ماکو
می‌نمایندعده ازاکراد را هم که در بازداشت امنیه وشهربانی ماکوبوده اندمرخص
وحتی بمامورین امنیه قدغن هم نموده اندکه نباید بطرف اکراد تیراندازی شود –
X باسوابقی که بنده باکراد جلالی ماکوداریم وازروحیات آنهامطلعم هرگاه اقدام
موثری به ویژه جلوگیری ازشرارت اکراد جلالی بزودی نشود ممکن است عده از
اکراد جلالی وسایراکراد آنهائیکه درسنوات اخیربه ترکیه مهاجرت نموده اند
باآنهاملحق شده غارت گری رانه تنها درماکوادامه خواهند داد ممکن است
بخاک ترکیه ویا شوروی هم تجاوزنموده زحمات زیادی برای دولت فراهم نمایند
چنانچه ازسال ۱۳۰۷ تا سال ۱۳۱۱ انیروی لشگرشمال غرب برای دفاع وجلوگیری

x

وزارت کشور
اداره کل شهربانی

رونوشت ۲ مورخه شماره

ازشرارت ودفع آنها اقدام وعده زیادی افسروافراد برای رفع غائله آنها شهید گردیدند و بعلاوه شرارت اکراد جلالی منجربه تیرگی روابط دولت ترکیه با ایران گردید که بااقدامات مرتفع شد بنا براین تااکراد نامبرده اقتدار سابق را بدست نیاورده اند باید ازآنها جلوگیری نمود — پاسیار ۱ جلیلوند ·

Wezareta Navxwe-Birêveberiya Giştî a Şarevaniyê
Rêkevt: (10.06.1942) – 20.03.1321
Hejmar 205, şarevaniya giştî

Ji mehekê berî niha ve Kurdên Celalî yên Makûyê ku mijûlî talankirina gundan bûn, di van dawiyane de talankariyên xwe zêdetir kirine. Herwisa Kurdên Celalî ên ku li gundên Şapûrê (Selmasê) akincî bûn û ew jî di ajawe û fitneya van dawiyane de, ku digel Kurdên Şapûrê (Selmasê) li talankirina gundên Xoy û Şapûrê (Selmasê) de beşdar bûn ber bi Makûyê meşiyane, da ku ew jî tevlî Kurdên Celaliyên wir bibin.

Ligor wan zanyariyên ku gihîştne destên me, hêzên Artêşa Sor ji bilî piştevanîkirina wan ji Kurdên Celalî û Kurdên din ên Makûyê, hejmarek ji wan Kurdan jî azad kirine, ku ji aliyê emniye û şarevaniyê ve hatibûn destbiserkirin. Herwisa Rûsan rê nedane ku hêzên emniye Kurdan bidin ber gulleyan.

Li gor wê ezmûn û derbazbûyiya ku min digel Kurdên Celalî ên Makûyê heye, û agehdarî edet û tîtalên wan im, hekî em bilez karekî pêdivî ji bo pêşgirtin ji xweşkirina şer û aloziyê ji aliyê Kurdên Celalî ve nekin, renge hejmarek ji Kurdên Celalî û Kurdên din yên ku di salên bihorî de ber bi Tirkiyê koç kirine, tevlî wan bibin, û hingê ne tenê li Makûyê wê talankariyên xwe bidomînin, belkî îhtîmal heye ku destdirêjiyê bikin ser xaka Tirkiyê yan Sovyetê jî, û hingê wê gelek kêşeyan bo hikûmetê saz bikin. Her wek ku di sala (1928) heya (1932)`an de ku hêza leşkerî a bakûrê rojava bona bergirî û pêşgirtin ji aloziyê û paşekêşekirina wan çalakî kirin, û hejmareke zêde ji zabit û leşkerên din ên hikûmetê bona bidawîanîna bi vê fitneyê hatin kuştin, û cuda ji vê yekê jî fitneya Kurdên Celalî bû sedema alozbûna pêwendiyên hikûmeta Tirkiyê digel Îranê, ku piştre bi karê hewce hate çareserkirin. Lewra heya ku Kurdên îşarepêkirî hêza xwe ya rabihorî bi dest neanîne, divêt pêşiya wan were girtin.

Pasyar 1 Celîlwend

## Belgeya hejmar: 67

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

رونوشت گزارش شهربانی رضائیه مورخه ۲۱/۳/۲۳ شماره ۲۱۱

شهربانی کل – ۷۲۷۳–۲۱/۳/۲۱ – درمورد اشخاصیکه تحصیل اسلحه –
نموده اند نتیجه مطالعه وبازجوئی را بشرح زیرمعروض میدارد .
۱– پس ازوقوع حوادث شهریورماه گذشته اسلحه هائیکه دردست افراد –
لشگرهای ۳و ۴ شمالغرب بود موفرارا بخانه های خود برده اند درمیان اهالی
بویژه اکراد گرم سیریان خرید وفروش می شده است ۲– پاره ازپادگانهای
کوچك که درمرزها بوده اند ازطرف اکراد درموقع ورود نیروی شوروی بایران خلع
سلاح وپادگانهارا معدوم وپس ازخلع سلاح مرخص کرده اند ۳– بواسطه باز
بودن مرزهای عراق اکراد واثوریها ازحدود موصل وروانداوزتا حدیکه توانسته اند
آشکارا ومخفیانه اسلحه خریداری نموده اند – ٤– پس ازوقوع حوادث شهریور
ماه گذشته عده ازروسای اکراد بخاك شوروی برای سیاحت رفته بودند در –
مراجعت بانها کمك هائی ازحیث اسلحه شده وتااین تاریخ هم برای تقویت –
تسلیحات کمك وحمایت میشود ودرمورد جمع آوری اسلحه هائیکه درشهرموجود
است اسلحه رادرشهرمقتضی ندانسته اند وبه عقیده بنده هم فعلا مقتضی نیست
زیرا اولا قسمت عمده ساکنین شهرعجم که مطیع دولت بوده وتقریبا یك ربع ساکنین
شهرمسیحیان آثوری وارمنی کلیمی بوده چون به ارتش سرخ تظاهرات دولتی
نشان داده وخود راطرفدار وجانب دارآنها جلوه داده اند ازآنها حمایت و
جانب داری وطبعا درموقع جمع آوری اسلحه ازشهرا سلحه عجم ها جمع آوری

وزارت کشور

اداره کل شهربانی

رونوشت ۲ مورخه شماره

واسلحه آثوریها بوسایل مختلفه مخفی وبابدهات خارج شهرکه آثوری نشینی هستند انتقال داده وبدون ترتیب اسلحه آنها حفظ وعجم ها خلع سلاح — خواهند گردید از طرفی هم عکس العمل جمع آوری اسلحه درشهرد رمیان اکراد منعکس واین موضوع رانیز دست آویز قرار داده وبشرارت خود ادامه خواهند داد — پاسیار ۱ جلیلوند ٠

Wezareta Navxwe
Birêveberiya giştî ya şarevaniyê
Rûnivîsa raporta şarevaniya Urmiyê
Rêkevt: 23.03.1321 (13.06.1942)

Şarevaniya giştî-7273- 21.03.1321-an, encama şopandin û lêkolînên derheq wan kesên ku çek bi dest xistine, bi vî awayî em ji we re radigehînin:

Piştî bûyerên meha Xermanana bihorî, ew çekên ku di destên endamê leşkerên sê û çar ên Bakûra Rojava de bûn, kesên reviyayî ew çek birine malên xwe, û di nav xelkê û bi taybetî Kurdên akinciyê Germiyanê de kirîn û firotin bi wan çekan hatiye kirin.

-Hinek ji wan serbazgehên biçûk ku li ser sînor bûn, di dema hatina hêzên Sovyetê bo nav Îranê, ji aliyê Kurdan ve çekên wan hatine ramalîn, û binkeyên leşkerî hatine tunekirin, û serbazên çekkirî jî hatine berdan.

3)-Bi sedema vekirîbûna sînorên Îraqê, Kurd û Aşûrî li ser sînorê Mûsil û Rewanduzê, hindî ku karîne bi eşkere û bi dizî ve çek kirîne.

4)-Piştî bûyerên meha Xermanan bihorî, beşek ji serokên Kurd ku bona seferê çûbûne Sovyetê, li wir di warê çek û teqemeniyan de alîkariya wan hatiye kirin, û heya niha jî bona vê ku bihêz bin, di warê çek û teqemeniyan de hevakariya wan tê kirin.

Derheq komkirina wan çekên ku di nav bajaran de ne, bi baweriya min jî niha komkirina çekan di nav bajar de hewce nine. Jiber ku:

- Yekem: Piraniya akinciyên bajar Ecemên ser bi dewletê ne, û nêzî yek ji çarê ya akinciyên bajar jî Mesîhî, Aşûrî, Ermenî û Kelîmî ne, bi sedema vê ku wan li cem Artêşa Sor xwenîşandan li dijî dewletê organîze kirine, û xwe wekî alîgirê wan nîşan dane, piştgiriya wan tê kirin, û bi vî awayî di dema komkirina çekên Eceman di nav bajar de çekên Aşûriyan jî ji rêyên curbicur ve têne veşartin, yan jî têne veguhastin bo gundên Aşûrînişîn ên dervey bajar, û bi vî rengî çekên wan têne parastin, û Ecem jî bêçek dimînin.

-Duyem: Karvedana komkirina çekan li nava bajar di nava Kurdan de deng vedide, û ew mijar jî dibe hêcetek da ku ew jî bona domandina şerxwaziyên xwe bi kar bînin.

-Pasyarî 1 Celîlwend

## *Emerxan û Komeleya Jiyanewey Kurd (J-K)*

Li sala 1941`an piştî hatina hêzên hevalbend ên şerê duyem ê cîhanî bo Îranê, û ji kar dûrxistina Riza Şah û herwisa lawaziya deshilata sava ya Mihemed Riza Şahê kurê wî di Îranê de, derfetek ji bo azadiyê li herêmên naverasta Rojhilatê Kurdistanê hatibû pêş.

Ligor kavdana wê demê li 16.08.1942`an li Mihabadê (J-K) ji aliyê 11 kesên rewşenbîr û welatperwer ve hatiye avakirin, û çalakî û civînên veşartî lidar xistine, ku navê wan wiha ye:

-Mihemed Nanewazade

-Rehman Zebîhî

-Husên Firûher

-Ebdulrehman Îmamî

-Qasim Qadirî

-Mela Ebdullah Dawûdî

-Mihemed Yahû

-Mela Qadir Muderisî

-Sidîq Hêyderî

-Ebdulrehman Kiyanî

-Serwan Mîrhac (efserê Kurd ê Başûrê Kurdistanê)

Emerxan jî bi têkiliya ku tevî kesên mîna Ebdulrehman Zebîhî û hin ji serkirdeyên (J-K) hebûye, beşdarî gelek civînên (J-K) dibû. Herwisa kurê xwe yê bi navê Necîb, tevî mamosteyê olî yê gundê xwe ku navê wî Mela Şerafedîn bû şandin Mihabadê, û bi hemû hêza xwe ve piştgiriya wê bizava netewî dikir.

Herwisa ji rêya Emerxan û Qotaz Mamedî ve serokeşîrên Şikak û Herkiyan komîte û şaxên rêkxistina (J-K) ê di herêmên Selmas û Urmiyê de damezrandin.

Meramnameya (J-K) ji van çar xalên bingehîn pêk hatibû:

Xebat li dijî netifaqî û çend desteyî û bêganeperistiya di nav civaka Kurd de.

Rizgariya netewa Kurd ji zincîra koletî û bindestiyê.

Têkoşîna ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe, ku herêmên Kurdakincî ên Îran, Îraq, Tirkiyê û Sûriyê li xwe bigre.

Devberdana ji xebata çekdarî, û pêdagirîkirin li ser xebata medenî û pêkanîna civaka medenî di nav Kurdan de.

Ji bo van armancan Emerxan ji tewahiya êlên Şikakan xwestiye, ku hevsozî û wefadariya xwe bi (J-K) re rabigehînin û pê re bixebitin.

Bi vî rengî di herêmên Şikakan de xelk bi rêya Mela Şerafedîn û herwisa Qazî Ewdilwehab, ku ji Mihabadê çûbû gundê Hacîcefanê bal Qotaz Mamdedî, sonda wefadariyê bo (J-K) dixwin, û dibin endamê vê saziya netewî. Diyare bo wergirtina her endamekê, hewce bû ew kes ji aliyê sê kesên din ve hatiba piştgirîkirin, û paşê sond xwariba.

Ew sond bi vî awayî bûn:

Xiyanetê li miletê Kurd neke.

Ji bo serxwebûna Kurdistanê xebatê bike.

Esrar û nihêniyên (J-K) çi yên nivîskî an jî yên devkî biparêze.

Heta daviya emrê xwe wekî endamê (J-K) bimîne.

Tewahiya jin û mêrên Kurd wek xûşk û birayên xwe bizane.

Nabe bêy îzna (J-K) bibe endamê ti sazî û rêxistinek din.

Bi vî awayî li Urmiyê jî Zêro Begê Herkî, Nûrî Begê Begzade û ...hwd, tevlî kar û xebatên vê Komeleyê dibin. Kar û xebatên (J-K) heta sala 1945`an bi hesteke netewî ya xurt hatiye domandin, û bi hezaran welatperwerî, li gelek herêmên Rojhilatê Kurdistanê di nav (J-K) de birêkxistin dibin.

Herwisa (J-K) bi hebûna çalakî û pêwendiyên xwe digel Hizba Hîwa ya li Başûrê Kurdistanê û herwisa pêywendiya wê ya bi Xoybûn û welatperwerên Bakurê Kurdistanê re, karîbû bala karbidestên Sovyetê û hestyariya dezgehên hevalgirî yên Îranî û biyanî bo aliyê xwe rabikêşe.

Balkêş e ku di vê derbarê de serkonsolê Rûs yê li Makûyê, di raporeke xwe de bo Wezareta Derve a Rûsiyê wiha nivîsiye:

“Dema ku Emerxan ji bo damezrandina şaxên (J-K) nûnerên

xwe bo Makû û derdora wê dişandin, gelek caran daxwaz ji Sovyetê dikir ku piştgiriya Kurdan bo serxwebûnê bikin. Lê me jî bi rêya sefîrê Sovyetê li Tehranê û ...hwd ji Kurdan re digot; "Mijara serxwebûna Kurdistanê, digel rewşa niha hev nagire, û nabe ew daxwaz pêşwext ji me bihête kirin.

Herwisa me ew şîret dikirin, ku bila Kurd bi rêya saziyên demokratîk yên Îranê kar bikin, û bi vî awayî mafên xwe yên demokratîk bi dest bixin. Piştî vê agehdarkirinê, me nehêşt Emerxan di çalakiyên birêkxistinkirina şaxên (J-K) di van herêman de, serkeve".

## Belgeya hejmar: 68

اداره ..................

رونوشت گزارش رضائیه وزارت پست و تلگراف و تلفن

شماره ۷۹ تاریخ ۲۱/۷/۲۱ وزارت / اداره / شرکت ................ که اصل آن بشماره .................. ثبت شده

وزارت ـ عین گزارش ۱۶ و ۱۷ مهاباد که امروز رسیده مخابره میشود ٠

نصری ۷۹ / ۲۱/۷/۲۱

چند روز است عمرشکاک که بوسیله زرونام مشغول اخطار بکلیه عشایر اطراف مهاباد و میاندوآب و بوکان بوده اخیراً روسای عشایر کردستان واستان ٤ درمهاباد جمع شده اند و در شهر نیز شبها مجلس محرمانه دایر میشود ٠ ازقرار اطلاع حاصله جهت اخراج عده از شهر میباشد که بعد از رفتن عمرشکاک شعلی خواهند نمود ٠

۲ ـ در ساعت ۱۵/ ۷/ ۲۱ عمرخان با همراهان بطرف رضائیه حرکت ظاهراً چنین شایع است بمنکورها ابلاغ نموده است که باید ازمهاباد بیرون روند وقاضی محمد را بحکومت مهاباد بشناسند ولی منکورها هم قبول نکردند واهالی هم تصمیم دارند منکورها را ازشهر خارج نمایند ٠

حشمت

رونوشت با اصل یکی است

شمارهٔ این سند در آرشیو سازمان اسناد ملی ایران ۱۴۹۰-۱۵-۱۱۶۰۰۷ می‌باشد.

نمونه ۲

Wezareta poste û telegrafê/ rûnivîsa raporta Urmiyê

Hejmar: 79, rêkevta: 13.10.1942

Wezaret- deqa raporta 16 û 17 a Mihabadê ku îro gihîştiye, wek xwe tê şandin.

1- Çend rojek e Emerxanê Şikak bi rêya kesekî bi navê Zêro, mijûlî oltîmatom û hişdarîdan bi tewahiya êlên derdora Mihabad, Miyanduaw û Bokanê ye. Ew di wan dawiyane de, digel serokêşîrên Kurdistanê û parêzgeha 4 li Mihabadê civiyane, û li nav bajar jî di dema şevê de, bi awayekî nepenî civînên wan tên lidarxistin. Wekî me zaniye, bi merema derxistina hejmarek kesan ji bajar, wê piştî çûna Emerxan, ew biryar were dayîn.

2- Li rêkevta 15.07.1942`an Emerxan û hevalên wî ber bi Urmiyê rê ketin, û dengoya wê hat belavkirin ku wî bi êla Mengur ragehandiye ku divêt ji Mihabadê derkevin, û Qazî Mihemed wekî hikumdarê Mihabadê qebûl bikin. Lê Mengur bi vê yekê razî nebûne û xelkê bajar jî dixwazin Mengur ji bajar derkevin.

Hişmet

**Belgeya hejmar: 69**

۹/۳۰

شماره ............ تاریخ ............ ۱۳۲ پیوست ............

وزارت کشور

ژاندارمری

امنیه کل کشور

اداره ............ دایره ............

محرمانه = فوری = مستقیم

وزارت کشور ۲۱۷۵۵

محترماً معروض میدارد طبق گزارش ناحیه ۲/ ژاندارمری آذربایجان
در ۱۹/۹/۳۱ سه نفر افسر روس بملاقات عمرخان شکاک رفته پس
از مذاکره با نامبرده عمرخان نیز به قوتاش که آنهم رئیس
یکی از طوایف است پیغام داده که روسها با و تکلیف اغتشاش و
نا امنی نموده‌اند دستور داده شد با سیاست محلی عمرخان را در
دست نگهداشته و مانع از سوء عملیات آنان بشوند .

رئیس ژاندارمری کل کشور = سرلشکر آق اولی

Wezareta Navxwe

02.10.1321

23.12.1942

Nihênî, Bilez û rasterast

Em bi rêz ve radigehînin ku ligor rapora herêma 2 ya jandirmiriya Azerbaycanê li rêkevt 19.09.1321`an sê zabitên Rûs çûne serdana Emerxanê Şikak û piştî danûstandina digel navbirî, Emerxan peyam ji Qotaz re şand ku ew jî serokê yek ji êlan e, û ew haydar kir ku Rûsan daxwaz jê kirine da ku ewlehiyê têk bide.

`Emir hate kirin ku em siyaseta herêmî a Emerxan di destên xwe de ragirin, û rê nedin xirabkarî werin kirin.

Serokê jandirmiriya giştî a welat-serleşker Aq Ula

**Belgeya hejmar: 70**

وزارت داخله

اداره کل شهربانی

سواد نامه اداره ژاندارمری کل کشور مورخه ۲۱/۱۰/۱۰ نمره ۱۷۰۹۴/ج ۱

محرمانه فوری

ریاست اداره کل شهربانی

از تبریز اطلاع میدهند احسان نوری که از افسران سابق ترکیه ودر تهران تحت نظر بوده گویا بطورناشناس از تهران خارج و به آذربایجان آمده باعمرخان ملاقات و همچنین برای ملاقات شیخ عبدالقادر چعالی بطرف ماکو رفته است خواهشمند است دستورفرمایند تحقیق و تعیین نمایند خروج شخص نامبرده از تهران صحت دارد یاخیر و چون نامبرده درمیان اکراد تولید انقلاب و اغتشاش خواهد کرد تصمیمات مقتضی نسبت به نگهداری او در تهران اتخاذ شود. رئیس ژاندارمری کل کشور. سرلشگرآق اولی محل امضا.

رو نوشت برابراصل است

سازمان اسناد و کتابخانه ملی ایران
IRAN NATIONAL ARCHIVES

Wezareta Navxwe
Îdareya Giştî a Şarevaniyê

...nameya Îdareya Jandirmiriya Giştî a Welat
10.10.1321
Hejmar 17094/ C 1


Serokatiya giştî a şarevaniyê

Ji Tewrêzê ve zanyarî şandine ku Îhsan Nûrî ku ji efserên pêşîn ê Tirkiyê ye, û li Tehranê li jêr çavdêriyê de bûye, wek dibêjin bi awayekî ku nehê naskirin ji Tehranê derketiye û hatiye Azerbaycanê, û digel Emerxan hevdîtin hebûye, û herweha bo dîtina Şêx Ebdulqadirê Celalî ber bi Makûyê ve çûye. Kerema xwe fermanê bidin ku lêkolîn bihê kirin û diyar bikin ku gelo derketina wî ji Tehranê rast e yan na.

Li ber vê ku navbirî di nava Kurdan de şoreş û fitnê çêdike, divêt biryara hewce bo ragirtina wî li Tehranê bihê dan.

Serokê jandirmiriya giştî a welat-Serleşker Aqawelî

## Belgeya hejmar: 71



اداره: دفترمحرمانه
شماره: ۳۴۵۹
تاریخ: ۲۱/۱۲/۶
پیوست:

وزارت امورخارجه

محرمانه

خیلی فوری

جناب آقــای نخست وزیر

بقراریکه سفیرکبیر ترکیه اظهارمیدارند احسان نوری کرد که سابقا در نیروی ترک سمت افسری داشته و بعدا بایران آمده در سنین ۱۱۲۸ ــ ۱۱۲۷ موجب انقلابات اغری داغ گردیده و ازطرف دولت شاهنشاهی در ساوه تحت نظر بوده است اخیرا آزادگردیده ــ بآذربایجان رفته و در یکی دو هفته پیش در تبریز دیده شده است و بطوریکه اطــــلاع پیدا کرده اند نامبرده با عبدالقادر رئیس طایفهٔ جلالی وعمرخان رئیس ایل شکاک مــلاقات و مذاکراتی بعمل آورده است و سفیرکبیر اضافه مینمود که چون ممکن است این شخص مــانند گذشته زحمات و مشکلاتی در مرز ایجاد نماید علیهذا تقاضا داشت تا فرصت فوت نشــــده دستور داده شود که از نامبرده جلوگیری بعمل آید .

با عرض مراتب بالا مستدعی است قدغن فرمایند که بفوریت اوامر لازمه صادر گردد کــــه نامبرده را از نقاط مرزی و ایالت آذربایجان دور و در نقاط دور دست اسکان داده و بهر نوع که مقتضی باشد تحت مراقبت قرارداده شود که مبادا بواسطهٔ بودن در آذربایجان و داشتن نفوذ و روابط محلی اتفاقات و گرفتاریهائی فراهم نماید که درآتیه موجب زحمت شود استدعا دارد مقرر فرمایند از دستور صادره و نتیجهٔ حاصله وزارت امورخارجه رامستحضر فرمایند که بسفارتکبرای ترکیه پاسخ لازمه داده شود .

وزیرامورخارجه

IRAN NATIONAL ARCHIVES

۳۷۲۸۸

Îdare: Ofîsa nihênî
Hejmar: 3459
Dîrok: 06.12.1321

Wezareta Karûbarê Derve
Gelek nihênî/bilez
Rêzdar cenabê serokwezîr

Herwek ku balyozê Tirkiyê bas dike, Îhsan Nûrî ê Kurd ku berê di nava hêzên Tirk de pileya efseriyê hebûye, û piştre hatiye Îranê, û li salên 1927-1928`an bûye sedema serhildana şoreşa Agirî Daxê, û ji aliyê dewleta Şahenşahî ve li Sawe di bin çavdêriyê de bûye, di van dawiyane de hatiye berdan, û çûye Azerbaycanê. Ew hefteya borî li Tewrêzê hatiye dîtin, û her wek hatiye zanîn navbirî digel Ebdulqadir serokê êla Celalî û Emerxan serokê êla Şikak hevdîtin û danûstandin hebûye. Balyozê payebilind ê Tirkiyê jî dibêje, li ber vê ku Îhsan Nûrî di derbazbûyî de li ser sînoran gelek alozî û kêşe çêkirine, daxwaz kiriye ku hindî dereng nebûyî, ferman bihête dan ku pêşiya wî bigrin.

Bi baldan bi van xalên serê em daxwazkar in ku hatûçûna wî qedexe bikin, û biryara hewce bihê derkirin ku navbirî ji herêmên sînorî û wilayeta Azerbaycanê bihê dûrxistin, û li cihên dûrdest bihê akincîkirin, û bi her awayekî be, divêt ew di bin çavdêriyê de be, ku nebe bi sedema hizûra wî li Azerbaycanê û ew bandor û peywendiya ku wî li herêmê heye, di siberojê de bibe kêşesaz.

Kerema xwe emir bikin, û ji biryara xwe û encama biryarê jî, Wezareta Derve agehdar bikin, bona vê ku bersiva balyozê payebilind ê Tirkiyê bidin.

Wezîrê Karûbarê Derve

## Belgeya hejmar: 72

اداره ..........................

رو نوشت گزارش رضائیه وزارت پست وتلگراف وتلفن

شماره ۸۳ تاریخ ۲۲/۱۲/۱۲ وزارت / شرکت ................ که اصل آن بشماره ................ ثبت شده

مستقیم – وزارت پیرو ۸۲ – ۱۲/ ۱۲/ ۲۲ ساعت ۱۵ امروز معاون
کسولگری شوروی به پست جمال آباد رفته پس‌ازیک رشته تحقیقات ازروسای پاسگاه
نظامی وژاندارم ساعت ۱/۲ ۱۵ به ده قوشچی که درتصرف اکراد بوده حرکت
واطلاع داده است دستور داده ام اکراد قوشچی راتخلیه نمایند ساعت ۱۶
امروز فرمانده تیپ وفرمانده ژاندارمری درمخابره حضوری بافرمانده لشگرتبریز
جریان امررامفصلا گزارش وبرای‌اعزام سرباز ووسایل زرهی دستورلازم به فرمانده
تیپ دادندکه برای رفع محاصره پاسگاه های نظامی وژاندارم سریعا اقدام نمایند
بقراریکه درتلگرافات مبادله مستفاد میشد عده اکراد درحدود چهارصد نفرسوار
ومقداری پیاده تحت ریاست پسران عمرشریفی وروبتزاید هستند وبیم آن میرود
پاسگاه راتصرف وافراد انراخلع سلاح کنند ازشاهپورهم اطلاع میدهند قوطاز یکی
ازسران اکراد آن حدود باکسان خودنزدیک عمر شریف رئیس ایل شکاک رفته
ودرکوه های خان تختی ۱۴ کیلومتری شاهپورقراول گذاشتند حتی یک عرابه
رابعنوان اینکه عبورممنوع است بازگردانده اند . مراتب برای استحضار خاطر
عالی گزارش گردید . ساعت ۲۰ – ۱۲ / ۲۲ ۸۳ جواهری

رونوشت بااصل یکی است

۲۰۲۵

Îdare

Rûnivîsa rapora Urmiyê Wezareta Post û telegraf û telefonê

Rêkevt 12.12.1322`an çavkaniya bi hejmara ...hatiye tomarkirin

Rasterast-Wezareta Peywest bi 82-

03.03.1944`an demjimêr 15`ê îro cihgirê konsolxaneya Sovyetê serdana posta Cemal Abadî kiriye û piştî zincîreyeke lêkolînan ji berpirsên pasgaha leşkerî û jandarmê, demjimêr 15:30 deqeyan ber bi gundê Quşçiyê çûye ku di bin destê Kurdan de bûye, û ragehandiye ku min biryar daye Kurd Quşçiyê cih bihêlin.

Demjimêr 16`ê îro fermandê tabûra jandirmiriyê li pêwendiyeke hizûrî digel fermandê Tewrêzê, bûyerên îro bi hûrî jê re bas kirine, û bo şandina leşkeran û alavên leşkerî destûra hewce daye fermandê tabûrê, ku divêt di demek zû de bona rakirina dorpêçan li ser qereqolê û jandirmiriyan, pêgavan hilgirin.


Ligor telegrafê hejmara Kurdan nêzî 400 siwarî û hejmarek piyade ne, ku di bin fermana Kurên Emerxanê Şerîfî de ne, û ew metirsiya heye ku dest bi ser qereqolê de bigrin û leşkerên di nav de çek bikin. Herwiha li Şapûrê (Selmasê) jî xeber şandine ku Qotaz yek ji serkirdeyên Kurd ên vê deverê digel cemaeta xwe de ber bi aliyê Emerxan Şerîfî serokê êla Şikak çûne, û li zozanên Xantextî ku li 14 km a Şapûrê (Selmasê) ye, çeper girtine, û heta gariyeke wan jî li jêr navê qedexeya hatûçûnê vegerandiye.

Ev nûçe ji bo agehdarbûna we rêzdarî hate ragehandin.

83 Cewahirî

Wêneyê rûnûsê digel deqa çavkaniyê beramber e

**Belgeya hejmar: 73**


J.K

بەناوی یەزدانی گەورە و بەرز

بەیاننامەی ژمارە ٣١٢ ڕۆژی دووەمی خەزەڵوەری ١٣٢٣

آ، ل، ب، هەیئەتی ناوەندی کومەڵەی ژ.ک

Ev daxuyaniya helwesta siyasî ya Komeleya (J-K) e ku derheqê kêşeya îmtiyaza nefta bakûra Îranê di navbera hikûmeta wê demê ya Îranê û yekîtiya Sovyetê di wê serdemê de ye. (J-K) ê xwastiye ji vê rêyê ve bala Yekîtiya Sovyetê bo nerîn û daxwaziyên Kurdan rabikêşe.

Daxuyaniya hejmar 312 roja 2`ê Xezelwera 1323 (24.10.1944).

Bi navê Yezdanê mezin û dilovan

Di van rojan de radyo û rojnameyên Îranê belav kirin ku hikûmeta Yekîtiya Sovyetê dixwaze li bakûrê Îranê bo derxistina neftê, hikûmeta Îranê zewiyên bakûr û îmtiyazan bide wan. Lê hikûmeta çavbirsî ya Îranê çavên xwe ji hemû wan qenciyan miqandiye ku ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve bo mana wê hatibû kirin, lewma ew daxwaz jê nehate qebûlkirin.

Em ku nêzî 3 milyon kesî ji neteweya me hatiye bêdeshilatkirin, narewa ye ku li Kurdistana mezin ketine nav sînorê Îranê, û heya demekê ku sînor di navbera perçeyên Kurdistanê nehatiye hilgitin, divêt di tewahiya welatên Tirkiye, Îran û Îraqê em xwedî maf bin. Ku wisa ye me ev maf heye ku li ser hemû karûbaran lêkolînê bikin, û digel jiyana xwe bidin berhev. Derheqê sûd û daxwaza hikûmeta Yekîtiya Sovyet û bersiva hikûmeta Îranê em van çend peyvên jêrîn belav dikin.

Ev bersiva ku ji aliyê hikûmeta Îranê ve bo nûnerê Yekîtiya Sovyetê hatiye şandin, bi tu awayî digel qazancê neteweyên Îranê nehatiye hevberkirin, û diyar e qazancê sê milyon kesî ji neteweya Kurd jî di vê bersivê de nehatiye berçavgirtin. Neteweya Kurd nikare li hember vê hemû neheqiya ku heya niha jê hatiye kirin, bibîne ku li rex wan hikûmeteke wek Yekîtiya Sovyetê ku bi hindê hatiye naskirin ku ji bo xweşiya jiyana neteweyên biçûk têkoşînê dike, ji aliyê kesekî nefam wek Dr. Sa`id serokwezîrê Îranê ve bihê retkirin û bibe sedema aloziya di welatekî de ku sê milyon Kurd tê de akincî ye.

Komeleya (J-K) hikûmeta Yekîtiya Sovyetê agehdar dike, 9 milyon neteweya Kurd bi taybetî Kurdên Îranê ji vê biryara hikûmeta Îranê derxîne, ku ji dana îmtiyaza petrola bakûr bêzar e, û em bi tu awayî digel vê biryara hikûmetê nînin.

A.L.B     Heyeta Navendî ya Komeleya (J-K)

Têbînî: Bi sedema vê ku xwendina peyv û xetên nav vê belgenameyê gelek bizehmet bû, renge çend peyvên wê bi tewahî nehatibin zelalkirin, lê naveroka wê bi tewahî hatiye zelalkirin.

## *Siyaseta wê demê a Sovyetê li hemberî Kurdan*

Hewceyî gotinê ye ku siyaseta hingê ya Sovyetê li hemberî Kurdan dirêjiya heman siyaseta wan ya serdema piştî şerê yekem ê cîhanî bûye, ku di Çarçoveya stratejiya Sovyetê de tenê wekî kartekê di hevkêşeyên herêmî de, ji bo parastina hevsengiya berjewendiyên xwe bi Osmanî, Îranî û Birîtaniyan re hatiye bikaranîn, û tu carî rê nedane û nexwestine ku pirsa Kurd wek hevkêşeyeke girêdayî bi jeopolîtîk û stratejiya wan li Rojhilata Navîn de bê pênasekirin. Sovyetê ji dîtingeha xwe ve, pirsa Kurd wek pirojeya împeryalîzma Îngilîz û Amerîkayê çav lê kirine, lewra berdewam cîrantiya xwe digel Îran û Tirkiyê, ji ya bi Kurdan re biqazanctir zanîne, û niha jî siyaseta Rûsiyê li hemberî Kurdan doma stratejiya wan ya berê ye. Bi sedema vê ku wê demê armanca setratijîk a Sovyetê dabînkirina ewlehiya veguhastina cebilxane û alavên leşkerî, û parastina wan hêlên tedarukatî û locîstîkî ên ji nav Îranê re bo Sovyetê bûye, da ku bikare bi vê rêkê eniya şerê li Rojavayê Sovyetê li hember hêrişa Alman a Nazî biparêze.

Bixasmanî dema ku li eniya şerê li Qefqazê hêzên Sovyetê di bin givaşeke mezin a hêzên Alman de bûne, û hêzên Alman li eniya Rojavayê Sovyetê 1200 kîlometran di nav xaka Sovyetê de pêşrevî kiribûn.

Herwisa dema ku li dawiya sala 1944`an de bi sedema wan arîşe û kêşeyên ku derheqê îmtiyaza berhemanîna petrola bakûrê Îranê, û mifahwergirtina kompaniyên Sovyetê ji petrola Îranê pêk hatibûn, têkiliyên di navbera Sovyetê û Îranê gelek şêlû û aloz bibûn.

Lewma Sovyetê siyaseta xwe li hemberî Îranê guheriye, û xwestiye bi mifahwergirtin ji karta Kurd û Azeriyan wek siyaseteke taktîkî û kurtheyam, Îranê neçar bike ku rê bide kompaniyên Rûsî daku pişka wan di pîşesazî û berhemanîna petrola Îranê de hebe.

Di demeke wisa hestiyar de gumana vê yekê hebû ku dewleta Îranê jî wê alîkariya Almaniyan bikin, lewma Rûsan bo van du mebestên jêrîn, xwestine bi Kurdan û Azeriyan re têkiliyan danên daku bi rêya vê siyaseta demkî ve bikare pêgeh û maytêkirina xwe

di nav Îranê de bihêz bike.

1-Parastina ewlehî û seqamgîriya wan herêmên ser sînor, ên di navbera Sovyetê û Îranê de, bi rêya Kurd û Azeriyan.

2-Ji bo lawazkirina hikûmeta Îranê piştgirîkirina taktîkî û demkî ji daxwaziyên netewî ên Kurd û Azeriyan da ku wekî kartekê bo givaşxistina li ser Îranê bi kar bîne, da ku bikare Îranê bo pêdana îmtiyaza petrola bakûr razî bike.

Xûya ye ku Kurd jî bi dirêjiya dîroka xwe ya hevçerx, bo bidestxistina mafên xwe ên neteweyî xebitîne. Lewma xwestine bi mifahwergirtina ji wê derfeta şerê duyem ê cîhanê jî bi danîna têkiliyan bi karbidestên Sovyetê re, bo gihîştin bi serxwebûna Kurdsitanê bixebitin.

Serbarî vê ku rewşa hingê heta qasekê (J-K) û Sovyetî li hev nêz kirine, lê taybetmendiyên netewîxwazî û oldarî a (J-K) bi dilê Rûsan nebûye. Bixasmanî bi egera hebûna têkiliyên di navbera (J-K) û Hizba Hîwa li Başûrê Kurdistanê, ku bi rêberiya Refîq Hilmî têkoşîn dikir, û Rûsan jî bi gumana vê ku Refîq Hilmî têkiliyên wî bi Îngilîzan re hene, ji (J-K) jî biguman bûne, û tim bi sarî bersiva daxwaziyên (J-K) dane, û bi awayekî micid alîkariya wan nekirine.

Di heman demê de Sovyetiyan ji bo danîna têkilî û hevkariyan, ev daxwaziyên jêrîn ji (J-K) hebûne:

(J-K) dest ji merem û armanca serxwebûnê berde.

(J-K) daxwaziyên Kurdan di çarçoveya avakirina dewletek Demokratîk li Azerbaycana Îranê de bişopîne.

Herwisa pêdagirî kirine ku divêt (J-K) digel siyasetên Hizba Tûde a Îranê hemaheng û alîkar be.

Hewce ye were gotin ku Hizba Tûde ku wê demê di Îranê de hatibû damezrandin, paşko û dûvelanka siyasetên Hizba Komonîst û parêzerê berjewendiyên Sovyetê di Îranê de bûye.

Dema ku Sovyetiyan zanîne hin serkirde û rêberên (J-K) naxwazin daxwaziyên wan cîbicî bikin, hewl dane di nava rêberiya (J-K) de hinek ji wan kesên ku li ser baweriyên xwe tund in bêbandor bikin, û di heman demê de hinek kesên ku miyanerev û nêzî fikra Rûsan bin, di rêberiya (J-K) de cî bigrin.

Lê piştî sê salan dema ku Sovyetiyan nekarîne rêberiya (J-K) bo dûvelankî û paşkotiya siyasetên xwe razî bikin, bi merema rêgirtin ji fikra sexwebûnxwaziya (J-K) bi mahneya neguhertina siyaset û pêkhatiya wê saziya netewî, Sovyetiyan bi awayekî demkî têkiliyên xwe bi (J-K) re qut kirine, û xwestine ku (J-K) nav û naveroka pêkhateya xwe biguhere.

Xûya ye merema Sovyetê ji vê siyasetê ew bûye ku nehêle tevgera Kurdistanê û fikra serxwebûnxwaziya Kurdan ji kontirola Rûsan derkeve. Jiber ku tirsa wan ew bûye, neku ew doz bikeve destê eniya împeryalîzma Îngilîz û Amerîkiyan de, û bibe metirsî li ser berjewendiya domdirêj û stratejîk a Sovyetê.

Bo vê armancê dema ku şanda duyem a Kurdan bi serokatiya Qazî Mihemed bo Bakûyê hatine bangkirin, ligor siyaseta Hizba Komonîst a Sovyetê, Baqirov hewl daye ku Qazî Mihemed û hevalên pê re razî bike, ku divêt (J-K) navê xwe biguhere, û ji vê rewşa xebata veşartî derkeve. Herwiha Rûsan bi eşkereyî bi serkirdeyên Kurd ragehandine ku hekî hûn bixwazin piştgiriya Rûsan ji we berdewam be, baştir e ku hûn di cihê Komeleya J-K, Hizba Demokrat a Kurdistanê bi serokatiya Qazî Mihemed ava bikin.

Di wê hevdîtinê de piştî minaqişe û gengeşeyek zaf, şanda Kurdan bi vê pêşniyara Rûsan a ku dixwestin Kurd wekî herêmeke Otonom a girêdayî bi Dewleta Millî a Azerbaycanê bi Tewrêzê re bimînin, razî nebûne. Dema ku Rûsan ew helwesta micid a Kurdan dîtine, soza piştgirîkirin ji Kurdan û herwisa razîbûna xwe bo avakirna Komara Kurdistanê ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistan û Qazî Mihemed, bi Kurdan ragehandine.

## *Hatina Barzaniyan bo Rojhilatê Kurdistanê*

Barzanî bi rêbertiya olî ya Şêx Ehmedê Barzan û bi fermandehiya leşkerî a Mela Mistefa Barzanî li heyama serhildana (1943-1945) a xwe li dijî zordariyên hikûmeta Îraqê û Îngilîzan, karîbûn çendîn derbên giran li dijmin bidin, û di wê serdemê de bi piştevaniya siyasî ya Hizba Hîwa berxwedana Barzanê bikin hêvinê mafên neteweyî ên gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê. Lê piştî vê ku hikûmeta Îraqê bi palpiştiya hêza esmanî û bejahiyê a Îngilîzê, û bi hevkariya beşek ji serokeşîrên kirêgirtî ên Kurd karî vê serhildanê ber bi rewşeke aloz û perîşan ve bibe, Barzaniyan biryar dank u bi hezaran şervan û jin û zarokên xwe ve rû bikin Rojhilatê Kurdistanê.

Barzanî li 11.10.1945`an de ji riya çiyayên Kêleşîn û Dalamper ve gihîştin Rojhilatê Kurdistanê. Li wir jî li ser daxwaza Qazî Mihemed û Seyîd Ebdullah Şemzînî, bi alîkariya Emerxan wek hevsoziya neteweyî xelk bi ew qasê dilgermî ve pêşwaziya Barzaniyan kirin û ew li dehan gundên herêmên: Şino, Mirgewer, Nexede û mehabadê akincî kirin, û piştre hemû cure alîkariyeke madî bo bijîwa jiyana wan dabîn kirin. Barzanî piştî akincîbûna li Rojhilatê Kurdistanê wek erkeke neteweyî roleke berçav û dîrokî li bûyerên siyasî û leşkerî ên Rojhilatê Kurdistanê de dîtine.

## Belgeya hejmar: 74

٢٦٦٥
٥٤٣٤٨
٢٦/٩/١١

وزارت جنگ

ستاد ارتش

محرمانه مستقیم فوری

جناب آقای نخست وزیر

در پیرو مکاتبات قبلی نسبت به اقدامات اکراد بر علیه دولت، محترماً زحمت میدارد. گزارش واصله از تبریز حاکی است در جلسه اخیر عمرخان اظهار کرده قدرت اسمعیل آقای سمیتقو را همه دیده بودند در مقابل دولت نتوانست مقاومت کند آنهائیکه اهالی را تحریک مینمایند هر وقت با ما عملاً همکاری کرده و جلو افتادند ما هم اقدام میکنیم ملا مصطفی بارزان در روزهاست محرمانه به مهاباد وارد شده شیخ عبداله افندی به کمک قاضی محمد مشغول جمع‌آوری اعانه و اسکان مهاجرین است عمرخان علاوه بر گندم شش هزار تومان نقد داده در موقع حرکت خطاب به فرزند سمیتقو از مهاباد قاضی محمد اظهار داشته فراموش نکنید پدر شما را عجم‌ها کشته‌اند و نامبرده خیلی اصرار داشت که اشخاصی را مانند حاجی قرنی آقا و ملا خلیل وغیره که حاضر به مهاباد نشده‌اند بوسیله حاضرین تهدید نماید ولی با عدم موفقیت توام بوده قرار شده از هر طبقه روحانیون چهار نفر و از هر طایفه هم چهار نفر بسمت نمایندگی انتخاب و به کمیته مهاباد معرفی نمایند

از طرف وزیر جنگ

٤٨٢٨
٣٠ر٩ر٢٦

شمارهٔ این سند در آرشیو سازمان اسناد ملی ایران ۱۵۲۵-۱۷-۱۱۶۰۰۷ می‌باشد.

Wezareta Şer/ serfermandehiya artêşê
Rêkevt: 11.12.1945
Veşartî- bilez û rastewxwe
Rêzdar Serokwezîr

Li dirêjiya nivîsên pêştir derheqê kiryarên Kurdan ên dijberî hikûmetê, ez bi hurmet ve bi we radigehînim, ligor raportekê ku ji Tewrêzê ve gihîştî ye, di civîna vê dawiyê de Emerxan ragehandiye ku hemûyan hêz û qaveta Simko dîtibûn, lê nekarî li hember hikûmetê de berxwe bide, lewma yên ku xelkê han didin, kengê bi kiryar alîkariya me kirin û ketne pêşiyê, hingê emê jî dest bi çalakiyê bikin. Mele Mistefa Barzanî du roj e bi veşartî çûye nav Mihabadê, û Şêx Ebdulla Efendî bi alîkariya Qazî Mihemed mijûlî komkirina alîkarî û cîwarkirina koçberan e. Emerxan cuda ji genim, 6 hezar Tûmen jî perê kaş daye. Derheqê hereket û bizava Tahirxanê kurê Simko li Mihabadê, Qazî Mihemed gotiye wî, bîr neke Eceman çawa bavê te kuştin, navbirî pêdagirî dikir ku bi rêya wan kesên ku li Mihabadê hazir bûn, gefan li hin kesên wek Hacî Qerenî Axa û Mela Xelîl û yên din bike ku li Mihabadê amade nebibûn, lê serkeftî nebû. Biryar hatiye dayîn ji qada melayan 4 kesan û ji her êlekê jî 4 kesan hilbijêrin, û bi komîteya Mihabadê bidin nasandin.

Wezîrê şer…

## *Damezrandina Hizba Demokrat a Kurdistanê (PDK) li ser bingeha Komeleya (J-K)*

Di havîna sala 1945`an de serkirdeyên (J-K) û serokêlên Kurdan bi merema mifahwergirtin ji wê rewşa ku bi sedema şerê cîhanî yê duyem hatibû pêş, herwisa bona ku hebûna Komeleya (J-K) nebe asteng ku Yekîtiya Sovyetê bi hêcetên bêbingeh piştgiriya Kurdan neke, ji bo xizmet bi armancên neteweyî, amade bûne ku partiyeke nû bi pêkhate û siyaseteke vekirî û eşkere bi navê Hizba Demokrat a Kurdistanê li ser bingeha Komeleya (J-K) ava bikin.

Bi vî awayî berî damezrandina Hizba Demokrat li havîna sala 1945`an nameyek ku ji Mihabadê re bo Emerxan şandibûn, jê xwestibûn ku ew jî tevî çend kes ji serokêlên Şikakan ji bo beşdariya di yekem civîna avakirina Hizba Demokrat a Kurdistanê de beşdar bin.

Emerxan jî bi dilxweşî ve tevî Tahirxanê kurê Simko, Ebasê Fenekî, Qotaz Mamedî, Hacî Etmanî, Şêro Isma`îlzade (pisaxa), Ewdiyê Êverî, Zibêyd Êverî, Hesenê Hinare, Hesen Têlo, Temirxan Hinare, Ezoyê Fenekî, Miradê Nîsanî, û Nûrkoyê Ewdoyî, Sofî Pakî, Mela Mecîd û serokêlên tayfeyên (Xidirî, Gewirkî, Botanî, Xilûfî, Kurmancê Şipîranê, Ne`imetî, Mamedî, Ewdoyî, Muqirî, Baxoşanî û Kuresinî û...hwd) beşdariya wê civînê kirine.

Di wê civîna berfireh de li rêkevt 24.10.1945`an Hizba Demokrata Kurdistanê li ser bingeha Komeleya (J-K) hate avakirin, û Qazî Mihemed jî wekî serokê Hizba Demokat a Kurdistanê hatiye hilbijartin. Ew kesên ku navê wan di jêr de hatiye, wek endamên Komîteya Navendî hatine hilbijartin:

-Hacî Baba Şêx
-Mihemed Husên Seyfê Qazî
-Rehman Zebîhî
-Emerxan Şerîfî Şikak
-Seyîd Ebullah Geylanî
-Reşîd Begê Cehangîrî
-Zêro Begê Herkî

-Menaf kerîmî
-Seyîd Mihemed Tahazade (Eyûbiyan)
-Ebdulrehman Îlxanîzade
-Îsma`îl Îlxanîzade
-Ehmed Îlahî
-Xelîl Xusrewî
-Kerîm Ehmedî
-Hacî Mistefa Dawûdî
-Mihemed Emîn Mo`înî
-Mehmûd Welîzade
-Mihemed Resûl Dilşad
-Mihemed Emîn Şerefî

Hizba Demokrat a Kurdistanê di dema damezrandina xwe de, armancên xwe ên siyasî di van 8 xalên jêrîn de formole kiribûn:

- Netewa Kurd di nav Îranê de ji bo birêveberiya îdareya herêmî serbixwe û serbest be, û di nav sînorên dewleta Îranê de otonomiya xwe wergire.
- Mafê xwendina bi zimanê xwe yê zikmakî hebe, û hemû karûbarên birêveberiya îdareyan, bi zimanê Kurdî bi rê ve here.
- Li ser xîmê zagona bingehîn encumena herêmî a Kurdistanê bilez were hilbijartin, û serkêşiya hemû karûbarên civakî û dewletî bike, û çavdêriyê bi ser wan de bike.
- Erkdarên dewletê hetmen divêt ji xelkê herêman bin.
- Divêt li ser bingeha zagoneke giştî, di navbera gundî û xwedî zewiyan de lihevhatinek pêk were, û paşeroj û berjewendiya herdu aliyan li xwe bigre.
- Hizba Demokrat a Kurdistanê têkoşînê dike ku di xebata xwe de, bi taybetî di navbera netewa Azerbaycanê û kêmnetewên din de, ku li Azerbaycanê dijîn, (Asûrî, Ermenî û ...hwd) yekîtî û biratiya tewaw pêk bîne.
- Hizba Demokrat a Kurdistanê bi armanca pêşxistina karûbarên cotkarî, bazirganî, vejandin û geşepêdana karûbarên çandî û

saxlemiyê, û ji bo baştirkirina rewşa aborî û me`inewî a netewa Kurd, wê dest bi mifahwergirtin ji samanên xwezayî û kangehên Kurdistanê bike, û di vê rêyê de wê bixebite.

● Em dixwazin bo hemû gelên Îranê derfeta têkoşîna bi serbestî ji bo bextewerî û pêşxistina nîştimana wan were dayîn.

● Bi vî awayî dema ku naveroka 8 xalên siyaseta Hizba Demokrat a Kurdistanê tevî meramnameya (J-K)ê bidin ber hevdu, hingê derdikeve ku çi yek ji wan 4 xalên bingehîn, ên ku (J-K) wekî armanc bo xwe diyarî kiribûn, di siyasetên Hizba Demokrat a Kurdistanê de nayên xûyakirin.

● Xûya ye ku Hizba Demokrat a Kurdistanê hewl daye bi siyaseteke vekirî û eşkere piraniya xelkê Kurd li dora armancên xwe kom bike, û tevî programa xwe ya Kurdistanî ber bi pirojeya demokrasîxwazî a Îranî ve hemaheng û berdewam be.

Bi vî awayî piştî damezrana Hizba Demokrat a Kurdistanê, serkirde û çalakvanên hizbê bi eşkereyî meramnameya hizba xwe di nav Xelkê de belav kirine, û êdî xebat û çalakiyên berfireh û eşkere li Rojhilatê Kurdistanê dest pê kirine, û xelk li dora diruşmên Hizba Demokrat kom bûne.

Çend rojan piştî vegera Emerxan ji civîna avakirina Hizba Demokrat a Kurdistanê, ji aliyê serokatiya hizbê ve daxwaz ji Emerxan hatiye kirin, ku pêdivî ye li Urmiyê bi generalê Rûsiyan yê bi navê Atakişiyov re hevdîtinê bike.

Emerxan di roja diyarîkirî de tevî Qotaz Mamedî, Ebas Fenekî, Şêro Isma`îlzade û Hesenê Hinare çûne dîtina wî generalê Rûsî li Urmiyê. Atakişiyov di axavtina bi şandeya Kurdan re, bi dirêjî derbarê siyaseta Yekîtiya Sovyetê wekî Piştevanê neteweyên bindest û bixasmanî neteweya Kurd bo Emerxan û hevalên wî axiviye. Herwisa gotiye, divêt hûn ji bo bidestxistina mafên xwe ên netewî, haziriya xwe bikin, û dewleta Sovyetê jî wê piştgiriya we bike.

Di bersiva Atakişiyovê generalê Rûsî de, Emerxan jî wekî siyasetvanekî zana, û xwedî tecrube gotiye: “Eva ku Sovyet dixwaze piştgiriya miletê belengaz ê Kurd bike, em spasiya Sovyeta mezin û heval “Joseph Stalin” dikin. Lê hevalê general! divêt ez vê yekê

jî bêjim, ku sedan sal e, miletê Kurd di bin zilm û ezabeke mezin de ye. Eva cara yekê ye, ku dewleteke bihêz dixwaze piştgiriyê ji vî miletê mezlûm bike. Lewma miletê Kurd wê heta ebed, spasdar û emegnasê wê piştgiriya Sovyetê be. Lê hekî Sovyet vî miletê me yê bextreş û belengaz, bike qurbaniyê siyaset û berjewendiyên xwe, hingê wê jin û mêr, û zarokên Kurdan hetanî ebed nifiran li we bikin, lewma em hêvîdar in ku wisa lê neyê".

Wextê wî generalê Rûsî ew gotinên girîng ên Emerxan guhdarî kirine heyirî maye, û gotiyê: "Heval Emerxan! ji vê ku we spasdariya Sovyetê û heval "Joseph Stalin" kir spas dikim. Lê min ew çavnihêrî ji we nebû, ku hûn bêjin hekî Sovyet me bike qurbaniyê siyaset û berjewendiyên xwe, hingê emê nifiran li we bikin. Paşê general gotiye, dewleta Sovyetê qisa xwe ji çi kes, yan milet û dewleteke cîhanê naveşêre, û ji çi aliyekî jî natirse. Jiber ku we li dawiya xeberdana xwe de got, (em hêvîdar in ku wisa lê neyê), lewma ez bawerî û mizgîniyê didme we û gelê Kurd, ku qet wisa lê nayê, û dewleta Sovyetê wê wekî dostê rastîn û piştevanê bihêz ê we bimîne".

Dema ku xeberdana general tewaw bûye, Emerxan û hevalên pê re bi keyfxweşî vegeryane ciyê xwe. Piştre wî generalî hezar çekên Birno û miselsel û teqemeniyeke zaf, bi çend kamyonên leşkerî, bo Emerxan şandine Zindeştê, û Emerxan jî ew çek û teqemenî bi ser elên Kurdan di herêmê de parve kirine.

## *Beşa Pêncem*

## *Avakirina Komara Kurdistanê*

Piştî avakirina Hizba Demokrata a Kurdistanê, di heyama sê mehan de têkoşînek berfireh û eşkere di nav hemû pêkhate û qadên Kurdistanê de bi armanca tejîkirina wê walatiya deshilatê ku piştî nemana hêzên Îranê di hin herêmên Rojhilatê Kurdistanê de pêk hatibû, hate encam dayîn. Di heman demê de li Tewrêzê jî bi piştgiriya Sovyetê, Dewleta millî a Azerbaycanê hatibû ragehandin û li wir jî deshilata hikûmeta Îranê bidavî hatibû. Di rewşek wisa de Hizba Demokrat a Kurdistanê hewl daye ku li ser bingeha wê lihevkirina ku di hevdîtina cara duyem li (12.09.1945)`an li Bakûyê bi Rûsan re hebûnî, haziriya xwe ji bo ragehandna Komara Kurdistanê bikin.

Dema ku ji karbidestên herêmî ên Sovyetê re zelal bûye, ku Qazî Mihemed di nav xelkê Mihabad û eşîretên derdorê de kesatiyekî bibandor û xwediyê pêgeheke bihêz a civakî û siyasî ye, li ser bingeha wê lihevkirina pêşîn a ku Rûsan li Bakûyê tevî şanda duyem a Kurdan kiribûn, û herwisa li ser daxwaza serkirdeyên Hizba Demokrat û serokêlên Kurd, Rûs razî bûne ku bi serokatiya Qazî Mihemed, Komara Kurdistanê were ragehandin.

Di heman demê de ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistanê ve ji bo encamdayîna wê erk û vezîfeya neteweyî, dest bi amadekariyan ji bo ragehandina Komara Kurdistanê hatiye kirin, û bi vexwandina piraniya serokêl û rewşenbîrên Kurdistanê, di roja 22.01.1946`an de bi beşdariya nûnerên her çar perçeyên Kurdistanê, Komara Kurdistanê bi coşeke germ û bi merasimeke mezin a netewî, di meydana Çarçira a bajarê Mihabadê de hate ragehandin, û Qazî Mihemed jî sonda serokomariyê bo gelê Kurd xwar.

Sond wiha bû:

“Ez bi Xwedê û bi kilama Xwedê, bi welatê xwe, bi şerefa miletê Kurd, bi alaya pîroz a Kurdistanê sond dixwim ku heya dawî nefesa

xwe û fîdakirina dawî dilopa xwîna xwe, bi can û dil di rêya parastina serwerî û serxwebûna nîştiman û bilindragirtina alaya Kurdistanê de, ji tu hewl û xebatekê xemsariyê nekim, û bi Komara Kurdistanê û hevkariya Kurdistan û Azerbaycanê wefadar bim".

Di vê merasimê de ku Kurdên her çar beşên Kurdistanê tê de beşdar bûn, hin kesayetiyên girîng û xwedîpêgeh ên wekî:

Mela Mistefa Barzanî, Emerxanê Şikak, Mela Husênê Mecîdî, Seyîd Ebdula Şemzînî, Hacî Baba Şêx, Mihemed Husên Xanê Seyf Qazî, Zêro Begê Herkî, Heme Reşîdxanê Bane, Tahirxanê Simko, Qotazê Mamedî, Reşîd Begê Cehangîrî, Nûrî Begê Begzade, û hin rewşenbîrên Başûrê Kurdistanê, û herwisa Qedrî Cemîl Paşa û Wecdî Cemîl Paşa tevî hin xebatkarên din wekî nûner û berdevkê Xoybûnê ku ji Diyarbekirê ve hatibûn Mihabadê, û piraniya serokeşîrên Kurdistanê ji Makûyê ve bigre heya Kirmaşanê tevî dehan hezar kesî ji xelkê Mihabad û herêmên din ên Rojhilatê Kurdistanê beşdar bûn.

Di heman demê de kabîneya Hikûmeta Kurdistanê û berpirsyarên payebilind ên wê, û herwisa çar generalên hêza netewî ya Pêşmergeyên Kurdistanê ku ji aliyê serokatiya Hizba Demokrat ve hatibûn pejirandin, ji aliyê Qazî Mihemed ve bi xelkê hatine nasandin. Navê çar generalan ev bû: Mihemed Husênxanê Seyfê Qazî, Mistefa Barzanî, Emerxan Şerîfî/Şikak, Mihemed Reşîdxanê Xanzadeyî. Ev çar generalên Hêza Pêşmerge ya Komara Kurdistanê di Wezareta Berevaniyê de, bi fermandehiya Mihemed Husênxanê Seyfê Qazî Wezîrê Şer dest bi karê xwe kirine, û navê wan tevî navê wezîr û berpirsên din di rojnameya Kurdistan a hejmara 2 de hatiye belavkirin.

Hewceyî gotinê ye ku serbarê vê ku di zivistana hingê de sir û seqemeke dijwar hebûye, lê gelê kurd bi biçûk û mezinên xwe ve di vê merasimê de amade bûye.

Mam Hejarê helbestvan ji bo wê rojê wiha gotiye:
(Bila sed bihar, xulamê vê zivistanê bin).

Senar Mamedî wiha pesna roja merasîm a Komarê daye:

“Sala 1946`an di zivistaneke pir berf de her ji Agirî a serbilind ve bigre heta Şino û Dalanper, piraniya serokeşîr, seyîd, mela û pêkhateyên civaka Kurd tevî hezaran çekdarên xwe bi coş û bi dilxweşî, ber bi Mihabadê ve çûn ku weke qubleya armanca netewî hatibû  diyarîkirin.

Di destpêkê de piştî vekirina merasima ragehandina Komarê, Qazî Mihemed jî bi cilûbergên serbazî, derkete ser sekoyeke bilind û Komara Kurdistanê ragehand, û ji bo parastina vê komarê sond xwar.

Xelkê Mihabadê jî di nav wê xulyaqet û kernevala mezin de, ku ger derzî havêtibana esman, li erdê nediket, şahî û govend gerandin û spasiya leşkerên Rûsan kirin, û ew wek firîşteyên rizgariyê bi nav kirin”.

**Belgeya hejmar: 75**

*THE KURDISH MINORITY PROBLEM*
*CENTRAL INTELLIGENT AGENCY*
*Published on 8th December 1948*

Kêşeya kêmaniya Kurd
Rêkxirawa Îstixbarata Navendî
Rûpela 9`emîn, Beşa 5`emîn

Derfetên nû ji bo daxwazên xweseriya Kurd di dawiya sala 1945`an de çêbûn. Ew jî beriya ku Yekîtiya Sovyetê leşkerên xwe yên dagîrker ji Îranê paşve vekişîne, çalakî û amadekariya bilez a Sovyetê ji bo damezrandina dewleta Azerbeycanê dest pê kir. Herwisa li herêmên Kurdan li başûrê Azerbaycanê (Parêzgerha Urmiyê) jî, Partiya Demokrata Kurdistanê di bin serokatiya Kurdekî navdar û dewlemend ê Mihabadê bi navê Qazî Mihemed û Emerxan qehremanê serhildana salên 1918-1922`an ku serokeşîrê herî bibandor ê Kurdên Şikak li Îranê bû, bo avakirina birêveberiyeke Kurdî pêngav hilgirtin.

Ev yek jî di sala 1946`an de piştî ragihandina rejîma nû li Azerbeycanê bû. Qazî Mihamed damezrandina "Komara Gelê Kurd" li paytextê Mihabadê ragihand. Qazî Mihemed "Serkomar" û Hacî Baba Şêx serokwezîr, û melayekî Mihabadê serokê Meclîsa Neteweyî bû.

Artêşa Gelê Kurd di bin sîvan û razîbûna Sovyetê de û bi piştgiriya Begzade, Celalî, Herkî, û eşîrên din yên Kurd pêk hatibû. Herwisa di bin rênîşandana Sovyetê de radyoya Mihabadê û rojnameyeke Kurdî jî ji bo piştgiriya dewleta nû hatin damezirandin.

## *Peymannameya li navbera Komara Kurdistanê û Dewleta Millî a Azerbaycanê*

Li 23.04.1946`an dema ku şanda Komara Kurdistan û Dewleta Millî ya Azerbaycanê bi navbeynkariya karbidestên Sovyetê li Tewrêzê, derheqê deshilata Komara Kurdistanê û çarenûsa bajarên Urmiye, Selmas, û Kela Xwê (Xoy) de dicivin, karbidestên Sovyetê digel serokê dewleta Azerbaycanê Pîşewerî, ji bo girêdana wan bajarên navbirî bi Azerbaycanê ve, dixwestin Qazî Mihemed razî bikin.

Herwisa dixwestin têkiliyên di navbera Komara Kurdistanê û Hikûmeta Îranê de jî ji rêya Dewleta Azerbaycanê û Pîşewerî ve werin encamdan.

**Şandên herdu aliyan ji van kesan pêk hatibûn:**

Şanda Komara Kurdistanê:

1-Qazî Mihemed Serkomarê Kurdistanê

2-Mihemed Husên Seyfê Qazî Wezîrê Spaha Millî ya Hikûmeta Millî ya Kurdistanê

3-Seyîd Ebdullahê Şemzînî endamê Komîteya Navendî a Hizba Dêmokrat a Kurdistanê

4-Emerxanê Şikak endamê Komîteya Navendî a Hizba Demokrat a Kurdistanê û serokê hoza Şikak

5-Reşîd Begê (Cehangîrî) Herkî endamê Komîteya Navendî a Hizba Demokrat û nûnerê hoza Herkî

6-Zêro Begê (Behadorî) Herkî endamê Komîteya Navendî a Hizba Demokrata Kurdistanê û nûnerê hoza Herkî

7-Qazî Mihemed Xizriyê Şinoyî nûnerê xelkê Şinoyê

**Şanda Dewleta Millî a Azerbaycanê:**

1-Ce`ifer Pîşewerî serokwezîrê Dewleta Millî a Azerbaycanê

2-Hacî Mîrza Elî Şebisterî Serokê meclisa millî ya Dewleta Azerbaycê

3-Saciq Badgan cihgirê Komîteya Navendî a Firqeya Demokrat a Azerbaycanê

4-Dr. Selamullah Cawîd  Wezîrê Navxwe yê Dewleta Millî a Azerbaycanê

5-Mihemed Bêrya Wezîrê Çandê yê Dewleta Millî a Azerbaycanê

Di vê civînê de şanda Kurdan piştî guhdarîkirina nêrîn û helwestên neyînî ên Ce`ifer Pîşewerî û şanda digel wî, Emerxan ji bo helwest wergirtina di hember vê nêrîna neyînî a Rûs û Azeriyan de, bi Qazî Mihemed re şêvirî ye û gotiyê: "Xebat û armanca me ji bo serxwebûnê ye, û ew bajarên Urmiye, Selmas, Kela Xwê, Makû û Miyanduaw jî pişkek ji axa Kurdistanê ne. Lê hekî biryar be ku em serbixwe nebin û xulam bin, baştir e heta ku em xulamê xulaman bin, bila em xulamê Axa bin".

Mebesta Emerxan ji van gotinan ew bû ku, ku divêt Komara Kurdistanê jî wek dewleta Azerbaycanê li cem Sovyetê birûmet û bideshilat  be.

Lê hekî Sovyetî û Azerbaycanî bi deshilata serbixwe ya Komara Kurdistanê û çarenûsa kurdistanîbûna wan bajarên kêşe li ser razî nebin, hingê baştir e Komara Kurdistanê, ne bi rêya dewleta Azerbaycanê belkî rasterast tevî Hikûmeta Tehranê di têkiliyan de be, û herwisa hekî tenezulkirinek jî pêdivî be, bila ew tenezulkirin ji bo çareseriya arîşeyên Kurdan bi Tehranê re be, nek ji bo Tewrêzê û Rûsan ku naxwazin arîşeyên wan bajarên Kurdistanê bi me re çareser  bikin.

Diyar e ku Qazî Mihemed jî bi van gotinên Emerxan û şanda pê re razî bûye. Lewma wî jî di civînê de pêdagiriyeke baş li ser deshilata Komara Kurdistanê û çawaniya têkliyên di navbera van du hikûmetan de kiriye. Aliyê Azeriyan jî hewl dane ku bi piştevaniya Sovyetiyan daxwaziyên herî kêm ên şanda Komara Kurkdistanê qebûl  bikin.

Piştî vê gengeşekirinê herdu şandên Komara Kurdistan û Dewleta Millî ya Azerbaycanê lihevhatinek ku ji 7 xalên sereke pêk hatibû, bi hev re îmze kirine.

**Deqa peymana di navbera Dewleta Millî a Azerbaycanê û Komara Kurdistanê li 23.04.1946`an de bi vî awayî bû:**

Di wan ciyan de ku hewce bizanin, herdu hikûmetên millî nûnerên xwe ên fermî di nav xaka hevdu de diyarî bikin.

Li Azerbaycanê di wan ciyan de ku piraniya akinciyên wê Kurd bin, karûbarên dewletê di destê Kurdan de be. Herwisa li Kurdistanê di wan ciyan de ku piraniya akinciyên wê Azerbaycanî bin, karûbarên dewletî di destê vezîfedarên Hikûmeta Millî a Azerbaycanê de be.

Her du hikûmet wê komsiyoneke hevpar ji bo çareseriya arîşeyên aborî ava bikin, û biryarên wê komsiyonê bi çavdêriya serokên herdu hikûmetan wê werin cîbicîkirin.

Di dema pêdivî de wê di navbera Hikûmeta Millî a Azerbaycanê û Kurdistanê de alîkariyên serbazî hebin, û çi hewce be wê hevkariya hevdu bikin.

Hekî hewce be tevî hikûmeta Tehranê gotûbêj were kirin, divêt bi razîbûna herdu hikûmetên Azerbaycan û Kurdistanê be.

Hikûmeta Millî a Azerbaycanê ji bo pêşxistina ziman û çanda netewî a wan Kurdên ku li xaka Azerbaycanê de dijîn, û hikûmeta Millî a Kurdistanê jî, ji bo pêşxistina ziman û çanda netewî a wan Azerbaycaniyên ku li ser xaka Kurdistanê dijîn, wê ligor karîna xwe hewl bidin.

Her kesek ji bo têkdana dostaniya dîrokî a netewa Azerbaycan û netewa Kurd, û bo jinavbirina yekîtiya demokratîk-millî, yan alozkirina vê yekîtiyê hewl bide, wê di cî de ji aliyê herdu aliyan ve were sizadayîn.

Di vê civînê de dema ku şanda Azerbaycaniyan ew micidbûn û pêdagiriya Emerxan ya derheqê Kurdistanîbûna bajarên Urmiye, Miyanduaw, Selmas, Xoy û Makûyê dibînin, Wezîrê Navxwe yê Hikûmeta Azerbaycanê Selamullah Cawîd ji Emerxan re dibêje: Em bi mercekê razî ne ku berpirsayetiya kontrola tewahiya herêma rojavayê Urmiyê û başûrê Selmasê bi te bispêrin ku tu jî li hemberî vê yekê dev ji baweriya kurdîniya xwe berdî, û di wan bajaran de bi

Fedayiyên Azerbaycanê re alîkar bî.

Li hemberî vê pêşniyara Selamullah Cawîd, Emerxan gelekî bihêrs dibe, û bi bersiveke tund wê pêşniyarê protesto dike û dibêje: "Ez Kurd im û divêt ev herêmên navbirî wekî pişkek ji Komara Kurdistanê, bi awayekî fermî werin pejirandin, lê çêdibe ku em digel Azeriyan bi hevparî wan bajaran bi rê ve bibin".

Li gor vê peymannameyê derdikeve ku şanda Azerbaycanê bi piştgiriya Sovyetê hewl dane ku nasnameya Kurdistanîbûna wan bajaran nehêlin, û qedera wan bajaran li gor berjewendiyên siyasî ên Sovyet û Azerbaycanê werin bikaranîn.

**Belgeya hejmar: 76**

B. hejmar 35
Wezareta Karê Derve, telegrafa hatî, 2571, sade, Tewrêz
Rêkevta wergirtinê: 07-05- 1946
Wezîrê Derve, Bilez

Nivîsa jêr wergerana nefermî a naveroka lihevkirinekê ye ku li 23`ê Nîsanê /3`ê Banemerê di navbera Hikûmeta Milî ya Azerbaycanê û Hikûmeta Millî ya Kurdistanê li Tewrêzê hatiye wajokirin:

1) Her demekê bi hewce bizanin, ew du hikûmetên ku ew peyman wajo kirine, nûneran bo hevdu dişînin.

2)-Di vê para Azerbaycanê de ku kêmaniya Kurd li wir e, Kurd li fermangehên hikûmetî de têne danîn, û di vê beşa Kurdistanê de ku kêmaniya Azerbaycanî heye, Azerbaycanî li piraniya fermangehên hikûmetî têne danîn.

3)-Bona behskirina li ser pirsên aborî ên du neteweyên pêbend (mute`ehid) komîsyoneke hevbeş a aborî pêk tê. Serokên hikûmetên millî, endamên vê komîsyonê diyarî dikin.

4)-Hêzên çekdar ên her du hikûmetên pêbend, li her cihekî ku hewce be, hevkariya hevdu dikin.

5)-Hemû danûstandin digel hikûmeta Tehranê li gor berjewendiyên hevbeş ên hikûmetên millî ên Azerbaycan û Kurdistanê dibe.

6)-Hikûmeta Millî ya Azerbaycanê bo pêşkevtina zimanê Kurdî û vegeşandina kultura Kurdî di navbera Kurdên Azerbaycanê û Hikûmeta Millî ya Kurdistanê bo kiryara hemşêwe, li hember wan Azerbaycaniyên ku li Kurdistanê dijîn karê hewce dikin.

7)-Herdu neteweyên pêbend, wê her tak yan girûpekê ceza bikin, ku bixwazin dostatiya dîrokî û biratiya demokratîk a Azerbaycanî û Kurdan têk bidin.

Ev peymanname ji aliyê Hikûmeta Millî ya Azerbaycanê û bi destê Pîşewerî, Padgan, Cawîd û Bêrya, û ji aliyê Hikûmeta Millî ya

Kurd bi destê Qazî Mihemed, Mihemed Husên Seyfê Qazî, Seyîd Ebullah Geylanî, Emerxan ji êla Şikak û Reşîd begê Cehangîr ji êla Herkî û Zêro Begê Behadorî ji êla Herkî  ve hatiye wajokirin.

Duher

**Belgeya hejmar: 77**

1/32
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî, 9394, Tewrêz
26.04.1946
Nihênî, Wezîrê Derve, Bilez

Şeva bihorî di rewşeke gelek dostane de ji aliyê Qazî Mihemed û Emerxan ve pêşwazî ji min hate kirin, û piştî pevguherîna nerîn û axavtinan û basên asayî, min pirsa ewlehiya Amerîkayiyên bi eslê xwe Asorî yên herêma Rizayiyê (Urmiyê) di egera rûdana kêşeyeke navxweyî de xiste ber basê. Qazî ez xatircem kirim ku Kurd li hember hemû Mesîhiyên Kurdistanê, hesteke birayane hene, û bona parastina can û malê kêmaniya Mesîhî, û bi taybetî hevwelatiyên Amerîkayî ên akinciyê herêmê, hemû hewla xwe bi kar tînin.

Piştre min gote Qazî ku êdî karê min digel we tewaw bûye, lê bi egera kêmbûna zanyariyan li ser bûyerên Kurdistanê, hez dikim ku hekî razî bî, di vê derheqê de em bi awayekî ne fermî hinek baxivin. Wî jî ragehand ku ew pêşwaziyê ji her cure pirsyarekê dike.

Min jê pirsî, tevgera Kurd dixwaze tu cure pêwendiyek digel hikûmeta Navendî hebe?. Wî bersiv da min, ku armanca Kurdan digel armanca hikûmeta Azerbaycanê bi tewahî wek yek e, yanî mafê xwerêvebirinê di çarçoveya Îranê de.

Dema ku min derheq danûstandinên di navbera Kurdan û Azerbaycanê pirs kir, wî ragehand ku her wê rojê me li ser hemû mijaran bi tewahî li hev kir.

Piştre min hewl da, derheqê vê yekê ku gelo di navbera hikûmeta Navendî û Kurdan de danûstandinek heye, yan ji aliyê wan ve bo vê yekê çi pêşniyarek hatiye kirin yan na, da ku ez zanyariyan werbigrim?. Di vê qonaxê de, wî serdana çaverêkirî a şandeke Azerbaycanî ku biryar e bi serokatiya “Badgan” bona danûstandina digel Qewam herin Tehranê, piştrast kir. Wî got şanda Azerbaycanê li ser navê Kurdan jî danûstandinê dikin. Kurd û Azerbaycanî bo bidestveanîna daxwaziyên xwe bi hev re hevkariyê dikin.

Piştre min pirs kir ku gelo Kurdên Îran û Îraq û Tirkiyê dixwazin ku wekî şerê yekem ê cîhanî (piştî şer) şandekê bo konferansa aştiyê binêrin? Wî bersiv da, nexêr, li ber rewşa Îranê, Kurdên Îranê digel Kurdên navçeyên din pêwendiya wan bi hev re nîne.

Min anî bîra wî, ku min bihîstiye ku Qewam li ser vê baweriyê ye ku pirsa Kurd gelek bizehmet nine. Wî bersiv da û got, ji ya ku Qewam jî dibêje sadetir e, û hekî eva ku ew derheqê demokrasiyê de dibêje, rastgoyane be, dikarim bêjim ku her ji niha ve ev pirs çareserkirî ye. Wî got ku Qewam her niha jî wek demokratekî rasteqîne qise dike, û ger bi kiryar jî wek demokratekî rastgoyane tev bigere, hingê tuxmên curbicur ên neteweyî û nejadî ên di Îranê de wê bikarin bi bê xwînrijandin û bi dosataniyek tewaw bi hev re bijîn.

Qazî Mihemed bi îşarekirin bi vê ku armanca Kurdan aştîxwazane ye, û ji bilî parastina xwe tu planeke wan ya din a leşkerî nine, bi jîrî xwe ji bersivdana bi pirsên pêwendîdar bi biyavê leşkerî dûr dixist.

Min jê pirsî ku gelo zabitên wî ji wan cîpên Amerîkayî ku min dîtin ew di nav bajar de dihajon, razî ne? Wî bi dilpakî ve got “kîjan cîp”?

Di destpêka vê gotûbêjê de, Emerxan Wezîrê Şer ê Kurdistanê ku tefeş û reng û rûyekî wek yek ji generalên “Opera Komîk”an hebû, wisa xûyabû ku ji van gotûbêjan bêtaqet bûye, û ode bi cih hêla.

Dema ku ez rabûm ku herim, Qazî îşare da min ku ez rûnêm. Wî ji min pirs kir ku çima Hikûmeta Wîlayetên Yekgirtî ên Amerîkayê ji vê bandor û deshelata xwe bona guherîna hikûmeta Îranê berev demokrasiyeke rasteqîne mifahê wernagire? Min qala vê kir ku, destwernedan (di nava karûbarên navxwe) yek ji bingehên sereke ên hikûmeta Amerîkayê ye, û pirsên navxweyî ên Îranê dibe ji aliyê Îraniyan bixwe ve bi bê destêwerdana welatên bîhanî were çareserkirin.

Piştre wî bi awayekî ecêbgirtî got: Kurd pêşwaziyê ji destêwerdana Amerîkayê dikin. Hikûmeta Amerîkayê bi pêngavhilgirtina di

berjewendiya kêmaniyên Îranê de, wê bikare hitbara xwe zêde dike. Piştre got: Heta niha hikûmeta navendî rêgirê têkiliyên Kurdan û cîhana derve bûye, û ji niha şûnda Kurd dixwazin xwe bi cîhana derve bidin nasandin.

(Bi hejmar 135 bo Wezaretxane, bi hejmar 125 bo Tehran, bi hejmar 30 bo Mosko, bi hejmar 51 bo Lenden, bi hejmar 32 bo Enqerê, bi hejmar 28 bo Bexda û bo Parîsê hate şandin.

Duher

**Belgeya hejmar: 78**

B. hejmar 33

Wezareta Karê Derve, telegrafa hatî, 9749, Tehran

Rêkevt 27.04.1946

Wezîrê Derve

Serbarê îdi`aya eşkere ya serkirdeyan (telegrafa hejmar 124, Tewrêz, 25`ê Nîsan) ev girîngiya ku peyamnêrên rojnameyan didin bûyerên Kurdistanê, derdikeve ku Serokwezîr Qewam herwisa li ser vê baweriyê ye, ku kêşeya Kurdistanê biçûk e û hekî danûstandina digel hikûmeta Azerbaycanê bigihîje encama dilxwaz, wê ew jî bê kêşe çareser dibe. Me heta niha ne tenê her nekariye tu zanyariyekê derheq her planekê ku renge hikûmeta Îranê bona danûstandina digel Kurdan hebe, bi dest bixin. Belkî berevajî wê jî, Qewam haşa ji wiha daxwazeke me kiriye. Di vê biyavê de em dikarin wisa danên ku hikûmeta Îranê çavnihêr e ku piştî nemana piştevaniya rasterast a Rûsan, û piştevaniya nerasterast ya Azerbaycana otonom wê tevgera Kurdan jî hilweşe.

Roso li ser vê baweriyê ye ku renge nerîna hikûmeta Îranê rast be, jiber ku koma pêkhateya hikûmeta otonom ya Kurdistanê heya astekê destçêkirî ye, û tenê bi ser pêkhateyeke ne zêde yekgirtî ya eşîretî de hatiye sepandin.

Bi hejmar 596 bo wezaretxaeyê hate şandin, bi hejmar 178 bo Mosko, bi hejmar 44 bo Bexda û bi hejmar 2 bo Enqere û Parîsê hate dubarekirin.

**Belgeya hejmar: 79**

(1942, bergê VII, rûpel 442-443)

Telegrama ji Wezareta Derve bo cihgirê konsolê Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li Tewrêzê (birêz Duhêr 1)

Nihênî

Waşington, 29.04.1946

Li bersiva telegrama 137, rêkevt 27`ê Nîsanê:

Bi boçûna me bo we yan jî bo “Roso” baş nine ku di vê rewşê de wek mêhvanê Qazî Mihemed, serdana Mihabadê bikin. Jiber ku Qazî Mihemed hêşta rêberê tevgereke serbixweyîxwaz li dijî dewleta navendî a Îranê ye. Ji vê zêdetir serdaneke wiha renge li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Îraq û Tirkiyê, wek hêmaya hevxemiya Amerîkayê digel armancên Kurdan bo pêkanîna dewleteke serbixwe a Kurd bête şirovekirin.

Açîson 4

Li telegrama 648, rêkevt 6`ê Gulanê, nûnerê balyozxaneya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li Tehranê pêşniyara vê yekê kiriye ku qedexebûna sefera karmendên balyozxaneya Amerîkayê li Tehranê û konsolxaneya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê ji Tewrêzê ve bo Kurdistanê, bihê hilweşandin. Jiber ku tewahiya leşkerên Sovyetê heya 7`ê Gulanê wê ji Îranê derbikevin.

Wezareta Derve jî li telegram 398, rêkevta 7`ê Gulanê bi vê razî bûye ku ji vê rêkevtê ve, ev qedexebûna han were hilweşandin. (645-5/124.91)

## *Şerê di navbera dewleta Îranê û Komara Kurdistanê de*

Li bihara sala 1946`an hêzeke mezin ya Îranê bi piştgiriya tang û topxane û firokeyan bi merema hêriş bo ser Mihabad û Komara Kurdistanê li çiyayên derdorê bajarê Seqizê cihgîr dibin.


Hingê li ser banga Qazî Mihemed ji serokeşîrên Kurdan bo berevanîkirin ji Komara Kurdistanê, Emerxan tevî Tahirxanê kurê Simko û Qotaz Mamedî bi 1700 pêşmergeyên Şikak, Celalî û Mîlan re çûne eniya şer, û tevî hêza Barzaniyan û leşkerê Komarê li herêma Bokan, Seqiz û Serdeştê, li eniyên Kosalan, Sera, Qarawe û Mameşe de pêşiya leşkerên Îranê girtine.

Di wî şerî de ku zêdetir ji mehekê domandiye, Îranî bi hêzeke zêde a peya, û bi piştevaniya tank û top û firokeyan, hêrişî ser herêmên Komara Kurdistanê kirine, û Hêza Pêşmerge a Şikakan bi fermandehiya Emerxan û Tahirxanê Simko û Qotaz Mamedî roleke berçav di wan şeran de lîstine, û ji pêşmergeyên Celalî kesek bi navê Qere Yusif bi roketa firokeyê şehîd bûye. Herwiha ji pêşmergeyên Hêza Tahirxanê Simko jî pêşmergeyek bi navê Riza Rezmcû kurê Mihemed xelkê gundê Kurmikê li herêma Somaya Urmiyê şehîd bûye, û çend pêşmerge jî birîndar bûne.

Hewce ye bê gotin ku di wê serdemê de, Hêza Pêşmerge ya Barzaniyan di çendîn eniyên şer de rola girîng û bibandor hebûne, û li yek ji van şeran de Xoşewî Xelîl serokê eşîra Mizorî ku digel çendîn pêşmergeyên Barzanî karîne bi qehremantî û fedakariyeke bê mînak, hêrişên dijmin têk bişkînin, bixwe û çend pêşmergeyên din ên Barzaniyan birîndar dibin, û piştî çend rojan Xoşewî Xelîl Mizorî li nexweşxaneya Tewrêzê de canê xwe fîdayê nîştiman kiriye, û piştre bi merasimeke leşkerî û bi beşdariya Qazî Mihemed û Mela Mistefa Barzanî û berpirsên Komara Kurdistanê, termê wî li Mihabadê bi xakê hatiye spartin.


Hêzên Îranê jî piştî dana hejmarek kuştiyan, û têkşikana çendîn tank û zirêpoşan û ketina balafirekê şikest xwarine.

**Belgeya hejmar: 80**


جناب آقای محمد رشید خان

Nameya Qazî Mihemed bo Mihemed Reşîdxan
02.05.1946
Rêzdar Axayê Mihemed Reşîdxan
Derheqê vê berevaniya ku we kiriye, ez li we pîroz dikim. We çi tiştek hewce be, bilez ji min re binivîsin, da ku ez bo cîbicîkirina wan dest bi kar bim, jiber ku nûnerên me li Tehranê mijûlî gotûbêjan in, nabe bi tu awayî hûn hêrişî dijmin bikin. Hûn li her cihî bin, li wir bisekinin, û cihê xwe qahîm bikin.
Mihemed Qazî

**Belgeya hejmar: 81**



Nameya Emerxan bo Mihemed Reşîdxan

31.05.1946

Bo hizûra rêzdar hezretê general Mihemed Reşîdxan pêşkêş be

Li gor vê nameya cenabê te ku gihîşt, ez ji naveroka wê têgihîştim û te derheqê Mîredê, emir kiribû ku em bo destpêkirina şer destpêşxer nebin. Me tenê bi 50 kesan karên hewce kirine, û me kopika çiyayan û cihên asê girtine.

Wê roja ku şer hebû, min bi rêya hejmarek ji kesên ser bi Temerxanê Hinare ve, Mîredê girtibû. Niha jî dikarim bilez wir bigrim, lê îzna şer tuneye. Siwarên Ecem li aliyê Quredere cihgir bûne, lê ez ji wan xatircem nînim, û hekî hûn bilez îzna şer bidin, ezê Mîredê bigrim. Ez li benda emrê cenabê we me. Lê hekî em Mîredê bigrin, şer wê dest pê bike, lê me îzna şer tuneye. Li ber vê ku Mîredê vala ye, ez li benda fermanê me.

Ez çaverê me ku hûn gelek gelek zû fermanê bidin


Eva deh caran me bo navendê nivîsiye ku nalbendan bo me bişînin, lê heya niha jî neşandine. Ricayê dikim ku nalbendan bo me bişînin.

Îmza

Emer

**Belgeya hejmar: 82**

Nameya Tahirxanê Simko bo Mihemed Reşîdxan



30.05.1946


Birayê hêja Mihemed Reşîdxan

.....`Erzî te dikim ku li rêkevt 28.05.1946`an hêza me li pişt rêya Koselan-Kerîmava.....bûn. Dijmin ji nişkêve em xafilgîr kirin û êrşî ser me kir, û ji aliyê Alkanê ve wan hêrişî ser Mihemed Husên Seydayê Qasim kirin. Hêza me berevanî ji xwe kir û karî di rewşa xweparastinê de hêrişî wan bike, û wan bi giranî têk bişkîne. Me çend kes ji dijminan kuştin, û me du trombêlên wan girtin. Ji hêza me jî kesek ji tayifeya Ewdoyî hate kuştin û kesek birîndar bû, û hespeke me jî ji nişkêve bi gulle hate kuştin. Hêza me gelek bê fîşek mane, ez ricayê dikim ku hinek qurxane (çek û cebilxane) ji me re bişîne da ku em mehtel nemînin. Li aliyê Kerîmava ew kiryar li posta Zobeyr û ..... û Mihemed de qewimiye, û li aliyê Koselanê jî, ew yek di posta Tirk û Edo de bûye, li aliy Alkanê (posta Mihemed Husên Îqdam û ...qewmiye) û em li benda alavan û destûrê ne.

Ez ricayê dikim ku top û dijîtankan ji me re bişîne, û hewce ye ku karê me bi cidî wergirin. Jiber ku tu cudahî di navbera karê me û karê cenabê te da nine, û ji hevalên me hin....kesan, çeka dutîr û sêtîr, û hin jî bê tiving hene. Wî karî berçav bigrin.

Tahir Simko

**Belgeya hejmar: 83**



Nameya Tahirxan Simko bo fermandeyê eniya Sera û Bokanê

04.06.1946


Fermandê eniya Sera û Bokanê, ez bi rêzdarî ve `erzî we dikim, ku kaxeza cenabê we gihîşt û hate ziyaretkirin. Te nivîsîbû ku we eniya şer terk kiriye. Me eniya şer terk nekiriye, lê piştî çend şerên giran, fîşekên me xilas bûn û (me hinek paşekêşî) kir. Îca wê demê bû ku em kêmekê ji eniya şer dûr ketin. Te nivîsîbû ku 2 hezar fîşek hazir in û çend kesan digel çarpêyan bişîne û wergire.

Lê bi 2 hezar fîşekan çi tê kirin? Cenabê we baş dizane ku 2 hezar fîşek, têra hezar û 600 kesî nakin. Teqrîben 11 muselsel hazir in ......rica dikim ku bo navendê binvîse ku fîşek û alavan bo me bişînin, da ku em dest bi kar bin. Sond bi Xwedê, hinek kesên me tenê paketek fîşekên wan mabûn, bi yek..........bilez fermanê bidin ku em mehtel nemînin. ...............

Îmze

Tahir Simko

Belgeya hejmar: 84



۱۵/۳/[illegible]

خدمت جناب آقای علی بیگ

پس از تقدیم) عرض سلام خاطر مبارک مستحضر میدارد خود حضرتعالی مستحضر

هستید که هزار فشنگ مال برادران [illegible] برادرانم بواسطه [illegible]

دولتی سوخته برای [illegible] فشنگ خدمت رسیده [illegible] قبول زحمت فرموده

توسط یکنفر پیشمرگ برای ما روانه فرمایید و هم در صورت امکان

شاید چهار نفر [illegible] روانه فرمایید که در اینجا [illegible] را [illegible]

و حالیه خودم هم در قلعه کهنه هستم [illegible] کردی [illegible] و آقای

رشید بیگ [illegible] در ده چاخرلو فقط فوری [illegible]

[illegible] هم در چاخرلو خدمت رشید

بیگ هستند خواهش میکنم فشنگ ها را هرچه زودتر

توسط یکنفر پیشمرگ روانه فرمایید و هم مرقوم فرمایید

که [illegible] محمد حسین از [illegible] هستند [illegible]

[illegible]


Nameya Tahirxan Simko bo Elî Begê Şêrzad
Wergera ji Farsî
05.06.1946
Xizmeta rêzdar Axayê Elî Beg

Piştî pêşkêşkirina silavan ez bi cenabê we radigehînim, her wekî cenabê we agehdar in, hezar fîşek ku yên siwaran in, li gundê Serayê mane. Siwar jî li ber nebûna nalên hespan, nekarîne bona barkirina fîşekan, bigihjîn xizmeta we. Kerema xwe vê zehmetê bikêşin, û bi rêya pêşmergeyekî ve ji me re bişînin, û herwiha ger îmkan hebe, çar nalbendan jî ji me re bişînin, da ku li vir hespên me nal bikin. Niha ez bixwe li Qelakonê me, û nivîserê zimanê Kurdî tunebû, Axa Reşîd Beg digel cema`eta xwe li gundê Çaxirawe ye, û tenê Nûrî Beg li Newbuharê ye, cema`eta Tahir Axa jî li Çaxirawê li xizmeta Reşîd beg de ne.

Ez ricayê dikim, ku fîşekan hindî zûtir bi rêya pêşmergeyekî ve, ji me re bişînin, û herwiha kerema xwe bo me binvîsin , ku cema`eta Mihemed Husên di çi gundekî de ne.

Tahirxan simko

**Belgenameya hejmar: 85**



ژماره ——
رۆژ / / ۱۳۲۶
ضمیمه ——

[illegible]ارتی هیزی دیموکراتی کوردستان
هیزی بوکان

۲/۲/۲۵

بۆ حضور پیشوای معظم کوردستان تقدیم

پاش سلام به اندازه [illegible] ایشەو ۲۱/۲/۲۵ [illegible] آغایان
[illegible] سلطان پناه و محمود خان سلطان و آغایان گلباخی و تیلکو [illegible]
[illegible] تقدیم کرد. [illegible] آغا [illegible] لسر [illegible]
محمد رشید خان [illegible]
[illegible] توقف بکم [illegible]
[illegible] سوارانی گلباخی [illegible] سوارە تیلکو [illegible]
[illegible]
[illegible] لطف و [illegible] اقدام بکرێ
[illegible] سلطان پناه و محمود خان سلطانی آغایانی گلباخی و تیلکو
[illegible]
[illegible]
[illegible] ملاقات [illegible]

[illegible]

[illegible]

Nameya Emerxan bo Qazî Mihemed

Wezareta Hêza Demokrat a Kurdistanê, Hêza Bokan

11.06.1946

Bi navê mehbûbê Pêşewayê mu`ezem ê Kurdistanê

Piştî silavên bê hempa, û nîşandana bendegiyê, îşev 11.06.1946`an ji aliyê axayan: Axa Salih Sultanpenah, Mehmûdxanê Sultanî û axayên Gelbaxî û Tîlekoyî li bexşa ....a jor ve, name pêşkêşî min kirin ku sedema dest ji kar kêşana Axa Salih li ser wan çend gundan e, ku Mihemed Reşîdxan ew gund dane Mihemed Sidîq. Yekem ricaya min ew e ku emrekê bidî min, ku serdana wan gundan bikim, da ku vê îdi`aya xwe ligor şerî`tê bi dawî bînin. Niha 400 siwarên Gelbaxî û 250 siwarên Tîlekoyî digel serhengekê û emniyeyan li gundê Rostên e, û dixwastin wî gundî dagîr bikin û perîşan bikin. Lê em gihîştin wir, û li jêr siya dilovanî û meznahiya te, wan nekarî tu tiştekê bikin. Niha Axa Salih Sultanpenah û Mehmûdxanê Sultanî, axayên Gelbaxî û Tîlekoyî bi Qur`anê sond xwarine, ku ruha xwe ji bo kurdatiyê gorî bikin, û çavnihêrê bersiva me ne. Em hêvî dikin ku zû bersiv bidî, û niha ezê digel wan axayan zû hevdîtinê pêk bînim.

General Eemerxan Şerîfî

Piştî îmzekirina wê peymannameya di navbera Komara Kurdistan û Dewleta Millî ya Azerbaycanê de, dema ku Emerxan û Zêro Beg digel serokêlên Şikak, Herkî û Celaliyan dibînin ku karbidest û Fedayiyên dewleta Azerbaycanê, naxwazin pêbendî bicihanîna wê peymannameya lawaz jî bin, lewma di roja 18.06.1946`an de zêdeyî 300 şervanên Şikakan bi fermandehiya Emerxan, ku wekî hêza pêşmergeyên Komarê hatibûn birêkxistin, bo bicihanîna vê rêkkevtina di navbera Komara Kurdistan û Dewleta Millî a Azerbaycanê de, bo birêvebirina hevbeş a wan bajarên ku Kurd û Azerî tê de dijîn, çûne nav bajarê Kela Xwê.

Lê hêza Fedayiyên Azerbaycanê jî ji bajarê Merend û Makûyê re bo dijberiya Emerxan ketine nav tevgereke dijminkarî de. Bi vî awayî

rewşa bajar ber bi alozî û şer ve çûye. Lê piştre bi navbeynçîtiya cêgîrê Konsolê Rûsan bi navê “Alaydîryov” ku alîgiriya Azeriyan kiriye, hişdarî dane Emerxan ku hekî hêza Şikakan ji Kela Xwê paşve nebin, wê leşkerê Sovyetê destêwerdanê bike.

Bi vî awayî ew helwesta karbidestê Rûsî derbeyek mezin bûye ku li îqtidar û deshilata Kurdan di vê herêmê de ketiye. Lewma Emerxan jî heta daviyê qet baweriya xwe bi Rûsan neaniye.

**Belgeya hejmar: 86**

B. hejmar 47
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî, Tewrêz
Rêkevt: 15.7.1946
Nihênî, derve

Refî`î ku di van dawiyane de kirine fermandeyê Rizayiyê (Urmiyê), ligor agehiya yek ji endamên teşkîlata konsolxaneyê, duh ragehand ku nakokiya Kurdan û Azerbaycaniyan cidî ye. Lê ew li ser vê baweriyê ye ku Kurd heta berî ceribandina hemû rêyên li ber dest bona destpêregihîştina wan bi hikûmeta xwecihî, hawara xwe nabin ber hêza serbazî. Refî`î ragehand ku ew bi van zûkatiya ber bi Rizayiyê (Urmiyê) rê dikeve, û li wir bona gihîştina bi lihevkirineke cuda, digel serkirdeyên êlên Kurdan û yek ji wan jî Emerxan danûstandinê dike. Ji bo Demokratan ku heya berî niha ji rêya Qazî Mihemed ve karûbarê Kurdan rêk dixist, ev yek wekî stratejiyeke nû tê hesibandin.

Wergerê konsolxaneyê ku li pey karûbarên wergirtina mohleta sefera (Angos) berpirsê konsolî bo Mihabadê bû, bo ofîsa parêzgar Cawîd hate bangkirin. Cawîd derheq hitbar û garantiya (hikûmetî) a Azerbaycanê di nav xaka Kurdan de digel Qazî danûstandin dikir. Qazî bi amadehiya Cawîd, weha gote wergerê (konsolxanê):

Karbidestên Azerbaycanê heya Rizayiyê (Urmiyê) berpirsê ewlehiya şandê dibin. Em jî bo rêya di navbera Rizayiyê (Urmiyê) heya Mihabadê, di wê "navçeya ku di bin deshilatdariya me de ye", erk û vezîfeya xwe ya di vê derheqê de cîbicî dikin. Helbet Cawîd li ser axavtina Qazî tu tiştek negot, lê heyamekê piştre pêşniyar kir ku ew serdana li ser rêya Miyanduawê û li beşa Rojhilatê gola Urmiyê were kirin, jiber ku rêya Rizayiyê (Urmiyê) bo Mihabadê baş nîne. Li gor gotina wergerê konsolxanê di navbera Qazî û Cawîd de hest bi sarbûnekê dihate kirin, piştî vê Cawîd garantînameyeke nivîskî bo girûpê derkir, û Qazî jî wisa kir ku şarezayek heya Mihabadê digel wan be. Helwesta dostane ya rêberê Kurd li hemberî Wilayetên Yekbûyî bi awayekî zelaltir ji caran tê berçav, û bi nîşandana vê yekê

ku ew serdan serdaneke tewaw nefermî ye, wisa kir ku rewşeke nebaş pêk nehê.

Bi hejmar 215 bo wezaretxaneyê hate şandin, bi hemar 216 bo Tehranê, û bi hejmar 142 bo Moskoyê, bi hejmar 41 bo Enqerê û bi hejmar 35 bo Bexdayê hate dubarekirin.

Duher

**Belgeya hejmar: 87**

B. hejmar 48
Wezareta Karê Derve, telegrafa hatî Tewrêz
Rêkevt: 16.07.1946
Nihênî, Wezîrê Derve
Telegrafa hejmar 218, 15`ê Tîrmeh

Wisa xûya ye ku têbînî û gotûbêjên dema li hevdîtina li Rizayiyê (Urmiyê) de, gotinên Refî`î derheq hestiyarbûna rewşa Kurdan li herêmê piştrast dike. Niha Kurd bi ser hemû herêmên rojavayê bajarê Xoy, Şapûr (Dîleman-Selmas), Rizayiyê (Urmiyê) de zal in, û hemû rojê Demokratan (Fedayiyên Azerbaycanê) li gundan derdixin. Wisa xuya dike ku ji bilî nav bajarê Rizayiyê (Urmiyê) bixwe, hemû beşa rojavayê gola Rizayiyê (Urmiyê) di bin kontrola wan de ye.

Heta nizîkî 10 maylî ji bakûrê bajarê Rizayiyê (Urmiyê), hemû cure alaveke veguhastinê, mijûlî veguhastina Kurdan ber bi aliyê bilindahiyên wan cihan in ku di destê Kurdan de ne. Çavkaniyên xwecihî ên min li ser vê baweriyê ne ku Kurd dixwazin, çi ji rêya aştiyê ve be, yan ji rêya hêzê ve be, bajarê Rizayiyê (Urmiyê) ku tenê herêma wan e bo karê kirîn û firotinê, bigrin û bikin paytextê Kurdistana Bakûr.

Bi hejmar 220, bo wezaretxanê, bi hejmar 221 bo Tehranê, bi hejmar 142 bo Mosko, bi hejmar 42 bo Enqerê, bi hejmar 36 bo Bexdayê hate şandin.

“Gerald Doher”

**Belgeya hejmar: 88**

B. hejmar 49
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî, Tehran
Rêkevt: 25.07.1946
Nihênî, Wezîrê Derve

Destbiserdegirtina Xoyê ji aliyê hêzên Kurdan ve, ku li gor rapora konsolê Amerîka li Tewrêzê, li roja 18`ê Temûz/28`ê Pûşperê rû dabû, roja piştre ji aliyê şexsê Gagarîn û konsolê Birîtanya ve hate şopandin û hate retkirin. Li gor raporên dawiyê ku ji aliyê (yek ji) akinciyên Xoyê ve bo konsolê Amerîka li Tewrêzê hatine şandin, hefteya bihorî 300 çekdarên êla Şikak çûne nav Xoyê, û daxwaz kirin ku nîva îdareyan radestî wan bêne kirin, lê dema ku hêzeke 800 kesî ên fedayî bo piştevanîkirin ji hêzên akinciyê Xoyê bo wir hatin şandin, li gor raporan Şikak ber bi bilindahiyên derdora bajar vekişiyan, û ew rewşa aloz, bi bê xwînrijandin bi dawî hat.

Bi hejmar 1022 bo Wezaretxanê hate şandin û bi hejmar 6 bo Enqere û bi hejmar 69 bo Bexdayê hatiye dubarekirin.

## *Sefera Qazî Mihemed bo bakûrê Rojhilatê Kurdistanê*

Se`îd Humayon wisa nivîsiye:

Di naverasta meha Gelawêja 1946`an de Qazî Mihemed bi merema ji nêz ve dîtin û agehdarbûna ji arîşeyên Kurdan li bajarên Urmiye, Selmas, Kela Xwê û Makuyê, tevî çend kes ji karbidestên Komarê di berahiyê de çûne Urmiyê, û piştî mayîna du rojan li wir, bi nûner û kesatiyên bawerpêkir yên Kurd û Azerî û herwiha serokêlan re hevdîtin pêk anîne.

Herwisa bi dîtina karbidestên Komara Kurdistan û Dewleta Azerbaycanê, şîret û rênimayiyên pêdivî dane wan, da ku ji bo hevkariya zêdetir ya di navbera xwe de, bikarin ewlehî û tenahiya baştir û zêdetir ji bo xelkê bajar û gundên derdorê dabîn bikin.

Emerxanê Şikak ku bo pêşwaziya Qazî Mihemed çûbû Urmiyê, tevî Qazî Mihemed û şanda pê re ber bi Selmasê ve bi rê dikevin, û dema ku li ser rêya xwe nêzî Zindeştê (gundê Emerxan) dibin, li ser daxwaza Emerxan, Qazî Mihemed razî dibe, ku tevî şanda pê re herin Zindeştê.

Lê Qazî Mihemed berî ku here Zindeştê, li gundê Dermanawayê diçe ser tirbên eshabeyên Îslamê û bo wan fatihê dixwîne, û serdana Germik (kaniya ava germ û derman) a wir dike.

Piştre gava Qazî Mihemed digihîje nêzî Zindeştê, li ser rêya gund, xelkê wir ku wê demê di nav paletiya genimdirûnê de bûn, ji bo nîşandana keyfxweşiya xwe, bi coşek mezin û bi gurzên genim ve, pêşwaziya Qazî Mihemed û şanda pê re kirin.

Herwisa kurên Emerxan û siwarên Şikakan jî, ji bo pêşwaziya Qazî Mihemed, di kêleka rê de rêz bibûn, û bi teqandina fîşekan şahiya xwe bo hatina Qazî Mihemed nîşan didan.

Qazî Mihemed û şanda pêre, wê şevê wekî mêhvanên Emerxan li Zindeştê dimînin û li wir gelek serokêlên Şikak û Begzadeyan seredana Qazî Mihemed dikin.

Roja paştir Qazî Mihemed û şanda xwe tevî Emerxan û çend serokêlên Şikakan diçin Selmasê, û li wir jî Şikak bi pêşwaziyeke

mezin bixêrhatina Qazî Mihemed dikin.

Herwisa Azeriyên Selmasê jî wekî rêzgirtin ji dilpakiya Qazî Mihemed ji bo pêkanîna dostanî û yekîtiya di navbera Kurd û Azeriyan de, ew jî li dema pêşwaziya ji Qazî Mihemed amade dibin.

Piştre Qazî Mihemed û şanda pê re diçin bajarê Kela Xwê, û li wir jî Qazî Mihemed di hevdîtina bi nûner û karbidestên dewleta Azerbaycan û hêzên Kurdan re, pêdagiriyê li ser dostanî û yekîtiya Kurd û Azeriyan dike, û hêviya paşerojeke baştir bo herdu aliyan dixwaze. Piştre Qazî Mihemed digel şandeya pêre, berê xwe dide bajarê Makûyê.

Di rê de gava çavên Qazî Mihemed bi çiyayê Agirî dikeve, wekî rêzdarî ji serhildana Ararat û cangorêyên wê re, silavê li Agirî dike û dibêje: “Silav li te ey Agirî, tu baş bizane ku ew roj wê bihê, ku tu cardin bi agirê şoreşgerên xwe, coxîna hebûna dagîrkeran bikî xalîşînk”.

Li ser rêya Makûyê li Siyahçêşmeyê, êla Celalî û Xelkanlû digel Ermeniyên wir, bi coşek mezin pêşwaziya Qazî Mihemed dikin, û digel wan diçin Makûyê.

Qazî Mihemed sê rojan li Makûyê dimîne, û li wir jî bi Emer Axayê serokê eşîra Celalî, Şêx Hesenê Celalî, Ebdulla Axayê serokêlê Mîlan, û Hesen Axayê serokêlê Xelkanlû re hevdîtin pêk anîne, û ji nêz ve guhdariya wan kiriye, û ji daxwazî û arîşeyên wan agehdar bûye.

Piştre ji bo çareseriya kêşeyên wir û xizmeta baştir destûr û biryarên pêdivî dane karbidestên Komara Kurdistanê, û herwisa pêdagirî li ser rêzgirtin û parastina Azeriyên wir ji aliyê karbidestên Komarê ên di Makûyê de kiriye.

Piştr Qazî Mihemed ji bo serdana Aynalî Xanimê ku hevjîna serdarê Makûyê bû, diçe Qesra serdarê Makûyê, ku navê wî Îqbal Seltene (Qulîxan) bû, û berî çend salan ji aliyê Riza Şah ve hatibû kuştin.

Aynalî Xanimê di hevdîtina bi Qazî Mihemed re bi pêdagiriyeke zêde ve, Qazî Mihemed ji bo xwarina firavînê razî kiriye, û di baxçeyê Qesra xwe de pêşwaziya wan kiriye, û piştre jî pêşangeha

di nav Qesrê de nîşanî Qazî Mihemed daye, ku çend salan berê ew pêşangeha kevnar, ji aliyê karbidestekî mezin ê Îranî bi navê Emîr Ebdullahxanê Tehmasibî ve hatibû talankirin.

Bi vî awayî sefera deh rojî ya Qazî Mihemed û şanda pê re bo herêma bakurê Rojhilatê Kurdistanê, bandoreke erênî di nav xelkê wan deveran de bi cî hiştiye, û ev yek bibû egera pêkhatina yekîtî û dilgermiya akinciyên Kurd û Azeriyên wê herêmê.

## *Hewlên parastina nasnameya Kurdistanîbûna Urmiyê û derdora wê*

Herçend rêveberiya fermî ya bajarên Urmiye, Selmas, Makû, û Kela Xwê, di destê Azeriyan de bû, lê kontrola ewlehiya van bajaran, hertim di destê Kurdan de bû, û danîna karbidestên Azerî li wan bajaran, tiştekî rotînî û tenê ji bo merema siyasî û dijberiya Kurdan bû.

Jiber ku wê demê li Agirî û Makûyê (Emer Axayê Celalî û Şêx Hesen û Axayên Mîlanî, Delan û...hwd), li Selmasê jî (Qotaz Mamedî û Haciyê Etmanî û...hwd), li herêma Soma-Biradost û Enzelê jî (Emerxanê Şikak, Tahirxanê Simko, Nûrkoyê Ewdoyî, Ebasê Fenekî, Hesen Têlo û Şêroyê pisaxa û Hinare) û bi xasmanî li Urmiyê jî Zêro Begê Herkî, Nûrî beg û Reşîd beg, roleke berbiçav bo kontrola van bajaran hebûne, û hazir nebûne ku îdareya van bajaran bixin ber destê Hikumeta Azerbaycanê.

Li gor çavkaniyên Rûsî:

Di nava serkirdeyên Kurdan de kesên wekî Emerxan û Nûrî Beg, û Qotaz Mamedî û...hwd, bi kiryar û bi eşkereyî hewl didan ku ew bajar (Urmiye, Selmas, Kela Xwê, Makû) ser bi Komara Kurdistanê bin. Lewma hêzên çekdar ên Kurd di naverasta meha “April”ê de bi mebesta kuntrolkirina van bajaran, piştî derketina hêza Sor a Sovyetê ji wan deveran, ew herêm dorpêç kirine, û tenê piştî destêwerdana hêzên me çekdarên Kurd vegeryane herêmên xwe.

Di vê derheqê de, “Gerald Dooher” jî wiha dibêje:

Li 09.08.1946`an bi egera vê ku Azeriyan li gor lihevkirina bi Kurdan re xwe ji dayîna bac û seraneya dexlûdanê bajarên Urmiye û Selmasê vedizîbûn, yekîne û pêşmergeyên Komarê derdora Selmas û Urmiyê digrin, û li ser vê yekê Pîşewerî yekser daxwaza hevdîtinê bi Qazî Mihemed re dike.

Li 15.08.1946`an hêzeke mezin a pêşmergeyên bi Mela Mistefa

Barzanî re diçin çembera bajarê Miyanduawê, û hêzên Azeriyan jî bi top û tankan dikevin amadebaşiyê.

Li07-20.09.1946 `an hêzeke 500 kesî ji pêşmergeyên Şikakan bi fermana Emerxan ber bi Urmiyê ve pêşreviyê dikin, û derdora bajêr dixin bin kontrola xwe de, û piştre derbasî nav bajêr dibin, û li nav kolanên Urmiyê digerin.

Herwisa li 30.09.1946`an Zêro Beg bi darê zorê, derbasî baregeha waliyê Urmiyê dibe, û ji waliyê Azerî yê bi navê Refî`î dixwaze ku li gor lihevkirina Tewrêzê divêt hûn nîva karûbarên îdarî û dadweriya Urmiyê radestî Kurdan bikin. Lê walî direve avahiya telgerafxanê, û piştre cihgirê konsolê Sovyetê yê li Urmiyê bi navê Haşimov dikeve navberê, û di serî de fermanê dide Kurdan ku ji bajêr derbikevin.

Lê gava ku Zêro Beg xwe nedaye ber bicihanîna wê fermanê, Haşimov jê re gotiye; "Hekî hûn bi aştiyane ji bajêr derbikevin, ew jî wê hewl bide ku wê arîşeyê bi razîbûna herdu aliyan çareser bike". Piştî wan gotinên cihgirê konsolosê Sovyetê, hêzên Zêro Beg ji Urmiyê derdikevin.

Lê Emerxan hêzên xwe ji bajêr dernaxe, û di navbera hêzên Emerxan û Fedayiyên Azerbaycanê de, li derdora Urmiyê hin pevçûn rû didin.

Piştî gotûbêjeke çend rojî ya di navbera karbidestên konsola Sovyetê û Dewleta Millî ya Azerbaycanê tevî Emerxan û hin ji serokêlên Mihabadê, Azerî qebûl dikin ku bila Kurd jî di berpirsatiya hêzên ewlehiyê de li Azerbaycanê kar bikin, û emê budceyek mehane jî bo wan xerc bikin.

Li 25.09.1946`an tenê piştî derbasbûna du rojan bi ser wê lihevkirinê re, hêzên Emerxan li ser rêya Selmas û Urmiyê bazgehên wergirtina bacê datînin, û ji her kesî bacê werdigrin.

Li 27.09.1946`an Emerxan peyamekê ji fermandeyê Azeriyan yê li Selmasê re dişîne, û di peyamê de ji bo wî nivîsiye; "Emê roja 30`ê Îlonê bajarê Selmasê bi fermî li ser navê Komara Kurdistanê qeyd bikin".

Ev peyama Emerxan yekser digel dijberî û karvedana Haşimov û karbidestên Azerbaycanê rûbirû dibe, û Haşimov tevî Zêro Beg

ji Urmiyê ve diçin Selmasê, û Pîşewerî jî general û fermandeyên hêzên dewleta Azerbaycanê, yê bi navê Xulam Yehyaxan gazî dike, û wî erkdar dike ku ji bo berhingarbûna îhtimalî li dijî hêzên Emerxan, ji bajarê Zencanê vegere, û here Selmasê.

Piştre Haşimov diçe Zindeştê û li wir hewl dide bi axavtina tevî Emerxan, wî razî bike ku bêy tu mercekê dev ji daxwaziyên xwe ên derheqê Selmasê berde, lê Emerxan bi gotinên wî razî nebûye. Piştre Haşimov gefan li Emerxan dixwe ku ger bi pêşniyarên wan razî nebe, wê hezên Sovyetê destêwerdanê bikin.

Di encama sê roj danûstandina di navbera Emerxan tevî Haşimov û karbidestên Azeriyan de, Emerxan bi mercê wergirtina deshilata îdarekirina tewahiya karûbarên ewlehî, û bac û xeraca Selmasê, razî bûye ku hêza Pêşmerge ji Selmesê vekişîne.

Bi vî awayî bi zelalî xuya dibe ku Rûsan ji bo ku ew bajarên navbirî nekevin bin kontrola Kurdan de, tim alîgirî û piştgiriya Azeriyan kirine.

Di vê derbarê de Dr. Qasimlo di kitêba xwe ya bi navê (çil sal xebat ji bo azadiyê) de nivîsiye: Di sala 1946`an de dema ku şandên Hikûmeta Azerbaycan û Komara Kurdistanê li konsolxaneya Sovyetê ya li Urmiyê civînek li derbarê pirsgirêka bajarê Urmiyê pêk anîbûn, piştî gengeşeyeke dirêj, herdu alî derbarê vê ku Urmiye ser bi Hikumeta Azerbaycanê be, yan jî ser bi Komara Kurdistanê be, negihîştibûn ti encamekê. Lewma Zêro Begê Herkî ku endamê şanda Komara Kurdistanê di wê civînê de bûye, rabûye kursiyek di naverasta odeya civînê de daniye, û gotiye serkonsolê Sovyetê: “Cenabê Haşimov! niha ev ode ya te ye, ma dibe ku ez wî kursiyê xwe di naverasta odeyê de danêm, û bêjim ev ode ya min e?”.

Xuya ye ku armanca Zêro Begê Herkî, ew bûye ku bajarê Urmiyê di naverasta Kurdistanê de ye, û dormandorê wê jî hemû Kurd in, û nabe bibe pişkek ji Azerbaycanê, û dibe bikeve ser Komara Kurdistanê.

Piştî paşveçûna leşkerên Îranê, Tahirxanê Simko li eniya şer de maye, û Emerxan vegeriyaye Mihabadê, û li hevdîtina xwe ya bi Qazî Mihemed re basa rewşa xirab a Kurdan di herêmên Urmiye, Selmas,

Kotol, û Makûyê kiriye, ku ji aliyê Hikûmeta Millî a Azerbaycanê ve tên azardan. Wî ji Qazî Mihemed xwestiye ku li hember wan zordestiyên ku çekdarên Hikûmeta Azerbaycanê li Kurda dikin bêdeng nemînin. Herwisa Emerxan gotiye Qazî Mihemed, ew bajar û herêmên han beşeke sereke ji Kurdistanê ne, û divêt em bo vegerandina wan herêman ji bo ser Komara Kurdistanê xwediyê helwestek cidî bin.

Pêdivî ye were gotin ku Fedayî anku çekdarên Hikûmeta Azerbaycanê ku piraniya wan ji Hizba Tûde û Komonîst bûn, ji nerîn û helwestên Emerxan û Zêro Begê Herkî derbarê van herêman, gelek hesas û aciz bûne. Lewma çendîn caran plana girtin yan jinavbirina Emerxan û Zêro Beg danîne, lê serkevtî nebûne.

Ji aliyekî din ve Kurdên herêma Selmas û derdora wê çend caran şikayeta xwe ji reftara tund û nebaş a karbidestên Hikûmeta Azerbaycanê û Fedayiyên wir birine cem Emerxan, û ji wî xwestine ku çareyekê bo wê pirsê bike. Emerxan jî hişdarî daye berpirsyarên îdareya Hikûmeta Azerbaycanê, ku dest ji wan reftar û kiryarên dijminkarane ên xwe di herêmên Makû, Kotol, Selmas û Urmiyê de, li dijî Kurdan hilgirin.

Lê Fedayiyên Azerbaycanê guhê xwe nedane wê xwestika Emerxan, û paşê bi piştgiriya hêzên Rûsiyan gundê Zindeştê, ku wargeha Emerxan bûye, dorpêç kirine. Emerxan jî haziriya xwe bo şer kiriye, û dema ku Rûsiyan dîtiye Emerxan bo berevaniyê amade ye, biryar dane pê re gotûbêjê bikin.

Dema ku Emerxan û Rûsiyan hevdu dîtine, Emerxan gotiye wan, me çi dijberiyek bi dewleta Sovyetê re nine, û nabe hûn tagiriya Azeriyan li dijî me bikin, û hêzên xwe bînin ser me. Herwisa gotiye wan, me nakokî bi Hikûmeta Azerbaycanê re hene, û ew dixwazin herêmên me dagîr bikin. Emerxan gotiye Rûsiyan, ger hûn dostê me herdu aliyan in, pêdivî ye hûn bêaliyane navbeynkariya me bikin, da ew nakokiyên di navbera me de nemînin.

Bi vî awayî wextê ku efserê Rûs, ew gotinên mentiqî ên Emerxan bihîstine, dorpêça hêzên xwe li ser gundê Emerxan rakirine.

## *Têkiliyên siyasî ên Emerxan bi Sovyetî û Amerîkiyan re*

Li bihara 1946`an Dewleta Millî ya Azerbaycanê li ser bingeha planeke pawanxwazane ji bo dagîrkirina hin herêmên Kurdan, û destnîşankirina deshilatdariya xwe li van herêmên derdora Kela Xwê, Makû, Kotol, Selmas û Urmiyê, hewl daye hêza serbazî ya Fedayiyên xwe li van deveran bicî bikin.

Dema ku Emerxan haydarî wê pîlanê dibe, tevî Qotaz Mamedî û serokêlên şikakan, Celalî, Mîlan, Begzade û Herkiyan, li hember wê biryara dewleta Tewrêzê amadebaşî û seferberiya giştî ragehandine, û gef li karbidestên Tewrêzê xwarine, ku hekî Hêza Fedayiyên xwe bişînin van herêmên Kurdan, ewê rê nedin wan, û wê bi van re şer bikin.

Herwisa Emerxan bi rêya nameyekê ve Rûsî ji helwesta Kurdan ya li hemberî pîlana dewleta Tewrêzê bo dagîrkirina herêmên Kurdistanê agehdar kirine. Gava Rûsî ji helwêsta micid a Kurdan agehdar bûne, ji bo parastina rewşa heyî, hişdarî dane Kurd û Azeriyan, û derbarê çareseriya arîşeyên heyî de rêya danûstandinan bo herdu aliyan pêşniyar kirine.

Piştre êdî Emerxan ji bo wergirtina piştgiriya Amerîkayê, nûnerê xwe yê bi navê Akif Şerîfî dişîne Tewrêzê, û nerazîbûna xwe ji siyaseta Rûsan, ku bi zirara Kurdan piştgiriya Azeriyan dike, bi wan ragehandiye.

Herwisa Emerxan bi rêya nûnerê xwe ve ji konsolosê Amerîkî yê bi navê "Gerald Dooher" pirsiye: "Hekî Kurd bi yekcarî pêwendiyên xwe bi Rûsan re qut bikin, hingê Amerîka amade ye piştgiriya Kurdan bike?".

Konsolyar "Gerald Dooher" di bersiva nûnerê Emerxan de gotiye: "Heta ku Kurd xwe ji hikûmeta navendî ya Îranê dûr bigrin, bila ji Amerîkayê bêhêvî bin, lê hekî siyaseta serxwebûnxwaziya xwe biguherin bi wefadariya bi hikûmeta navendî, hingê dikarin ji Amerîkayê bihêvî bin, û emê di lihevkirina xwe ya bi Îranê re hewl bidin, ku hinek ji daxwazên Kurdan werin berçavgirtin".

**Belgeya hejmar: 89**

B. hejmar 50
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî
Rêkevt: 12.09. 1946
Nihênî, Wezîrê Derve, ewlewiyet

Yek ji sîxorên ku heya niha xeberên wî rast bûn, her niha ji Rizayiyê (Urmiyê) ve gihîşte vir. Ew radigehîne ku yekîneyeke biçûk ku yonîforma artêşa Komara Kurdistanê li xwe kirine, ji bo man û danîna serbazgeheke hertimî hatine nav bajar.

Ew di karwanserayekê de ku li heyama dagîrkariya Sovyetê serbazgeha (Artêşa dewletî) a navendî bû cihgîr bûne. Ew herwiha dibêje, li ser rêya Rizayiyê (Urmiyê) bo Xoyê tenê xaleke lêgerînê ya Azerbaycanê heye, ku ew jî di bin çavdêriya berpirsên Kurd de ye. Rozvelt û Mumaw, di dema serdana xwe de bo kurdistanê, li vê raporê hildikolin.

Bi hejmara 322 bo Tehranê hate şandin, û bi hejmar 246 bo wezaretxanê, û bi hejmar 155 bo Moskoyê hate dubarekirin.

Duher

**Belgeya hejmar: 90**

B. hejmar 51
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî, Tewrêz
Rêkevt:14.09.1946
Nihênî, Wezîrê Derve

Du çavkaniyên bawerpêkirî ên din jî (rapora pêwendîdar) piştrast kirin ku yekîneyeke leşkerî a artêşê, bi bêy vê ku tu astengek di hemberî wan de hebe, çûne nav Rizayiyê (Urmiyê). Li gor rapora yek ji raporthinêrên me, ji niha şûnda binkeya artêşa Kurdistanê divêt di vî bajarî de be, û Kurdan di nava ciwanên vî bajarî de dest kirine bi wergirtina xortan bo xizmeta leşkeriyê. Generalê artêşa Azerbaycanê yê bi navê Azer zêdetir ji sê hefteyan e ku li Tewrêzê ye, û piraniya xelkê li ser vê baweriyê ne ku ew êdî venagere Rizayiyê (Urmiyê), û kesên ku di van dawiyane de ji Mihabadê hatine, basa vê dikin ku hikûmeta Îraqê şopandina Barzaniyan tundtir kiriye, û hejmarek zêdetir ji malbatên vê êlê, ji sînor derbaz bûne û hatine nav Îranê. Konsolê Birîtanyayê dibêje ku Barzanî li herêma Şinoyê akincî bûn.

Bi hejmar 248 bo wezaretxanê, bi hejmar 327 bo Tehranê, bi hejmar 157 bo Moskoyê, bi hejmar 37 bo Bexdayê hate şandin.

Duher

**Belgeya hejmar: 91**

B. hejmar 52
Wezareta Karûbarê Derve, telegrafa hatî, Tewrêz
Rêkevt: 23.09.1946
Nihênî, Wezîrê Derve, ewlewiyet

Yek ji kesayetiyên olî ên Asorî ku pêwendiya wî bi mîsyonê Amerîkayî re heye dibêje: Nûçeyeke wî ya piştrastkirî heye ku Kurd bi bêy vê ku berbirûyê tu astengiyekê bibin, herî kêm nîva îdareyan girtine. Çavkaniyek din ku xatircem nine ji rastbûna nûçeya xwe, ragehandiye ku hêzên ku yonîforma artêşa Kurdistanê li xwe kirine, di nav bajar de dest bi ser serbazgeha artêş û hikûmeta Azerbaycanê de girtine. Ew rapora dikare şêweya aloz ya tevgerên bihorî ên Kurdan be, ku min li rapora 12`ê Îlonê de amaje pê kiribû.

Çavkaniyên hikûmeta Azerbaycanê bas ji vê dikin ku Kurdan li Miyanduawê bi awayekî nefermî pêşniyar kirine ku fabrîke û parzîngeha şekerê a li bajar bi Kurda were dayîn.

Bi hejmar 25 bo wezaretxanê, bi hejmar 333 bo Tehranê, bi hejmar 158 bo Moskoyê hate şandin.

Têbînî: Şandina peyamê kete derengiyê

**Belgeya hejmar: 92**

**B. hejmar 2-54**

Konsolgeriya Amerîkayê, Tewrêz, Îran.

11.10.1946

Nihênî, qedirgiran "George Allen" baloyozê Amerîkayê li Tehranê, Îran

Birêz balyozê hêja, min şanaziya vê yekê heye ku bi we ragehînim, ku serbarê hewla berdewam ya berpirsên konsola Sovyetê û berpirsên xwecihî ên Azerbaycanê, li Rizayiyê (Urmiyê) û Şapûrê (Selmasê) bo rêgirîkirina ji vê ku di dema serdana min bo Rizayiyê (Urmiyê) li 9 û 10`ê Çirriya Pêşîn, min karî ji çavkaniyên din zanyariyan bi dest bixim, lê bi hevkariya konsolê Tirkiyê li Rizayiyê (Urmiyê), û serokê êla Kurd a Mengur, min ew zanyariyên jêrîn kom kirin:

1-Cihgirê konsol Haşimof û cihgirê wî Elî Ekberof, berpirsên konsolî ên Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê), bi awayekî eşkere li raserî rojavayê gola Urmiyê destêwerdanê di nava karûbarê navxweyî ê Îranê de dikin. Ew berpirsên ku di dema hevdîtina fermî a duh a sibezû digel min de kêmekê jî serxoş bibûn, li cem wergerê min ew yek qebûl kiribûn ku hikûmeta Sovyetê ji bandora xwe bo gihîştina bi lihevkirinekê di navbera hikûmeta millî ya Kurdan û hikûmeta Azerbaycanê mifahê distîne. Yek ji nûnerên Emerxan li Şapûrê (Selmasê), ku duh li dema serdana min bo bajarê min hevrêyê min bû, gote min ku çar rojan berî niha fermandar Refî`î û Haşimov li Zindeştê -gundek ku baregeha Emerxan li wir e -çûye cem wî, û daxwaz jê kiriye ku ewê lihevkirina ku çar rojan pêştir bi amadebûna nûnerê Sovyetê di navbera Zêro Beg û Danişyan de hatiye wajokirin qebûl bike. Emerxan got: Min bi eşkereyî ew daxwaz ret kir, û min ragehand ku Zêro Beg nûnerê xelkê Kurd nine, û ji dîtingeha min ve, ew lihevkirin ji bilî kiryareke îxanetkarane ji aliyê Zêro Beg ê Rûsperest ve tu tiştekî din nine.

2-Berpirsên Sovyetê niha gelek guman li têkiliyên Qazî Mihemed

digel berpirsên Amerîkayî hene, û tewahiya raporan bas ji vê dikin, ku Sovyetê piştevaniya xwe ji Qazî Mihemed wergirtiye, û niha rû li Zêro Beg kirine, lê bi vî halî jî kesê amajepêkirî (Zêro Beg) wisa dixuye ku rojane ew metirsiya heye, ku ji aliyê Kurdên dijîkomonîst ve, ku wî wek xayînê neteweya xwe dizanin, rastî hêrişan bê. Tenê destêwerdana Haşimov bû sedema vê ku sê hefteyan berî niha yek ji serkirdeyên herêmî yê Kurd, li herêma Rizayiyê (Urmiyê) hêrişê neke ser baregeha Zêro Beg.

3-Sovyetî di danûstandinên xwe yên digel Kurdan de, bas ji egera vegera Artêşa Sor bo Azerbaycanê dikin, ew serokê Mengor ku pêştir min qala wî kir, dibêje ku hekî Qewam carek din bixwaze dosiyeya Îranê li Civata Ewlekariyê de bixe ber basê, hingê wê gelek Kurd amade bin ku derheqê vê gefê de şahidiyê bidin.

4-Di peymannameyekê de ku hefteya bihorî di navbera Hikûmeta Millî a Kurd û Azerbaycanê de hate wajokirin, biryar hate dan ku Azerbaycan salê 3 milyon Qiranî li hemberî xizmetên Kurdan bona dabînkirina aramiyê di Azerbaycana Rojava de bide wan. Rast e ku bi berçav birêveberiya bajar di destê berpirsên Azerbaycanê de dimîne, lê niha jî hin nûner ji aliyê Kurdan ve beşek ji avahiyên hikûmî û yek ji wan, cihê mana fermandehiya Rizayiyê (Urmiyê) kontrol dikin. Zêro Beg bo Emerxan bas kiriye ku armanca wî ji wajokirina vê peymannamê ew bû, ku hevdem digel vê ku Kurd bi rêberatiya Qazî Mihemed wê siyaseta aştiyane ya xwe bidomînin, ewê jî bikare pere ji Demokratan (ên Azerbaycanê) werbigre.

5-Emerxan digel dijberîkirina vê mijarê, daxwaz kiriye ku divêt hindî zûtir kontrola hemû herêmê bi Kurdan were dan. Emerxan pêdagiriyê dike ku ew peymanname bi bê vegerandina cem Qazî Mihemed bixwe, nedibû hatiba îmzekirin.

Refî`î û Haşimov bi berdewamî li navbera Rizayiyê (Urmiyê)-Zindeştê di hatûçûyê de ne, û daxwazê ji Emerxan dikin ku bi vê lihevkirinê razî be, lê nûnerê Emerxan li Şapûrê (Selmasê), gote min ku rêberê Şikakan, herwisa li ser gotina xwe pêdagir e. Wî herwisa got ku niha bas ji çûna ji nişkêve ya min bo ofîsa Danişyan tê kirin, di demekê de ku wek hertim mijûlî rawêjkarî û

danûstandinan digel Haşimov bûye, û paşveçûna ne gelek zelal a wî ji dergehê derve, di hemû kom û civînên li Şapûrê (Selmasê), bûye rojeva axavtinê.

6-Rewşa niha ligor dema şoreşa Demokratan, rewşa herî necihgir e. Qazî Mihemd bona rêgirtina ji serhildana hejmarek ji serokhozên Kurd, ji wan jî Şikak û Mengor li şûna hikûmeta herêmî a xwe, ji bandora xwe mifah wergirtiye. Lê êlên Kurd bêqerar in û wisa xuya dike ku Qazî Mihemed neçar be digel vê girûpê ji Kurdan bikeve ku dixwazin bi awayekî rasterast li dijî Demokratan tev bigerin.

7-Li gor gotina Emerxan, ew girûp ji hozên Kurd ku daxwazkarê rûbirûbûna rasterast in, ji aliyê Emîr Es`ed ve, ku di van demên dawîn de ji Tehranê hatiye Mihabadê, alîkariya darayî a hikûmeta navendî digihîje wan. Emerxan pêdagirî kir ku hekî Kurd li dijî Demokratan dest bo çekê bibin, heya wê dema ku komonîzm ji Îranê nehê derkirin -ku renge bi vê watayê be ku heta hemû Azerbaycan nekeve dest Kurdan de- çekên xwe dananên. Di egera şoreşeke wiha de Kurdan çavnihêriya vê yekê hene ku hejmareke zaf ji leşkerên artêşa Azerbaycanê cihê xwe biguherin. Ew gotûbêj û behsên ku min di rêya Rizayiyê (Urmiyê) de digel leşkerên Azerbaycanê hebûn, ez anîme ser vê baweriyê ku ev egera dûr ji çavnihêriyê nine. Tenê dijberiyeke çekdarane ku Kurd di hember xwe de dibînin, fedayî ne. Lê bi baweriya min heya berî dirûna hasilê (berhemên çandiniyê) renge heya çar mehan piştî vê yekê, ew şoreşa sertaserî ji aliyê kurdan ve nehête lidarxistin.

8-Sê hefteyan berî niha yek ji kargêrên siyasî ên Birîtanyayê ji sînorê Îraqê derbaz bûye, û wiha gotiye hejmareke mucahidên Kurd: (Hekî Kurd nîşan bidin ku yekgirtî ne, wê Birîtaniya behseke gelek girîng digel wan bîne ber bas). Her niha çar kes ji nûnerên Kurdên Îranê li Bexdayê, mijûlî danûstandina digel Îngilîzan in.

9-Hêza Kurd Rizayiye (Urmiye) bi cih hêlaye, lê bajar tejî ye ji Fedayiyên çekdar ên Kurd ku piraniya wan Şikak in, li Şapûrê (Selmasê) jî Kurdên çekdar mijûlî cewlê (geriyan û manovrê) ne, herçende hejmara wan kêmtir e.

Hizba Demokrat a Kurdan li Rizayiyê (Urmiyê) şaxeke wê heye, û ofîsa serheng Elî Axa Xusrewî nûnerê hikûmeta Mihabadê li Rizayiyê (Urmiyê) di binkeya fermandar Refî`î de ye. Konsolê Tirkiyê belgeyek nîşanî min da, ku wajoya Refî`î li ser bû, û tê de daxwaz ji Zêro Beg hatibû kirin, ku bacê ji beşek ji hevwelatiyên Tirkiyê wernegrin. (Ev belgename) selmînerê vê ye ku Kurd li herêmê, wekî birêveberên bacê, mijûl in û kar dikin. Wî gote min ku, serbarê lihevkirina wajokirî di navbera hikûmeta millî ya Kurd û hikûmeta Azerbaycanê, her yek ji êlên Kurd, bi awayê cuda zext xistine ser Refî`î ku bi awayê cuda digel wan jî peymannamê wajo bike. Min hebek ji wê peymannamê dîtiye. Her niha du kes ji nûnerên Emerxan li Xoyê akincî ne, û derheq pişka Kurdan di îdareya bajar de, mijûlî danûstandina digel fermandeyê wî bajarî ne.

10-(Hebûna) polîsê nihênî ê Demokratan li Rizayiyê (Urmiyê) hêşta jî eşkere û berçav e. Bi vî halî jî çûna min bo Rizayiyê (Urmiyê) û geriyana min a eşkere di nav bajar de, bi dengê bilind silogana "bijî Amerîka" û "Amerîkayî li vir in" ji aliyê xelkê ve li pey xwe hebû. Li her cihekî trombêla konsolxaneyê bisekinîbaya, xelk kom dibûn û piraniya wan hewl didan ku ji pencereyê ve destê min bigrin. Ji wan jî girûpek ji zabitên artêşa Azerbaycanê, Kurd û xelkê bajar bûn. Eyan bû dema ku diçim her cihekî, ji aliyê polîsê nihênî ê Firqeya Demokratan û karmendên nûneratiya konsolê Sovyetê ve, di bin çavdêriyê de me.

11-Nûneratiya konsolxaneya Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê), amêreke bihêz a hinardeya Radyoyê heye.

12-Sê kes ji kurên Simko, rêberê bihêz ê Kurd di şerê cîhanî ê yekem de, li Tirkiyê sînor derbaz kirine, û tevlî Emerxan bûne.

13-Wisa xuya dike ku Kurd ji wan sozên Sovyetê ku li Bihara bihorî dane wan, bêhêvî bûne.

14-Wisa xuya dike ku Emîr Es`ed, piraniya Kurdan û yek ji wan jî Qazî Mihemed razî kiriye, ku bexteweriya Kurdên Îranê di yekgirtina wan digel hikûmeta Îranê de ye, ku ew jî li jêr serperestiya Qewam de ye. Wî Kurd xatircem kirine ku heya dema ku Amerîka

û Birîtanya hebin, Sovyetî nevêrin vegerin Îranê.

Digel rêz û hurmatan

"Gerald Doher" Konsolyarê Amerîkayê

Li roja 22.10.1946`an cardin nûnerê Emerxan serdana konsolyarê Amerîkî dike, û jê re dibêje: "Min Emerxan ji naveroka peyama we agehdar kir. Ew amade ye li ser navê eşîretên Kurd yên li herêmên parêzgeha Urmiyê, bi mercekê wefadariya xwe bi hikûmeta navendî re rabigehîne, ku hikûmeta navendî jî garantiyê bide, ku wê di paşerojê de bi şêweyeke dadperwerane bi Kurdan re reftarê bike, û wê dev ji siyasetên tepeserkirinê li hemberî Kurdan berde. Hingê em jî amade ne bi wan re li hev bikin".

Herwisa nûnerê Emerxan ji konsolyarê Amerîkî dixwaze, ku bi rêya balyozxaneya Amerîkayê li Tehranê, vê peyama Emerxan bigehînin Serokwezîrê Îranê Qewam El-seltene.

Dema ku Amerîkiyan ew peyama Emerxan gehandine Qewam El-seltene, her çend Qewam El-Seltene ji niyetpakiya Emerxan di vê derheqê de biguman bûye, lê bi rêya nûnerê Amerîkî ve bersiva Emerxan daye, û gotiye: "Wefadariya Kurdan tenê bi rêya kiryarên wan ve, wê bihête hilsengandin. Hikûmeta min jî dixwaze pêşwaziyê ji her derfetekê bike, bo sererastkirina wan nedadperweriyên ku di serdema Riza Şah de derheqê eyaletên herêmî hatibin kirin, û wê ji wan re alîkar be".

Herçend di wê demê de Rûsan nexwestiye ku tu pêwendiyek di navbera Komara Kurdistanê û dîplomatên Amerîkî de hebe, lê Emerxan bi rêya Akif Şerîfî ê nûnerê xwe ve berdewam bi Amerîkiyan re têkilî hebû, û serbarê hinek mahne û astengiyên ku Rûsan li hember çûna dîplomatên Amerîkî bo seredana Qazî Mihemed dirust dikirin, lê Emerxan kariye dîplomat û karbidestên Amerîkî ji Tewrêzê bi rêya Urmiyê re ji bo hevdîtina digel Qazî Mihemed bişîne Mihabadê.

Di vê derheqê de "Archibald Roosevelt" rayedarê wê demê yê Amerîkî di nivîsên xwe de bi hûrî qala çawaniya têkiliyên Amerîkiyan bi Qazî Mihemed û Kurdan re kiriye. Bitaybetî li ser hewlên Sovyetiyan ên ji bo astengkirina têkiliyên Amerîkiyan bi Komara Kurdistranê re ravestiyaye.

**Belgeya hejmar: 93**

B. hejmar 55

Wezareta Karê Derve, Telegrafa hatî, 9749, Nihênî, 2541

Rêkevta wergirtinê: 08.11.1946

Ji Tehranê ve bo Wezareta Derve

Îro bo dîtina Qewam, min "Gerald Doher" digel xwe bir, da ku derheq rewşa niha ya Azerbaycanê zanyariyên nû bide serokwezîran. Duher pêdagirî kir ku seranên Kurdan, bi taybetî Emerxan û serkirdeyên Rojava (bakûrê Rojhilatê kurdistanê) û herwiha Qazî Mihemed, ji cîbicînebûna qewl û sozên Sovyetê derheq piştevanîkirina ji wan dilşikestîne, û gelek bi tundî li dijî komonîzmê ne, û amade ne ku digel hikûmeta navendî di hêrişa bo ser Azerbaycanê de beşdar bin, bi mercekê ku hikûmeta navendî wan xatircem bike ku çalakiyên leşkerî ên xwe digel wan hevaheng dike, û soz dide ku piştre heman siyaseta serkutkerane ya Riza Şah li hember Kurdan dest pê nake.

Qewam gelek bi hezkirin ve bala xwe da gotinên "Gerald Doher", û derheq hikûmeta Tewrêzê û serkirdeyên din, gelek pirs jê kirin. Qewam ragehand ku hekî bi zorê jî be, divêt bajarê Zencanê kontrol bike (...). Ez ser vê baweriyê bûm ku Zencan bi tenê bes nine, lê aliyê kêm destpêk e. Qewam got ku dixwaze kêm-kêm pêşreviyê bike. Misyonerekî Amerîkayî ku duh ji Tewrêzê vegeriyaye Tehranê, dibêje ku hêzên Tewrêzê li pêş Zencanê mijûlî lêdana çeperan in, û wisa xûya dike ku wê bergiriyeke qurs bikin.

George Allen

**Belgeya hejmar: 94**

(1946, bergê VII, rûpel 545)

Telegrama 846-11/00/891 li balyozxaneya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li Îranê (Birêz Alîn 1) bo Wezareta Derve Nihênî

Tehran, 08.11.1946

Ji Wezareta Derve bo cihgirê konsolê Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê li Tewrêzê (birêz Duhêr1)

Nihênî

Li bersiva telegrama 137, rêkevt 27.04.1946, 450-Min îro "Duhêr 2" digel xwe bire cem Qewam, da ku zanyariyên pile yek derbarê rewşa niha ya Azerbaycanê bidin serokwezîrê Îranê.

"Duhêr" pêdgirî li ser vê yekê dikir ku rêberên Kurd bi taybetî Emerxan serokê Kurdên Rojavayê Îranê, û renge "Qazî Mihemed" jî bi tundî li hember komonîzmê û Sovyetê dilsar bûne. Jiber ku Sovyetê ew hewcehî bo wan dabîn nekirine ku soz dabûnê, lewma ew amade ne ku digel dewleta navendî a Îranê hêrişê bikin ser Azerbaycanê, bi vê mercê ku dewleta navendî wan xatircem bike ku çalakiyên leşkerî ên xwe digel wan rêk dixe, û soz bide wan ku êdî siyaseta tepeserkirinê a Riza Şah derheq eşîrên Kurd nayê domkirin. Qewam axavtinên "Duhêr" gelek bi dilê wî bûn, û derheqê dewleta Tewrêzê û rewşa leşkerî a wir gelek pirsyar jê kirin, û got: Ew li ser vê yekê pêdagir in ku di heyama 10 rojan de, divêt Zencanê bigre, (ger pêdivî be, bi rêya hêza leşkerî ve).

Min Qewam xatircem kir ku siyaseta Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê bo piştevaniya ji yekparçeyiya xaka Îranê qet lerzok nebûye, û berevajiyê wan dengoyên ku min bihîstine ku gotina cudabûna Azerbaycanê ji Îranê di berjewendiya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê de dibe, jiber ku jehra komonîzmê wê di nav Îranê de jî bandorê dabinêt.

Bi her halekê be, min amaje bi vê yekê kir ku Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê bi zehmet dikare herwisa piştevaniya bêsînor ji yekparçeyiya xaka Îranê bike, hekî dewleta Îranê nîşan nede ku aliyê kêm derheq vê pirsê de digel me berjewendiya hevpar hene. Di

encam de min pêşwazî ji nerîn û şiroveya Qewam kir, ku dixwaze ji bo berfirehkirina deshilata xwe heya Zencanê, mifahê ji çavkaniyên berdest wergire. Min gote wî, bi nerîna min tenê girtina Zencanê ne bes e, lê aliyê kêm destpêkek e bo girtina cihên din. Qewam got ku vê gavê dixwaze tenê kêmekê here pêş.

Heyeteke Amerîkayî ku duh ji Tewrêzê vegeriyaye Tehranê, dibêje ku hêzên (hikûmetî) li Tewrêzê li derwazeya Zencanê çal hilkolîne, û wisa diyar e ku dixwazin bi tundî li hemberî hêzên hikûmeta navendî de bisekinin.

Allen

## *Nigeraniya Emerxan û Barzanî ji qedera Komara Kurdistanê*

Emerxan di wê demê de çendîn caran li civînên bi Qazî Mihemed û serkirdeyên Komara Kurdistanê re anîbû ziman ku, divêt em vê rastiyê li ber çav bigirin ku wê rojek were ku hêzên Mutefiqîn (Sovyet û Birîtanya) piştî serkevtin û misogerkirina berjewendiyên xwe wê ji Îranê derkevin. Lewma nabe em tenê pişta xwe bi wan qahîm bikin. Divêt em wê bêserûberiya di nav xwe de nehêlin û dema ku leşkerên Sovyetê çûn, bila em bikarin li ser pêyên xwe bisekinin.

Ger em wisa nekin, bi vê rewşa bêserûber ku niha me heye, û her kes xwe mezin dike û dibêje tenê ez û ez, bê şik û guman di dema hêrişa dijmin bo ser Komara Kurdistanê, ew kes xwe nedin bin barê berxwedanê. Ez nîgeran im, yên ku wisa xwe mezin dikin û tenê xwe dibînin, dema ku em berxwedanê bikin, wê zû dest ji berxwedanê berdin. Bêguman kesên wisa, wê di dema şer de zû alaya xweradestkirinê bo dijmin bilind bikin, û wê bibin sebebê rojreşî û bedbextiya miletê Kurd.

Di pirtûka Îbrahîm Şerîfiyê Memekanî a bi navê "Îlê Şikak der mesîrê hewadis" de, derheqê wê mijarê de wiha hatiye nivîsîn:

Dema ku Emerxan ji eniya şerê li Seqizê bo bêhnvedanê vegeriyabû Mihabadê, û di mala Mîrza Rehmet Şafî`î de bûye, ew agehdar kirine ku general Mistefa Barzanî tê, bona ku te bibîne.

Piştî çend deqeyan Barzanî ku nerihetî û perîşanî bi rûyê wî ve xûya bû, tevî çend parêzvanên xwe hatiye bal Emerxan. Piştî vê ku halê hevdu pirsîne, Barzanî bi dilekî tejî ji nerihetî û xembarî ve gotiye Emerxan, "General Emerxan! ev çi rewş e? Ev çi cure komar e? Ev komare bi vê rewşa bêserûber, qeleq, û lawaziya rêveberiyê, êdî dewamê nake, û wê Kurd û Kurdistan ber bi tevlîhevî û bedbextiyê ve here. Aya hikûmetdarî û birêvebirina komarê wiha ye?

Barzanî di doma axavtina xwe de, bi keserek kûr ve gotiye: "Emerxan! rast e ku em hemû Kurd in, û Kurdistan jî welatê me

hemûyan e, lê serbarî vê ku welatê me ji aliyê dagîrkeran ve hatiye parçe-parçekirin, ez nigeranê vê netebayî û netifaqiya di nav hin Kurdan de me. Lewma ger niha ez dijkiryarekê di hember vê rewşa bêserûber de ji xwe nîşan bidim, wê heman ew kes bêjin, me komar damezrand, lê Barzanî ji Îraqê hat, û ev komar têk da".

Herwisa Barzanî gotiyê: "Emerxan! ger ji tirsa lomeyên xelkê nebe, ev bêserûberiya ku di vê komara lawaz de heye, bo hindê dibe, ku şeqekê lê bidim, û di ciyê wê de hikûmeteke bihêz û rêkûpêk bo Kurdan çêbikim".

Emerxan jî piştî guhdarîkirina gotinên Barzanî, gotiye: "Cenabê Barzanî! Hemû gotinên te derbarî rewşa ku niha di komarê de heye rast in, û min jî heman nerîn û nîgeraniyên wek te hene".

Di havîna wê salê de dema ku Emerxan ji eniya şerê li Sera û Qarawe û Serdeştê, ji bo bêhnvedanê vegeriyaye mala xwe li Zindeştê, Tahirxanê Simko û Qotaz Mamedî, û Sofî Pakî û hin serokeşîretên Şikakan, digel hin pêşmergeyan di wan eniyên şer de mane.

Bi hatina Emerxan wekî her car xelk çûne dîwanxana wî, da ku ji rewşa komarê û silametiya pêşmergeyên Şikakan di eniya şer de jê bipirsin. Lê dîtine ku vê carê Emerxan nerihet e, û kûr di nav fikran de çûye, û çi gotinên xweş ji bo civata dîwanê nabêje.

Dema ku Keleş Pakî meznê Şipîranê tevî Senar Mamedî ji Emerxan pirs kirine, ku çima vê carê wiha nerihet xûya yî? Emerxan bi kesereke kûr ve gotiye wan: "Me Komara Kurdistanê û Hêza Pêşmerge û damûdezgehên dewletê çêkirin, lê bi vî awayê ku ez dibînim êdî paşeroja wê vala ye. Lewma êdî ezê jî piştî çend rojên din vegerim Mihabadê, û dev ji hemû berpirsayetiyên xwe berdim".

Piştî van gotinên Emerxan, Keleş gotiyê: "Qurban! be Komara Kurdistanê wê kulê (çi lê) bêt?". Emerxan bersiv daye û gotiyê: "Kîjan Komar?! êdî ev Komara me, wekî pişkeke biçûk ji dewleta Azerbaycanê tê bikaranîn, û Qazî Mihemed jî wekî qasidekî Pîşewerî rol dilîze. Berî çend rojan Qazî Mihemed piştî dîtina Pîşewerî, bilez ji Tewrêzê hatibû eniya şer û gote me, êdî dibe hûn xwe ji her cure şer û hêrişekê li dijî leşkerê Îranê biparêzin.

Herwisa Qazî Mihemed li gundê Serayê jî tevî general Rezm Arayê fermandeyê leşkerê Îranê hevdîtin kiriye, û êdî li wir kes bi kes e, û çi serûberî û nezma hêza Komara Kurdistanê nemaye, û her kes axa û padişahê xwe ye".

Piştî heyameke kurt ew nîgeraniya Emerxan û Barzanî derbarî rewşa lawaz û bêserûber a Komara Kurdistanê rast derket. Çend rojan berî dagîrkirin û hilveşîna deshilata Komara Kurdistanê, serokeşîretên Dêbukrî, Mengur, Mameş û Gewirk, ku berê bi Komara Kurdistanê re bûne, wextê ku dîtine êdî Qazî Mihemed dest ji biryara serbixweyî û berevanîkirina ji Komara Kurdistanê berdaye, wan jî zû wefadariya xwe bi dewleta Îranê ragehandine.

Di heman demê de Emerxan jî ku ew rewşa di eniya şerê li Sera a Seqizê de dîtiye, wî jî bi nerihetî ve biryara dest ji kar kêşana xwe ji generaliya Komara Kurdistanê û ji serkirdayetiya Hizba Demokrat bi Qazî Mihemed ragehandiye, û bi dilekî şikestî tevî hêza Şikakan vegeriyaye memleketê xwe.

Bi vî awayî ew hêza pêşmergeyên Şikakan ku bi eşq û mêrxasiyek girseyî çûbûne berevaniya komarê, û hazir bûne hemû cangorîtiyekê ji bo parastina Komara Kurdistanê bikin, lê bi melûlî û bêhêvîtiyeke mezin ve tevî Emerxan û serkirdeyên Şikakan vegeriyane malên xwe. Di heman demê de her yek ji wan pêşmergeyan bi awayekî basa bêserûberiya di nav berpirsên Komara Kurdistanê û herwisa destpêkirina pêwendiyên serokeşîrên Mihabadê bi karbidestê Îranê re dikirin.

## *Dawiya temenê Dewleta Millî a Azerbaycan û Komara Kurdistanê*

Piştî derbazbûna çend mehan bi ser lihevkirina di navbera hevpeymanên şerê duyem ê cîhanî û derketina leşkerên Sovyetê ji Îranê, Qewam El-seltene serokwezîrê hingê yê Îranê û “Joseph Stalin”ê serkomarê Sovyetê li ser pêdana îmtiyaza petrola bakûrê Îranê bi Sovyetê li hember vekêşana leşkerên Sovyetê ji Îranê û destberdana Sovyetê ji piştgiriya Komara Kurdistan û Dewleta Millî a Azerbaycanê li hev kirin.

Piştî lihevkirina di navbera Sovyet û Îranê de, di demekê de ku Sovyetiyan êdî pişta xwe dane Kurd û Azeriyan, Baqirov serkomarê Azerbaycana Sovyetê, destûr dabû Pîşewerî serkomarê Azerbaycana Îranê, ku li hember hatina hêzên Mihemed Riza Şah, ku bona haziriyên hilbijartina nûnerên parlemantoya Îranê têne Tewrêzê, çi dijkiryarekê ji xwe nîşan nedin. Pîşewerî tevî stûxwariya bo vê biryarê, di wê hevdîtinê de ku li Tewrêzê digel Qazî Mihemed hebû, ew biryar bi Qazî Mihemed jî ragehandiye.

Piştî vê ku êdî Sovyetê bi yekcarî pişta xwe dabû Azerî û Kurdan, Dewleta Millî a Azerbaycanê zû berev aşbetalî û hilweşînê çûbû. Li Kurdistanê jî cuda ji bandora neyîniya wê piştlêkirina Sovyetiyan, eşîrên wek Mengur, Mameş, Dîbokrî û çendîn kesayetiyên xwedîpêgeh ên Mihabadê jî, ku pêştir hêza sereke ya Komara Kurdistanê li Mihabadê bûn, wan jî bi sedema nezelaliya biryara Qazî Mihemed, û wê nîgeraniya ku wan ji siberoja xwe hebûne, derheqê domandina hevkariya xwe bi Komara Kurdistanê re dudil bûne, û piştre jî li dijî Qazî Mihemed ketibûne eniya dewleta Îranê de.

Di rewşeke wiha de êdî Qazî Mihemed ku tu hêviyeke wî bi dirêjîkêşana temenê Komarê nemaye, bona vê ku bikare derfetekê bibîne da ku pêşiya kuştina xelk bigre, di destpêkê de bi rêya Sedrê Qazî birayê xwe, ku endamê parlemana Îranê bûye, piştre jî bixwe rasterast digel hikûmeta Qewam El-seltene serokwezîrê Îranê dest bi gotûbêjan kiriye. Di encamê de li ser daxwaza Qewam El-seltene,

derheqê hatina artêşa Îranê bo Mihabadê bi hêceta dabînkirina ewlehiyê bo birêveberina hilbijartina parlemana Îranê, Qazî Mihemed razî bûye ku artêşa Îranê bête nav Mihabadê. Di hember de Qewam jî hinek sozên bê bingeh û hêvîbexş bo dabînkirina daxwaziyên herî kêm ên Kurdan daye Qazî Mihemed, lê piştre her tişt berevajî wan sozên hatinî dayîn derketiye.

Di wesiyetnameya Qazî Mihemed de jî, bi zelalî îtiraf bi vê rastiya tal hatiye kirin ku wiha kerem kiriye: "Baweriyê bi qewlên dijmin nekin, piştrast bin ger Ecem hingivînê jî bide we, diyar e jehr xistiye nav de".

Belgeya hejmar: 95



تلگراف جناب آقای نخست وزیر

آقای قاضی محمد

نظر باینکه طبق تصمیم اینجانب انتخابات بایستی باحضور قوای تامینیه اعزامی ازمرکز انجام شود وبایستی انتخابات منطقه کردنشین آذربایجان باهمکاری صمیمانه وعلاقمندی تام شما صورت گیرد لذا لازم است تعیین نمائید درخوی – شاهپور – رضائیه مهاباد که مناطق کرد نشین است چگونه شما باقوای تامینیه همکاری خواهید کرد که دستورات مشخص صادر شود.

با همکاری صمیمانه و علاقمندی خاصی که دراین مدت از شخص شماملاحظه شده منتظرم دراینقسمت که موضوع اکراددرین است علاقمندی کامل خودرا درپیشرفت امورعلا ارائه دهید.

نخست وزیر - قوام السلطنه

Deqa telegrafa Qewam El-seltene ji bo Qazî Mihemed
Çavkanî: (Rojnameya “Kuhistan”-hejmar : 72)
02.12.1946

Rêzdar Qazî Mihemed!

Bi berçavgirtina vê yekê ku li gor biryara min divêt hilbijartin bi amadebûna hêzên ewlehiyê ku ji navendê ve têne şandin bi rê ve here, divêt hilbijatina herêma Kurdakincî a Azerbaycanê bi hevkariya dostane û hogiriya temam a we, were encamdayîn. Lewra hewce ye hûn diyarî bikin li Xoy, Şapûr (selmas), Rizayiye (Urmiye) û Mehabadê ku herêmên Kurdakincî ne, hûn dikarin çawa hevkariya hêzên emnî bikin, da ku di vê derheqê de biryara pêdivî were dayîn. Li gor vê alîkariya dostane û hezkirina ku di vê heyamê de min ji we dîtiye, ez çavnihêr im hûn di vê mijarê de jî, ku pirsa Kurda di rojevê de ye, razîbûna tewaw a xwe ji bo pêşveçûna karê han ragehînin.

Qewam El-seltene
Serokwezîr

**Belgeya hejmar: 96**

B. hejmar 56
Konsolxaneya Amerîkayê, Tewrêz, Îran
07.12.1946
Bêsînor

Mijar: Bersiva Kurdan bi daxuyaniya serokwezîr li derheq vê ku, ew hêzên ku bo hemû herêmên Azerbaycanê hatine şandin, hêza parastina ewlekariya hilbijartinan in.

Rêzdar Wezîrê Derve, bi şanazî ve ez wergerandiya bersiva Qazî Mihemed rêberê Kurdan, ku tê de amaje bi daxuyaniya vê dawiyê a Serokwezîran Qewam hatiye kirin, bona agehdariya Wezareta Derve, ji we re dişînim. (Di vê daxuyaniyê de hatiye ku) hêzên Îranê bi armanca dabînkirina ewlekariya hilbijartina (dahatû, bihêt) a meclisê, bo hemû Îranê û ji bo Kurdistana Azerbaycanê jî têne şandin. Kurtiya axavtina Qazî Mihemed ew e ku nabe tu hêzekê bişînin, jiber ku tu hewcehî bi wan hêzan nine, û Kurd bi xwe dikarin parastina ewlekariyê bigrin stûyê xwe. Ev bersiva 29`ê Çirriya Paşîn a 1946`an li Azerbaycanê, di rojnameya fermî a Demokratan de hatiye belavkirin.

Digel rêz û hurmetan
F. Lester Satton
**Konsolê Amerîkayê**

**Belgeya hejmar: 97**

B. hejmar 58
Wezareta Karê Derve, telegrafa hatî, Nihênî, 3965
Rêkevta wergirtin: 13.12.1946
Ji Tehranê ve, ji aliyê Wezareta Şer bo Wezîrê Derve
Hejmar 1589

Demjimêr 3`ê paşnîvro Monsînyor Papalardo kefîlê nûneratiya Pap li Îranê daxwaz ji balyozxanê kiriye ku bona pêşgirî ji her cure reftareke kirêt li hemberî kêmaniya Mesîhî û Kelîmî li Azerbaycanê û bi taybetî li herêma Rizayiyê (Urmiyê) û Şapûrê (Selmasê) di heyama piştî xweradestkirina Demokratan (Fîrqeya Demokrat a Azerbaycan), ji têkilî û hevkariyên xwe mifahê bistînin.

Di heyama tevgerên pêşîn de, alozî û tevliheviyên di wê herêmê de, ku wek metirsiyeke sereke, gef li Mesîhiyan dikir, ji aliyê Kurdan ve bû. Kerema xwe hemû hewla xwe bidin bona pêwendîgirtina digel nûnerên Emerxan û Qazî Mihemed li Tewrêzê, û bibîranîna wan qewl û sozên ku wan herduka dane, ku li egera serhildana tevliheviyên navxweyî, Mesîhiyên herêmên Kurdakincî, tu zirarek negihîje wan. Cuda ji vê yekê jî bînin bîra wan, ku hikûmeta Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê bi taybetî ji reftara xirab li hember kêmaniya Mesîhiyan nîgeran e, jiber ku hejmarek ji hevwelatiyên ku di koka xwe de Asûrî û Ermeniyên Amerîkayê ne, û di herêmên li jêr deshilata Kurdan de akincî ne, pêşniyar hatiye kirin ku daxwaz ji deshilatdarên herêmê were kirin, ku bona parastina van kêmaniyan ji tu hewlekê xemsariyê nekin.

Papalardo her niha xatircemî ji Îranê wergirtiye, ku bona parastina kêmaniyan fermana taybet bo fermandeyên leşkerî tê şandin, lê heyama metirsîdar, dema berî vegeriyana aramiyê bo seranserê herêmê ye, ku di vê heyamê de hinek alî dixwazin ku kêmaniyan azar bidin û ji aloziyê bona gihîştina bi armancên xwe mifahê wergirin.

Bo Tewrêzê hate şandin -George Allen

## *Xatirxwastina  Mela Mistefa Barzanî û Qazî Mihemed*

Dema ku Barzanî ji biryara Qazî Mihemed bo desthilgirtina ji berxwedan û xweradestkirina bi Îraniyan agehdar dibe, dizane ku êdî qedera Komara Kurdistanê gihîştiye xala dawiyê. Barzanî di dema şevê de bona hevdîtina dawiyê diçe cem Qazî Mihemed û piştî gengeşeya dawî pêşhatan û xatircembûna ji wê biryara Qazî Mihemed, Barzanî gotiye: “Heya dema ku pêşeroja me zelal nebe, em neçar in ku çekên xwe biparêzin û  rêya çiya bigrin pêşiya xwe. Lê derheq xweradestkirina we bi dewleta Îranê, ez nîgeranê silametiya we me”. Herwiha daxwaz ji Qazî Mihemed kiriye ku hekî digel wan bimîne, ew amade ne bi hemû şiyana xwe, xizmeta wî bikin û silametiya wî biparêzin.

Qazî Mihemed jî bi Barzanî radigehîne ku tevî hemû metirsiyekê ku renge hebe, ew amade ye ku bona parastina silametiya xelkê Mihabadê, û bi cî gehandina wê soza ku di dema ragehandina Komara Kurdistanê de dabû xelkê xwe, ku ewê hemû berpirsayetiyên avakirina Komara Kurdistanê bigre stûyê xwe, wê wefadar bimîne, û çi dibe bila bibe.

Di vê derheqê de li bîreweriyên Mihemed Emîn Qadiriyê Kolîç, di pirtûka “Komeleya J-K heya Komarê” de wiha hatiye nivîsîn:

Di dema xatirxwestinê de Qazî Mihemed alaya Kurdistanê hildigre û maçê dike û dide destê Barzanî û dibêjê: “Alaya Kurdistanê li cem xwe ragire. Hêvîdar im ku hûn nehêlin ev alaya pîroz bikeve erdê. Barzanî jî alayê ji dest Qazî Mihemed werdigre û maçê dike û li ser serê xwe dadinê, û soz dide ku ne tenê nahêle ew ala tu demekê bikeve, belkî wê rojekê vê alayê cardin bilind bike”.

Piştre ew serokeşîrên ku heya wê demê digel Komara Kurdistanê mabûn, ew jî bi bihîstina vê biryarê bêhêvî bûne, û gotine madam ku Qazî Mihemed dev ji biryara berxwedanê li hember hêzên Îranê berde, êdî qedera me wê çi lê bê, û emê çi bikin?!.

Hêjayî gotinê ye ku heyamekê berî wê demê, dema ku Emerxan dev ji berpirsayetiyên xwe li Komara Kurdistanê berda, û digel

hêzên Şikak vegeriyabûne herêmên xwe, bo parastina silametiya xwe û Şikakan têkilî digel general Rezmara karbidestê payebilind ê Îranê danîbû. Hingê xelkê gilî û gazinde li Emerxan dikirin û digotin ku çima Emerxan wiha kir?. Lê dema ku xelkê dîtin li 16.12.1946`an Qazî Mihemed digel Hacî Baba Şêx û Seyfê Qazî bo pêşwaziya ji sertîp Homayonî fermandeyê paynizimtir ê hêzên Îranê çûne Miyanduawê, û niyetpakiya xwe bona radestkirina Mihabadê bi bê şer bi wan ragehandiye, êdî tu kesî Emerxan lome nekiriye, û çavnihêr mane ku Emerxan bikare di siberojê de bo silametiya wan çi karekî encam bide, û pişta wan bernede û wan bi cih nehêle.

Bi vî awayî hêzên Îranê li 17.12.1946`an, bêy vê ku berbirûyê tu bergiriyekê bibin, bajarê Mihabadê dagîr dikin, û dawiyê bi temenê Komara Kurdistanê tînin. Piştre Qazî Mihemed û Seyfê Qazî û Sedrê Qazî digel komeke karbidestên Komara Kurdistanê ji aliyê artêşa Îranê ve têne destbiserkirin û bo dadgeha leşkerî têne veguhastin.

Bi vî awayî ew komara ku sembola îradeya neteweyî û xewna hemû welatparêzên Kurd bû, piştî 11 mehan ji temenê zêrîn û pirdeskeft ê xwe, bi sedema piştevanînekirina Sovyetiyan ji Komarê û pênedana çek û teqemeniyên hewce bona bergirîkirinê, û herwiha aşbetala serkirdeyên Dewleta Millî a Azerbaycanê û rûxana wê hikûmeta ku hevpeymanê Komara Kurdistanê bû, ji aliyekî din ve bi sedema lawaziya jêrxana Komarê di warê pêkhateya civakî, perwerdehî, aborî, nebûna yekrêziya neteweyî, nebûna îradeya berxwedanê, û piştlêkirina beşek ji serokeşîran, di nava terajidiyeke xembar de şikest xwariye.

**Belgenameya hejmar:98**

THE KURDISH MINORITY PROBLEM
CENTRAL INTELLIGENT AGENCY
Published on 8th December 1948

Kêşeya kêmaniya Kurd
Rêkxirawa Îstixbarata Navendî

Rûpela 10, Beşa 2

Dewleta Kurdî a Mihabadê îhtîmal hebû ku bibûya navenda mezin a "Kurdistanê", lê tenê çend heyvan berdewam kir. Nakokiyên di navbera Kurdan û "Komara gelên Azerbeycanê" de sedema cûdabûnê bûn. Daxuyaniyên Hikûmeta Mihabadê ji bo deshilatdariya fermî li ser axa Îranê, ji rojavayê Seqizê heta Başûrê sînorê Sovyetê û Miyanduawê bû.

Bi sedema nakokiyên qewmî ên di navbera hikûmeta Azerbeycanê û Kurdên Mihabadê de, hin pevçûnên mezin çêbûn. Aciziya Kurdan ji têkiliyên taybetî ên karbidestên leşkerî ên Sovyetê ku bi rejîma Azerbeycanê re hebûn çêbibû.

Lê sedema herî girîng ya sernegirtina sozê Sovyetê ji bo rizgariya Kurdistanê, nigeraniya Sovyetê ji siyaseta Amerîka ye li dijî Sovyetê. Emerxan gelek zû û bi eşkere hem dijberiya siyaseta Sovyetê kir, û hem jî, ji serokatiya Partiya Demokrat nerazî bû. Serokeşîrên din jî, bi helwesta Şikakan re bûn. Lewma êdî Qazî Mihemed bandora xwe ji dest da.

Ji aliyekî din ve Serokwezîr Qawam jî lez ji rûxandina dewleta Kurdî kir, û soz da ku hekî Kurd piştgiriya damezrandina deshilata navendî bikin, ewê hin îmtiyazên baş bidin Kurdan. Bi vî awayî di Kanûn 1946`an de, piştî ku artêşa Sovyetî paşve vekişiya, hêzên Îranî ber bi Azerbaycanê û "Kurdistanê" meşiyan, û herdu hikûmetên serhildêr hilweşiyan. Rêberê Azerbaycanê Pişewerî reviya û çû Yekîtiya Sovyetê, û Qazî Mihemed jî xwe radest kir, û piştre tevî bira û pismamê xwe hatin îdamkirin.

**Belgeya hejmar: 99**

B. hejmar 1-59

Beşa derve ya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê, balyozxaneya Amerîkayê, Tehran, Îran

15.01.1947

Nihênî

Mijar: Şandina rapora guherînkariyên siyasî li nav Kurdên Îranê, di sala 1946`an de

Rêzdar Wezîrê Derve yê Waşingtonê

Bi şanazî ve ez rapora konsolyar Grald F.P. Duher li jêr serxetê "guherînkariyên siyasî li nava Kurdên Îranê di sala 1946`an de dişînim. Konsolyar "Gerald Doher" li meha Adara 1946`an bû fermanberê konsolxaneya Tewrêzê, û ji 23`ê Hezîranê heya 1`ê Çirriya Paşîn a 1946`an serperestiya wir li stûyê wî bû. Wî di serdema berpirsayetiya xwe de çendîn sefer bo herêmên Kurdakincî hebûn, û digel beşeke zêde ji serokêlan û rêberên Komara Kurdî a li jêr piştevaniya Sovyetê li navçeya Mihabadê nasyariyeke tewaw peyda kir. Piraniya wan zanyariyên ku di vê raporê de hatine, li heyama sala bihorî û di qalibê telegrafê de ji Tewrêzê hatine şandin. Lê bi baldan bi herifîna ji nişkêve a hikûmeta Demokratên destçêkirî a Sovyetê li Azebaycanê, û bêhelwestiya Kurdan di vê navberê de ku bandora xwe li ser vê herifînê hebû, me meslehet zanî ku bona nasîna hokarên bibandor ên jinavçûn û herifîna bereya nifûza Sovyetê li nav êlên Kurd ên bakûrê Îranê di sala 1946`an de raporeke giştî bê amadekirin.

Rapora konsolyar "Gerald Doher" wek zelalkirineke binirx derbarê vê mijara girîng, ez pêşkêşî we dikim.

Digel rêz û hurmetan

"George Allen"

Balyozê Amerîkayê

Hevpêç : Rapora rêkevta 15.01.1947`an

**Belgeya hejmar: 100**

Rapora hejmar 2-59

Balyozxaneya Amerîkayê, Tehran, Îran, Nihênî

15.01.1947

Guherînkariyên siyasî li nava Kurdên Azerbaycanê di sala 1946`an de

Amadekirî ji aliyê Grald F. P. Duhêr konsolyar

1)-Beşdariya Kurdan di şoreşa Azerbaycanê de

2)-Komara Mihabadê

3)-Guherîna helwesta Kurdan li hemberî Azerbaycan û Sovyetê

4)-Destpêka pêwendiya Kurdan û berpirsên konsolxaneya Amerîkayê

5)-Pevçûna Kurdan û artêşa hikûmeta navendî

6)-Şêlûbûna zêdetir a pêwendiyên di navbera Kurd û Azerbaycanê de

7)-Sedema şikesta siyaseta Sovyetê li hemberî Kurdan

8)-Pêwîstiya hikûmeta Îranê bi siyaseteke jîrane li hemberî Kurdan

(Hevpêçên yek heya çar)

**1)-Beşdariya Kurdan di şoreşa Azerbaycanê de**

Li destpêka hatina Artêşa Sor bo nav beşa bakûrê Îranê di sala 1941`an de, deshilata hikûmeta navendî a Îranê li ser hozên Kurd ên rojavayê Azerbaycanê bi kiryar ji nav çû. Li hinek ji gundên Kurdnişîn ku li tenişt bajarên Meraxe, Miyanduaw, Rizayiyê (Urmiyê), Şapûr, Xoy, û Makûyê ku li dirêjahiya peravên rojava û başûrê gola Urmiyê hilketibûn, serbazgehên Artêşa Sor heya radeyekê deshilat bi ser herêmê de hebûn, lê ew hozên li bilindahiyan û çend km dûrtir ji wan rêyan dijiyan û li dewra gola Urmiyê bûn, ji nû ve bi awayê sunnetî (kevneşopî) vegeryane ser jiyana xwe ya eşîrtiyê. Wate rê û şêwazek (a jiyanê) ku heya berî pêşreviya artêşa dagîrker a Sovyetê

di sedsala bihorî de, ji aliyê hikûmeta navendî ve ji nav çûbû.

Bi dirêjahiya sê salên destpêka dagîrkariya wê herêmê ji aliyê Artêşa Sor ve, Sovyetiyan bona nêzîkbûna siyasî bi êlên Kurd, heya nîva duyem a sala 1945`an hinek pêngavên nivîşkan ji bo dûrkirina Kurdan ji hikûmeta navendî hilgirtin, lê planeke bihêz nehate dariştin. Renge eva ku Kurdên Azerbaycanê di piraktîkê de li jêr deshilatdariya hikûmeta Tehranê derketibin, di vê derheqê de bêbandor nebûbe.

Li payîza 1946 an hevdem digel destpêkirina karê berpirsên konsola Sovyetê li Tewrêzê bona rêkxistina Firqeya bi nav Demokrat a Azerbaycanê, ku li jêr serperestiya koçberekî Îranî bi navê Ce`ifer Pîşewerî de bû, Major general Atakîşyov yek ji wan kargêrên siyasî ku ji Bakûyê hatibû şandin, zincîre serdanek bo Mihabadê dest pê kirin. Girûpek ji Kurdên Îranî, Îraqî û Sûrî, ku di hizra avakirina Kurdistana mezin a Serbixwe de bûn, li wir kom bibûn. Rêberê wê girûpê Qazî Mihemed dewlemendekî Kurd bû, ku ser bi malbateke xweşnav a wê herêmê bû, û di warê olî de bandora wan heya bakûr û nêzî sînorên Sovyetê dom hebû. Rakêşana bala vê girûpê bona karkirin bi awayê desteya destpêkî bo pêkanîna “tevgereke millî” a Kurdî, ku dibû hevdem be digel “hikûmeta millî” a Azerbaycanê ku Pîşewerî û hevkarên wî li Sovyetê mijûlî rêkxistina wê bûn, armanca sereke ya seferên berdewam ên general Atakîşyov bo Mihabadê bûn.

Bi sedema cudahiya boçûnên siyasî di nava sîstema êlan, û gumana piraniya serokêlên Kurd li hemberî armancên Sovyetê bona piştevaniya ji Hikûmeta Millî a Kurd, plana Rûsan di vê herêmê de li çav herêmên din ên Azerbaycanê ku xwediyê sîstemeke îdarî bûn, berbirûyê sistî û dijwariyê bû. Li Azerbaycanê kêşe tenê derxistina deshilatê di destên berpirsên Îranî de bû, lê armanc di herêmên Kurdnişîn de, ew bû ku diviya her di bingeh û kokê de, hikûmeteke nû bihê avakirin, û deshilata wê bo wan herêman jî belav bibe, ku çend sal bû li jêr tu deshilateke derekî de nebûn.

Hevdem digel avakirina Firqeya Demokrat a Azebaycanê, Partiya Demokrat a Kurd jî hate avakirin, lê di demekê de ku Pîşewerî li jêr

serperestiya  komek serokan de bû, ku beşek ji wan yan ji girûpek ji koçberên Îranî pêk hatibûn ku bi salan bû li Yekîtiya Sovyetê jiyabûn, û digel bîr û baweriya komonîstî nasyar bûn, yan ji wan hevwelatiyên Azerbaycana Sovyetê bûn, û ji aliyê din ê sînoran ve hatibûn. Partiya Demokrat a Kurdistanê diviya rêberên xwe di nava serokêlên navdar û kesayetiyên diyar û naskirî ên ayînî de hilbijêre, ku ne tenê cîhanbîniya komonîstî qebûl nedikirin, belkî jê halî jî nedibûn.

Di dawiyê de wê desteya kargêrî ku serkirdayetiya Partiya Demokrat a Kurdistanê girte stûyê xwe, cuda ji Qazî Mihemed ku serokatiya wê girtibû stûyê xwe, pêk hatibû ji milkdarên mezin ên Mihabadê û derdora wê, Hacî Babe Şêx kesayetiyê ayînî ê navçeya Mihabadê, Emerxan serokê êla bihêz a Şikak û milkdarê herî girîng ê rojavayê Azerbaycanê, ku di serdema bihêzbûna xwe de yek ji girûpên gelek gelek bêrehm û talançî ên Kurd rêberatî kiribû, û herwiha komeke kesayetiyên paşvemayî ên wek wan. Cuda ji vê yekê jî bona rakêşana piştevaniya Kurdan, tiştek cuda ji soza azadî, û wekhevî û biratiyê û ...hwd li jêr deshilata Sovyetê de hewce bû. Kargêrên siyasî ên Rûs tê gihîştin ku ji bilî rêya şandina berdewam û çek û teqemenî û pere, riyeke din bo rakêşan û hevkariya Kurdan nine.

Rêkxistina hikûmeta xwecihî a Kurdan hêşta di qonaxên destpêka xwe de bû, ku Sovyetî gihîştin vê encamê, dema wê hatiye ku li Tewrêzê “hikûmeta Millî a Azerbaycanê” di cihê hikûmeta herêmî a Îranê de were bicihkirin. Şêweya formgirtina şoreşa Oktober-Desamber a 1945`an a Azerbaycanê û herifîna sîstema bi nav demokratîk, û encama wê şoreşê piştî salekê, bixwe mijara raporeke cuda dibe. Tenê rola çalakên Kurd di vê şoreşê de vedigere ser çend pevçûnan li Rizayiyê (Urmiyê), ku tê de girûpeke şervanên ser bi Partiya Demokrat û hêzên Artêşa Sor û yekîneyên nerêkxistî ên Kurdan, di dema hêrişa bo ser serbazgeheke artêşa Îranê, dest dane destê hevdu. Girîngiya vê bûyerê derheq rewşa siyasî a Kurdan di vir de bû ku hêsankarî bo pêkanîna Komara kurdistanê kir, û lez lê kirin.

Serokêlên Kurd dema ku dîtin ji aliyê serbazgeha dewletê ve tu bergiriyeke wisa nehate kirin, û Artêşa Sor jî bi eşkere piştevaniyê ji destbiserdegirtina îdareyên hikûmetî ji aliyê şoreşgerên Firqeya Demokrat ve dike, Kurd jî gihîştin vê encamê, ku berbirûbûna digel hêza teyar û bihêz a Sovyetê, bo wan xwekujî ye. Lewra tenê rêya ku ji wan re maye, ev e ku tevlî wê plana Sovyetiyan bibin ku dixwastin hikûmeteke Kurdî a guhdar û girêdayî wan bi rêbertiya Qazî Mihemed were avakirin.

**2)-Komara Mihabad**

Li destpêka Şibata 1946`an heyameke kurt piştî cihgirbûna rêkxistinên Firqeya Demokrat a Azerbaycanê bi piştevaniya çek û teqemeniyên Artêşa Sor, Qazî Mihemed jî pêkanîna komareke xelkî a Kurdî bi navendîtiya Mihabadê ragehand. Herêmek ku wê hikûmeta xolamok, wek beşek ji xaka di bin deshilata xwe de ragehandiye, hemû beşa Rojavayê gola Urmiyê li xwe digre heta herêmên Xoy, Makû li bakûra gola Urmiyê, û li nêzî sînorê Yekîtiya Sovyetê, herêmên derdora Mihabadê heya Başûr û ber bi herêmên Serdeşt û Seqizê, û berev Rojava (ya dirust Rojhilat e) û heta Miyanduawê û van sê bajarên navbirî.

Ew herêmên ku ji aliyê komara gelê Kurd ve hatiye îdi`akirin, ew digel Hikûmeta Millî a Azerbaycanê tûşî kêşeyan kirine. Hikûmeta navbirî deshilata Kurdan, bi ser herêmên Makû, Xoy, Şapûr, Rizayiyê (Urmiyê) û Miyanduawê de bi fermî nas nedikir, û bi kiryar komara navbirî bi beşeke biçûk ji çarmedorê Mihabadê sînordar kiribû.

Bi vî halî Qazî Mihemed di cihê wê de ku, bilez li pey xwestekên Kurdan de be, hewl dida hêdî-hêdî nifûzê bike nava wan herêman, û di vê navberê de hemû şiyana xwe bi kar bîne bo wê ceribandina nû û bêmînak a dîroka Kurd, wate rêkxistin û pêkanîna hikûmeteke Kurdî, ku xwediyê kabîneyeke birêveberî û civata yasadanîn û artêşeke hemşêwe ya biserûber bû. Girûpek ji xizmên Qazî Mihemed, yek ji Kurdên xwendewar ên herêma

Mihabadê, û hejmarek ji Kurdên dûrxistî ên herêmên din ên Îran, Îraq û Sûriyê endamên kabîneya Komarê pêk tînin. Helbet tewahiya kabîneya wezîran di bin bandora Qazî Mihemed de ye, ku xwe wekî serkomarê vê hikûmetê daye nasandin. Komeleya yasadanîna vê rêkxistinê ku xwe wek Meclisa neteweyî a Kurd dide nasîn, li jêr serperestiya Hacî Babe Şêx ji kesayetiyên olî û navdar ên Kurdistana navendî de ye. Bi sedema vê ku Qazî bi alîkariya şêvirmendên Sovyetê û herweha bi tena serê xwe hemû deshilat di destên wî de bû, wê meclisê tenê rengûrûyeke formalîte hebû. Herweha bi sedema girêdayîbûna vê hikûmetê bi piştevaniya serokhozên Kurd ên Azerbaycanê (parêzgeha Urmiyê) ku li dervey deshilatdariya Mihabadê dijiyan, bi taybetî êlên Şikak, Beygzade, Herkî, Zerza, Dîbokrî, Mengor, Mameş, Celalî, û Mîlan, bû sedema vê ku herêma deshilata wê hikûmetê li çav Hikûmeta Firqeya Demokrat, gelek bertengtir bibû.

Pêkanîna artêşa cemaweriya Kurdî, yek ji ezmûnên herî balkêş bû ku Qazî Mihemed hewl jê re da. Disîplîn û rêkxistin, du mînakên wan taybetmendiyan in ku Kurd digel de biyanî ne. Ceribandinên jandirmirî a Îranê di çend salên bihorî de, derheqê wergirtin û damezrandina hejmareke Kurdan wek beşek ji hêza rêkûpêk a xwe, ev mijar piştrast dikir. Di demekê de ku wan bona birêvebirina erk û berpirsatiya diyarîkirî gelek baş kar dikirin, lê pêbendî tu disîplînekê nebûn, û nedikarîn di nava serbazgehekê de bijîn.

Qazî Mihemed têgihîşt ku ew hêzên ji bajaran hatine wergirtin û damezrandin, zêdetir digel karê rêkxistinî û disîplînê xwe rêk dixin, heta Kurdên eşîretî, lewma jî artêşa wî zêdetir ji Kurdên bajarî, û gundiyên Asûrî, û têkeliyeke biçûk jî ji Kurdên eşîretî pêk hatibû, bona vê ku ruha şervantiyê di nav vê hêzê de tim xurt e. Çek û teqemenî û cilûberg û hewcehiyên leşkerî ên wan hêzan ji aliyê Sovyetê ve dihate dabînkirin. Avakirina dezgeheke radyoyî, ji bo Radyoya Mihabadê, û belavkirina rojnameyeke Kurdî, yekek din ji wan afirandinan bû, ku bi alîkariya Rûsan hate nav jiyana Kurdan. Li tenişta van rêyan, Artêşa Sor piştî vekişiyana ji Îranê li meha Gulana 1945`an, amûreke radyoyî a bihêz da destê hikûmeta

Firqeya Demokrat a Azerbaycanê, ku hemû rojê êvaran programa Kurdî jî belav dikir.

**3)-Guherînkariya helwesta Kurdan li hember Azerbaycanê û Yekîtiya Sovyetê**

Ji Şibat heya Nîsana 1946`an serkirdeyên Kurd hemû hewla xwe xistin ser hev, da ku hikûmeta xwe bikin hikûmeteke kêrhatî. Ew bona mijûlbûna bi nakokiya sînorî a deshilatdariya xwe digel hikûmeta Tewrêzê, ev egera gengeşe dikirin ku renge Sovyetî li gor berjewnediya xwe wek leyîstokekê şoreşgerên Azerbaycanê li dijî wan bi kar bînin, lewra hewl didan ku piştgiriya Sovyetiyan bo xwe misoger bikin, lê derfeta hewce tunebûn. Di meha Nîsanê de, dema ku zelal bû ku Artêşa Sor bi bêy vê ku soza xwe derheq pêkanîna Kurdistana mezin û serbixwe, yan dana çekên giran û trombêlan bi Kurdan cîbicî bike, di encam de xaka Îranê bi cih dihêle, û seranên Komarê jî di warê baskirina ji xwestekên xwe di parêzgeha Urmiyê de vêrektir bûn. Ew hêvîdar bûn ku bikarin berî derketina Artêşa Sor ji herêmê, piştevaniya wan bo zeliqandina van herêman bi deshilata Komara Kurdistanê ve bi dest bînin. Li destpêka meha Nîsanê Kurdan piştî vê ku zanîn, nikarin di vê derheqê de pişta xwe bi piştevaniya Sovyetê qahîm bikin, li hember hikûmeta Tewrêzê helwestên gefxwarinê girtin pêş, û li herêmên kêşe li ser dest kirin bi rêkxistin û tûjkirina (handan) xelkê.

Berî vê ku kar bigihîje pevçûnan, Haşimov cihgirê konsolê Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê), Qazî Mihemed û hejmarek ji serokêlên navdar ên Kurd vexwandin, û ferman dane wan ku bona danûstandina digel Pîşewerî, tevî general Atakîşyov û general Kirasîk û serkonsolê Sovyetê serdana Tewrêzê bikin.

Bi Kurdan dihate gotin ku bi liberçavgirtina sefera çavnihêrkirî a Pîşewerî bo Tehranê bo danûstandina digel hikûmeta navendî derheqê qedera Azerbaycanê, gihîştina bi lihevkirinê di navbera wan û hikûmeta Firqeya Demokrat de gelek hewce ye, û cuda ji vê jî, bi wan dihate gotin ku Pîşewerî û nûnerên din ên Azerbaycanê

(ku diçin Tehranê) dibe deshilata wê hindê jî hebin ku li ser navê serkirdeyên Komara Kurdistanê jî, danûstandinê bikin.

Li 23`ê Nîsanê piştî çend danûstandinan bi amadebûna Pîşewerî, Kirasîk, Atakîşyov, Qazî Mihemed û çend kesên din, di navbera rêberên Hikûmeta Millî a Azerbaycanê û Komara Kurdistanê de peymanek hate wajokirin. Di vê lihevkirinê de, pêdagirî li ser hevkariya di navbera hikûmeta Kurdistanê û Azerbaycanê hate kirin. Herweha li ser cîbicîkirina cureyek ji çavdêrîkirina hevpar li ser herêmên kêşe li ser ên rojavayê Azerbaycanê (Parêzgeha Urmiyê) li hev kirin, lê xwe li çareserkirina eşkere ya kêşeya sînoran nedan.

**4) Destpêka pêwendiya Kurdan digel berpirsên Konsola Amerîkayê**

Heya berî danûstandinên Kurd û Azerbaycanê li Tewrêzê li meha Nîsanê, bo berpirsên konsolî ên Amerîkayê rewşa bo avakirina her cure pêwendiyekê digel Qazî Mihemed û seranên Kurd pêk nedihat. Her cure hewlek bona hevdîtina bi Qazî Mihemed re, digel dijayetiyê berbirû dibû. Piştî wajokirina peymana 23`ê Nîsanê ku li jêr zexta Sovyetê de hate wajokirin, daxwaza "Gerald Doher" ku cihgirê konsolxaneyê bû, bona hevdîtina bi Qazî Mihemed re bilez hate qebûlkirin. Di hevdîtineke dosatane de ku zêdetir ji demjimêrekê dom kir, rêberê Kurdan bi pêdagirîkirin li ser van xalên jêrîn baseke têr û tejî li ser "tevgera Kurdistanê" anî ziman.

Hikûmeta nû ya Kurdan serbarê vê ku navê Komarê li ser xwe daniye, lê di piraktîkê de daxwazkarê tiştekî zêdetir ji otonomiya navxweyî di çarçoveya Îranê de nine. Otonomiyeke kulturî digel bi fermînasîna zimanê kurdî, wek mafê xelkê Kurd bona derbazbûna ji "îzolebûna di rabihorî de ye. Îzolebûnek ku ji aliyê hikûmeta Îranê ve bi ser wan de hatiye sepandin". Otonomiya îdarî, û herwisa îdareya xwecihî a karûbarên bacwergirtinê, û perwerde û ewlehiya giştî, ji wan tiştan in, ku divêt di vê otonomiyê de werin berçavgirtin.

B) Hikûmeta Mihabadê digel Kurdên Îraq, Tirkiye, û Sûriyê têkilî

tuneye, û hez nake ku Kurdistana mezin a serbixwe ava bike. Ew axavtina Qazî Mihemed tewaw berevajiyê wê siyasetê bû ku pêştir ji aliyê wî bixwe, di destpêka avakirina PDKÎ de hatibû ragehandin û eyankerê vê bû ku kiryarên vê dawiyê ên Sovyetiyan, tu hêviyek bona rakêşana piştevaniya wan ji wiha siyasetekê nehêlaye.

P) Kurd pêşwaziyê ji vê dikin ku Amerîkayî bi baldarî ve li karûbarê wan dinêrin. Îdeala Kurdan ji demokrasiyê ji cureya Amerîkayî bû, lê ew nikarin bi bêy Amerîkayê bigihîjin vê îdealê.

T) Qazî got ku di van dawiyane de Kurdan hemû kêşeyên xwe digel hikûmeta Pîşewerî çareser kirine. Lê di heman demê de hevşêvriya wî, eyankerê vê yekê bû ku ew razî nebûn li Azerbaycanê rola kêmanî bilîzin.

Di encam de Qazî Mihemed pêşniyar kir ku îznê bide, ku her yek ji berpirsên hikûmeta Amerîkayê (ku jê hez bikin) serdana Kurdistanê bikin, û bixwe rasterast bibînin ku ji destpêka avakirina hikûmeta Mihabadê ve, çi pêşkevtin çêbûn. Wî daxwaz kir ku rojnamevanên Amerîkayî agehdarî vê xwesteka wî bin, û xala dawiyê ya wî balkêş bû: Wî digot ku hekî Amerîka herwisa li ser baldana bi karûbarê Kurdan berdewam be, renge Kurd ew qas hest bi tenêmanê nekin, û pêngavhelgirtina berev demokrasiya rasteqîne ji wan re hêsantir be.

Piştî hevdîtina Qazî Mihemed û cihgirê konsolê Amerîka li Tewrêzê, pêwendiya di navbera nûnerên Kurd li Tewrêzê û endamên konsolxaneya Amerîka zêdetir bû, û bo konsolxaneyê misoger bû ku bi hûrbîniyeke zêdetir ve cihê guherînkariyên rojava û başûrê Azerbaycanê bigre. Li 23`ê Nîsanê heya dawiya vê mehê, dema ku Pîşewerî û şanda rasipartî a hikûmeta Azerbaycanê bo danûstandina digel hikûmeta navendî ber bi Tehranê ve çûn, serokên Kurd konsolxane ji têkçûna pêwendiyên di navbera xwe û Demokratan agehdar kir. (Guherînkariyek) ku bû sedema vê ku Qazî Mihemed zextê bixe ser Pîşewerî ku du nûnerên Kurd jî, di nav şanda xwe de qebûl bike, bona vê ku rê ji şik û gumana Kurdan li ser vê bigre, ku nebe Firqeya Demokrat bi zirara Kurdan poanan ji hikûmeta navendî bistînin.

Ji dawiya Nîsanê heya destpêka Tîrmehê, hevdem ku nakokiya di navbera Kurdan û Firqeya Demokrat zêdetir dibû, lê di navbera van du hikûmetan de tu pevçûnek rû neda. Di meha Hezîranê de, êlên Kurdan li bajarên Şapûr (Selmas) û Xoyê nêzîktir dibûn, û serbarê destbiserdegirtina gundên vê herêmê hikûmeta Mihabadê hêzên xwe ber bi Miyanduawê jî şandin, hêzên serbazxaneya Firqeya Demokrat neçar kirin, ku ji sînorê bakûrê wan du rûbarên ku ji naverasta bajar re derbaz dibin, nehêne vêdetir.

Li Rizayiyê (Urmiyê) jî ku li beşa rojavayê gola Urmiyê hilketiye, Zêro Beg berpirsyarekî hikûmeta Mihabadê, dersxwanên bajarê xwe bona serhildana li dijî hikûmeta Firqeya Demokratan tûj kirin. Herçend ku wan nearamiyan dom tunebû, lê zexta Kurdan li ser Rizayiyê (Urmiyê) her dom hebû, û heta eva ku di encam de, li payîza vê salê de, hemû bajar kete bin deshilata Kurdan. Piştre Rizayiye (Urmiye) li jêr deshilata hêzên Tewrêzê û hêzên Kurdî, wate li jêr deshilata hevpar a herdu aliyan de ma.

Sernekevtina Pîşewerî ji wergirtina her cure poanekê bo Kurdan ji hikûmeta navnedî, piştî wajokirina peymannameyekê ku li meha Hezîranê ya wê salê, di navbera wî û Muzefer Fîroz derheq siberoja Azerbaycanê de hate îmzakirin, û piştre jî xwe vedizîna hikûmeta Azerbaycanê ji cîbicîkirina peymannameya 23`ê Nîsanê di navbera Kurdan û Azerbaycanê de -bi taybetî xalên pêwendîdar bi parvekirina deshilatê li bajarên rojavayê Azerbaycanê di navbera Kurdan û Demokratan de- sedema sereke a kûrtirbûna nakokiyên di navbera wan de bû.

Li naverasta meha Hezîranê hesta dijayetiyê li hemberî Firqeya Demokrat gelek zêde bû, ku tenê destêwerdana bi eşkere ya Haşimov cihgirê konsolê Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê) û Alîk Baryen (Elî Ekberov) rê ji xwînrijandinê girt. Ev destêwerdana Sovyetê hevdem ku bo rêgiriya ji hêrişa Kurdan bo ser bajarên di bin kontirola Demokratan bandora xwe hebû, di piraktîkê de bû sedemeke bibandor jî, bo jinavçûna giraniya Sovyetê di nava êlên kurdan de. Haşimov û Elî Ekberov (ku bi vê hatibû nasîn ku serperestiya tora endamên N.Ka.W.D di wê herêmê de dike), bi

baskirin ji egera vegera Artêşa Sor bo Azerbaycanê û vegerandina ewlehiyê bo sînorên Sovyetê çendîn carî gef li serkirdeyên Kurd xwarin.

Li 16 û 17`ê Tîrmehê "Angos Ward" karmandê konsolî yê balyozxaneya Amerîkayê li Tehranê û "Gerald Doher" ku cihgirê konsolxaneya Tewrêzê bû, bona nîqaş û gengeşeya li ser radeya bandor û kontrola Komara Kurdistanê serdana Mihabadê kir. Ev serdana piştî hevkarîkirina bi Qazî Mihemed re ku wê demê li Tewrêzê bû ser girt. Qazî Mihemed hêzeke parêzer pêk anî, bona vê ku digel Amerîkiyan bin, û nehêlin ku di rê de tu kêşeyek ji wan re pêk bihêt. Wî herwiha bi hikûmeta Mihabadê ragehandibû, bona ku ew serdan wek bi fermînasîna tevgera neteweyî a Kurd ji aliyê Amerîkayê ve nehê şirovekirin, nabe bi awayek fermî pêşwazî ji wan mêhvanan were kirin. Li Miyanduawê girûpek ji zabitên artêşa xelkî a Kurdan mêhvandariya konsol "Ward" û cihgirê konsol "Gerald Doher" kirin, û şaredarê Mihabadê û hejmarek ji endamên hikûmeta Kurdistanê jî li çend km a Mihabadê pêşwazî jê kirin, û heta paytexta Kurdistanê digel trombêla Amerîkiyan bûn, û paşnîvroya roja 16`ê Tîrmehê hejmareke zêde ji berpirsên hikûmeta Mihabadê û serokê wê bi awayê girûpî sardana berpirsên Amerîkayî kirin û berpirsên Amerîkayî îzna vê yekê bi wan nehate dan ku bi azadî derheq rewşa siyasî a herêmê pirsyaran bikin. Lewma bersiva piraniya pirsan eşkere nebû, û cuda ji wan zanyariyên ku pêştir konsolxaneya Tewrêzê ji rêya asayî ve bi dest xistibû, tu zanyariyeke nû nekete destên me. Lê paşnîvroya wê rojê, birêveberê perwerdehiyê yê Komarê ku wek rênîşanderê konsol "Ward" û cihgirê konsol "Duher" hatibû destnîşankirin, amade bû ku bi awayekî eşkere û rastgoyane bersiva hemû pirsyaran bide. Ew xalên jêrîn me ji axavtinên wî wergirtin.

A) Di hikûmeta Mihabadê de, hejmareke nasyonalîstên demargirj hene. Ew in ku behsa Kurdistana serbixwe vedigeşînin. Lê hêdî-hêdî giranî û bandora xwe li ser Qazî Mihemed ji dest didin, ku ew zêdetir di hizra avakirina herêmeke xwebirêveber a Kurdî di çarçoveya Îranê de ye.

B) Girûpên nermrev derheq wergirtina kêmtirîn poanan ji hikûmeta navendî, piştevaniyê ji siyaseta vê dawiyê ya Qazî Mihemed dikin, ku ew poan ev in:

1)Xwebirêveberiya kulturî bo Kurdistanê, û mafê xwendina bi zimanê Kurdî

2)Kurdistana yekgirtî a Îranê, wan herêmên Azerbaycana Rojava ku pêştir bas ji wan hate kirin, digel: Herêma Mihabadê û hemû herêma Erdelan û herêmên Kurdnişîn ên Kirmaşan û Hemedanê jî li xwe digre.

3)Hêzeke leşkerî a Kurd bi sûdwergirtina ji zabitên Kurd. Herçend ew mijar bi wateya xwe vedizîn ji wergirtina zabitên şareza ku Kurd nînin, bo serfermandehiya leşkerî nine.

**5)-Pevçûnên di navbera Kurdan û artêşa hikûmeta navendî de**

Li heyama sala 1945`an di navbera hêzên Komara Kurdistanê û yekîneyên artêşa navendê de, ku li Serdeşt û Seqizê cihgir bûn, pevçûnên berbilav rû didan. Di meha Tîrmehê de hêzên çekdar ên hikûmeta Mihabadê ku bi şandina hêza êlan ji hemû herêmên bakûr û ji herêma Xoyê ve hatibûn bihêzkirin, pêwendiya serbazxaneyên Seqiz û Serdeştê digel navendên piştevaniya wan qut kirin. Her di vê heyamê de bû ku Qazî Mihemed serdana Tehranê kir, û tê gotin li wir biryara agirbesekê dan, ku bû sedema vê ku rê bihête dan, ku cilûberg û xwarin û hewcehî, ji bilî çek û teqemeniyan bigihîje wan du serbazgehan. Hebûna hêzeke mezin ji Kurdên Îraqê ku di bin fermana serhildêrê sovyetxwaz Mela Mistefayê Barzanî de bû, li herêma Mihabadê yek ji kêşe û nakokiyên herî sereke di navbera hikûmeta navendî û Kurdan de bû. Herçend ku dihate gotin ew peyrewê biryarên Qazî Mihemed in, lê bi vê şêwazê ji xwebirêveberiya ku wan hebû, û wan hêrişên ku dikirin ser her yekîneyeke leşkerî, bibûne sedema kêşeyeke zaf. Serbarê vê yekê jî piştî biryara hikûmeta Îraqê li ser ragehandina lêbihorîna giştî bo hemû şoreşgerên Barzanî, ji bilî Mela Mistefa û Şêx Ehmedê

Barzanî yê birayê wî, girîngiya wan wek xwe nema.

### 6)-Aloziya zêdetir li pêwendiyên di navbera Kurd û Azerbaycanê de

Di naverasta Tîrmehê heya rûxana hikûmeta destçêkirî ya Sovyetê li herêmê di meha Çileya Pêşîn de, pêwendiyên di navbera Kurdan û bi taybetî jî serokhozên Kurd, digel Demokratên Tewrêzê bilez ber bi aloziyê ve çû, di demekê de ku berpirsên konsolî ên Sovyetê li Azerbaycanê zextên xwe li ser Kurdan zêde dikirin, da ku rê li ber rûbirûbûneke rasterast digel Demokratan bigrin. Herweha hejmareke zêde ji serkirdeyên Kurd bi giştî dev ji vê yekê berdan ku bi berçav xwe wekî dostê Sovyetê nîşan bidin, û bi eşkere daxwaza xwe bona veqetandina peywendiya digel Rûsan û rakêşana bala hikûmeta Amerîkayê eyan dikirin, heta hekî ew kar bi wateya vegeriyana deshilata hikûmeta navendî jî bibûya. Rêzbendek ji wan bûyerên ku nîşana wan guherînkariyan bûn, di nerîn û siyaseta Kurdan de, wiha bû:

18`ê Tîrmehê girûpeke pêkhatî ji 300 Kurdên Şikak çûne nav bajarê Xoyê li bakurê rojavayê gola Urmiyê û daxwaz ji Demokratan kirin ku nîva fermangehên hikûmetî ên bajar, û herwiha îdareyên darayî û şarevaniyê bi wan bispêrin. Ew daxwaza wan pişta xwe bi beşek ji peymannameya 23`ê Nîsanê di navbera Kurd û Azerbaycanê de girê dida, ku behsa hevbeşî û beşdarîpêkirina Kurdan li birêvebirina van herêman de kiribû, ku rêjeyeke berçav ji akinciyên wê Kurd bûn.

Bi hatina hejmareke hemşêwe ji Fedayiyên Demokrat ji Merend û Makûyê ve bo Xoyê, bona derkirina Şikakan rewş ber bi aloziyê ve çû, û tenê piştî gihîştina Aladîryov cihgirê konsolê Sovyetê li Makûyê kar negihîşte pevçûnan, û wî ferman da Kurdan ku vegerin herêma xwe, û şêweya axavtina wî, ew wateya hebû ku hekî vî karî nekin, eva ew karê wan, wê hatina Artêşa Sor bilez bike. Ew kiryara berpirsê Sovyetê wek sîleyeke eşkere bû li rûyê deshilatê û otorîteya Emerxan rêberê êla Şikak, ku piştî wê qonaxê, êdî wî xwe

ji eşkerekirina dijayetiya digel Sovyetê venedidizî.

20`ê Tîrmehê qasidekî Kurd bi gehandina nameyekê, bi berpirsên Firqeya Demokart li bajarê Merendê, ragehand ku ji niha şûnda Kurd wî bajarî wek dawî herêma bakûrê rojhilatê Komara Mihabadê dizanin.

22`ê Tîrmehê, piştî birêveçûna hilbijartineke herêmî ji aliyê Firqeya Demokrat ve ku wek hertim Demokratan bi %99 a dengan serkevtin bi dest xistin, dersxwan û bazerganan di navenda bajar de nerazîbûna xwe nîşan dan, û bi lidarxistina serhildaneke cidî li Rizayiyê (Urmiyê), berevajiyê biryara rêkxistina herêmî a bajêrvaniyê ku daxwaz jê dikirin wir vala bikin, ber bi telegrafxaneyê çûn û daxwaz ji Tewrêzê kirin ku encamên vê hilbijartina saxtekarane hilweşînin.

Li 23`ê Tîrmehê, bazara Rizayiyê (Urmiyê) herwisa hate daxistin, û piştî vê ku Refî`î fermandeyê hêzên Firqeya Demokrat li Rizayiyê (Urmiyê) ragehand ku deshilatdariya Demokratan di vî bajarî de ji nav çûye, Pîşewerî bi telegrafekê, daxwaz jê kir ku hilbijartinan dubare bike. Çend hefteyan piştre yek ji Kurdên naskirî ên Rizayiyê (Urmiyê) eşkere kir ku serkirdeyên Hizba Demokrat a Kurdistanê di vî bajarî de, dest di nearamiyan de hebûne.

Ji 4 heya 12`ê Tebaxê, Qazî Mihemed, Pîşewerî agehdar kir ku, komkirin û parvekirina dexl û danê li Azerbaycana Rojava, wê li gor rêkarên pêşîn ên hikûmeta navendî bihête cîbicîkirin, ne ew rêkarên nû ên ku hikûmeta Tewrêzê danîne. Wisa xuya dikir ku bifermî nenasîna rêkarên nû ji aliyê serokêlên Kurd ve, vedigeriya bo vê ku, wan ew rêkar berevajiyê şer`a Îslamê dihesibandin. Piştevanîkirina ji wê desteyê ji milkdarên Xoy, Şapûr, û Rizayiyê (Urmiyê) ku dixwastin rêkarên pêşîn wan jî bigre, pêngava piştre a Kurdan bû. Li piraniya gundên wan herêmên ku bas jê hate kirin, bona komkirina yek li ser deh a berhemên ku dibû milkdar li jêr piştevaniya Kurdan de bidin, komeke çekdar hatin cihgirkirin.

Li 9`ê Tebaxê, Pîşewerî piştî wergirtina raporekê li ser cihgirkirina hêza çekdar a Kurd li derwazeya bajarên Şapûr (Selmas) û Rizayiyê (Urmiyê), bona danûstandina digel Qazî

Mihemed bilez çû Rizayiyê (Urmiyê). Li gor lihevkirina di navbera wan de, Kurdan qebûl kirin ku hêzên xwe li ser rêyan hilgirin, lê di hember de bo pirsa komkirina dexl û dan, li gor rêkarên dilxwaz ên xwe tevbigerin, bi vî halî jî Pîşewerî heyameke kurt piştî vegeriyana bo Tewrêzê, bi cihgirê konsol "Gerald Doher" ragehand ku du rojan piştî vegera wî, Kurdan ew lihevkirin binpê kirine.

15`ê Tebaxê bi çûna girûpeke mezin ji Kurdên Barzanî bo yek ji gundên mezin ên herêma Miyanduawê, şerê derûnî ê Qazî Mihemed digel hikûmeta Tewrêzê gihîşte wê herêmê jî. Firqeya Demokrat ku li benda wê bûn, ku serbazxaneya wan rastî hêrişê bihêt, bilez hêzeke piştevan bi tank û topxaneyan ve şandin rex wî rûbarê ku beşa Kurdakincî û Ecemakincî a bajar, ji hev cuda dike, lê êlên Kurd tu karekî din nekirin.

Ji 7 heya 20`ê Îlonê rewşa Rizayiyê (Urmiyê) ew qas aloz bû, ku di encamê de li 7`ê Îlonê hêzeke 500 kesî ji çekdarên Kurd ber bi Rizayiyê (Urmiyê) ve pêşrevî kirin, û çend gund li çend km a başûr û rojavayê bajar xistin jêr deshilata xwe de. Hêzek jî çû nav bajar û li karwanserayekê ku berî serhildana Firqeya Demokrat serbazxaneya artêşa Îranê bû, cihgir bûn. Çend rojan piştre çend sed kes ji êlan li jêr fermana Emerxanê Şikak de çûne nav bajar, û li ser kolanên bajar mijûlî geriyanê bûn.

Li 30`ê Îlonê Zêro Beg cihgirê Qazî Mihemed li Urmiyê bi zorî çû nav baregeha fermandehiya Refî`î, û daxwaz jê kir ku li gor lihevkirina 23`ê Nîsanê bona cihgirbûna nûnerên Kurd û dabînkirina nîva karûbarên îdareyan cih ji wan re bê dabînkirin. Refî`î ku tirsiyabû, berpirsên din ên Firqeya Demokrat bang kirin, û hemû pêkve ber bi telegrafxaneyê reviyan. Wir her ji demên kevn ve wek cihê girevgirtinê dihate hesibandin. Di vê qonaxê de Haşimov konsolê Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê) hate nav vê kêşeyê de, û di destpêkê de ferman da Kurdan ku bajar bi cih bihêlin. Piştî vê ku Kurdan ew yek qebûl nekirin, wî soz da wan ku hekî Kurd hêzên xwe vekişînin, ewê jî bi awayekî ku hemû aliyek razî bin, wê kêşeya wan çareser bike.

Hêzên Kurdan vekişiyan, lê Emerxan tenê ew hêz venekişandin

ên ku li ser kolanên bajar mijûlî parastina ewlehiyê bûn. Di heyama vê qonaxa pir ji kirîz a di navbera hêzên Kurd û Fedayiyên Demokrat li derdora Rizayiyê (Urmiyê) çend pevçûnek rû dan, û di yek ji wan şeran de jî li herdu aliyan qurbanî çêbûn. Piştî çend rojan danûstandina di navbera berpirsê konsolxaneya Sovyetê ku ji aliyê hikûmeta Azerbaycanê ve serdana Mihabadê kiribû, digel girûpek ji serokêlên Kurd û berpirsên hikûmeta Mihabadê, Demokratan qebûl kirin ku Kurd wek hêza emnî a Azerbaycanê kar bikin û di hember de jî pereyeke mehane werbigrin.

25`ê Îlonê tenê du rojan piştî îmzekirina wê lihevkirina ku bi kiryar ji aliyê Haşimov ve bi ser Kurdan de hatibû sepandin, Kurdan bi dirêjahiya rêya Şapûr (Selmas) bo Rizayiyê (Urmiyê) rawestgeha wergirtina bacê danîn, û ji tewahiya wan kesên ku li ser vê rêyê hatûçûn dikirin, baceke giran werdigirtin. Kirasnîk serkonsolê Sovyetê li Tewrêzê û general Kawyan serokê şarevaniya hikûmeta Tewrêzê ji wan kesan bûn ku di dema serdanekê bo Rizayiyê (Urmiyê), bi zora çekê bac ji wan hatibû wergirtin.

27`ê Îlonê Emerxan ku êdî bi awayekî tund û eşkere li dijî Firqeya Demokratan bû, fermandeyê Firqeya Demokrat li Şapûrê (Selmasê) bi navê "Penbe" agehdar kir, ku Kurdên Şikak dixwazin roja 30`ê vê mehê, bi navê Komara Mihabadê dest bi ser vî bajarî de bigrin. Wê oltîmatomê karvedana tund ya Rûsan û hikûmeta Tewrêzê lê ket. Haşimov û Zêro Beg ji Rizayiyê (Urmiyê) ve çûne Şapûrê (Selmasê), û Pîşewerî jî general Xulam Yehya Daniş fermandeyê hêzên leşkerî ên firqeyê li eniya Zencanê vexwand. Ew fermande wek fermandeyê hêzên firqeyê li hemberî hêrişa çaverêkirî ya hikûmeta navendî bo ser Xemse li wir hatibûn bicihkirin, û niha diviya ku hatiba Şapûrê (Selmasê). Zêro Beg û Danişyan bi awayê fermandehiya leşkeriya hevpar, kontrola Şapûrê (Selmasê) bi dest ve girtin, û Haşimov bona rêgirtina ji metirsiyekê ku ji aliyê Kurdan ve gef li Şapûrê (Selmasê) dixwar, ber bi Zindeştê wate binkeya Emerxan ve çû. Piştî sê rojan danûstandina li Şapûr (Selmas) û Zindeştê ku tê de Haşimov çendîn carî bas ji egera dagîrkirina Azerbaycanê ji aliyê Artêşa Sor ve kir, di encamê de Emerxan qebûl kir ku hekî ji hemû

wan mijarên ku pêwendiya wan bi dexl û dan, û ewlekariyê ve heye, digel nûnerên wî li Şapûrê (Selmasê) hemşêvrî bihê kirin, ewê wir bispêre dest Demokratan.

Li 30`ê Îlonê wate rast ew roja ku lihevkirin hate îmzekirin, du bûyer bûne sedema vegeşîna dijminayetiya rêberê Şikakan digel Sovyetê û Firqeya Demokrat. Bûyera yekem rast di dema çûna cihgirê konsolê Amerîkayê “Gerald Doher” bo Şapûrê (Selmasê) li ser rêya çûna wî bo Rizayiyê (Urmiyê) rû da. Ew serdan ji aliyê berpirsên Demokrat li Tewrêzê, mohlet pê hatibû dan. Gengeşeya li ser kêmkirina qasê deshilata Demokratan li herêmên Kurdakincî ên rojavayê Azerbaycanê, ji armancên ranegehandî ên cihgirê konsol “Gerald Doher” di wê herêmê de bû. Herwiha berhevdan û şiroveya rêreva siyaseta rêberên Kurd ku dihate gotin Kurd dixwazin li jêr bandora Yekîtiya Sovyetê derkevin û digel hikûmeta navendî li hev bikin.

Nûnerên Kurd li Şapûr (Selmas) û Rizayiyê (Urmiyê) pêştir ji vê serdanê hatibûn agehdarkirin, û bi awayekî ku piştre zelal bû, Emerxan û seranên din ên Kurd peyamek derheqê wefadariya bi Serokwezîr Qewm El-seltene amade kiribûn, bi vê mercê ku hikûmeta navendî qewl bide ku di siberojê de, reftareke baştir li hemberî Kurdan hebe.

Bi baldan bi vê ku piştî serhildana Firqeya Demokrat, pêwendiya di navbera Kurdên Azerbaycana Rojava û hikûmeta Tehranê veqetiyabû, seranên Kurd li hev kiribûn ku piştî gihîştina cihgirê konsol “Gerald Doher” daxwazê jê bikin, ku soza emegdariya wan bigehîne Serokwezîran. Wisa xuya dike ku general Danişyan û cihgrê konsolê Sovyetê Haşimov ji vê mijarê hesiyabin, jiber ku Danişyan ku ji aliyê Haşimov ve hatibû tûj kirin, trombêla cihgirê konsolê Amerîkayê li Şapûrê (Selmasê) ragirt û bi “Gerald Doher” ragehand, ku bi sedema têkçûna rewşê, ew nikare berdewam be li ser sefera xwe. Lê mana Haşimov bo heyameke zêde di ofîsa Danişyan de şaş bû. Ew ku hatibû wir, daku bêje Danişyan, pêşiya trombêla Amerîkayiya bigrin û nehêlin derbaz be, ji nişkêve rastî cihgirê konsolê Amerîkayê û wergerê wî hat. Lê bêy vê ku bizane,

ku Amerîkiyan ew nas kiriye, ji deriyê piştê yê ofîsê re reviya.

Zêro Beg ku di dema van bûyeran de li wir bû, piştre bi cihgirê konsol ragehand ku, ew bixwe dema ku Haşmov ferman da Danişiyan, ku rêya çûna Amerîkiyan ber bi Rizayiyê (Urmiyê) bigrin, li wir bûye. Ew bûyer tenê bû sedema nakokî û hêrsbûna zêdetir ya Emerxan û serkirdeyên din ên Kurd, û dema ku cihgirê Konsol "Gerald Doher" piştî vegera bo Tewrêzê, li rêzetelegrafên bêremz de mijara destêwerdanên berpirsên konsola Sovyetê ji Tehranê re şand, Pîşewerî daxwaz ji general Danişyan kir ku vegere Tewrêzê, û bi amadebûna li konsolxaneya Amerîkayê, bi sedema vê bûyerê daxwaza lêbihorînê bike.

Êvariya wê rojê, ku rê bi konsolyar "Gerald Doher" nehate dan ku dirêjiyê bide sardana xwe, berpirsên konsolxaneya Sovyetê bi şaşî karekî din kirin ku bû kêşeyeke qerebûnekirî li pêwendiyên di navbera wan û Kurdan de. Elî Ekberov cihgirê konsolyar Haşimov bona nîşandana fîlmekê ku di van dawiyane de, li Komara Azerbaycana Sovyetê hatibû berhemanîn, civînek pêk anî, û Emerxan û hejmarek ji serokêlên Kurd wek mêhvanên taybet ên vê civînê vexwandin. Lê naveroka fîlmê li ser şoreşa cotkarên Azerbaycana Sovyetê û li dijî milkdaran bû, û dîmenên talankirina malên axayan û serkevtina cotkaran nîşan dida. Ew kar bi tu awayekî, bo vê civînê di cihê xwe de nebû. Serokêlên Kurd ku bixwe di rêza xwedîmilkên Azerbaycanê de bûn, wiha ji nîşandana vê fîlmê êşiyan ku bilez li Zindeştê kom bûn, û sond bi qur`anê xwarin ku heya binbirkirina vê cureya demokrasiya Sovyetê, rihet nerûnên, û deqa vê sondnameyê bo Mihabadê jî hate şandin, û Qazî Mihemed jî wek rêberê tevgera Kurd ew yek îmze kir.

Roja 7`ê Çiriya Pêşîn hefteyekê piştre, konsolyar "Gerald Doher" piştî vê ku ji aliyê Pîşewerî û berpirsên din ên Azerbaycanê ve hate xatircemkirin ku bûyera Şapûrê (Selmasê) dubare nabe, dîsan hewl da ku here Rizayiyê (Urmiyê). Vê carê di rê de tu sekinandin û kêşeyek rû neda, lê li Rizayiyê (Urmiyê) berpirsên Firqeya Demokrat hemû hewla xwe dan, ku rê li ber hevdîtina konsolyar û rêberên Kurd bigrin. Refî`î fermandeyê hêzên Firqeya Demokrat

li Rizayiyê (Urmiyê), û Elî Ekberyov cihgrê konsolxaneya Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê) hemû hewlek dan, da ku li heyama mana xwe li Rizayiyê (Urmiyê), wê şanda Amerîkayî mijûl û sergerm bikin. Lê hevdîtineke nefermî li binkeya Hizba Demokrat a Kurdistanê, û hevdîtina çaverênekirî a serokê êla Mengor digel konsolyar “Gerald Doher”, ku daxwaz kir di dema vegera bo Tewrêzê, ew jî siwarî trombêla wî be, gelek zanyarî derheqê rewşa siyasî a Kurdên herêmên Kurdakincî û bi taybetî destêwerdanên Haşimov û Aladî Pirîyov konsolyarê Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê) û Makûyê li derheq pêwendiyên di navbera Demokratên Kurd de li pey xwe anî.

Serhildana Emerxan wek berdevkê Kurdên Azerbaycanê, serbarê vê ku pêştir wî bixwe Qazî Mihemed wek serokê tevgera Kurd bi fermî nas kiribû, yek ji zanyariyên herî girîng bûn, ku di vê serdanê de bi dest ve hatin, hevdem digel zêdebûna dijberiya Kurdan li hemberî Firqeya Demokrat û Sovyetiyan, nerazîbûn li hember Qazî Mihemed jî, ku wek rêkxerê yekem ê hevkariya di navbera Kurd û Demokratan û Sovyetiyan dihate hesibandin, rû li zêdebûnê bû. Du êlên Dîbokrî û Mengor bi taybetî li dijî bîra tevgera otonomiya Kurdistanê bûn, û gelek bi tundî piştevanî ji siyaseta eşkere ya Emerxan derheq dijayetiya digel Rûs û Firqeya Demokrat dikirin.

Roja 12`ê Çiriya Pêşîn Emerxan vexwandina Pîşewerî bo çûna Tewrêzê qebûl nekir, lê di hember de bo parastina pêwendiya digel konsolyarê Amerîkayê li wî bajarî, bi mebesta rakêşana hevsoziya Amerîkiyan û tenê kanala pêwendiya di navbera Kurdan û hikûmeta navendî de, nûnerek şande Tewrêzê. Nûnerê wî Akif Şerîfî di dema sardana xwe ya bo konsolxaneyê, ew raporên curbicur piştrast kirin ku ji Tewrêzê derheqê plana siberojê a Kurdan belav bibû. Bi taybetî eva ku Kurd dixwazin bi van zûkatiya, serbarê hemû wan lihevkirinên ku di bin zexta Sovyetê de encam dane, birêvebirina karûbarên Rizayiyê (Urmiyê) û Şapûrê (Selmasê) û Xoyê bi dest ve bigrin.

Wî ji konsolyar pirs kir, li egera veqetandina pêwendiyên wan digel Sovyetê, dikarin çavnihêrê çi alîkarêyekê ji aliyê Amerîkayê ve

bin? Konsolyar “Gerald Doher” bi wî ragehand, ku heya wê demê ku Kurd xwe ji hikûmeta navendî dûr ragirin, nabe dilê xwe bi alîkariya Amerîkayê xweş bikin. Lê hekî siyaseta xwe ji cudaxwaziyê ve bo pêvajoyeke emegdarane bi hikûmeta navendî biguherin, wê demê dikarin hêvîdar bin ku li vê hevpeymaniya ku Amerîkayê di daxuyaniya xwe a ji bo Îranê qewlê wê dabû, Kurd jî dikarin mifahê wergirin.

Li 22`ê Çiriya Paşîn nûnerê Şikakan dîsan vegeriya konsolxaneyê û rapor da, ku wî Emerxan ji naveroka gotûbêja digel konsolyar agehdar kiriye, û ew amade ye ku bi navê hozên Kurd ên Azerbaycana Rojava, wefadariya xwe li hember hikûmeta navendî nîşan bide, bi vê mercê ku hikûmeta navendî jî garantiyê bide ku di siberojê de reftareke dadperwerane digel kurdan hebe, û siyaseta serkutkarane ya rabihorî li hemberî êlan dubare nebe. Akif Şerîfî daxwaz kir ku balyozxaneya Amerîka li Tehranê, vê pêşniyara Kurdan bigehîne dest Serokwezîran “Qewam”, û bersivekê jê wergire, ku ew jî bikarin bi hemû serokêlên herêmê ragehînin.

Pêşniyara Kurdan bo Tehranê derheq ragehandina wefadariya wan, ji Pîşewerî û berpirsên konsolî ên Sovyetê bi tewahî hate veşartin, û herçend ew ji sardana konsolyar “Gerald Doher” bo herêmên Kurdakincî û serdanên berdewam ên serkirdeyên Kurd bo konsolxaneya Amerîkayê li Tewrêzê agehdar bûn, lê zelal bû ku wan haj vê yekê nebûye ku bandora wan di nava Kurdan de nemaye.

Bi zelalbûna vê ku êdî kêşeya di navbera hikûmeta navendî û Firqeya Demokrat de, nikare rêçareya aştîxwazane hebe, guherîna siyaseta Kurdan jî gelek bilez girîngî pê hate dan. Ne tenê Firqeya Demokrat nedikarî pişta xwe bi piştevaniya çalakane ya êlên rojava qahîm bike, belkî ev metirsiya jî li ser wan hebû, ku hekî artêşa hikûmeta navendî xwestiba ku ber bi Azerbaycanê ve pêşreviyê bike, eva ji aliyê rojava ve jî wê berbirûyê dijmineke metirsîdar bibûna. Lê hemşêvriyeke bi eşkere a pêkenok, ku Pîşewerî di dema gotûbêja digel serkonsolê Birîtanyayê li 19`ê Çiriya Pêşîn de derheq peymannameya 23`ê Nîsanê a Kurd û Azerbeycanê hebû, zelal kir ku wî heta wê demê jî, tu berhevdan û nerîneke dirust li ser rewşa

rastîn a Kurdistanê tunebûye.

Li 3`ê Çiriya Paşîn konsolyar “Gerald Doher” vegeriya ser posta xwe li balyozxaneya Amerîkayê û karî wê rewşa ku encama şikesta siyaseta Sovyet û Firqeya Demokrat li hemberî Kurdan de bû, bi hûrgilyên zêdetir ve bo Serokwezîran Qewam zelal bike. Herçend wisa dixuya ku Serokwezîran guman ji rastbûna pêşniyara wefadariya Emerxan heye, lê peyameke şexsî bo rêberê Şikakan şand ku bas ji vê dikir, ku ew demekê dikarin radeya wefadariya Kurdan bizanin, ku hikûmeta navendî bixwaze bo vegerandina deshilata xwe bo ser Azerbaycanê hewara xwe bibe ber bikaranîna hêzê. Wî herwiha ew yek jî zêde kir ku, hikûemat wî bona qerebûkirina wê nedadperweriya ku li serdema Riza Şah de derheqê êlan hatiye kirin, pêşwaziyê ji her derfetekê dike.

Di encam de li rêkevt 22`ê Çiriya Paşîn seranên Demokrat li Tewrêzê hêdî-hêdî tê gihîştin, ku êdî ji vê zêdetir ew nikarin bi gefên nûnerên Sovyetê wefadariya hevpeymanên Kurd desteber bikin. Wisa xuya dike ku di vê qonaxê de Qazî Mihemed li jêr zexteke giran de hejmareke serkirdeyên Kurd vexwandin bo Mihabadê, da ku derheqê egera operasiyoneke hevpar digel Tewrêzê di dema pêşreviya hikûmeta navendî de gotûbêjan bikin. Emerxan nûnerê xwe şande konsolxaneya  Amerîkayê, bona vê ku pêşniyar bike, ku amadekarî bo serdaneke konsol Sotûn bo Mihabadê di vê demê de wê bandora erênî hebe, û dikare berxwedana serokêlan li hember dawî zextên Sovyetê bihêz bike.

Konsol Sotûn Tewrêz ber bi Mihabadê bi cih hêla, lê hêşta çend km dûr nebibû, ku zabiteke Azerbaycanî ew vegerand. Hefteyekê piştre Akif Şerîfî hate konsolxaneyê û rapor da, ku Qazî Mihemed li jêr zexta Sovyetê de daxwaz ji êlan kiribû ku bona bergiriya ji Azerbaycanê, digel Firqeya Demokrat bikevin, lê serokêlan bi rêberatiya Emerxan, ragehandibûn ku amade nînin li hemêberî artêşa hikûmeta navendî de bergiriyê bikin, meger eva ku li jêr hêrişa topxanên Artêşa Sor de ew bo vî karî bêne naçarkirin. Dema ku artêşa hikûmeta navendî jî li destpêka Îlonê de bera xwe da Kurdistanê, ne tenê yek fîşek jî nehate teqandin, belkî dema ku

berpirsên leşkerî ên Tehranê çûne Miyanduawê, Qazî Mihemed ragehand ku amade ye xwe radest bike.

### 7)-Hokarên şikesta siyaseta Sovyetê li hemberî Kurdan

Sedemên sereke ên şikesta siyaseta Sovyetê li derheq Kurdên Azerbaycanê, em dikarin di van xalên jêrîn de bibînin:

A- Xwestin ku cihê nifûza Artêşa Sor bi nifûza çend kesên karmend ên Sovyetê tejî bikin, ku ji bilî derevan û gefên vala û bênaverok -ku ji bo serkirdeyên jixwerazî ên êlên Kurd tejî ji sivikatî bû-tu tiştek wan a din tunebû.

B- Berçavgirtina şêwazeke propagendeyê ji aliyê Rûsan ve ku wefadariya Kurdan li hemberî serkirdeyên xwe berçav negirtibûn.

P- Pêdagirbûna Sovyetê li ser vê ku Kurd li hemberî hikûmeta Tewrêzê rola kêmanî bilîzin.

T- Qirnûsî û rezîliya Sovyetê bo nedana çek û cebilxaneyan bi Kurdan.

S- Girîngî û bandora têkiliyên berpirsên Amerîkayî bi Kurdan re

C- Zanyariyên rû ji zêdebûnê ên serkirdeyên xwendewar ên Kurd, li ser siyaseta zelal a Wilayetên Yekgirtî li hemberî destêwerdanên Sovyetê.

H- Bêşiyaniya Sovyetê di warê piştevanîkirin ji tevgera Kurdistana mezin a serbixwe, ku bû sedema vê ku, nekarin cuda ji rêya îdeolojîkî ve, Kurdan bona berdewamiya bergiriya li hember hikûmeta Îranê tûj bikin, û mifahê ji wan wergirin.

### 8)- Hewcehiya hikûmeta Îranê bi siyaseteke jîrane li hemberî Kurdan

Xwevedizîna Kurdan ji piştevaniya ji hikûmeta Tewrêzê li hemberî pêşreviya artêşa Îranê ber bi Azerbaycanê li meha Çileya Pêşîn de. Herçend ku di herifîna hikûmeta Firqeya Demokrat de sedemeke yekalîker nebû, lê bo siyaseta ragehandî di daxuyaniya Tehranê de, derheqê yekparçeyiya xaka Îranê wek serkevtineke

mezin tê hesibandin. Jiber ku pêştir hêzên artêşa navendî di rewşa asayî de jî, bo operasiyonekê ku hewcehî bi destbiserdegirtina cihê êlên Kurd bû, berbirûyê parastina çekdarî dibûn. Xweradestkirina bêy berxwedan a Kurdan di hemberî Tehranê de, ew jî piştî çar salan ku deshilata hikûmeta navendî li Kurdistan û Azerbaycanê de nemabû, û herwiha neh mehan piştî hikûmeta Komara Kurdistanê, bêguman bûyereke gelek neasayî ye. Hikûmeta Îranê li encama vegerandina bi sanahî a deshilata xwe bo Azerbaycana Rojava, niha di rewşeke gelek baş de ye, bona vê ku siyaseteke aqilane a Kurdî li cihê siyaseta xwe a kevneşop ku berê bo serkut û dûrxistina Kurdan dimeşand, bigre pêş.

Nîgeraniya herî girîng a serkirdeyên Kurd, di dema behs û gengeşeya derheqê mesilheta veqetandina pêwendiya digel Firqeya Demokrat, û xweradestkirina li hemberî Tehranê, eva bû ku ev egera hebû ku cardin bikevin jêr zexta hikûmeta leşkerî, û di encam de jî talankarî û awayekî din ji zulm û stemê bi serê wan bihêt.

Kurdan piştî wergirtina qewlê Serokwezîr Qewam ji bo qerebûkirina wê zordariya derbazbûyî ku li derheq wan hatibû kirin, ew jî bi vê mercê razî bûn ku bi hikûmeta navendî wefadar bin.

Kurdan hevdem bi hewldana xwe bo rakêşana bala hikûmeta Amerîkayê, xwastin ku Amerîka jî, ji bandora xwe ya exlaqî li ser Îranê bi awayekî tevbigere, da ku hikûmeta Îranê siyaseteke dadperwerane li hemberî Kurdan bigre pêş. Yanî Kurdan di navbera xirab û xirabtir de, xirab hilbijartin. Bi baldan bi vê ku ew daxwaziya Kurdan hevdem bû digel pêşniyareke hevşêwe ji aliyê Wezareta Derve a Amerîkayê ve, “George Allen” balyozê (Wilayetên Yekgirtî li Tehranê) bala Qewam rakêşa, bona vê ku siyaseteke azadtir li hemberî êlên Îranê de bigre pêş. Formgirtina piraktîkî a siyaseta hikûmeta navendî li hemberî Kurdan piştî xweradestkirina vê dawiyê a wan, mijara raporeke din dibe.

**Belgeya hejmar: 101**

B. hejmar 59 3-

Hevpêç a yekem bi rapora rêkevt 15.01.1947

Li jêr serxetê: “Guherînkariyên siyasî di nava Kurdên Azerbaycanê li sala 1946`an”

**Kesayetiyên siyasî ên Kurd**

Qazî Mihemed serokê Komara Kurdî a Mihabadê, temenê wî nêzî 45 salan e. Xelkê Mihabadê ye, û ser bi malbateke birêz û dewlemed a Kurd e. Wî di xwendingehên vê herêmê de ders xwandiye, lê kariye li rex zanîna Tirkî û Farsî û Kurdî a herêma xwe, heta radeyekê jî Îngilîzî û Rûsî jî fêr be. Heya berî pêşreviya Rûsan, Qazî zêdetir bi sedema pêgeha xwe ya olî di nava Kurdên bakûr (Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê-nivîskar) de navdar bû, û ji aliyê êlên cuda û hikûmeta navendî ve rêz jê dihate girtin. Dema ku Sovyetî ji rêberekî Kurd digeriyan, bona vê ku bikarin wek Pîşewerî li Azerbaycanê mifahê jê wergirin, Qazî hilbijartin ku di vê serdemê de tenê Kurdek bû ku ji aliyê êlên bakûr ve rêz jê dihate girtin. Di vê qonaxê de bû ku Qazî guherînkariya xwe ji pêgeha pêşewayeke olî ve bo rêberekî siyasî yê komareke destçêkirî dest pê kir.

Di nîva duyem a sala 1945`an de general Atakîşyov rasipartiyê Qefqazî ê Sovyetê, bona hemşêvriya digel Qazî Mihemed û serokêlên Kurd, çend carî sardana Mihabadê kir. Baweriya giştî li ser vê ye, ku sedema sereke ya lihevkirina serokêlan bo nasandina Qazî hem wek rêberekî siyasî û hem jî wek serokekî olî, ew cih û pêgeha wî ya li cem Sovyetiyan bû, da ku bikarin rêjeyeke berçav ji çekên sivik û giran bi dest bixin.

Şarezayên karûbarên Kurdan li vir li ser vê baweriyê ne, ku ev dijhevî ku gelo çawa serkirdeyên xweperist ên êlên Kurd amade bûn, hikûmeteke destçêkirî a Sovyetê (Firqeya Demokrat a Azerbaycanê) qebûl bikin ku armancên wê, digel armanca wan serokêlan dijberiyeke mezin hebû, tenê dikare bi vê şêwazê were peçavtin, ku wan li hemberî reşebayê de xwe çemandin, da ku rê li ber destêwerdana

rasterast a Sovyetiyan di nava karûbarên Kurdan de bigrin.

Qazî Mihemed di warê kesayetî û taybetmendiya takekesî de, ji piraniya kesên ser bi Sovyetê ku niha li Azerbaycanê li ser deshilatê ne -yek ji wan Pîşewerî- li sertire. Ew Kurdekî asayî nine, tu nîşaneyek ji şerxwaziya caran a Kurdan û rengûrûyê çekdarî a wan êlên ku îro li ser kolanên Tewrêzê em dibînin, di wî de nahêne dîtin. Di gotûbêjên asayî de hemşêvriyeke aram heye, û heta dema ku baweriyên siyasî ên xwe bi awayekî hestewerane eyan dike, dengê xwe ji asteke diyarîkirî zêdetir bilind nake. Berdevkekî şareza ye, û bi baldan bi vê ku di eyankirina bîr û boçûnên xwe de, rastbêjiyeke gelek zêdetir ji kesên ser bi Sovyetê heye, û wisa xuya nake ku tu demekê li mekteba Hizba Komonîst de hatibe perwerdekirin. Qazî serbarê rabihoriya xwe ya olî, bi tu awayî Misilmanekî demargirj nine. Serokê Mesîhiyên Asûrî li Tewrêzê, û herwiha serperestyarê mîsyonê Katolîk ê Fransayê li wir, wî wek kesekî "sade" û "baş" bi nav dikin.

Di hember de berpirsên konsola Birîtanyayê li Tewrêzê li dijî van nerînan in, û bi xatircemiyeke tewaw ve, li ser vê baweriyê ne ku Qazî ji bilî kesekî fêlbaz û girêdayî bi Sovyetê, tu tişteke din nine. Renge ev boçûna vedigere ser vê ku Qazî bi zelalî dijberiya xwe bi Birîtanyayê re eşkere dike, û du caran zabitên konsolî ên Birîtanyayê bi gefa bikaranîna tundûtûjiyê ji Mihabadê hatin derkirin. Di vê derheqê de ku Qazî Mihemed kesek e ku sûdê ji derfetê werdigre, tu gumanek nine. Lê em dikarin wiha şirove bikin ku mifahwergirtina wî ji derfetê, tu reng û bêhneke îdeolojîkî pêve xûya nake. Di warê eşkerekirina hezkirina xwe li hember xelkê Kurd jî, heya radeyekê rastbêj e. Niha qedera şer ew xistiye eniya Sovyetê de, lê wisa xuya nake ku ew bixwe gelek ji vê rewşê razî be, gelek caran bi awayekî eşkere nîşan daye, ku hem baweriya wî bi Sovyetiyan nine, û hem jî bi berdevkên wan ên Azerbaycanî.

Mihemed Husên Seyfê Qazî, Wezîrê Şer ê Komara Kurdistan a destçêkiriyê Sovyetê, xelkê Mihabadê ye, û Kurdekî bajarî ye. Ser bi yek ji malbatên herî rêzdar e. Bavê wî Şêx Mihemed Seyfê Qazî yek ji zanayên ayînî ên kurdên bakûr ên ser bi malbata Qazî Mihemed, sala bihorî koça dawiyê kir. Wisa belav bûye ku Mihemed Husên

Seyfê Qazî gelek jîr e, û wisa xuya dike ku xwendina bilind bi dawî anîbe, û kêmek Îngilîzî û Firansî dizane.

Emerxan serokê êla Şikak e, û bo heyamekê jî Wezareta Şer a Komara Kurdistanê li stûyê wî bûye. Temenê wî nêzî 73 salî ye, û hertim digel hikûmeta navendî di şer de bûye. Beşek ji temenê xwe di girtîgehên Riza Şah de derbaz kiriye, û çend salan jî bo Tirkiyê hatiye dûrxistin. Hêşta jî wekî serhildêrekî tê hesibandin. Konsolê Birîtanyayê li ser vê baweriyê ye ku, yek ji sedemên herî girîng ku Qazî Mihemed dikare bo selimandina îdi`aya xwe di warê parastina seqamgîriya siyasî a herêmî de bîne, ew e ku heya niha kariye wefadariya Emerxan biparêze.

Ebûlqasim Sedrê Qazî, berdevkê Qazî Mihemed e li Tewrêzê. Temenê wî 50 salî ye. Herçend ku jidayîkbûyê Mihabadê ye, lê li Tewrêzê dijî, û milk û samaneke berçav di vî bajarî de heye. Xwendewar e, û di nav Kurdên Bakûr de rêz û hurmeteke zêde heye. Heyamekê li Meclisa Şêvra Millî de nûneratiya Kurdên Mihabadê li stûyê wî bû.

Zêro Beg, ji serokên tazepêgihîştî ên êla Herkî ye, û renge kesayetiyê herî heznekirî ê hikûmeta Mihabadê be. Temenê wî nêzî 40 salî ye, bi pirçeke kal û çavên şîn ve. Di mehên bihorî de zêdetir hez kiriye ku yonîforma Artêşa Sor li xwe bike, ne ya artêşa Komara Kurdistanê. Wî zanyariyeke wisa li ser rabihorî nine, herçend ku hejmarek ji Kurdên navdar bi nivîserê vê raporê ragehandine ku, Zêro Beg di destpêka jiyana xwe de, di xizmeta yek ji serokêlên Begzade de bûye, ku bi hezkirina xwe rêya Menfa li Îraqê girtibû pêş. Wî heyameke kurt piştî pêkhatina Komara Mihabadê, pile û payeya niha wek generalekî artêşa Kurdistanê bi dest anî, û bi stûxwarbûna bo berpirsên konsolî ên Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê) naskirî ye.

Reşîd Beg û Nûrî Beg, ji serokên herî girîng ên êla Begzade li herêma Rizayiyê (Urmiyê) ne.

Hacî Babe Şêx serokê Meclisa Millî a Komara Kurdistanê û piştî Qazî Mihemed girîngtirîn serokê olî ê Kurdên Bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistanê) ye. Temenê wî nêzî 65 salan e, û bi rêdîn û simbêlên xwe ên spî ve gelek şerîf û rêzdar e.

**Belgeya hejmar: 102**

B. hejmar 5-59

Havpêç a sêyem bi rapora rêkevt: 15.01.1947

Li jêr serxetê: "Guherînkariyên siyasî di nava Kurdên Azerbaycanê li sala 1946`an".

Serdana berpirsê konsolî yê balyozxaneya (Amerîka li Tehranê) "Ward" û Konsolyar "Duher" bo Mihabadê. Rapora konsolyarê balyozxaneyê "Angûs Ward"[2]

Sibehiya roja 16`ê Tîremehê digel konsolyar "Gerald Doher" me Tewrêz ber bi Mihabadê bi cih hêla. Rêzdar "Do Sênt Siwan" bi sedema nexweşiyê digel me nebû. Li ber vê ku sefera ji Tewrêzê bo Mihabadê hewcehî bi derbazbûna ji navçeya li jêr kontrola Kurdan hebû. Em hatibûne agehdarkirin ku hukmê hikûmeta Tewrêzê li van navçeyan bi rê ve naçe. Konsolyar "Gerald Doher" digel Qazî Mihemed rêberê Kurdên Bakûr li hev kiribûn, ku berpirsekî Kurd ji Tewrêzê heya Mihabadê digel me be. Piştî derketina ji Tewrêzê li tu yek ji rawestgehên lêgerînê em neravestandin, û tu lêpirsînek li me nehate kirin, ji bilî rawestgeha lêgerînê ya di navbera Meraxe û Binawê li 130 km a Tewrêzê, ku nobedarê wê postê bi Tirkî diaxivî, lê balkêş bû dema ku mijûl bû navê me di deftera xwe de dinivîsî, di ber xwe de bi Rûsî mizemiz dikir. Di vê demê de em ji rêya serekî derketin û piştî birrîna 12 km, me serdana Meraxê kir. Li wir di demekê de ku em mijûlî nanxwrainê bûn, em li jêr çavdêriya tund a polîs de bûn. Trombêlên me û ew resturanta ku me li wir nan dixwar, bi tewahî ji hêla polîsan ve hatibûn dorpêçkirin, û ji bilî kerkerên resturantê rê bi tu kesî nedihate dan ku nêzî me bibin. Li kolanên Meraxê me nêzî deh kesan dîtin ku wisa xuya dikir ku Rûsî bin, û heşt jinên ku rengê Rûsiyan didan, ji pencerê ve li me dinêrîn. Li Miyanduawê em çûne navçeya jêr deshilata Kurdan. Dawî hêzên çekdarê ên Azerbaycanê li bakûrê çemekê bûn ku bi dirêjahiya derdora bakûrê bajar dirêj bibû.

Li Miyanduawê, em bo vexwarina çayê gazî kirin binkeya

çekdarên Kurd, û bi rêz û hurmeteke zor ve mêhvandariya me kirin. Piştre em ber bi Mihabadê bi rê ketin, û piştî vê ku li 15 km a Mihabadê em gihîştin pira Cexetû, li wir ji aliyê şandeke Kurd ve ku ji Mihabadê hatibûn, pêşwazî ji me hate kirin. Şaredarê Mihabadê jî ji endamên şandê bû, û li Mihabadê jî bi germî pêşwazî ji me hate kirin. Min û konsolyar "Gerald Doher" me bi başî dît ku ew serdan çiqas xweş bû, û yekem car bû ku digel Kurdan min qise dikir. Berevajiyê ezmûna min, li wan beşên Azerbaycanê ku Kurd nînin, min dikarî bi hêsanî bi Rûsî digel wan biaxivim, lê di herêma Kurdan de min kes nedît ku bikare bi zimanê Rûsî biaxive. Helbet ez digel hejmarek ji Kurdên Îranî û Îraqê nasyar bûm ku Îngilîzî dizanîn, yan Kurdên Sûriyê ku zimanê Fransî dizanîn.

Ya ku min dît Kurdên Mihabadê gelek netewexwaz bûn, ji vê ku di Îranê de wek kêmaniyeke jibîrkirî reftar digel wan dihate kirin, û gelek gilî û gazinde hebûn, û ji reftara kirêt ya berpirsên hikûmî û leşkerî ên Îranê nerazî bûn, û gilî û gazinde ji xemsariya hikûmeta navendî derheqê avakirina xwendingeh û dermangehên giştî digirtin. Herçend ku ez di rewşekê de nebûm ku bikarim ji rastbûna axavtinên wan xatircem bim, lê ji gilî û gazindeyên wan derbarê xirabbûna rê û banan bi başî tê gihîştim. Rêya sereke ya di navbera Şapûr (Selmas) û Rizayiyê (Urmiyê) li rojavayê gola Urmiyê û rêya sereke ya di navbera Miyanduaw û Mihabadê li beşa rojhilat de, rewşeke pir xirab hebû. Encama van nerazîbûnên ji hikûmeta navendî, di nava Kurdan de têgihîştineke wisa pêk anîbû ku ew li ser vê baweriyê bûn, hekî di van herêman de rêkxistineke Kurdî bête avakirin, rewş ne tenê ji ya heyî xirabtir nabe, belkî wê baştir jî be.

Kurd xelkekî ji xwe razî û serhişk û eşîretî ne, û di cîbicîkirina karûbarên eşîretî ên xwe de tu kêşeyeke wan nine, lê bi tu awayî ez xatircem nînim ku ew bikarin di warekî berfirehtir de jî şiyaneke wisa hebin. Ew Kurdên ku min dîtin, derheqê cureya wê rêkxistina neteweyî de ku bikare xwestekên wan dabîn bike, hevdeng nebûn. Hinek ji wan daxwazkarê cureyek ji otonomiyê di çarçoveya Îranê de bûn, û girûpeke din jî daxwazkarê cudabûna tewaw ji Îranê û

têkelbûna wan digel Kurdên cîran (li Îraq û Tirkiye û Sûriyê) bûn. Têgihîştina min ew e ku ew li ser gihîştina bi azadiyê ji bo Kurd pêdagir in, heta hekî destpêregihîştin bi vê armancê, tenê ji rêya hewarbirina bo çekê bi dest ve bihêt.

Li gor wan zanyariyên ku min cuda ji Kurdan, ji çavkaniyên din ên li dema serdana xwe a bo Mihabad û Rizayiyê (Urmiyê) bi dest xistine, Kurdên bakurê (bakurê Rojhilatê Kurdistan) Îranê ku piraniya wan Sunnî ne, nêzî 6 hezar kesî hêza rêkxiraw (bi Yonîform ve) hebûn. Texmînkirina hejmara çekdarên nerêkxistî ên Kurd dijwar e, lê bi baldan bi vê ku her Kurdekî servey 12 salî, çekdarekî qabil e, û heta jinên Kurd jî di dema pevçûnan de, mil bi milê hevjînên xwe disekinin, dibe hejmara wan gelek zêde be.

**Belgeya hejmar: 103**

B. hejmar 6-59
Havpêça çarem bi rapora rêkevt: 15.01.1947
Li jêr serxetê: "Guherînkariyên siyasî di nava Kurdên Azerbaycanê li 1946`an"
Serdana berpirsê konsolî yê balyozxaneya (Amerîka li Tehranê) "Ward" û konsolyar "Duher" bo Mihabadê.
Rapora konsolyar "Gerald Doher"

Piştî sefereke bê kêşe li Azerbaycan û Kurdistana Bakur (Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê-nivîskar) digel serokê navenda ragehandinê ya Kurd, ku ji aliyê Qazî Mihemed ve wek şareza digel me hatibû destnîşankirin, paşnîvroya roja 16`ê Tîrmehê em çûne nav Mihabad a paytexta Komara Kurdistanê. Şaredarê Mihabadê û çend kesek ji berpirsên Komarê, ji gundekî li bakûra bajar hatibûn bo pêşwaziya ji me, û heya cihê ku me dixwast em herin, bi me re bûn. Bi rêz û hurmeteke zêde, mêhvandarî ji me hate kirin, û Kurdan hemû hewla xwe dan, ku serdana me di çarçoveyeke nefermî de bimîne.

Paşnîvroya wê rojê hejmareke zaf ji berpirsên Kurd, ku ji yekem serdana me bo Mihabadê kêfxweş bûn, û dîtin ku berpirsên Amerîkayî li Mihabadê ne, bo serdana me hatin wê malê ku em tê de bûn, û rêz û hurmeta xwe bi me ragehandin. Şaredarê Mihabadê serokê Meclisa Millî a Komarê û endamên kabînê li rêza serdankeran de bûn.

Yên ku serdana me kirin, bi hezkirin û xwesteka xwe, lê bi mercê nihênîmana behsan, li ser rewşa siyasî a Kurdistanê û daxwaziyên Kurdan û bernameyên kurtheyam û dirêjheyam ên Komarê, digel me gotûbêj kirin. Wan pêdagirî dikirin ku naxwazin ew beşek ji Azerbaycana Demokrat bin, belkî dixwazin xwediyê otonomiya kulturî û îdarî û beşek ji neteweya Îranê bin. Hejmarek ji wan bas ji vê dikirin, ku avakirina dewleteke serbixwe ya Kurd ku "Sê milyon Kurdê Tiriyê, sê milyon Kurdê Îranê û nîv milyon Kurdê Sûriyê, û yek û nîv milyon Kurdê Îraqê û çaryek milyon Kurdê Sovyetê" li xwe

digre, armanca dirêjheyam a siyaseta Kurdan e.

Bi vî halî jî piştî xwarina şîvê, êvariya wê rojê serokê îdareya perwerdehiya giştî a Komarê ku pêştir li hember berpirsên konsolxaneya Amerîkayê li Tewrêzê helwetseke dostane hebû, ragehand (Xwediyê wan boçûnên ku hate baskirin) Qazî Mihemed û alîgirên wî amade ne ku aliyê kêm ê van poanên jêrîn ji hikûmeta navendî qebûl bikin:

1)-Avakirina parêzgeheke Kurdî di çarçoveya Îranê de, li herêmên Kirmaşan, Hemedan, Erdelan, Loristan û li Azerbaycanê jî hemû herêmên rojava û başûrê gola Urmiyê, û ji wan jî bajarên Xoy, Makû, Şapûr, Rizayiyê (Urmiyê) û Miyanduawê li xwe bigre. Ew wilayet dibe ji aliyê parêzgarekî Kurd ve were birêvebirin ku ji Tehranê tê destnîşankirin, û xwediyê encumeneke wilayetî be, ku ji aliyê xelkê herêmê ve bihête hilbijartin.

2)-Otonomiya kulturî zêdetir bi vê watayê ku heta pola şeşê xwendin bi zimanê Kurdî be.

3)-Artêşa Komara Kurdistanê bibe beşek ji Artêşa navendî û her wek niha li jêr fermana zabitên Kurd -ji wan jî fermandê parêzgehê-de be. Ev yek jî nabe rêgir be ji hebûna zabitên payebilind ên Îranî di warê teknîkî de, ku nekarin wek şêvirmend li artêşa Kurdistanê de xizmetê bikin. Her vê çavkaniyê em agehdar kirin, ku Asûriyên Kurdistanê û girûpên cudabûyî ji Ermeniyan û Cihûyên herêmê jî, bi tewahî piştevaniyê ji hikûmeta Mihabadê dikin.

Têbîniyên konsolyar “Ward” di dema serdana xwe ya hefteya bihorî bo Rizayiyê (Urmiyê), û axavtinên pêştir ên rêberên Asûrî li cem min, vê îdi`aya Kurdan piştrast dikin ku Asûrî piştevaniyê jê dikin. Li Mihabadê hemû nîşane selmînerê vê yekê bûn ku Qazî Mihemed û tevgera wî nifûzeke gelek berfireh li hemû Kurdistanê hene. Hemû ew serokên ku me bi wan re axivî -hinek serkirdeyan li Sine, Bokan, Serdeşt- wisa xuya dikir ku Qazî Mihemed wek rêberê xwe yê siyasî qebûl dikin. Xelkê Mihabadê jî wek alîgirên herî nêz ên vê tevgera nû xûya dikirin.

Mohlet bi me hate dan ku em hemû cihên Mihabad û derdora wê bibînin. Tu nîşaneyek ji bandora Sovyetê bi ser vî bajarî de

diyar nine, di demekê de ku Tewrêz û bajarên din ên Azerbaycanê tejî ji endamên polîsê nihênî ên Sovyetê , û N.K.W.D ne, lê me di Mihabadê de heta yek kes jî ji wan nedît. Birêveberê îdareya perwerdehiya giştî a Mihabadê ragehand ku, bi sedema vê ku berpirsên Kurd amade nînin digel hikûmeteke wek hikûmeta niha a Azerbaycanê ku li jêr teror û tirsa Sovyetê de hatiye avakirin jiyana xwe derbaz bikin, gelek bi tundî li dijî hevalbendiya bi Azerbaycanê re ne.

Eva ku me di dema çûna bo Mihabadê û vegera xwe de dît, selmênerê vê bûn ku Kurd dest bo herêmekê dirêj dikin, ku hikûmeta Tewrêzê jî bi ya xwe dizane. Bajarê Miyanduawê ji bilî serbazgehekê ku li bakûrê bajar hilketibû, û di destên hêzên Azerbaycanê de bû, bi tewahî li kontrola hêzên çekdar ên Kurd de bû.

Berpirsên Kurd ragehandin ku naxwazin digel hikûmeta navendî şer û kêşe di navbera wan de hebe, meger eva ku hêriş li ser wan pêk bê. Herwiha gotin ku wan tank û topxaneyên giran nînin, lê hekî hewce be ku berxwedanê bikin, eva dikarin dehan hezar çekdarî kom bikin. Di dema serdana nav bajar de, me çend sed çekdar dîtin ku bi kincên hemşêwe di nav bajar de bûn, û wisa xuya dikir ku di şer û pevçûnên vê dawiyê ên li derdora Seqizê de beşdar bûn. Lê piraniya hêza çekdar a Kurd ji hêzên nerêkxistî û sunnetî pêk dihat, ku dikarîn çekê bi dest ve bigrin.

Vê serdanê em anîne ser vê baweriyê ku Kurd hêvîdar in têkiliya herî nêzîk bi Amerîkayê re hebin. Wan bona nîşandana helwsta dostane ya xwe hemû hewlek dan, û daxwaz ji me hate kirin ku, her Amerîkiyekî agehdar bikin, ku hekî hez bikin serdana Kurdistanê bikin, emê jî pêşwaziyê ji wan bikin.

**Belgeya hejmar: 104**

B. hejmar 1-61
Karûbarên Derve ên Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê
Nihênî: Hejmar 275
Tehran: Îran, 27.01.1947
Mijar: Kurdên Bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistan) piştî herifîna Komara Kurdistanê
Birêz Wezîrê Derve, Waşington

Bi şanazî ve kurtiyek ji bûyerên herêmên Kurdnişîn ên Azerbaycanê piştî herifîna hikûmetên destçêkirî ên Sovyetê li Kurdistan û Azerbaycanê bo agehdariya wezaretxanê hevpêç dikim. Ev kurtiya ji aliyê konsolyar "Gerald Doher" û di doma rapora pêşîn a wî, derbarê rewşa siyasî a Kurdan ku bi hejmar 262, rêkevt 15`ê Çileya Paşîn a 1947`an ji aliyê balyozxanê ve hatibû şandin, hatiye amadekirin. Ev rapora pişta xwe bi komek zanyariyan ve girê dide, ku ji aliyê Kurdên navdar ên Tehranê ve li ber destê zabitên şanda leşkerî hatiye danîn, û herwiha encama gotûbêjan e digel Hebîb Emîrî nûnerê Emerxan û serokê êla Şikak ku niha bo pêşkêşkirina çend nameyên rêberên Şikak bo serokwezaîran û Wezîrê Şer hatiye Îraqê.

Çend nusxeyek ji wan nameyan hatine hevpêçkirin, ku tê de bas ji amadeyiya Şikakan bona xweradestkirina tewaw bi hikûmeta navendî hatiye kirin, û herweha tê de bas ji radestkirina hemû wan çekan hatiye kirin ku bo rêgirtina ji talanên eşîretan ji aliyê sînorê Kurdistana Îraq û Tirkiyê ve hewce nînin. Balyozxaneyê li ser van nameyan digel general "Bormen Şiwartiskov" (şêvirmendê) jandermêriya Îranê gotûbêj kiriye, û ew li ser vê baweriyê ye, ku naveroka van nivîsan, hilbijartina siyayseteke gelek maqûlane ye ku ji aliyê Şikakan ve tê nîşandan, ku êla herî bihêz a Kurd di Îranê de ne. Pêşniyara Şikakan li ser çekdanîna tewaw bi vê mercê ku hikûmeta navendî bikare hêzeke hewce ya ser sînor di vê herêmê de cihgir bike, wek pêngaveke bibandor bo çareseriya kêşeya êlan

tê berçav, jiber ku çekkirina vê êla girîng, wê bikare êlên din ên Kurdistanê jî han bide, ku çav li wan bikin.

Digel rêz û hurmetan

"George D. Allen"

Balyozê Amerîkayê

Hevpêç:

1-Kurtiya bûyeran li Kurdistana Bakur (Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê-nivîskar).

2-Nameya Emerxan bo Serokwezîran Qewam.

3-Nameya heft kes ji serkirdeyên Kurd bo Serokwezîran Qewam.

4-Nameya heft kes ji serkirdeyên Kurd bo Wezîrê Şer Emîr Ehmedî.

Kopiyek jî bo balyozxaneya Moskoyê, balyozxaneya Enqerê, Balyozxaneya Bexdayê, nûnertiya Beyrûtê, konsolxaneya Tewrêzê.

**Belgeya hejmar: 105**

B. hejmar 2-61

Havpêçê yekem bi nameya hejmar 275,

rêkevt 27.01.1947`an li jêr navê:

“Kurdên Bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistan) piştî herifîna Komara gelê Kurd”

Kurtiya bûyerên vê dawiyê li Kurdistana Bakur (Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê-nivîskar)

Amadekirî ji aliyê: Konsolyar “Gerald Doher”

**Mihabad**

Hêzeke artêşa hikûmeta navendî a Îranê ku di bin fermandehiya general Homayonî de bû, Sine bi cih hêlaye, û paş pîvana rêyekê li beşa başûr a bi nav komara gelê Kurd, bi bêy vê ku berbirûyê tu bergiriyekê bibe, li roja 13`ê Çileya Pêşîn çûye Miyanduawê. Li wir pêşqerawelê artêşa hikûmeta navendî digel Qazî Mihemed serokê hikûmeta destçêkirî a Mihabadê berbirû bûn, û wî û endamên hikûmeta xwe, xwe radestî general Humayonî kirin. Qazî Mihemed digel hêza şandî a artêşê ber bi Mihabadê çû, û li wir hate destbiserkirin. Li gor çavkaniyên hikûmeta Îranê, Qazî Mihemed kilîda çek û cebilxaneya Mihabadê dabû Mela Mistefa Barzanî, ku rêberê Kurdên Îraqê bû, û sala bihorî piştî şoreşeke neserkevtî û li dijî hikûmeta Îraqê ber bi Îranê ve reviyabû. Li gor raporan, Barzanî çekên di nav cebilxaneya Mihabadê de talan kiriye, û bûye metirsiyeke gelek mezintir ji berî xweradestkirina Qazî.

Mihemed Husênxan kurmamê Qazî ku li hikûmeta Mihabadê de Wezîrê Şer bû, û herwiha birayê wî Sedrê Qazî nûnerê pêşîn ê meclisa Îranê, ku ji aliyê artêşê ve bi dizî ji Tehranê bo Mihabadê hate veguhastin, digel Qazî Mihemed hatin destbiserkirin. Di destpêka meha Çileya Paşîn de, dadgeheke taybetî a leşkerî bo dadgehîkirina wan sê rêberên tevgera cudahîxwaz a Kurd li Mihabadê bi tohmeta îxanetê pêk hat. Li gor çavkaniyan ev dadgeh bona vedîtina hin

şahidan bû, da ku bikarin li dijî tohmetbaran şahidiyê bidin. Lê ew dadgeh rastî dijwariyeke zêde hat, û di qonaxekê de neçar bû bi belavkirina daxuyaniyekê di nav bajar de, ku daxwazê bike ku ewên gilî û gazinde ji vê hikûmeta dasepayî (Komara Kurdistanê) hene, di dagehê de amade bin.

Bi sedema dijwariyên dadgeha leşkerî, zelal bû ku hersêk ji wan bi tohmeta îxanetê, wê cezaya bidarvekirinê bi ser wan de bihête sepandin. Di rastî de li 19`ê Çileya Paşîn (29 `ê Befranbarê) biryara tawanbarbûn û bidarvekirinê derheqê wan de hatibû dayîn, lê li ber vê ku diviya hersê biryar ji aliyê Şah ve bihê pesendkirin, hersêk li girtîgeha Mihabadê çavnihêrê biryara Şah in. Şah niha bona vê ku bidarvekirina van tohmetbaran nebe sedema vê ku, ew bibin "şehîdên riya gelê Kurd" egera guherîna cezaya bidarvekirinê bo zîndana heta-hetayî gengeşe dike.

Egera vê yekê jî heye ku berpirsên konsolxaneya Sovyetê li herêmê, bi pêdagirîkirina li ser vê ku, di serdema kontrola Sovyetê de, hemû berpirsên Kurd ji destêwerdana berpirsên kêrnehatî ên navendê parastî bûn, bixwaze ji derçûna her cure cezayeke tund bi ser tohmetbaran wek derfetekê bo vegerandina maytêkirina xwe ya ji dest çûyî di herêmê de bi kar bîne, lewra divêt em vê mijarê berçav bigrin.

Şah di navbera du vebijêrkan de dudil e. Ji aliyekî ve razîkirina artêşê bi cîbicînekirina biryara bidarvekirina Qazî Mihemed û jêrdestên wî bû. Ew agehdarî vê yekê jî bû ku êlên Kurd ên Azerbaycanê, dikarin wek berbestekê li hember vegeşîna Sovyetê li bakûrê Îranê tevbigerin. Ger wisa nebe Kurd dikarin bi hilbijartina dubare ya helwestekê ku heya vê dawiyê jî hebûn, wek emrazekê bo pêşvebirina siyaseta Sovyetê li Rojhilata Navîn tevbigerin.

Herweha Şah dizanî ku berçavgirtina siyaseta xwîn û polayê li Kurdistanê, bi tu awayî nikare destpêka siyaseteke nermtir di hember êlan de xuya bike, siyasetek ku hikûmeta Amerîkayê bi hikûmeta Îranê pêşniyar kiriye da ku bigre pêş xwe.

**Barzanî**

Hebûna pênc heya heşt hezar kesan ji endamên êla Barzan ku di bin fermandehiya yaxiyê navdar Mela Mistefa ji Îraqê ve bo Îranê reviyane, û piştî herifîna Komara Mihabadê, ew li herêma Mihabad-Şinoyê akincî bû, û wî rewşa siyasî a Kurdistanê aloz kiriye. Barzanî piştî talankirina cebilxaneya artêşa hikûmeta Mihabadê, berî vê ku hêzên hikûmeta navendî dest bi ser bajar de bigrin, bi armanca vê ku li egera her kiryareke artêşê bona şopandina wan, ew bikarin artêşê berbirûyê bergiriyeke tund a xwe bikin, ber bi herêmên navxweyî ve vekişiyane.

Mela Mistefa û fermandeyên di bin fermana wî de, daxwaza general Homayonî bona radestkirina çekan qebûl nekirin, lê Mela Mistefa bona danûstandina digel general Homayonî derheqê siberoja alîgirên xwe hate Mihabadê. Helbet amadebûna wî ku xwe dixiste ber destê artêşa Îranê, berî vê ku bi sedema xatircembûna ji cîbicîbûna xwestekên xwe be, zêdetir bi vê sedemê bû, ku wî baş dizanî, heya demekê ku çend hezar çekdarên eşîretî ên peyt û teyar li rex serbazgehên biçûk ên artêşê li Azerbaycanê hebin, artêş nevêre reftareke xirab digel wî bike.

Homayonî ku nedikarekî berpirsatiya diyarîkirina siyaseta hikûmeta navendî li hember Barzaniyan bigre stûyê xwe, bi taybet bi sedema karvedanên vê siyasetê li hemberî hikûmeta Îraqê, wî Mela Mistefa ji bo danûstandina digel berpirsên payebilind li jêr çavdêriyê de şande Tehranê. Tê gotin ku Barzaniyan bona garantîkirina vê ku Mela Mistefa bi silametî ji Tehranê vegere, pênc zabitên Îranî wek rehîn (barimte) cem xwe ragirtine. Hikûmeta Îranê daxwaza hikûmeta Îraqê ji bo radestkirina rêberên Barzaniyan ret kiriye, û pêşniyar kiriye ku êla Barzanî li herêmekê li başûrê Hemedanê bêne nîştecihkirin. Lê ew biryar di warê exlaqî de Îraniyan di hemberî berpirsên cezakirî ên hikûmeta pêşîn a Mihabadê de dixe rewşeke dijwar de. Jiber ku ew kar bi wateya xelatkirina Mela Mistefa ye, ku ji dîtingeha binpêkirina serweriya Îranê, di sala 1946`an de tawaneke gelek girantir ji ya Qazî Mihemed kiribû, û li jêr bandora

Sovyetiyan de bû. Di demekê de ku Qazî Mihemed li ber çavên hikûmeta dagîrkar a Sovyetê li Azerbaycanê wek kelemekê bû, di nîva duyem a 1946`an de cezaya bidarvekirinê jê re hatibû birrîn.

Mela Mistefa û êla xwe berî her tiştî daxwazkarê vegeriyana bo welatê xwe li bilindahiyên bakûrê Îraqê ne, û gotine ku hekî ew ji bêalîtiya Birîtanyayê di dema her cure pevçûneke xwe digel hikûmeta Îraqê xatircem bin, ger bi derba hêzê be jî, ewê vegerin Îraqê, lê Birîtanî amade nînin xwe bixin nav vê kêşeyê de.

**Şikak**

Emerxan rêberê Kurdên Şikak li 11`ê Çileya Pêşîn ji girtina bajarê Miyane ji hêla hêzên hikûemta navendî ve hate agehdarkirin, û wî jî ew plana destpêkî ya xwe xiste warê cîbicîkirinê, ku du mehan pêştir, li Tewrêzê konsolyar "Gerald Doher" jê agehdar kiribû.

Ew plan jî pêk dihat ji derxistina bajarên Rizayiye (Urmiye), Şapûr, Xoy û Merendê ji destên Firqeya Demokrat, û parastina wan heya wê demê ku hêzên artêşê ji başûr û rojhilatê Azerbaycana Rojava ve digihîjne hevdu. Hebîb Emîrî nûnerê Emerxan bi nivîskarê vê raporê ragehandiye, ku Şikak li hemberî wan berpirsên naskirî ên Firqeya Demokrat, ku li dema kontrolkirina bajaran ketibûn destê Şikakan de, bêwefa bûn. Bi egereke zêde mebest ji vê bêwefayiyê, kuştina hemû wan berpirsên Firqeya Demokrat e ku hewl dabûn Emerxan neçar bikin ku hevkariya hikûmeta dasepayî a Tewrêzê bike. Herwiha mebest talan, û şer û pevçûnên berdewam e, bi awayekî ku di nava Kurdan de bûye adet, û her derfetek dest wan bikeve, wî karî dikin. Lê bi giştî wisa xuya dike ku bi sedema deshilata hesinîn a Emerxan li ser alîgirên xwe, Kurdên Şikak bi giştî reftareke baş ji xwe nîşan dane.

Emerxan di hewlekê de, ji bo daxistina rêya revîna Pîşewerî ber bi Sovyetê, bixwe rêberatiya hêzekê dikir ku ji sed siwarên Şikak pêk hatibûn, û bilez ber bi Merendê ve çûn. Li gor gotina Hebîb Emîrî ew hêz tenê du demjimêran piştî derbazbûna trombêla Pîşewerî

gihîşte Merendê, û nekarîn erkên xwe cîbicî bikin. Emerxan li Merendê çavnihêrê hêzên hikûmetî ma, û piştî gihîştina wan hêzan bixwe ber bi Tewrêzê ve çû, û li wir wek welatparêzekî rastîn ê Îranî pêşwazî jê hate kirin.

Dema ku serheng Zengene parêzgarê nû yê Rizayiyê (Urmiyê), Tewrêz ber bi Rizayiyê (Urmiyê) bi cih hêla, Emerxan jî di rêza hevalên wî de pêgeheke bilind hebû, û Zengene li Rizayiyê (Urmiyê) serkirdeyên Kurd ên herêmê ku hemû hevalên Emerxan bûn, bo civînekê vexwandin, û tenê Zêro Beg ji êla Herkî di vê civînê de amade nebû. Ew ditirsiya ku bi sedema pêwendiya nêzîk digel konsolê Sovyetê li Rizayiyê (Urmiyê), bê destbiserkirin. Ligor gotina Hebîb Emîrî nûnerê Emerxan di vê civînê de, hevahengiyeke tewaw di navbera wan de hebû. Kurdan qebûl kirin ku stûxwarê fermande û hakimê leşkerî bin. Pirsa çekkirina êlan nekete ber bas û Serheng Zengene gengeşeya vê behsê xiste demeke din, da ku ewlehiyeke zêdetir di herêmê de hebe. Piştî vê civînê Emerxan vegeriya binkeya xwe li Zindeştê.

Li destpêka Çileya Paşîn ew fermana ku Şikak jê ditirsiyan, ji Rizayiyê (Urmiyê) ve gihîşte wan: Diviya ku wan hemû çekên xwe radestî hêzên leşkerî bikirana. Di vê heyamê de ku Emîrî ber bi Tehranê ve hate şandin, da ku çend nameyan bide Serokwezîr Qewam û Wezîrê Şer Emîr Ehmedî, Emerxan û serokên jêr fermana wî, bi vî karî wext û derfet dikirîn. Emîrî berî vê ku nameyan bide Qewam û Emîr Ehmedî, hebek ji her yek ji wan nivîsan dane nivîskarê vê raporê.

Gotina giştî ya wan ev e, ku Şikak li dijî çekkirina xwe ji aliyê artêşê ve nînin, lê pêdagiriyê dikin ku bo vê armancê, yan divêt hikûmeta navendî qewl bide, ku bona rêgirîkirin ji hêrişa êlên din li aliyê din ên sînorên Tirkiyê û Îraqê ve, hêza hewce bo vê herêmê were şandin, yan jî divêt rê bihê dan ku bo parastina xwe çekên hewce hebin. Ligor gotina general “Normen Şiwartiskov” şêvirmendê jandirmiriya Îranê metirsiya talançîtiya Kurdên aliyê din ê sînor bo Kurdên Îranê metirsiyeke rasteqîne ye, û wan ew pêşniyar daye Şah, ku bedela çekkirina hemû êlên Kurd, ya baştir

ev e ku rê bidin kesên berpirsên êlan, da ku çekên xwe li cem hikûmetê tomar bikin û ragirin, û erk û vezîfeya parastina sînoran li hember talankariyên Kurdên Tirkiye û Îraqê jî, bi wan bê spartin. Deqa tewaw ya nameyên serkirdeyên Şikak bi awayê hevpêç yê 2,3, û 4 digel vê raporê hatiye hevpêçkirin.

**Hikûmeta Navendî**

Yek ji aliyên xirab ên rewşa Kurdên Îranê ew e ku hêşta hikûmet bona pêregihîştina bi rewşa êlan, siyaseteke yekparçe ranegehandiye. Wisa xuya dike ku Serokwezîran Qewam bixwaze siyaseta sunnetî a serkutê vêde bide. Eva di demekê de ye ku artêş dixwaze siyasetekê li ser bingeha xwîn û polayê bigre pêş. Bi cezaya bidarvekirina rêberên Mihabadê, û ragehandina hikûmeta leşkerî bo hemû herêmên êşîretî û çekkirina wan, dîsan jî artêş nikare ewlehiya wan herêman biparêze. Şah wek fermandeyê giştî yê artêşê, bo vegerandina siyaseta sunnetî a deshilatdariya leşkerî, di bin zexta berdewam de ye. Di rastî de ger em jî nebêjin, lê xûya ye û hewcehî bi vê zextê nine. Ger di şiyana wî de jî nebe, lê bi berçav wisan e, ku ew jî bi pêngavdanîna di cihê bavê xwe de, çareseriya kêşeya êlan bi rêya tundûtîjiyê dibîne.

Lê ew ji esasgirtina siyasetekê ku bikare boçûna erênî ya Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê û endamên din ên NY li hember Îranê biguhere, dudil e. Bi taybetî jî ku vê siyasetê hêceteke wê ya exlaqî jî tuneye. Balyoz “George Allen” hikûmeta Îranê ji rasipardeya Wezareta Derve ya Wilayetên Yekgirtî derheqê vê yekê de ku, berçavgirtina siyaseteke eşîretî a azadtir, dikare armanceke baştir be ku Îran bigre pêş, agehdar kiriye. Di encam de wisa xuya dike ku serbarê hezkirina Şah û dijberiya Qewam bo hezkirina artêşê, dewleta Îranê neçar dibe ku li hember Kurdan û renge êlên girîng ên din ên Îranê jî, siyaseteke nermtir bigre pêş.

**Belgeya hejmar: 106**

B. hejmar 3-61

Hevpêçê hejmar 2 bi nameya hejmar 275, Rêkevt 27.01.1947`an li jêr navê: “Kurd piştî herifîna Komara gelê Kurd”.

Hezretê eşref Qewam El-seltene Serokwezîrên Îranê, em daxwazkar in ku ev nameye pêşkêşî we be.

Hezretê eşref, hûn ji rabihoriya min agehdar in û bi başî dizanin ku bona xizmetkirina bi nîştiman û hikûmetê, her çi di şiyana min de ye min kiriye, û di birêvebirina fermanên hikûmetê de, ez kesê yekem bûm. Piştî heşt salan mana di girtîgehê de, bi bê sedem û bi bê tawan, di wê heyamê de ez ji jiyanê bêpar bûm. Piştî azadbûna min, ez bona cihgirbûna ewlehî û yasayê di herêma xwe de, min hemû hewla xwe daye, û min îzin nedaye ku kes destê xwe bo mala kesê dirêj bike. Di heyama pênc salên bihorî de, di hember her cure zextekê de, ez xweragir bûm. Belge diselimînin ku min tu demekê li dijî hikûmetê karek nekiriye, û min tu pêngav hilnegirtine.

Di rastî de hertim ez alîgirê hikûmetê bûm. Di heyama mehên bihorî de, ji rêya rêzdar Emîrî ve, çend peyamên hezretê eşref gihîştin min. Min tu demekê guh nedane telegrafên berdewam ên Pîşewerî û min ew piştguh xistin. Belkî berevajî wê, min dijayetiya wan jî kir, û min rê neda ku di vê herêmê de wan tu deskeftek hebe. Niha em şukra Xwedê dikin, ku bi vegeriyana artêşa Şahenşahî, carek din me ewlehî heye. Bona birêvebirina her cure fermanekê ku ji aliyê hezretê eşref ve bête dan, amade me, û emrên we bi rê ve dibim.

Kak Hebîb Emîrî, nûnerê êla Şikak, wê axavtinên din bigehîne xizmeta hezretê eşref

Emer Şerîfî

Serokê êla Şikak

**Belgeya hejmar: 107**

B. hejmar 4-61

Hevpêçê hejmar 3 bi nameya hejmar 275, Rêkevta 27.01.1947`an li jêr navê: "Kurdên Bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistan) piştî herifîna Komara Gelê Kurd".

Hezretê eşref Qewam El-seltene Serokwezîrên Îranê, em xizmetkarên êla Şikak van xalên jêrîn bi we radigehînin:

Yekem û berî her tiştekî em spasiya Xwedê dikin bo serxwebûna Îranê û silametiya Şahenşah û hezretê eşref.

Hezretê eşref baştir dizanin ku di heyama sê salên bihorî de, em heya çi radeyekê li jêr zext û givaş û stema îxanetkaran û cinayetkaran de bûn. Niha ku bi vegera artêşa Şahenşahî, çavê neyaran kor, û destên tawanbaran ji etega dayîka nîştiman kurt bûye, li jêr baldan û kerema mezinan, em dikarin jiyaneke şerfetmendane bigrin pêşiya xwe, û em şukra Xwedê dikin.

Niha artêşa Şahenşahî daxwaz ji me kir, ku em çek û teqemeniyên xwe radest bikin. Helbet hezretê eşref bi başî agehdar in ku bi salan e, ku êlên Îranî digel êlên Tirkiyê dijminatiya wan heye. Hemû êlên Tirkiyê çekdar in, û hekî xulam di rewşa niha de bêne çekkirin, bi baldana bi vê ku niha sînor nahêne parastin, ewê jin û zarokên me êxsîr bikin û wê jiyana me jî talan bikin. Di vî warî de em bi hurmet ve ricayê li hezretê eşref dikin, fermanê bidin zabitên berpirs, ku erk û vezîfeya parastina sînoran bigrin destê xwe, û piştî vê ku em xatircem bûn ku can û malê me ji destdirêjiya çete û talançiyan wê parastî be, hingê emê bixwe hemû çekan radestî we bikin, û di nava asûdeyî û ewlehiyeke bêhempa de, emê du`aya silametiyê bo hezretê eşref bikin.

Niha em ji van çekan bo parastina xwe li hemberî destdirêjiya xelkê din mifahê distînin, û hekî hezretê eşref biryarê bidin, emê bixwe sînoran biparêzin, û li wan herêmên ku bi me têne spartin, em berpirsatiya her bûyereke nexwastî digrin stûyê xwe. Bi her hal, li ber vê ku Kak Hebîb Emîrî heyameke zêde li vir kar kiriye, û

bona rakêşana dostaniya xelkê zêdetirîn hewl daye, û ew derfet ji me re pêk aniye ku qise û gotina me bigihîje xizmet hezretê eşref, û herêmê jî bi başî nas dike, em vî rêzdarî wek nûnerê xwe didin nasîn, da ku bi devkî di xizmeta we de, axavtinên me bigehîne we, û rohnkirina hewce li ser bide.

Em çavnihêrê emrê hezretê eşref in:

Tahir Simîtkozade, Şêro Pisaxa, Qotaz Mamedî, Ebas Fenekî, Hesen Hinare, Mihemed Îsma`îl, Sertîp Mamedî.

**Belgeya hejmar: 108**

B. hejmar 5-61

Hevpêçê hejmar 4 bi nameya hejmar 275, Rêkevt 27.01.1947`an li jêr navê: "Kurdên bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistan) piştî herifîna Komara Gelê Kurd".

Wezareta Şer a Şahenşahî, em dixwazin van xalên jêrîn di xizmeta we de bas bikin:

Ji aliyê Artêşa Şahenşahî daxwaz ji me hatiye kirin ku em çekên xwe radest bikin. Li ber vê ku sînor nahêne parastin û berpirsayetiya parastina wan sînoran li stûyê kesê nine, û emê xizmetkar jî me digel êlên Tirkiyê dijminatî heye, û hêşta jî ew dijminatî berdewam e, jiber vê yekê ger di rewşa niha de em çekên xwe radest bikin, êlên Tirkiyê wê me ji nav bibin, û ya ku me heye wê talan bikin.

Lewra em bi minetdarî ve, daxwazê ji Wezareta Celîle dikin ku bona cihgirkirina hêza hewce bi dirêjahiya sînoran, fermana hewce bidin, û piştî xatircembûna ji vê ku mal û canê me ji metirsiya jinavçûn û talankirinê tê parstin, û piştî wergirtina soza hewce ji aliyê wezaretxaneyê ve bo ewlehiya me, emê çekên xwe radest bikin. Niha bi van çekên ku di destên me de ne, em xwe diparêzin û em xatircem in ku Wezareta Celîle bi jinavçûna me û talankirina darayiya me razî nine.

Em di warê xizmetkirina bi hikûmet û welatê xwe de, bi her awayekî ku Wezareta Celîle pê baş be, amade ne û em çavnihêrê fermana we ne.

Tahir Simîtkozade, Şêro Pisaxa, Qotaz Mamedî, Ebas Fenek, Hesen Hinare, Mihemed Isma`îl, Sertîp Mamedî.

**Belgeya hejmar: 109**

B. hejmar 62
Wezareta Derve, telegrafa hatî, kontrol 8321, Nihênî
Rêkevta wergirtinê: 28.01.1947
Ji Tehranê ve bo Wezîrê Derve, hejmar 76, 28`ê Çileya Paşîn, 1`ê paşnîvro.

Komkirina hejmareke zêde ji çekan ku di destên xelkekî curbicur û bi taybetî Kurdan de ye, kêşeyeke sereke ye ku hikûmeta Îranê piştî girtina Azerbaycanê berbirûyê wê bûye. Yekem pêngav bo çekkirina Kurdan, kêşeya Barzaniyan e. Êleke şervan a Kurd ku di sala 1945`an de ji Îraqê hatin nav Îranê, û hêza sereke ya çekdar a "Komara Kurdan" pêk dianî, ku di dema serhildana Azerbaycanê û bi serokatiya Qazî Mihemed û bi piştevaniya Sovyetê pêk hat.

Tê gotin ew Barzaniyên li Îranê nêzî 10 hezar kes in, û 3 hezar çekên wan hene. Niha li 25 maylî a sînorê Îraqê û nêzî 50 maylî a cihê yekgirtina sînorê Îran, Tirkiye û Îraqê akincî ne. Ew herêma ku ew wek nîştimana xwe dizanin, hinek dûrtir ji sînorê di navbera Îran û Îraqê û di nav xaka Îraqê de hilketiye. Mela Mistefa rêberê wan, di heyama du hefteyên bihorî de, û bi vê garantiya ku bi wî hatibû dan, li Tehranê bû. Lê roja bihorî îzin pê hate dan, ku vegere nav êla xwe. Tê gotin ku pênc zabitên Îranê bo garantîkirina vegeriyana Mela Mistefa bi silametî, li cem êla wî wek rehîn (barimte) hatin ragirtin.

Dema ku ew li vir bû, hewl dida ku bo vegeriyana êla xwe bo Îraqê rêçareyekê bibîne. Tê gotin hikûmeta Îraqê amade ye ku ji bilî Mela Mistefa û 110 kes ji serkirdeyên Barzanî ku fermana destbiserkirina wan heye, Barzaniyên din efû bike û rêya vegerê bide wan. Mela Mistefa jî dibêje yan divêt hemû Barzanî pêkve biçin, yan jî tu kes naçe.

Wî bi razîbûna Îraniyan bi armanca rakêşana bala Birîtaniyan bona vê ku zextê bixin ser hikûmeta Bexdayê da ku lêbihorîneke giştî derbixin, hewl da ku digel balyozxaneya Birîtanyayê pêwendiyê bigre, lê Lêrojtêl (balyozê Birîtanyayê li Tehranê) li gor wan rênimayên ku gihîştne wî, amade nebû pêşwaziyê jê bike. Mela

Mistefa gotiye, hekî Îngilîzî û Amerîkayî qebûl bikin ku bêalî bimînin, ew ji artêşa Îraqê natirse û wê rêya vegera xwe bi şer veke.

Îranî hez dikin ku kêşeyê çareser bikin, li ber vê ku hebûna van şervanên çekdar di nav Îranê de, wek gefeke berdewam dizanin, ku beşeke berçav ji hêzên Îranî bi xwe ve mijûl kiriye. Berpirsên Îranî akincîkirina Barzaniyan li derdora Hemedanê gengeşe kirine, herçend ku ew mijar, karekî gelek pirxerc û metirsîdar e. Barzanî dibêjin ew ji bilî bilindahiyên nîştimana xwe li Îraqê, cihek ku 15 hezar Barzanî niha jî li wir dijîn, li tu cihekî din aram nagrin.

Li ser daxwaza serfermandehiya artêşa Îranê, çend rojan berî niha li mala Kolonêl Sikiston şêvirmendê leşkerî ê balyozxaneyê, min gotûbêjek digel Mela Mistefa hebû. Serxetê plana zarokane ya Mela Mistefa wiha ye: Li ber vê ku Wilayetên Yekgirtî hêzeke zal û daxwazkarê dadperweriyê ji bo hemû xelkê ye, em dixwazin ku xwe bi niyetpakiya we bispêr in, da ku digel berpirsên Îraq û Îngilîzê, kêşeya me çareser bikin. Min gotê, eva kêşeya me nine, û tu karek ji dest me nahêt.

Şeva bihorî Şah daxwaz kir ku li ser vê mijarê digel min gotûbêjê bike. Min gotê, ku bi baweriya min baştir e ku ev kêşeya bi danûstandineke rasterast a dostane di navbera berpirsên Îranî û Îraqî de bihê çareserkirin, û li ber vê ku ew nê`imeta ber Îraqê ketiye, û li gor xerîteyê nîştimana Barzaniyan di nav xaka welatê wan de ye, hetmen hikûmeta Bexda jî amade dibe ku beşek ji vê berpirsatiyê bigre stûyê xwe. Şah derheq erk û vezîfeya hikûmeta Îranê li gor yasayên navdewletî ku hewce dike ew penaber berî vegera bo nav xaka xwe werin çekkirin, nîgeraniya xwe zelal kir û got: Ev yek Kêşeyeke dijwar e, û ji bo tev Kurdistanê girîngiyeke berçav heye. Herçend ku kêşeya sereke ya me nine, lê di herêmekê de ku ew qas bi pîlana derveyî hestiyar e, her karek ji destê we bihêt, bo me mifadar dibe. Em ji her boçûnekê di vê derheqê de, ku renge wezaretxane yan balyozxaneya Wilayetên Yekgirtî li Bexdayê hebe pêşwazî dikin.

Bi hejmar 76 bo Wezaretxanê hate şandin, bi hejmar 11 bo Bexdayê hate dubarekirin.

**Belgeya hejmar: 110**

B. hejmar 63
Wezareta Derve, telegrafa hatî, Nihênî, kontrol 2295
Rêkevta wergirtin: 08.02.1947
Ji Londonê ve bo Wezîrê Derve, hejmar 859, 7`ê Şibat,

"Paymen" di beşa rojhilatê Wezareta Derve a Birîtanyayê, duh derbarê Mela Mistefa û alîgirên wî de ku li Îranê ne, got:

Wezareta Derve agehdar e ku Mela Mistefa li Tehranê di bin çavdêriya polîs de ye, û hejmara kesên wî (berevajiyê hejmara 10 hezar ku di rapora hejmara 476 a Wezareta Derve a Amerîkayê a rêkevt 3`ê Çileya Paşîn de hatibû) 1500 kes e. Herçend ku Îraqî dixwazin hikûmeta Îranê hemû wan kesan çek bike, û wan zincîrkirî radestî Îraqiyan bike, lê Îraniyan ew yek qebûl nekiriye û di encam de gihîştne bonbestê.

Derbarê Mela Mistefa bixwe de jî, Wezareta Derve a Birîtanyayê li ser vê baweriyê ye, Îraqî razî ne ku ew li herêmeke dûr ji sînorê Îraqê, bo heyameke nediyar di bin çavdêriya polîs de bin. Paymen dibêje ku Îraniyan hewl daye, pêyê Birîtanyayê jî bikêşin nav vê kêşeyê de. Lê ew bi tu awayî neçûne jêr barê wê zextê de, û her bi vê sedemê jî daxwaza Mela Mistefa bona hevdîtina digel balyozê Birîtanyayê hatiye retkirin.

Bi hejmar 859 ji bo wezaretxaneyê hate şandin, bi hejmar 7 bo Tehranê hate dubarekirin.

Galmen

## *Hewlên bêencam ên Emerxan ji bo pêşgirî ji bidarvekirina Qazî Mihemed*

Konsolê Sovyetê li Tewrêzê bi navê Kirasnîx di bîreweriyên xwe de wiha dibêje:

Roja 10.02.1947`an min serdana konsolyarê Amerîkî bi navê "Gerald Dooher" kir, ku ji Tehranê ve bi awayê demkî hatibû Tewrêzê. Wî hingê di balyozxaneya Amerîkayê ya di Tehranê de li ser eşîrên başûrê Îranê û li ser Kurdan kar dikir. Jiber ku wî serdana Urmiyê kiribû, lewma min jê pirs kir ku rewşa Urmiyê çawa bû, li wir aramî û ewlehî heye? Wî jî wiha bersiva pirsên min dan:

"Niha li wir bi berçav aramî heye, lê di rastî de hêşta jî ne wisa ye. Li wir azardana Ermenî û Asûriyan û derkirina wan heye. Mixabin siyaseta dewleta Îranê jî, ji tundreviyekê ve ber bi tundreviyeke din diguhere. Rewşa Kurdistanê jî hêşta nediyar e û nigatîv e. Lê Qazî Mihemed kesê herî pêşkevtî di Kurdistanê de ye. Di wir de ji min re eşkere bû, ew kesek e ku tenê bi awayekî cuda difikre, lewma tohmeta kuştinê dixin stûyê wî. Ew yek tiştekî metirsîdar û cihê heyrîmanê ye. Qazî Mihemed çi tawanek encam nedaye".

Herwisa nivîsiye: "Gerald Dooher" di berdewamiya axavtina xwe de dibêje:

"Min Emerxan jî dît. Emerxan gote min ku hekî mûyek ji serê Qazî Mihemed kêm bibe, wê hemû Kurdistan serî hilde".

Herwisa Kirasnîx di bîreweriyên xwe de dibêje, dema min ew gotinên "Gerald Dooher" guhdarî kirin, ez gihîştim vê encamê, ku Amerîkayî wê ji bo guherîna biryara bidarvekirina Qazî Mihemed û birayê wî, hewl bidin ku ew hukm cîbicî nebe.

**Belgeya hejmar: 111**

B. hejmar 64
Wezareta Derve, telegrafa hatî, Nihênî, hejmara kontrolê 4877
Rêkevta wergirtin: 15.02.1947
Ji Tehranê ve bo Wezîrê Derve

Konsolyar "Gerald Doher" di dema serdaneke demkî bo Tewrêzê di hefteya bihorî de, bona lêkolîna rewşa giştî a siyasî û bi taybetî jî rewşa gundên Mesîhî û Asûriyên herêma Rizayiyê (Urmiyê), ku di dema nebûna sîstema îdarî û piştî herifîna hikûmeta Demokratan, ji aliyê Misilmanan ve hatne talankirin, serdaneke sê rojî bo Azerbaycana Rojava hebû. Di serdana çend gundên talankirî û hevdîtina digel berpirsên hikûmetî, serdana komeleya Asûrî û biyaniyên akinciyê Rizayiyê (Urmiyê) de, "Gerald Doher" anî ser vê baweriyê ku ew kuştara ku tê gotin canê 200 Misilman û Mesîhiyan jê standiye, tenê handereke siyasî li piştê bûye. Lê talankirina gundên Asûriyan bi sedema dijminatiya olî bûye. Bêhelwestiya artêşa Îranê jî ew tişte zêde kiriye, û talan berî gihîştina artêşê bo herêmê dest pê kiribû, û herî kêm deh rojan paş vegera artêşê jî dom hebû.

Renge çûna kardarekî leşkerî ê Fransayê bo Rizayiyê (Urmiyê), sê rojan piştî herifîna hikûmeta Tewrêzê, bandora wê li ser pêşgirî ji kuştara Mesîhiyan bi sedema olî hebûbe. Serdanên kardarê leşkerî ê Birîtanî û me, û Kaptan "Gagarîn" û "Gerald Doher" jî alîkar bûn da ku pêşî ji tundûtîjiya zêdetir ji aliyê Misilmanan ve li dijî Mesîhiyan were girtin.

-Li warê xwarin, cilûberg û stargehê, di tengaviyê de ne, û nerîna Asûriyan bi giştî ev e ku bi sedema metirsiyên talan û kuştareke rêkxistî, ew nikarin li herêma Urmiyê bimînin. Du kes ji hemwelatiyên naskirî ên Misilman jî ser vê baweriyê ne, ku heya wê demê ku kêmaniya Asûrî li herêma Rizayiyê (Urmiyê) bin, tu hêviyeke zelal bo çareseriya kêşeyan nahê dîtin.

Deh gundên Asûrî bi tewahî hatine talankirin, heta derî û

pencereyên wan jî birine. Pazdeh gundên din jî heya radeyekê hatine talankirin. Tundûtîjî û destdirêjiya sêksî gelek zêde bûye. Di navbera sê heta pênc hezar Asûriyan û çend sed kesên Ermenî de, ji bilî wan kesên ku ji aliyê cîranên Misilman û Mesîhî ên xwe ve hatine hewandin û piştevanî ji wan hatiye kirin, di warê xwarin, cilûberg û stargehan, di tengaviyê de ne.

Wisa xûya ye ku Kurd li ser vê soza ku sala bihorî Qazî Mihemed û Emerxan bi konsolyar “Gerald Doher” dabûn, li ser vê ku hekî fitneyek rû bide, zirarekê nagehînin Mesîhiyan, bi tewahî wefadar mane. Di bûyerekê de, Emerxan girûpek ji re`iyeta yek ji gundên xwe, ku Kurd nebûn, bi sedema beşdarbûna wan di talankirina gundekî Asûrî li wê derdorê ceza kiribû. Ev mijara digel bêşiyaniya artêşê bona cîbicîkirina wê soza ku derheqê parastina kêmaniyan dabûne konsol “Satenî”, netebahiyeke eşkere heye.

Li Rizayiyê (Urmiyê) çavkaniyên bawerpêkirî dibêjin ku artêş ji ragehandina rewşa neasayî mifah wergirtiye, û ji wan kesên ku bi hevkarîkirina Firqeya Demokrat tawanbar in, û bi taybetî Ermen û Asûriyan bacê distîne. Piraniya tohmetan bê bingeh in, û yek ji wan girtiyên ku bavê wî di artêşa Amerîkayê de xizmetê dike, li gor tohmeteke bê bingeh hatiye girtin, ku vedigere bo 30 salî berî niha. Ji aliyekî din ve Refî`î fermandeyê hêzên Firqeya Demokrat li Rizayiyê (Urmiyê) û destrastê Pîşewerî di vê herêmê de, ku wek fermanberê konsolxaneya Sovyetê dihate hesibandin, niha bi rişweteke gelek mezin ku tê gotin daye, niha di Tehranê de serbest e.

Artêş bi tu awayekî nikare ewlehiya Azerbaycana Rojava dabîn bike, û niha jî hevwelatiyên çekdar digel yek-du leşker, parastina gundên xwe girtine stûyê xwe. Fermandeyê leşkerî yê Şapûrê (Selmasê), bajarekî girîng li herêmên Kurdakincî, tenê zabitek pile nizm e. Wî piştre gote “Gerald Doher” ku tenê hebûna girûpekê ji kesên ser bi Emerxan li nav bajar, di hemberî vê yekê de bû rêgir, da ku Misilmanên ku Kurd nebûn, nekarin hejmarek gundên Mesîhîakincî ên wê herêmê talan bikin. Wisa xûya dike ku hêza akincîkirî Li Rizayiyê (Urmiyê) lawaztir ji vê yekê ye ku bikare

gundiyan çek bike, û tenê bi navbeynkariya misyonerên Fransî bû, ku di encam de hinek kar di vê derheqê de hate kirin.

Konsolyar “Gerald Doher” di dema amadebûna xwe li Rizayiyê (Urmiyê), digel Dr. Şefeq nûnerê pêşîn ê meclisê hevdîtin hebû, ku ji aliyê Serokwezîran Qewam ve bo karekî hatibû Rizayiyê (Urmiyê). Wisa xuya dike ku Dr. Şefeq bi başî ji rewşa ewlehiya wê herêmê û bi taybet jî bandorek ku dikare li ser kêmaniyên vê herêmê hebe agehdar e, û tê çaverêkirin ku piştî vegeriyana bo Tehranê, vê mijarê bi tewahî digel serokwezîran bixe ber bas.

Allen

**Belgeya hejmar: 112**

B. hejmar 1-65

Beşa Derve a Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê, balyozxaneya Amerîkayê

Tehran, Îran, 25.02.1947

Hejmar 309, Nihênî/ Waşington

Mijar: Şandina rapora “Sîstema Kurdên Bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistan) li hember hikûmeta Îranê”

Rêzdar Wezîrê Derve! Bi şanazî ve raporek li jêr navê “siyaseta Kurdên Bakûr di hemberî hikûmeta Îranê de” ku ji aliyê konsolyar Girald. F.P. Duher ve hatiye amadekirin, bona agehdariya wezaretxaneyê dişînim xizmeta we. Konsolyar “Gerald Doher” di van dawiyane de, bo karekî demkî vegeriya konsolxaneya Tewrêzê, û dema ku li wir bû, karî digel çend kes ji serokhozên girîng û kesayetiyên payebilind ên Kurd li Azerbaycana Rojava gotûbêj hebin.

Digel rêz û hurmatan

“George Allen” balyozê Amerîkayê

Hevpêç: Raporek bi vî rengê ku hate baskirin

Çend heb ji vê raporê bo balyozxaneya Amerîkayê li Moskoyê, Bexda û Enqere, nûnertiya Beyrûtê, konsolxaneya Tewrêzê û kardarê leşkerî hate şandin, bi nameya hejmar 309, rêkevta: 25.02.1947

**Belgeya hejmar: 113**

B. hejmar 2-65,
Hevpêç bi nameya hejmar 309, Rêkevt 25.02.1947
Li balyozxaneya Amerîka, Tehran, Îranê
Nihênî
Siyaseta Kurdên Bakur (Kurdên bakurê Rojhilatê Kurdistanê) li hember hikûmeta Îranê
Amadekirin ji aliyê konsolyar "Gerald Doher"

Di heyama berpirsayetiyeke demkî de ku min di van dawiyane de, li konsolxaneya Tewrêzê hebû, min guhertineke çaverênekirî ji rewşa siyasî ya hozên Kurd ên Azerbaycanê dît. Dema ku piştî çûna artêşa Îranê bo Azerbaycanê li meha Çileya Pêşîn de, ku Komara Kurd herifî, çavnihêriya giştî ew bû ku wê ew yekîtiya siyasî ya heya radeyekê necihgir ku bi sedema hewlên Qazî Mihemed serokê destnîşankirî ê Mihabadê, di nava êlan de pêk hatibû, bilez ji nav here.

Berpirsên hikûmetî û herwiha zabitên serfermandehiya artêşa şahenşahiya Îranê li ser vê baweriyê bûn, ku "yekîtiya" di navbera Kurdan de tiştekî aloz nine, û bi herifîna vê hikûmetê ku ji aliyê Sovyetê ve li Mihabadê pêk hatibû, Kurdên bakûr jî wê ji nû ve, mijûlî şer û kêşeyên navxweyî ên eşîretî di navbera xwe de bin. Ew yek ji deb û resmên nav wan de ye, û bi vî rengî jî artêş wê bi sanahî bikare bi tûjkirina êlan li dijî yektir, herêmên kurdakincî bixe bin kontrola xwe de.

Herçend ku tu demekê digel nerîna beşeke zaf ji çavdêrên Îranî hevhizir nebûm ku baweriya wan ew bû ku nifûza Qazî Mihemed tenê bi sedema piştevaniya Sovyetê bû, û serkevtina wî li pêkanîna hevkariya di nava êlan de demkî û têper e, lê bi vî halî jî, hevdengî û hevboçûniya tewahiya wan serokêlên cuda ên ku min di heyama du hefteyên bihorî de ew dîtine, Ii ser pirsên wek çekkirina êlan, Kurdên Barzan, û çarenûsa Qazî Mihemed, ji vê hindê ecêbgirtî mam. Ya herî ecêbtir jî, bilindbûna asta berçav ya hitbara Emerxan serokê

bihêz ê êla Şikak di nava êlên din ên Azerbaycana Rojava de bû, û amadebûna eşkere ya piraniya serokêlên girîng li peyrewîkirina ji Emerxan derheq siyaseteke giştî ku diviya di hemberî hikûmeta navendî de bigrin pêşiya xwe.

Di navbera wan gotûbêjên ku min derheq rewşa siyasî a niha ya Kurdan, digel parêzgar Elî Mensûr û berpirsên din ên navçê û herwiha digel du fermandeyên leşkerî li du bajarên herêmên kurdakincî û herwiha hejmarek serokêlan hebû, û yek ji wan jî Emerxan bû, ji min re eşkere bû ku, ev gumana zêde ku Kurdan ji niyeta artêşê derheqê xwe hebûn, roleke sereke di bihêzkirina yekîtiya di navbera Kurdan de hebû.

Di heyama temenê Komara (Kurdistanê de), naveroka sereke ya siyaseta hikûmeta leşkerî li hemberî Kurdan, di van çend xalên jêrîn de têne kurtkirin:

"Çekkirin berî reformê" pêdagiriya artêşê li ser çekkirina bilez, bo hejmareke zaf ji serokêlan, bîrhînerê ezmûnên bihorî derheqê çekdanînê de ye, ku ne tenê bi reformê, belkî bi awayên herî tund a serkutkirinê dom hebû. Serbarê vê yekê jî, ji demekê ve ku artêş cihgir bûye, zêderevî jî li hemberî Kurdan rû daye. Di bûyerekê de, li yek ji gundên derdora Şapûrê (Selmasê), 500 ser pezê gundndiyên Kurd, bi bê dana perê wan dest bi ser de hatiye girtin, û dema ku Emerxan bo nîşandana wefadariya xwe çûbû Tewrêzê, di bûyereke gemjane de trombêla wî bi biryara berpirsên leşkerî ên bajar dest bi ser de hatibû girtin.

Ez wisa tê gihîştim ku hemû serkirdeyên Kurd ligor ezmûnên bihorî, gihîştine vê encamê ku nebûna yekîtiyê, çeka herî girîng e ku hikûmetê li dijî wan heye. Di wan gotûbêjên ku me bi wan re hebûn, ew peyva ku çendîn carî dihate bihîstin yekgirtin û yekbûn bû. Wan ne tenê her ev peyva bo van kêşeyên Kurdî ku li pêşberî wan bû bi kar dianîn, belkî wisa xuya dike ku hizra pêwendiya di navbera hemû êlan di serê wan de ye, da ku ji niha şûnda berevajiyê derbazbûyî, rewşek wisa nehête pêş ku artêşa şahenşahî ji Kurdan bo şer li dijî Loran, ji Qeşqayiyan li dijî Bextiyariyan, ji Şikakan li dijî Celaliyan û ...hwd bi kar bîne.

Emerxan got, ew çaverê dike ku li egera rûdana şer digel Qeşqayiyan li Bihara bê de, wê artêş daxwaza hevkariyê jê bike. Min jê pirs kir ku gelo hûnê hêza çekdar bixin xizmeta artêşê, wî bersiv da: "Nexêr heta şivanekê jî nadmê".

Berevajiyê eva ku dihate çaverêkirin, serkirdeyên sereke ên êlan biryar dane, ku bo azadiya Qazî Mihemed ku meha bihorî ji aliyê dadgeheke leşkerî ve cezaya bidarvekirinê jê re hate birrîn, ji deshilat û nifûza xwe mifahê wergirin. Emerxan di vê derheqê de nerîneke gelek zelal hebû, wî ragehand: "Me biryar daye, ku ger artêş mûyekê ji serê Qazî Mihemed kêm bike, divêt bizane ku digel Kurdan berbirû dibe". Wî herwiha got: Ew dizanin ku Qazî Mihemed derheqê qebûlkirina piştevaniya Sovyetê bo hikûmeta xwe li Mihabadê şaşitî kiriye, lê bi baweriya wan, ew karê wî nabe bibe sedema bidarvekirina wî.

Hesen Axa Emîrî serokê êla Celalî jî, ku li nizîk sînorên Sovyetê akincî ne, nerîneke wisa hebû, û heta Ebdullah Îlxanîzade yek ji serokêlên êla Dîbokrî ku dijminê serhişk ê Qazî Mihemed e, dev ji hewlên xwe bo bidarvekirina rêberê pêşîn ê hikûmeta dasepayî a Mihabadê berdaye, û li ser vê baweriyê ye, ku du-sê sal dûrxistin bo wî bes e. Di van dawiyane de Şah pirsa çarenûs û qedera Qazî Mihemed digel balyozê yekem "George Allen" xistiye ber bas, û bi wî ragehandiye ku artêşê hejmarek zêde ji telegrafan ji serokêlên Kurd wergirtiye, ku daxwaz dikin Qazî Mihemed û hevdestên wî li hikûmeta Komarî, bi awayên herî tund bêne cezadan. Lê piştî çend pirsyaran ji Şah, navbirî ew rastiya anî ziman ku ev telegraf piraniya wan, ên êlên Dêbokrî û Mengor in ku qazancê wan ê siyasî di nemana Qazî Mihemed di nav Kurdan de ye.

Di dema dawî hilbijartinên meclisê, Sedrê Qazî birayê Qazî Mihemed ku ew jî cezaya bidarvekirinê jê re hate birrîn, bi cudahiyeke zaf ji Îlxanîzadeyê namzed biriye, ku ji aliyê Dêbokrî û Mengoran ve piştevanî jê dihate kirin.

Îlxanîzade di van dawiyane de bi Kolonêl Sêkiston kardarê leşkerî yê balyozxaneyê ragehandiye, ku serokêlên servey wî, tenê li jêr zexta artêşê de ev telegraf wajo kirine ku Şah jî amaje pê kiribû.

Balyozê yekem “Allen” pêşniyar bi Şah kiriye, ku heya wê dema ku ji nerîna Emerxan ku bihêztirîn serokê Kurdistana Bakur (Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê-nivîskar) ye agehdar nebe, biryardana li ser bidarvekirinê Qazî were paşxistin.

Kurd ji kiryara vê dawiyê ya artêşê nerehet bûn, ku firoke şandibû herêma êlan, û daxuyaniyek bi ser wan de belav kiribûn, ku tê de hatibû nivîsîn her Kurdek çeka xwe radest bike, lêbihorîna giştî wan digre.

Emerxan bi amajekirina bi vê ku renge baştir bû ew lêbihorîn ji bo artêşekê be, ku pênc salan berî niha li hember hêrişa Artêşa Sor bo Azerbaycanê çeka xwe avêt û reviya, û helwesta êla xwe di vê derheqê de ragehand. Wî ev pirsa anî ber bas, ku “Di demekê de, ku piştevanên me, wek kîroşkek tirsnok reviyan, hingê bo me ji bilî adetkirin bi Sovyetiyan çi rêyek maye? Ew aliyê ku zirar gihîştê, Kurd in û niha divêt pêşniyara lêbihorînê bidin Kurdan.

Xaleke din ku Emerxan pêdagirî li ser kiriye û serokên din jî piştrast kirine, eva bû ku Kurdan biryar daye ku alîkariya her êleke Kurd bikin ku dikeve ber operasiyona çekkirina artêşê. Wî got ku ev biryara Barzaniyan jî digre xwe: Ew “Kurd in û em nikarin wan li hemberî artêşê de bi tenê bihêlin”. Wî got, Barzaniyan çend qebze topên sehrayî hene ku ji dîtingeha Kurdên bakur (bakurê Rojhilatê Kurdistanê) ve, li egera hêrişa artêşê bo çekkirina êlan, bo bergirîkirina li hemberî tank û zirêpoşan hewce ne.

Rêberê Şikakan gote min, ku biryar e roja 9`ê Şibatê, sibehiya wê roja ku me bi hev re qise kir, piraniya serokêlan li sînorê Sovyetê heya Mihabadê li baregeha wî li Zindeştê kom bibin. Diyarîkirina siyaseteke giştî ji aliyê êlên Kurd ên Bakur di hemberî hikûmeta Îranê de, armanca vê konferansa êlan e. Ewlehiya sînoran, û helwestek ku dibe li hemberî Barzaniyan de bigrin pêş, şêwazên rizgarkirina Qazî Mihemed, û çawaniya parvekirina wan çekên zêde ku piştî herifîna hikûmeta Demokratan kete dest Şikakan û Celaliyan, û herwiha hilbijartina serokekî payebilind, da ku bi nûnertiya êlên beşdarbûyî bi armanca danûstandinên digel hikûmetê bişînin Tehranê, ji wan xalan bûn, ku diviya li ser baxivin.

Emerxan ez pê hesandim ku derheqê piraniya van pirsan de pêştir ji rêya pêkve guherîna nameyan biryar hatiye dan, û armanca konferansê tenê pesendkirina biryaran e. Her çend texmîneke hûr ji hêza leşkerî a êlan gelek dijwar e, lê ya herî kêm tê texmînkirin ev e ku renge 25 hezar qebze çek di navbera sînorê Sovyet heya Mihabadê de hebin. Lê nerîna giştî bas ji hebûna 80 heta 100 hezar çekên reşaş di nav Kurdan de dike.

Tê gotin ku Şikakan dest bi ser barekê de girtine, ku 800 reşaşên destî li xwe digre, û di dema revîna Demokratan ji Rizayiyê (Urmiyê), bi kamyonan ber bi sînorê Sovyetê ve dibirin. Hebîb Emîrî nûnerê Emerxan li Tehranê gote min, ku ew wek rêberê girûpeke pêncî kesî ji êlan, berpirsê vê yekê bûn ku ew Firqeya Demokratên ku piştî xweradestkirinê, vedigerin ser mal û halê xwe, çek bikin. Navbirî herwiha ragehand ku di dema birêvebirina vê erkê de, çend reşaşên asayî û hejmareke yekcar zêde teqemeniyên curbicur ketne ber destê wan. Ew wisa texmîn dike ku Şikakan bi tenê ewqas çekên wan hene, ku her yek ji şerkerên êlê, du çek ber wan dikevin. Niha çekên zêde di wan herêmên çiyayî de, ku di bin fermana Emerxan de ne, hatine veşartin, û tenê demekê bi êlên din têne dan ku artêş bixwaze li dijî êlên din tevbigere.

Hejmareke zaf ji serokêlan li ser vê baweriyê ne, ku artêş bi radestkirina formalîte (nimayişî) a hinek çekan ji aliyê êlên cuda ve razî ye. Kesên din ên agehdar jî, ku min digel wan qise kiriye, ev boçûna piştrast kirine. Celalî ku li gor texmînan di navbera 5 heta 10 hezar çekî hene, di van dawiyane de, wan bixwe 125 çekên şikestî û jenggirtî dane dest artêşê, lê du rojan piştre rojnameyên Tewrêz û Tehranê, daxuyaniyeke fermî a artêşê belav kirin ku tê de hatibû, Celalî hatine çekkirin.

Emerexan ragehand ku berpirsên leşkerî ên akinciyê herêma wî, bi wî ragehandine ku ji Tehranê ve ferman ji wan re hatiye, ku êl dikarin bo parastina ewlehiya xwe û parastina sînoran li hemberî hêrişên eşîrên Kurd ên Tirkiye û Îraqê, çekan ragirin. Wî herwiha got, wisa xûya dike ku artêş zêdetir li pey radestkirina topxaneyan e ku li cem Barzaniyan in, ne ew çekên li cem êlan in. Lê pêşbîniya

vê yekê jî dike, ku piştî vê ku topên wan hatin radestkirin, gelek nakêşe, ku wê daxwaza hemû çekan bikin.

Rêberê Şikakan li 18`ê Şibatê, bi nûnertiya êlên li jêr deshelata xwe de, bo danûstandina digel hikûmetê gihîşte Tehranê. Digel bidawîhatina van gotûbêjan bi berpirsên hikûmî û leşkerî re, encama wê di raporekê de wê bê şandin.

**Belgeya hejmar: 114**

B. hejmar 66
Wezareta Derve, telegrafa hatî, Nihênî, hejmara kontrolê 7641
Rêkevta wergirtinê 25.02.1947
Ji Tehranê ve bo Wezîrê Derve
Hejmar 130, 25`ê Şibatê

Rapor gihîştiye destê me, ku çend hêzên leşkerî li Mihabad û Rizayiyê (Urmiyê) li dijî Kurdên Barzanî bi rê ketine, tê gotin ku ew hêzên hikûmetî li jêr fermandehiya serheng Zengene de ne, ku li herêma Nexede a hilketî li başûrê Rizayiyê (Urmiyê) digel girûpekê ji Kurdan li hev xistine. Lê Emerxan serokê êla Şikak ku niha li Tehranê ye dibêje, girûpek ku di van pevçûnan de beşdar e, ji xelkê reşok û nerêkxistî û wan Asûriyan pêk tên, ku di bin fermana Zêro Beg efserê pêşîn ê Komara gelê Kurd de ne, û Kurd wî wek îxanetkar bi gelê xwe nas dikin. Wî got, Barzanî hêşta digel artêşê tûşî şer nebûne, lê ew bawer e ku hekî bona çekkirina wan zext were bikaranîn, hingê Barzanî jî wê parastina xwe bikin, û Kurdên Herkî û Begzade ên herêma Rizayiyê (Urmiyê) jî wê hevkariya wan bikin.

Herwiha egera vê yekê jî heye ku li egera bi encam negihîştina van danûstandinên niha di navbera Emerxan û berpirsên Îranê de, êla çekdar û peyt a Şikakan jî piştevaniya Barzaniyan bikin.

**Belgeya hejmar: 115**

B. hejmar 67

Beşa derve a Wilayetên Yekgirtî ên Amerîkayê, balyozxaneya Amerîkayê

Tehran, 27.02.1947

Hejmar 312, Nihênî

Mijar: Şandina nameyeke girêdayî bi gotûbêja digel Emerxanê Şikak

Gelek rêzdar, Wezîrê derve, Waşington, bi şanazî ve nameya têkildar bi gotûbêja digel Emerxan, serokê êla Kurd a Şikak, ku niha bona gotûbêjê digel artêşa Şahenşahî derheq bi çekkirina êlên Azerbaycanê li Tehranê ye, bo agehdariya wezaretxanê, ezê bişînim xizmeta we.

Emerxan temenê wî nêzî 73 salî ye, û bê guman niha wek rêberê herî xwedîdeshelat di nava êlên Kurd de tê hesibandin. Ew piştî mirina (deste) birayê xwe, Simkoyê navdar ku di sala 1919 heta 1921`an rêberiya hêrişa Kurdan li dijî Mesîhiyên Rizayiyê (Urmiyê) li stû bû, di heyama çend salên bihorî de, di cihê wî de serperestiya Kurdên Şikak girte stûyê xwe.

Piştî çendîn salan eva yekem car e ku Emerexan serdana Tehranê dike. Dawî car ku li ser daxwaza Rizaşah hate Tehranê, hate girtin, û heyama şeş salan di girtîgehê de ma. Di van dawiyane de ku Şah niha ew vexwandiye da ku bête Tehranê, wî hez nedikir vê daxwazê qebûl bike, di dawiyê de piştî vê ku bihîst ku berpirsên Amerîkayî hest dikin ew dikare bi silametî vê serdanê bike, qebûl kir ku bêt. Niha ew heya astekê zêde, bi sedema vê pêwendiya baş ya ku konsolyar Duhêr di dema serokatîkirina konsolxaneya Tewrêzê de karî digel de pêk bîne, gelek bi tundî û ji dil ve, alîgirê Amerîkayê ye. Sê mehan berî niha jî “Arçîbalt Rozvelt” alîkarê kardarê leşkerî li Kurdistanê serdana wî kir, û encameke baş lê ket. Emerxan digel general “Şiwartiskov” hevaltiyeke taybetî heye, û bawerî pê heye. Li gor hemû belgeyan wisa dixuye ku sedema wan hemû talankariyên ku

di van dawiyane de, li hemberî Mesîhiyên herêmê, Azerbaycaniyên Tirkziman hebûn, ne Kurd in. Emerxan jî ev hinda ku bikare hewl dide bona vê ku rê li ber rûdana bûyerên wiha bigre. "Mon Sînyor Papalardo" nûnerê "Pap" li Tehranê, ku bi van zûkatiya ji serdana Azerbaycanê vegeriyaye, ev behsa piştrast kiriye, û dibêje ku rewşa Asûr û Ermeniyên herêmê niha hêdî-hêdî ber bi başbûnê ve diçe, herçend ku ew wisa hest dike, tenê rêya baş veguhastina Mesîhiyên vê herêmê ye.

Derheq vê axavtina Emerxan de ku êla wî di dema vegera dubare ya artêşê bo Azerbaycanê fikir ji vê kiriye ku ber bi Tirkiyê ve birevin, min şeva bihorî ew mijar digel balyozê Tirkiyê xiste ber bas, û wî got ku di vê derheqê de tu tiştek nebihîstiye, û bawer nake ku çi berpirseke Tirkiyê ev pêşniyar kiribin ku Şikakan werbigrin. Ew xatircem bû ku hikûmeta wî, rêya çûna jor nade wan, û tê gotin ku êla Şikak herî kêm 10 hezar çekdarên peyt hene, ku çekê ji canê xwe zêdetir hez dikin.

Digel Rêz û hurmatan

"George Allen"

Balyozê Amerîkayê

Havpêç: Nimûna nivîsa wê gotûbêjê, bi vî awayî ku amaje pê hate kirin, esla wê bo wezaretxaneyê ye, û nusxeyek jî bo balyozê Amerîkayê li Moskoyê, London, Enqere, bo Bexdayê û ofîsa kardarê leşkerî ê Amerîkayê li Tehranê.

**Belgeya hejmar: 116**

B. hejmar 68
Wezareta Derve, telegrafa hatî, Nihênî, hejmara kontrolê 140
Rêkevta wergirtin: 01.03.1947
Ji Tehranê ve bo Wezîrê Derve,
Hejmar 145,

Emerxan serokê Kurdên Şikak dibêje ku Rezmara serokê erkanê ertêşê daxwaz jê kiriye, ku bona bidawîanîna şerê artêş û girûpa yaxî a Zêro Beg, bilez vegere Rizayiyê (Urmiyê). (Rapora Balyozxanê, 130, 25`ê Şibatê).

Bi sedema vê ku êla Begzade hêzek bo alîkariya Zêro Beg şandiye, rewş gelek aloz bûye. Emerxan hatiye rasipartin ku pêşniyarê bide Zêro Beg û seranên Begzadeyan ku li egera bidawîanîna şer, wê ber efûyê bikevin.

Artêş hêşta digel Kurdên Barzanî ku ber bi Şinoyê paşekêşe kirine, û tê çaverêkirin li wir bergiriyeke dijwar bikin, tu pêwendiyek tunebûye. Ew gotûbêjên ku li Tehranê di navbera Emerxan û seranên artêşê de hebû, gihîşte vê encamê ku rê bi Şikakan hate dan ku çekên xwe di destên xwe de ragirin. Artêşê ew çavnihêrî heye ku Şikak li çekkirina êlên cîranê xwe de hevkariya Artêşê bikin. Lê egra wê zor e ku Emerxan tenê çekên kevn û şikestî bo radestkirina bi artêşê kom bike, û di cihê van çekan de, ew çekên nû ên li meha Çileya Pêşîn de, û piştî herifîna hikûmeta di bin piştevaniya Sovyetê, ji Firqeya Demokratan standiye, bide êlan. Egera wê yekê jî zor e ku artêş bi neçarî, vê çekkirina nimayişî qebûl bike.

Emerxan çar caran digel Nasirxan ji êla Qeşqayî hevdîtin hebûye, û herçend ku li derbarê derencamên van hevdîtinan tu zanyariyeke hûr belav nekir, lê em li ser vê bawewriyê ne ku, wan du serokan li hev kiriye, ku li egera cudahiya eşkere di navbera Şah û Serokwezîran de, piştevaniya tewaw ji Qewam bikin. Herduk ji wan serokêlan ragehandine ku ji kar vêdedana Qewam ji posta

Serokwezîran, bi xatircemî ve dibe sedema serhildana nearamiyên berfireh li raserî herêmên êl û eşîran.

Allen

Dubare bo Bexda bi hejmar 22.

## *Bidarvekirina Qazî Mihemed*

Piştî rûxana Komara Kurdistanê û girtina Qazî Mihemed û hevalên wî, Qazî Mihemed di dadgeha leşkerî a Şah de, bi tometa hewldan ji bo avakirina dewleta Kurdistanê û perçekirina Îranê, û herwisa xiyaneta bi dewleta Îranê dadgehî kirine.

Lê Qazî Mihemed gelek bi vêrekî û mêrxasî berevaniyeke girîng ji berpirsayetiya xwe, û hemû kiryarên Komara Kurdistanê kiriye, û ew tometên wan ret kirine.

Piştî çend mehan ji wê mehkemekirinê, dadgeha leşkerî a Şah sizaya lidarvekirinê bi ser Qazî Mihemed û Heme Husênxanê Seyf Qazî û Ebulqasim Sedrê Qazî, û çar berpirsên din ên Komara Kurdistanê ên di Mihabadê de sepandiye.

Berî bidarvekirina Qazî Mihemed û hevalên wî, dewleta Îranê 11 kes ji berpirsyarên komarê û serokêlên Feyzula Begî di bajarên Seqiz û Bokanê de bi navên: (Elî Begê Şêrzad, Ehmed Xanê Şecî`î, Heme Emîn Begê Babexan, Ehmed Xanê Farûqî, Ebullah Xanê Metîn, Heme Xanê Danişwer, Mihemed Begê Babexan, Elî Xanê Sertîpî, Hesen Xanê Celalî, Şêx Sidîq Esedî, Şêx Emîn Esedî) destbiser dike. Wan şoreşgeran gelek bi netirsî û mêrxasî berevanî ji armancên netewî ên Komara Kurdistanê kirine. Lê mehkemeya şer a leşkerî Îranê, hukmê bidarvekirinê bi ser wan de sepandiye, û li rêkevta 14.02.1947`an, di heyameke kurt de, hukmê darvekirinê bi ser wan şoreşgerên Kurd de cîbicî kiriye.

Di sipêdehiya roja 31.03.1947`an de, ew hukmê reş, bi biryara dadgeha leşkerî ya Îranê, li qada Çarçiraya Mihabadê, wate heman ciyê ku Komara Kurdistanê li wir hatibû ragehandin, bi ser Qazî Mihemed û hevalên wî de hate cîbicîkirin. Peyva dawî ya Qazî Mihemed di dema bidarvekirinê de eva bûye ku, gotiye karbidestên Îranê: “Çavên min girê nedin, ez şermezarê xelkê xwe nînim, û dixwazim di dawî demên jiyana xwe de, çavên min bo dîtina xelk û welatê min vekirî bin”. Herwiha Qazî Mihemed di wesiyetnameya xwe de gelek şîretên binirx bo neteweya xwe nivîsîne, ku kurtiya naveroka wê wesiyetnamê bi vî awayî ye:

## *Beşek ji wesiyetnama Pêşewa Qazî Mihemed*

Bismillahê Rehmanê Rehîm

Neteweya zulmlêkirî û birayên min ên hêja, birayên min ên ku mafê we hatiye xwarin, di dawî demên jiyana xwe de, hinek gotinan, wek şîret dibêjme we.

Ji bo xatirê Xwedê êdî dijminatiya hevdu nekin û milên xwe bidin hev û li hember dijminê zordest û zalim derkevin, û xwe bi erzanî nefiroşin dijminan. Dijmin her û her dixwaze ku tenê karê xwe bi we bide kirin, û piştre qet rehmê bi we nake, û di her firsendekê de qet li we nabihore.

Dijminê gelê Kurd pir in, zordest û zalim in, bêrehm û bêwijdan in, remza serkevtina her gel û netewekê, hevgirtin û yekbûn e, azadiya neteweyekê hewcehî bi piştevaniya wê neteweyê bi giştî heye. Her gelê ku yekîtî û tebahiya wê nebe, ewê hertim di bin destê dijmin de be. Tu tiştê gelê Kurd, ji gelên li ser rûyê vê cîhanê kêmtir nîne. Belkî hûn, bi mêranî, egîdî û hêjatiya xwe, ji gelên ku rizgar bûne li pêştir in jî. Gelên ku ji destê dijminên xwe yên zordest rizgar bûne, ew jî mîna we ne, lê wan yekîtî û îradeya xwe rizgarkirinê hebûye. Bila hûn jî mîna hemû gelên li ser rûyê erdê, êdî bindest nebin. Bi yekîtî û hesûdînekirina hevdu û xwenefirotina bi dijminan, hûn jî dikarin rizgar bibin.

Birayên min! Êdî bi dijminan neyên xapandin, dijminên Kurdan ji kîjan reng, destek û neteweyekê dibin, ferq nake û her dijmin in, ew bê merhemet in, bê wijdan in û rehmê bi we nakin, û wê we bi destên hev bidin kuştin. Dijmin, wê timahiya we bibe tiştan, û wê bi derew û xapandinê, we berdin canê hevdu.

Di nava hemû dijminên Kurd de, dijminê herî zalimtir, Xwedê nenastir û bêrehmtir, Ecem in, ew destê xwe ji tu tawanan li dijî gelê Kurd venakşînin, û wan bi dirêjiya dîrokê, bi gelê Kurd re Xeres û kîneyek kevnar hebûye û hene jî.

Hûn binêrin, çawa ew kesayetiyên me ên mezin, her ji Isma`îl Axayê Şikak ve bigire hetanî Cewher Axayê birayê wî, û Hemze

Axayê Mengur û çendîn qehremanên din, her hemû bi qur`an û sondê ji aliyê wan zordarên mel`ûn(Eceman) ve hatin xapandin, û bi namerdî hatin şehîdkirin.

Ez wekî birayekî we yê biçûk, di rêya Xwedê de, ji bo xatirê Xwedê ji we re dibêjim hev bigirin û tu carî pişta hev bernedin. Piştrast bin ger ecem hingivînê bide we, diyar e jehr xistiye nav de. Bi sond û sozên derewên Eceman nexapin. Ger hezar carî jî sond bixon, lê dîsan jî, wan tu armancek cuda ji jinavbirina we nîne.

Ez di demên dawî ên jiyana xwe de, ji bo xatirê Xwedayê mezin, ez we şîret dikim û dibêjme we, û Xwedê dikim şahid, ku di rêya azadî û bexteweriya we de, ya ku ji destê min hat, min ji tu hewl û têkoşînekê xemsarî nekir.

Êdî bi Eceman nexapin, li cem wan Kurdbûna we tawan e, ser û can û mal û şerefa we li cem wan helal e. Ew jiber ku nikarin di qada şer de li hermberî we bisekinin, hertim penaha xwe dibin ber hîle û bêbextiyan. Evane her hemû di bîra min de bûn, û min qet jî bawerî bi Eceman nekiriye. Lê Şah û dûvelankên wî, berdewam peyam dişandin ku ew bo gotûbêjê amade ne, û wan niyeteke xêr heye, û wan dilê xwînrijandinê nine. Herçend ku min dizanî ku ew derewan dikin, niha hûn encama qewlên wan bi çavên xwe dibînin, ger serokhoz û eşîran, îxanet nekiribana, û xwe nefirotibana hikûmeta Eceman, em û hûn û Komara me, ev yeka han nedihate serê wê.

Şîret û wesiyeta min ew e: Bila zaroyên we bixwînin, û fêrî zanistê bin. Jiber ku cuda ji xwendin û zanistê nebe, tu tiştê me ji yê gelên din kêmtir nine. Fêrî xwendin û zanistê bin, bona ku hûn ji karwanê pêşkevtinê paşve nemînin. Zanist çeka jinavbirina dijminan e. Piştrast bin û bizanin ger tebahî, yekbûn û xwandina we baş be, hûnê pir baş bi ser dijminê xwe de, serkevin.

Nabe bi kuştina min, û bira û pismamên min, tirs bikeve nav dilê we, hêşta divêt gelek kesên din jî canê xwe gorî bikin heta ku dara azadiya Kurdistanê ber bigre. Piştrast im ku wê piştî me jî, pir kesên din bikevin davka Eceman û wê bi xapandin û bêbextiyê, ew jî, ji holê werin rakirin. Lê hêvî dikim ku mirna me bibe dersa îbretê

bo dilsojên gelê Kurd.


Renge hûn li xwe pirs bikin ku çima ez bi ser neketim?! Di bersivê de dibêjim: Bi Xwedê serkevtiyê rastîn, ez im! Çi nê`imeteke ji vê yekê mezintir e ku ez ser û mal û canê xwe, di rêya gel û welatê xwe de gorî bikim. Hûn jî, li ser xebat û têkoşînê berdewam bin, da ku wek hemû gelên din hûn ji bin destê dijminan rizgar bin. Malê dunyayê tu tiştek nine, hekî we welatek hebe, serbestiyek hebe, mal û xak û nîştimana we, ya we bixwe be, wê demê we her tişt heye, hem mal, hem serwet û hem abrû.

Xizmetkarê gel û nîştiman

Qazî Mihemed

Hêjayî gotinê ye, piştî bidarvekirina Qazî Mihemed û hevalên wî, li rêkevt 07.04.1947`an de, çar berpirsên din ên Komara Kurdistanê bi navên: Hamid Mazûçî, Resûl Nexedeiyan, Ebdula Roşenfikr û Mihemed Nazimî, ew jî li Mihabadê hatin bidarvekirin. Herwisa piştî vegeriyana beşek ji hêza Barzaniyan bo Îraqê çar zabitên Kurd bi navên Serheng Mistefa Xoşnaw, Serheng Îzet Ebdulezîz, Serwan Xeyrullah Ebdulkerîm, û Serwan Mihemed Mehmûd ku pêştir di nav artêşa Îraqê de reviyabûn, û digel Barzanî xizmeta Komara Kurdistanê kiribûn, ew jî, ji aliyê hikûmeta Nûrî Se`îd li Îraqê, bi cezaya bidarvekirinê hatin hukmdan, û li 19.06.1947`an de, ew hukm li ser wan hate cîbicîkirin, û ew jî çûne nav refa şehîdên Kurdistanê.

## Belgeya hejmar: 117



در جواب مراسله حروف و
اعداد ممیزه که منضم شماره
است با شماره ذکر شود

اداره
دائره
تاریخ ۲۹/۱/۲۶
شماره ۱/۷۵۸/۴۹۱
پیوست
موضوع

وزارت کشور
شهربانی کل کشور

وزارت کشور

باستحضار میرساند . شهربانی مهاباد گزارش میدهد :

۱ـ حمید باروخی ۲ـ محمد ناظمی ۳ـ عبداله روشنفکر ۴ـ رسول نقده
از افسران دمکرات های مهاباد و از همدستان محمد قاضی که در جبهه سردشت وغیره برعلیه قوای دولتی قیام مسلحانه کرده و در دادگاه زمان جنگ باعدام محکوم و در تبریز زندانی بوده اند شب ۱۷/۱/۲۶ بمهاباد آورده و ساعت ۲۴ پس از اجرای مراسم مذهبی ومقرراتی درمیدان پهلوی واقعه درخیابان بچوبه دار آویخته وصبح ساعت ۸ اجساد را پائین آورده وپس از اجرای آئین اسلامی مدفون ساخته اند وانتظامات برقرار بوده است .

از طرف رئیس شهربانی کل کشور ـ سرهنگ حسام وزیری .

شمارهٔ این سند در آرشیو سازمان اسناد ملی ایران ۲۹۳/۱۲/۱۴۳/۱ می‌باشد.

Wezareta Navxwe

Şarewaniya giştî a welat

Rêkevt: 14.04.1947

Em bi we radigehînin ku bajêrvaniya Mihabadê raport daye:

1-Hemîd Baruxî 2-Mihemed Nazimî 3-Ebdulla Roşenfikir 4-Resûl Nexede ji fermandeyên Demokrat ên Mihabadê û hevkarên Qazî Mihemed li eniya Serdeşt û herêmên din, ku li dijî hêzên hikûmetê serhildana çekdarî kirine, û di dadgeha serdema şer de, sizaya bidarvekirinê bo wan hatiye pejirandin û li Tewrêzê zindanî bûn, şeva 07.04.1947`an bo Mihabadê hatin veguhastin, û demjimêr 24 piştî birêvebirina rêûresma olî û rênimayiyên pêdivî, di meydana Pehlewî de li ser şeqamê hatin bidarvekirin, û demjimêr 8`ê cenazeyên wan ji sêdarê anîne xwarê, û piştî bicihanîna rêûresma Îslamî hatin binaxkirin û rewşa wir jî hate kontirolkirin.

Ji aliyê serokê bajêrvaniya giştî a welat- serheng Hîsam wezîrî

## *Beşa Şeşem*

## *Hilsengandina "Archibald Roosevelt" derheqê Komara Kurdistanê û Dewleta Millî a Azerbaycanê*

"Archibald Roosevelt" di çend xalan de bi vî awayî qala cudahiyên di navbera Komara Kurdistanê û Dewleta Millî a Azerbaycanê kiriye: "Bi hilsengandina hinek ji wan sebebên sernekevtina Komara Kurdistanê, û Dewleta Millî a Azerbaycan li Tewrêzê, mirov dikare baştir ji rastiyên wê demê têbigihîje.

Di halekê de ku herduk ji wan sazî û hikûmetane di yek serdemê de pêk hatine, û ligor rewşeke wek hev û di yek serdemê de jî, ji nav çûne. Lê di navbera wan de cudahiyên eşkere û bingehîn berçav dikevin.

-Ce`ifer Pîşewerî serokdewletê Azerbaycanê, û gelek ji hevalên serkirdatiya Firqeya Demokrat û karbidestên Azerbaycanê, endamên dêrîn ên Hizba Komonîst û girêdayî bi Sovyetê û markisîst bûne. Lê Qazî Mihemed û serkirdeyên Komara Kurdistanê, neteweperwer û nûnerê borjwaziya Kurdistanê bûne, û girêdayî bi çi hêzeke biyanî nebûne.

-Armanca serkirdeyên Dewleta Azerbaycanê ew bûye, ku bikarin Azerbaycana Îranê jî, bixin ser Azerbaycana Sovyetê. Lê serkirdeyên Komara Kurdistanê hewl dane, di nav erdnîgariya Îranê de, bo netewa Kurd Komara Kurdistanê ava bikin, ku xewna sedan sale a çendîn nifşên wan bûye.

-Herwisa ferqek esasî a din, di navbera wan du hikûmetan de, ew bûye ku, Komara Kurdistanê bi qasek berbiçav, serbixwe ji hizûra karbidestên Sovyetê, û destêwerdanên wan, bi şêwazek Demokratîk karûbarên xwe bi rê ve birine. Lê Dewleta Azerbaycanê pir girêdayî bi Azerbaycana Sovyetê û Hizba Komonîst bûye, û bi şêwazeke polîsî û tundûtîjî hatiye îdarekirin.

-Di temenê 11 mehî a Komara Kurdistanê de tenê 1 kesê sivîl

hatiye kuştin, û ti zîndaniyên siyasî li zîndana Komarê de nebûne. Lê di Dewleta Azerbaycanê de gelek karê terorîstî û qetlên siyasî çêbûne, û gelek girtiyê siyasî di zîndanên wan de hebûne.

-Di kolanên Mihabadê de guhdarîkirina radyoyên biyanî ên wek Lenden û Enqerê, normal û serbest bûye. Lê di Tewrêzê de guhdarîkirina wan radyoyan sizaya îdamê hebûye.

-Komara Kurdistanê û Qazî Mihemed di nav gelê xwe de gelek hezkirî û birûmet bûne, û di dema rûxana Komarê de jî xelk melûl û xembar bûye. Lê di Tewrêzê de serbarî hebûna tirsa saziyên ewlehî û polîsên veşartî ên hikûmeta Azerbaycanê, lê xelk ji hikûmetê nerazî û bêzar bûne, û dema ku leşkerên dewleta Îranê gihîştne Tewrêzê, Azeriyên wir li dijî karbidestên hikûmeta Azerbaycanê serhildan kirine, û gelek ji wan karbidestên hikûmeta Azerbaycanê kuştine.

-Bi vî awayî serbarî vê ku Komara Kurdistanê jî ji derfeta hatina Sovyetê bo Îranê, karîbû bi piştgiriya wan ava bibe, û hinek alîkarêyên kêm ji wan wergire, lê jiber ku ew komar berhema bîr û baweriya netewî a gelê Kurd bû, lewma niha jî piştî derbasbûna dehan salan bi ser rûxana wê komarê de, hêj rêbaza wê komarê di nav dil û mejiyê Kurdan de zindî ye. Lê jiber ku avabûna Dewleta Millî a Azerbaycanê li ser bingeha bîr û baweriyên netewî û girêdayî bi xelkê Azerbaycanê nebû, lewma nayê bibîranîn û ti şopek ji wê nemaye.

## *Emerxan piştî Komara Kurdistanê*

Emerxan çend caran di civînên Hizba Demokrat a Kurdistanê de, bêbaweriya xwe ya derbarî siyaseta Sovyetiyan bi Kurdan re anîbû ziman. Lê piştî vekêşana hêzên Sovyetê, û dûrketina piraniya eşîrên Kurdan ji Komara Kurdistanê, Emerxan jî fikiriye ku, eger çavnihêrê vê nezelaliya rewşa Komarê, û herwisa nebûna biryara berxwedanê ji aliyê berpirsên komarê ve bimîne, diyar nine ku paşî xweradestkirna Qazî Mihemed, û berpirsên Komarê, hingê qedera wî, û piraniya Şikakan, ku hem bi sedema şoreşa Simko, ku li dijî dewleta Îranê şer kiribûn, û hem jî, bi sedema beşdariya wan di Komara Kurdistanê de, wê çi bi serê wan were?.

Lewma Emerxan wisa baş zaniye, ku bona xweparastin li hemberî her metirsiyeke dewletê, vê gavê xwe radestî dewletê nekin, û bi çekên xwe ve di herêma Urmiye û Selmasê de bimînin, heta bikarin çareyekê bo paşeroja xwe peyda bikin.

Di heman demê de jî gef û givaşên berdewam ên karbidestên Şah û artêşa Îranê ku ferman dabûn, dibe Kurd çekên xwe radestî dewletê bikin, bo wê meremê jî Şêx Ebdulrehîmê Şems Burhan şandibûn Zindeştê, û li civîna bi Emerxan û serokêlên Şikakan re derbarî bêpaşerojiya Kurdan li dijberiya bi dewleta Îranê re axivî bû. Bi xasmanî li dijî Qazî Mihemed û Mele Mistefa Barzanî qise kiribû. Lê Emerxan û serokêlên Şikakan gotibûne wî qasdê dewletê, ya baş ew bû te giranî û rûmeta malbata xwe parastiba, û di ciyê dijberiya bi Qazî Mihemed û Barzanî re, te alaya Kurdistanê hildaba. Lê niha ku tu qasidê dewletê yî, here bêje dewletê heta efûya giştî bo Şikakan dernexe, em çekên xwe radest nakin û bi egera nigeraniya me ji paşeroja xwe, û bêbaweriya me bi dewleta Îranê, em neçar in bi êl û eşîrên xwe re ji Îranê derkevin, û bi hev re penaberê Îraq û Tirkiyê bibin.

Ew berxwedaniya Şikakan ji radestnekirina çekên xwe bi dewletê, çend mehan piştî rûxandina Komara Kurdistanê domandiye. Di wî wextî de “George Allen” balyozê berê yê Amerîka li Yûguslaviyê, ku salekê berî damezrana Komara Kurdistanê hatibû Tehranê, û

di wan heyaman de çend caran bi Emerxan re hevdîtin hebûye, û bi hev re dostanî hebûne, peyamek bo Emerxan şandiye, û gotiye, min derbarî te û eşîreta Şikakan, bi Şah re axiviye, û min gotiye Şah, Emerxan her ji despêka hatina Rûsiyan bo Îranê, mixalifê maytêkirin û nifûza wan di Îran û Kurdistanê de bûye, û wî çi bawerî bi Rûsiyan neaniye. Herwisa gotiye, min Şah razî kiriye, ku te û eşîreta Şikakan efû bike.

"George Allen" di wê peyama xwe de ji Emerxan xwestiye ku sardana leşkerê 64 ê Şah li Urmiyê bikin, û piştî radestkirina çekên xwe, li ser cî û warê xwe rihet rûnên.

Piştî wê peyamê, Emerxan bi serokêlên Şikakan re civiya ye, û tevî Reşîd Begê Cehangîrî û Temirxanê Hinare, çûne bal serleşkerê Şah li Urmiyê, û wefadariya xwe ji Şah û dewleta Îranê re ragehandine.

Bi vî rengî "George Allen" hem Emerxan û Şikak ji metirsiya îdamê rizgar kirine, û hem jî wefadariya Emerxan û Şikakan bi Şahê Îranê ragehandiye.

Piştre êdî Emerxan heta dawiya jiyana xwe di Zindeştê de maye, û wekî meznê Şikakan, di hemû xêr û şerê wan qonaxan de pişikdar bûye.

Herwisa heta dawiya jiyana xwe, di asteke bilind de, tevî karbidestên dewleta Îranê têkilî hebûye, û çend caran bi Şahê Îranê re hevdîtin kiriye, û di piraniya merasim û civînên dewletê de, bixasmanî yên eleqedarî Kurdan de, bi nûneratiya Şikakan beşdar bûye, û biryar daye.

Emerxan li sala 1958`an di temenê 85 saliyê de, koça dawiyê kiriye, û di nava merasimeke mezin a serokêlên Şikak, Herkî, Soran û karbidestên dewleta Îranê de, li gundê Zindeştê bi xakê hatiye spartin.

## *Nerîna kesayetiyên siyasî derheqê pêgeh û kesayetiya  Emerxan*

**Raporta "Archibald Roosevelt" alîkarê leşkerî di balyozxaneya Amerîka li Tehranê derbarê Emerxan de**

"Archibald Roosevelt" di raporta xwe ya derbarê Emerxan de nivîsiye: "Kiryarên hin ji serkirdeyên Kurd li gor nerîn û merema wan, hin şik û gumanan pêk tînin. Yek ji wan nimûneyên balkêş jî, mijara Emerxanê Şikak e.

Emerxan di wê demê de rêberê teraz yekem ê eşîreta Şikakan û bihêztirîn û rêzdartirîn kesatiyê Kurdistana Îranê bû. Tê texmînkirin ku Emerxan derheqê bûyerên wê demê de, bandorek erênî li ser çavdêrên Amerîkî hebûye." "Archibald Roosevelt" Emerxan wek "Pîrê Mezin" yê Kurdistanê pênase kiriye.

**Sipehbûd (generalê Riza Şah) Ehmed Emîr Ehmedî nivîsiye:**

"Dema ku min û "Archibald Roosevelt" ku hingê ew karbidestê Amerîkî di Îranê de bû, me derbarê Emerxanê Şikak de qise dikir, "Archibald Roosevelt" ji min re got; "Emerxan Pîrê mezin ê Kurdistanê  ye."

**Rapora "William Douglas" derbarê Emerxan de**

Di sala 1950-î de, "William Douglas" qaziyê naskirî yê Dîwana Bilind a Amerîkayê di wê demê de, hevdîtinek digel Emerxan kiriye, û di beşa 4 a kitêba xwe de basa sefera xwe ya ku ji bo dîtina Emerxan çûyî Zindeştê kiriye, û wiha nivîsiye:

"Di serî de min silavên "George Allen" sefîrê berê yê Amerîka li Îranê ku dostê Emerxan bûye gehandine Emerxan, û wî bi germî mêhvandariya min kir. Serbarî vê ku Emerxan çi xwendineke kilasîkî tunebû, herwisa çi rojname û govar jî li cem wî tunebûn ku bixwîne, lê wî bi rêya radyoyê tim nûçeyên cîhanê şopandine, û kesekî xwediyê zanista siyasî, û agehdar ji rewşa cîhanê, û şirovekarekî  lêzan  bû.

Wextê min dît Emerxan çawa li ser komonîzma li Sovyetê, û herwisa rewşa Koreya Bakûr, û mîsaqa Atlantîkê qise dikir, û di wê derbarê de nerîn û rexneyên xwe bas dikirin, ez ecêbgirtî mam, ku Emerxan çawa ew qas zanyarî û têgihîştina siyasî kom kirine, û bi wê zanabûna xwe gelek baş, pirsên siyasî şirove dike. Min wisa hîs dikir, ku ew mamosteyek e ku dersê dibêje dersxwanan."

Ew herwisa dinivîse:

"Emerxan bi Komara Kurdistanê re alîkar bû, û yek ji çar generalên wê komarê û endamekî xwedîbandor di serperestiya Hizba Demokrat a Kurdistanê de bû. Herwisa Emerxan yek ji îmzakerên peymannameya di navbera Komara Kurdistanê û Dewleta Millî ya Azerbaycanê ya di sala 1946`an de bû, û şervanên di bin fermandehiya wî de beşek ji hêza sereke ya Komara Kurdistanê bûn. Dema ku wî zaniye êdî rûxana Komara Kurdistanê nêz bûye, alîkariya xwe bi Komara Kurdistanê re qut kiriye, û bi vegeriyana bo mala xwe li Zindeştê, çavnihêrê bûyer û guhertinên dawiyê maye.

Tê texmînkirin ku Emerxan bi dirêjiya wê heyama ku bi Komara Kurdistanê re bû, têkiliyên wî bi "George Allen" sefîrê Amerîkî yê li Tehranê re hebû. Ew karê Emerxan wekî tedbîreke îhtiyatî bo paşerojê bû."

**"William Douglas" derbarê rizgarbûna Emerxan ji wê tirajidî û metirsiya piştî Komara Kurdistanê, ku bi navbeynkariya sefîrê Amerîkayê tevî Şahê Îranê pêk hat, dinivîse:**

"Bi dirêjiya wê dema ku Emerxan bi Komara Kurdistanê re alîkarî dikir, qet têkiliya xwe bi "George Allen" re qut nekiriye, û di nav Komara Kurdistanê de jî, tim li dijî siyasetên Sovyetê ravestiyaye. Piştî rûxana Komarê jî, dihat texmînkirin, ku Emerxan jî wê tevî Qazî Mihemed bihê bidarvekirin. Lê "George Allen" li cem Şah berevanî ji navbirî kiriye, û di encam de nehêlaye Emerxan bê kuştin."

**Şerîporv dîpolomatê Sovyetê li Îranê derbarê Emerxan de wiha dibêje:**

"Li rêkevt 06.02.1945`an dema ku ez ji Tewrêzê vedigeriyam Urmiyê, di rê de rastî Emerxan hatim, Emerxan derbarê hewlên xwe ên ji bo yekxistina eşîrên Kurd ku berê bi hev re nakok bûn dipeyivî, û bo vê meremê dixwest cardin seferekê bo herêma bakûrê Rojhilatê Kurdistanê bike. Di vê sohbeta me de Emerxan got; "Min çiqas bi rêya radyoyê ve deng û basên cîhanê şopandine, lê min ji mezinatiya Sovyetê tiştek fêm nekiriye, û dîsa jî hêvîdar im ku Sovyet bo serxwebûna Kurdistanê, piştgiriya xebata me bike."

**Dr. Efrasiyab Hewramî ku piraniya belgenameyên derbarê Kurdan de, ji arşîva Rûsan wergirtine, derheqê Emerxan de wiha nivîsiye:**

"Serbarî vê ku gelek kesan derbarê rûxana Komara Kurdistanê de Emerxan û hin serokêşîrên din wek xiyanetkar nasandine, lê Emerxan ji sala 1942`an ve serbarî wê daxwaza ku ji aliyê dewleta Îranê ve jê hatiye kirin, ku heger alîkariya wan bike, ew jî wê gelek post û pere bidin wî, lê Emerxan ew yek qebûl nekiriye û paşê jî wek generalekî Komara Kurdistanê li ser xebata netewî û nîştimanperwerî berdewam bûye.

Herwisa Emerxan û hin serokeşîrên Kurd bi Qazî Mihemed re li ser vê yekê li hev kirine, ku bajarên Urmiye, Selmas, Kela Xwê û Makûyê, ku parek ji Kurdistanê ne, bi çi awayekî be, divêt em wan deveran vegerînin jêr deshilata Komara Kurdistanê. Lê pêdivî ye bihête gotin ku, Qazî Mihemed zêde tekez li ser vegerandina herdu bajarên Seqiz û Baneyê bo jêr deshilata Komara Kurdistanê kiriye û gotiye, derheq bajarên din, pêdivî bi hevahengiya bi dewleta Azerbaycanê re heye."

**Selumîn ê serkonsolê Rûs li Makûyê, li sala 1946`an di rapora xwe de derheq Emerxan wiha nivîsiye:**

"Emerxan mirovekî fêlbaz û lêzan e, ew ji hemû bûyerên Îran û cîhanê agehdar e, û wî kariye piraniya eşîreta Şikakan çekdar bike. Ew di dema axavtinê de rihet dikare axavtinê ber bi aliyekî din ve biguhere û mijareke din bîne ber basê, û hişê mirov bibe aliyekî din ve. Bo nimûne; wî hingê ji min re basa peymana Atlantîk dikir.

(Hewce ye bihê gotin ku mebesta Emerxan ji amajekirina bi Peymana Atlantîkê li dema hevdîtina digel karbidestên Rûsî û Amerîkî, pêdagirîkirin e li ser naveroka daxuyaniya 14 madeyî ya "Woodrow Wilson" serkomarê Amerîkayê li dema şerê yekem ê cîhanî, ku di madeya 12 ya vê daxuyaniyê de bas ji mafê qedera gelên bindest ên li jêr deshilata Osmanî û yek ji wan neteweya kurd hatibû kirin. Ew daxuyaniya piştre li sala 1941`an bû bingeha carrnameya Atlantîkê ku di navbera "Winston Churchill" serkokwezîrê Birîtaniyayê û "Franklin D. Roosevelt" serkomarê Amerîkayê de hate wajokirin, û di xala 3 ya vê carrnameyê de jî bi zelalî pêdagirî li ser mafê diyarîkirina qedera wan gelan hatiye kirin, ku bi her sedemekê be, ji deshilata nîştimanî û serweriya bi ser xaka xwe hatine bêparkirin.).

**Boçûna "George Allen" balyozê Amerîka li Tehranê derheqê Emerxan de**

Emerxan serokê êla Şikak e, û bo heyamekê jî Wezareta Şer a Komara Kurdistanê li stûyê wî bûye. Temenê wî nêzî 70 salan e, û hertim digel hikûmeta navendî di şer de bûye. Beşek ji temenê xwe di girtîgehên Riza Şah de derbaz kiriye, û çend salan jî bo Tirkiyê hatiye dûrxistin. Hêşta jî wekî serhildêrekî tê hesibandin. Konsolê Birîtanyayê li ser vê baweriyê ye ku, yek ji sedemên herî girîng ku Qazî Mihemed dikare bo selimandina îdi`aya xwe di warê parastina seqamgîriya siyasî a herêmî de bîne, ew e ku heya niha kariye wefadariya Emerxan biparêze.

**Nerîna Qotaz Mamedî derbarê Emerxan de**

Emerxan kesatiyekî siyasî, vêrek, lêhatî û xwedîheybet bû. Lewma Simko di berahiyê de ji wî hez dikir, û dema nanxwarinê tim Emerxan bang dikir û bi hev re nan dixwarin. Lê ew qedirgirtina ku Simko ji Emerxan re nîşan dida, bibû sebebê hesûdî û nerazîbûna Ewdoyiyên Pisaxa ên derdorê Simko. Ber hindê paşê Simko jî hêdî-hêdî ji pêşkevtina Emerxan û alîgiriya Şikakn bi wî re nîgeran bibû.

**Nerîna Senar Mamedî derbarê Emerxan de**

"Emerxan ji aliyê leşkerî ve fermandeyekî lêzan, vêrek û nîşançiyekî derece yek bû. Di ware siyasî de siyasetmedarekî zana, xwedîtedbîr ji bo paşerojê bû. Wî di wê qonaxa hestiyar a wî zemanî de kariye bi lêzanîneke mezin, peywendiyên xwe yên siyasî bi dîplomatên Amerîkî, Rûsî û dewleta Îranê re çêbike, û di tewahiya çalakî û peywendiyên xwe de, derheqê mafê Kurd û serxwebûna Kurdistanê xebitiye."

## *Şehîdbûna du kur, û du neviyên Emerxan di nav xebata PDKÎ de*

Di sala 1979`an de piştî vê ku Komara Îslamî di Îranê de deshilat bi dest ve girtiye, Xomêynî rêberê olî ê rejîma Îranê, fitwaya cîhadê li dijî gelê Kurd ragehand, û hêzên rejîma Îranê, hêrişî ser Rojhilatê Kurdistanê kirin.

Li dema berevaniya gelê Kurd ji xaka Kurdistanê, di hemberî vê fitwaya Xomêynî de, bi hezaran xortên Kurd di çepera berxwedaniyê de, canê xwe gorî kirin, ku di nav wan de, du kur û du neviyên Emerxan jî, canê xwe ji dest dane.

Kurê wî yê bi navê Ferzende, tevî neviyê wî bi navê Mihemed Şerîfî di çarçoveya siyaseta jînosayda gelê Kurd ji aliyê rejîma Îranê ve, di gundên "Kûrê" û "Belehî"ya herêma Enzelê de, tevî çendîn kesên sivîl tên şehîdkirin.

Herwisa kurekî din yê Emerxan bi navê Îbrahîm Şerîfî ku bi Guro dihate nasîn, digel neviyê wî yê bi navê Ferheng şerîfî, ku ew jî kurê Guro bû, herdu jî di nav refên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de fermandeyên lêhatî yên Pêşmergeyên Kurdistanê bûn, û li sala 1983`an di şerekî giran de ku li gundê Belehî ya herêma Enzel a nêzî Urmiyê qewimî, şehîd bûne.

# *Wêne*



Ji çep bo rast: Kesê yekem Simko,-Kesê çarem Cewer Axa,-Kesê pêncem Mistê bavê Birê Newrozî



Simkoyê Şikak



Ji çep bo rast:
Rêza pêşiyê kesê sêyem Simko,-Kesê çarem Nîkîtîn dîplomatê Rûsî, kesê pêncem Surme xanima xûşka Marşîmûnê Asûrî



Rêza pêşiyê kesê nîvekê yê rûniştî: Simko, tevî Qadir Axa û Cewer Axayê Hertoşî, yên rawestiyayî: Nûro û Hacî Axayê Hertoşî




Ji çep bo rast:
Rêza pêşiyê kesê duyem ê rûniştî Şêx Ebdulselam Barzanî




Ji çep bo rast:
Rêza pêşiyê kesê duyem Cewer Axayê Şikak digel deshilatdarên Qacaran li Tewrêzê, û ên rawestiyayî şervanên Şikak (1905)



Emerxanê Şikak



Kela Çariyê



Şêx Se`îdê Pîran



Şêx Ehmedê Barzan



Şêx Mehmûd Berzencî



Ebdulrezaq Bedirxan



Faris Axayê Zêbarî



Qotaz Mamedî bavê Senar



Temirê Cango Fenekî




Ferzinde Begê Hesenî




General Şerîf Paşa



Mistefa Paşa Yamolkî



Cemîl Kakil Mihemed Axa Gerdî



Şêx Ebdulrehman Seran



Îhsan Nûrî Paşa û Yaşar Xanim



Ji çep bo rast:

Kesê çarem Babekir Axayê Pişderî



Ji çep bo rast:
Kesê sêyem, Biroyê Heskê Têlî û şervanên Araratê



Ji çep bo rast:
Biroyê Heskê Têlî



Ji çep bo rast:

Rêza pêşiyê yê rûniştî kesê duyem Simko Şikak digel şervanên Kurd



Ji çep bo rast:

Emerxan, Simayîl Axa Pisaxayê Kardar, Zekî birayê Sûto, Sûtoyê Oremar, Murad Gewirkî, Şêx Murad




Qazî Mihemed û "Archibald Roosevelt"



Ji çep bo rast:

Rêza pêşiyê kesê sêyem Emerxan



Ji çep bo rast:
Rêza pêşiyê rûniştî kesê nîvekê Qazî Mihemed



Qazî Mihemed û Mela Mistefa Barzanî



Emerxan bi kincên leşkerî



Ji çep bo rast:

Rêza pêşiyê kesê şeşem Zêro Begê Herkî



Ji çep bo rast: Rêza li ser pêyan kesê pêncem Mela Mistefa Barzanî û Qedrî Cemîl Paşa (1946)



Serbazgeh "Qişleya Akrê" li serdema Osmaniyan



Ji rast bo çep: Emerxan,“Gorg Allen” balyozê Amerîkayê li Tehranê, Hebîb Emîrî nûnerê Emerxan



Emerxan û Seyîd Ebdullah Şemzînî digel pêşmergeyên Şikakan li serdema Komara Kurdistanê




Emerxanê Şikak



Ji çep bo rast:
Wîlyam Daglas û-Emerxan




Ji çep bo rast:
Kesê Sêyem Tahirxan Simko û birayên wî



Îbrahîm Şerîfî (Guro) kurê Emerxan



Ferzinde Şerîfî kurê Emerxan



Ferheng Şerîfî newiyê Emerxan



Ji çep bo rast:
Kesê duyem Senar Mamedî



Çiyayê Arart, Emerxan



Mezargeha Emerxan

# *Çavkanî:*

## Çavkaniyên Kurdî


- بارزانـی، مەسـعوود. (2020)، بارزانـی و بزووتنـەوەی ڕزگاریخوازیـی کـورد، بەرگـی یەکـەم، (۱۹۳۱-۱۹۵۸)، چاپـی یەکـەم، هەولێـر چاپخانـەی ڕۆژهـەڵات

- جەلیل، جەلیل. (1999)، بیۆگرافیا عەبدولڕەزاق بەدرخان، چاپی یەکەم، بەرلین، لە بڵاوکراوەکانی گۆڤاری هاڤیبوون.

- حەمە باقی، موحەمەد. (2011)، بیرەوەرییەکانی سەید عەزیزی شەمزینی، سلێمانی، بنکەی ژین.

- دۆغان، فەیسەل. (2020)، سیا دیرۆکێ، سەرهلّدانێن کوردان، بەشا خۆیبوون و ئارارات.

- ڕەفیق، ساڵح و سدیق، ساڵح. (2007)، ڕۆژنامەی کوردستان- مەهاباد، 1324-1324 هەتاوی. سلێمانی، بنکەی ژین.

- سـۆڵتانی، ئەنـوەر. (2005)، ڕۆژهەڵاتـی کوردسـتان لـە بەڵگەنامەکانـی وزارەتـی دەرەوەی بریتانیـدا، سـلێمانی، بنکـەی ژیـن.

- سەبری، عوسمان، ,(2009) فەرزندە بەگ، گۆڤارا بیر، گوڤارا لێگەڕین و لێکۆڵینێ، ژمارە ۱۰، ل. ٥٥-٦٨.

- عەزیز سەعید، هیوا. ((2006، کۆمەڵەی خۆیبوون-پارتی هیوا-کۆمەڵەی ژێکاف، چاپی یەکەم، سلێمانی، چاپخانەی یاد.

- عیـزەت، مەحمـوود مـەلا. (2001)، جەمهورییەتـی کوردسـتان، لێکۆڵینەوەیەکـی مێژوویـی و سیاسـی، سـلێمانی، دەزگای سـەردەم.

- عیزەت، مەحموود مەلا (2003)، دەوڵەتی جمهووری کوردستان، سلێمانی.

- قـادری، کاوە. (2008)، کۆمەڵـەی ژ.ک تـا کۆمـار (بیرەوەرییەکانـی محەمەدئەمیـن قـادری کۆلیـج)، چاپـی یەکـەم، هەولێـر، چاپخانـەی ڕۆژهـەڵات.

- قاسـملوو، عەبدولڕەحـمان. (1988)، چـل سـاڵ خەبـات لەپێنـاوی ئـازادی، چاپـی دووەم، چاپخانـەی حیزبـی دێموکراتـی کوردسـتانی ئێـران.

- کۆچێـرا، کریـس. (2006)، کـورد لـە سـەدەی 19 و 20، وەرگێڕانـی حەمەکەریـم عـارف، چاپـی دووەم، سـلێمانی، چاپخانـەی شڤان.

- گەوهەری، حامید. (2011)، کۆماری کوردستان، هەولێر، چاپخانەی شەهاب.

- گەرناس، ئارام. ,(2008) فەرزندە بەگ، گۆڤارا بیر، گوڤارا لێگەرین و لێکۆڵینێ، ژمارە ۸، ل. ۹۲-۹٦.

- لازاریڤ، م. س. (1989)، کێشەی کورد، وەرگێڕانی؛ کاوس قەفتان، بغداد، مطبعە الجاحظ.

- مسـتەفا ئەمیـن، نەوشـیروان. (2005)، کـورد و عەجـەم مێـژووی سیاسـیی کوردەکانـی ئێـران، چاپـی سـێیەم، سـلێمانی، چاپخانـەی ڕوون.

- مسـتەفا ئەمیـن، نەوشـیروان. (2007)، حکوومەتـی کوردسـتان، کـورد لـە گەمـەی سـۆڤیەتدا، چاپـی سـێیەم، سـلێمانی، سـەنتەری لێکۆڵینـەوەی سـتراتیجی کوردسـتان.

- مەنگـوڕی، میـرزا موحەمـەد ئەمیـن. (2001)، بەسـەرهاتی سیاسـیی کـورد، لـە 1914وە تـا 1958- بەشـی دووەم، سـلێمانی، چاپخانەی ڕاز.

- نـووری پاشـا، ئیحسـان. (2001)، بیرەوەرییەکانـی ئیحسـان نـووری پاشـا، وەرگێـڕ: وریـا قانیـع، هەولێـر، چاپخانـەی وزارەتـی پەروەردە.

- هەورامی، ئەفراسیاب. (2006)، کورد لە ئارشیڤی ڕووسیا و سۆڤیەتدا، هەولێر، چاپخانەی وزارەتی پەروەردە.

- هەورامـی، ئەفراسـیاب. (2007)، ڕووداوەکانـی ڕۆژهەڵاتـی کوردسـتان لـە بەڵگەنامەکانـی سـۆڤیەتدا (194-1945 )، سـلێمانی، بنکـەی ژیـن.
- هەورامـی، ئەفراسـیاب. (2008)، پێوەندییەکانـی کوردسـتان و ئازەربایجـان و هەرەسـهێنانی هـەردوو لا، لـە سـاڵی 1946دا. سـلێمانی، دەزگای چـاپ و پەخشـی سـەردەم.
- هەورامی، ئەفراسیاب. (2008)، ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە سەردەمی شەڕی دووەمی جیهانی، سلێمانی، بنکەی ژین.
- یانۆڤ، ئەڤیر. کورد لە جەنگی ڕووسیا لەگەڵ ئێران و تورکیا، وەرگێڕ: هەورامی. ئەفراسیاب،

## Çavkaniyên Farsî

- ادموندز، سیسیل جی. (1383)، کردها، ترکها، عربها. ترجمه ابراهیم یونسی، چاپ دوم، چاپخانه نوبهار.
- امیـر احمـدی، احمـد. (1994)، خاطـرات نخسـتین سـپهبد ایـران احمـد امیـر احمـدی، تهـران موسسـه پژوهـش و مطالعـات فرهنگی.
- بخش‌پوور، جلیل. (1385)، سلماس و دوره مشروطیت، فصلنامه مطالعات تاریخی، شوماره 12 بهار، 269-224.
- برفروخت، رزگار. (1398)، حرکت سمکو در کشاکش ناسیونالیزم و عشیره‌گرایی، تهران، نشر تاریخی ایران.
- بـورل، روبـرت میچـل. (1392)، یاداشـتهای سیاسـی ایـران، (1965-1881)، جلـد 7: 1926-1924، مترجـم: افشـار امیـری و مهـدی رحمانـی، تهـران: مرکـز اسـناد انقـلاب اسـلامی، موسسـه فرهنگـی- هـنری انتشـارات.
- توفیـق، رەحمت‌اللـه. (1393)، تاریخچـه ارومیـه، یادداشـتهایی از سـالهای جنـگ جهانـی اول و آشـوب بعـد از آن، تهـران، انتشـارات پردیـس دانـش.
- جویـد، وادی. (2006)، جنبـش ملـی کـورد، جمهـوری مهابـاد، فصلنامـه فرهنگـی اجتماعـی گفتگـو 1388، شـماره 53، ص: 82-47.
- چوپانی، احمد. (1394)، اسماعیل  آقا سمکو، تهران، انتشارات آنا.
- خامه‌ای، انور. (1372)، خاطرات سیاسی، تهران، نشر گفتار.
- خـسروزاده، سـیروان. (1397)، مجموعـه تاریـخ معـاصر ایـران- شکسـت اردوی آهنیـن: گزارشـی از سـمکو بـه مهابـاد و انهـدام هنـگ چهاردهـم ژاندرمـری، مهـر 1300 شمسـی. تهـران انتشـارات شـیرازه کتـاب مـا.
- درخشانی، علی اکبر (1994). از جنگهای گیلان و لرستان تا واقعه آذربایجان. ماریلاند، درخشانی.
- دهقان، علی. (1348)، سرزمین زردشت. تهران، ابن سینا.
- سجادی، امیر. (1398)، جامعه شناسی سیاسی حزب کومه‌له تجدید حیات کوردستان، سنندج، انتشارات مادیار.
- شریفی ممکانی، ابراهیم. (1388)، ایل شکاک در مسیر حوادس. ارومیه، حسینی اصل.
- جرالد ف.پ. دوهر. (1946)، کوردها و فرقه دموکرات آذربایجان، ماهنامه گفتگو، شماره 53، ص:152-133.
- مامدی ،سنار. (1379)، خاطرات و دردها، جلد اول و جلد دوم، سوئد الفابت ماخما.
- مامـدی، سـنار. (1999) حملـه، اعـدام، یـورش و یـاوه سرایـی بلوریـان، و فهرسـت از خاطـرات سیاسـی مـن، جلـد اول. سـوئد، نـاشر بـاران.
- موبلـی. ا. ریچـارد. (2008)، ڕوابـط جمهـوری کوردسـتان و آذربایجـان 1946-1945، ترجمـه: حسـن قـازی، سـلێمانی، چاپخانـەی شـڤان.
- موقـدم، حسـن. (1309)، قتـل اسـمعیل آغـا سـمیتقو، قطـع ریشـه فسـاد، کوشـش، سـال هشـتم شـماره مسلسـل 1328.

.(31.04.1309)

- هوشمند، احسان. (1388)، سالهای آشوب، فصلنامه فرهنگی اجتماعی گفتگو 1388، شماره 53، ص: 46-29.

- هومایـون، سـعید. (2004)، پیشـوای بیـداری، خاطـرات سـعید هومایـون، گـردآوری: هاشـم سـلیمی، اربیـل، چاپخانـه وزارت آمـوزش و پـرورش.

- قاضـی، د. رحیـم، (1385) اسرار محاکمـه قاضـی محمـد و یارانـش... گـردآوری و ترجمـه: محمدرضـا سـیف قاضـی، چـاپ سـوم, نـاشر: نـشر آنـا – تهـران.

## Raport

- سازانۆف. ڕاپۆرتی وەزارەتی دەرەوەی ڕووسیە

- هەڵسەنگاندنی ئارچیبالد ڕۆزڤێلت

- ڤیلیام داگلاس

-CENTRAL INTELLIGENCE AGENCY, (1960), GEOGRAPHIC INTELLIGENCE PEPORT, THE KURDSIN 1959, OFFICE OF PESEARCH AND REPOTS.

## Belgename:

Kurdî:

- بەڵگەی دیپلۆماتکاران و ئارشیڤی ڕووسیە

- بەڵگەی دیپلۆماتکارانی ئەمریکا

- بەڵگەی سی. ئای. ئەی

- بەڵگەی ئارشیڤی عوسمانییەکان

- بەڵگەی لەشکری بریتانیا

- بەڵگەنامەکانی کۆکراوەی پێوەندیدار بە ڕێبەرانی کورد و جوولانەوەی کوردستانەوە

- ڕۆژنامەی «کوردستان» لە سەردەمی کۆماری کوردستان

- نامەکانی نێوان فەرماندەکانی کۆماری کوردستان لە بەرەی شەڕدا

- ئارشیڤی زارەکی، (وەرگیراو لە فۆلکولۆر و دواندنی کەسایەتییە شارەزاکان)

Farsî

- اسناد وزارت پست و تلگراف

- سازمان اسناد ملی ایران

- وزارت کشور، اداره کل شهربانی (1322)، رونوشت گزارش شهربانی، رضائیه، مورخه 1321.03.08 شماره 184.